# DURYAN
# 1

Ji Bakur Heta Nehdaran

Hewar Gabar

*Ez vê pirtûkê di şexsê Şehît Merwan (Ahmet Özdemir) de diyarî tevayê şehîdên azadiya Kurdistanê û bi teybet Şehîdên koçberên wargeha Şehît Rustem Cûdî (Mexmûr) dikim.*

*Zeman, mesken û navên kesên bi vê pirtûkê re derbaz dibin, hemî rastîne.*

*Gerkû ji gelên dîrokê yê herî kevin û afirandvane ema, wekî di dîrokê de qet jiyan nebiye hesibandin di vê serdemê de wekû pêkenoka Kurd derdikeve pêşya me. Tu ya ji dîrokê re dergûştî û dayîktiyê bikî ema, di derbarê te de ti pîvan û exlaq nayêne bikaranîn; yên wekû gelê demê yê herî bê dil te binirxînin û tu ya bibî qurbana xiyanetên herî xirap. Yên te ji mafê herî binyat yên mirovan bê behr bihêlin û dîsa jî wekû civaka herî sûnçdar îlan bikin. Tu ya ji xizmeta her kesî re amadebî ema, dîsa jî ji qedapbiyînê rizgar nebî. Tu ya bimînî mirovên hemdem, wekî wan bî ema, di cewher de nesîbê xwe ji ti nirxan negirî; yên wekî gelên reş, zer an jî Qizildereyî yên serdema modern xwilamtiyê jî layîqê te nebînin. Bi berjengek wuha tu li hember Kurdîtiyek wisa di xefkê de hatî asêkirin kû heyîna mînakek ya wêya din qetiyen ne gengaze. Kurd tê fatiskirin, dibêjin; 'tiştek wisa nîne' ema herî zêde jî ji vê ya tine dihesibînin ditirsêne.  Ji ya tine çawa tê tirsîn? Tu yê bêjî heye, wekî hemî hemwelatiyan xweyê hemî mafaye; ema tu yê tehemûla bi awayek azad xwe îfadekirina zimanê wî yê bi zorê jipiya dimîne û nîvçe mayî jî nekî. Bawerim pirsgirêka çaxê me ya çareseriya wê herî zehmet ya ev be.*

***Rêber APO***

## Pêşgotin

Di vê xaka pîroz de gotin û wêje bi tiştên pîroz hatiye destpêkirin. Her çiqasî di têgihandina mirovatiyê de wate û pîroztiya gotinê kêm bûbe jî baweriya me ya li hemberî gotinê didome û em nirxek pîroz lê bar dikin. Dema min dest bi xwendina DURYAN'ê kir, di destên min de pirtûka Amîn Maaloûf ya bi navê, "*Navê Sedî*" hebû. Li gor nivîskarê pirtûka dabaşa gotinê navek yê Xwedê hatiye wundakirin an jî ji bû mirovên ji rêzê nehatiye gotin. Not û neh navên xwedê bi navek wunda yekparetiya xwe temam nekiriye û vê rê li pêşiya mirin, penabertî û bê maftiye vekiriye. Yekparetî ango heqîqet, di wateya kêmnavî de li gelik tiştên mirov hatine barkirin û gera heqîqetê bi vî şêwazî her didome.

Gotin gîrîngin û mîmarê dilê *DURYAN'ê* Ocalan, vê rastiyê bi şêwazê "xweza xwe di mirov de dide naskirin" pênase dike û pahnava wateyê bi awayekî bê sînor fireh dike. Gotin jî dibin ravekirina heqîqeta mirov. Gelo pirtûkek dikare barê heqîqetê hilgire û bibe zimanê wê? Pirsek gelek girînge û gelek caran mirov bûne şahidê pirsên wisa. Di vê xaka kevnar de şahidîtiyek ya gotin û vebêjiya heqîqetê her hatiye jiyandin. Jibîrkirina gotinê bi qasî wundakirina heqîqetê xirap hatiye dîtin û hatiye heramkirin. Herambûn, ji koka 'ram' ango ramanê tê û tê wateya menkirina ji nêrîn û gotinê jî. Yanî tişta ji aliyê ramanê ve nehatî pejirandin û destwerdana wê hatî qedexekirin.

Belê koçbertî ji aliyê rêvanên koçbertiyê ve tê destgirtin û nivîsandin. Li gorî gelik kesan nivîsandina çîroka vê penabertiyê dereng ma an jî hatibe nivîsandin jî kêm hatiye dîtin. Bêgoman mebesta nivîskar ji van rastiyan wêdetire. Yek ji mebestê eve kû ger tu bi rastî kurd jiyan bibî an tê li çiyan wekî gerîlayekî têkoşîn bikî an jî penaberbî. Di koçbertiyê de çawaniya jiyanê pirs û bersivên bi agir dadayîne. Em bawerin me ev pênaseya rêbertiyê ji cihekî baş girt û em di cihek baş de bicîh dikin. "Ji ber kû mijara me ya girîng ewe, divê em têkiliya di navbera bûyîn-hebûn-serwextbûnê

de zelal bikin û maneyê bidinê. Dema ku mijar Kurd bin, mirovê bikaribe ji têgînên hebûn, bûyîn û serwextbûnê (bîrbirinê) gelik tiştan hîn bibe. Eger em Kurdan bi rewşa wan ya hebûn, bûyîn û serwextbûnê bidin naskirin, ev yek wê ji bû fêhmkirina mijarê bibe bingeh. Ne dûr, heta ji beriya demekê, li gorî gelik civak û dewletan hebûna Kurdan cihê guftûgoyê bû. Di van dused salên dawiyê de ji bû piştrastkirin û îspata hebûna Kurdan, di çarçoveya modernîteya Kapîtalîst de, belkî bi qasî Kurdan ti civak ewqasî li şîddetê rast nehatibe, ji aliyê naverok û şêweyê ve zordestî, fatis û qir nedîtibe. Li ser Kurdan siyasetên qirkirinê yên fizîkî û çandî hatin meşandin. Li mekanê xwe yê binyat (Kurdistan), çi ji aliyê fizîkî ve, çi jî ji aliyê çandî ve (zêhnî) hatin parçekirin û ji bû tinekirinê her core amûrên zorê û îdeolojîk hatin seferberkirin. Mirov dikare bibêje, heta gihişt qirkirina bi destê modernîteya Kapîtalîst, ti mekanîzmayên talan û zorê neman ku li ser nehatibin ceribandin. Kurdîtî ji vî alî ve diyardeyek wisa ye kû hemtayê wê nîne. ***Cihû, ji bû qirqirinên xwe têgîna 'bêhemta, nedîtî, yekane' bi îhtîmam bi kar tînin. Ji bo Kurdan jî ne ku bi sedema qirkirina li ser wan meşandine, lê ji ber tevahî kirinên ew ji hebûnê derxistine mirov dikare wekû 'gelê yekane' yan jî 'yekane hebûna civakî'*** bi kar bîne."

Bûyîn-hebûn-serwextbûn anjî zanebûna bûyîn û hebûna xwe jiyan bûyînê çarenûsek mina Duryanê dixe pêşiya mirov. Li gorî em ji nivîskar hîn dibin, tişta ji bûna mirovan normal eve. Asayîbûniya bûyîn, hebûn û serwextbûnê vê ji mirov dixwaze Duryan, çîroka Kurdê azad e. Saziyên tekoşîna Kurdan bi gelemperî li penaberiyê hatin sazkirin. Bêgûman mirov dikare ji bûna civakê jî wisa bêje. Di hemû tekoşînên mezin de heman rastî hatine jiyandin. Di hemû dînan de jî kêm zêde mînakên wisa hene. Di Hîcreta Îslamê de, di navbera Xwedê û Resûlê wî de gotebêjek wisa derbas dibe: ***"(Resûlê min!) bêje ku: Ey Rabbê min! Cihê em biçinê bihêle kû em bi başî biçinê! Cihê em jê derên jî bihêle em bi başî derên! Ji cem xwe hêzeke alîkar û rêzan rêke ji me re!" (el-Îsrâ, 80)*** Dibe ku derdê nivîskar yek ji van be jî. Rewş û serpêhatiyên bi wezbet kû di jiyan û rêvantiya koçbertiyê de hatine jiyandin, di heman demê de serpêhatiya hemî serhildanvanên Kurdanin jî. Bêgoman hemû çûyîn û derketinên koçberan bi başî encam nebûne. Di nexşe rêya dîrokê ya koçbertiyê de gelik cih û warên xemgîn yên Kurdan hene. Ji Kahîra Misrê, heta Baalbeka Lubnanê, ji Anatolyaya navîn heta nav zozanên Kafqasê hatine koçkirin û nebûne penaber jî. Nivîskar bi awayek hûrkulîn tevna cudatiya vê koçbertiyê dihune û radixîne ber çavan. Ger tu komek biçûk bî jî di ferqa bûyîn-hebûn û serwextbûna xwe de bî hemû dewletên yekbûyî jî bibin yek nekarin te ji rê derxînin. Dîroka karwanê koçberên Bihêrê, Şeraniş, Bêsivê,

Geliyê Qimatê, Etrûş, Nînûva, Nehdaran û Mexmûr ev ispat kiriye.

Dîroka penabertiya gelê Bohta (Botan) ku bi wargeha Maxmûrê bi dawî dibe têra xwe xwedî wate ye. Di heman demê de dîroka bûyîn-hebûn û serwextbûnê ye jî. Kurd azadbin wê weke Mexmûr bin. Mexmûr nasnameya azadiya gelê Kurde. Mirov dikare bêje, hemî dîroka gelê Kurd di rêvantiya vî karwanî de xwe dubare kiriye. Bi leheng, xweşmêr, zanyar û xayîn û welatfroşên xwe mîna dîrok di roja me de xwe veşartiye xwe eşkere dike. Li gorî nivîskar di dîroka vê penabertiyê de kî û çi çibe niha jî ew tişte. Ji ber wê jî bi hewildanek mezin vê bîr û hişê binirx zindî dike û agahiyan ji quncikên jibîrçûyî hildikşîne roja me ya îro. Wekî welatê Ehmedê Xanê, ango çîroka Xanê kû di koçbertiyê de zindî bûye jan û xweziyên xwe anîne ser ziman. Jana Xanê Evîna Mem û Zînê ye û ev evîn jî Kurdistane. Nivîskar di her sê bergan de jî wekî bêje ez hozanim, ez hunermendê gelê xwe me gazî dike. Belê, pirtûka DURYAN; têra xwe tijî leheng, xweşî, xemgînî, evîn û nexweşî ye. DURYAN, banga hemî serpêhatî û dîroka koçbertiya gelê Kurdistanê ye.

Di her xet û hevoka vê pirtûkê de coş, jan û fermêskên hunerî xwe didin der. Hozan ango hunermend ji bûna civakekê tên çi wateyê di xwendina vê berhemê de baş tê dîtin. Serpêhatiyên zor û dijwar elmasan çêdikin. Elmas ji reqbûnê tê û vîna çola Qereçox hatî siqakirin wekî elmasekê li ber xwe dide. Kevir dihelin, ax dişewetin, dar dimirin li wê çolê. Hozan û dengbêjên qedîm ew çol ji jiyanê re qedexe kirine. Lê vîna di kûrha Serok Apo de hatî siqakirin li wê çola sincirî jiyanê diafirîne. Elmas li cihên hêja têne hilanîn û veşartin. Bazara wê jî wisa ye û ger bazara wê nînbe divê her li cihê xwe be. Ji bû vê DURYAN, bang û şîreta vê bazara hêja ye.

Wezbeta DURYAN'ê ez birim şîroveyek evqas balkêş. Heke gotin bi hêza heqîqetê were vegotin, dikare barê heqîqetê hilgire. Belê em niha hêdî hêdî derbasî nav pelên pirtûkê bibin. DURYAN, çîroka penabertiyek li ser axa welatê xwe vedibêje. Milê wê yê herî balkêş jî ev bixwe ye. Parastina rastiya heqîqeta xwe, bûye çîroka wî karwanê pirtûk li ser hatî nivîsandin. Hîvî, mebest û armanca karwanê koçberên li ser axa welatê xwe kêlî bi kêlî hatiye hunandin û bûye bîra hişê karwanê penaber. Erşîvek ne li ber dest, lê di quncika serê hemî mirovên di van duryanan de gav avêtin piç bipiç kom kiriye û raxistiye pêşberî me. Ger hestek hatibe jibîrkirin, ger gotinek li pişt dîwaran mabe, ger zarokek rû qemitî li pişt konan hatibe jibîrkirin û gelik tiştên wisa dîmen bidîmen tîne bîra mirov. Di vê pirtûkê de mirov zindîne û ji xetên rûyên wan bigre heta bi xwêhdana li ser eniyê û bi dilopên baranê ve li pêşberî me dirawestin. Deng û bêhna wan tê û difna mirov dikizirîne. Ger galonek yê gazê hatibe ji bîrkirin û ya Hîlalî, Mijînî, Şirnexî û Geweriyan be, bila li nav

pelên DURYAN bigerin; misoger yê bibînin. Di vê pirtûkê de gotinên êvaran nakevin kunê dîwaran û ji girikê Viran xwe li perdeyên guhê me didin. Mîna wêneyên defterekê temenê hemî kesên tevlî wî karwanê bi heybet bûyîn hatiye zindîkirin.

Egîd û leheng jê ne kêmin. Xayîntî û birakujî jî dîsa. Lehengtiya me gelik bîriyê kirî û di oxira doza pîroz de birçî mayîn. Li ser rê û rêbarên Nehdaran şop û dewsên bergeşên ji nîsk û birincan Helefeyan pêktê û bi Hevaltiyek esîl me danî pêşberî hev hatiye neqişandin. Ma gelo, tiştek hatiye jibîrkirin di vê pirtûka hanê de! Dibin çadirek diryayî kû li rasta bayê Şêxan hatî, di zivistanek sar de li ser darên req bi tîpên zêrîn li ser depên meydanê ji modernîteyê re dixwînin tên nivîsandin. Kî hebû û kî tunebû di bin van çadirên diryayî de. Zarokên Gûyî yên rûyên wan zer kû sermayê sor bûne, keçikên Şirnexî yên rû esmer kû çav û guhên wan cara yekê ye ji zimanê dişibe çarenûsa wan tê vekirine. Hest û ramana wê kêliyê ku ev nedidan bi ti sûkên Hewler û Silêmanî li ser bajarê ji çadiran ber bi baya Şêxan diket. Çadir çadir digere û dibe guhdarvanê deriyên ji zeraqa fanosan diyar dibin. Mîna siyek bi ber zeraqê dikeve dibe şahîdê çîrok û serpêhatiyên wan jî. Zarokên ji birça xewa dayik û şêniyên çadirê direvîne, zarokên bi şans ku xwediyê qûtek xwezayî ku hewceyî ti kîs û telîsan nake jî nehatine jibîrkirin.

Mîna qabîleya Yahûdî ku çawa ji fîrewn direvin, ew jî bûne rêwiyên ji  hezar qat ji fîrewn xerabtir û zalim. Jiyan avakirin bûye mîna leyîstoka zarokan, çêdikin û dîsa xiradikin, lê tiştekî qet jibîrnakin. Dilê wan her li çiyê ye û qet jê qutnabin. Lehengek ji vê pirtûkê pirsa malîvanê  xwe dike, bersiv balkêşe û tê gotin malîvan li jore. “Jor” peyvek nepenî ya di nav malika dil de ye û her ber bi roja me tê, dibe nasname û cihê hêviyên azadiyê. Jor ne her çiya ye, jor çiyayê Hevalane. Bîrî û hesreta li ser dilê her penaberê vê pirtûkê ye jor. Jor milê wane, jor çavê wane û jor hema her tiştê wane. Jor, xwezî û pevguhertina ji her tiştên dinyayê yên niha, bûye raza hunera nivîskar.

Pirtûk bi dînê xwe jî gelekî balkêşe. Gelo li ku derê cîhanê dîn jî bûne penaber. Penaberên herî şîrîn penaberên dînin. Ji Evdilahê Dîn heta bi Elî Kop û Muhemedê dîn çavdêriyek dîn jî para xwe daye vê pirtûka hanê. Şehîd û miriyên wan têkelin di serpêhatiyên wan de. Her mirin bi qasî şehîdekî bi wateye di vê rêwîtiya penabertiyê de. Gorên xwe jî bar dikin û gorên wan jî penaberin mîna wan. Çend kal û çend pîrik bûn penaberên bê dawî. Belê, pirtûk çîroka penaberên Mexmûrê ye. Mexmûr ba û tofana herî dawî ye.

Bêgûman pirtûk ji ezmûn û mînakên destpêkê mişte. Komek biçûk ji quncên welatek giregire çawa dikare giyan û dilê neteweyekê ragire dibêje. Ger komek biçûk be jî, xwedî raman û baweriyek xurt

be dikare vê rastiya hanê pêkbîne. Pirtûk di vê xalê de balê dikişîne ser Rêber Ocalan ku çawa kêlî bi kêlî çavdêriya vê koma biçûk dike û li wê beriya sincirî her avdanek giyanî û ramanî dike. Barek giran hildan ser milên xwe û wisa dest bê vê rêwêtiyê kirin. Em jî weke xwendevanekî dikarin bêjin kû her destpêk encama xwe diyar dike. Despêk giregire û bi wate ye. Meş didome û gelik zarokên destpêka vê pirtûkê niha mezin bûne. An Demhat in, an Eyşê ne an jî Xezal in. Jiyan li pê jiyanê avakirin. Mîna bexçeyên Babîlê ku pir nêzî wire. Çol veguhestin buhuştek biçûk û tije hêvî. Mêw û darhijîrên xwe, col û kerî pezên xwe mîna li Kêlê û rûbarên Gebarê ne, li qûntarên Qereçoxê çêrandin. Bi hêviya domandina berga sêyemîn ji niha ve ji nivîskar re spasiyên xwe dişînin.

**Nûman Amed**
**28-04-2019**

## Paşgotina Pêşgotinê

Bihara 1994'ê artêşa dewleta Turk bi mantiqa "deryayê biçikîne û masiyan bej bihêle" êrîşek mezin anî ser qadên çiyayî yên Kurdistanê. Di vê êrîşa 'ji nû ve' dagirkirinê de nêzîkî pênç hezar gundên Kurdan şewitandin, bi hezaran Kurd kuştin û bi milyonan jî ji cih û warên wan koçberkirin. Dewleta dagirker, di navenda hedefên êrîşên xwe de herêma Bohta-Hekarî bi cêhkiribû û gotin di cêh de be; kuç li ser kuçê ne hiştibû. Bi hezaran gundên Bohta ya ji aliyê dewleta Turk ve bi statûyek teybet dihat rêvebirin û wekû 'Komara Şirnex' nav lê kirîn; bi erdê ve yêksan kiribûn. Kurdên xwe ji devên şûrên artêşa Turk rizgarkirîn, pijiqîbûn çar aliyên cîhanê. Qismek gundiyên bi teybet li nêzîkê sînorê Başûrê Kurdistanê, bi tehfdana artêşa Turk derbazî Başûr bibûn. Wan qesta deriyê xwişk û birayên xwe yên Başûrî kiribûn û bê goman xwe ji hemqederên xwe yên aliyên din ve çûyîn şansdartir dîtibûn.

Aha ev Pirtûka bi navê "DURYAN 1 (Ji Bakûr Heta Nehdaran) û DURYAN 2 (Ji Nehdaran Heta Mexmûr)" beşek ya serîwana bê eman ya vê rêvantiya bê hemsal vedibêje. Gelo çi hat serê wan mirovên bi çi kul û halî stoyên tifalên xwe ji şûrên artêşa dewleta dagirker rizgarkirîn û xwe gihandîn ber deriyê xwişk û birayên xwe yên Başûrî? Çima neçar man, di nav mihacirtiyê de heft caran mihacir bibin û di dawiya dawî de li qontara Qerçoxa keçel werin qerastin? Çend boseyên ji agir derbazkirin û çend duryanên mirinê bi mergên xwe yên tazî qulibandin? Di berxwedana parastina NAMÛS'ê de, çend vînqels ketin û çend leheng biken çûn ava? Karwanê giraniya wê ji pîr û kalan û ji zarokan pêkdihat û her tiştên wan ji aliyê artêşa dewleta Turk ve hatî şewitandin û qirêja ji dewleta dagirker rizgarkirîn jî ji aliyê Partiya mala Berzanî ve hatî talankirin; çima û çawa li berxwedan? Bi kîjan vîn û rêbazan xwe ji boseya bi agira sê xelek ya dewleta Turk, Partiya mala Bêrzanî û UNHCR (Komiseriya Bilind a Pênaberan yê Netewên Yekbûyî) rizgarkirin, ne ketin û rûmeta xwe parastin? Di nav wan têkilî û nakokiyên yeman de bi kûjan hêz û vînê li ser lingan man? Aha bersiva tevayê van pirsan û bi hezaran pirsên din hûnê gav bigav, bêhn bibêhn di vê pirtûkê de bibînin û bixwînin.

Ez bi wî karwanî re derketim rê û heta niha jî bi wan re jiyan dibim. Di şevên zilomat de, di çemberên mirinê de me bi hev

re li berxweda û di şevaqek ya serkeftinê de me bi hev re govenda azadiyê gerand. Li ber kazênên zarokên ji nêza heneseyên xwe yên dawî didan, em bi hev re girîn û di parçekirina boseyên nemirovan de me bi hev re navlixweda. Min di beyaniyek ya şevek êşdar de ji rêvanek çavreş bihîstibû; jina biskên pora xemor bi bin xavika lewitî re rijayîn ser awrên dijwar digot;

***"Heke hin ji me ji vê boseya mirinê bifelitin û rojekî ev çîroka jandar ema bişeref were nivîsandin; hergîz divê nivîskar kesek bi me re jiyan bûyîbe. Encex ew bi karibe evîna me ya jandar û sibehên me yên hîvîdar di kûrahiya mergên xwe de hîs bike."***

Çîrokek fêrisbû serpêhatiya karwanê rêvanên azadiyê. Şerê pîroz û qedabêbû. Serpêhatiyek têr êş û lehengbû. Ew rêya dirêj û têr asteng gav bigav bi xwîna şehîdan hatibû nexişandin û bi hêstirên dayîkan hatibû stirhandin. Nivîsandina wê zehmetbû û min ne wêrî xwe bere bikim. Ez ditirsam û dihizirîm kû nikarim mafê wê yê layîq teslîm bikim. Ema pêwîstbû ew berxwedana bi wezbet bi awayekî hatibûya nivîsandin û ji dîrokê re bibûya mal.

Ev xebata ji sê beşan (DURYAN 1- Ji Bakur Heta Nehdaran, DURYAN 2 - Ji Nehdaran Heta Mexmûr, DURYAN 3 - Mexmûr) pêktê, sala 2013'ê hat destpêkirin. Bi qasî pênçsed hemwelatiyên wargehê re rû birû hevpeyvîn hatin pêşxistin û hiş hatin nûkirin. Heke vegotinên wan dê û bavên hêstbarkirî û ji kûrahiya mergan difûrîn tinebûna, belkî di vê astê de ev berhem derneketa holê. Girêdayî vê di şexsê wan mirovan de ev berhem ya tevayê hemwelatiyên wargeha Şehît Rustem Cûdî ye. Bêkû navê Şoreşgerê Etîmolog û lêkolînvan Nûman Amed û Ristvan û Nivîskara Şoreşger Rihan Îke bibîrbînim naxwazim derbaz bibim. Di serxistina vê xebatê de şîret û arîkariyên rewanî yên hevalên nabûrî bandorvanbûn.

Beşa yêk û du ya vê berhemê amade ye û nivîsandina beşa sê jî didome. Hingî ji me hat û hizrên me têrêkir, me hewlda bi vê xebatê bibin vebêjê hêstên dayîkên di vê rêvantiya biheybet de zarokên xwe wundakirîn. Me hewlda em cêh bidin hemî veqetînan û tiştekî paşguh nekin. Ji ber kû her gav û bêhna rêya vî karwanî kutayî girîngbû û ji girîngtiyê jî wêdetir pîrozbû. Heke ji derveyî karîna me hin tişt ji çavan revîbin û ne hatibin nivîsandin ew qisûra mine û wekû pêşîn lêbûrîna xwe dixwazim. Heke bi vê berhemê me karibe em ji deryaya vê têkoşînê serpeşkekî jî vebêjin em şad û bexteyarin.

**Hewar Gabar**
**15. 08. 2020**

## Destpêk

Ew çaryêkekbû tirimpêl ji bajarê Duhokê derbazbûyî. Cîba Başûrî jêre dibêjin; “Landegros” bilez di fitlûpêçkên çiyayê Zawite de diçû xar. Demek dirêjbû li tirimpêlan siwar ne bibûm, tirimpêlê serê min girtibû û di rewşek nîv gêj de bûm. Ji nişkan ve bidengê ajotvan Birûsk veciniqîm. Zelamê enî fireh got;

“Ewa he... Qampa Etrûşe!”

Heta min li biwara tiliya wî ya îşaretê nêrî, sirtê beramber ket di navbera çavên min û wargehê de. Dengê hevalê Birûsk, ser giraniya min tarûmar kiribû û dubare daketibûm nav xeyalên nîvçe mayî. Di hesabên min de çûyîna qampekî û bûyîna mihacir tinebû. Dibêjîqey tirimpêl bibû robarek har û ez li ber pêlên wê ketibûm. Pêlên har ez çep û rast tavêtim û ber bi ne kifşbûyînekî ve tajotim. Pêl ewqas xwirt û dijwarbûn, di demek pir kurt de ez ji cîhanekî avêtbûm cîhanek din.

Birûsk, tirimpêl li duryanekî sistkir. Dibêjîqey rewşa min ya ruhî dixwend û dixwest min ji qula zeman bikişîne cem xwe. Rêya qîr ya destê rastê nîşan kir û got; “ev rê diçe Laleş. Vaye nêzîke, biqasî deh deqîqaye.” Piştî min biryara çûyîna qampê dayî cara yêkêbû, kêm jî be gotinekî ez keyfxweş kiribûm. Hîviya dîtina Laleş turûskek piçûk di hinavên min de pêxistibû.

Ajotvan, pîtkek ji pêşmergeyên li duryanê re da û li rêya destê çepê ajot. Piştî bêhnekî em gihatin tenişta qampê. Çadirên gewr, di pehnavekî de bê rêkûpêk hatibûn reşandin. Reşê mirovan wekî mûriyan di nav çadiran de diqijvijîn. Di ketina qampê de alek hişîn bi stûnek bilind ve diheja. Dibe kû cara yêkêbe çavên min li wê alê diket, an jî cara yêkem bala min kişandibe. Baregeha keleh ya ji Sedam Huseyn mayî û li ser (li ser)kevana gundê raser; dibêjîqey haxta di ser çadiran de gindirvarî bibe.

Tirimpêlê rêya ax ya ji rêya qîr vediqeta û diçû qampê derbazkir û xwe li fitlûpêçkên evraz yên Etrûş da. Birûsk, mereqa di dêmê min de xwendibû û got;

"Ezê we deynim qampa Geliyê Qiyametê. Ne dûre di pişt Etrûş de ye. Mereq neke, êdî tu li van derayî. Tu yê pir li van qampan bigerêyî" û çixareyek pêçayî ji berîka êlekê xweyê serê kursî ve kirî derxist û raberî min kir.

Hê min mizek ne dayî çixara xwe, tirimpêl gihat rastika binya baregihê. Pêşmergeyek şaşik sohr, keleşkofek bê qontax bi milan ve li tenişta kelha kor zîq li tirimpêla me dinêrî. Gundek asayî ya Kurdistanê bû Etrûş. Bi nîvê girekî ve li cihek asê hatibû avakirin. Heke ew kelha kor û bê merîs lê nebûya, gundek şîrîn jî bû. Lê wê kelha bêhna mirinê jê dihat, hemî rindîtiya gund di bin siha xwe de hiştibû. An jî herî kêm min wisa didît.

Tirimpêl bi tenişta gund re derbazbû û gihat serê milê. Dengê stirana Xelîl Xemgîn "Welatê min tu yî bûka cîhanê" cara yêkemînbû ewqas bandor li hêstên min kiribû. Dilê min diguvaşt û ûrkê minê piçûk dişewitî. Em li destê çepê ji rêya mak veqetan û bi nav darên êrvist[1] re daketin xar.

Qampa Geliyê Qiyametê li pesarê beramberê me bû. Li gor Etrûş piçûktirbû û çadir di nav dar û deviyan de belawela hatibûn vedan. Heke di şûna çadirên gewr de konên reş bûna, bi pez û dewarên xwe ve warê koçeran yên zivistanê tanîn bîra mirov. Ji nişkan ve çadirên gewr, nivz û piçûk li ber çavên min bûn konên reş yên çardeh stûn û warên azad û asê yên zozanên Herekolê hatîn bîra min. Berxvanan, berx berdabûn ber makan û barbara mih û berxan dengê strana koma Berxwedan didewisand. Lê, zû ji wan xeyalên xapînok veciniqîbûm. Ew, ne wargehên azad û evîndaran yên Zozanên welatê min bûn; qampek ya mihaciranbû.

Tirimpêl bi ser pira li ser robarek kiçik hatî avakirin re derbazbû û li ber derê qampê rawesta. Zilamek cilên Hevalan li ber, şalemeyek rengîn li newqa xwe pêçayî, kefiyek Sêrtikî li ser navmilan, rih û simbêlên wî tevlî hev bûyîn; ji koxikê sergirtî û kêmek ji çeperekî mestir derket û bi rûyek ken em pêşwazîkirin. Dema hêşedarê spehîmêr û Birûsk bi hev re taxivîn, çavên min li çadira mezin û spî ya bi bin rê re aliqî. Di bin bapeşka barana nû destpêkirî de, zeriyek şidayî birek zarok tajotin di hundirê çadira mezin de.

Jixwe hêşedar jî di nav de hemabêje hemî wargehê Birûsk nas dikir. Ji bilî xweşbaşê tiştek ne dihat gotin û tirimpêla me ket di nav malan de. Rêya wargehê herîsohrikbû. Mirovên ji asayî pir zêdetir li ser rê û bi awrên mereq barkirî li me dinêrîn, barana nû destpêkirî û serma zivistanê ne li xema wan bû. Birûsk jî bê îstîsna bê silav ji kesî ne dibûrî. Her kesê silav digirt bi rûyek ken û xweş

---

1
 Qaç, darek bistirî.

silava me vedida. Bi nav şelît û stûnên çadiran re tirimpêl hêdî hêdî pêş diket. Piştî bêhnekî em li dawiya malan, li ber derê çadirekî rawestan. Jinek sivik, tenik û ciwan zarokek li mila li ber eywana derê çadirê rawestabû. Piştî Birûsk silavek da jina ciwan, li min zivirî û got: "Tu yê li vê malê bimînî, heta Heval hatin" û bixwe jî peyabû. Min jî çeltê xwe girt û em çûn destê malîvana ruhsivik. Piştî xêr hatinek bikeyf û nêzîkê can li me da; Birûsk rextê xwe bi hêlwesta generalekî rastkir, mêhvandartiya mina derbazer jêre vegot, dubare li tirimpêla xwe siwarbû û çû.

Jina ciwan û rûken, bi keyf û siyanetek mezin ez vexwendim hundir. Dema min paçê derê çadirê hilda bêhnek bê eman û gêjker firnikên pozê min gizgizandin. Ji bû neçim di hundir de texûpaşbûm. Wextê li paş xwe zivirîm, min dît jina malê li pişt min sekiniye û neçar mabûm derbazî hundir bibim. Du betaniyên rengê leşkerî, tenik û ti carî min ne dîtîn di binê çadirê re rayêxistibûn. Çend betaniyên wekî wan û li hev pêçayî di quncikekî de li ser hevbûn. Alek ya ERNK'ê[2] di paşiya çadirê ve daleqandîbû û wêneyek yê Rêber[3]tiyê li ser kaxezek stûr dabûn û pê benikekî ew jî bi rex alê ve daleqandîbû. Çadir biqasî neh, deh mitredam firehbû. Nîvê wê biqasî bejnekî bilind û her du teniştên wê biqasî nîv mitreyî hebûn. Amêrek spî, kêmekî binê wê fireh, wekî nîv lûleyek ya sopê li ser wî binî û nêzîkê binê wê du çavikên bi naylonek ronahî girtîn û pêtek agir di hundirê wê de li nîvê çadirê dirawesta. Ew bêhn hemî ji wê amêra navê wê "sopa eledîn" dihat. Bêhna sopa qelba qazyaxê û ya çadira şimakirî diket di nav hev de û sitar, ûr û hinavê min li hev dixistin.

Piştî ez rûniştim kêmekî, min ji malîvana mêhvanperwer pirsa "hûn ji kûne?" kir.

"Em Goyîne. Ji gundê Nêrweh ya girêdayî Qulabanin. Ez hevjîna Musa yê Nêrwehî me. Milîse, qey tu nas nakî?"

"Na."

"Hemî Heval wî nas dikin, qey tu ne Hevalî?"

"Na. Ez jî wekî we welatparêzekim."

"Ya, belê, belê. Musa çûye jor. Hey xwidê hes bike, îşev siba yê were" got û bi pêre jî rabû ser xwe û ji bû xwarinê amade bike destûr xwest.

Bi awrên şerm barkirî, min got;

"Jor kûdere?"

Jina xweşik, zerîn û bejin navîn, bitinaz tevlî tevz beşişî û got;

---

2 Eniya rizgariya Netewa Kurdistanê

3 Abdullah OCALAN

"Tu jor jî nizanî?"

"Na!"

Wekî gotinê ji dizî ve û ji hinan veşerê, bê hemd tona dengê wê ket;

"Em ji çiyan re, ji çûyîna cem Hevalan re dibêjin; jor" got û derket jiderve.

Piştî malîvana me ya delal derket ji derve, min li demjimara xwe ya casio temaşe kir; demjimar 15 û 46 deqîqe û salnama mîladî 21.02. 1995 dinivîsand.

Piştî kêmekî ji rêvebertiya wargehê hevalê Bedranê Serhedî û Feqe yê Goveşîrî hatin û bi siyanet û keyfxweşiyek mezin xêrhatina min kirin. Qet ji bîra min naçe; bêhna tirimpêlê û di ser de ya soba eledîn û çadira şimakirî ez gêj kiribûm. Piştî xweşbêşê daxwaza min ya pêşî ji Hevalan; "dubare û aha niha min vegerînin cihê jê hatîm" bû. Hevalan daxwaza min bi dêmek tinaz û wekû bertekek ya ecemîtî nirxandibûn. Hevalê Feqe yê ji kena zikûpişt bûyî destê xwe li milê min da;

"Em zarokên sobyên darane, xaniyên du olî[4] yên ax û gundên li navseran çiyane. Lê, xema nexwe, emê bi hev re fêrî vê jiyanê jî bibin. PKK ya me fêrî vê jî bike" got û em yêk û yêko çûn destê malîvana xwe ya dilnivz û mirovyar. Me xatirên xwe jê xwestin û hevalan ez birim çadira milîsên Gabarî.

Malîvanên min yên nû, ji berya êrîşa şewtandina gundan ya artêşa Turk li gundên xweyên Gabar milîstiya rêkxistinê dikirin. Piştî dewlet gundê wan dişewitîne û malbatên wan derbeder dike, bi rêya Hevalan derbazî qampê dibin. Endamên eşîreta Goyiyan ew wekû 'zigurt' binav dikirin. 'Zigurt', dihat wateya bê malbat, biserê xwe. Ez jî yêk ji wan zigurdabûm êdî. Ji bilî neh, deh milîsên Gabar, hema bibêje her kes bi malbata xwe ve hatibû qampê.

Piştî çend rojan komîteya têkiliyên jiderve ya wargehê -wekû Komîteya Netewên Yêkbûyî jî dihat binav kirin-, rêkirin pey min û ez çûm mala Mele Şîrînê Baneyî. Xoceyê Erûhî -berpirsê komîteya wargehê ya Netewên Yêkbûyî- û kesek bozê çav hişîn çaverêyî min bûn. Piştî çend pirsên "tu ji kû, çima" û "bi kû re hatî" kirin, jinek û çend zarokên xeyalî li ser min tomar kirin. Çadirek, çend betaniyên ji betaniyan zêdetir dimînin her tiştî, fanosek piçûk û sopeyek eledîn dan min. Bi arîkariya derdor min çadira xwe di navbera mala Sofî Reşîtê Şaxî û Mele Şîrînê Baneyî de veda û çîroka mihacîrtiya min bi vî awayî destpêkir.

Bêkû vê hêsta xwe vebêjim naxwazim derbaz bibim; bi ser gotina Şehîd Feqe Goveşîrî ya "emê fêr bibin" re bîst sal derbazbûn

---

4 Qet, tebeqe.

û hê jî serîwana min ya mihacirtî yê ne qedaye. Lê, dixwazim li xwe mikur werim kû hê jî heman wekî cara destpêkê min serê xwe êxistî çadira Şehîd Musa yê Nêrwehî de me. Qet, ema qet fêrî vê mihacirtiyê nebûm. Di wê pêvajoyê de ji bû xwe hêdî bikim û bêhna min fireh bibe, min gotinek bikartanî;

" Ez ne dîlê teme, dilê min li gel te ye!"

Bi rastî jî min ti carî xwe dîlê vê mihacirtiyê ne dît lê, dilê min li gel vê têkoşînêbû û eva her tim jî wisa bima.

## Wêran

Ji berya hatina min ya wargehê ew nêzî deh mehabû wê serîwenê destpêkirî û karwanê wan  mirovan sê wargeh jî li dûv xwe hiştibûn. Dibekû deh meh di pîvana zeman de ne demek zêde dirêjbe. Ema di jiyanê de hin dem hene saniyên wê jî pir dirêjin. Aha ew deh mehên bûrî jî ji bû wan rêvanan wateyek wisa hildigirt. Di nav wî qetê zemanê kurt de, bi dehan zarokên xwe qurban dabûn û di nav mihacirtiyê de bi caran mihacir bibûn. Heta gihatibûn geliyê Qiyametê, berxwedanek bê hemsal mezaxtibûn. Ji bû em baştir têbigihên karwanê koçberan çima, kengê û çawa derket wê rê ya dijwar, divê em herin destpêka êrîşên sala 1994'ê yên artêşa dewleta Turk.

Sibatoka dîn nû xatir xwestibûn. Zivistan têkçûbû û Adarê mizgîniya sala nû bi xwe re anîbû. Nûroj, bi hemî heybet û serefraziya xwe derketibû meydanê. Kulîlkên behîvan li dola Dîcle bi hêlwesta xêlaniyê makên xwe pêçabûn. Li ser kulîlkên spî, mêşên hingivî govenda demsalê fireh digerandin. Perîstankan hemî rengên Biharê di nav perên xwe de dihewandin û dibêjîqey bi kubartiya vê teybetiya xwe perikên xwe dijenandin. Bêrzanê milan ji zû ve zîl dabûn. Gangilok[5], bi hemî hunermendîtiya xwe li ber bayê biharê direqisîn. Av ketibû daran û wextbû darberû tirh bidin. Dibêjîqey bilalûk bi behîvê re di nava pêşbeziyek bê emandebû û digot; "ez jî heme û ji te bileztirim." Hemî candar bi çûyîna zivistanê û bihatina biharê şad û bexteyarbûn li welatê Bohta.

Komana[6] Kurd û biteybet çiyayî, xwezayîbûn. Keyf û şahî, êş û nexweşyên wan xwezayê kifş dikirin. Berf çiqas giranbe, bihar jî ewqas şadkerbû. Ev du alîteya xwezayêbû. Yêkî ya din tîmar dikir û bê hev ne pêkanbûn. Lê bihara wê salê, bi şadîtî û kelecana her salê mergên çiyayiyan ne diferikandin. Ji perîstankan bigre heta bi rûviyan, ji beytikên gundan bigre heta kundê kor, ji zarokan

5 Kulîlkek yêk belgiz, bejin kurt û Bihara zû çêdibe.

6 Aliyê fizîkî yê civakê.

bigre heta bi mezinan her kesî, her tiştî hîskiribû kû ew bihar ne asayiye. Artêşa dagirker ya Roma Reş xwe kom dikir û roj biroj hê bêhtir lûleyên çekên xwe dipesartin çeperên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan. Her roj bi hezaran gule li dol û niwalên Kurdistanê dibarandin. Roj tinebû firok û balefirên Turkan bi sedan cihên Bohta bombebaran nekin. Serok wezîra dewletê Tansu Çîler, bi artêşa xweya teybet navlixwe dida û dûruşma ***"yan yê biqedêne, yan yê biqedêne"*** wekî benîşt di devê xwe de dicût. Serfermandarê artêşa Turk Doxan Gûreş, bi vegotina; ***"İngilîzan ji me re lempa kesk pêxist"*** nîşana qirkirinek mezin dida. Tansu Çiler digot; "ez dayika we me" û Serok komarê heman dewletê Sulêman Demirel jî digot; "ez bavê we me". Wê salê niyeta wê dewleta dê û bav baş nedixweya. Jixwe wekû rasthatî jî be, gelê Kurd ti carî li rasta niyetek baş ya wan ne hatibû. Ji mirovan wêdetir, dibêjîqey candarên din jî hatina wê xetertiyê hîs kiribûn.

Tansu Çiler, bi artêşa xweya teybet 02.03.1994'ê derketibû sefera Gabar. Gabar, dergahê warê Bohta bû. Bi gotinek din, deriyê kelhêbû. Ji bû derya were çikandin û masî bej bimînin, fetehkirina Gabar şertê destpêkêbû. Pergala hegemonan, ev ferman dabû baregeha xwe ya navê wê Turk. Kuştin, girtin, îza, tirsandin, şewtandin, tecewûz, kuştinên kirekê wan dewlet, tiştekî pêşya pêşketina PKK'ê ne girtibû û dengê lingên şervanên azadiyê bilindtir dihat. Hêviya dawî, çikandina deryayê û bej hiştina masiyanbû. Ji bû serkeftina wê konseptê sêtiya Sulêman Demirer, Tansu Çiler û Doxan Gûreş hatibûn erkdarkirin.

Di encama şerê şeş rojan yê sing bising de, artêşa teybet ya wê sêtiyê xwe pênavdida li hember Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan hilweşabû û yên sax mayîn jî canê xwe bi zorê rizgar kirinbûn. Di wî şerê artêşa Romê di tê de bidehan kuştî dayîn de sê gêrîlayên Kurd jî şehîd ketibûn. Du Dilgeş û Serbixwe yê Rojavayî bibûn stêr û ji singa welatê Bohta rijabûn. Yêk ji Dilgeşan xortek pir ciwan û ji Nahiya Eynê ya girêdayî Dihê bû û Dilgeşê din û Serbixwe Rojavayîbûn.

Ev şerê şeş roja ajotî lê, di dîroka Têkoşîna Gelê Kurdistan de wekû 'şerê heft rojan' hatî tomar kirin, pir destpêk di nav xwe de dihewandin. Di dîroka ARGK'ê de cara yêkemîn gêrîla gel li piş xwe têxist, parastina wan dikir û bi ser jî diket. Ev şer, bi serê xwe dabaşa pirtûkekî ye. Ji sedema mijara me cudaye, em neçarin kurt derbaz bibin.

Sêtiya (Sûleyman Demirel, Tansu Çiler û Doxan Gûreş) ji İngilîzan 'erê' girtîn, bibiryarbûn Kurdistanê wêran bikin. Piştî operasyona dikara wê hatî kirin nozdeh rojan, ji bû çavên gelê Bohta bitirsînin û koçkirina wan hêsanî bikin, gundên hatîn hilbijartin bi firokên cengê hatin bombebarankirin. Li Gabar gundên

Gîver û Bêsûke, li Cûdî gundê Şax û li Kêla Memê jî gundê Şirîş bombebarankirin (26.03.1994). Li Gîver sêh û pênç, li Bêsûke neh, li Şax pênç, li Şirîş jî du gundî kuştin û bi dehan jî birîndar. Di nav van qirkirinan de ya herî dilêş Gîver bû. Givera li quntara Başûrê Rojhilatê Çiyayê Çirav û li pesarê beramber yê Bakurê Rojavayê bajarê Şirnex diket, gundek piçûkbû û hemabêje tu kes jê sax ne felitîbû.

Bi van qirkirinan dewleta Turk peyama; “heke hûn koç nekin û Gêrîlayên PKK’ê tenê nehêlin, emê we hemiyan qir bikin” dabû gelê welatparêz yê welatê Bohta.

Nîsana heman salê artêşa Roma Reş ji Gabar ve dest biwêranê kiribû (09.04.1994). Bi nîvê şevê re berê hemî çekên xwe yên giran dabûn gundên herêma Gabar. Bi berbangê re bidehan balefirên cengê û kobrayên turkan bi ser gundên herêmê re dizivirîn. Balkêşe, balefiran qazana destpêkê li gundê Xwirsê dabûn û bi rêzê ve qazan û roket berdabûn nav gundan. Dûyê tenorên Gabariyan û qazanên turkan bi hev re hewadiketin û li ezmanan jî tevlîhev ne dibûn. Nêzî sed gundê li herêmê tertûbelav kiribûn. Kelaşê mirov û lawirên piçûk û mezin tevlîhev bibûn. Qîrîna jin û zarokan erşê ezîm dihejandin. Her kes bi milekî ve direvî. Piranî zilam di çeperên şer de bûn ema, çekek ya wana van teyrên mirin barkirî rawestînin tinebû. Di nav çend demjimaran de li herêmê kevir li ser kevir ne hiştinbûn. Her kes bi aliyekî ve direvî û hevoka “dê li weledê xwe nedibû xweyî” aha ew kêlîbû. Balefir û firokên Roma Reş wekî teyrên kelaşan derketibûn nêçîra gundiyên Kurdan. Romiyên Romê dor li Gabar girtibûn û kemîn li pêşya jin û zarokan vedabûn. Li ber çavên mirovtiya şaristan bi firok, balefir û çekên dewletên Rojavayiyan, Roma Reş jin û zarokên Kurdan qir dikirin û tu kesî “hewara” wan ne dibihîst. Hewara jin û zarokên di bin qirkirinê de ti carî evqas dijwar û bê eman ne hatibû fetisandin. Milîs û ciwanên li cem havalan mayîn bi awrên neçar li reva dayik, bav û zarokên xwe temaşe dikirin.

Artêşa dagirker di tevayê dîrokê de ji bû di dilê dagiriyên xwe de xofê bafrîne hewlên bê eman mezaxtibûn û wekû dawî biqirkirina gundê Gîver, Bêsûke, Şax û Şirîş ev hovîtiya xwe derxistibû lotkê. Gelê Kurd, ev dagirker ji zû ve nas kiribû û wekû tedbîr xwestibû bar bike. Bê goman Gêrîlayên Kurd ne alîgirê koç kirinbû û nêrîna xwe di aliyê mayînê de û li ser axa xwe xweparastinê de kifş kiribûn. Ev viyînek xwezayîbû û her kes alîgirê vê viyînêbû. Ema di aliyê karîna xweparastinê de gomanên gelê herêmê hebûn û van gomanan xewê şevan li wan diherimandin. Lê, berxwedana ‘Şerê heft rojan’ kû hê jî xwîna leşkerên Turkan li erdê terbû, di hundirê gundiyên herêmê de çurûskek ya bixwe bawerbûnê hilkiribû.

Pêwîste ev xal vekirî û zelal were kifşkirin; şervanên Gelê Kurdistanê ji bû parastina gelê herêmê pergalek qayîm ya parastinê pêş ne êxistibûn û amadekartiyên pêwîst ne kiribûn. ARGK, hêzek ya gêrîlabû û stretejiyek ya wê ya parastina axê tinebû. An jî di navbera stretejiya parastina xakê û gêrîlatiyê de dudil mabû. Heke ARGK'ê stretejiya xwe li ser parastina herêmê avakiribûya û ligor wê amadekartiyên xwe kiribûna, dibe kû rewş di aliyê erênî de pir cudatir bipêş ketibûya. Ev xal bi pişt re pir hat gotûbêjkirin û şîrovekirin. Fermandar û rêvebertiya herêmê di aliyê rêkûpêktiya hêzê û çeper girtinê de kêm mabûn û herêm bi erzanî ji romiyên Roma Reş re hiştibûn. Ji aliyê Rêvebertiya PKK'ê ve rexne û rexnedayîna Gabar pir hat dayîn û kirin. Bohta kelha têkoşînêbû û Gabar jî dergahê vê kelhêbû. Bi ketina Gabar re pê li pey pê herêmên din jî ketibûn. Vê qirkirinê bi me hemiyan da hîs kirin kû xweparastina cewher ji nan, av û hewayê jî lipêştir û girîngtire.

Civaka bê xweparastin, mehkûmê qirkirin û xwilamtiyê ye. Aha malîvanên min yên wekû 'Milîsên Gabar' an jî Goyî wan wekû 'zigurt' binav dikin wisa wêran bibûn û vê derê re derketibûn. Merwanê Zivingşikakî (Ahmet Özdemir), Feqeyê Gweyînî (Abdullah Înan), Diyar-Soro yê Xwaranî (Mihemed Timortaş), Serbestê Xwaranî (Îbrahim Erdogan) û Qehremanê Şehrikî (Beşir Kilinc) çend kesên ji malîvanên min yê nûbûn.

Piştî Gabar ji xwecihên wê paqijkir, pê li pey pê ji Garisa, Besta, Kêla Memê bigre heta bi Katoyan, Govend û Oremar tevgera wêrankirina Bohta û girêdayî vê ya Kurdistanê ajotibû. Kurd wekî lehiyê ber bi bajaran ve diherikîn û vê lehiya koçberan rêvebertiya dewleta Turk bê zar kiribû. Dibekû destpêkê çareya pêşî lêgirtina çûyina ber bi bajaran ve cêhgirê Fermandarê togaya Şirnex yê fermandarê wî Lewent Ersöz, xwe wekû "Serokê Komara Şirnex" ayan kirî, tog general Hulusî Akar peyda kiribe.

Gundiyên Şirîş yên wekû pêşvanê serîwana karwanê koçberan dihatin pejirandin, roja hilbijartina giştî (26.03. 1994) ji aliyê balefirên dewleta Turk ve hatibû bombebarandin. Gundiyên piştî bombebaranê bar dikin, berê xwe didin gundê cîran Repin. Yêk ji rêhspiyê gund **Îsivê Elî (Yusuf Şen)** vedibêje:

"Gundê me li quntara çiyayê Kêla Memê bû. Ji sedema bergihê gundê asêbû, çûyîn hatina Hevalan pirbû. Danûpeza roja hilbijartinêbû. Di dabaşa deng dayîn û nedanê de em dudilbûn. Gundiyan ne dixwestin dengan bidin hilbijartina sîstema dewleta Turk. Piştî gotûbêjekî me biryar da; çend kes herin û wekû sembolîk deng bidin. Berf giranbû û rê girtîbûn. Sandiqa hilbijartinê ne anîbûn gund û em neçarbûn herin Qulaban û dengê xwe li wêdê bikarbînin.

Roja sohr nû gihatibû cihê danûpeza. Em çend zilam ji

gund daketin û ji bû deng dayînê me berê xwe da Qulaban. Hê em nû ji gund veqetabûn dengê balefiran hat. Jixwe em bifikarbûn û nîşanên xirakirina gund dixwiyan. Lê, me qet bawer ne dikir, dewlet bi balefirên cengê gundê me bombebaran bike. Bi hatina deng re, çar balefiran da der û yêkser berê xwe dan gund. Destpêkê yêkî û piştî kêliyekî ya din du bombeyên qazan berdan ser gund. Her du balefirên din jî bombayên xwe berdan tenişta gund û bi hev re gund û derdora gund bi roketan gulebarankirin. Xanî dinav guriya agir, toz û dûmanê de wunda bibûn. Ya star, heşirbû! Qêrîna jin, zarok û zilaman erşê ezman dihejand. Kesî kes ne didît. Her kes ji aliyekî ve direvî. Qet û parçeyên goşt, wekî baranê ji hewa ve dihatin xar. Qêrîn û nalîna mirovan dengê balefirên dijmin didewisandin.

Me bawer ne dikir ji gund tu kes sax felîtîbe. Piştî çend deqîqeyan toz û dûmana nav gund kêmekî belav bibû û em jî gihatibûn nav gund. Berf ji xwînê sohr bibû. Perçeyên laşê mirov û lawiran tevlîhev bibûn. Bi dehan zarok, jin li zikakan û dibin kavlan de mabûn. Tu kes li benda çûyîna balefîran nema. Hê balefiran derdûra gund gulebaran dikir, mirovan dest bi rizgarkirina kesên di bin kavlan de mayîn kiribûn. Piştî demjimarekî me bi dehan kelaş li meydana gund komkiribûn. Bidehan kes bê ruh li holê dirêj kirîbûn. Kûjan saxe, kûjan miriye ne dihat zanîn. Bi metreyan berf li erdêbû û rêya tirimpêlê jî ne dihat gund. Piştî demekî me fêhmkir kû Salhê Simal û Miryema Îsîv şehîd ketine û piranî giran 18 kes jî birîndarin. Her kesê li hişê xwe, ji tirsa dubare balefirên bizivirin û gund bomberan bikin, zarokên xwe berbi şkeftan ve direvandin. Kuştî û birîndar li hola gund mabûn û emê çi ji wan bikin me nizanî.

Li wêdê bûyerek jan-kenok derketibû holê. Evdilayê kurê Miryema Îsîv, dema hewldide kelaşê dayîka xwe ji bin kavlê xanî derxîne qazana duyemîn li mala cîranê wan dikeve û ji ber hewca qazanê ji hiş diçe. Bi hesabê şehîd ketiye gundî wî bi ser berfê re dixirînin û dixwazin derxînin ji derveyî gund. Piştî demekî di nav lepên gundaiyan de deng jê tê û wisa dizanin hê saxe.

Piştî bûyerê çend rojan, em di şkeftên derdora gunde man. Berfa salê giranbû û bi ser bejna mirovan re tavêt. Di wê navberê de me bi bêrikan rê vekir û berê xwe da gundê cîran Repin. Me yê çi kiribûya, di wê zivistanê de bi kû ve çûbîna qet fikrek yê kesî tinebû. Kesî ji dewletê ne wêrî heywanên me jî bikirin. Sêgirkî çete bûn û li cem dewletê biqîmetbûn. Ji bû firotinê, min pezê xwe bir bazara Sêgirkê. Li wî gundî mirovek bi navê Cehwerê Xalid hebû. Cehwer, dibû xwarziyê me û ez çûm mala wî. Min û Cehwer pezê min bir û em çûn bazarê. Li wêdê Bînbaşiyek yê Turkan û Şêxo yê serok çete li rasta me hatin. Fermandarê turk bi awrên tevzker û piçûkdîtî li min nêrî û got;

“Cehwer, ewê bi te re kêye?”

“Ewê we gundê wan bombebaran kiriye fermandarê min.”

“Hatiye çi?”

“Hatiye pezê xwe bifiroşe, ezbenî.”

“Piştî hingê yê çi bike, an yê here nav Apociyan?”

“Na, dixwaze here nav turkan.”

Fermandarê romiyan, bi refleksek serasayî re eniya xwe qermîçand û tiliya xwe hejand û got;

“Nirç, nirç, nirç! Na, nabe! Bixwidê ez bibihîzim yêk ji wan li bin Sêgirkê ketiye ezê wan perçe perçe bikim. Divê zû û aha niha herin Quzêy Êraq (Başûrê Kurdistan)ê. Berzanî ji wan re dewletek Kurdî avakirî ye û divê herin herin dewleta xwe. Qedexeye ber bi Turkiye ve herin.”

Cehwer, bi awayek stoxwehr û reben got;

“Birêz fermandarê min, jixwe we gundê wan bomberankir, xizmên wan kuştin, niha destûr bidin bi kû ve dixwazin bila bi wêdê ve herin.”

Fermandarê, awrek dijwar da û bigef tiliya xwe hejand;

“Kuro, hej te dikim û naxwazim erza te bişikînim Cehwer. Mûdafeya van terorîstan li cem min neke. Heke ne ji bû xatirê te bûya, minê ev se bibin daran ve kiribûya û bavêta îşkencexaneya Şirnex. Qey me ne dibîhîst, her roj Apocî tîmar dikirin û berx û beran ji wan re serjê dikirin. Heqê wan eve, hê misteheqe wan maye. Zû bila ji ber çavên min reş bikeve û yêkser here Quzêy Êraqê.”

Ji tirsa fermandarê dagirker min pezê xwe binîv buhakî da Sêgirkiyan û berê xwe da Repin. Dewleta Romê wekû fermî berê me dabû Başûrê Kurdistanê. Du rê danîbûn ber me; yan xayîntî û yan jî çûyîna Başûr. Qetiyen dewletê rêya sêyemîn ne dipejirand.

Jixwe Egîdê birayê min, Ehmedê Mele Brahîm û Muhemedê Silêman wekû pêşmalên me derbazî Başûr bibûn û li ber tehtên Xirabê Bekir sekinîbûn. Piştî wê sê rojan, nîvê rojê me bîst û pênc, sêh malan bi awayek karwanî berê xwe da sînorê Başûr. Erkê derbazbûyînê dabûn bînbaşiyê Tabûra Kadûn. Zilam ji her kesî re vekirî digot;

“Yên nekar, seqet û temendar bila werin, ezê wan heta bi pira Ziravikê bi tirimpêla bibim.” Yên nekar li tirimpêlên eskerî siwar dikirin û heta bi binê gundê Ziravikê dibirin.

Dema em gihatin Mêrga Sûsê kû li ser sînore, Hevalan û baregeha turkan ya Meydanê danîn hev. Turkên ji çûyîna Başûr zêdetir ti rê ji me re nehiştîn gotin; keys ev keyse û karwanê me dan ber hewanan. Keçika Eliyê Simo ya neh salî û birayê wê Welatê yêk Salî li pişta, bi me re bû. Guleyek ya hewanê li zarokê li pişta keçikê ket, perçe perçe kir û keçik jî giran birîndarbû. Kelaşê Welatê yêk

salî û xwişka wî di nav lepê me de mabû. Me xwe li ber lat û zinaran bizorê sitrandibû û bi tarîtiya şevê re em dubare derketin rê.

Em wê şevê hatin cem Hevalan. Hevalek navê wî Rimezan ket pêşya me û em anîn şkeftek nêzîkî gundê Dêreşîşê. Hevalan wê şevê Welatê zarok spartin axê û keçika birîndar jî rakirin nexweşxaneyê. Me sibehî ji hevalê Rimezan re got;

"Em dixwazin li cihek avî, xweş bicêh bibin."

Hevalê navbûrî ket pêşya me û em anîn ser kehniya Bihêrê. Em û pêşmalên xwe nêzî çil malabûn û me danî ser kehniyê.

Piştî hatina me di nav hefteyekî de bi sedan malbat ji Bakur derbazî Bihêrê bibûn. Di heman demê de ji Zaxo û gundên derûdora wê jî Goyiyên meyên ji berya hingê hatîn û li cem dost û nasên xwe bicêh bûyîn jî qesta me kirin û di demek pir kurt de hêjmara wargeha me, xwe li heft, heşt hezar kesan da."

**Saleh Îke** vedibêje;

"Ew demekbû ez ji ber dewletê revîbûm û hatibûm mala mamê xwe yê li Zaxo. Dema hat bihîstin mihacir hatine Bihêrê, Hevalan em erkdarkirin û wekû gurubekî me çend kon birin û em çûn Bihirê. Konên me birîn piçûkbûn û têra malbatên boş[7] ne dikirin. Ji sedema zarokên Egîdê Şirîşeyî tinebûn û ew û hevjîna xwe tinêbûn, konê destpêkê me ji Hevalê Egîd re veda. Piştî me kon veda em hatin ber Sûlava Şeraniş û me dîroka wê rojê nivîsand; çarê Nîsana hezar û nehsed û not û çar (04. 04. 1994). Di heman demê de ev dîrok wekû dîroka destpêkirina mihacirtiyê jî hatibû qeytkirin.

Nîvê meha Nîsanê bû. Cêhgirê fermandarê togaya Şirnex Holûsî Akar, bi helîkupterê danî mila li tenişta şarevaniya nehiya Hilal û bilez fermana komkirina gundiyan da romiyên xwe.

**Narinca Qutasê Lewend (Narinc Kara)** vedibêje;

"Cêhgirê Fermadarê togaya Şirnex Holûsî Akar, bi helîkupterê danî ser milika li tenîşta şarevaniyê. Zilamê berçavkek reş çavên wî dinixwimandin, fermana komkirina gundiyan da romiyên xwe. Romiyan, bi gef û qêran di demek pir kurt de gundî li pêşya Generalê çav şimşirî komkiribûn. Agir ji devê romiyê dagirker dibarî. Bi awrên kîn barkirî li gundiyên dibin lûleyên tifekên romiyan de çok vedayîn temaşe dikir. Zilamê Turk, bi gotina; "qencî kêrî we nayê" dest bi axaftinê kir û bi hêlwesta êdî sebra wan ne maye gotinên xwe ajotin;

"Me hingî ji we re got, xwe ji terorîstan dûr bêxin û arîkarî bi dewleta xwe re bikin we guhdar nekir. Me ji we re got, dewleta Turk bi hêz û mezine, we bawer nekir. Niha em hatin duryana rê. Êdî em li hêstirên çavên we nanêrin."

---

7 Qelebalix, zêde.

Mirin ji çavên bi çiçik yên zilamê turk dibarî. Awrên xwe qerastin rêza gundiyan û bi dengek bilind zirtên xwe ajotin;

"Niha li pêşya we du rê hene. Yêk; an hûnê werin gundê Şêxan bibin Qorucî yên dewleta xwe û wekî mirovan xizmeta dewletê bikin. Du; an jî hûnê herin Bakurê Êraqê cem Berzanî!"

Herkû diçû tona dengê generalê dagirker gefvantir dibû û dengê qêra wî xwe li zinarên Karçînê dida. Kêmek vesekînî, berçavka reş jiber çavên xweyên werimî rakir û bi awrên dijwar li me nêrî. Ji nişkan ve tiliya xwe repkir û axaftina xwe domand;

"Heta yêkê Gulanê divê dû ji vî gundî neçe! An jî wekî me li gundê Şirîş kirî, emê bi erz û ayal ve gundê we topbaran bikin û bişewitînin. Pazdeh roj ji we re mûhlet. Yên piştî pazdeh rojan ez li van dera bibînim xwidê ji dayika wa satand."

Mamê Emer, zilamek temendar û perixîbû. Niha jî jiyan dibe û ew jî li wargehê ye. Ev zilamê bejin kurt, qurîcokî û esmer, ji berê ve wekû mêrek ne tewên û wêrek dihat zanîn. Mamê Emer, ji nişkan ve rab ser xwe û rabûna wî gundiyên bê dengiya mirinê pêçayîn veciniqandibûn. Ne tenê gundî veciniqîbûn; di nav wê xofa tîr de livîna zelamê mêrxas fermandarê Romê jî tirsandibû. Mamê Emer, şewqa xwe ya Sêrtikî zivirand û got;

"Fermandarê min, bihesibîne îro yêkê Gulanê ye. Tenekeyek qazyax bîne û me hemiya bi şewitîne! Qey emê bi kû ve herin?"

Berteka mamê Emer, generalê Turk har û hêç kiribû. Tiliya wî ya rep lerizandibû û kef û kincê bi devan re avêtibû. Çavên xwe girtin û got;

"Tu bi kû ve siktir dibî bi wê ve here. Tenê bi baskî me ve newe" û dijûnên nayên gotin kirin, li helîkuptera xwe siwarbû û çû.

Piştî fermandarê romê ji gund veqeta gundî kombûn û gotin;

"Qey ev fêrsa nehiya ya bi gotina romiyekî xira bibe? Werin em herin cem qaymiqamê Qulaban."

Şandeyek ji rêhspiyên gund xwe dan hev û çûn cem qaymiqam. Malxwê min Teyîp jî di nav wê şandeyê de bû.

Qaymiqam, ji wan re gotibû;

"Di vê herêmê de gotina leşkeran derbazdare. Paşayê min ji we re çi gotibe, wê bikin. Heman şande piştî çend rojan çûn Şirnex û bi çi kul û halî xwe gihandibûn walî. Bersiva walî ji ya qaymiqam dijwarit û çend dijûn û zirt jî li serbûn.

Walî:

"Paşayê min çi gotibe wê bikin. Yan bibin qurocî yan jî rojek ji berya ya din vî welatî biterikînin. Ya din jî zû ji Şirnex tit bibin hê paşayê min bihatina we nehesayî. Nixwe çiya were serê we, ew û xwedê tenê dizanin."

Gundê me ji heşt taxan pêk dihat. Ji şarevaniyê bigre heta

bi navenda tenduristiyê, sê dibistanê seretayî, sê dêr, dibistanek ya navîn dihewand. Nêzî şeş, heft hezar rûniştvanên gund hebûn. Bi serê xwe bajarekbû û me çavên xwe di nav wan çar çiyan de li cihanê vekiribûn. Cîhana me, bîranînên me, xeyalên me her tiştên me ew gundbû û niha em li duryanek asê qerase kiribûn. Yan xayîntî û yan jî mihacirtî!

Şîn û girî ketibû nav gund. Berdana gund, dûr ketina ji gund sînorên xeyalên me derbaz dikir û me nikarî em jiyanek bê Hilal xeyal bikin. Hemî şahî, şîn, serpêhatî, wesf û pesnê me girêdayî wî warîbûn. Darek bê ra çawa bikaribe jiyan bibe, me jî bê gundê xwe wisa dikarî jiyan bibin. Bi gotina leşkerek bêmerîs û kes nizane bezê guhê bavê wî ji kûye, dixwestin wekî kerengperê me li ber bayê bêxin. Dixwestin, em warê dapîr û kalên xwe berdin û bibin mihacirên guhê gundan. Me nikarî em wateyê bidin wê hovîtiyê.

Di vê navberê de yêkê Gulanê jî nêzîk dibû û dengên 'ji çetetiyê wêdetir çareya me nîne' jî ji qismek gundî bilind dibû. Qismek mezin jî di nebûna çetetiyê de bibiryarbûn. Piştî rêhspî ji cem walî jî dest vale zivirîbûn û bi rê ya komîteya gund me pêwendî bi fermandarê eyaleta Bohta hevalê Cemal re çêkir. Ji hevalê Cemal re hat gotin; "dewlet çûyina Başûr dipesêre û em jî naxwazin herin nav turkan. Heke hûn li me xweyî dernekevin gundî neçarin çetetiyê bipejirînin." Piştî hevalan jî derbazbûyîna me ya Başûr erêkir, êdî dema rêvantiyê hatibû û xwe pesartibû.

Ew nêzî deh rojanbû guftûgoyek bê eman di nav gundiyan de tajot. Qismek kêm yê gund ne alîgirên çûyîna Başûr bûn û dixwestin wekî dewlet dixwaze li gundê Şêxan bicêh bibin û bibin qurocî. Hin kesên hal û wextê wan yê madî baş jî dixwestin ber bi bajarên Turkan ve herin. Evê tevlîhevî û bê biryartiyê bandor li ser ramandina herkesî dikir û bandorek neyînî li ser biryardayîna me jî dikir. Jixwe ji sedema eşîra me li ser sînorbû, Başûr li me wekî dewletek cuda ne dihat. Çûyîn û hatina me ji Bakur zêdetir bi Başûr re bû. Jixwe biteybet ji bû malbatên şehîd û şervanan çûyîna cem hevalan, bi wan re jiyan bûyîn, bê tirs li gel wan mayîn kelecanek pir cudabû. Lê, bê goman çaryêkek ya gundiyan ne diwî fikrî de bûn û wan rêya xwe cuda hilbijart.

Ez ne şaşbim êvara bîst û duyê Nîsanê bû. Amedekartiyek bê hemta destpêkiribû. Bidilek birîndar û pazdehê şkestî zilaman barê hêstiran, jinan tûrên xwe û keçên ciwan jî boxçikên xwe dadigirtin. Şivanên pez ne firotîn, ka yê çawa pezê xwe li sînor derbaz bikin kûr kûr raman dibûn.

Bi berbanga beyaniyê re heşir ketibû nav gund. Qêr û qelebalixa girî, geliyê Goyan dagirtibû û xwe li erşê bê stûn dida. Yên rêvan û yên diman hev himbêz dikirin. Destê dê û weledan

ji hev diqeta. Yên dubare kengê, çawa, li kûdê hev bibînin, qet ne kifşbû. Serê karwanê Mijîn jî êdî ketibû nav gund û hêdî hêdî derbaz dibûn. Bê dil û şermokî jî be lib mibên Hilaliyan jî tevlî karwanê Mijîniyan dibûn û rêvantiya ber bi ne kifşbûyînê ve destpêkiribû êdî. Her keça destê xwe ji nav destên dayîka xwe rizgar dikir, an jî her dayîka keça xwe ji himbêza xwe vedikir bi qêr û girî û bi gavên lezgîn gund diterikand û tarîtiya şevê di cêh de dadibeland.

Wê şevê em man gundê Repin û sibehî hema bibêje nîvê Repinî yan jî tevlî me bûn û ber bi sînor ve em derketin rê. Nîvê rojê bû û bihezaran mirov gund û warê xwe berdebûn û berê xwe dabûn sînorê welatek din. Ji gundên derdor jî bi sedan malbat tevlî karwanê me bibûn. Zarok, jin, pez, hêstir çêlek, mirîşk, elok, se, pisîk her tişt tevlîhev bibûn û em gihatin ber pira gundê Ziravik. Dewletê erkê derxistina me dabû Bînbaşiyê tabûra gundê Kadûn. Dibin fermandartiya wî romiyê zik têrik de, bi hezaran romî û çeteyan li dora pirê bend danîbûn. Bê îstîsna barê her dewarê didan danîn, her tişta di bar de dibin navê 'lêgerînê' de ji hev di hilweşandin û fermana dubare komkirinê didan xweyên baran. Ji kurtanê hêstiran bigre, heta li nav pirça bizin û mihan li her derî dinêrîn. Di dawî de jî çend zirt û dujîn dikirin û digotin;

"Siktirbin herin û êdî ne zivirin."

Romiyan destûra derbaz bûyîna me dabû lê, ji bû em pezê xwe nebin û ji çeteyan re bihêlin, wan xayînan hewlek bê eman dimezaxtin.

Gotin; "Li gor qanûna dewleta Turk ne pêkane evqas pez bi hev re li sînor derbaz bibe."

Teyîp, heftê mihên me kirin heşt bir û wisa dikarî derbaz bike. Ji bû pezê xwe derbaz bike, wê rojê heşt caran çû wî aliyê sînor û hat pira Ziravikê. Armanca Romê îza dayînbû.

Ji berya em bigihêne kêlika sînor, bi evrazê Karçkînê ve baregiha Meydanê em dan ber top û hewanan. Bi hezaran zarok, jin û lawir bi hev re ketibûn wî kaşî. Her topek tavêtin bi dehan jinên zaroşîr bi zarokên xwe ve xwe tavêtin erdê. Destpêkê em pir tirsabûn. Em hizirîn kû dewleta dagirker xefik li ber me vedaye û yê me di vî sînorî de qir bike. Piştî çend topan me fêhmkir kû tevzên xwe bi me dikin û îza bi me didin kişandin. Û bi ketina tarîtiyê re em gihatin Dêreşîşê. Wê şevê em li wêdê man û sibehî bi pêşvantiya Hevalan em hatin wargeha Bihêrê. Jixwe ji berya me bipiranî ji gundê Şirîş çil mal li wir bi cêh bibûn."

***

Dibe kû gundê Mijîn di aliyê sazî û dezgahên xwe de wekî Hilal ne di asta bajarekî de bû ema, di aliyê boşîtiya rûniştvanên xwe de ne jê kêmtirbû. Bergihê gund asêbû û ji destpêka gêrîlatiya Bohta ve hemabêje ti carî Gêrîlayên Kurdistanê jê qut ne bibûn. Di welatê Bohta de yêk ji gundên destpêkêbû gêrîla jê derketîn. Yêk ji gundê herî zêde şervanên Kurdistanê bidilsozî himbêzkirîn Mijîn bû. Ev jî bibû sedem kû zû bala dewleta dagirker bikişîne û zext û zordariya xwe li ser gund zû pêşbêxe. Di geliyê Goyan de ferqek sosyolîjîk ya Mijîn hebû; sedem çiye ne dihat zanin ema, di nav gundên herêmê de wekû gundek rayît[8] dihat dîtin û ji dewleta dagirker zêdetir li rasta zextên gundên derdor hatibû. Bê goman vê rastiyê bi sedsalan ajotibû û bi demê re Mijîniyan jî li hember vê qederê stoxwer kiribû. Dibekû di bingeha ji her kesî zûtir û zêdetir nêzîkbûyîna wan ya Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de, ev perçiqîn xweyî bandorbe. Lê, di aliyê hevgirtin, desthilanîn û bi hev re serîhildanê de, vê rastiya civakî û toqa naletê ti carî bela xwe ji wan venekiribû. Dibêjin ya, gula Lotos di nav teqnan de çêdibe. Wê Mijînê  jî pir leheng û qehremanên jixwe zêdetir gihandibûn û ji rika rayîtiyê ve di oxira azadiyê de kiribûn feda.

Yêk ji wan lehengan Pilingê Mijînî bû. Ji destpêka Têkoşîna Azadiyê ve wekû milîs bê dudil mil dabû ber barê PKK'ê û ew û malbata xwe bibûn hedefa dagerker û nûkeran.

Hevjîna Piling **Şehzade Hemîd** vedibêje.

Di dema vegotinê de carna hêstirên wê dibûn lehî û carnan jî bi berxwedana xwe navlixwe dida û leylanokên şerefê di dêmê jina yêxtiyar de vedidan.

"Çileyê Zivistana sala not û çarê bû. Gundê me zozanîbû û sir û serma wê giranbû. Bi mitreyan berf li erdê bû, şembelûlkên cemedê bi werîsan dirêj bibûn. Xwîsîtî bi destan stûr bibû. Hişke sahî bû û sirek bê eman cîhana me dîl girtibû. Wekî her car dîsa Piling ji der ve bû.

Berbanga beyaniya şevek bi zemîte[9] bû, zarokên min hemî hûrbûn û ji zû ve nivistîbûn. Ez rabibûm ser dergûşa zaroka xwe ya şîr. Ji nişkan ve qerpên ket deriyê me yê ji der ve! Radok şkandin û derî beyî paşya mezelê. Bi pêre jî pehînek li deriyê mezela me dan û derî bi hemî dijwartiya xwe li navguhê dergûşa min ket. Mozaffer Bînbaşiyê di herêmê de bikujertî, qetlîam, îza û îşkenceya xwe navdarbûyî, da ji derî ve. Qatilên Qulaban Nafo, Mihê Porê, çeteyên mala Beyrê û çeteyên Hûnê bi hev re radan di mal de. Ew bi carabûn tavêtin ser mala me ema, wê carê pir dijwartir dixwiyan. Heta

8
 Bindest, bê desthilanîn.

9
 Di hewayek zêde sar de, wekû mijek tîra reng xemor dadikeve dolan.

bînbaşî bi çend kesan ve li paşmezela me venerîn, Nafo bi Kurdî û ji dizî ve got;

"Zarokên xwe birevîne!"

Baweriya min bi gotinên wî xayînî ne dihatin. Min zenkir kû fikek hîleyî dibin gotinên wî de heye. Min ji wî hêviya qenciyê ne dikir. Ema hîsên min gotinên wî destek dikirin. Heta min zarokên xwe derxistin eywanê, fermandarê turk tozek spî li paşmezela me reşand û agir berdayê. Ew toza bê bêhna spî, wekî benzînêbû! Ji nişkan ve agir paşmezela me pêçabû. Ez bi nav qelebalixê re derketim hewşê û min zarokên xwe berbi ji derveyî gund ve revandin. Li pişt mala me sirtek hebû. Me jêre digot; 'kêriyê Kehniyê'. Dema ez gihatim kêriyê Kehnî yê min bi paş xwe ve nêrî. Pêta agirê bi mala me ketî, xwe li esmanê hefta dida. Bi dengê guleyekî re orênek mezin biser çêleka me ketibû. Dengê leşkerê fermandar heta bi cem me dihat. Bi dengek mirin barkirî digot;

"Wan bîjiya bînin û bavêjin ser agir."

Bi dengê romiyê turk re qedemên minên ji xwe direcifin yêk car şkestibûn. Min bawer nedikir, bikaribim zarokên xwe ji destê wan celadan rizgar bikim. Min ji xwe re got; 'îşev rizgariya min û zarokên min nîne'. Ew Nafo yê ti sînor ji xiyanet û xirabiyê re ne hiştîn, nizanim çima ema, wê şevê dengek ji wijdana wî hatibû. Ji bû em ji qirkirinê rizgar bibin peyvek jî be ji nav lêhvên wî yên bê merîs derketibû.

Berbangbû. Hêdî hêdî dunya keşaf dibû. Çavan êdî, se û gur ji hev vediqetandin. Sedem çiye nizanim ema, li dûv me nehatin. Dibekû ji tirsa Hevalan newêrîbin derkevin ji derveyî gund. Ji ber kû rêya em bipêve çûyîn, rêya Hevalan bû û dijmin zû bizû newêrî wî alî ve were.

Ji tirsa, ji serma lêhvên zarokên min hişîn bibûn. Dilerizîn û şeq şeqa dinan wan bû. Keçika min ya herî mezin deh, yazdeh salî bû. Em, hemî di hundirê xwe de digiriyan. Piştî roj du werîsan bilindbû, rêz ket romiyên roma reş û berbi Hilal ve ji gund veqetan.

Piştî dijmin ji gund veqeta em, Piling û Heval bi hev re gihatin cem malê. Çêlek û hêstira me di hewşê de kuştibûn. Xaniyê me du olî bû û ser olî bibû xwelî. Pezê me dibin oliyê de bû. Dema me deryê govê vekir, pezê me hemî fetisîbû. Çend bizinên hê ruh li ser wan heyî kotekî bi kêrê re gihatin. Ji bû me ne hewînin, dijmin gef li gundiyan xwaribûn û gotibû;

"Kiyê kû wê malbatê bihewîne emê mala wan jî bişewitînin."

Piling û hevalan çi kir, nekir ji çarsed malan tu kesî em ne hewandin. Xaniyê me kuçbû. Banê wî şewitîbû lê, dîwar saxlembû. Piling û hevalan çend girş danîn ser quncikekî, naylonek di pê de kirin û wê zivistanê bi şeş zarokan ve ez çûm di bin wê naylonê

de. Tiştek ya em bixwin jî ne hiştibûn û her tiştê me şewitandibûn. Gundiyan ji tirsa dijmin derziyek jî nedida me. Piştî çend rojan Haşimê Tahirê Evdila, ji gundê Şirîş barê du hêstiran ji mere qût anî. Di tarîtiyek zilomat de ew qût wekî çirûskekîbû. Ji keyfa wî qûtî me ji nişkan ve hemî êş, jan û kulên xwe ji bîrkiribûn û me keyfa qûtê xwe derdixist.

Lê, pirsgirêka me tinê ne qûtbû. Zivistana geliyê Goyan giranbû û di nîvê zivistanê de em bê mal û star hiştibûn. Ji tirsa romiyan zeravê gundiyan jî qetabûn û qet rehm li me ne dikirin. Dema xewê min şeş zarokên xwe li malên xizman belav dikirin û bi berbanga beyaniyê re ji rêzê ve bipêve diçûm. Min zarokên xwe didan hev û dibirin çiyê.

Wê rewşa me du mehan ajotibû. Ji xwe piştî demekî dijmin bi balefiran gundê Şirîş bombebarankir û tirsa gundiyan sê, çar qetir bibû. Her kes li çareyekî, li rêyek ya revê digera. Berde balefirên cengê, êdî gundî ji ber balefirên balhilgir jî direvîn. Her kesî digot; “vê carê dora gundê meye.”

Piştî dijmin fermana ‘yan qurucîtiya dewletê, yan jî mihacirtiya Başûr’ da Hilaliyan, di heman rojê de û heman xeber ji gundê me re jî şandibûn. Ji bû gundê me xira nekin, gundiyan serî li her derî dan. Ji qaymiqamê qezayê bigre heta waliyê Şirnex û heta xwe avêtin cem serok çete Hazoyê Sêgirkî jî. Her kesî li gel gef û zirtan heman gotin digot;

“Yan bibin çete û yan jî siktir bibin û herin cem Berzanî.”

Jixwe têkiliyên eşîra Goyiyan, ji dewleta Turk bêhtir bi başûriyan re bûn. Karê me, nîvê xizmên me hemî li Başûr bûn. Sînorê hatî kişandin yê dewletanbû û wekû gel nikarîn pêşya me bigrin. Me qûtê xwe, cilên xwe, debara xwe ji Başûr peyda dikir. Piranî gundiyan lîreyên Turkan nas ne dikirin û ji lîreyan re jî digotin, ‘dînar’. Ankû Başûr ne xerîbê me bû. Ema, gundê xwe terikandin, dest ji bîranîn, xeyal, milk û malê xwe berdan zorbû. Dijmin du rê danîbûn ber me; yan çetetî û yan jî mihacirtiya Başûr. Hevalan jî kêlî bikêlî rewş dişopandin û di asta jor de dihatin agahdarkirin. Piştî çend rojan, Hevalan jî derbazbûyîna me ya Başûr erêkir û êdî zengilê wêranê lêdabû. Ne di heman wateyê de jî be lê, dibekû di dîroka xwe de cara yêkemîn be romî û heval di xalekî de wekî hev difikirîn.

Êdî me debar ne dikir. Jixwe hemabêje koça gundiyan ya berbi Başûr ve mîsoger bibû. Qismek gundî dilgiranî dikirin û meyla wan li ser çetetiyê jî be, piraniya gundiyan ne di wî fikrî de bûn. Bi fermana Hevalan wekû neqla destpêkê ez û zarokên xwe, Mala Emer û zarokên Evdilxeynî derketin rê. Evdilxeynî, li Batûfa ya Zaxo xaniyek kirîbû û zarokên xwe wekû tedbîr şandin wêdê. Şeva destpêkê em li Repin man. Şirîşeyiyên piştî bomberana balefiran

gund berdayîn, di şkeftên dola Germikê ya li pişta Repin de bûn hingê.

Her çiqas dewleta Turk destûra derbazbûyîna Başûr dabû jî lê, dîsa baweriya me li bextê wan ne dihat. Em roj hatin Ziravikê û wê şevê me xwe li sînor da. Ez ji Întîqamê xwe avisbûm û Bedran jî li ser qulîka min bû. Ji bilî zarokan barê min jî pir giranbû. Bi zor û deh zehmetan wê şevê me xwe gihand Sinehta Heftanîn. Piştî em gihatin Sineht, Hevalan bar û zarok ji min hilgirtin û em birin êxistin di şkefta Sineht de.

Ji berya hingê demekî, Nêrwehiyan civîna çetetiyê li darxistibûn. Heval jî pêhesabûn û bi ser civîna wan de girtibûn. Hemî zilamên gund girtibûn û bi xwe re anîbûn. Piştî wê ji kesên hatîn desteserkirin wekû qazid zelamek şandibûn gund. Ji kesê wekû qazid şandî re gotibûn;

"Here ji gundiyan re bibêje, bila mal, pez, dewar û her tiştê xwe bînin û werin Başûr. Nixwe em zelamên wan bernadin."

Ew zelamê wekû qazid çûyî gund, heman tişt ji gundiyan re gotibûn û mala xwe barkiribû, çûbû qezayê û bibû çete. Gundiyên mayîn jî li pey zelamên xwe yên girtî, ji gund barkiribûn û hatibûn geliyê Qesrokê. Dema em hatîn, Nêrwehî li geliyê Qesrokê bûn. Kon, pez, dewar, mal û her tiştên xwe anîbûn. Te digotqey hatine banehiyan.

Bi piştî me re çend rojan bira destpêkê ya Şirîşeyiyan jî hatin û wan jî xwe dan ber sitarên zinarên Qesrokê. Li vêdê dixwazim pêkenokek jandar vebêjim. Piştî hatina me çend rojan Hevalan, ji bû rewşa me ji UNHCR re ragihînin û arîkariya mirovî ji wan daxwaz bikin şandeyek rêkirin Zaxo. Bi arîkariya Keşeyê kevin yê Sinehtê, şandeyê xwe gihandibû rayedarên saziya DY[10] û rewş û merema xwe ji wan re vegotibûn. Camêran jî texsîr nekiribûn, li tirimpêlên xwe siwar bibûn û berê xwe dabûn geliyê Qesrokê. Di heman rojê de, dema neqla duyemîn ya Şirîşeyiyan sînor derbaz dikir, dewleta Turk bi hewanan li wan dabû. Zarokek yêk salî li pişta xwişka wî qetil kiribûn û keçik jî giran birîndar bibû. Zarokê qetilkirî û xwişka wî ya birîndar û şandeya Dewletên Yêkbûyî bi hev re gihatibûn cem me. Dîsa wekû rasthatinekî di heman kêliyê de du qubrayên turkan jî gihatin raserî me. Şandeya DY ya ji tirimpêlên xwe nû peya bûyî û li ser birîndar û zarokê qetilkirî kombûyîn; kengê çav dan helîkupteran, bê mehwer revîn û xwe devikî li nav şkêrên tenişta rê êxistin. Piştî firok ji me bûrîn, rabûn, birev li tirimpêlên xwe siwar bûn û berê xwe dan Zaxo.

Piştî çend rojan heman şandeyê ji me re tirimpêlek çadir û

---

10 Netewên Yêkbûyî (UNHCR).

betanî anîn û hat. Li gel xwe çend mirovên çekdar jî anîbûn. Dema şande gihat cem me, çekdaran xwe ji tirimpêlan avêtin û li dora tirimpêla barkirî çekên xwe rastkirin û rawestan. Me jî ji dûr ve, bi awrên şaqis li rewşa wan temaşe dikir.

Wergerê şandeyê got;

"Çima hûn çadirên xwe na deynin?"

Me got;

"Ev çi kesên çekdarin?"

"Ji bû tişt newin talankirin û adil werin belavkirin, me ji bû parastinê bi xwe re anîne."

Me xwe acikir û ji wan re got;

"Yan hûnê van kesan bidin aliyekî, tiştên me deynin û herin, yan jî em tiştên we naxwazin. Qey em parsekên wene? Dozek ya me ya siyasî heye û ji bû doza xwe em koçberbûne. Hûn jî wekû erkdarên vî karî heke arîkariyek mirovî bi awayek kubar bi me re bikin, keremkin. Na, tiştên xwe bigrin û oxira xwe bixêr bikin."

Piştî berdevkê me jixwe bawer û kêmekî jî qure dawî li gotinên xwe anîn û wergerê Behdînî yê til werimî axaftin bê dilê xwe ji mêrikê çav hişîn û keçel re wergerand, zilamê biyanî lêhva xwe gezda, eniya xwe qermiçand û ji nav me xwe da aliyekî. Zelamê bi bin xwe re li me dinêrî, bi kelecan tiştin ji hevalê xwe re gotin û her du yan serê xwe bi neyartî hejandin.

Rayedarên saziya UNHCR, li hember hêlwesta me şaqis mabûn. Reng avêtibûn. Ji qermîçokên eniya wan û ji awrên çavên wan diyar dibû kû hêlwesta meya serbilind qet û qet li xweşa wan zelamên qure ne çûbû. Rezil bibûn. Bê hemd zilamên xwe yên çekdar dan aliyekî, çadir û betaniyên me danîn tenişta rê û çûn."

Dapîr û bapîrên wan kûjan zemanî, bi keda çend milan, bi xwêhdana çend eniyan Mijîn avakiribûn, ne dihat zanîn. Kê, çima li cihek evqas asê war danîbû, ew jî ji zanina wan derbû. Xweza şahide, yêk ji kevintirîn gundê welatê Bohta Mijîn bû. Û ya misgor ew bû kû Mijîn, bexşaindinek ya wî robarê har û cemidîbû. Gundek asê û girtîbû Mijîn. Li wan çiyayên xir û xalî erdên çandiniyê jî hemabêje qet tinebûn. Hin zeviyên bikeda hezar salan hatîn fetandin jî têra şêniya vî zemanî ne dikir. Royek boş, har û cemidî hebû, lê wî jî di geliyek teng û asê de rêya xwe peydakiribû û zêde feyda ne dida xwecihên pêgirtiyên xwe. Kêm dehlên li ber ro hatîn çêkirin jî zikê gundiyan têr nedikir. Aha heke tu bibêjî; "çiya Mijîn navdarbû?" bê goman bersiv; 'pîvazên gir û şîrînbûn'. Tenê rêyek ya debara wî gundê asê hebû; ew jî şivantîbû.

Îhtimalek mezin ew gundê asê ti carî ne hatibû wêrankirin. Ji Romê bigre heta bi Moxiliyan, destê ti xwînxwar û dagirkeran ne gihatibû Mijîn. Mijînî, di dîroka xwe de ti carî bi koçbertî yê re

hevnas nebibûn û li ser xweliya xwe hişîn bibûn. Jiyanek bê Mijîn tixûbên xeyalên gundiyên wî warê çiyayî derbaz dikirin. Fikrandina wê jî dil diqelikandin. Pîroztiyên xwe li wêdê avakiribûn. Xweşmêr û kezîzerên xwe li wêdê afirandibûn. Bi sed hezaran sal li wêdê jidayikbibûn û li ser wî warî çavên xwe li jiyanê girtibûn. Perastgeh û qesta wan, tama jiyana wan, bawerî û ewlehiya wan li ser wê perçeya xaka asê mabû. Nevî çîçirkên Helako, ker dizên Asya Navîn bi desteka teknîka zeman koçbertî pesartibû derîzana wan û wêran kiribû ew warê qedîm.

Dibêjîqey Şehzade ya pîr, di nav qermîçokên rûyê xwe de êş û jana dîrokek têr kul diveşart. Carna gotin di qirikê de asê diman û awrên wê di valetiya bê dawî de diqerisîn. Carnan jî tebeqeyek rohn çavên wê yên gir û belek dinixwimand. Ema dema peyva ‘Piling’ ji nav lêhvên wê difelitî kelecanek raza wê nayê zanîn dêmê wê dipêça.

“Piştî em derbazî Sineht, cem hevalan bûn êdî em sekinîn û çaverêyî hatina gundiyan man. Gundiyên me tengsistî dikirin û di biryar dayîna di navbera mayîn û barkirinê de zehmetî dikişandin. Jixwe dewletê nêzî bîst mêrên Mijîniyan biribûn û wekû gerew[11] li tabûra Şêxan digirtin. Pesartina, ‘yan hûnê aha niha gund berdin û herin Quzêy İraqê, yan jî hûnê werin Şêxan û bibin çete’ bi hemî hovîtiya xwe dikirin. Hevalan, wekû qazid Piling şandin gund û gotin;

“Here ji Mijînya re bibêje; me ji bû wan her tişt amade kiriye. Bila bi dilniyayî bar bikin û werin.”

Piştî Piling ev nûçe gihant, Mijînya berdana gund pejirand û çarsed malan bi hev re û di rojekî de barkirin û hatin geliyê Qesrokê. Bihatina Mijînya re gelî ji mirovan hatibû pîncdan. Te xwelî avitibûya li erdê ne diket. Heval ketin pêşya me û berê me dan Bihêrê.

Em karwanek boş û qelebalixbûn. Mirov, hêstirên barkirî, pez, dewar û her tişt tevlîhev bibû. Em li ser rêya qîrûzivt dirêj bibûn. Piştî me gelî derbaz kir em gihatin Perex. Di heman demê de em diketin pêşberî tabûra Turkan ya kêrya Reş. Û ji tabûra kêrya Reş, turkan em dan ber top û hewanan. Em her yekî bi derekî ve revîn. Menfesên rê pirbûn û piranî mirovan xwe avêtin bin menfesan. Topek li hêstira Rimezanê Îsa yê gundiyê me dan û dibin zarokên wî de hêstir kuştin. Wekû rasthatin, tiştek bi zarokan ne hatibû. Piştî toprana turka kêm bû, herkesî pişt tewandî leza lingê xwe kir û berê xwe dan Bihêrê.”

***

---

11 Rehîn.

Wekî roja heşrêbû. Qiyamet rabibû li geliyê Goyan. Rêya sînor rêka kakêşokê tanî bîra mirov. Artêşa dagirker rewşek ruhiya wisa avakiribû kû dema xwecihên bi hezaran sal warê xwe diterikadin wêrîna li dûv xwe jî binêrin bi xwe re peyda nekiribûn. Ev rev, ji wan re wekî rizgariyek şîrîn dihat. Hin kesên qet niyeta wan ya koçkirinê tinebû jî li nav karwan ketibûn û dabûn ser rêya xerîbiyê. Wê rêyê, rêvanên xwe berbi ne kifşbûyînekî ve dikişandin. Tu kesî nizanî yê bi kû ve here, li kû raweste û çi bike. Lê, hêviyek qewî hêstên wan diferikandin; ew jî bê tirs himbêzkirina şoreşgerên Kurdistanê bû.

Ew karwanê boş û bê serûbin di nav hêstên têkel de diçû û dihat. Li aliyekî bi zext û zora dewleta Turk her tişt, ema her tiştên xwe li dûv xwe hiştibûn û direvîn. Li aliyê din berê wan li wan kesên bisaleye hasreta dîtina wan dikişîninbû. Ji bû di holek azad de zarokên xwe bê tirs himbêz bikin, mirina xwe danîbûn holê û niha berê wan li nav wan zarokanbû. Êdî yê bê tirs û xof zarokên xwe himbêzkiribûna. bikin, Tu kes jî nikarî ji bû vê kirina wan, li wan bide, îza bike, an jî bikuje. Kelecanek wisa jî bi rêvanên wê rê ye re habû.

Di nava çend rojan de geliyê Goyan wêran bibû. Dehl û zevî bê xweyî, se û pisîk sêwî mabûn êdî. Gundê Şirîş, Aloş, Pîran, Hilal, Mijîn û Nêrweh bi giştî hatibûn wêrankirin. Ziravik, Repin, Nîreh, Şiwêd, Bileh, Zevyan û Robosk jî qismek hatibû wêrankirin. Dewleta dagirker sînor vekiribû û xwecihên ber bi nekifşbûyînekî ve tajotin.

## Wargiha Bihêrê

Bihêrê, biqasî bîst kêlûmitran diket Bakurê Rojhilatê Zaxo û li quntara Rojava yê çiyayê Heftanîn bû. Li Bakur, robarê Hêzil û çiyayê Cûdî hebûn. Dolek xweş û avî Bihêrê. Gerangeha herêmêbû û koçberan malên xwe di nîvê gerangehê de danîbûn. Bi pesarê dolê yê bi aliyê Heftanîn ve şkeftek hebû û biqasî coya aşekî av ji wê şkeftê diherikî. Jixwe ya Bihêrê kirî seyrangeh, ji Besra heta bi Silêmaniyê mirov qestê dikin; raza ava ji wê şkeftê dipijiqîbû. Li herêmê ne tenê ewder qest seyranvananbû; li Başûrê Rojhilatê Bihêrê jî sûlava Şeraniş hebû. Bi meşa lingan biqasî deh deqîqeyan ji Bihêrê dûrbû. Biteybet roja înê, li şkefta Bihêrê û sûlava Şeraniş xwelî hatibûya avêtin ji mirovan li erdê ne diket. Kurdên Başûrî, Êraqî û gerokên biyanî jî di nav de hemabêje salê misoger çend caran berê xwe didan wê gerangehê.

Nîvê demsala biharêbû. Bi sedan coreyên gul û kulîlkan di wê dolika şîrîn de milê xwe dabûn hev. Wekî kulavê baş hatî sûtin, nefel di ser hev de ketibû û tolikê xwe li nav tenga mirovan dida. Awazê bilbil, şaşûl, kew û bi sedan çûkên din lat û zinarên Xantor

dişarandin û wekî melodiyek hemaheng guhê mêhanên xwe yên kotek diferikandin. Gotin ji keyfa şivanan re ne dihat kirin. Erdê Heftanîn bijûn[12]bû û pirsgirêka sînor û tixûban jî tinebû. Ne zozanê te û ne jî yê min hebû. Hingî çavan difitirandin Heftanîn bû. Herêm, di bin parastina Hevalan de bû û çawa dixwazî pezê xwe wisa biçêrîne. Bêrîvanan aşîrkên xwe bi hêstiran dikişandin û dengê meşkên kevaniyan ne şemirîbûn. Kevaniyan qelfatên nîvişikên li ser dewê meşkan diketin pê heskoyên dar kom dikirin û hemabêje ji niha ve kûzikên xwe yên tewaş tijî kiribûn. Niyeta vegerê ya mêhvanên bê mehwer amedekartiyên bicêhbûnê dikin, ne dixwiya. Wan mirovên pişta xwe dayîn Hevalan û tirsa xwe kuştîn, bi awayek dumohr darên derdor dibirîn û ji bû dibin de jiyan bibin kolik çêdikirin. Êdî dola fireh jî boşatiya wan ne radigirt û li her du pesarên dolê belav bibûn. Kurdên ji her çar aliyên welatê Bohta direvîn, geliyê Qesrokê wekî rêka mûriyên reş ew dikişandin wargehê. Ne tenê ji Bakur; malbatên ji berya hingê ji ber zexta dewleta dagirker revîn, li Zaxo û gundên derdor bicêhbûyîn jî mal û malbatên xwe digirtin û berê xwe didan Bihêrê.

Êdî ne tenê ji geliyê Goyan û ji gundên li ser sînorê Bakur û Başûr; ji her çar aliyên Bohta kes û malbatên ji xwe tirs, dewleta Turk li wan digeran û bi awayekî bûyîn hedefa dagirker bi arîkariya Hevalan berê xwe didan Bihêrê. Ji navenda Şirnex bigre heta bi gundên derûdor û ji deşta Silopya bigre heta bi Hezex; pê li pey pê Kurd diherikîn wargehê. Di navbera pazdeh, bîst rojan de hêjmara rûniştvanên Bihêrê deh hezar derbaz kiribûn. Ji bû wargehek nû komîteya wargehê ketibû tevgerê û li Başûrê Rojhilatê sûlava Şeraniş cihek nû kifşkiribû. Di aliyê coxrafîk de wargeha Şeraniş ne ji ya Bihêrê kêmtirbû. Heta xweştir jî bû.

## Wargeha Şeraniş

Ligor qisimkirina Rêvebertiya wargehê; yên kevin hatînbiteybet Şirîşeyî, Hilalî, Mijînî û girêdayî vê yên xwe baş bicêh kirîn yên li cihê xwe bimana. Yên nû hatîn û werin jî yên derbazî wargeha nû bibûna. Bi vî awayî piştî avakirina wargeha Bihêrê bîst rojan, wargeha Şeraniş jî hatibû avakirin. Rûniştvanên wargeha nû, ji gundiyên gundên derdora Şirnex, Cûdî, deşta Silopya, Cizîr û Hezex pêk dihatin. Ew qismê wargeha Şerniş pêktanîn, ji sedema gundê wan ji sînor dûrbûn, ji berya bar bikin dijmin bi caran mala wan şewitandibû û bi arîkariya Hevalan bi zorê zarokên xwe gihandibûn

---
12
Erde ne çêrayî.

Başûr; wekû madî tiştek bi xwe re ne anîbûn.

Demsal Biharbû û gotin ji keyfa mêhvanên bê vexwendin warê xwe danîn ser gerangeha Zaxo re ne dihatkirin. Zarokên xwe yên bisalane hasreta dîtina wan dikişînin, bê tirs û têr himbêz dikirin. Bi hev re bergeşa xwarinê amade dikirin û bê xof li dêmê hev dikenîn. Tinaz û henekên bîriya wan kirîn jî paşguh ne dikirin. Ew mirovên sînorê Başûr û Bakurê welatê xwe qetandîn û li rexa sînor bi cêhbûyîn; ji mihaciran wêdetir diman koçerên zozanan. Bi teybet gundiyên nêzîkê sînor, ji berkû bi destûra dewletê derbaz bibûn; pez û tiştên xwe jî anîbûn û li bihuştek wekî Heftanîn, dibin parastina zarokên xwe de bi cêh bibûn û di aliyê debarî de jî pirsgirêk ya wana mucid tinebû.

Ji berya hingê salekî (05. 11. 1993), bi hezaran leşkerên Turk bi sê tangan ve avêtibûn ser gundê Ziravik. Di wê êrîşê de neh mal hilweşandibûn û ji mala Mustefa û Evdila yê birayê hev; pênc kes kuştibûn û neh kes jî birîndar kiribûn. Di encama wê qirkirinê de ji gund heştê mal koçber bibûn  û ji wan malbatan heftê derbazî Zaxo û gundên derdor bibûn. Piştî bi rê nîşandan û arîkariya PKK'ê, koçberên nû hatîn li Bihêrê û Şeriniş wargeh avakirîn, wan malabatan jî berê xwe dabûn wan wargehan. Rewşa aborî ya wan malbatên Ziravikî yên li wargeha Şeraniş hatîn bi cêhkirin jî ne xirapbû. Ankû wargeha Bihêrê,  hemabêje ji sê gundan pêkdihat lê, Şeraniş, têkeltir û ne wekî Bihêrê xwirîbû.

Bê goman malbatên ji dûrtir hatîn û qaçax derbaz biyîn, derfetên pez û tiştên xwe bînin peyda ne kiribûn. Rewşa wan ya debarî ne wekî ya gundiyên navê wan li jor hatî kifşkirinbû. Ema di rewşa heyî de Partiya Karkerên Kurdistan arîkariya feqîran dikir û pirsgirêka tu kesî ya birçî bûyînê tinebû. Jixwe parî nanê kî hebe bi cîranê xwe re bi dilxweşî parvedikiri.

**Îdê Slêman** vedibêje;

"Em ji Gundikêremo ya Şirnex bûn. Gundê me diket qontara jor ya Bakurê çiyayê Cûdî. Gundê me boşbû û biqasî du sed malan hebû. Bi berbanga şevek ya zivistana 1989'ê re leşkerên dewleta Turk dor li gundê me girtin. Kengê cîhan keşafbû, ketin di nav malan de. Biteybet zelam, li nava gund komkirin, tazî kirin û îşkenceyek bê hemsal li wan kirin. Di dawî de jî fermana;

"her kes zarokên xwe bigrin û ji gund derkevin" dan.

Me jî wisa kir. Romî mal bimal çûn, tozek spî li malan direşandin û agir berdidan xaniyên me. Agir wekî benzînê bi wê tozê diket. Mirîşk, elok, pez, dewar her tiştê me şewitandin. Bi pişt re romiyekî ji me re got;

"Jiyana we ya vî gundî qediya. Êdî hûnê nan nedin terorîstan. Niha siktir bibin û herin."

Bawer bike, di ser halê xwe de em memnûn jî bibûn. Me ji xwe re got;

"Mala xwidê ava, hema zarokên me ne şewitandin, ya din ne girînge" û wê şevê me gund berda.

Herkes bi aliyekî ve teriqî. Berfê xwe li nav tengê dide û wekû malbat me berê xwe da deşta Silopya gunde mala bavê min Şemka. Ne pir ji dil jî be gundiyan em hewandin. Nêzî salekî me şivantiya gund kir. Zarok hûrbûn û ji şivantî, rêncbertiyê zêdetir tiştek ji destê hevjînê min ne dihat.

Di wê navberê de dîsa dewletê bela xwe li me da û li wêdê jî rihetî neda me. Her şev tavêtin ser mala me, hevjînê min dibirin û bi mehan îşkence dikirin. Ji gundiyan re jî digotin:

"Ev terorîstin û wan ne hewînin. Nixwe yên li serê we jî bibin bela."

Me li wêdê jî debar ne kir û me berê xwe da navenda Silopya. Em difikirîn kû Silopiya boşe, kes kesî nas nake, emê di nav de wunda bibin û êdî dewlet bela xwe li me nade. Lê, ne wisa bû. Piştî du roja dîsa polîsan avêt ser mala me, her der tevlîhev kirin û gotin:

"Hûn ji destê me xilas nabin. Heke em bibihîzin têkiliyek ya we bi PKK'ê re çêbûye, vê carê emê mala we bi zarokan ve bişewitînin."

Zivistana 1991'ê Rojîna min, li Besta bi çardeh hevalên xwe ve mabû dibin şapa berfê de û şehîd ketibû. Terezina min, 1987'ê tevlî refên ARGK[13]'ê bibû. Bihara 1992 yê ji aliyê Hevalan ve şehadeta Rojîn hat ayankirin û nas û dost hatin sersaxiyê. Dijminê bi vê sersaxiyê hesayî, zextên xwe zêdetir kirin. Eşref (Hevjînê min) ji lêdan, girtin û îşkenceya Turkan kerixîbû. Piştî şehadeta Rojîna min, hew debara wî bû û çû Cûdî cem Hevalan. Di navbera taxa me û rêya hatina tirimpêlên dijmin de pirikek hebû. Bi dehan şeva ez li ber kuleka malê li ser çokên xwe dirawestam û min nobet li wê pirikê digirt. Niha jî ji sedema hingê li ber wê kulekê li ser çokên xwe sekinîme, her du kabê min seqetin û bawîne.

Piştî demekî Eşref ji me re xeber şand û xwest em jî herin Cûdî. Em û mala Rimezanê Yasînê hemgundî, şevekî ji dizî ve ketin rê û çûn gundê Şax. Şaxa li qontara Rojavayê çiyayê Cûdî cêh digirt, di dema kevin de havîngeha mîrê Bohta bû. Hingî dixwazî gundek şîrîn û xweşbû hevîngeha mîrekan. Warê me yê nû dibin parastina Hevalan de bû û em serbixwebûn. Li pişta gund şkeftek bi navê şkefte Reşê hebû; hevalan em her du mal di wê şkeftê de bicêhkirin. Di çar, pênc salên dawî de cara yêkêbû bê tirs dinivistim. Yên li ser desta ne meşîn, qîmetê lingan nizanin kurê min. Yên êş û îşkenceya

13
Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan.

bindestiya Turkan ne dîtîn, tama azadiyê jî fêhm nakin. Azadî ji her tiştî birûmetire. Şkefte Reşê li min bibû Birca Belek. Dema ez dikara azadiyê dikim ewil Şkefte Reşê tê bîra min. Hevalan qûtê me dida. Zilamên me şivantiya pezê Hevalan dikirin û me jî bêrîvantî. Rêxistinê dibistana Kurdî li gund vekiribû. Melayê gund Mele Şîrîn, hem melatî û hem jî mamostatiya dibistanê dikir. Zarokên me jî diçûn dibistanê û gotin ji keyfa me re ne dihatkirin."

Yadê Îdê, jinek navser, esmer û girbû. Dibêjîqey jan û elema Şaristaniyeta zordar hemî li çavên wê yên gir û bireng hatibûn barkirin. Sebra Eyûp li cem ya wê sebiqandî[14]bû. Dema dikara hevjîn û zarokên xwe yên şehîd dikir, dengê wê kêmekî di tehisî lê, xwe zû komî ser hev dikir û bi awayek serbilind sohbeta xwe tajot. Hemabêje tona dengê wê qet ne dihat guhertin. Tijî, jixwe bawer taxivî lê, ewqas jî miskîn û helîm. Carnan kelegirî qirka wê bigirta jî di çavên wê de qet diyar ne dibû. Tenê dama dikara tama azadiya li şkefte Reşê dikir, kelegiriya di qirika xwe de bi zorê zeft dikir. Dibêjîqey ji Gundikê Romo bêhtir bîriya şkefte Reşê kiribû.

"Bi Bihara sala 1994'ê re dijmin liv û tevgera xwe zêde kiribû.  Li gundê me yê nû malbatek xwecih ya bi navê mala Sofî Reşît hebû. Di salên heştêyê de kurek yê vê malbatê tevlî refên Artêşa Gel bibû. Ew gêrîlayê nasnavê wî Riza, piştî demekî şehît ketibû û birayê piçûktir çeka wî rakiribû. Ji berya wê çend rojan Hevalan avêtibû ser navenda bajarê Silopya û Riza yê duyem jî di wê çalekiyê de şehît ketibû. Rojên dawî yên meha Adarê bû û hê şîna şehît lidarbû. Balefirên Turkan li mala Sofî Reşît dan û mala du olî hilweşandibûn. Ji heman malbatê bûka du canî ya malê, keçek ya malê bi zarokek ya xwe ve û kurek yê malê şehîd êxistin. Êdî roj tinebû dewleta dagirker, bi top û balefiran li gund û şkefta me nede. Gundiyan jî gund berdabûn û li şkeftên derdora gund bicêh bibûn. Bi dehan malên ji Cizîr, Hezex û ji gundên derdor ji ber dijmin revîn jî xwe sipartibûn Şax.

Destpêkê Hevalan destûra çûyîna Başûr ne dan. Piştî ew tofan bi Serê ehlên Gabar de hat, ji bû me bigihînin deverek ewle Heval jî ketibûn di nav hewldanan de. Rojekî Hevalan em komkirin, hebûna qampek ya mihaciran ya li Heftanîn ji me re vegotin û gotin;

"Xwe amade bikin emê we bibin Başûr, Qampa mihaciran!"

Di zimanê Kurdî de peyva mihacirtî tehlbû. Bêhna rebentî, malwêrantî û xerîbiyê jê dihat. Lê, wekî din çareya me tinebû û jiyana zarokên me di xeteriyê de bû. Carek din niyeta me ya em herin û dibin tirsa lûleyên tifekên Turkan de jiyan bibin tinebû.

Piştî civînê çend rojan, Hevalan em, gundî û yên ji derûdor

---

14
Ne timam, ne bi serê xwe, kêm.

hatîn derxistin rê. Wê şevê me xwe gihand şkefta du olî ya Gundikê Remo. Roja din me qonaxa xwe li gundê Bilika danî. Li gundê Bilika jî balefirên Turkan em bombebarankirin lê, ji sedema em di şkeftê de bûn tiştek bi me nehat. Şeva din me xwe bi biwara kêla Spî re li sînor da. Di dema derbaz bûyînê de dijminê li kêla Spî bi cêhbûyî em ferq kirin û bi top û hewana danîn me. Bi kotekî û heft belayî me xwe ji kemîna dijmin rizgarkir. Wê şevê em li cem Hevalan man û roja piştî wê em hatin wargeha Bihêrê. Em demek ne dirêj li wêdê man. Piştî zêde mirov hatin û Bihêrê têrê ne kir, Hevalan em anîn wargeha Şeraniş".

***

Li her du wargehan jî xebatek bê eman ya bi cêh biyînê dihat meşandin. Koçberên kon peydakirîn li pêşiya konê xwe kolikek çêdikirin û yên bê kon jî di kolikan de jiyan dibûn. Jixwe herîkîna mihaciran ya berbi wargehê ve jî qet ne dirawesta. Bi awayek şermokî û dudil jî be, her çend rojan carekî şandeyên saziya UNHCR çend tiştên bê qîmet jî bi xwe re tanîn û dihatin. Lê, pirsgirêka destpêkê û herî mezin ya di navbera wan û rûniştvanên wargehê de rêxistinbû. Rayedarên UNHCR[15] ne dixwestin koçber di nav xwe de xwe birêxistin bikin û xwe bixwe birêvebibin. Wan dixwest, erkadarên wan bikevin di nav gel de û tiştên tanîn li gor keyfa xwe belav bikin. Gel komîteyên wî karî ji nav xwe hilbijartibûn û dixwest tiştên anîn bisipêrin wê komîteyê û ligor pêwîstiyan ew belav bikin. Gel ne dixwest hêzek ji derve têkilî karên wan yên navxweyî bibe û di serî de UNHCR, hêzên herêmê ev daxwaza gel bi dijwartî red dikirin. Nankokiya destpêkê ya di navbera gelê wargehê û rayedarên UNHCR de derketî ew bû. Ji serî ve kifş bibû kû ew saziya erka wê ya bingehîn kedîkirin û ji taqet xistina kûviya, ya li wêdê zehmetiyên mezin bikişanda.

Jixwe arîkariya DY ne di xema gelê wargehê de bû. Biqasî ji çaran sêyê wargehê ji gundên nêzî sînor bûn û hema bêje pêwîstiyên wan yên demek dirêj têra wan bikin hebûn. Jixwe gundên wan nêzîkbûn û pêwîstiyên kêm mayîn, bipêre ne gihatin bi xwe re bînin, dubare dizivirîn û tiştên xwe dikişandin wargehê. Çaryêka mayî jî ji bû demek kurt jî be diravên wan hebûn û yên qet tine jî PKK'ê bi wan re arîkarî dikir. Gel germ û bikelecanbû. Hêstên wan li pêşbûn û ne dixwestin tiştek bandorê li ser ruhê wan yê nu azadî tamkirî bike. Xwe ji dagirî, zext û îşkenceya Romê rizgarkiribûn û hê nû bi azadiyê tamijîbûn. Bi hevalan re jiyan dibûn û ji bû vê tu kesî nikarî

15
Komîsertiya bilinda mihacirên Cenewre ya Dewletên Yêkbûyî.

hesap ji wan bixwaze. Gotin ji keyf û şadîtiya wan re ne dihatkirin û azadbûn êdî. Hilalî, dema li gundê xwe bûn, ji sedema kar û debarê hev kêm didîtin. Ne di xêlekî, şahiyekî de bûya hema bibêje qet ne direqisîn. Li wargehê her kes betalbû û hema bibêje her êvar li repinê binya şkefta Bihêrê govendek mezin li dartêxistin û li ber stranên dawetê direqisîn. Di dîlanên dabaş[16]a gotinê de pirsgirêka herî mezin, sergovendîbû. Pir caran dilê wan ji ber sergovendiyê ji hev dima.

## Hevdîtina bi Nêçîrvan Berzanî re

Bi ser hatina koçberan re nû mehek derbaz bibû. Coxrafya war lê danîn xweşbû û demsal Biharbû. Ne li gor dihat xwestin jî be, koçberbûyîna gel ketibû rojeva cîhanê û gel bixeyalên peyîzê dubare vegerin gunden xwe jiyan dibûn. Di wê demê de bûyerek jan-kenok qewimîbû. Du malbatên Hilalî yên zarokên xwe zewicandîn; nextê bûkê li ser heliza bavê kurik ya wê salê birîbûn. Mihacirtiya 1991'ê ya Başûriyan ji xwe re hemsal girtibûn û bawer dikirin kû DY, ya zextê li ser dewleta Turk bike û di demek herî kurt de yê bizivirin gundên xwe. Ramandina mijara gotinê, di aliyekî de moralê mihaciran bilind digirt û di aliyê din de jî li hember xwe ligor demek dirêj amade bikin dibû asteng. Ji bû gel xwe ligor demek dirêj xwe amade bike, her çiqasî Rêkxistin û rêvebertiya wargehê pesartin jî dikir ema, koçberan ev şîret mucid ne digirtin û bi çavên mêhvanên demkurt li xwe temaşe dikirin.

Ev nêzîkatî, ji derveyî jiyana rojane li hember rêkxistina siyasî, civakî, perwerdeyî jî dibû asteng û dereng dihiştin. Ji aliyên kesên dildar ve komîteyên semtan hatibûn pêkanîn. Ne pir mucid û birêkûpêk jî perwerdeya ciwanan hatibû destpêkirin. Milîsên Gabar, li her du aliyên wargehê bend danîbûn û erka asayîş û ewlekariyê pêktanîn. Ema, wekî dihat xwestin gel xwe ne dida ber barê xwe û tinê bi keyfa xwe ya azadiyê ve mijûlbû. Li aliyê din, fik û planên dewleta dagirker vale derketibûn û ji baregiha kêrya Reş hêdî hêdî derdora wargehê bi top û hewanan dihingavt û balefirên cengê bi ser wargehê re nivz dizivirîn. Ev jî ne elamatên xêrêbûn. Her çiqas carnan rayedarên saziya DY hin arîkarî tanîn jî lê, hêvî ne didan û berpirsiyartiya wargehê ne digirtin ser xwe. Rewşa heyî Tevgera Azadî tehfî fikaran dikir û wekî gel ne dilniyabû.

Bi hewldana rêvebertiya wargehê civan[17]ek bi Nêçîrvan Berzanî yê neviyê Mele Mustefa Berzanî û birazayê serokê

---

16
Ji her qetek ya beşe re "dabaş" tê gotin. Mijar.

17
Rendewo.

Partiya Demokratê Kurdistanê Meshûd Berzanî re hatibû girtin (02.06.1994). Pêncî rêhspiyên hatîn destnîşankirin, ji bû hevdîtinê çûbûn qaymiqamtiya Zaxo û bi Nêçîrvan Berzanî re rûniştibûn. Doza hemandin, hewandin û arîkariyê jê kiribûn. Hemabêje piraniya rihspiyên wê şandeyê pêşmergeyên kevin yê PDK'ê bûn û piraniya di nav wê rêkxistinê de xebat kiribûn û şehîd dabûn. Şandeya rihspiyên wargehê, bi hîviyek mezin qesta deriyê Nêçîrvan kiribûn. Lê, hesabê mal û bazarê li hev derneketibûn. Bi çavpêketina destpêkê re hîviyên wan vemirîbûn û di singa Zaxoka Behdînan de qerisîbûn. Neviyê Mele Mustefa Berzanî, bi awayek eşkere xwestibû xwe ji PKK'ê qut bikin û xwe bispêrin wan. Pêşmergeyên dêrîn, bi zimanek tûj daxwaza Nêçîrvan red kiribûn û Nêçîrvan jî bi awayek sergirtî gef li wan xwaribin. Nêçîrvan Berzanî ji şandeya hevdîtinvan re gotibû;

"Hûn dibêjin; me pêşmergetî û xizmeta Partiya Demokrat kiriye lê, ez dixwazim fêhm bikin; hûn niha xizmet û pêşmergetiya kê dikin? Ew Kurdistana ne di destê mala Berzanî de be û ew Kurdê ne digotina me de be, di vê cîhanê de cihê wî nîne" û hevdîtinvan bi awayek dilmayî ji hev veqetabûn.

Serê pêşmergeyê dêrîn nû li hedan ketibû û bi dilek kul û pazdehê birîndar vegerabûn wargehê. Gel, bi gefên Nêçîrvan Berzanî ji xeyalên xwe yên xapînok hişyar bibû. Hê zivistana reş nedayî ji derî ve, pêwîstiya tiştekî bikin xwe bi awayek lezgîn dipesart. Bi qewlê Başûriyan 'ev mihacirên kotek' ji xewna xwe ya azad zû hişyar bibûn û zend û bendên xwe ji berxwendana NAMÛS'ê re hildabûn.

## Çalekiya Rojiya Biçîbûnê

Piştî hevdîtina xeyalkuj heft rojan, civînên hemwext yên awerte û mezin li her du wargehan hatibûn lidarxistin û biryara çalekiya rojiya birçîbûnê hatibû girtin. Kelecana azadiyê zêde ne ajotibû. Cîhan piçûkbû û azadiya wê komika mirovên serhişk qestêkirî ewqas ne nêzîkbû. Baregiha leşkerên artêşa turk pênc kêlûmitran li Bakurê wargehê disekînî û bi top û hewanên xwe, bibalefir û firokên xwe her roj siha xwe bi wan dida hîskirin. Rûniştvanên wargehê zû têgiştibûn; ferqek zêde di navbera Qumîsertiya Bilind ya Mihacirtiya Detewên Yêkbûyî (UNHCR), PDK û turkan de tinebû. Ji ber şirikê revîbûn ber mezrîbê û wekî zenkirîn li piş çiyayê Heftanîn jiyanek azad tinebû. Cîhan giroverbû û desthilatdar heman raman dibûn. Pesartina Partiya Demokratên Kurdistan; dûr ketina ji PKK'ê bû. Temsîlvanên Dewletên Yêkbûyî UNHCR jî heman tişt dipesartin. Kum ketibû û serê keçel di hola nîvî de dibiriqî. Armanca dewleta Turk, ya berê wan mirovan dayî Başûr

jî hêdî hêdî derdiket holê.

Piştî hazirkirina cihê çalekiyê û tespîtkirina çalekvanan, jin û mêr têkel pêncî endamên her du wargehan li nêzîkê pira Delalê destbi çalekiya Rojiya birçîbûyînêkirin (12.06.1994). Destpêkê hêzên xwecih û yên hevsarê wan dikişandin zêde ne di cîdiyeta çalekiyê de bûn û zêde nebibûn asteng. Lê bigiştî Başûrî û biteybet jî Zaxoyî ji çalekî û protestoyên civakî dûrbûn. Gelê parçeyê Başûr yê welatê Kurdistanê demek dirêj li hember dagirkeran têkoşîn kiribû ema, têkoşîna wan di navbera sirme û sihika birnoya pêşmergeyan de teqinîbû. Ankû têkoşîna kirîn yêkalî û berteng mabû. Ji wê sedemê ti wate ne didan çalekiyek bi komanî. Têkildarî çalekiyên sifîl û xelkê Zaxo diyalokek jan-kenok li civatên koçberan zêde bibû. Du pêşmergeyên bihes yên Zaxoyî bi pêşya cihê çalekiyê re derbaz dibin. Yê yêxtiyar ji yê ciwan re dibêje;

”Ev xelk çi dikin, çima li vêdê kombûne mamo?”

Yê din dibêje;

“Bixwidê Mamo baş nizanim lê, dibêjin ji zadî enirîne.”

Her kû diçû çalekvan zêde dibûn û di hundirê hefteya destpêkê de hêjmara rojîgiran xwe li sêsed û pêncî kesan dabû. Ji rûniştvanên wargehan û ji Bakuriyên derdor, her tim bi hezaran serdenvanî jî li cihê çalekiyê amadebûn. Govenda çalekiyê roj bîst û çar demjimare lidarbû û çalekiyê koçberan dengek awerte bi Zaxoka Behdînan êxistibû. Piştî çalekiyê destpêkirî çend rojan, temsîlvanên Komîsertiya Bilind ya Mihacirên Dewletên Yêkbûyî (QBMDY) hatibûn cihê çalekiyê û xwestibûn daxwazên çalekvanan fêr bibin. Komîteya amadekar, şertnameya ji berya hingê ji aliyê rêvebertiya wargehan ve hatî amadekirin û ji neh xalan pêktdihat teslîmê wan kiribûn.

**Şertname**

1. Pêwîste mafên me yên siyasî û yên mihacirên nû tevlî me bibin werin naskirin.
2. Divê êrîş û bombardimanên dewleta Turk yên li ser me ji aliyê Dewletên Yêkbûyî ve werin astengkirin.
3. Ji me re nexweşxaneyek bi mezintiya bikaribe nexweş û birîndarê me tedawî bike were avakirin.
4. Ji bû em bikaribin mercên jiyana xwe sererast bikin, divê arîkariya madî bi me re werekirin û ev arîkarî birêkûpêk were berdewamkirin.
5. Divê arîkariya em bikaribin xwe li hember mercên xwezayî ya demsala zivistanê biparêzin (Sope, cilên nivistinê, sotemenî, qut û wekî din) bi awayek berdewam û birêkûpêk werekirin.

6. Divê di bin banê Dewletên Yêkbûyî de bi navê "Kurdistan û Mihacirtî" şandeyek ya çavdêrî û lêkolînê were damezrandin û ev şande bime bişêwire.

7. Divê ji bû dawî lê anîna şerê di navbera PKK'ê û dewleta Turk de, bi navbeynkariya Dewletên Yêkbûyî hevdîtinên aşîtiyê werin destpêkirin.

**a-** Ji ber van sedeman, divê pêvajoyek siyasî were destpêkirin.

**b-** Girêdayî vê, divê mafên me yên siyasî li vêdê û doza tanzîmata gundên me yên hatîn şewitandin, malên me yên hatî talan kirin were vekirin.

**c-** Divê Dewletên Yêkbûyî vê berpirsiyartiyê bigre ser xwe û bi vî awayî vegera me ya gundan were pêkanîn.

8. Girêdayî vê divê derhal arîkariya çek û tiştên din yên di vê çarçovê de li ser dewleta Turk werin rawestandin.

9. Divê Dewletên Yêkbûyî, zext û zulma dewleta Turk ya li ser Gelê Kurd derhal rawestîne.

Endamên Dewletên Yêkbûyî daxwazên çalekvanan girtin û ji bû ji Bexdayê re birêkin ji cihê çalekiyê veqetan. Eleqe û girîngiya çalekiyê PDK, aciz kiribû û ji bû çalekvan dawî li çalekiya xwe bînin zextên bê eman dipesartin. Ji bû di navbera pêşmergeyên PDK'ê û çalekvanan de proweqsiyonekî derxînin MÎT'a Turk, hewlek bê eman dimezaxt. Lê, çalekvanên rêxistî, bihes û hişyar tevdigeran û rê ne didan tevlîheviyek mezin. Li aliyê din artêşa Turk pileya êrîşên xwe bilindkiribû û wargehê wundayiya xwe ya jî destpêkê dabû. Feyroz Serhana ji gundê Aloş, di encama topbarana dewleta Turk de li Bakurê wargeha Bihêrê hatibû kuştin(09.07.1994). Jina navser û dayîka heft zarokan, wekû şehîda yêkem ya wî karwanî derbazî qeydan bibû.

Di dawiya hefteya sêyemîn ya çalekiyê de, rêvebirê UNHCR yê Bexdayê bi şandeyekî ve hat û bi komîteya dîplomasiya çalekvana re rûnişt.

Berdewkê komîteya amadekar ya çalekiyê **Mele Şîrîn Baneyî** hevdîtina bi şandeya UNHCR'e vedibêje;

"Rêvebirê UNHCR yê Bexdayî kesek Filistînî bû. Bi şêwazekî xweş û dilnivz guhdarî daxwazên me kir. Piştî di çarçoveya şertnameya xwe de me dubare daxwazên xwe jêre ravekirin got;

"Ligor zagonên UNHCR'ê divê çek û çekdar di nav we de peyda nebin. Divê bi ti awayî têkiliyên we bi PKK'ê re çênebin. Lê, ez dixwazim bi awayek eşkere vê jî bibêjim; ez Filistînî me û

dema çav didim van dayikan, dayikên welatê min têne bîra min. Heke hûn bixwazin tine nebin û azad bibin, berdel çi dibe bila bibe divê hûn dest ji Tevgera xwe ya azadiyê bernedin. Dîsa li gor zagonên me, divê di navbera qampa we û sînorê dijminê we de herî kêm bîst kêlûmitre hebin. Cihê we yê niha ji baregiha leşkerî ya dijminê we pênç kêlûmitra dûre. Ya din, ligor zagonên me cihê qampa we divê di bin quntrola PDK'ê de be. Lê, cihê hûn niha bicêhbûyîn dibin quntrola PKK'ê de ye û zagonên me dest nadin em li vêdê arîkarî bi we re bikin û we wekû mihacirên siyasî bipejirînin. Emê we wekû mihacirên siyasî bipejirînin, xaniyan ji we re ava bikin û ji bû şertên we yên din jî hewl bidin lê, divê cihê em dixwazin hûn qampa xwe bînin wêdê."

Em bi hev re çûn pişta Zaxo. Zelamê Filistînî, li ber Robarê Xabûr cihek bi navê çemkê Gula wekû cihê wargeha me ya nû pêşniyarkir. Di aliyê coxrafîk de cihek pir xweşbû û keyfa me jî jêre hat.

Rêvebirê UNHCR yê Filistînî got;

"Emê we li vêdê bicêh bikin, we wekû mihacirên siyasî bipejirînin, xaniyan ji we re ava bikin û Partî Demokrata Kurdistan (PDK)ê ya ewlekariya we bigre."

Wekû komîte, me bi yêk dengî xala dawî ya berpirsê UNHCR yê Bexdayê redkir û me xwest em xwe bixwe ewlekariya qampa xwe bigrin. Ema zilamê Filistînî bitinaz tevlî tevz serê xwe hejand û ji ya xwe nehat xarê. Rêvebirê UNHCR yê Filistînî got;

"Ez fikarên we baş fêhm dikim. Ema ez niakrim zagonên UNHCR ji bû we binpê bikim."

Me li ser xala 'PDK ya ewlekariya we bigre' li hev nekir û di dawî de me ji wan re got;

"Em jî yê di nav xwe de gtûbêj bikin û encamê ji we re ragihînin" û em ji hev veqetan.

Yêkser em hatin wargehê. Gelê wargehê bi awayek bê sebir jixwe çaverêyî me bû. Piştî me xalên hatîn gotûbêj kirin ji rêvebertiyê re rêzkirin û em gihatin xala 'PDK ya ewlekariya we bigre' berpirsê Meclîsa wargehê eniya xwe qermiçand û got;

"Ev teslîmiyete. Divê di mayîna herêmên gêrîla de em israr bikin."

Jixwe wekû gel, çalekvan û rêvebertiya qampê em hêmî di wê xalê de hemfikirbûn. Û me wekî daxwaza xwe biryar girt. Me biryara xwe ya di mayîna Heftanîn de gihand rêvebirê xwe yê Filistînî. Di heman rojê de em bi hev re siwarbûn û çûn walîtiyê Duhokê. Em Waliyê Duhokê û şandeya UNHCR ya Bexdayê li hev rûniştin. Walî yê Duhokê Evdilezîz Teyip got;

"Herêma hûn lê bicêhbûyîn ne dibin desthilatdartiya me

de ye û em nikarin li wêdê berpirsiyartiya we bigrin ser xwe."

UNHCR;

"Hevkûf[18]ê me PDK ye. Em nikarin ji derveyî PDK'ê di vê herêmê de bixebitin."

Dema me ev gotûbêj dikir, zelamek temendar û şaşik sohr ket hundir. Kesê nû hatî, endamê komîteya navend ya PDK'ê Mele Mehmûdê Dêrşewî bû. Me nas dikir û wî jî em nas dikirin. Em bihatina wî pir keyfxweş bibûn. Me zenkir kû Bakuriye û yê arîkarî bi me re bike. Piştî Mele Mehmût kêmekî guhdarî gotûbêja me kir, ji nişkan ve ket di nav sohbetê de. Li walî zivirî û got;

"Seyda, dev ji van berde! Kurdistan di gemiyekî de ye û gemî jî li ser deryayêye. Bîst hezar mirovên xwenenas hatine û dixwazin Kurdistana me xerq bikin."

Em pir aciz bibûn. Me jî ew bihevalbendîtiya Turkan tewambarkir û bê encam em ji wêdê jî vegeran.

Di dawiya vê têkiliya têr nakok de rêvebirê UNHCR yê Filistînî bi awayek jidil got;

"Ez xweyê soza xweme. Tiştên me gotin, ew jixwe li cihê xwene. Herin dawî li çalekiyê bînin, bi awayek berfireh gotûbêj bikin û kengê hûn amadebîn xeberê bidin endamên me yên vêdê û ezê bi we ve werim."

Me heman tiştkir û em zivirîn wargeha xwe (10.07.1994)."

***

Gelê wargehê bi awayek serkeftî dawî li çalekiya xwe anîbû û vegerabû xwe rêkxistinkirina hundir. Ji destpêkê û pêve gelê wargehê xwe bi xwe birêve dibir û bi lezgîntiyek mezin sazî û dezgahên navxweyî avadikirin. Sînorên taxan dihatin kifşkirin, rêvebrtiya taxan dihat diyarkirin û rêvebertiya giştî ji mebûsên herêma Bohta dihatin hilbijartin. Dibistan, mamosta, komîteya karê jiderve, komela ciwanan û wekî din her tişt di demek kurt de hatibû rûniştandin.

Ji danûpeza rojek hunik ya demsala Peyîzê re kêmek mabû. Tîrojên rojê bi hemî dijwartiya xwe kolik û xîbetên wargeha Şeraniş dihingavtin. Şewqa nû gihatî Sûlavê, li ava bi dehan mitre ji jor dirije dida û qevdek zeraqa pir reng vedana xwe belawî derdor dikir. Koma mirovên boş yên di dol û pesarên Bihêrê de kombûyîn, qijvijek bi ser asiyê re dertêxistin holê. Jixwe dengê top û balefirên Turkan biserê xwebû û qet kêm ne dibû. Bare bara mihan û berxan, zire zira keran,

18
Mûhetap.

qide qida mirîşkan û dengê zarokan; ji qampek ya mihaciran zêdetir wargehek azad ya zozanên Kurdistanê di bîran de zindî dikir. Tama azadî yê şîrînbû û hêstên azadî û serbixwetiyê qabilê hemî zorî û zehmetiyanbûn. Di kolika taxa Şehît Şiyar ya wargeha Şeraniş de rêvebertiya wargehê civîna hefteyî ya asayî lidardixist. Asifê mala Naîfê Paşa, li nîvê paş yê kolika mezin çarmêrkî rûniştibû. Li aliyekî Mustefa yê Cizîrî (endamê mejlîsa Kurdistan), Bawerê Hevlerî (endamê rêvebertiyê) û hevalê Cûdî (berpirsê karê perwerdê) cihê xwe girtibûn. Li aliyê din, Xoceyê Erûhî (endamê mejlîsa Kurdistan), Hacî Eliyê Xwirsî (endamê mejlîsa Herêma Bohta), hevalê Feqe (berpirsê ewlekarî û milîsan) Zîna Hevlerî (endama rêvebertiya wargehê) û ji komîteyên wargehê Teyrikê Nêrwehî li dawiya civatê destê xwe dabû ber çavê xwe yê kor û bi çavê xwe yê sax tevgerên ji der ve temaşe dikir. Zînê mafê axaftinê girt û ji sedema bê edaletiya ji aliyê rêvebertiyê ve tê kirin û tevgerên erkdarên bêkêr rexneyên giran li Asif kirin û ew bi fedoltiyê tewambarkir. Jina esmer û ciwan, di dewama axaftina xwe de got;

“Em di avakirina saziyên rêxistinî û civakî de tengsistiyan dikin. Em dihilbijartina erkdaran de nahes û bê cîdiyetin. Ji bû gel bikaribe zorî û zehmetiyên çaverêyê me ne bi awayek saxlem pêşwazî bike, em wan baş amade nakin. Em hemî wekû derbazer nêzî vî gelî dibin. Lê di rastiyê de, dibe kû ev rêvantî bi dehan sal bajo” got û bê hemd destê wê ket ser kîsikê titnê yê qet ji xwe dûr nayêxe. Ji qehra kêmasiyên giraniya wan ji Asif jêderdibin, lêhvên Zînê hişîn bibûn û dibêjîqey haxta kîsikê xwe derêxe û çixareyekî bipêçe.

Asif û hevalên zelam ji latekî ketibûn. Bi awrên nivz li hev dinêrîn û lêhvên xwe gez didan. Ji jinek ya malê û bizarok ev gotin û rexne hêvî ne dikirin. Hêvî ne kiribûn wan rexneyên dijwar ji jinek ya mala gundekî bibihîzin. Lê, neçarbûn û tiştek ya bikirana tunebû. Yê herî zêde bi rexneyên wê jinê şad bûyî Feqe bû. Ji ber kû tiştên Zînê rexnekirîn her tim dabaşa rexneyên wî jî bûn. Zînê, bi rexne û nirxandinên xwe bibû berdevkê hêstên wî.

Di dibistana wargeha Şeraniş de mamosta Mele Şîrînê Baneyî, stoyê xwe yê ber bi milê çepê ve kêmekî xwehr, xwehrtir kiribû û berê wî li depê reş di nav tîp, kite û hevokan de xwe ji zû ve wunda kiribû. Xwendevanên di aliyê temende ti hevsengî bi wan re nemayî, di hundirê kolika navê dibistana seretayî li kirîn de, li ser dirîncên ji kuçan hatîn çêkirin bê deng rûniştîbûn. Xwendevanên armanca wan ya fer fêrbiyina xwendin û nivîsandinê, di alema xwe de bûn û mamosta di alemek din de difirî. Ti eleqeya wan bi hev re tinebû û bi werîsan demjimara kutahiya dersê dikişandin.

Mamosta Hacî Ehmedê Gundîkî, li rastika binê wargeha

Bihêrê, xwendevanên xwe derxistibûn dersa bedenê. Xwendevanên di navbera temenên wan de ferqên mezin heyîn, wekû sê rêze li rex hev rêz kiribûn. Mamostayê li rexa pêş, bi dengek bilind sîroda "Heftanînê" diqêrî û xwendevanên bi meşa leşkerî dimeşin lê vedigerandin. Hêstên Mamostayê bi kelecan ewqas sincirîbûn, jibîrkirbû yên dirêzê de xwendevanên dibistana seretayîne û ew bixwe jî ne perwerdevanê hêzek teybete.

Yadê Naric li pêşya, bêrîvanan teşiya xwe diristin û ber bi quntara Xantor ve hawa diketin. Her endama şêniya warê nû, bi karekî ve mujûlbû û heke dengê top û balefirên turkan jî tinebûna gotin ji keyfa wan re ne dihat kirin.

### Sê Ehmet

Gelê wargehê şadîtiya dûr ketina ji romiyên romê jiyan dibû. Êdî tirsa çima "heval hatine gundê we, çima we nan daye wan" û "çima hûn alîgirê PKK'ê ne" di paş de mabû. Koçberên di qontara Xantora Heftanînê de wargeh danîn, şev û roj di nav Hevalan de bûn û bi Hevalan re bûn. Saziya di wargehê de herî jîndar û boş ya hêza xweparastinê bû. Her kesî bi awayekî dixwest xizmeta rêkxistina xwe bike û ji bû wekû milîs navê xwe tomar bikin, li derê kolika milîsên Gabar rêz girtibûn. Şûr simbilên Feqe yê berpirsê saziya hêza xweparastinê nabire û keyfa wî li cêhbû.

Ji bû xizmet û arîkariyê her roj bi dehan ref û biran berê xwe didan nav Hevalan. Hin kesên gundên wan nêzîkê sînor, bi armanca tiştên xwe yên li gund mayîn bikişînin wargehê derbazî Bakur dibûn. Hinan, hem qaçaxçîtî ya sînor dikirin û pêre jî xizmeta rêkxistinê dikirin û hinan jî yêkser ji bû arîkariya rêkxistinê ji wargehê vediqetan. Milîsên herêma Goyan, destpêkê derbazî qada Sineht dibûn û li wêdê tanzîma wan dihat çêkirin. Yêk ji fermandarê gêrîla yê wê qadê Rimezanê Şirnexî bû. Rimezanê, kesek dirêj, esmer û pir henekvanbû. Ji sedema ew demek dirêjbû li heman heremê kar dikir, çand û keyfîtiya ehlê herêmê jî baş dizanî.

Rojekî sê milîsên navser û nevê wan Ehmet bi armanca pratîkê çûbûn Sineht. Rimezan, kûjan xizmet li wan haydida; her sê Ehmedan bi hev re bersîva "ne kirkim (nikarim bikim),ne çûkim (nikarim herim)" didin. Fermandarê gêrîla bi hêstên bê çare, wan li cem xwe dihêle. Navê her sê yan jî Ehmede û ligor navîna temenê gêrîlayan kêmekî jî temendarin. Dema navê yêkî tê gotin, her sê bi hev re bertek nîşa didin û ev hêlwest dibe sedemê şermedartiya Hevalan. Ji bû berjengên cuda bi wan ve bike û navê wan ji hev cuda bike Fermandarê henekvan, li pêşya keysekiye. Wê demê polîtîkaya Serok wezîrê dewleta turk Turgut Özal ya wekû "Stûna Nîvî (Orta

Direk) bi nav kirî, pir di rojevê de bû û Ehmedê Ziravikî pir wesf û pesnên vê polîtîkayê dike û mijara sereke ya zanista wî ya siyasî ev polîtîkaye. Fermandar, "orta dîrek"ekî datîne paş navê Ehmedê Ziravikî û navê wî dibe "Ehmet Orta dîrek". Ehmedê Kalhesinî, tiştan zêde mezin dike û ji zirt û pesnên xwe pir hes dike. Navê wî jî wekû "Ehmet Atar" kifş dike. Ehmedê Bilehî, di henekvantiyê de ji fermandar ne kêmtire û ji bû berjengek baştir bigre hewlek mezin dimezêxe. Fermandar jî ji bû Ehmedê mayî li berjengekî digerê lê, kêmekî zehmetiyan dikişîne û ev Ehmet zêde lewaztiyên xwe nade dest.

Rojekî fermandar Ehmed'ê mayî bi erkekî erkdar dike û dirêke cihekî. Hê Ehmet birêve balefirên turkan têne û Ehmedê Bilehî xwe dibin kevirekî de vedişêre. Yêqîn kêmekî sehma balefiran li ser Ehmedê mayiye û demek dirêj dibin wî kevirî de dimîne. Bi pişt re bi xew ve diçe û wê rojê dibin wî kevirî de derbaz dike. Dema ji xew radibe êdî şeve. Bêkû erka xwe pêkbîne dubare vedigerê cem fermandar. Fermandar jî ji ber dereng mayîna Ehmedê Bilehî bifikare û ditirsê belayek hatibe serê wî. Piştî Ehmet vedigerê cem hevalan, li gel keyfxweşiyê her kes pirsa "tu li kû mayî Hevalê Ehmet?" dike.

Fermandar;

"Te zeravên me qetandin Hevalê Ehmet, li kû mayî?"

Ehmedê Bilehî, bikelecanek awarte û jixwe bawer bersiv dide;

"Bixwedê heval, dema ez ji cem we veqetayîm Fanto hatin! Tu dizanî fanto mîratê pir xirabe û zilika giyê jî li erdê dibîne. Ji bû min nebîne min xwe di bin kevirekî de veşart. Mîratan ji raser serê min neçûn. Te digotqey dizanîn ez dibin wî kevirî de me. Heta êvarî li ser serê min zivirîn û min jî nikarî derbikevim."

Fermandar;

"Fanto çiye hevalê Ehmet?"

Ehmet;

"Fanto ya, fanto! Qey tu nizanî fanto?"

Fermandar;

"Ankû tu ne çûyî cem hevalan?"

Ehmet:

"Na bavo, Hevalên çi? Bixwedê ji tirsa fantoyan min nekarî serê xwe ji bin tehtê derxînim."

Hemî heval ji kena zik û pişt dibin û Ehmedê Bilehî jî li wêdê berjengê "Fanto" digre. Ev berjeng wekû navê Ehmedan bi wan ve dizeliqe û bêkû berjengê wan were gotin tu kes êdî van Ehmedan nas nake. Ji bilî Ehmet Atar, her du Ehmedên din ji berjengên xwe razîbûn û êdî tenê bi berjengên xwe dihatin naskirin.

**Perwerde û Dibistan**

Perwerde û PKK hemcewherbûn. Dema navê PKK tê ziman, ji berya her tiştî perwerdê dihat bîra milîtan û alîgirê wê. Yêk ji teybetiya herî sereke ya PKK'ê anî wê astê, girîngî dayîna wê ya perwerdêbû. Ji bû pêşkêşkirina têkoşînek ewqas bê hemsal, xwe ji nû ve avakirin, guhertin û veguhertin şertek serekebû. Ji bû wê jî têgihiştîn pêwîstbû. Ji bû têgihiştinê perwerde şertek nebe nabebû. Gotina, "***Yê di perwerdê de xwêhdanê ne rijîne, yê di şer de xwînê birijîne"*** felsefeyek jêneger ya PKK'ê bû.

Piştî koçber derbazî qadên gêrîla dibin, xala destpêkê ya rêvebertiya herêmê ya gêrîla li ser kûr û berfireh raman bûyîn, bê goman perwerde û vekirina dibistananbû. Bi hatina refên destpêkê re, ji bû perwerdeya ciwan û zarokan mamosta hatibûn erkdarkirin û ne pir birêkûpêk jî be dewreyên perwerdê hatibûn vekirin.

**Wargeha Perex**

Di wê serîwana dijwar de wargeha Perx jî hebû. Ev wargeha şeş, heft kêlûmitran diketa Bakûrê wargeha Bihêrê û ji bîst û pênç malbatên ji qampa Zelê hatîn pêkdihat; ti caran di lîteratûra wargehiyan de wekû wargehek cuda cihê xwe negirtibû. Di dema Şerê Xiyanetê (Cohtmeha-1992) de, qismek gêrilayên Kurdistanê vedikişabûn qampa Zelê. Malbatên milîs û welatparêzên ji zexta dewleta Turk revîn û li Zaxo û derdor hewayîn, vê carê jî ji PDK revîbûn û çûbûn Zelê. 28'ê Çile ya 1994'ê dewleta Turk bi 52 balefiran êrîş biribû ser qampê Zelê û piranî jin û zarok ji malbatên mijara gotinê hifdeh kes qetil kiribûn. Yên ji qirkirina balefirên Turkan felitîn dubare vegerabûn Zaxo û gundên derdor. Piştî koçbertî ji Bakur ber bi Başûr ve destpê dike û li Bihêrê biwar dibin, ev malbat jî ji Hevalan dixwazin wekû wargeh li herêmek ya çiyan bicêh bibin. Heval jî wan li gundê Perex yê ji zû ve xirabiyî bicêh dikin. Lê di lûteratûra dîroka wê serîwenê de, ti carî Perex wekû wargehek cuda nehat hesibandin. Ji ber wê wekû wargehek cuda cêh ji wargeha Perex re nehat veqetandin.

Jiyan, keçek ciwan ya gundê Kalhesina eşîra Goyan bû. Keça Ehmet Atar bû. Ew jî yêk ji malbatên serpêhatiya Zelê jiyan bûyîbûn. Jixwe xwendin û nivîsandina wê hebû û piştî kêmek perwerdeya Zimanê Kurdî ji hevalan jî digre, li Zelê wekû mamostaya zarokan tê erkadarkirin. Dema heman malbat ji Zelê dizivirin û li Perex bi cêh dibin, Jiyan dubare erka xwe ya mamostatiyê dewam dike.

Li Perex Jiyan, li Bihêrê Hacî Ehmedê ji Gundikê Melê û li Şeraniş jî Hevalek binavê Binevş wekû mamostayên zarokan hatibûn erkdarkirin. Di dîroka karwanê di welatê xwe de koçber, kesên nav bûrî yên wekû mamostayên destpêkê derbazî qeydan bibûna.

Ev kesên mijara gotinê ji bû xwendin û nivîsandinê fêrî zarokên wargehan bikin, wekû mamosta hatibûn erkdarkirin. Ema ne amêr û ne jî pêwîstiyên perwerdê hatibûn dabînkirin û ne jî avahiyek navê wê ‘dibistan’ hebû. Mamostayên dikara wan hatî kirin, zarokên daxwaza wan heyî kom dikirin û dibirin ji derveyî wargehê. Li gor derfetên xwe tîpên Kurdî, dengên tîpan, navê welatê wan, paytexta welat, navê Serok û wekî din fêrî zarokan dikirin. Bi teybet Hacî Ehmet, ji fêrkirina xwendin û nivîsandinê zêdetir giraniyî dida meş û tevgerên leşkerî û zarok fêrî sîrodên meşê dikirin.

**Mamosta Jiyan** vedibêje;

“Hevalan ji min re got;

“Zarokan kom bike û dersê bide wan.”

Jixwe dema em li Zelê bûn serpêhatiyek ya mina mamostatiyê hebû. Lê ne dibistan, ne pênûs-defter û ne jî depê nivîsandinê hebû. Ji bû ewlekariyê me zarok dibirin berevez[19]ekî. Demekî av bi wê tehtê re herikîbû û şûna avê kirêç girtibû. Ankû spî mabû. Min jî li ser wê spîtahiyê bi rijiyê ders dinivîsand û bi zarokan dida xwendin û nivîsandin. Jêbira me jî paçek şilbû. Mamostayên li wargehên din jî heman rêbaz û amêr bikartanîn”.

***

Roj biroj hêjmara koçberan û girêdayî vê wargehan zêdetir dibû. Bicêhbûn û rêkxistinkirina navxweyî jî bi heman lezgîntiyê tajot. Wekî her saziyê, saziya perwerde jî xwe wekû pêwîstiyek lezgîn dipesart. Pergal, rêbaz û mamostayên hatîn erkdarkirin, ji ya dihat xwestin dûrbûn û ne dibûn bersiv. Êdî dema dibistanên birûkûpêk hatibû û dereng jî mabû. Rizgar, fermandarê gêrîla yê qada Heftanîn bû. Wekû derbazer parastin û rêvebirina wargehan aydê qada wî bû. Wekî bi her pirsgirêka koçberên wargehan ve mijûl dibû, dest avêtibû pirsgirêka avakirina dibistanan jî Rizgarê gêrîla.

Rizgar, navên çend kesên xwendin û nivîsandina wan ya turkî heyî û di pergala perwerdeya turkan de dibistan xwendîn li mamostayê kevin zêdekir. Piştî biqasî têra dersdayînê bike nav hatin kifş kirin, civînek berfireh ya perwerdê hat lidarxistin. Hevalê Rizgar, ne tenê şervanek yê Têkoşîna Azadiya Kurdistanê bû; di heman demê de mirovek rewşenbîr, lêkolînvan û zimanzanek kurd bû. Ji bû pêşketin û azadiya civakan dirêj dirêj dikara wate û girîndiya perwerdêkir û ji avana civînê daxwaza vekirina dibistanên birêkûpêk yên Kurdî kir.

Hevalê Rizgar:

---

19
Şkefta vêl, ne kûr. Ber tehtek bistar.

“Wekû PKK’ê, herî zêde em êşa bê perwerdeyiyê dizanin. Civakek bê perwerde ji civakbûyînê wêdetir ji şkêra mirovên xwilam pêktê. Seydayê Cegerxîn dibêje; ‘du êşên me kurdan hene; yêk nezanîn û ya din jî xîzaniye’. Di rastiyê de jêdera xîzaniyê jî nezaniye, ankû bê perwerdeyiye. Vêca em dixwazin we wekû mamostayên destpêkê yên Gelê Kurd erkdar bikin.”

Xendeyek bitilsim dêmê gewr û girover yê fermandar pêça û bibeşişandinê re rêze dinanên wî yên wekî mircanan xwiyan. Bi çalekiya xwe şad dixwiya û belkî jî yêk ji xeyalên xwe yê herî girîng pêktanî. Fermandarê zanyar, di dewam axaftina xwe de got:

“Jixwe bawerbin, navê we yê derbazî dîroka perwerdya Gelê Kurd bibe.

Ez dizanim, we perwerdeya Kurdî nedîtiye û hûn di dibistanên dijmin de fêrî xwendin û nivîsandinê bûne. Lê, kêmekî lêkolînên min li ser zimanê Kurdî hene. Biqasî derfet dest bidin, ez jî yê bi we re arîkarî bikim.”

Ji bêje, pênase û ji gotinên ji nav lêhvên tenik yên fermandarê gêrîla diherikîn, kifş dibû kû di derbarê zimanê Kudî de xweyî zanîn û lêkolîne. Evê berhevkirina fermandar, hem ew şad dikir û hem jî kelecan û heyrantiya guhdarvanan derdixist lotkeyê. Hîs û kelecana fermandar jî rabibû pêdarê û bipêve çû;

“Zimanê Kurdî, zimanek sade, tewandî û biherikandine. Çawa tê axaftin wisa jî tê nivîsandin. Ne nêrin, ji bê perwerdeyî di devoka me de xirabûn pêşketiye û stûrbûye. Di rastiyê de zimanê me zimanek nazdar û kubare. Ji ber kû zimanê jinêye. Zimanek xwezayiye. Jixwe dizê. Bêjeyan, navê xwe ligor tevger û karanîna xwe girtine û zimanek pir dewlemende. Jixwe hûn hemî Bohtîne û peyv, awaz û qirika resen ya Zimanê Kurdî ya herêma we ye. Tenê hewlbidin axaftinên xwe daxînin nivîsandinê. Tiştek din ne pêwîste. Jixwe bi demê re û di encamê lêkolînan de tiştên kêm jî hûnê timam bikin.”

Dibêjîqey ji nişkan ve xwînê êrîşkiribû dêmê gewr û girover yê Rizgar. Çavên wî yên gir û genimî ji asayî zêdet vebibûn. Ji her rewşa wî kifş dibû kû kelecanek bê eman hinavên wî dagirtibûn. Jixwe dema dikara spehîtahî, kevnîtî û dewlemendîtiya zimanê Kurdî dikir, ji eşqa sermest dibû. Ji rêzê ve çavên xwe li ser berendamên mamostayên di bin barê li wan hatîkirin de wundabiyîn gerandin û tilsimek efsûnî dêmê wî pêça.

“Dijminên me û dilxwede hin kurdên xwe wekû rewşenbîr difiroşin dibêjin; ‘Zimanê Kurdî ne zimanê xwendin û nivîsandinê ye û zimanê şivan û gavana ye’. Ev, yêk ji aliyê herî girîng ya fatiskirina me ye. Em tenê li ser peyva ‘xweza’ bihizrin, emê raza mezintiya vî zimanî baş fêhm bikin. Gelo kengê, kûjan zanyarî, bi kûjan

xwebîrtiyê ev rastiya xwezayê zaniye û ev bêje[20] lêkiriye. Di roja me de jî bi dehan zanyar û ramyar[21] bifikirin nagihêne raza vê bêjeyê."

Ji bû avana ji mamostayan bêhtir dimîne her tiştî, baweriya xwe bixwe bîne û biçavên mamosta lixwe binêre; gêrîlayê zanyar hemî hunerên xwe ratêxisitin holê. Axaftina bibandor û bêjeyên guhên wan fêrî bihîstina wan nebûyîn; serê mamostayên sebiqî tarûmar kiribû.

**Mamosta Mele Şîrînê Baneyî** vedibêje;

"Li hember rewşenbîrtiya sêhrvan ya hevalê Rizgar em şaqis mabûn. Te digotqey çiyayê Cûdî dabû piştma me û teşkên me di bin de dilerizîn. Ne rêzikek nivîsandina Kurdî di destê me de hebû û ne jî jêderek em serî lê bidin. Bêjeya navê "dibistan"ê jî me cara destpêkê ji devê wî bihîstibû. Li ser fermana hevalê Rizgar ez çûm Zaxo. Di dema çalekiya rojiya birçûyîbûyînê de min kesek binavê Îsmet nas kiribû. Îsmet, eslê xwe ji Miksa Wanê bû. Di salên heftiyê de malbata wî derbazî nav pêşmergeyên Başûr bibû. Bi pişt re koçberî Rojhilatê Kurdistanê bibûn û piştî serhildana not û yêkê zivirîbûn Zaxo. Kêmekî meyildarê Zimanê Kurdî bû. Ji bû amêr û pêwîstiyên dibistanê û xwendevanan ez çûm cem Îsmet. Me pênûs û defter kirîn lê, me kir û nekir me depê nivîsandinê peyda nekir. Me depek spî kirî, Îsmet ji me re boyaxa reş lêda û em hatin wargehê. Me kolikek mezin çêkir, şûna kursiyan me rêzên keviran danîn, jixwe mêze ranê zarokabûn. Bi arîkariya komîteyên taxan û rêvebertiya wargehê biqasî karîna xwe me zarok peydakirin û ji refa seretayî ya yêk wekû fermî me dest bi perwerdeya dibistanêkir.

Wekû destpêk, ji her wargehê sê mamosta hatin kifşkirin. Li Şeraniş ez wekû mamostayê Zimanê Kurdî, Evdilselamê Zêwkî wekû mamostayê Bîrkarî û Emîn (Hewar)ê Şirnexî jî wekû mamostayê wêne û muzîkê hatibûn erkdarkirin.

Ne me xwe û ne jî gel em mucid[22] digirtin. Em pir seresere û derbazer nêzî dibûn. Li wargehek dibin gefên qirkirinê de, dibistan kolik, kursî kevir û mêze ranên zarokan. Xwendevanên me bê rêkûpêk û ne li berketîbûn. Ne defteran têra wan dikir û ne jî pênûsan. Me pênûsek têxist sê qet û li sê xwendevanan belav dikir. Me per û pero defter didan wan. Dîsa em bipêre ne digihatin. Dixwazim bîranînek ya xweya wan rojan vebêjim;

Rojekî ji rêvebertiya wargehê Hacî Eliyê Xwirsî bangkir min û ez bibez çûm cem. Eniya rêvebirê pîr qermiçîbû û awrên tûj ji min

20 Kavram, gotin.

21 Raman yar, kesê hej ramandinê dike.

22 Cidî.

vedidan. Hacî Elî, bi dengek aciz got;

"Gazindên gel di derbarê te de hene Seyda."

M. Şîrîn:

"Di kûjan dabaş[23]ê de Hevalê Hacî?"

"Gel dibêje; we navê mektebê guhertiye. Navek li mektebê kirine û ne em û ne jî zarokên me dizanin bêjin."

"Navê mektebê, bi Kurdî 'dibistane' hevalê Hacî."

"Haa.. Aha ewan jî tiştek wisa digot. Te got; 'zivistan'?"

"Na heval, dibistan."

" Aha xoce, hey xwidê ji te razî, mane ez nizanim bibêjim, ma rebenên zarokan yê çawa bizanibin? Dîsa wekî kevin bila mekteb be û xilas."

### Hevdîtina bi dewleta Turk re

Berevajî dewleta dagirker û hevkarên xwe fik[24] kirîn, koçberên wargehê serhişkî dikirin û ji bilî PKK'ê hukmê kesî ne dipejirandin. Fikên dewleta Turk ji bin ve xwirimîbûn û dûyek reş li ser kavlên wan ketibû. Dewleta Turk, bi destê xwe bi hezaran kes avêtibûn himbêza dijminê xwe. Bi nezanîn av ji aşê PKK'ê re kişandibû. Ev jî bibû sedemê kîn û hêrsek mezin. Ji bû fika wê bi destê xwe avakirî xira bike û tola xwe rake, şev û roj wargeh dida ber top û hewanan û bi balefir û firokan derdora koçberan bombebaran dikir. Li gel êrîşên leşkerî, bi arîkariya partiya mala Berzanî dilxwede hewldanên siyasî jî êxistibûn di dewrê de. Endamê komîteya navevd û berpirsê Zaxo yê PDK Ebu Enter, ji rêvebertiya wargehê re xeber şand û got;

"Dewleta Turk dixwaze bi gelê wargehê re hevdîtinê pêkbîne."

Rêvebertiya wargehê bigoman nêzîkê daxwazê bibû lê, PDK ling dabû ser. Nûnerê PDK'ê di dewam axaftina xwe de got;

"Ez ji we re soz didim vê hevdîtinê wekû hevdîtinek siyasî ji raya giştî re deklere bikim."

Li ser sozên Ebû Enter, rêvebertiyê ji her du wargehan çil kesan hildibijartin û li navendek ya PDK'ê ya Zaxo hevdîtinê destpêkir.

**Lewend Özgûn (Lewendê Heso yê Ziravikî**) vedibêje;

"Destpêka heyva Tebaxê bû. Em sibhê zû çûn Zaxo. Pêşmergeyekî em birin navendek ya PDK'ê. Li her cihê nobedar danîbûn. Gotin di cêhdebe, li derdora navendê çûk ne difirandin. Li

---

23 Mijar. Mijar, bêjeyek çandiniye, ji 'mişar'ê tê. Dabaş, ji dabeşkirina beşe tê û giştiye.

24 Plan.

eywanekî em dan rûniştandin û li pêşiya me mêzeyek yê komîsyonê danîbûn. Piştî demekî endamê komîteya navevd û berpirsê Zaxo yê PDK Ebu Enter hat û li tenişta mêze rawesta. Zilamê yêxtiyar û şaşikek sohra melkebî serê wî dinixwimîne, bi awayek minetî got;

“Hûn hêstên dagirkeran dizanin. Ew her tim bi awayek piçûkdîtî nêzîkê bindestên xwe dibin. Hûn kêmekî bi tehemûl nêzîk bibin ji we re baştire” û hema piştî van gotinan sê kes ketin di hundir de.

Yêk kamarevan, yêk werger û zilamê cilên pêşmergeyan li ber, navser û keçel jî dilxwede hevdîtinvanbû. Zilamê keçel, Ebû Enter û werger li cihê komîsyonê rûniştin.

Bi hatina Ebû Enter re mesele hatibû fêhmkirin. Nasnama Ebû Enter ji aliyê me ve baş dihat zanîn. Ew, hevkarê MÎT’a Turkan bû û her kesî ev dizanî. Piştî dilxwede hevdîtinvan kesek tenêbû û cilên pêşmergeyan liberbûn, finasên wan baştir hatin fêhmkirin. Bi hêstên şidhayî me dest bihevdîtinê kir.

Endamê MÎT’a Turk;

“Merheba hûn bixêr hatin. Jixwe em hemî turkî dizanin, emê sohbeta xwe biturkî dewam bikin.”

Şandeya Qampê;

“Em biturkî nizanin.”

Zilamê keçel û ji bû keçeltiya xwe binixwîmîne biskên dor guhê xwe dirêjkirîn, bitevz beşişî û bi destên xwe zilamê Zaxoyî nîşankir û got;

“Min tedbîrên wê girtine, bi xwe re werger aniye.”

Şandeya wargehê;

“Baweriya me bi wergerê te nayê. Emê werger ji nav xwe kifş bikin.”

Endamê MÎT’a turk got;

“Hay hay xem nake, dibe.”

Şandeya wargehê ez wekû werger kifşkirim û min di navbera endamê MÎT’ê û aliyê wargehê de wergervantîkir û gotûbêjê destpê kir.

Endamê Mît’a’ Turk bihêlwestek qure û gefxwar dest bi axaftinê kir;

“Dewleta Turk, dewletek demokrat û adile. Piştî we her tişt hatiye guhertin. Êdî zulm, îza û îşkence nemaye. Rêya we berê xwe dayiyê, rêyek ne kifş û xetere. Ya din jî baweriya xwe bi wan rizîlên (qesta wî PKK ye) we xwe dayî ber siha wan neyînin.”

Bi gotina “rizîl” re yêk ji aliyê wargehê rabû ser xwe û ji cêh kurveda zilamê turk û bi turkî got;

“Tu û bavê xwe rizîlin.”

Ebû Enter ket di navberê de. Werhasil piştî gengeşeyekî

dîsa her kes li cihê xwe rûnişt. Êdî meyla gotûbêjê hatibû guhertin û hingî ji MÎT'ê dagirker dihat bisiyanet taxivî û çi dihat devê aliyê wargehê digotin.

Endamê MÎT'ê;

"Ev kesên hûn li cem wan dimînin (dikar[25]a PDK dikîr) ew bixwe li cem mene. Heke em pariyek nan nedin wan, ewên ji nêza bimrin. Heke em bixwazin, emê we bibin û ti hêz nikare dengê xwe jî bike."

Zilamê turk, bi ser milê xwe re li Ebû Enter nêrî û Ebû Enter jî bi serê xwe gotinên wî erêkirin. Piştî malîvanê KDP[26] yî, bi hêlwestek melaq gefên MÎT'a Turk erêkirin; zilamê turk dengê xwe bilindtirkir û gotinên xwe ajotin;

"Xeyalên hûn li dûv ketîn pûç û valene".

Serîwerhasil me danek yê rojê dikara mafdarîtiya doza xwe û zulm û neheqiya dewleta Turk kir û wî jî hewlda wekî tiştek ne qewimiye me qayil bike û vegerîne.

Di dawiyê de zilamê turk, bi hêlwestek heyfî û tevzvan lêkir;

"Dibe kû hûn kurd pir merd, mêrxas û qencbin lê, qetiyen hûn nabin mirovên siyasî" û dawî li civînê hat."

Ebû Enter, wekî soz dayî, hevdîtin ne dabû çapemeniyê û PDK'ê jî hêlwesta xwe ya jixwe neyînî dijwartir kiribû. Piştî hevdîtinê du rojan, endamên MÎT'ê li bazara Zaxo li dûv wergervanê şandeya koçberan Lewendê Heso ketibûn û gêrîlayên PKK'ê ew bizorê rizgar kiribûn. Jixwe saziya UNHCR'a DY bê rêkûpêk û ne jidil nêzîkê koçberan dibû û gel, xwarin û vexwarin ji kîsê xwe ji Zaxo peyda dikir. Piştî hevdîtina bi MÎT'ê re, PDK ambargoyek hişk danîbû ser wargehê û ne dihişt tiştek derbazî nav wargehê bibe.

Hêlwesta koçberan ya bi hevdtina MÎT'a Turkan re hîviya dawî ya PDK ya mala Berzanî şkandibû û zêde acizkiribû. Benê jixwe xav yê di navbera partiya mala Berzanî PDK'ê û koçberên wargehê de qetandibû. PDK, hîviya xwe ji koçberan birîbû û embargoya li ser wargehê hişktir kiribû. Neyartiya xwe ewqas şidandibû, ji gelê wargehê bêş[27]a tiştên dikirîn distand. Wekû mînak; kesek kîsek ar ji Zaxo dikirî, di xala lêgerînê de pêşmergeyên PDK'ê bêşa wî arî ji xwediyê wî distandin. Bi mihaneyên pûç û betal koçber binçav dikirin û embargoya li ser wargehê fermîkiribû.

Li ser vê nêzîkatiyê bi armanca protestokirina PDK'ê, refek sed kesî li neqeba Dêrkarê, li ser rêya qampê destbi rojiya

---

25 Behs, qiset.

26 Kurdistan Demokrat Partîsî- navê PDK bi turkî.

27 Bac, vêrgî.

birçîbûyînê kirin (01.08.1994).

Hêzên xwecih çalekiya rojiya birçîbûyînê ya Zaxo hemsal girtibûn û mucidtir nêzîkî wê çalekiyê bibûn. Di çalekiya Zaxo da bîryardartiya encam girtinê ya wan mirovan dîtibûn û di sêyemîn roja çalekiyê de her du şertên çalekvanan ya 'berdana girtiyên ji wargehê û rakirina ambargoyê' pejirandibûn û çalekvanan jî dawî li çalekiya xwe anîbûn.

Li ser sozên PDK'ê, çalekvanan dawî li çalekiya xwe anîbû ema, benda di navbera hêzên xwecih û gelê koçber de her kû diçû kûrtir dibû. PDK'ê, li sozên didan xweyî dernediket û zextên xwe zêdetir dikirin. Ji bû dest ji PKK'ê berdin gef li koçberan dixwarin û ew biqirkirina turkan tehdît dikirin. Hemwextê gefên PDK, turkan jî hê bêhtir derdora wargehan gulebaran dikirin û bê navber balefirên cengê bi awayek nivz bi ser wargehê re difirandin. Ji bû pîrozbahiya Cejna Vejînê newe lidarxistin û koçberan çavtirsandî bikin; roja pazdehê Tebaxê bibalefirên cengê derdora wargehê bombebarankirin. Û dilxwede saziya herî mezin ya mihacirên Cîhanê UNHCR jî polîtîkaya 'çaverêbe û bibîne' dimeşand û ji dûr ve temaşeyî kirinên qirker dikir.

## Pîrozbahiya Cejna Vejînê

Gêrîlayên Hêza Rizgariya Kurdistanê di bin serdartiya fermandarê mezin Mehsûm Korkmaz - Hevalê Egît- de, pazdehê Tebaxa sala 1984'ê avêtin ser Diha navçeya Sêrtê û bi wê çalekiyê li hember dagirkertiya turk şerê çekdarî yê rizgariyê îlan kiribûn. Ji wê mûnasebetê gelê Kurd, pazdehê Tebaxê wekû roja ji nû ve 'Vejîn'a xwe pejirandibû û wekû 'Cejna Vejînê' her sal bi şahiyên mezin pîroz dikir.

Deravê roja Cejna Vejînêbû. Hêst difûran û kelecana koçberên Xantor derketibû lotkê. Ema wargeha koçberên xwe ji cejnek azad re amade dikirin di bin siha lûleyên artêşa Turk de bû û bihêsanî dikare were tehmînkirin kû dewleta Turk û hevkarên xwe di dema pîrozbahiyên Cejna Vejînê de qirkirinekî plan dikin. Rêvebertiya wargehê ya fika dijmin û nûkeran ferqkirî, pîrozkirina Cejnê ji bû rojek ne diyar bi paş ve dabû. Di wê navberê de cihek destdayî parastinê diyarkiribûn û bi awayek veşartî dest bi amadekartiyên pîrozbahiyê kiribûn. Şeva nozdehê Tebaxê, di dolek ya di navbera her du wargehan de cejnê destpê kir!

Gel germbû û bi awayek azad ew pîrozkirina cejna wan ya yêkemînbû. Ji hûr û giran hemî koçberên wargehan li cêhê cejnê gihatibûn hev. Kelecan di lotkê de bû. Dibêjîqey ew koma serhildanvan di cîhana çîrokan de jiyan dibû. Ew ala ji berya du

mehan ne diwêrîn di malên xwe de jî bihewînin, niha di destê wan de bû û bê minet ji hewa ve libadibû. Ew cil û pêlavên dibûn sedema kuştina wan, niha bi şêwazê navlixwe bidin, bejna wan bê tirs dixemiland. Tilîliyên jin û dayîkan bi awayek azad dol û niwalên Heftanîn dişarandin û deng li lotkeya Xantor têxist. Milîsên Gabar bendên quntrolê li ser rêyên derdora cihê pîrozbahiyê danîbûn û gotin di cêh de be, ne dihiştin çûk bifire. Mamostayên ecemî yên bi israra fermandarê biryargeha pêncemîn hevalê Rizgar, bi awayek kor û kulek û ji xwe ne bawer dest bi dersdayînê kirîn; biqasî karîna xwe ji xwendevanan refên dîlan û mizûkê hazirkiribûn û ew jî çaverêyî dora xwe li tenişta dikeyê hatî amadekirin rawestabûn.

Her kesî xwe di xewnek bi nirxên azadiyê hatî xemilandin de hîs dikir û dikeyê bi ronahiya jeneratorê hatî ronahîkirin, wekî baxçeyê buhiştê zen dikirin. Durişm û tilîlî tevlîhev dibûn û dengê staranên xwendevanên ecemî didewisandin. Refa xwendevanên dîlanvan yên hunerê xwe bi çekên rastî pêşkêşkirîn, çepkek mezin ji dê û bavên xwe girtibûn. Temaşevanan bi heyrantiyek mezin temaşeyî hunerê zarokên xwe kiribûn û sefta singan dil zevt ne dikirin. Ne tenê koçberên wargehan, ji Zaxo û gundên derdor jî gel berbi cihê çalekiyê ve herikîbû û piştî lêgerîn û venêrîna asayîşa wargehê derbazî cihê çalekiyê bibûn. Ew bêhna dê li weledê xwe xweyî dernakeve, heşra şadîtiyê, lehiya heskirinê hat û xwe pesart!

Fermadarê eyaleta Bohta hevalê Cemal -Murat Karayilan- ji nişkan ve ket di dike de. Destpêkê kesî ji çavên xwe bawer nekiribû û girse şakis mabû. Lê piştî bêhnekî, girse di carekî de rabibû jipiya û dengê tilîlî û durişmeyan li singa Xantor diket û di guhê dagirker û nûkeran dikir zirme zirm. Piştî merheba û xêrhatinê gêrîlayê Fermandar, li ser pêşketinên dawî yên siyasî, armanc û girîngiya serhildan û rêvantiya wan ya azadiyê axaftinek xweş û bikelecankir û di heman şevê de ji cihê pîrozbahiyê veqeta.

### Ref Safî Dibin

Dewleta Turk, biniyet û armancên cuda berê wan mirovan dabû Başûr. Hevkarên xwecih jî bi heman hîviyan nêzîk bibûn û zenkiribûn kû xwilam li xwilamên wan zedebûne. Dewletên Yêkbûyî, dilxwede UNCHR jî bi polîtîkaya nandoziyê hevkartiya wê xetê dikir. Sêtiya fêris ji xwe bawerbû û ne hizirîbûn PKK ya bikaribe wî gelî ji nav kulabên wan bigre û bikişîne. Heta bi pîrozbahiya Cejna Vejînê, lewaz jî be bi serxistina polîtîkaya xwe bawer dikirin û ji bû ser bikevin hewlek bê eman dimezaxtin. Dewleta dagirker bi bombardimanên xwe, hevkarên xwecih bi malîvantiya xwe û UNCHR jî bi çadir û arê xwe zextek bê eman dimeşandin. Lê karwanê

koçberan biryara xwe dabû û ref girtina li cem Tevgera xwe ya azadiyê hilbijartibû. Biryardartî û bê tirsiya koçberan, hîvî û polîtîkayên vê sêtiyê ji bin ve xwirimandibûn û dest û lingên wan tevlîhev kiribûn. Êdî ref safî bibûn. Ew gel û ew wargeh ya PKK'ê bû. Polîtîkayên xapandinê encam ne girtibûn û PKK'ê koçber ne sipartibûn teqna Başûr. Di wargehekî de kom kiribûn, sazî û dezgahên wan dabûn avakirin, rêvebertiyek ji nav wan dabû hilbijartin û bandora xwe ji tevayê cîhanê re ayankiribû.

Êdî hevsengî hatibûn guhertin û hêzên desthilatdar û nûkerên wan hêlwest û polîtîkayên xwe dubare bi çav re derbaz dikirin. PDK, ji berya mezinên xwe ketibû tevgerê û beyaniya piştî pîrozbahiyê, bendên li ser rêyên dihatin wargehê xwirtir kiribûn û embargoya xwe wekû fermî ayan ragihandibû. Piştî pîrozbahiyê sê rojan (22. 08. 1994), zilamek dirêj, lêhv gilol û reşik bi karwanek tirimpêlên 'UN' li ser tenişta wan nivîsandî hat wargehê û banngkir komîteya karên jiderve.

Zilamê reşik, bi rûyek tirş û hêlwestek dijwar got;

"Ez rêvebirê giştî yê UNCHR'a Bexda yê me. PKK, rêkxistinek terorîste û niha hûn li qadek dibin quntrola vê rêkxistinê de ne. Hevkûfê me PDK ye û pêwîste hûn dakevin qadek di bin quntrola hevkûfê me de. Berevajî, em nikarin ji bû we tiştekî bikin."

Komîteyê hewldabe derd û merama xwe vebêje û zelamê zencî qayil bike lê, hewla wan beyhûde çûbû. Dema zelamê lêhv gilol û bê merîs, hewldida li tirimpêla xwe buhadar û lûks siwar bibe; eniya xwe qermiçand û bidengek gefbarkirî lêkir;

"Ez ne hatime li vêdê bi we re gotûbêj bikim! An hûnê aha niha bar bikin û herin geliyê Qiyametê, an jî.." bitiliya xwe ya reş û dirêj baregiha leşkerên Turk ya kêriya Reş nîşan da û zirtên xwe ajotin;

Em û hûn ji hev xilas û ji tiştên werin serê we em ne berpirsin" got û deriyê tirimpêlê hişk girt û çû.

Di hemwextê zirtên zilamê reşik de, firokên dewleta Turkan bi ser wargehê re bê navber dizivirîn û derdora kolikên koçberan wekû rasthatî bombebaran dikirin. Van bombebaranan di rojên dûv de jî bê rawestin ajotibûn û wargehên koçberan ji sê aliyan ve hatibûn dorpêçkirin. Xetertiyê xwe dipesart û digot; "ez hatim!"

UNHCR, di çavên koçberan de mezintirîn û adiltirîn hêza cîhanî bû û baweriya wan bi vê saziya her tim wekû rizgarvanê mihacir û mişhetan hatî naskirin bê dawî hatibû. Qet bawer ne dikirin, ev saziya dilxwede mirovyar yê hêlwestek bi vî awayî raber bike û dest ji wan berde. Ji hêlwesta dewleta dagirker û PDK wêdetir, ya Dewletên Yêkbûyî ew şaqis hiştibûn. Êdî her firok û balefira dihat, mirin barkirîbû û her kes ketibû heyra parastina ruhê zarokên xwe.

Dest ji avakirina çadir û kolikan berdabûn û piranî wextê xwe di bin kevir û şkeftan de derbaz dikirin. Artêşa Romê jî nemerdî ne dikir û bê navber didan ber guleyan û ji hewa ve jî derdora wargehan bi bombeyan dihingavtin.

Di navbera PDK'ê û YNK -Yêkîtiya Niştimanperwerê Kurdistanê- de jî şer û nexweşî hebû. Pêşmergeyên alîgirê YNK'ê yên dibin fermandartiya Seîdê Dêrkarî de, xwe sipartibûn qadên di bin quntrola PKK'ê de û li derdora qampê jiyan dibûn. Refek ya wan pêşmergeyan li neqeba gundê Şeraniş bicêh bibû û ya din jî li tenişta wargeha Şeraniş li ser rêya gundê Pîrbila bû.

Hefteya destpêkê ya heyva Êlûnê bû. Kesek Zaxoyî yê binavê Karwan, agahiya 'balefirên Turkan yê siba pêşmergeyên YNK bombebaran bikin' ji dizî ve gihandibû guhê rêvebertiya wargehan. Rêvebertiya wargehê jî pêşmergeyên dabaşa gotinê ji heman nûçeyê agahdarkiribûn û ji wan xwestibûn cihê xwe biguherin. Lê, pêşmergeyên YNK, agahî mucid ne girtibûn û ji cihê xwe ne livîbûn. Pêncê heman mehê du balefirên cengê yên dewleta Turk hatin û her yêkî cihek yê wan pêşmergeyan bombebarankir. Refa li neqeba Şeraniş felitîbû ema, ji refa li ber tenişta wargehê yazdeh kes hatibûn kuştin û ewqas jî birîndar bibûn.

Dewleta turk, qenciyek newe jibîrkirin li PDK ya mala Berzanî kiribû. Bi kuçekî du çûk kuştibûn. Hem bi awayek zindî hunerê xwe yê qirkirinê nîşa koçberên wargehê kiribû û çavên wan tirsandibû û hem jî peyama 'hûn nikarin li vê qadê jiyan bibin' ji ber PDK'ê ve dabû YNK ya Celal Telebanî.

Peyama bi wê qirkirinê hatî dayîn gihatibû cihên pêwîst. Ewlekariya wargehê di xeteriyê de bû û tedbîrên lezgîn dihatin xwestin. Rêvebertiya PKK'ê ya heremê û ya wargehan civîn li ser civînan lidar dixistin. Di manîfestoya PKK'ê de çi dibe bila bibe, merc çiqas tûj û dijwar jî bin peyva 'tenezûlê' cêh ne digirt. Ji BERXWEDAN'ê wêdetir bijartekek ne dihat nivîsandin. Li Başûr û biteybet li herêma Behdînan, MÎT'a turkan difûra. Hema bibêje her der, her tişt dibin quntrola wan de bû. PDK'ê serê xwe êxistibû di ciherê wan de û ji derveyî fermana wan gavek jî ne tavêt. Jixwe bi nizbetê dewleta Turk, berê koçberan dabû teqna Başûr. Dibin rêvebertiya PKK'ê de û li qampekî kombûn, di hesabên wan de tinebû. Jixwe harîtî û bê mehwertiya wan, ji wî hesabê wan yê şaş derketî jêder dibû.

Ew gelê destpêkê bi kelecana azadiya nîhayî jiyan dibû, hêdî hêdî bi têkoşîna dirêj û dijwar ya li pêşya xwe dihesa. Ji wê xewna xweş zû hişyar bibû. Evder Rojhilata Navîn bû! Berdelê jiyanek azad buha û giranbû. Bizanebûn, ne bizanebûn karwanê koçberan jiyana azad hilbijartibû û neçarbû êş û elema wê jî bikişîne.

Piraniya koçberên wargehan ji eşîra Goyan pêk dihat û gundên wan li ser sînor cêh digirtin. Têkiliyên wan û Başûr kûr û piranî têkiliyên xwînêbûn. Xizmên hevbûn. Nîvê eşîrê li Başûr û nîvên din li Bakur cêh digirt. Di dema xwe de piraniya wan bi awayekî têkildarê PDK'ê bibûn û ji bû wan ferqek mezin di navbera PKK'ê û PDK'ê de tinebû. Bi dehan bav û birayên xwe di nav PDK'ê de şehît dabûn. Xizmet kiribûn, pêşmerge di mala xwe de hewandibûn û tişta ji destê wan hatî di wê rêyê de mezaxtibûn. Heta hingê di zena wan de her du ya jî ji bû rizgariya welatê wan têkoşîn didan û Kurd bûn. Ferqa kifşker, PDK hêzek Başûrî û PKK Bakurî bû. Sedemê PKK'tiya wan jî hema bêje ewbû. Jixwe sedema ewqas dilniya û bê dudil berê xwe dayîn Başûr jî ev hêstbû. Lê, niha heman hêzê mil dabû milê qirkerê wan û ji bû qirkirina jin û zarokên wan dixebitî. Evê xiyaneta PDK, hem xeyalên wan zû şkandibûn û hem jî niwalên kûr êxistibûn di navbera wan de.

Dengên ne razî û dijber di nav koçberan de jî hêdî hêdî bilind dibû. Biteybet qismek yê Şirîşeyiyan û hin derdorên din, yên ne bizanebûn û bi xeyalên cuda derketîn wê rêyê, heyîna hêzên xweparastinê yên di nav wargehê de ji bûyeran berpirs digirtin û dixwestin xwe bisipêrin bin bazkên UNHCR û girêdayî wê wargehê bispêrin serdestiya partiya mala Berzanî. Ew ji xefk û teqna hatî vedan bê agahbûn û demkurt li rêvantiya xwe dinêrîn. Lê, giraniya koçberan û biteybet yên ji derveyî gundiyên gundên li ser sînor û ji hundir hatîn, di têkoşînê de bê dudilbûn.

Tam di wê demê de, li wargeha Şeraniş kesek ji gundê Nêrweh yê bi navê Newroz, ji sedema nexweşiyek navxweyî ji aliyê kesek din yê Nêrwehî ve hatibû kuştin. Evê bûyerê hêstên gel hê bêhtir şidandibûn û bandorek neyînî li ser rojeva koçberan kiribû.

Sibehek sar ya nîvê hefteya duyemîn ya heyva Êlûnê bû. Barana destpêkê ya Peyîza salê barîbû û hunikatiyek nerm bi xwe re anîbû. Dûyê ji tenûran bilind dibûn, bi singa zinarên Xantora Heftanîn re hawadiket û xwe li peravên ezmanan dida. Dengên birûskan û yên top û balefirên Turkan tevlîhev dibûn û bêhnên jandar bi koçberan didan jiyandin. Wan mirovên zarokên xwe ji boseya agirdar ya dewleta Turk rizgarkirîn, xwe di nîvê boseyek pir xelek de peyda kiribûn. Hêst şidayîbûn û hîvî bi zinarên çiyayê Heftanîn ve hatibûn hilawistin. Fermandarê biryargeha pêncemîn ya kû wargeh wekû fermî girêdayî wî ye, rêveberên her du wargehan, rêhspiyên gundan û kesayetên erkdar li biryargeha xwe kom kiribûn. Fermandar Rizgar, bi dêmek aciz ema jixwe bawer agahiya 'dibe kû siba balefirên artêşa dagirker wargehan bombebaran bikin' bi beşdarvanên xwe re parvekiribû. Ev agahî li koçberan xerîb nahatibû û jixwe çaverêyî wê bûn. Awrên her kesî bi lêhvên

tenik yên Rizgar ve daleqayî mabûn û çaverêyî gotinek ya xêrêbûn. Çend pêşniyarên xwediyên wan jî ji wan ne bawer hatibinkirin jî lê, her kes çaverêyî wê gotina xêrê ya ji devê fermandarê biryargehê derkevebû.

Fermandar Rizgar;

“Îşev bi reş ketinê re divê her kes destê zarokên xwe bigre û berê xwe bide deşta Bêsivê! Ev çalekiyeke. Armanca me cara duyemîn li hember dagirker û nûkerên wan serîhildane. Divê em bi wan dubare bidin îspatkirin kû gelê wargehan serê xwe nayêxe di ciherê ti dagirker û nûkerên wan de. Em rêvanên azadiyêne û ji bilî jiyanek azad ti bijartekên din di pirtûka me de ne hatiye nivîsandin. Wekû rêkxistin, em bi we re ne û htya dawiya bê dawî di her şertî de emê parastina jiyana we bigrin ser xwe.”

Axaftina Fermandarê gêrîla rûyên qermiçî, bê hîvî û bê biryar geşkiribûn û xwînê êrîş kiribû dêmên zuwabûyî. Dibêjîqey her kes çaverêyî vê biryarêbû. Ji xetên rûyê temsîvanên koçberan kifş dibû kû her kes wekû pêşin tevlî pêşniyarê Fermandar bibû û gotûbêj li ser herambû. Pêşniyara Fermandar bi tevayê dengên beşdervanan bibû biryar û bilez û bez xwe avêtin wargehan. Gel, birêya komîteyên taxan ji biryarê hatibû agahdarkirin û koçberan bilezgînî dest bi amadekartiya koçek din kiribû.

Piraniya şêniyên wargehan nizanin yên bi kû ve jî herin. Tenê dizanîn, kêm jî be yê ji hukmê top û tangên Turkan kêmek din dûr bikevin. Dibe kû êdî balefir jî newin ser wan. Kêferata dûr ketina ji mirinê, ew şad, bihêz û bilez dikirin. Wekî carikên caran dîsa ker û hêstirên xwe kurtan kiribûn û teng, bersing û qûşên wan şidandibûn. Teketor, pîkab û tirimpêlên nas û dostên gundên derdor jî hatibûn bi hewara wan ve. Çadir û tiştên giran li ker, hêstir û tirimpêlan barkiribûn. Dayîkan zarokên hûr dabûn milên xwe, ciwanan xwe bi çek û rextan pêçabûn, milîsên Gabar ewlekariya rê girtibûn û ya star qumên ketibû kêreyê Dêrkara Ecem.

Ew koçbertiya di nav koçbertiyê de yêkemîn, salnama Mîladî wekû dazdehê Êlûna sala hezar û nehsed û not û çarê qeyd kiribû.

Şevê nû Zaxoka Behdînan dabelandibû. Zeraqên ji lmepeyên zerhimî vedadina efsûnek rakêş li tarîtiyê bar dikirin. Sêzdeh, çardeh hezar jin, zarok, temendar ketibûn di neqeba gundê Şeraniş de. Bê mehwer di fitlopêçkên kêreyê Dêrkarê de dirijan jêr. Berê xwe dabûn oxirê û pişta wan li feleka xayîn. Dengê giriyê zarokan, orêna çêlekan, barebara mêh û berxan û zirina keran dengên teqreqa rêmorqên teketoran didaqurtand û bê dengiya şevê tarûmar dikir.

Tahir, ji gundê Zivinga Şikaka ya Gabar bû. Dema cara duyemîn Gabar ji aliyê Roma Reş ve hatî dagirkirin û her tiştê wan şewitandîn, dest ji jin, zarok û malbata xwe berdabû û bi rêya

Hevalan derbazî wargehê bibû. Yêk ji Zigurdên Gabare bû û bi hevalên xwe re wekû asayîşa wargehê kar dikir.

**Tahirê Gabarî** vedibêje;

"Em ji pêşya gel hatin. Hem ji bû ewlekariyê û hem jî ji bû gel rê şaş neke û berê xwe nede nav nehiya Dêrkarê. Em li duryana pişta gund sekinîn. Rêyek ax ber bi Başûrê Rojhilatê Dêrkarê ve ji rêya qîr vediqeta û me berê gel dida wê rêyê. Heşir bixwebû! Rê dûrbû û her kesî ji karîna xwe pir zêdetir bar hilgirtibû. Zelaman pêwîstiyên malê kiribûn piştî û dabûn pişta xwe. Dayikan li gel zarokên xwe tûrên mezin hilgirtibûn. Her kes westabû û ji hal ketibû. Lê, bûyera wê şevê herî zêde ez bandor kirîm û qet ji bîra min neçûyî serhatiya dayikekêbû.

Karwan boşbû û hema bêje her kes bi awayekî barkirîbû. Lawir, mirov, seqet, zarok her kes û her tişt tevlîhev bibû û şev tarîbû. Hev wunda kirin pir hêsanîbû. Jixwe pir kesan jî hev wunda kiribûn û heya ne bibûya roj hevdîtin jî ne gengazbû. Ji bû dayîk zarokên xwe wunda nekin û di ser êşa xwe de êşek din jî jiyan nebin, hewlek bê hemta dimezaxtin. Di wê navberê de dayikek li çavên min ket. Du zarok li ber milabûn, yêk li ser qulîkabû û tûrek bidêvre tişt jî li piştabû. Dayika biser navsertiyê re kêmekî temendar, di bin barê giran de xwûs bibû. Her sê zarok bi hev re û bê mehwer digirîna û dayîka neçar jî bi hêstirên çavên xwe tevlî wan bibû. Wî dîmenî wêrana gundên Gabar û reva zarokên min li ber çavên min zindîkir. Hinavê min şewitand û di tevlîbûyîna giriyê wan de min jî nemerdî nekir. Me dayîk li cem xwe sekinand, tirimpêlek rawestand û biçi kul û halî bi zarokan ve li ser barê tirimpilê ediland û şand."

## Wargeha Bêsivê

Tarîtiya şevê û boşîtiya karwan, xaka li ser danîn daqurtandibû. Ti kesî nizanî cihê lê çawane û bi ronahiya rojê re yê bi kûjan dîmenî re rû birû bimîne. Piştî keşafa sibhê tarîtiya şevê quliband, dîmenek biser asayî re derketibû holê. Ewqas mirov bi lawir û tiştên xwe ve, bê rêkûpêk li deştekî hatibûn reşandin û gotin di cêh de be, deşt nixwimandibûn. Axa deşta zexim di bin lingan de hatibû hêran û bi lêketina bayê re girên tozê deşt mijdar dikir. Toza vegerayî mijek tîr wekî taviya berfa lewitî di barî ser deşta Bêsivê. Wekî kunmûriyek hêlîn xirabûyî, bi hezaran mirov, lawir di nav hev de mabûn û dîmenek kilamet li deşta şaqis barkiribûn. Bi berbangê re dawiya karwan gihatibû deşta Bêsivê. Deşta Bêsivê; nêzî bîst kêlûmitran li Rojhilatê Zaxo û pênç, şeş kêlûmitran jî diketa Rojhilata Başûrê nehiya Dêrkarê. Ji sedema deşt nêzîkê gundê Bêsivê bû û di nav sînorê gund de cêh digirt; ew wargeha

wekû ‘Qampa Bêsivê’ bihata binavkirin.

Her gundiyê ji gundên derdor çavên xwe ji xewê vedikir, bi dîmenek awerte re rû birû dîma û vediciniqî. Tu kesî wate nadabû hatina wan mirovên bê vexwendin. Gundiyan civat li ser civatan li dardixistin û şîroveyekî ya din betal dikir. Hinan wekû artêşa cinan şîrove kiribûn, hinan ew wekû hêzek dagirker û talanker nirxandibûn û aqilmendan jî ji zû ve gund berdabûn û ber bi bajarên derdor ve tif kiribûn binên lingên xwe. Heta mesela wê koma mirovên birû hatibû fêhmkirin, ji tirsa nava wan bibû dew.

Bêkû li westandin, êş û janên şeva bûrî raman bibin, bi hêz û enerjiyek ne asayî wekî mûriya reş dest bi liv û tevgerê kiribûn mihacirên welatê xwe. Ji sedema kon bi hev re û bê rêkûpêk li tirmpêlan hatibûn barkirin, tu kesî nizanî konê wî li kûye. Jixwe konê xwe dîtibûya jî nas ne dikir. Ji ber kû kon hemî gewrbûn û wekî hevbûn. Lê, dîsa jî xweyî kon li konên xwe digeran û bi israr dixwestin konên xwe peyda bikin. Yên bişans û konê xwe zû peydakirîn, ji zû ve avakiribûn û ji bû taştê jin li deştê ketibûn û li avê digeran. Yên bê kon jî li wan kaşan ketibûn û ji bû kolikekî çêkin, li daran digeran. Her kes ema her kes binav hev ketibûn û yên ji cihê xwe vediqetan, cihên xwe wunda dikirin û heta dubare zarokên xwe peyda dikirin demjimar bi sere derbaz dibûn.

Ew komika mirovên westandin, bê xewî, birçîbûn û jixwe kerixandin[28] çiye nizane, heta roj gihat cihê danûpeza di deşta Bêsîviyên reben de bajarek ji dar û paçan ava kiribûn. Gundiyên derdor li ser pêtî û banên bilind kom bibûn û bi awrên matmayî li wan mirovên bê tebat dinêrîn. Şêwazê hatin, bicêhbûn, liv û tevgera wan, gundiyên derdor şaqis hiştibûn. Kirinên wan mirovên xerîb, sînorên xeyalên gundiyên xwecik kun dikirin û dûr vedidan. Herkesî pirsên; “ev kêne, di di deravê zivistana reş de li çi digerêne, bi jin û zarokan ve berê wan li kûye” jixwe dikirin û pirsên wan bê bersiv diman.

Danê êvarî ya heman rojêbû. Erkdarên rêkxistina navxweyî ji zû ve dest bi kifşkirina cihê sazî û dezgahan kiribûn. Tîkên êlekên wan liba dibûn û amadekartiyên avakirina wargehek mayînde hatibûn destpêkirin. Sînorên taxan kifş dikirin, cihên kolikên semtan, dibistanan, kolika gel û mêhvanxaneyê amade dikirin. Jixwe ji zû ve milîsên Gabar li her du aliyên wargehê kolikên asayîşê avakiribûn û bicêhbûna xwe qedandibûn jî.

Ava sar û zelal ya sûlava Şeraniş û kehniya şkefta Bihêrê di şûn de mabûn. Ji xeynî birka kêlûmitreyekî bi ser wargehê re, av li

28 Westandina herdemî, bê bawerî, dest ji xwe berdan.

deşta Bêsivê peyda ne dibû. Ji fecrê ve jin, zarok, zelam çi firax bi destê wan ketibin, li ser rêya wê birka ji çalek ya axê pêktê. Wekî rêka mûriyan rêz bibûn û av dikişandin. Ji bû kişandina avê, ne amadekartî û ne jî firaxên pêwîst li ber destên wan hebûn. Bêrîvanan bi aşîrkên şîr, kevaniyan bi meşkan û hin kesan jî bi bîdonên pênç lître bê westan ji çala lewitî av dikişandin. Di rastiyê de ew çala bigemar, ji birkê zêdetir wekî bêrmekîbû. Ya rast, ne bêrm jî bû. Birk, çar aliyê wê dîwar kiriye, binê wê reqifandiye û kuna paqij kirinê heye. Bêrm jî ji birkê pir firehtir û kûrtire û dora wê dîwar kiriye. Ya em dikara wê dikin, di erdek çal ya ax de, hin ava kombiyî ye. Di tevayê havînê de, ew av di wê çalê de genî bibû û ji lawirên kedî û kûvî re delavtî kiribû. Kevzî, kurmik û mêşan rûyê ava genî nixwimandibû. Lê dîsa jî bi hêsanî mirov dikarî şadîtî û keyfek veşartî ya di hundirê vê komika mirovan de ferq bike û bibîne. Sedem, kêmek jî be dûr ketina ji mirinê û hêstên berxwedanêbû.

Gera cîhanê bê rawestandin dewam dikir û rojan hev tajot. Karwanê koçberên li ser axa welatê xwe, qonax li deşta Bêsivê danîbûn û di nav toza bê merîs de digevizîn. Rojekî Ehya yê Bilehî -Goyî ji Yehya re ‘Ehya’ bikartînin- bi kerê xwe yê hişîn diçe avê. Dema firêxên avê dadigre ker dimîze û mîza wî diherike di nav ava korta lewitî de. Ehmet Orte Dîrekê Ziravikî jî li wêdê ye û xwe ne qayil dike. Di derbarê paqij ne girtina avê de Orte Dîrek, Ehya yê beden pehn rexne dike. Ehya jî rexneyên wî napejirîne û dibezin hev. Wê demê wekû erkdarên asayîşê du milîsên Gabar jî li wêdêne û wan ji hev vedikin. Ev bûyer bi leza têza tifekê digihê guhê rêvenertiya wargehê. Rêvebertî, wekû şahidên bûyerê bang dike milîsên erkdar û wan guhdar dike. Erkdarên destûr nadin toz deyne ser wujdana wan, wekû aliyê neheq Ehya nîşan dikin û ev tewambartî Ehyayê Bilehî radike ser lingên paş. Zilamê çav li serî zivirîn û kef û kinc di lixaban de zuwa bûyî dibêje;

“Ez bûme mêr û zigurdên Gabar gilhê min kirine, an ezê di vê qampê debim, an jî ew!”

Ji bû bûyer mezin nebe û encamên ne xweş bi xwe re neyîne, rêvebertî kolika milîsên Gabar derdixe ji derveyî wargehê û bi vî awayî kela di hinavê Ehya de dadikeve.

Li hember wêrîn, xweragirî û rika wê komika mihaciran dagirker, hevkarên wan yên xwecih û saziya fêris ya UNHCR’a Dewletên Yêkbûyî heyîrî mabûn. Berxwedan û vîna wê komika têr bela, sînorên xeyalên wan kiribû serad û mejiyê wan dihingavt. Ji bû pêşiya karwan bigrin, karwaniyan bikerixînin û vîna wan bişikînin ti sînorên exlaqî nas ne dikirin.

Li Bêsivê nû şeş rojên wan qedabûn. Beyaniya şevek hunikbû. Ewrê kerespiyê berfê daketibû ser deşta Bêsivê û mizgînya

zivistanek dijwar radigihand. Koçberên serên xwe ji bin kolik û xîbetan derdixistin, lûleyên çekan li çavên wan diketin û vediciniqîn. Pêşmergeyên partiya mala Berzanî, gundiyên derdor jî tehrîq kiribûn û bi hev re dor li wargehê girtibûn. Bi teybet navbera wargehê û hewtê avê birîbûn û her kesê ber bi çala bê merîs ve diçû bi lekim û dijûnan dizivirandin. Çûna koçberan ya ser avê asteng dikirin û gefên qirkirinê li wan dixwarin. Piştî şaqistiyek kurt, koçberên di dorpêçê de mayîn rabibûn serhildanê û ber bi rêza pêşmergeyan ve bikîn û nefretek mezin herikîbûn. Kurdên di welatê xwe de bostek axa hewandinê peyda ne kirîn û pêşmergeyên Partiya Demokrat di ber hev de dirêj bibûn! Awrên tûj ji hev vedidan û zirtên kuştinê bi heva ve difirîn. Li ser hişyartiya PKK'ê, mala Berzanî hêzên xwe ji dora wargehê kişandibûn û ema ambargoya heyî dijwartir kiribûn.

Hem ava heyî ji wargehê pir dûrbû, hem jî pir qirêjbû. Biteybet ji bû tedbîr girtina li hember dorpêçkirina PDK'ê, gel biryara di nav wargehê de kulandina bîrên avê girtibû. Bi ser hatina wargeha Bêsivê re nû neh roj derbaz bibûn. Bikelecanek pir mezin û wekû dorveger gel bidestan dest bi kulana bîrekî kiribû. Di encama hemî hewldanan de av derneket û dest ji bîr kulanê berdan.

Deşta sohr, bi barîna taviyek baran re vedigera teqna heriyê û bi bayê dijwa re jî zuwa dibû. Zeviyên şov yên deşta Bêsivê di bin lingên koçeran de dibû toz û li gel bayê Peyîzê wekî çêlên ewran toza sohr wargeh dinixwimand û di bin xwe de wunda dikir. Pirsgirêka herî mezin ya koçberan avbû lê, ew jî ji hewtê ax çareser dikirin. Di serî de gundiyên gundê Bêsivê û gundiyên gundên derdor bi tahrîk û tevdana PDK'ê hêdî hêdî xwe ne qayîl dikirin û gefên; "heke hûn di demek kurt de ji nav zeviyên me bar nekin em qîma xwe naynin" ji hewa ve li hev diketin. Ji tirsa PKK'ê eşkere ayan ne kiribe jî PDK'ê, ambargoyek fîîlî danîbû ser wargehê. Rayedarên UNHCR'a DY jî di pesartina çûyîna geliyê Qiyametê de israr dikirin û beravajî hemî têkiliyên xwe ji wargehê qut kiribûn.

Jiyan bibû guloka berxwedanê û bi kêm û qisûrên xwe ve diherikî. Êdî top û hewanên turkan jî ne digihatin wargehê û balefiran jî belaya xwe kêmtir kiribûn. Mirovên ji eşîreta Goyan kû piraniya wargehê pêktanîn; hema bibêje hemî xwedî pezbûn û debara xwe bi heywanên xwe dikirin. Yên mayîn jî bi diravên ji Bakur anîn hêdî hêdî xwe birêve dibirin. Pêwîstiyên sazî û karên giştî jî Rêkxistina PKK'ê pêşwazî dikirin. Koçerên bûyîn koçberên welatê xwe, di demek pir kurt de dubare hemî saziyên xwe ava kiribûn û bikêm û kurtî jî be jiyan vegerabû rewşa xwe ya asayî. Kolikên semtan, saziya çand û huner, komîteya karê jiderve, komela ciwanan û jixwe dibistan vekiribûn û her kes bikarê xwe ve mijûlbû. Dibistan zêde kiribûn û du dibistanên sê refî ji kolikan ava kiribûn.

Her du danan dibistan vekirîbûn û êdî mamostayan ders didan şeş refan. Bi hatina wargeha Bêsivê re, zarokên kêmekî temenê wan mezin, baş dixwînin û dinivîsin wekû refên du û yên nû ferî tîpan dibin wekû refên yêk ji hev hatibûn veqetandin. Di dibistanan de ders wekû biranş dihat bikaranîn. Ji bû saziyan endamên nû hatibûn zêde kirin û her kesî bikelecanek mezin kar dikir.

Di rastiyê de tiştek asayî tinebû û her tişt awertebû li wî warê zorava. Ji destavekî bigre heta bi vexwarina peşkek av. Ji sitarekî bigre heta bi cilek ya razanê. Jixwe ser şuştin û hilbijartina cilên lixwe kirinê bi serê xwe ramandinek mucîzewî dixwest. Her kesî hîviya xwe ya welatek azad tîmar dikir û ji bû bikaribe li berxwe bide hewlek bê hemsal dimezaxt. Jixwe PKK, bihes[29]iya dayikek ya li ser zaroka xwe dilerize, nêzîk dibû û ji bû ew komika serhildanvan bikaribe li hember êrîşên sê alî têkoşîna xwe bajo bê mehwer dixebitî.

Wekû karekterîstîk koman[30]a kurd, gelek keyfiye. Ev ji girêdan û hes kirina wê ya jiyanê tê. Ji wê sedemêye her endamek ya komanê ji stranbêjekî baştir distirîne û ji govendvanekî çêtir direqise. Bidehan coreyên reqsê dizane û ji şanogerekî pir baştir texlît û tevgeran dike. Ev hunermendîtiya xwezayî li her derî digêhê hewara Kurdan û wan motîve dike. Li wargeha Bêsivê jî vê teybetiyê tiştek ji nirxê xwe wunda nekiribû û berevajî bi watetir bibû. Hema bibêje roj tinebû li taxek ya wargehê govend ne lidarbe. Yên herî aşiqgovend jî bê goman gundiyê gundê Hilalî bûn. Lê, di aliyê estetîk û spehîtahiyê de, reqis li ser ya Batûyan ne diket. Bi teybet dema jinên Batûyan milê xwe didan hev û dawa kirasên çemçem çepûrast liba dibû, bê hemdê xwe jî be mirov neçar dima kêmekî raweste û bi heyrantiyek mezin temaşe bike. Lê, ji sedema hêjmara wan li wargehê pir kêmbû, girêdayî vê şansê mirov yê temaşe kirina vî hunerî jî kêm dima.

Wê rojê dîsa dîlana Goyîkî lidarbû û govendek mezin gêr vedabû. Evdilkerîmê Hilalî yê mala Xecka, bi gewdê xwe yê gir serê govendê dikişand û ji bû kes ser govendiyê jê nestîne ya star xwe wunda kiribû.

Dengê stirana;

“Di geliyê Mijîn de bû şere lê, lê, lê,lê, lê

Di geliyê Mijî de bû şere heyrana çavên gêrîla.

Heval Egît serleşker lê, lê, lê, lê, lê,

Heval Egît serleşker qurbana çavên gêrîla” xwe li singa Heftanîn dida û di mejiyên neyaran de dikir zirme zirm.

29
Hişyar, hestyar.

30
Aliyê civakê yê fizîkî.

Dengê reqasvanan di deşta Bêsivê de bilind dibû û di dolên Heftanîn de vedida. Li rexa cihê govendê ji rêvebertiya wargehê Mustefa yê Cizîrî devê xwe nêzî guhê Asifê Nayîf Paşa kiribû û diyare tiştek girîng jêre vedigot. Ji liv û tevgerên Mustefa diyar dibûn kû bigotina xwe re pir bi kelacan dibû. Berpirsê hêza xweparastinê Feqe yê Goveşîrî jî li tenişta Asif çokvedabû ema, qet guhdarî sohbeta kesên li cem xwe ne dikir û awrên wî yên bimitale di valetiya deştê de gindirvarî dibûn.

Bayê Peyîza têr bereket, hêdî hêdî serpeşkên baranê bi xwe re tanîn û mizgîniya rehma xwezayê digihand deşta Bêsivê. Zeviyên şov yên axa wan di bin lingên koçberan de vegarayîn bênderên tozê bi hasretek serasayî re çaverêyê barana sala mabûn. Ew demsala baran, berf û sermayê di xwe de disitrîne hat û ya were. Di her şertî de li hember êrîşên dijminên benî liberxwedan dihat fêhmkirin û serkeftin jî gengazbû. Lê, bi eyal û zarokan ve li deşta Bêsivê dibin ambargoya PDK û êrîşên Roma Reş de; dibin kolikên çilo de li hember zivistana dijwar liberxwe dayîn gel û biteybet rêvebertiya wargehê kûr kûr dida ramandin.

Reşikê lêhv gilolê Emerîqanî, ji çûyîna geliyê Qiyametê wêdetir tiştek bi şandeya wargehê re gotûbêj ne dikir. Şande ya wargehê jî di mayîna qada Heftanîn de lingên xwe qerastibûn erdê û ji ya xwe ne dihat xar. Hevdîtin di wê xalê de xetimîbûn û her kes vekişabû quncikê xwe. Dewletên Yêkbûyî bi rêyên dîplomatîk, PDK bi rêya dorpêçkirin û ambargoyê û dewleta Turk jî bi gefên qirkirnê wargeh dorpêç kiribûn. Di ser tevayê wan êrîşan de zivistanê jî kifşeyên xwe kifşkiribûn û barana salê ya destpêkê li deşta Bêsivê ketibû. Barana di bin lingan de hatî stirhan, deşt vegerandibû deryaya teqnê. Tu kes nikare bilive. Sitara herî parastavan ya wekû mal bi nav dikin kolikên çilobûn. Ne sitarek ya wan biparêze hebû û ne jî amêrek ya germ kirinê. Di nav heriyê de ji çala dûr av anîn, bi serê xwe îzayekbû. Keys ji rayedarên UNHCR re ketibû û ji bû wargeh barbike geliyê Qiyametê, ling didan ser komîteya karê jiderve. Tam di wê demê de gundiyên gundê Bêgalte û çend malên Geverî li geliyê Qiyametê hatibûn bi cêhkirin û ev ji koçberên Bêsivê re wekû hemsal hatibû pêşkêşkirin. Haya mihacirên birîn geliyê Qiyametê, ji xap û fikên rayedarên Dewletên Yêkbûyî û PDK'ê tinebû. Ji bû koçberên Bêsivê qîma xwe bi wan bînin, ew mirovên bê rêxistin sînor derbazkirîn û li Başûr belavbûyîn; bilez û bez komkiribûn û biribûn geliyê Qiyametê.

Ji bû bilind girtina gêwilê gel û qayîmkirina hêza berxwedanê rêvebertiya wargehê, şahî li ser şahiyan û govend li ser govendan lidardixist. Rojek tavikbû û ew du rojbû baran ne barî. Qirçe qirç ji herîsohrka dibin lingên koçberan de wekî deboqanê lêhatî bilind

dibû. Rojek ya betlana dibistananbû û bîranîna şehîdan hebû. Bi mûnasebata bîranînê pêşbirkek ya zanînê hatibû amadekirin. Di nav heriya nîvê wargehê de pêşbirkvan wekû du refa jipiya hatibûn bicêhkirin û ji rêveberê wargehê Asif jî erkê pêşkêşvantiyê girtibû ser xwe. Pêşbirkvanên wekû du ref û ji şeş kesan pêktên, ji kesên erkdar hatibûn hilbijartin. Pêşbirk ji bîst pirsan pêkdihat û hema bibêje tevayê pirsan di derbarê dîrok, felsefe, îdeolojî û têkoşîna PKK'ê de hatibûn amadekirin.

Wargeh bigiştî qulibibû cihê pêşbirkê û mirovan li derdora pêşbirkvanan xelekek mezin çêkiribû. Her kesî bêhna xwe girtibû û çavê wan bi devê Asifê neviyê Nayîfê Paşê ve hatibû daleqandin. Ji nîvî zêdetir pirs şirovebûn û bersiv devkîbû. Asif, gewriya xwe paqij kir, kaxeza pirsan nêzîkê çavên xwe yên kermişîkir û pirsa destpêkê ji refa A kir;

"Hevalê Hekî KARAR, li kûdê û kengê şehîd ketiye?"

got û beşişandinek qure reşand ser temaşevanan.

Berpirsê refa A Bawerê Hevlerî, wekî dizane livî, patka xwe xwerand û bû mine mina wî lê bersiv nehat. Zînê ya ji heman gundî û di rêvebertiya taxê de cêh digre, jixwe esmerbû li hember hêlwesta Bawer reş qeliha. Piştî Zînê, ji hevalên xwe yên pir zane dihatin hesibandin hêvî birî bersiva "Dîlok" da ema dîrok ne hatibû bîrê û bi xêra wê bêjeyê pênc puan ji Asif girtibûn.

Dor hatibû refa B. Pirsa yêkem ya wê refê;

"Hevokek navdar ya hevalê Kemal PÎR di berxwedana zîndana Amedê de bikaranî û deng vedayî heye. Ev hevok kûjane?"

Dîsa çavên her kesî zivîrîbûn ser berdevkê refê Mamosta Evdilselamê Zêwkî. Rewşa Evdilselam jî dima ya Bawer û ji xwerandina patka xwe zêdetir tiştek ne dikir. Demê bersivê deqeyekbû û haxta zengilê dawî lê bida. Di nav refê de keçek esmera nû bûyî mamosta û di rastiyê de ji aliyê wargehê ve zêde nayê naskirin, bersiva rast ji berdevk re got. Lê ji xirecira wan kifş dibû kû, dikir ne dikir nikarî hevoka mijara gotinê bi Evdilselam bide fêrkirin. An jî berdevkê ji esmertiyê wêdetir reş û çend mûyên bi sêrî ve mayîn ji bû keçeltiya xwe binixwîme dirêj berdayîn û wekî sîxên jîjo li ber bayê zivistanê ketîn, nizane hevokê bilêhv bike. Di saniyên dawî de keça ciwan pêl perdeya Evdilselam kir;

"Biqasî di oxira wê de canê xwe bidim hej jiyanê dikim" got û nefesek kûr bi refa xwe da kişandin.

Bilêhv kirina wê, wergerandina hevokê û wêrîna wê ya civakî her kes matmayî hiştibû. Çepkek mezin û dirêj ji keça esmer re hat kotan û ji pêşkêşvan jî deh puanê ne şkestî girtibûn.

Pêşbirk qulibîbû ser milê Zînê û Mamosta Fatma Bîlen ya

Hilalî. Di encam de refa Mamosta Fatma -B- bi ferqek mezin pêşbirk qezinckiribû û wê keça renk esmer bixwe jî di dilê wargehê de hejêkirinek mezin ava kiribû.

Fatma Bîlen; li gundê Hîlal jidayik dibe. Dibistana seretayî û navîn li gund dixwîne û li bajarê Qersê dibistana amadeyî û zanko yê diqedîne. Bi malbata xwe re koçber dibe û tê Başûr. Piştî wê pêşbirkê hefteyekî navê "Koçerîn" digre û tevlî refên Artêşa Rizagriya Gelê Kurdistan –ARGK-ê dibe. Demek dirêj di çapemeniya eyaleta Bohta de dimîne û peyîza 1998'ê di encama operasyona artêşa dagirker de, bi heşt hevalên xweyê jin ve li Katoyê Marînos şehîd dikeve.

***

Rojan hev tajotin û demsala Zivistanê bi hemî harîtiya xwe serî hildabû. Koçberên wargeha deşta Bêsivê di nav gola avê de melevantî dikirin. Car carnan berf jî dibarî û şembelûlkên cemedê yên bi singa kolikan ve erd maç dikirin. Li hember xayîn û dagirkeran li berxwedan sehlbû, ema bê hazirtî bi zarok û malbatan ve li hember xwezayê sekinîn ne karê aqilanbû. Di rastiyê de heke gel rast hatibûya rêkxistinkirin û di aliyê xwecêhtiyê de hatibûya qayîlkirin dikarî tedbîrên xwe bigre û bi wê rewşê re rûbirû nemîne. Ema, hêstên derbazer bibûn asteng û statûya siyasî ya UNHCR ew xapandibûn.

Çare û bê çaretiyê, pêşdîtin û tedbîran şertên hayî kifş dikirin. Heke li cihekî neçartî derketibe holê, misoger li wêdê şaş hesibandinek heye. Rêvebertiya qampê jî hesabek şaş kiribû û neçar mabû stoyê xwe ji daxwazên DY re bitewîne. Kêm jî be gelê wargehê DY bê alî û niyet baş hesibandibû. Ema rastiya li holê berevajî vê hesibandina niyet paqijbû. Komîteya wargehê ya karên jiderve, di dawî de naçar mabû çûyîna geliyê Qiyametê bipejirîne. Lê, bi şertê 'şandeyek destpêkê here û temaşeyî cihê dabaşa gotinê bike'. Rayedarên UNHCR, ji dûh ve amadebûn û di cêh de şandeyek ya gelê wargehê hilbijartî şand geliyê Qiyametê.

Geliyê Qiyametê, wekû coxrafîk ne ji Şeraniş û Bihêrê kêmtirbû û heta mirov bihêsanî dikare bêje, xweştir jî bû. Lê, ya girîng ne xweşî û xweşiya coxrafîkbû; gel ne dixwest ji Hevalan qut bibe û dûr bikeve. Jixwe di nav gel de ev qutbûn û dûr ketin, wekû xiyanetê hatibû şîrovekirin.

Bi vegera şandeyê re di nav gel de, li ser 'çûyîn û ne çûyîna geliyê Qiyametê' civîn li ser civînan dihatin li darxistin. Gel bi awayek dijwar li dijî çûyîna geliyê Qiyametê derdiket û xweşiya coxrafîk ne di xema wan de bû. Sedemê dij derketina gel, ne tenê qutbûn û dûr ketina ji rêkxistinê bû. Ji ber kû rêkxisinê bawerî û ewlehiya "em

tu carî ji hev qut nabin" dabû gel. Astenga bingehîn psîkolojîkbû. Karwan çaverêyê vegerêbû û hê bêhtir dûrketina ji gundên xwe hezim ne dikirin. Her gavek ya dûr ketina ji warê xwe, hîviya vegerê dûr têxist, an jî lewaz dikir. Destê wan ji sînor ne diqeta û lingên wan ew ber bi hundir ve ne dibirin. Jixwe piranî şêniyên wargehê ji eşîra Goyan pêkdihat û ferqek mezin di navbera geliyê Goyan û Zaxo de ne didîtin. Jixwe Zaxo bajarê wan bû. Hemî kirîn û firotina xwe li Zaxo dikirin. Ji Zaxo dûr ketin, ji gund barkirinê zortirbû. Bi teybet Hilalî û Mijînî bi awayek dijwar li dijî barkirinê derdiketin û qayîl nedibûn. Lê, wekî din çareya rêvebertiya wargehê tinebû û baş dizanîn, heke wê zivistanê ew zarok di nav wê teqnê de bimînin, yê telefatên mezin bi xwe re bîne. Jixwe biryara çûyînê hatibû dayin û çaverêyê biryara UNHCR mabûn.

Di wê navberê de ji bû amadekartî û vedana çadiran rêvebertiyê, refek ciwan şandibû geliyê Qiyametê. UNHCR'a Dewletên Yêkbûyî  jî çadîr, betanî, sope û tiştên din yên mafê koçberan û dest danîn ser wan, kişandibûn wargeha nû; geliyê Qiyametê.  Jixwe Bêgalteyî li wêdêbûn û wan jî  bi ciwanan re arîkarî dikirin û di demek kurt de wargehek ji xîbetan hatibû avakirin.

Deng bi wargeha Bêsivê ketibû û her kesî amadekartiyên barkirinê dikir. Hilaliyan destpêkê kêmekî xwe ne razî kiribe jî ji aliyê rêkxistinê ve hatibûn qayîlkirin û hema bibêje li ser bar kirinê nakokiyek mucid ne mabû. Ji bû 'ka çend malbatên li tirimpêlekî siwar bibin' rêznav[31] hatibûn amadekirin û qijevijek awerte derketibû holê. Her kes bi aliyekî ve dilivî û livandinê dîmenek ne asayî derxisitbû meydanê. Yêk ji yên herî zêde herî distirha û bê kerixandin dixebitî Feqe yê Goveşîrî bû. Bi teşkên xwe yên kurt û bi rûyê xwe yê biken bê rawestandin bi derdê her kesî ve dibezî û arîkarî dikir.

Ligor biryara hatî girtin gundên piçûkên pêşî çûbîna û yên mezinên dawî. Bê goman ne razîbûna rabûnê û tengsistiya çûyînê ya Hilalî û Mijîniyan bandor li ser girtina vê biryarê kiribû.

Rûpelên salnameya filhan dehê Cotmeh 1994 divîsand. Tirimpêlên balhilgir yên ji aliyê Dewletên Yêkbûyî ve hatîn birêkirin ketibûn di nav wargeha Bêsivê de. Cara yêkêbû ew mirovên wekû koçber bitirimpêlan koç bikin. Hatina tirimpêlan ji erêntiyê zêdetir bandorek neyînî li ser hêstên koçberan kiribûn. Heta hingê bi lingan hatibûn û li ser sînor bicêh bibûn. Êdî tirimpêl hatibûn û wan ji gund û warên wan dûr bêxin. Ew rê li wan wekû rêya çûyîn û nehatinê dihat. Wekî cara ewil û destpêkê dest ji gundên xwe berdabin û ketibin ber pêlên bayek dijwar. Cara yêkê bû evqas dilê wan dişewitî.

---

31
 Lîste.

Biteybet jinên gundên wan nêzîkê sînor, hêstirên xwe diherikandin hundir û bileza barkirinê pev ne dihatin têr û bidilê xwe bigrîn jî. Wekû neqla yêkem tirimpêlên hatîn çar sed mal barkiribûn. Ew fêrsa DY ya li her quncikê cîhanê ji her kesê mişhet re dilxwede dibû sênc û star, li Bêsivê ne fikirirîbû tirimpêlên barhilgir û mirovhilgir ne hemanin. Çend malbatên tiştên xwe li tirimpêlekî bar dikirin, ew jî li ser tiştên xwe siwar dibin û berê xwe didan wargeha nû. Jixwe şivanan ji zû ve pez û dewarên xwe bi pêyan derxistibûn rê.

Karwanê tirimpêlan hê ne gihatibû nav Zaxo û baranê destpêkiribû. Ya star! Dibêjîqey zikê ezmanan çirabû û lehî di jor dihat xar.

**Egîdê Gabarî** vedibêje;

“Navê gundê me Zivinga Şikaka ye. Gundê me dikeve Rojavayê çiyayê Gabar, raserî Ava Dîcle. Ji destpêka şerê çekdarî û pêve roma reş bi caran em di îza û îşkencexaneyan re derbazkirin. Piştî sala 1991’ê Hevalan baregiha dijmin ya gundê me hilweşandin û leşkerên Turkan ji gundê me revîn, ti têkiliya me bi dijmin re nemabû. Piştî sê salên azad roma reş zivistana 1993’ê dîsa êrîşkir û di navbera sê mehan de sê caran gundê me şewitand. Her wan dişewitand û em dubare ava dikir.

Di destpêka hefteya duyem ya Nîsana 1994’ê de Roma reş bi sedan balefir û firokan êrîşî herêma me kir. Wekû rasthatî gundê me jî di nav de gundên herêmê dan ber qazan û roketan. Qîr û hewara jin û zarokan xwe li erşê asîmanan dida! Em çekdarbûn û bi Hevalan re me girên derdora gund girtibûn lê, di destê me de çekek ya wan teyrên mirinbarkirî rawestîne tinebû. Bi awrên neçar me li reva jin û zarokên xwe temaşe dikir. Wekî tu kulmek nohk li tehtekî bidî, her kes bi aliyekî ve direvî. Ji sedema di bin gundê me de û derdora wî hemî şkeftbûn zêde telefata mirovî çêne bibû lê, dewar û heywanên me hemî kuştibûn.

Du hevjînên min û deh zarokê minên hûr hebûn. Bi kû ve çûn, çi ji wan hat min nizanî. Di nav çend demjimaran de bi sedan gundên Gabar kiribûn kavil. Heta peyîza heman salê ez di nav Hevalan de mam. Di heman peyîzê de ji bû pirsa zarokên xwe bikim bi arîkariya Hevalan û ji dizî ve çûm bajarê Sêrtê. Ez li wêdê ji nas û dostan fêrbûm kû hevjîna min ya piçûk Li Mêrsînê ye û ya mezin jî çûye Denîzlê. Ne gengazbû û di aliyê ewlekariyê de jî ne mûmkûnbû bi karibim wê zivistanê, bi rêya çiyan re malbata xwe hemiyê derbazî Başûr bikim. Me birêya telefonê biryar da; ez niha hevjîna piçûk û her du zarokên wê derbaz bikin û heta me keys peyda kirî emê ya din jî derbaz bikin. Min birêya dostan, rênas û cêh diyarkir û ez dubare vegeran çiyê.

Piştî hefteyekî bi arîkariya dostan hevjîna min û her du

zarokên xwe hatin Gundê Rexêne yê kû dikeve Başûrê Sêrtê. Du malbatên din jî gihatibûn me. Em her sê malbat dibin pêşvantiya rênasê Hevalan de derketin rê. Hema bibêje ew heftî hemî bi berf û baran derbazbû. Di nav me her sê malbatan de nêzî deh zarokên hûr hebûn. Di nav kemîn û lûleyên tangên romê re em derbaz dibûn.

Qet ji bîra min naçe; dema em ji Besta derbazî Cûdî dibûn, li ser rêya qîr ya di navbera Şirnex û Qulaban de keçika min Leyla ya sê salî destbi girîkir. Ew li ser pişta hêstirê û ez li erdêbûm. Bi lez min destê xwe danî ser devê wê. Ji tirs û ji kelecanê destê min dev û pozê zarokê girtine û nikare nefesê bistîne. Şev tarîbû û baranek dijwar dibarî. Keçik nikare bêhnê bigre û min ev ferq nekiribû. Piştî kêmekî kef û kincê di nav tiliyên min re avêtin, dengên cuda li ser zarokê ketin û hê jî ez bi tiştekî ne hesabûm. Hevalê Pale yê li pêşiya me dimeşe, ji dûr ve ketibû ferqa rewşa zarokê û bibez hat û destê min ji ser devê zarokê rakir. Pale, qederekî xwe ji min re acizkir û rexneyên giran li min kirin. Heke rehmetiyê Pale ne bibûya delîl, minê li wêdê keça xwe bi fetisanda.

Ji berya qamp rabe sê rojan em hatin Bêsivê. Dîsa baran dibarî û rewşa qampê yemanbû. Di heman roja em hatîn qampê de kurê Xoceyê Şehrikî yê ew jî bi me re hatîn, ketibû di çala tuwaletê de. Hevjîna Xoce Selîma rabû ser lingên paş û îsyankiribû. Hevjînê wê jî di nav de ji her kesi re dijûn dikirin û heta awaza wê derdiket têxist qêr. Hetka me ji Hevalan çûbû. Hevalan, di hola nîvî de serê zarokê ketî di çala tuwaletê de bi ava baranê şuştin. Zarok, ji tirsa û ji serma ji binê lingên xwe dilerizî. Li ser wê bûyerê me lava ji rêvebertiyê kir û em tevlî neqla destpêkê kirin.

Tiştek yê me tunebû û DY bi hêjmar malbat li tirimpêlan bar dikirin. Ji bû malbatên em li cem wan behra me jî tişt ji xwe re bar bikin her kesî dixwest em li gel wan siwar bibin. Em li gel Şirîşeyiyan siwarbûn. Dema em birêketîn dunya xweşbû. Tam dema em gihatin Zaxo û baranê lêkir. Ya star! Baran ne rawesta heta em gihatin geliyê Qiyametê. Deziyek zuwa li me nemabû. Jixwe ji berya mal werin, çadir vedayîbûn. Çadirek nîşa me kirin û bê agir û sobe em ketin di bin wê çadirê de.

Ji wê roja û heta niha bîst sal derbazbûn; ne min karî ez zarokên xwe yên mayîn derbaz bikim û ne jî wan xwest werin. Hê me hev nedîtiye û emê kengê hev bibînin jî ne kifşe. Belkî jî em êdî qet hev nebînin!"

Çavên Egîtê Gabarî tijî av bibûn. Kelegirî ketibû qirika zelamê yêxtiyar, kuxikek zuwa girt û êdî nikarî baxive.

Piştî UNHCR'a Dewletên Yêkbûyî, di neqlekî de çarsed mal avêtin geliyê Qiyametê, vêca pişta xwe dabû koçberên Bêsivê. Herkû diçû zivistan dijwartir û zortir dibû û rayedarên DY bi mihaneyên

pûç û vale neqilkirina koçberên mayîn dereng têxistin. Li ser pesartin û protestoyên gel piştî deh rojan çarsed mal din jî anîbûn û dîsa xwe ker kiribûn. Ew DY ya ji bû koçber çûyîna geliyê Qiyametê bipejirînin tişta ne anî serê wan nemayî, êdî giran tevdigera û ji bû neqilkirina gel bipaş bêxe mihaneyên cor becor tavêtin holê. Tu kesî wate ne dabû hêlwesta wan û her kesî bi tol standinê ve girê dabû. Şîroveyên, 'gelê qampê ew acizkirine û niha jî keys peyda kirine û tola xwe hiltînin' di nav herî sohrka deşta Bêsivê de digevizîn.

Heta hingê li gor peymana hatî çêkirin, hemî gelê derbazî wargeha geliyê Qiyametê bibûya û li wêdê bi hevre mabûya. Lê, piştî DY neqla duyem bêdil avêt geliyê Qiyametê, êdî dikara qampek din kiribûn û hêdî hêdî navê Etrûş derxistibûn pêş. Evê hêlwesta UNHCR, koçber rakiribûn serhildanê. Jixwe gelê qampê ji niyeta DY bigomanbû, evê kirina wan ev goman piştrast dikirin. Rayedarên saziya UNHCR, xizmet ji dewleta Turk re dikir û êdî ev rastiya wê saziya dilxwede mirovyar gotûbêj bixwe re ne dibir. Jixwe, ji bilî tol standinê tu kesî wate ne dabû vê guhertina wan ya ji nişkan ve. Bê goman armanca wan cudatirbû û bi pişt re eva hatibûya fêhmkirin.

Gelo çima ew fêrsa saziya dilxwede mirovyar bi neyartî nêzîkê wê komika mirovên mişhet dibû? Qey sebebê heyîna UNHCR, ne bi hewara mirovên ji ber fikrên xwe yên siyasî bizorê hatîn derbederkirin ve bezînbû? Qey dilxwede ne bêkû hizir, reng, bawerî, nijad berçav bigre arîkarî bi mirovên muhtac re dikir û ew diparastin? Çima her gav ew komika mirovên ji her kesî muhtactir û belangaztir bi Turkan, bi pêşmergeyên PDK'ê û bi birçîbûyinê tehdît dikir? Dewleta Turk li ber çavên tevayê cîhana şaristan ew mirov bi darê zorê ji gundên wan derxistibûn, gundên wan şewitandibûn û dîsa bikutekî berê wan dabû welatek din. Çima hêzek wekî Dewletên Yêkbûyî, dilxwede sêhwana neçarên tevayê cîhanê ji dêla wan mirovan ji Turkan bibapêzê dîsa ew bi Turkan tehdît dikirin? Her roj sozek dida û roja piştî wê li soza xwe poşman dibû? Gelo raza dijminatiya wê çibû? Qelqîtî û qelbîtiya wan ya li hember wan koçberan ji kûdê jêder dibû? Wekî gel şîrove dikir "tenê tol girtinbû?" Ya rayedarên wê fêrsa saziyan evqas mişewiş dikir û kîna wan ya li hember wan mihaciran evqas mezin dikir çibû?

Di rastiyê de ew komika mirovan pir kubarbû. Heke wekû mihacir werin hesabindan, di nav mihaciran de mirovên herî bê pirsgirêkbûn. Xwe bixwe birêve dibirin û pirsgirêkên xwe di nav xwe de çareser dikirin. Ji mafên xwe yên hatîn kifşkirin zêdetir tiştek ne dixwestin. Mirovên kedkarbûn û ji bû xwe bi keda destên xwe xweyî bikin her rê diceribandin. Ji bû debara zarokên xwe hewlek bê eman dimezaxtin. Qîma xwe bi hemî şertên zehmet yê jiyanê tanîn. Exlaqîbûn û rê ne didan rizîbûyina civakî. Hergîz ji kesî re ne

dibûn bar. Di her şertên jiyanê de barê xwe bixwe hildigirtin. Tenê ji mirovtiya cîhanê hîviya kolmek jiyana azad dikirin û tiştek din ne dixwestin. Gelo ya UNCHR'a Dewletên Yêkbûyî ji wan dixwest çibû? Bersiva tevayê van pirsan di alîgirtiya Partiya Karkerên Kurdistanê de veşartîbû? Heke ev rastbe, pirsa herî bişewt ya were kirin jî eve; gelo kîna vê saziyê ya li hember PKK'ê bixwe çibû? …….

Mafê koçberên siyasî ya gel bi berxwedana xwe ya rojiya biçîbûyînê qezinckirî wekû fermî hê jî ne hatibû vegotin. Piştî heştsed malbat derbazî geliyê Qiyametêbûn û yên mayîn jî çûyîna wan ya Etrûş hat mîsoger kirin, du yê Mijdara heman salê li Cenewreya Siwîsre Komîsertiya Bilind ya Koçberan civînek ya çapemeniyê li darxist û got;

"Statûya mihacirên siyasî ji koçberên ji Turkiye derbazî Bakurê Êraqê bûyîn re hatiye naskirin. Divê ji vêdê û pêve mihacirên nû derbazî Etrûşa li Başûrê Rojhilatê bajarê Duhokê bibin, di qampa fermî ya li wêdê were çêkirin de; werin bicêhkirin."

Di heman demê de ev statû, ji bû pejirandina çûyîna Etrûş wekû şantajekî jî hatibû bikaranîn. Roja ew daxwiyanî hatî dayîn, li wargeha Bêsivê berf dibarî. Kolik û çadirên havînî di bin berfê de ketibûn û zarokên dilxwede di bin parastina saziya UNHCR de di bin kavlan de mabûn.

Piştî daxwiyaniya UNHCR heft rojan, wargeha Bêsivê bigiştî hatibû valekirin û mihacirên nû anîn li Etrûş bicêh kiribûn.

Armanca dewletaTurk û hevkarên wan yên xwecih dihat fêhmkirin. Ya di fêhmkirina wê de zehmetî dihat kişandin; gelo DY çima evqas dildar û bikerb ji bû daxwazên Turkan dibezî? Gelo sedêmê şewitandin, derbederkirin û mihacirkirina vê komika mirovan û zextên bê merîs yên niha DY dike hemanbûn?

### Çiyayê Gara

Dema çûyina koçberan ya geliyê Qiyametê misoger dibe, PKK ji bû keşif û bicêhbûyînê refek heval dişîne çiyayê Gara. Çiyayê nav bûrî wekî sêhwanekî li raser geliyê Qiyametê bû. Ankû Geliyê Qiyametê li qontara jêr ya Gara cêh digirt. Hevalên bixef li sirtê dawî yê Bakurê çiyê bicêh bûyîn, dîsa bi nependî keşif û amedekartiyên hêzek mezin ya bi biharê re were Gara dikirin. Çola di navbera wargeha geliyê Qiyametê û çiyayê Gara de çiyayîbû. Ev dihat wê wateyê, ji bû bihevrebûyîna koçberan û gêrîla di navbera Bihêrê-Şaraniş-Bêsivê û geliyê Qiyametê de ferqek mucid tinebû.

Piştî neqla yêkem ya geliyê Qiyametê PDK, vê xebera tehl ji gundiyên herême fêr dibe û bi dilek xemgîn û pazdehê birîndar vê zanîna îstxbarî ya dereng fêrbûyî di guhê MÎT'a Turkan de dipispisîne. Rayedarên Turkan jî bi awayek pê şewitî dibezin cem rayedarên UNHCR'a Dewletên Yêkbûyî ya Êraqê. Rayedarên DY jî bi hewarî vê nûçeya xeter digihînin navenda Komîsertiya Bilind ya Cenewre. Komîsertiya bilind jî ji bû pêşya vê xetertiya dikare cîhana me ji holê rake bigre, bilez û bez şertê pejirandina statûya Mihacirên siyasî; çûyîna wargeha Etrûş şert datîne.

## Geliyê Qiyametê

Geliyê Qiyametê, li pişta nehiya Etrûşa girêdayî bajarê Duhokê bû. Ji Başûr heta Bakur tevayê Rojhilatê wê çiyayê Gara dipêça. Li Başûr navçeya Akrê, li Bakur bajarê Duhokê û li Rojavyê wê jî bajarê Şêxan cêh digirt. Çolek çiyayî û avîbû. Bi 'Gerangeh'iya xwe navdarbû. Cihê seyrana heremêbû. Ji dolek nîvçe ya di quntarê çiyayê Kanika de cêh digirt re dihat gotin geliyê Qiyametê.

Ya dolika nîvçe ji dol û dolikên din cuda dikir, ew robarê ji dawiya dolê dizabû. Darên çinarên sedsale dol bi giştî nixwimandibûn. Coxrafiyek çiyayî, têr dar, devî û şîrînbû geliy Qiyametê. Robarokek ne mezin ji Başûr û ava geliyê Qiyametê jî ji Bakur diherikîn û li binya wargehê digihatin hev. Wargeha koçberên geliyê Qiyametê, di nîvê nîv girava wan robarokan de hatibû avakirin. Hingî bixwazî cihek xweş û avîbû. Ji ber wê, keyfa runiştvanên wê yên nû pir jê re dihat.

Ligor dihat gotin; di dema dagirkertiya artêşa Îslamiyetê de xwecihên vê herêmê berxwedanek mezin kiribûn. Piştî demekî berxwedanvanên xwecêh şkestibûn û xwe vekişandibûn derdora dola geliyê Qiyametê. Cenga lehengên Kurd û artêşa dagirker, di wê dolê de dewam kiribû. Ligor gotinên gotinbêjan, artêşa Îslamiyetê di wê dolê de bihezaran, deh hezaran şervanê Kurd dabûn ber şûran û xwîna di wî robarokî de herikî ava Dîcle sohr kiribû. Jixwe yêk ji heftî û du fermanên hatîn serê Kurdên Êzdî, qirkirina geliyê Qiyametê bû. Navê 'Geliyê Qiyametê' jî ji wê qirkirinê dihat.

Îdîaya din û ya bêhtir nêzîkî rastiyê dixwiyê, li vêdê qir kirinek dilxwede navxweyî çêbûye. Di s.s 10. de dema Şêx Adî Bîn Musafir tê herêmê, dixwaze di Êzdatiyê de reform û guhertinan pêkbîne. Wekû xwezayî Pîr û Rêberên Êzdatiyê bi dijwartî li dijî vê ji cewherê xwe dûrketinê derdikevin û bi teybet di navbera yên xwe wekû Adanî (alîgirên Şêx Adî) û Rojyarên xwecih de şerek mezin

diqewime. Adaniyên di bin fermandartiya Şêx Hesenê biraziyê Şêx Adî de ser dikevin û Rojyaran di geliyê Qiyametê de teslîm digrin.

Ji îdîayên li jor kûjan raste ne mîsogere ema, ya mîsoger û rastiya wê guftûgoyê bi xwe re nabe, li wê dolê dagirker an jî nûkeran xwecihên berxwedanvan di qirkirinek mezin re derbaz kiribûn û di wê dolika şîrîn de zêhniyeta berxwedanvan ya gelekî hatibû kedîkirin. Ya hê jandartir, di qirkirina jiyan bûyî de mîsogertiya serkeftina xêr nexwazanbû.

## Wargeha Şehît Eşref –Geliyê Qiyamtê

Mihacirên wargeha geliyê Qiyametê, navê Şehîd Eşref li warê xwe yê nû kiribûn.

**Şehîd Eşref -Sedîq KARA;** sala 1988'ê ji gundê Hilal tevlî refên ARGK'ê bibû. Di demek kurt de bi dilnivzî, biruhê xwe yê hevaltî, wêrîn û lehengîtiya xwe navdar bibû û wekû fermandarê bêlûkê hatibû erkdarkirin. Di şerê xiyanetê de ji aliyê hêzên PDK ve hatibû şehît êxistin -Cotmeh1992. Gelê wargehê jî ji bû wefadartiyê, navê Şehît Eşref li jîngiha xwe ya nû kiribû.

Ew wargeha di belgeyên fermî ya UNHCR de wekû qampa "A" dihat binavkirin, li aliyê Başûr li ber tenişta dola geliyê Qiyametê hatibû bicêhkirin. Qamp, bi tevlîbûyînên xwe yên nû ve wekû nehsed malan dihat hesibandin. Ev jî bi hesabek bi çav re dikir 4500, 5000 kes. Ji gundê Pîrana Qulaban bigre heta bi Spêrtiyên Silopî, ji koçerên Hezex bigre heta bi Ziving Şikakî yên Gabar, ji Serkara Gundikê Şêx bigre, heta bi Gundikê Remo yê Şirnex û gundên geliyê Goyan; hema bêje ji her aliyê Bohta mirov li wêdê kom bibûn. Wekû îstîsna du malbatên Tetwanî û mala Hesenê Diyarbekrî jî li wargeha geliyê Qiyametê bûn. Hesen, ji Farqîna Amedê bû û sebebê rast ya ew anî wargehê ti carî nehat zanîn. Dîsa wargeh, ji çar semtên bi navê Şehît Şiyar, Şehît Harûn, Şehît, Cûma û wargeha Şehît Bêrîtan jî wekû semtek ya wargeha Şehîd Eşref dihat hêjmartin.

Heke berfa salê zû ne barîbûya koçberên geliyê Qiyametê yên ji kêferata jiyanê ferq ne kiribûna zivitan hatiye. Her kes di nav keft û lepta hazirtiyên demsala Zivistanê de wunda bibû. Yên pez û dewarên wan heyîn, govên zivistanî amade dikirin û yên sopeyên daran bi xwe re anîn bi piştiyan dar dikişandin. Dûr ketina ji gund, dilê wan dubare şewitandi be jî ji warê xwe yê nû razî dixwiyan. Bergehê warê wan yê nû firehbû û hingî bixwazî destdayiyê jiyanêbû. Têkiliyên wan û Hevalan jî ji hev qut ne bibûn û hê bêhtir nêzîkê hev bibûn. Bêhna gundên wan ji warê nû dihata û ligor dojeha Bêsivê, geliyê Qiyametê buhişt bixwebû.

Rayedarên UNHCR, devdozerek li nîvê wargehê dabûn û

rê vekiribûn. Zivistanbû û herîsohrka rêya di nav çadiran de nû hatine kolan xwe li navtengê dida. Heta kes ji çadirekî diçû çadira cîranê xwe, deh caran pêlava wan di nav heriyê de asê dima. Herî wekî deboqana têr stirhan lê hatibû û qirçe qirç jê dihat û karwanê koçberan bi hewarî xwe bi cêh dikir. Lept û tevgera mirovên di nav wargehê de mûrîreşkan hêlîn xirabûyî tanîn bîra mirov. Dar zehfbûn û mesken vekirîbû. Êdî mabû li ser jêhatin û kêrhatina kes. Gelê qampê jî gelek kedkare û carna jî dibêjqey pir dimohr kedkarbû. Dimohrtî û bê rêkûpêk xirapkirina jîngehê, mirovên xwezayar xemgîn dikirin. Tevayê koçberên wargehê wekî malbatekî tevdigeran û hej hev dikirin. Ji bû guhertina cihê çadirekî, hemabêje hemî derdor kom dibû û bi hev re arîkarî dikirin. Piranî ji herêma Bohta, gundiyên bi dehan gundî li wî warî kom bibûn. Lê, te digotqey hemî xizm û mirovên hevbûn û ji malbatekîne.

Li gel xebata şexsî û malbatî, xebata rêkxistinî jî bi hemî leza xwe tajot. Ji nexweşxaneyê bigre heta bi avakirina dibistanan her tişt pêwîstbû û di dorê de bû. Tîkên êlekên komîteyên semtan, komîteya karê jiderve, milîs, mamosta û rêvebirên wargehê li hev diketin. Mamosteyan xwendevan qeyd dikirin, komîteyên semtan rêznava hêşedaran birêkûpêk dikirin û tixûbên taxan kifş dikirin, milîsan xwe dubare saz dikirin; bêlûk, taxim û mangeyên xwe ji hev kifş dikirin. Komîteya karê jiderve, yên ne qeytkirî qeyt dikirin, yên pêwîstiyên wan heyîn çadir, betanî, ar, nîsk, birinc, sopên eledîn û tebax[32] li wan belav dikirin.

Ya herî zêde bala mirov dikişand, têkiliyên gel û birêvebertiyêbûn. Rêvebertî ji hevalên gêrîla pêkdihat. Ji sedema cihek yê wa yê kifşkirî tinebû û di nav gel de diman, her dema dihat xwestin mirov nikarî wan bibîne. Jixwe yên herî zêde pêşewitî û roj bîst û çar demjimare heriya wê rêya bê merîs distirhan hevalê Bedran û Feqe bûn. Her du jî bejin kurt, ciwan û xweşikbûn.

Cadayek seranser di nîvê wargehê re derbaz dibû. Demsal Zivistan bû û rêya ax nû kolabûn. Herîsohrka rê hingî di bin lingan de hatibû stirhan wekî benîştê benan lê hatibû. Çarşî, bazar, şêwirxane, bêhnvedan, hev dîtin her tişta rûniştvanên wargehê li ser wê rêyê pêktdihat. Dema ji rêvebertiyê kesek derdiket ser cadê, her du gavan yêk ji gel milê wî digirt û xef dikir. Hê xefa kesê dabaşa gotinê ne qedayî pênç, şeşek din diketin di dorê de. Ewî Heval hirve dikişand û yê din wir ve dikişand. Carnan heta Hevalên rêveber ev cade ya biqasî pênçsed, şeşsed mitre qut dikirin demjimar derbaz dibûn. Ji dêmê Hevalan ken kêm ne dibû, eniya xwe ne diqermiçandin, bêhna xwe teng ne dikirin û bê sînor guhdarî herkesî dikirin. Ya

32 Tifika bi qazyaxê dixebite.

din jî piranî tiştên di wan xefan de dihatin gotin, sîska hejîrekî ne dadigirtin. Tenê mirov dikare bêje; “ji sebra Hevalan re maşileh!”

Li aliyê din UNHCR, nêzî pênc hezar kes avêtibûn wî pesarî, di nav vê heriyê de û ji bilî hin tiştên ji rêzê ti arîkarî bi wan re ne kiribû. Hin malbatên hêjmara wan deh kesan derbaz dikin, di çadirek neh, deh mitre dam de bi çend betaniyên gewr, fanosek piçûk û sopeyek eledîn jiyan dibûn. Ne mutfaq, ne tûp, ne serşûk û ne jî cihek yê destavê hebû. Li çend cihên wargehê naylonek hişîn li çar daran pêçabûn û wekû cihê destavê binav kiribûn. Di demsala wê zivistana reş de, dibin berf û baranê de koçberan xwarin ji der ve û li ser tifikên daran çêdikir. Her malbatê du betanî li çar daran pêçabûn û wekû serşûk bikartanîn. Heke dema mirov di serşûkê de be û baranek boş bibare, zêde pêwîstî bi avê ne dima. Ya hê xirabtir, bagerek dijwar dikare betaniyên sitara te bifirîne û te rût û tazî di holê de bihêle. Lê, yêk ji wan pirsgirêkan ne di xema wî gelî de bûn. Ew têkoşerê dozek mezin û rêvanê azadiyêbû. Hinavên wan germ, tijî bikelecan û şadbûn. Heke pêşiya wan hatibûya vekirin û sînor ji wan re ne hatibûna danîn, dikarîn bihêsanî xwe bixwe xweyî bikin û ti mineta wan ji arîkariya DewletênYêkbûyî tinebû. Jixwe arîkariya Dewletên Yêkbûyî bi navê mirovtiyê dikir, ji rebenkirin û rizîlkirinê wêdetir ti wateya wê tinebû. Gel di wê ferqê de bû û ne dixwest hîviyên xwe bipesêre wê saziya kedîker.

Li millê jor ya geliyê Qiyametê embarek piçûk ya avê çêkiribûn û bi lûleyan av kişandibûn nav wargehê. Li her taxê çeşmeyek danîbûn û rojê carekî, bi qasî demjimarekî av berdidan. Hemî jinan wextê hatina avê dizanîn û ji berya avê berdin li pêşya çeşmê diketin dorê. Her kes firaxek di desta de  û li dûv hev rêz dibûn.

Zilamek Titwanî bi navê Cûma hebû. Ew jî nû û birêya Hevalan derbazî wargehê bibû. Cûma, zilamek kêmek qelew û keçelbû. Navê hevjîna wî Jiyan bû û kurek şeş, heft saliyê binavê Ciwan jî hebûn. Jiyanê bi bin xwe re li mirovan dinêrî û ligor hevjînê xwe kêmekî ciwantir jî bû. Sedem çiye ne dihat zanîn; ema Jiyan ne diçû avê û Cûma bi wî zikê xwe yê mezin ve diket nav jinên di dora avê de. Wekî dîkê eloka serê wî di nav rêza jinan de sohr dikir. Ti jinan Cûma zayenda dijber na dihesiband û xwe jê ne diparastin. Hinan Cûma tehf dida, ew li navguhê hinan diket. Ji bilî çend gotinên tinazvan yên keçên nû gihatîn, hemî jinên di dorê de rewşa heyîna Cûma asayî pêşwazî dikirn. Xerîbe, dema ew zelamê dêm tirş û ji her kesî aciz di ket dora avê de, hevjîna wî ya bajarî û ji spehiya dihat hêjmartin derdiket derê çadira beramber, lingên xwe bi ser hev re tavêtin û çixareya xwe vedixwar. Zilamên gazinda, “çima ne hevjîna te, tu diçî dora avê” dikirin; Cûma, bersiva; “hûn feodalin,

wekheviya jin û mêran li cem we nîne" dida.

## Wargeha Hungo

Dola geliyê Qiyametê wargeha Hungo[33] û ya Şehît Eşref ji hev vediqetand. Wargeha Hungo, li Bakur û ya Şehît Eşref li Başûrê geliyê Qiyametê cêh digirt û di navbera wan de bi piyan pênç, şeş deqîqe rê hebû. Her du wargeh li beramberê hevibûn û zarokên wan dihatin dibistanên wargeha Şehît Eşref. Navê fermî yê wê wargeha piçûk 'Şehît Bêrîtan' bû. Ji ber kû Bêgalteyî ji bêjeya "hûn" re peyva "hungo" bikartînin rûniştvanên Şehît Eşref ew wargeh wekû qampa "hungo" binav kiribûn. Ji bilî fermiyetê û Hevalan tu kesî ne digot, "wargeha Şehît Bêrîtan". Ji xeynî neh, deh malên Oremarî, hemî rûniştvanên wê wargehê ji gundê Bêgalte bûn. Gundê navbûrî, li ser sînorê Başûr û Bakur di navbera Şemzînan û Diyana de cêh digirt.

Havîna sala jiberya wê Gêrîlayên Rizgariya Kurdistanê li nêzîkê wî gundî çalekiyek mezin pakanîbûn û ligor çavdêriyên Bêgalteyiyan nêzî sed û pêncî leşkerên Turk kuştibûn. Ji sedema gund çetebû û romiyên dagirker ne parastibûn, dewletê ji wê çalekiyê gundî berpirs girtibûn. Êş û îzayên bê eman bi gundiyan dabûn kişandin, bê sitar kiribûn û du gundî li pêş çavên gundiyan kuştibûn. Dîsa ji mêrên gund dazdeh kes hilbijartibûn û bi xwe re biribûn. Her çiqas hê jî hevjîn, zarok û xizmên wan bi hîvîne saxin û yê rojekî vegerin lê, yên qerekterê dagirkerî nas dikin baş dizanin kû niha kelaşên wan dibin sergûyê baregiha Robarok de rizîne. Piştî tevayê van îşkence û kuştinan, leşkerên Turk gund dişewitînin û yên mayîn jî derbeder dikin. Bêgalteyî, destpêkê hatibûn Çemêcû û Peyîza salê re jî DY û PDK'ê ew avêtibûn geliyê Qiyametê. Ankû xwecihên herî kevin yên warê geliyê Qiyametê Bêgalteyî bûn. Yên mayîn hemî xwegirtiyê wan bûn.

## Wargeha Şehîd Azad

Şehîd Azad, gêrîlayek rojnamevanbû û ji bû ev mihacir di qada navnetewî de werin bihîstin û wekû mihacirên fermî werin pejirandin, hewlek bê eman mezaxtibû. Tam dema koçber ji Bêsivê berbi Etrûş ve têne koçkirin, di encama bomberana balefirên artêşa Turk de li fitlûpêçkên kêreya Dêrkara Ecem-Zaxo tê qetilkirin. Wekû wefadartiyekî koçberên wargeha Etrûş jî navê wî şehîdî li jîngeha xwe ya nû kiribûn.

Wekû fermî di belgeyên UNHCR'a DY de navê Şehîd Azad

---

33 Qismek yê Behdîniyan di şûna peya "hûn" de "hungo" bikartînin.

-wageha Etrûş- qampa “B” bû. Ev wargeha di pehnava di navbera çiyayê Şêxan û mila nahiya Etrûş de hatî avakirin, ji du semtên mezin pêkdihat. Ji semta Hilaliyan re, Şehît Salîhe û ji ya Mijînya re jî Şehît Êrîvan dihat gotin.

Şehît Azad, li Rojavayê nahiya Etrûş û Şehît Eşref jî li Rojhilatê wê cêh digirt. Rêya fer ya bajarê Duhok û Hewlêr bi hev ve girêdide di navbera her du wargehan re derbaz dibû. Çadirên wargeha Şehît Azad, di pehnava di navbera çiyayê Şêxan û girê Etrûş de hatibûn reşandin. Di navbera her du wargehan de bi pêya rêya nîv demjimarê hebû. Nehiya Etrûş û rêya mak ya bajarê Duhok û Hewlêr diketa di navbera wan de, nixwe ji hev ne dûrbûn. Qampa Etrûş, di aliyê hêjmar de du qetê geliyê Qiyametê bû. Dewletênên Yêkbûyî û PDK, destpêkê fik kiribûn kû hemî mihaciran bibin qampa geliyê Qiyametê. Di dema barkirinê de fika xwe guhertibûn û qismê zêde yê mihaciran danîbûn pehnava Etrûş. Ji wê sedemêye kû barkirin li demek dirêj hatibû belavkirin.

Aha Şaristaniyet ev bû. Çîndartiya di navbera bazar û bajaran de jidayikbûyî, destpêkê wujdana xwe kuştibû. Bi pişt re exlaq û hêst. Dizbû û ji xweyê malê pir ditirsa. Leptek, daxwazek herî piçûk ya xweyê malê, pêşin sedemê qirkirinêbû. Nixwe li hember komikek mirovên ewqas ji derb û ba ketîn, ew qir û qiyamet çima!? Di rastiyê de ew êrîşa kompîle û ti exlaqê mirovtî nas ne dikir; di şexsê wan mihaciran de li ser Tvgera Azadiyê bû. Gelo di welatê xwe de çengek azadî xwestin, tiştek ewqas qibhet bû?

Têkiliya PKK’ê û wan koçberan bibû girêkek kor û qet ne vedibû. Hêzên dijber ji bû girikê vekin û PKK’ê ji bû girikê hê bêhtir bişidîne şerek bê hemsal dimeşandin. Bê şik, heta hingê ya serkeftî PKK’ê bû û vê jî hêzên dagirker û nûker har û hêc kiribûn. Hê hêzên dijber deriyek ne girtîn PKK’ê deriyek nû vedikir. Hê rêyek qut nekirîn, TAK’ê rêyek nû çêdikir. Ev jî hemî dibû kîn û xezeba şaristanan û di ser wê komika mihaciran de dibarî.

Tam dema UNHCR koçber dikişandin geliyê Qiyametê, hatina gêrîlayan ya çiyayê Gara bê goman ne rasthatinekbû. Zext û êrîşên hêzên dijber jî wekeza. Her çiqas dem û cêh hatibin guhertin jî û navên desthilatdaran cuda jî bin, di zext û polîtîkayên karwanê koçberan ji gêrîla qut bikin de ti guhertin çênebibûn. Her çiqas zeman û mekan hatibe guhertin jî lê, dijmin hemanbûn. Ji bû têkiliyên wan mirovan û gêrîlayên Azadiyê ji hev qutbikin li Bakur dewleta Turk, ya nemayî di serê wan de anîbû û teriqandibûn. Êdî li Başûr bûn û vê carê jî PDK ya mala Berzanî, dibin navê xweyê malê de û Dewletên Yêkbûyî jî di bin navê arîkariya mirovtî de heman polîtîka dimeşandin. Vê jî pir vekirî diyar dikir kû gerîlayên azadiyê li hember sîstema desthilatdar ya cîhanî têkoşîn dikirin.

Ew deh rojekbû wargeha Etrûş hatî avakirin. Hema bêje rûniştvanên wargehê ji Gundê Hilal û Mijîn pêkdihatin. Du gundên mezinbûn û kompîle koçkiribûn. Gundê Şirîş jî li heman wargehêbû lê, hêjmara wî sêh û pênç, çil mal derbaz ne dikirin. Bê goman pir kêm jî be ji gundên cuda jî mihacir hebûn lê, hêjmara wan ne kifşkerbû. Hêjmara wargehê, li derûdora heşt hezar kesbû. Koçberan bi vîn û kelecanek mezin xwe bicêh dikirin. Keyfa wan bi rêvantiya wan xweşbû û kifşeyên herîsohrka Bêsivê di dêmê wan de ne mabûn. Bi şêwazek komînal çadirên xwe vedidan, xwarina xwe çêdikirin û bi hev re jiyan dibûn. Ji ber kû biteybet gundê Hilal nêzî sînorê Bakur û Başûr bû û dewleta dagirker jî çavên xwe li derbazbûyîna wan noqandibû pez, dewar û her tiştên xwe bi xwe re anîbûn. Mijînî kêmek din bipirsgirêk derbaz bibûn û hemiyan şansê Hilaliyan peyda ne kiribûn.

Bi cêhbûyîna wargehên nû re koçberan, ji her demî leztir saziyên xwe ava dikirin. Kolikên rêvebertiyê, mejlîsa wargehan, semtan, saziya milîsan, asayîş, komîteyên semtan û saziya karê jiderve ji zû ve hatibûn avakirin. DY jî li derê wargeha Şehît Eşref xaniyek prefabrîk avakiribû û qismek wekû navenda xwe bikartanî û odeyek jî wekû nexweşxaneya wargehê veqetandibû. Jixwe piraniya caran doktor tinebû û gel nexweşên xwe li bajarên derdor bi derfetên xwe tedawî dikirin. Ji sedema sitarek ya dibistanan tinebû, mamosteyan ders ji der ve didan xwendevanan û ji bû peydakirina çadirekî di nav hewldan de bûn.

Piştî demek pir kurt bi arîkariya saziyek xêrxwaz çadirek mezin li derê wargeha geliyê Qiyametê hatibû vedan û ev çadir wekû dibistana ‘seretayî ya Saleh KENDAL’ hatibû binavkirin. Kurdeleya dibistanê, ji aliyê Sînanê sohr yê berpirsê Eniya Rizagariya Netewa Kurdistan yê heramê vê hatibû birîn (18. 01.1995). Di vê rêvantiyê de ev dîroka wekû fermî dîroka destpêkirina perwerdeya dibistanan hatibûya qeytkirin.

Ew hefteyekbû wekû fermî dibistan hatîn vekirin. Ji bû rayêdarên DY li berxwe nekevin û arîkariyê bikin, berpirsê UNHCR yê Duhokê hatibû vexwendin. Şahiyek ji qestîka ya vekirinê ji wan re hatibû amadekirin û ji bû vekirinê berpirsê mijara gotinê bi karwanek tirimpêlên spehî ve hatibû Şehît Eşref. Bi awayek pir qure ji tirimpêlên xwe peyabûn û dibin barana çepkên mihaciran de dubare qurdele birîn. Zilamê kelepoz xaftinek kurt kir û soza arîkariya amêrên dibistanê da. Girseya kom biyî dibin lêhvên xwe de, di beşişîn û bi wê xapa xwe ya rûvîtî dikenîn.

Ew deh rojek bû dibistana Salîh KENDAL wekû fermî dest bi dersdayînê kirî. Kurdan bindestiya xwe bi nezanînê ve girêdidan û girêdayî wê dibistanan ji bû wan pir nirxek mezin hildigirt.

Dibekû di vê serîwenê de çalekiya herî şadker vekirina dibistanêbe. Ji roja dibistan vebûyî û pêve, ketibû ber lehiya serdanvanan. Her roj bi dehan ref dihatin dibistanê û mamosta pîroz dikirin. Her koma dihat jî ligor derfetên xwe perûyekî tanîn. Serdanvanên wê carê rêvebertiya saziya hêza xweparastinbû. Bi bejna xwe ya kin û li hevhatî Feqeyê Goveşîrî li pêş û hevalên din li pey dan bi derê dibistanê ve. Feqe, wekî zarokek sêwî di cejnê de hêkek neqişandî bidest êxistî şadbû. Hêşedar[34]a mamosta ya wê rojê keçek zerîn, bejin navîn û rûgeşbû. Bi rêz û siyanetek mezin serdanvanên xwe pêşwazî kiribûn. Mamostaya navê wê Çîçeka spêrtî, di aliyê civakî de pêşketî û keçek xweşbêjbû. Kovara 'Rewşen' ya li ser mêze yê dest çêkirî rakir û nîşa serdanvanên xwe kir û got;

"Girêdayî zimanê Kurdiyê nivîskî, xizîneya di destê me de ev kovare. Her mamosta dersa xwe ya rojê êvarî li mal dinivîse û wisa dide. Şazdeh ref xwendevanên me hene û em heşt mamostane. Jixwe dibistana me jî heşt refe. Ankû her du danê mamostayan fol dagirtîne. Xwendevanên li wargeha Bêsivê îmtîhan bûyîn, li vêdê derbazî refa sê bûne. Ankû hin zarokên temenê wan mezin, li Bakur di dibistanên turkan de xwendîn, pirsgirêka wan ya xwendin û nivîsandinê nîne û zarokên nû dest bi dibistanê dikin em wan wekû refên cuda ji hev vediqetînin."

Piştî zengilê hevala Çîçek, mamosteyan navber dabû û dengek ne asayî bi wê çadira mezin ketibû. Nêzî sê sed xwendevanên zarok bûn. Tenê dengê lingên wan têra qetandina perdeya guhê mirov dikir. Di çadira mezin de, bi bilokan ref ji hev hatibûn veqetandin. Dîwarê pirkêt biqasî bejna mirovekî bilind kiribûn û jor hemî vekirîbû. Di dema dersê de kûjan mamosta kêmekî dengê xwe bilind bike, hemî refan bandor dike. Jixwe di wan mercan de pêwîste deng ji xwendavanan dernekeve. Megefonek piçûk li cem mamosteya hêşedarbû û her refa deng jê dihat bi megefonê hişyar dikir. Dîsa di dawî ya her navberê de mamosteyan xwendevanan li derê dibistanê îştîma dikirin. Mamostaya hêşeder li pêşya xwendevanên di rêzê de disekinî û her mamosta derbazî serê rêza refa xwe dibû. Mamostaya hêşedar bi fermanên; "çep, rast, dest ser mil, dest deyne" xwendevan rêz dikirin û bi hev redurişma "An serkeftin an serkeftin" tavêtin û zarok ji rêzê ve di ketin refan de. Di îştîma herî dawî de durişma "Bi can, bi xwîn em bi te re ne ey Serok" bi hev re dubare dikirin û belav dibûn.

Piştî wê serdanê deh, dazdeh rojan mamosta Çîçeka Spêrtî, biryara xwe dabû û tevlî Refên ARGK'ê bibû. Bihara 1998'ê li herêma Garisa Bohta, di encamê şerek dijwar de ji aliyê artêşa Turkan ve

34 Nobedar.

hatibû şehît êxistin.

***

Di heman demê de bi xebatek bê hemsal bicêhbûn û xwe rêkxistinkirina wargeha Şehît Azad jî dewam dikir. Wekû xwezayî Şehît Azad, ji Şehît Eşref paşdetirbû. Ji ber kû mehekî piştî wê hatibû. Pirsgirêkên wê yên civakî, rêkxistinî jî ji ya wargeha din cudatirbûn. Şêniyên avana Şehît Eşref pêktanîn têkelbû. Piraniya wan ji gundên cuda hatibûn. Wekû nimûne; ji gundek yê Cizîrê du milîsên di encama xebata xwe de bûyîn hedefa dewletê û li ser wî bingehî, bi erê kirina hevalên qadê jî derbazî wargehê bibûn. Nêzîkatiya wan ya li rêkxistinê, li rêkxistinbûnê, di aliyê nas kirina stretejiya rêkxistinê, rastiya îdeolojî de erenîtir û zanîndartirbû. Bi gotinek din, neçartir jî bûn. Dema warê xwe terk kirîn, wekû madî nikarîbûn zêde tiştekî bi xwe re bînin. Li aliyê din nas, dost û têkiliyên wan yên Başûr tinebûn, heke hebin jî pir kêmbûn. Hevgihandina van her du bandoran dibû sedem kû bêhtir nêzîkê xeta PKK'ê tevbigerên.

Avana Şehît Azad, ji du gundan pêkdihat. Ji ber kû gundên wan nêzîkê sînorbûn û bi destûra dewletê derbaz bibûn, hema bibêje hemî tiştên xwe bi xwe re anîbûn û wekû madî pirsgirêkên wan yê mucid tinebûn. Dîsa ji nîvê zêdetir xizmên wan li Başûr bûn û di aliyê serbestiyê de qada wan firehtirbû. Ya din û ya herî girîng, avana gund hemî di heman astê de ne nêzîkê rêkxistinêbû. Di aliyê îdeolojîk û xeta jiyanê de pirsgirêkên wan yê mucid derdiketin holê. Hin ji wan bi niyeta derbazî Başûr bibin û wekû asayî li gel nas û dostên xwe jiyan bibin hatibûn. Hin bi hesabên çend mehan hatibûn. Hin jî li ber bayê yên hatîn ketibûn. Qismek jî ji bû xatirên xizmên xwe hatibûn. Yên bi niyeta, di her şertî de bi rêkxistinê re tevbigerêne hatîn, pir kêmbûn. Ev faqtor hemî sedembûn kû pirsgirêkên wan yê rêkxistinî zêdetir bibin. Ema tiştekî ev neyîntî hemî dadiqurtandin; ew jî ruhê saf û paqij yê gundîtiya Kurdisanê bû. Bi teybet ruh, kelecan û heskirina jiyanê ya jina geliyê Goyan, ji ya herêmên din ya Kurdistanê pir bandorvantir û zindîtirbû. Di nav şêniya eşîreta Goyan de ruh, niyet û nêzîkatiya jinê desthilatdarbû. Ji ber wê nêzîkatiyek zêde hesabdar û bîrkarîtî ne derdiket pêş. Di aliyê erêntiyê de ev faktor xweyê bandorek mezinbû.

Li gel hemî kêm û kurtiyên heyîn, bi arîkarî û fedekartiya kadroyên PKK'ê di demek pir kurt de li wargeha Şehît Azad jî sînorên semt û taxan hatibûn kifşkirin, rêvebertî û komîteyên wan ji nû ve hatibûn hilbijartin. Dîsa saziya asayîş, hêza xweparastinê, malbata şehîdan û saziyên din yên pêwîst hatibûn avakirin. Jixwe serpêhatiyek ya wargehên bûrî jî hebû û vê serpêhatiyê karê wan

hêsanîtir dikir.

Her çiqasî biteybet avana wargeha Şehît Azad pêktanî di hatinê de dudilî jiyan bûyî be jî piştî hatin û bicêhbûnê, ji wê israra xwe ya nehatinê poşman jî bibûn. Etrûş, di hemî aliyên xwe de ne ji wargeha Bihêrê kêmtirbû. Ya herî girîng Etrûş, biqasî sed û şêst kêlûmitreyan ji sînorê dewleta Turk dûrbû û halê hazir bi top û balefiran nikarî bandorek mucid jî li warê wan yê nû bike.

Ji bû rêkxistina qada perwerdê û bi teybet vekirina dibistanan, ji aliyê TAK'ê ve Xelîlê Ruhayî hatibû erkdarkirin. Ji sedema kesên li wargehên din mamostatîkirîn kes ne hatibû wargeha Şehît Azad û hemî li Şehît Eşref bicêh bibûn, pêwîstî bi hilbijartina mamostayên nû hebû. Di encama pêşniyarên gel, xebatkarên semtan û çavdêrtiyên hevalê Xelîl de, ji ciwanên li gund dibistan xwendîn mamosta hatibûn kifşkirin. Bi xebatek bê tebat ya Xelîlê navser, pêwistiyên dibistanê hatibûn dabînkirin. Piştî hemî amadekartî hatîn timamkirin, li Bakurê niwaloka semta Hilal û Mijîn ji hev vediqetîne çadirek ji yên asayî pir mezintir û bi rengê hişînê tarî hatibû vedan. Li ser paçê capûn ya bi bedena çadira hişîn ve hatî hilawistin, nîvîsa "Dibistana Seretayî Ya Dr. Nûrî Dêrsimî -11. 02. 1995- hatibû nivîsandin. Mamostayên wê dibistanê, bi mamostayên dibistana Şehît eşref re wekû hemaheng dixebitîn û bernameyek şirîk bikartanîn. Di aliyê devok û dîksiyonê de cudatiyek piçûk ya devoka eşîra Goyan ji herêmên din hebe jî lê, ji sedema xwendevan û mamosta ji heman herêmêbûn, pirsgirêkên mucid ne derdiketin.

***

Bi hatina koçberan ya wargehên nû re û bi daxiyaniya UNHCR ya 'pajirandina mafê mihacirtiya siyasî' re DY, serê malbatê çadirek, çend betanî, sopeyek eledin, fanosek piçûk, çend firaxên bafon belavkiribûn. Dîsa wekû mehane serê kesê neh kêlo ar, nehsed xiram dohn, sêsed xiram şekir, sêsed xiram nîsk û sed û pêncî xiram ça dabûn. Wekû fermî cara yêkemîn rayedarên UNHCR, di nav koçberan de serhêjmar pêkanîbûn û di navbera hêjmara rastî û ya helefeyan de ferqên mezin derketibûn holê. Bi Erebî ji saziya UNHCR re "helefe" dihat gotin. Başûriyan jî UNHCR, bi wî navî navdikirin û ew pênase derbazî nav mihacirên Bakurî jî bibû. Ji wê sedemê, gelê wargehan jî ji UNHCR re navê 'helefe' bikartanîn.

Qûtê helefeyan dida têra hefteyekî jî ne dikir. Derfetên gel yên xwe bi diravên xwe xweyî bikin jî qedabûn. Ji bû gel zêdetir qût ji helefeyan bigrin, hêjmara xwe zêde didan nivîsandin. Ev hêjmara zêde jî wekû 'hêjmara helefa' dihat binavkirin. Dema mirov pirsa hêjmara malabatekî dikir, pirsa "hêjmara rastî an ya helefa" dikirin.

Ji ber kû di navbera her du hêjmaran de ferqên mucid hebûn.

Ger kû êdî saziya mihaciran UNHCR, birêkûpêk dihat û diçû jî nakokiyên di navbera wan û gelên wargehan de ne rabibûn û her kû diçû kûrtir dibûn. Xerîbe ema, rayedarên DY mirovên bê rêz, bê exlaq, bê îdeolojî, ji siyasetê dûr, bê rêkxistin, bê parastin û ankû bê serûber dixwestin û ev merema xwe jî eşkere tanîn ziman. PKK'ê jî tam berevajî; ji bû gel birêzbe, xweyê îdeolojiyek pêşketî be, siyasetvan be, birêkxistî be û girêdayî vê bisazî û dezgah be hewl û xebatek bê eman dimeşand. Nakokî û li hevketina mezin ya gel û DY ji vêdê jêder dibû. Rayedarên UNHCR'a DY vekirî digotin;

"Çima komîteya we ya belav kirina qût û tiştan heye? Çima dema em ji we re tiştan tînin, hûn êrîşî tiştan nakin, nadin ser serê hev û nirxên xwe nayêxin? Çima rêvebertî, mejlîs û asayîşa we heye?"

Di encamê van nakokiyan de her roj gefên terk kirinê li gel dikirin û digotin;

"Heke hûn di kirinên xwe de israr bikin, xwe ji PKK'ê dûr negirin û bi hemî awayî xwe ne sipêrin me û PDK'ê, emê dest ji we berdin û Turkên we qir bikin."

Ankû jû bû gel tayê bipejirîne, mirin nîşa wan dikirin. Lê, koçberan guhdarî gefên wan ne dikirin, sazî û dezgahên xwe mezintir ava dikirin û hê bêhtir xwe bi PKK'ê ve dişidandin.

***

Bi kêm û kurt jî be, bi êş û azar jî be ew zivistan bê pirsgirêk derbaz kiribûn. Nakokiyên wan û pergala UNHCR'a Dewletên Yêkbûyî kûr jî bin, di astekî de li hev kiribûn. UNHCR, her meh qûtek bê qîmet, biqasî nemirin li wan belav dikir, ala xwe ya parastinê kişandibû banê wargehan û ya ji hemiyan girîngtir jî statûya wan ya siyasî îlan kiribû. Kadroyên PKK'ê, dîsa li nav wargehêbûn û pêşvantiya çareseriya hemî pirsgirêkên wan dikirin. Rêxistin dikirin, sazî û dezgahên wan didamezrandin û ya ji hemiya girîngtir jî dibûn pergala wan ya xweparastinê. Pêşmergeyên PDK'ê, xwe dabûn aliyekî û qenc û xirap tevlî wan ne dibûn.

Meha Adarê bû û Biharê pehnava Etrûş, çiyayê Kanika bi rengek kesk nixwimadibû. Robarên her du wargehan jî hebûn û pirsgirêka wan ya avê jî tinebû. Hol hola şivan û bêrîvanbû û dengê mih û berxan, zozanê Kêla Memê tanî bîra mirov. Ya herî girîng, êdî azadbûn û tirsa îfadeyên derew ji romiyên Romê re amade bikin tinebû. Jixwe hîviya di demek nêzîk de bawayek azad vegerin ser warên xwe li devê derîbû.

Ji nû ve bicêhbûn û xwe rêkxistinkirin roj dixwarin û dem

dixwest. Her kes bi pirsgirêkên her kesî ve û bi yê xwe ve mijûl dibûn. Ji xeynî pirsgirêkên jiyana rojane, ji nûve avakirina komîteyan, kifşkirina sînorê semt û taxan, cihê dibistanan, yê asayîşê, kolikên semtan, tespîtkirin û hilbijartinan mamostayan, qeydkirina xwendevanan, peyda kirina pêwîstiyên mamosta û xwendevanan dem û xebat dixwesta. Ji sedema wargeha Şehît Eşref, zûtir hatibû, ev pirsgirêkên xwe bipiranî çareser kiribûn. Lê gotin di cêh de be, ji hinga hatî ve wargeha Şehît Azad lingên xwe ne êxistibûn di bin xwe de.

Herêma Etrûş, coxrafyek şilokebû û hembêje her roj baran dibarî. Her der kolayîbû û her der herîbû. Heriya axa sohr wekî deboqan[35]ê lê hatibû. Bergehê wargeha Şehît Eşref fireh, çiyayî û bidaristanbû. Ligor wargeha din hêjmara wê jî kêmtir û bêhtir destdayiyê jiyanêbû. Lê pehnava wargeha Şehît Azad, bi gund û zeviyên çandî bose[36]kirîbû. Nêzî heşt, neh hezar mirov di qadek teng de hatibûn komkirine û lept û tevgera wan mûrî reşkan hêlîn xirabûyî tanîn bîra mirov. Ya baş qismek mezin ya erdê Şehît Azad bêrzanbû û heke ne hatibûya kolan ne dibû herî. Ji bû mirov pêlava xwe ji wê heriya wekî debpqanê paqij bikin, direvîn ser wî bêrzanî. Lê, heke wisa dewam bike, bêrzan, mêrzan jî xwe nagire û her dera bibe herîsohrik.

Axlêveya zûbû. Ji berfê belekî ne ketibû serê çiyayê Çiravê. Li dor geliyên kûr têrxwer çêbibû û devê pezê Nêrwehiyan nû bi giyayê salê ketibû. Rûyê zarokên koçberên di bin çadirên havînî de Zivistanek dijwar derbaz kirîn qemitîbûn. Dûyê li ser lûleya sopeyên daran diketin, li ezmanê geliyê Qiyametê girên ewrên lewitî tanîn holê. Çavên bê xew yên zilamên berê wê sibhê ji Gara zivirîn, ji hundir dikenîn. Kefiyên sêrtikî li stoyê xwe pêçabûn û hê jî pêlavan wan yên zer ji berfê şuştîbûn. Hevkartî û heskirinek bi serasayî re di nav koçberan de hebû û ji bû gel nekeve dibin psîkolojiya mihacirtiyê de û fêrî ruhê mihacirtiyê nebe; kadroyên PKK'ê hewlek bê eman dimezaxtin û di astekî de ser jî ketibûn. Mirov li kû malê dirûnişt wekî mala xwe hîs dikir. Bi teybet malîvanên jin ev hîs zû bi mêhvanên xwe didan jiyankirin. Rûkentî, dilgermtî û merdîtiya li wî warî, li ti derên cîhanê ne dihat peydakirin. Kurd bi çanda xwe ya mêhvanperwertiyê navdarbûn û dema bi terbiya PKK'ê jî dihat sitirhan ruhek muhteşem derdiket holê. Gelê wargehan biçavên gêrîla li her kesên bê malbat dinêrîn û qedrek mezin didan wan. Di wan mercên zor de nan, betanî, çadir û hertiştên zarokên xwe ewqas bidilgermî, ewqas birûkentî mirov re parvedikin kû êdî mirov diket

35
Madeyek bidebûş. Di zemanê bere de ji bû girtina çûkan dihat bikaranîn.
36
Çember.

di bin barê şermê de. Bêjeya ‘behremend’ li hember kirinên wan mirovan kêm û sebiqî dima. Di rastiyê de ne parvedikirin, ji dilê wan dihat ya heyî hemiyê bidin mêhvanên xwe. Wan mirovên Bohtî îspat kiribûn kû merdîtî, behremendîtî, rûkentî, ruhgermî û xweşmirovtî ne ji heyînêbû; çandekebû, exlaqekbû û ev exlaq jî ji koka dîrokek dûr û kûr dihat.

Ya ji hemiyan balkêştir, tevna koçberan ya civakîbû. Piraniya mihaciran gundînbûn û bi hezaran sal di gundê xwe de jiyan bibûn. Bê goman ew sefera wan ya herî balkêş û dibekû ya herî dirêj jî bû. Dîsa ji bilî çend gundên nêzîkî sînor yên bigiştî hatîn, yên din her çend malekî ji gundekî hatibûn. Ankû kesî zêde derbazbûyiyê kesî nizanî. Her kes di nav hewldanek mezin de bû kû neyîntiyên xwe yên di demên derbazbûyî de jêbibe û xwe wekû kesek bê qusir bide naskirin. Meydan ji zirtan re vekirîbû. Mirov serê xwe têxist di kûjan çadirê de, dest bi vegotina çîroka xweya bê dawî ya qenciyan dikir. Xwezayiye, tu kesî dikara xirabî û kêmasiyên xwe ne dikir. Jixwe heke mijar welatparêzî be, zirt ji hewa ve difirîn. Pesarteka wê jî hebû bê şik. Rêvantiya wê serîwenê îspata herî mezin ya welatparêztiya wan bû. Li wî warî, di nav wan çadirên peritî de her kes welatparêz jidayik bibû. Jixwe bi ser lehengtiya wan re, leheng ne dihatin pênasekirin. Ankû wekû erênî mêşa xwe têxistin gamêş û di gamêştiya wê de rikdarbûn. Ya hê xerîbtir, êdî wan bixwe jî ji tiştên digotin bawer dikirin û dikarîn sond bixwin; li gundê wan mirin tinebû. Yanî sed guneh ji ber xêrekî ve çûbûn û gunehên wan ne mabûn. Di cîhanê de gund ji gundê wan xweştir, eşîr ji ya wan mêrxastir û leheng bi ser pozên wan re tinebûn. Rêvebiran zêde gel nas ne dikirin û piraniya gel jî hev nas ne dikirin. Êdî iş mabû li ser zirtek zêde û li ser kêrhatina vegotinê.

Dîsa wê rêvantiyê, nazdartiyek ne asayî bi xwe re hilberandibû. Çawa malbatek zaroka xwe bi delilîne û bi demê re ew dilalandin bi xwe re pirsgirêkên din bîne, hê ji niha ve pirsgirêkên bi wî rengî hêdî hêdî rû didan. Wekû numûne; dema di navbera du malbatan de pirsgirêkek derdiket, rêvebertiyê di çareserkirinê de zehmetiyên mezin dikişandin. Ji ber kû misoger aliyek mafdar û yêk neheqbû. Dema rêvebertî bixwaze pirsgirêkê sergirtî bike, aliyê mafdar dilmayî dibû. Dema ji neheq re bêje; “tu neheqî” neheq û hemî derdora wî dilê xwe digirtin û vê carê jî berê tîrên xwe didan rêvebertiyê. Ji niha ve kifş dibû kû ev nazdartî û bi gotinek din, biserxwe çûyîn ya di demên pêş de pirsgirêkên pir cudatir bixwe re bi afirîne.

**Şerê Qirêj û Bêbext**

Di çanda kurdan de 'şerê qirêj' têgihek nûbû lê, bêjeya 'bext' wateyek têr raz dihewand. Kesê bibext hemî qencî û yê bêbext jî berevajî hemî xirabî temsîl dikirin. Jixwe dema qirêjtiya hêzên desthilatdar, dagirker û bêbextiya navxweyî digihat hev ya star ti sînorên beşerî nas ne dikirin. Niha li Başûr, mirov bihevgihandina wan her du hovîtiyan re rû birûbûn.

Qirêjtiya dewleta Turk û bêbextiya PDK'ê hevsarê xwe qetandibû û hemî nirxên mirovî binpê dikirin. Ne kurdîtî, ne turkîtî û jî ne welat, ne mak, ne zarok û ne jî mirovtî; tiştek ne di xema wan çeteyan de bû. Pergala mejiyê wan li ser bazarvantiya xwînê hatibû avakirin û dibêjîqey wekû bazirganên xwînê jidayik bibûn. Berjewendiyên xwe li ser qirkirin, wêran û êşa mirovan avakiribûn. Mirov çiqas zêdetir hatibûna kuştin û şer û alozî çiqasî serwerbûya, ew hêz ewqasî şad dibûn. Nijad û entîsîteya mirovên wêran dibûn, dihatin kuştin  ne di xema wan de bû û ji bû wan ferq ne dikir. Ew, tenê li pey fitne, fesadî û tevlîheviyê digeran.

Ew zêdeyî sê salabû Başûr û biteybet herêma Behdînan dibin desthilatdartiya PDK'e de bû. Amerîka, di encama şerê Xelîc de dilxwede ji bû parastina gelê Başûr, di navbera dewleta Êraqê û Başûr de Parelêla 36 kiribû sînor û xaka Başûr teslîmê partiya mala Berzanî PDK û partiya Mala Telebanî YNK'ê kiribû. Mam Celal ji Parîsa Fransa û Kek Meshûd jî ji Newyorka Emerîka dabûn hev û bi balefiran anîbûn û li Başûr kiribûn hukumdar. Ne di aliyê civakî, ne siyasî, ne çandî, ne aborî û ya ji hemiyan girîngtir jî ne di aliyê exlaqî de amadekartiyeka wan ya rêvebirina gel tinebû. Jixwe ew nêzî pêncî salabû dagirkerên Êraqê tevna civakî ya gelê Başûr perçe perçe kiribû û ji nişkan ve bexşindana desthilatdartiyê encamên tu kes nikaribe xeyal bike bi xwe re anîbûn. Destê kê di kûrikê kê de bû û kê xizmet ji çi re dikir ne diyarbû. Dibêjîqey tenê û yêkemîn şertê bexşandina vê desthilatdartiyê, dijminatiya PKK'ê bû. Rastiya di holê de kifş û eşkere dixwiya ev bû.

Gotin di cêh de be, MÎT'a Turkan Başûr û biteybet jî Bajarê Zaxo kiribû ringa xwe ya leyîstok û kuştinan. Di yêkemîn sala xwe ya desthilatdartiyê de YNK'ê û PDK'ê xwe dabûn hev û bi dewleta Turk re êrîşê PKK'ê kiribûn. Di wî şerê çil roja ajotî de û di dîroka Kurdan de wekû "şerê xiyanetê" hatî binav kirin; bi hezaran ciwanên kurd hatibûn kuştin. Sedem, qet! Tenê ji ber kû dewleta dagirker wisa xwestibû. Dîsa di wê navberê de, bi dehan aligirên PKK'ê yên ji ber turkan revîn û hatîn Zaxo bi cêhbûyîn, serê wan hatibûn jêkirin û wekû pêrû ji dagirkerên Turk re hatibûn pêşkêşkirin. Hin di mala xwe de hatibûn kuştin û hin jî ji mala xwe hatibûn revandin û bê serûşûn hatibûn wundakirin. Ji wan çend kesên nasnameya  wan

hatî peydakirin evin;

Dehê Cotmeha 1994'ê, MÎT'a turkan bi hevkarên xwe yên xwecih re li Zaxo operasyonek lidarxisitbûn û nîvê rojê Mehmût Melekê Hilalî, Eşrefê Nisêbînî, Evdila Yamanê Repinî ji mala wan derxistibûn û li derê malê înfaz kiribûn. Bi dehan kesên welatparêz jî revandibûn û bizorê sipartibûn MİT'a Turk. Piştî wan zextan, alîgirên PKK'ê yên ji Bakur revîn û xwe spartîn herêma Behdînan, ankû yên karîn xwe ji nav kulabên MÎT'a Turk û partiya mala Berzanî rizgar bikin, koçî wargeha Zelê kiribûn.

Zelê, qampek ya gêrilayên ARGK'ê bû û di pêvajoya şerê Xiyanetê de, di encama li hevkirina Celal Telebanî û Osman Ocalan de hatibû vekirin. Piştî pêkhatina qampê salekî, dewleta Turk bi 55 balfiran êrîş biribû ser qampê û di encama wê êrîşê de piranî jin û zarok hifdeh kes hatibûn qetilkirin(28. 01. 1994). Dilxwede hingê şer rawestabû û malbatên ji bombebarana Turkan felitîn dubare zivirîbûn Zaxo.

Di dîroka 22. 02. 1994'ê de li Zaxoka Behdînan, ji koçberan Muhemed Xalidê Şirnexî, Nazmî Oren, Veysel Ûlper û kesek din yê nasnama wî ne hatî fêrbûyîn, ji malên wan hatibûn revandin û bê serûşûn wunda kiribûn. Dîsa di heman bûyerê de Muhamed Tahirê Spêrtî, Osmanê Îsivê Hilalî, Musa yê Deredewşî, Nadir û Osmanê Silopî teslîmê MÎT'a turkan hatibûn kirin û derbazî îşkencexaneyên Turkan kiribûn. Jixwe piştî li Bihêrê wargeh hatî ava kirin, ew malbat hemî revîbûn û tevlî karwanê koçberan bibûn.

Piştî koçber derbazî geliyê Qiyametê û Etrûş jî bûn, wan hêzan dest ji kirinên xwe bernedan. Ji bû gelê Başûr û PKK bînin himber hev û şerek yê navxweyî yê nû derxînin, bê eman dixebitîn. Wan hêzên dabaşa gotinê di dîroka 29. 02. 1995'ê de çalekiya xwe ya mezin û navdar pêk anîbûn. Heştê sibhê li bazara dolara ya Zaxo tirimpêlek tijî TNT teqandibûn. Û di encama wê teqînê de sed û dazdeh kes hatibûn kuştin û bi sedan jî birîndar bibûn. Xerîbe, ji demjimara destpêkê ya wê teqînê û pêve, biteybet melayên mizgevtan ketibûn di dewrê de. Ji bû kîna gelê Başûr li hember PKK'ê tûj bikin û bûyerê bêxin di stoyê PKK'ê de, hewldanek bê merîs dimeşandin. Qetla gêrîla û alîgirên PKK wacip dikirin û şerê li hember PKK wekû cîhat îlan dikirin. Piştî qirkirina Zaxo sêzdeh rojan, artêşa Turk bi desteka mala Berzanî derbazî Zaxo bibû. Leşkerên Turk û pêşmergeyên mala Berzanî li bajarê Zaxo operasyon lidarxistibûn û bi dehan alîgirên PKK'ê înfaz kiribûn. Yên sax girtîn jî bi xwe re biribûn. Li ser wê bûyerê, ji her du wargehan sed û heştê kesî li Duhokê, li pêşya Navenda DY çalekiya rûniştinê destpêkiribûn. Di encama çalekiyê de, welatparêzên li Zaxo û gundên derdor di dorpêça artêşa Turk de asê mayîn felitîbûn û

hatibûn wargeha Şehît Azad.

Ji bû ronahîkirina bûyera teqîna li Zaxo, TAK'ê hemî derfetên xwe seferber kiribûn. Piştî bûyerê mehekî kesek gomandar û dilxwede dixwaze tevlî refên ARGK'ê bibe li çiyayê Spî hatibû girtin. Di encamê îtîrafên wî kesî de derketibû holê kû bûyer bi fermana Abdullah Çatli û Ebû Enter ji aliyê wî, Hacî Mahmûd, Hesen Hacî Elî û kesek bi navê Sekvan ve hatibû amadekirin û yê tirimpêl danî bazarê jî ew bixwe bû. Dîsa di îtîrafên xwe de eşkere gitibû kû ji bû kuştina endamên pêşvan yê TAK'ê ji aliyê Ebû Enter ve hatiye erkdarkirin.

Ebû Enter; di salên heftiyê de perwerdeyek dirêj ya MOSAD'a Îsraîl re hatibû derbazkirin. 1979'ê Fermandartiya qetilkirina Dr. Xalid, Elî Esker û 700 hevalên wan kiribû. Dema bûyera Zaxo qewimî berpirsê bajarê Zaxo û endamê pûlot bûroya PDK bû û malbata wî li Amerîka jiyan dibe.

Heyva Adarê kewna xwe jiyan dibû. Çiyayê Kanika, girê Eslan, Çirav, çiyayê Şêxan û dola Etrûş xwe kesk xemilandibûn. Jixwe gotin ji spehîtahiya seyrangeha geliyê Qiyametê re ne dihat kirin. Wekî hanerenginekî dibêjîqey hemî sêhrvantiya xwezayê di xwe de komkiribû û wekî bûka li pişt perdê ji xwecihên xwe yên nû re dibeşişî. Şirêna sûlavan û dengê şalûl û bilbilan tevlîhev dibûn û hezidandina welatê Bohta dikişanda ser bejna xwe. Bêrîvanên teşîrês, bi aşîrkên vale diçûn û barkirî ji çiyayê Şêxan dizivrîn. Dengê meşkên kevaniyan, banehiyên Kêla Memê tanîn bîra mirov. Ew komana kedkar zû fêrî warê xwe yê nû bibû û yê nizane, yê bibêje qey ew deh salbû li vêdêbûn. Ji bilî di çûyîn û hatina bajaran de bêrêziya pêşmergeyan li hember wan dikirin, ti pirsgirêkên wan tinebûn û bexteyarbûn.

Hê karwanê koçberên xaka welatê xwe têr bi bihara xwe şad nebûyîn, gote gotên 'artêşa Romê ya derbazî Başûr bibe ketibû di rojevê de. Evê nûçeyê kêm jî be sihek êxistibû ser keyfa gelê wargehan û rojeva wan guhertibû. Lê, bandorek mezin ne kiribû û keyfa ji tevlîbûnyînên nû girtîn, ew nûçe bê bandor kiribû.

Kelecan, rojev û lebata wan ya tevlîbûyîna mihacirên nûbû. Êlûna sala bûrî sê gundan ji herêma Colemêrgê sînor qetandibûn û li navçeya Şêledizê li cem xizm û nasên xwe bicêh bibûn. Bi agahiya 'artêşa dagirkera derbazî Başûr bibe' re, bi arîkariya rêvebrtiya wargehan gundiyên gundê Sêvê, Bêtrot û Kinyaniş tevlî koçberên Şehît Azad bibûn. Li milê jor yê Bakurê wargehê danîbûn û bi hûr û gir ve hemwelatiyên wargeha qulibibûn wêdê û heşirbû. Koçberên kevin, bi vê tevlîbûyîna nû ewqas keyfxweş û şad bibûn kû bi gotinan ne dihat ziman. Jinan zarokên xwe yên li ber şîr hiştibûn û çi bi dest êxistibin ji wan re dibezandin. Nan, ar, birinc, av , betanî,

sope, fanos, balgeh hema çi ji destê wan hatibe. Jixwe ji berya werin zilaman destbi amadekartiyên cihê wan kiribûn.

Yadê Narinc, jinek tenik, dirêj û di wî temenî de jî zêde tiştek ji spehîtahiya xwe wunda nekiribû. Her kesê di wargehê de merdbû û her kes behremendbû. Ema, Yadê Narinc cudatirbû. Egîd'a wê sala 1988'ê tevlî refên ARGK'ê bibû û 92 yê li eyaleta Erzirom şehîd ketibû. Dema hevjînê wê xebera Şehadeta kurê xwe dibihîze, ji nişkan ve dixwirime û hişê xwe wunda dike. Ji wê rojê û pê ve her tim di quncikekî de rûniştîbû û bi awrên kul, êş û keder barkirî li cîhanê dinêrî û qet ne taxivî. Yadê Narinc jî bi çavê Egît li hemî xerîban dinêrî û bi peyvên wekî "delala min, Egîda min" xîtapî hemî mirovên xerîp dikir. Sedem çiye ne dihat zanîn lê, Yadê Narinc pêveka mê "a" tanî paş navê hemî nêran.

Wekî her tim dîsa zendên Yadê hildayîbûn, dawa xwe biberve kiribû, sê, çar betanî li ser milanbû û bi gavên lez berbi mêhvanên nû hatîn ve dibezî. Di nav heriya bi bin cihê koçberên nû re singa Merwanê Zivin Şikakî û Yadê li hev aliqî.

"Yadê xêre, ev çi lez û beze?"

"Delala min, ezê van betaniyan bibim ji van totakên Şêlediziyan re. Belangaza nû hatine, niha tiştek yê wan nîne."

"Qey ew Şêledizîne Yadê?"

"Bixwidê ez nizanim delala min, dibêjin ji Şêledizê hatine" got û bilez bi kaşikê bin cihê Şêlediziyan re hawaket.

Ew nav qet ne hatibû guhertin. Wekî 'hungo'yiyan heta ew war avabû, her ew semta wekû Semta 'Şêledizî'yan hatibûya bilêhv kirin.

Hemabêje êdî derbazbûna artêşa Romê mîsoger bibû û tenê roja wê û şêwazê derbazbûyîna wê ne dihat zanîn. Ji bû ev artêşa dagirker ziyanê nede wan, rêvebertiya wargehan bi arîkariya Hevalan koçberên di demên cuda de derbazî Başûr bûyîn û li cem nas û dostên xwe bicêh bûyîn bi hewarî li wargeha Şehît Azad kom dikirin. Ji bilî Şêlediziyan hêjmarek mucid ji navend û gundên derdora Çelê malbat hatibûn Başûr û li cihên cuda bicêh bibûn. Ew jî bi hewarî diherikîn wargehê. Piştî her du neqlên destpêkê yên ji Bêsivê hatîn geliyê Qiyametê, êdî UNHCR destûr ne dida koçber derbazî Şehît Eşref bibin û koçberên nû hemî li Şehît Azad bicêh dibûn. Her kû diçû Şehît Azad mezin dibû û jixwe wekû navend UNHCR jî ewder bikartanî. Şehît Azad, bi malîvantiya xwe serbilindbû û kêmekî jî xwe qure dikir.

**Girkê Vira**

Cadeya ji rêya qîr vediqeta, bi ser wargehê re heta dawiya

malan diçû. Ji bilî navenda UNHCR ya bi teybet hatî çêkirin û xemilandin, ti mal li jorê rê tinebûn. Li jêrî rê ya li hindama semta Şehît Îsmaîl, girikek şîrîn û biqasî pênç, şeş mitreyan bilind hebû. Li derdora girik, çend çadirên wekû dukan dihatin bikaranîn jî hatibûn vedan. Mirov ewder wekû bazara wargehê jî binav kiribûya ne şaşbû. Mirovên ji bû pêwîstiyên xwe dihatin wan dukanan, carna xwe li serê vî girikî didan tavê, civat girê didan û sohbet dikirin. Di demek kurt de ew girik, bibû cihê qesta kesên betal, nekar û yêktiyar. Demek hat, ji destpêka rojê heta tarîtiya şevê te ax hilbavêta ji mirovan li erdê ne diket li ser wî girikê şîrîn. Jixwe di dema nûçeyên BBC de dîmenek ecêb derdiket holê. Kesên xweyî radyo şivikên radyoyên xwe dikişandin, nêzîkê guhên xwe dikirin û kesên bê radyo jî komik bikomik çokvedidan û bê hemd serê xwe bi aliyê xweyî radyoyan ve xwîz dikirin. Bêhna xwe digirtin û çavên xwe dinoqandin. Di wê gavê de hemî dukan hatibûna şelandin ruhê dukandaran ne dibhîzt. Êdî ajansa nûçeyan ya ne fermî li Girkê Vira hatibû avakirin. Li ser wî girikî Hevalan çalekî dikirin, Kurdistan azad dibû, koçberên wargehan bi alan dîlan vedigeran gundên xwe. Dîsa li ser heman girikî qumîteyên semtan ferq û cudatî dikirin, rêvebertiya wargehan bi hin malbatên kêm ked re destûbiratiyê dikirin û her tişt li ser vî girikê reben diqewimî. Êdî demek hat, dema dikara pêşketinekî dihat kirin, pirsa "ev nûçe ya girkê Vira ye, an rastiye" bê hemd ji devan difelitî.

Temsîlvanê Girkê Vira yê Şehît Eşref, Hacî Hêwil bû. Hacî Hêwil; zilamek yêxtiyar û şîrînokbû. Tenê hatibû wargehê û li cem xwişka xwe dima. Ji gundê Aqîra Şirnex bû Hacî Hêwil. Çima tinê hatibû, malbata wî li kû mabû, ne dihat zanîn. Radyoyek ya wekû "teketor" dihat bi navkirin hebû. Şev û roj radyoya peritî li ber guhê zilamê yêxtiyarê ji bilî Kurdî ti zimanan nizanebû. Hemî ajansên guhdar dikirin bi zimanê turkî bûn û Hacî Hêwil yêk peyva turkî nizanî. Ema sebra wî zilamê şîrîn û gotinxweş pê dihat. Jêdera hemî nûçeyên sansasyonel ya Şehît Eşref Hacî Hêwil bû. Tiştên di xewna xwe de didîtin, an jî yên xeyal dikirin wekî radyoya wî gotî belav dikirin û wî bixwe jî ji heman tiştan jidil bawer dikir. Hêvî û bîriya vegerê bû ya Hacî Hêwil. Rojekî got;

"Min di BBC de guhdar kiriye, Hevalan li Cûdî pêncî romiyên romê kuştinê."

Civatê got;

"Mamê Hacî, em jî nûçeyên BBC di şopînin radyoya me nûçeyek wisa nedaye."

Mamê Hacî aciz bû û lêkir;

"Xwidê ji we razî qey ez virkerê we me? Her kêyê bawer neke bila here Cûdî lê binere."

Ankû haşa, Hacî Hêwil ne derew dikirin, ya wî rewşek ruhîbû. Hêvî û bîrîkirina vegera azadiyêbû. Ji tiştên digotin, birastî bawer dikir. Bi pişt re kurê wî ew bixapand, bir Zaxo û carek din jî ne vegera yêxtiyarê têhnê azadiyê .

Li wargehan, kelecana Newrozê rojev dagirtibû. Ji berya du hefteya komîteya amadekar hatibû avakirin û bê westan hazirtî dihatin kirin. Cara yêkemînbû ew koçberên bi awayek azad, bê kuştin, girtin û lêpirsîn cejna xwe ya Berxwedanê pîroz bikin. Mamosta, xwendevan, rêvebir- komîte, milîs, saziya çandê her kes di seferbertiya cejnê de bûn. Xwendevan provayên dîlanê dikirin, saziya hêza xweparastinê şanoyek amade dikir, komîteyên semtan dengbêjên jin û mêr berhev dikirin.

Berbanga bîstê heyva Adarê artêşa Turk, bi sêh û pênç hezar romî û çeteyên xwe ve ketibû di navenda bajarê Zaxo de. Vê carê ayan û beyan hatibû. Carên bûrîn, yan yêkser û rêyên cuda re derbazî çiyan dibû, yan jî şev bixef ber Zaxo re derbaz dibû û dîsa berê xwe dida çiyan. Vê carê navend û gundên derdor yên Zaxo kiribûn hedef û Zaxoyî bi dengên paletên tangên artêşa turk ji xew hilciniqîbûn. Artêşa turk, ji nişkan ve navenda Zaxo, gundên Tilkever, Hîzava û Dêrkarê dorpêç kiribûn. Ev dorpêç, di hesabê alîgirên PKK'ê de de tinebû. Bi dehan malê milîs, erkdar û alîgirên PKK'ê li Zaxo û li gundên derdorbûn û jiyana wan dixeteriyê de mabû. Wextê were wundakirin ne mabû û ji bû rizgarkirina wan malbatan divê bi awayek lezgîn çalekî hatibûna lidarxistin.

Beyanî ya heman rojê ji her du wargehan dused kes hatibûn hilbijartin û berê xwe dabûn bajarê Duhokê. Komîteya ji nav girsêyê hatî hilbijartin merema xwe ji rêvebirên UNHCR û waliyê Duhokê re ragihandibû û ji bû ewlehiya koçberên di dorpêça artêşa Turk de mayîn daxwaza tedbîrên lezgîn kiribû. Girseya xemdar, li derê navenda UNHCR ya bajarê Duhokê dest bi çalekiya rûniştinê kiribû. Dîsa hemwextê wê çalekiyê şêniyên Şêhît Eşref rêya Duhok û Hewlêr li trafîqê girtibûn û dest bi çalekiyên protestoyî kiribûn. Roja piştî wê girseyek din jî tevlî ya Duhokê bibû, raporek ji heft madeyan pêkt dihat radestî rayedarên DY û waliyê Duhokê kiribûn û li navenda bajar meşek girseyî lidarxistibûn.

**Madeyên raporê:**

1. Em dixwazin DY- UNHCR bi awayek herî lezgîn ewlehiya koçberên di dorpêça artêşa Turk mayîn bigre û wan bîne qwargeha Etrûş.
2. Derfetên wan yên lojîstîk û qût dabîn bike.
3. Pêwîstiyên wan yên hewandinê pêkbîne.
4. Neh welatparêzên li Dêrkarê ji aliyê artêşa

Turk ve hatîn girtin, serbest werin berdan.

5. Di dema kişandina koçberan de, bi ti awayî dewleta Turk têkildarî wan nebe.

6. Pêwîste operasyonên dewleta Turk nêzîkî wargehên koçberan nebin.

7. Divê êdî balefirên turkan bi ser qampan re nivz ne firin.

Di êvara roja duyemîn ya çalekiyê de rayedarên DY û waliyê Duhokê bi çalekvanan re hevdîtin pêk anîbûn. Di wê hevdîtinê de, soza pêkanîna daxwazên çalekvanan dabûn û li ser vê sozê çalekvanan jî dawî li çalekiya xwe anîbû.

Roja piştê wê bilez û bez DY dest bikom kirina koçberên li Zaxo û gundên derdor kiribû. Lê, dema rayedarên DY mal bi mal koçber kom dikirin, romî û sîxurên xwe jî di zikakên Zaxo de dest bi nêçîra heman kesan kiribûn. Her du operasyon bi hev re dimeşîn. Rayedarên UNHCR koçber kom dikirin û artêşa Romê jî koçber dikuştin. Di heman rojê de leşkerên artêşa Turk û hevkarên xwe, li ber çavên rayedarên UNHCR çar koçber kuştibûn û piranî zarok neh jî birîndar kiribûn. Dîsa li duryana Gundik pêşya karwanê koçberan yên di bin parastina DY de girtibûn, zulm û heqaret li wan kiribûn û gefên kuştinê li rojnamevanan barandibûn. Romiyên Romê li Başûrê Kurdistanê huqoq, maf, edalet, koçber, sazî û rayedarên DY nas ne dikirin. Wekî dixwestin hespên xwe dibezandin û dilxwede pêşmergeyan jî hevsarên hespên wan dikişandin.

**Rêznava koçberên di wê operasyonê de hatîn kuştîn:**

1- Îbrahîm Gûler; ji gundê Şewê ya girêdayî Basa ya Şirnex

2- Muhemed Şefîq; ji gundê Kovexa Hezex

3- Sedîq Muhemed; ji gundê Delak ya girêdayî Qulaban

4- Loqmanê Şirnexî.

Di heman rojê de karwanê ji dused û pêncî malabatan pêk dihat, li wargeha Şehît Azad hatibûn bicêhkirin. Koçberên nû, du semtên bi navê Şehît Îsmaîl û Şehît Karker li wargeha Şehît Azad zêde kiribûn. Piştî hatinê demek kurt, bi navê Mehmet Kurt dibistanek seretayî ji bû zarokên wan hatibû vekirin û tevlî jiyana koçberan bibûn.

Di encama çar şehît û berxwedanek mezin de be jî di dîroka wan koçberan de cara yêkemîn saziya UNCHR, daxwazek ya wan jidil û bê hîle û pîle pêkanîbû. Di hinavên koçberan de hêstên serkeftinê rabibûn pêdarê. Şadîtî ji hundirên çavên wan dibarî. Vê çalekiya serkeftî gêwil tevlî gêwilên karwanê azadiyê kiribû û ji cihê

mayîn hê berxwedanvantir û mucidtir dest bi xebat û rêkxistina xwe kiribûn. Ji bû li hember operasyona artêşa Turk arîkariyê bi hêzên artêşa xwe re bikin, hêza xweparastinê ref biref ji wargehê vediqetan. Di wargehan de saziya herî bi îşve, boş û mucid, saziya hêza xweparastinê ya Feqe yê goveşîrî pêşvantiya damezrandinê wê kirî û milîsên Gabar binyata wê danî bûn.

Roja cejna Berxwedanê hat û xwe pesart. Kelecanek ne ji rêzê hinavên koçberên wargehan dagirtibû. Hûr û gir, herkes di tevgerek ne asayi de bû. Jixwe şaditî û kelecana zarokên derkevin ser dike hêjayî dîtinêbû. Operasyona Turkan kêmek sih êxist be ser rojeva Newrozê jî zêde ne bandorvanbû. Berevajî were gotin; ‘kelecan zêdetir jî kiriye’ ne şaşbû.

Dikeyê cejnê di berwarê di navbera girkê Vira û kolika saziya hêza xweparastinê de hatibû amedekirin. Bi qasî binê bênderekî erd hatibû rastkirin, stûn daçikandibûn û dike bi panqertan xemilandibûn. Newrozê, bi pêşkêvantiya keça bejna xwe ya narîn bi kirasê Kurdî pêçayî destpêkir. Xwendevanan dîlanên xwe pêşkêşkirin, dengbêjan strandin, rêvebirên qampê li ser wate û girîngiya rojê axaftinkirin û herî dawî jî milîsan şanoyek li ser hevkartiya PDK’ê turkan pêşkêşkirin. Û dîlanê destpêkir. Ya star! Bi dehan govend li dor hev dizivirîn. Ema govenda herî mezin govenda ARGK’ê bû. Gelê wargehê, navê ‘govenda ARGK’ê’ li govenda tiliyan kiribû. Ji berkû govendek sehlbû û her kesî dizanî. Govendên din herêmîbûn û ji bîlî mirovên wê herêmê zêde kesî nizanî bireqise. Ji sedema boşatiya wargehê wan pêktanî, di wî aliyî de pirsgirêka herêma Goyan tinebû.

Heyva Adarê perên xwe ber bi avabûnê ve dikutan û Nîsan liber derîzana salê rawestabû. Gerangeha geliyê Qiyametê xwe bi rengên biharê xemilandibû û gotin ji keyfa mêhvanên wê re ne dihatkirin. Cenga artêşa turk û artêşa rizgariya Gelê Kurdistan bi hemî dijwartiya xwe tajot û di bin derbên gêrîlayên Kurd de artêşa dagirker diveşewişî. Mizgîniyek ya xêrê hatibû û ev ne nûçeya girkê Viran, rastîbû! MED TV vebibû! Ji bû rûniştvanên her semtê kolikek ya televîzyonê çêkin, tîkên êlekên rêvebir û komîteyên semtan li hev diketin. Vê nûçeyê hêst firandibûn û dibêjîqey Kurdistana di oxira wê de qir û qiyamet hatîn jiyandin, ya ji ekrana wê tevelîzyonê derbiketa. Seferbertiyek ne ji rêzê hatibû destpêkirin. Bi sedan kes li dora çadira were vedan kom dibûn û wey li vî yê zûtir cihê televiyona xwe çêke.

Rêvebertiya wargehan, ji bû her semtê kolikek mezin dabû avakirin, televîzyonek û jeneratorek piçûk jî dabînkiribûn û êdî televîzyonek ya wan jî hebû. Êdî ji bilî dengê radyoya BBC, dengek yê wan bixwe hebû. Dengek nûçe, hêvî, pêşketin, şîn û şahiyên wan

vedibêje. Ji bû her kolika televîzyonê erkdarek jî hatibû diyarkirin. Erkdar, êvarî ji berya nûçeyan deh deqîqeyan jeneratora xwe pêtêxist û televîzyona xwe ya piçûk tanî û li ser cihê wê bicêh dikir. Awrek qure direşand ser mirovên bi bê aramtiyek mezin çaverêyê nûçeyane û pêl qumçeya wê sebetoka piçûk dikir. Hûr û gir, jin û mêr her kes li kolika televîzyonê kom dibûn û nûçe û pêşketinên rojê guhdar dikirin. Heke bernameyek ya Serok Apo tevlî bibe, anjî wekî din bernameyek girîng hebe û erkdar jî ricaya mirov bipejirîne, piştî nûçeyan heta derengê şevê televîzyon vekirî dima. Na, tiştek girîng tinebe, piştî nûçeyan jneratora xwe dadida, televîzyona xwe dida ber singa xwe û rêya mala xwe digirt.

Ji tevayê wargeha Şehîd Eşref re televîzyonek ketibû û televîzyonvan jî Sulêmanê Nirwehî bû. Zilamê qor, zirav û dirêj saniye şaş ne dikir. Tam di demjimara xwe de televîzyon berdidiyê û heke biryara rêvebertî yê tinebe, bi xatirxwestina pêşkêşvanê nûçeyan re wî jî televîzyon dadida. Di bin awrên rexnegir yên zarok û ciwanan de şelîtokên televîzyona xwe didan hev, televizyona bidûvik dida ber singa xwe û diçû mal. Her kes bi awayekî hatibû guhertin ema, Sulêman qetiyen.

Keyfa gelê wargehan ya jêdera xwe ji MED TV digirt, zêde ne ajotibû. Pişti vebûna televîzyonê çar rojan, du firok û çar jetên turkan bi awayek pir nivz bi ser Şehît Azad re zivirîbûn. Balefirên, li raser banê wargehê dengê xwe berdidin; ya star, ûr û hinavên mirovan tevlîhev dikirin. Ji ber dengê sehmdar bi dehan zarok ji şaqis bibûn û çendek ji wan jî nexweş ketibûn. Piraniya wan zarokên perdeyên guhên wan qetayîn, bi rojên pişt re jî jiyana xwe ji destdabûn. Li ser bûyerê hatina ballefiran, her du wargeh hemwext ji çadirên xwe derketibûn û dest bi meşa protestoyî kiribûn. Di aliyê xwe gihandina rêya mak de Şehît Azad bi ewantajtirbû. Rêya mijara gotinê bi ber rexa wargeha wan re derbaz dibû. Ema bi qasî pazdeh, bîst deqîqeyan rê ji Şehît Eşref dûrbû. Jixwe meşa bi girseyî zehmetirbû û rê dirêjtir dikir.

Piştî çalekiya protestûyî du rojan, dîsa komîteyên semtan di tevgerê de bûn. Bi kaziba sibhê re hêlim ji devê Zîna Hevlerî, Mehmûdê Zêwkî, Teyrikê Nêrwehî û bidehan komîteyên din bilind dibû û bi destê xwe çadir dikutan û bi pê re jî digotin;

“ Fermana rêvebertiyê ye, divê di navbera deh deqeyan de her kes li derê wargehê kom bibe. We bihîst hevalno?”

Piştî dengê “belê” bi heman awayî derbazî çadira teniştê dibûn.

Li rasta çadira Milîsên Gabar, singa Merwan, Feqeyê Gweyînî û Zînê li hev sekinî. Her du zilamên ciwan ji nobetê dihatin û çavên wan ji yên Zînê Mexmûrtir dixwiyan. Her yekî sakoyek li ser milê

wan bû û lûleyên çekên wan dibin sakoyan re derketibûn. Wekî dubirakanbûn her du xortên spehî. Bejna wan, cilê wan, dêmên wan jî diman hev û dibêjîqey du qetên pîvazekîbûn. Tenê Merwan ji Feqe kêmekî ciwantirbû.

Merwan;

"Xêre Hevala Zînê, dîsa çi qewimiye?"

"Ez nizanim heval, telaîmate! Di nav deh deqeyan de divê her kes li pêşya cihê helefa kom bibe" û bêkû çaverêyî berteka Merwan bimîne derbazî çadira din bibû Zînê.

Di nav deh deqeyan de ji her sê semtan nêzî hezar kesî li cihê hatî kifşkirin kom bibû. Semta Şehît Bêrîtan, hem kêmekî ji wargeha mak vederbû û hem jî ji sedema ne bi koçberên giştî re hatibûn dibêjîqey statûyek yan wana xweser hebû. Li aliyê din, Bêgalteyiyan xwe zêde aligirên PKK ne didîtin û wekî kûviyan ji dûr ve dinêrîn. Dibekû ji vê sedemê be, rêvebertî di derbarê wan de zêde nerm tevdigere.

Ji Rêvebertiya wargehê Kenanê Kobanî derket ser girikê himber, qirika xwe paqijkir û bikelecan dest bi axaftinê kir;

"Gelê meyê welatparêz û qehreman, hûn dizanin artêşa dagirker ji bû çavtirsandina gelê me û şkandina hîviya me ya azadiyê bi hevxebatkarên xwe yên xwecih re bîstê Adarê bi navê operasyona Pola li Başûrê welatê me tevgerek ya dagirkirinê daye destpêkirin. Dûh li pişta bajarê Sersingê heft şivanên pezê xwe diçêrandin bê sebeb qetil kirine. Dema xizmên kesên hatîn ketilkirin, dixwestin herin Duhokê û sedemê qetilkirina zarokên xwe ji cihên eleqeder pirs bikin, tîmên turkan di navbera Duhok û Sersingê de pêşiyê li wan qut dikin û çar kes din jî dikujin. Wekû gelê wargehê divê em bertekek dijwar nîşan bidin û qedabê li wan xayîn û dijmninan bibarînin."

Piştî rêvebirê ji lingek yê xwe gazî axaftina xwe ya dirêj qedand, gel ber bi rêya mak ya Duhok û Hewlêrê ve birêket. Girse hê nû birêketibû Seydayê Xwirsî –gel navê 'Seydayê xwisirî' lê kirbû- bi gavên bi bez derket rexê û dest bi avêtina durişman kir.

"Şehîdên Sersingê bê mirinin!"

Gel ji melaqiya Seyda dilgiranbû û bê dilê xwe durişme dubare dikirin. Ya star, ji bû rêvebertî dengê wî mexloqatê melaq bibihîze û bikeve çavan, zilamê xwisirî hê bêhtir dida xwe û tevgerên ne asayî dikirin. Melaqî û şelaqiyek ewqas bê merîs ratêxist kû êdî ji enrê wî re girseyê durişme dubare ne dikirin. Zilamê esmer û du qetên simbêlan di êxirên devê wî de daketîn, xwe wundakiribû û bê navber durişma "Şehîdên -li- sersingê bê mirinin" dubare dikir. Ji nişkan ve pîrkêna ken bi girseyê ketibû. Ji berteka li hember Seydayê xwisirî biteybet jinan, durişme wekû 'li ser singê' şîrove kiribûn.

Jixwe Seydayê melaq jî bi şaşîtî heman wisa diqêrî. Ji wê rojê û pê ve "Şehîdên li ser singê" wekû pêkenok ketibû di nav meseleyên koçberên wargehan de.

Ya jiyanê xweş dike ne heyîn, dewlemendîtî an jî wekî dilxwede cîhana pêşketî ji xwe re kirî armanc pere û polin. Ne jî qesir û sera û xaniyên pir olîne. Dîsa ne cilên buha û zayendîne. Ya jiyanê xweş dike û hêjayî jiyandinê dike, civakek hevgirtî, berxwedanvan û ji hev jidil hejêkirine. Ya jiyanê qelp jî dike kesîtiyên ezvan, kesvan girêdayî vê melaq û rebenin. Gotina "yên dunya me xirab dikin ne desthilatdar kesîtiyên xwilam yên xwe azad dihesibînin" aha li vêdê pirêzeya wê derdiket holê. Heke di nav wê civaka xwezayî, wêrek û paqij de kesên wekî Seydayê melaq jî tinebûna; jiyana çiqas xweştir bûya.

Xwezayê xwe bi rengên Biharê liba dikir. Biharê, bi hemî îhtîşam û bedewtiya xwe xweza bi rengê xwe xemilandibû. Li qontarên çiyayê Kanikan gul û kulîlkan mil dabûn ber milên hev û dibêjîqey ji mêhvanên xwe yên koçber re silav sekinîbûn. Artêşa dagirker derbeyên giran xwaribûn, revîbû û li ser dûvê xwe rûniştibû. Piştî koçberên ji Zaxo hatîn, bi teybet ji navend û gundên derdora Çelê kêm jî bin malbatên nû tevlî jiyana wargehê dibûn û vê jî keyf li şadîtiya koçberan zêde dikir. Her roj saziyek nû li saziyên wargehê dihat zêdekirin û ji bû xwirtkirina sazûmaniyê erkdaran civîn li ser civînan lidartêxistin. Saziya herî bitevger û boş hêza xweparastinêbû û ref biref ber biçiyayên derdor ve ji wargehê vediqetan. Refek derdiket û yêk diket wargehê de. Ji dewsa lingên koçberan şîverêyên nû çidibûn û ligor xwe nevên nû li gir û çiyayên derdor dikirin.

Li sirta berwarê geliyê Qiyametê girek bilind hebû. Ji bû têkiliyên bêhnî û her timî yên Gare û wargehê, bêtêlek piçûk her tim li ser wî girîbû. Ankû ew wekû girê bêtêlêbû û wekû dorveger endamên saziya hêza xweparastinê li wî girî nobet digirtin. Ji sedema kû nasnavê destpêkê yê bêtêla li wî girî "eslan" bû, ew girê wekû girê "Eslan" di hişê koçberan de hatibûya neqişandin. Dîsa navê girê li Bakurê Şehît Eşref kiribûn "Çirav" û çiyayê li Rojavayê Şehît Azad jî wekû "Şêxan" binav kiribûn. Di rastiyê de navê kevin yên wan gir û çiyayan cudatirbû bê goman.

Gelê wargehan gelek gundî, kedkar û hilberînvanbû. Lê, di pêvajoya koçbertiyê de ji hilberînê qut bibû û ji bilî erkdarên rêkxistinê, xweyî pez û hin kesên bazirgantiya sînor dikin, her kes betalbû. Yên diravek mezin ji Bakur ne anîn û hatinek ya wana din jî nîne, bi qûtê helefeyan re ser biser mabûn. Ji bû hin malbatên pir muhtac, rêvebertiyê arîkariyek sînordar dikir ema, ew jî zêde ne têrkerbû. Biteyebet ji bû koçber ji hilberînê dûr ne kevin, rêvebertiya

wargehan li rêyên debarê yên nû digera.

Binê wargeha Şehît Eşref, hemî dehl û baxçebûn. Dema UNHCR ev çol kirî, ew dehl jî di nav vî sînorî de mabûn. Ankû çol di tev de kirîbû. Ji her semtê komîsyonek hatibû hilbijartin û ew dehl li malabatên muhtac hatibûn behrkirin. Kelecan û xebata malbatên dehl ji wan re ketîn, hêjayî dîtinêbû. Tevr û bêrikên Egîdê Gabarî, Cibraîlê Geverî, Sofî Reşîdê Şaxî, Ehmedê simbêl firçeyê Hevlerî û bi sedan kesên din li hev diketin. Heke şerm nekirana, yên şev jî di nav dehlên xwe de nivistibûna. Dîwarên xwirimî çêdikirin, kerxik û leftikên nû difetandin û tu dehlvanan bi çavek derbazer li dehla xwe dinêrî. Dibêjîqey ji dapîr û bapîran ve ew milkê wa bû û ji eşqa şebeşek Amedî di devên wan de bi cêh dibû. Bacan, xiyar, lopik, bacanên reş, misir, giya milkis, miqewr, kolind û her tişt çandibûn.

Rojan bilez hev tajotin û demsalan meh li dûv xwe dihiştin. Sedem çiye nayê zanîn ema, zeman li wargehan zû derbaz dibû. Ji bendevantiyêbû an jî ji kelecana bûyerên diqewimin jêder dibû, ne dihat zanîn. Ji ber kû her kes neçarbû li wî meskenî li hember her rûdanê pir bihes be. Ankû qewmînek herî piçûk yêkser her kes eleqeder dikir. Her roj avana wargehan rêxistina xwe ya navxweyî mezintir dikir û girêdayî vê zanetir dibû. Di rastiyê de her kû diçû rewş baştir dixwiya ema, pergala li wargehê hatî rûniştandin zêde lixweşa hêzên li derdor ne diçû û ne dipejirandin. Karmendên wargehan yên girêdayî UNHCR û PDK'ê heta êvarî di navendên xwe de nîçîra mêşan dikirin. Ne koçberekî xwe tavêt devê deriyê wan, ne kesî tiştek ji wan dixwest û ne jî ji bilî komîteyên eleqeder kesî silavek li wan dida. Hemî sazî û dezgahên ji bû bajarek kamil pêwîst, gel bi lezgînî avakiribûn û hemî pirsgirêkên xwe di nav xwe de çareser dikirin. Dîsa ne çekdar û ne bê çek, destûr ne didan ti hêz tevlî jiyana wan ya navxweyî bibin. Ji hêzên xweparastinê bigre heta bi dadgeh û mejlîsê hemî saziyên wan li ser karbûn.

Fikên hêzên desthilatdar û nûkerên wan dîsa xwirimîbûn û dubare xeyalên wan şkestibûn. Dîsa hêza wan têrê ne kiribû, TAK'ê û gelê wargehan ji hev qut bikin. Berde qutkirin, ji her demî bêhtîr bibûn yêk û ferqek mucid di navbera gihatiyek yê wargehan û gêrîlayek yê PKK'ê de nemabû. Perwerdeya bê navber dihat meşandin avana koçberan zane dikir û di aliyê îdeolojîk de distewand. PDK, di her keysî de aciziya xwe tanî ziman û her roj li ser wan rêyan hemwelatiyên wargehan binçav dikirin û gefên kuştinê li wan dixwarin. Rayedarên UNHCR jî bi PDK'ê re hemfikirbûn. Her roj gef li komîteya koçberan dixwarin û daxwaze belavkirina pergala navxweyî dikirin û dixwestin gel ji bin ve têkiliyên xwe ji PKK'ê qut bike. Koçberan ev gefên rayedarên UNHCR, berçav ne digirtin û hê bêhtir lez didan perwerdê û rêxistina xwe.

Ne fermî jî be, wekû kirinî dewleta Turk Başûrê Kurdistanê dagirkiribû û her tişta MÎT'a Turk dixwest hevkarên wan bê dudil pêktanîn. Pêşêşmergeyên mala Berzanî û MÎT'a Turk, li pêşya fitneyek mezinbûn û bela dixwiya û bidengê bilind digot; 'ez hatim'. Berpirsiyartiya derxistina vê fitnê jî yêk ji endamê pûlot bîroya PDK, Samî Abdurehman girtibû ser xwe. Lingek yê zelam li Ankara ya paştexta Turkan bû û yê din jî li Telavîvê bû. Ji bû bi PKK'ê re şer bide destpê kirin, hifdeh hezar pêşmerge derbazî Colemêrgê kiribûn û li wêdê di wargehên leşkerên Turkan de dihatin perwerdekirin. Tam di wê demê de ciwanên binavê; Emîn, Loqman û Brahîm Pîranî û Serbest û Welatê Repinî yê dixwestin ji bû debara malbatên xwe herin ser sînorê Heftanîn û bi nasên xwe yên Bakur re bazarvantiyê bikin; pêşmergeyên PDK'ê ew li deşta Zaxo girtibûn û nîvê rojê li ber çavên her kesî înfaz kiribûn û keleşa wan jî berze kiribûn. Evê bûyerê gelê wargehan şebikandibû. Dîsa piştî wê demek pir kurt JÎTEM[37]'a dewleta Turk, hemwelatiyê Şehît Azad Hemîdê Geverî ji bajarê Duhokê revandibû. Piştî îşkenceyek hovane, li gundê Baniyê yê nêzîkê Duhokê, qazyaxê berdabûn ser bavê heft zarokan û dişewitandibûn (09.07.1994).

Kê dizane; belkî jî dojeh, cîhana wujdana xwe ji dest dayî be. Buhişt jî di quncika mergên lêgerînvanên wê wujdana wunda bûyî de asê ma be. Tam dema wê komika mirovên hatîn derbederkirin yêqîn kiribûn kû kolmek jiyana azad peydakirine; cîhan li wan hatibû hev û haxta wan bifetisîne. Sedemê vê têkoşîna sik, di destpêka dîroka şaristaniyetê veşartîbû. Roja çîndartî ketî di malzaroka mirovtiyê de vî şerî jî destpêkiribû. Şerê spehî û sikanbû. Cenga qenc û xirabanbû. Şerê çîna zordest û komana azadbû. Têkoşîna Ahura Mazda û Ehrîmananbû. Wekî ronahî û tarîtiyêbû. Di holekî de û bi hev re nikarîn jiyan bibin. Zordaran baş dizanîn; çirûskek herî piçûk dikare desthilatdartiya wan bêxe serad. Ew dizbûn û ji xweyê malê her tim pişt kulbûn. Nikarîn livandinek herî sehl ya xwesertiya gelan tehemûl bikin. Heke ne wisabe, wê fêrsa Netewên Yêkbûyî, wê qerasa dewleta Turk û xwecihên desthilatdar; ji wê komika mirovên di nav wê heriyê de, di wan çadirên peritî de bicêh bûyîn çi dixwestin?

Dibêjin ya, ji ber şirikê revîn û çûn ber mezrîbê. Ya wan serîwanvanên serhişk jî ew meselebû. Qet nebe dewleta Turka îdîa dikir kû dewletek zagoniye, şaristane û Kurd kêmekî bixef dikuştin. Ema li wî meskenê navê "Kurdistana Federe" li xwe kirî ew jî tinebû. Ne hed hebû û ne jî hesab. Ne zagon hebû û ne jî wujdan. Her gav, her koçber dikare were kuştin. Heneseya koçberên welatê xwe, bi

37 Navenda Teşkîlata Îstîxbareta Jandirmeyan.

devê lûleya pêşmergeyên kurd ve hatibû daleqandin.

Piştî bûyera Hemîd sê rojan, hê xwîna kesên hatîn qetilkirin hişk nebûyî qêr bi Şehît Eşref ketibû! Herkes bi aliyekî ve direvî! Dê li weledê xwe ne dibû xweyî! Qîr û hewara jin û zarokan ezmanê heftan dihejand. Guriya agirê ji semta Şehît Şiyar bilind dibû xwe li banê gerdûnê dida! Varêlên tijî qazyax wekî saroxan difirîn, ji hewa ve diteqan û qiyameta sohr rast dikirin. Galonên dohn, bihêza enerjiya germbûnê hawa diketin jor, ji hewa ve diteqan û wekî parçeyên bombeyan dûr dipijiqîn. Qirên ketibû zincîrên BKC yan û dengê bombeyan hemî dengên din didewisandin. Karmendên DY û PDK, yên kêlûmitreyekî ji cihê bûyerê dûrin, tirimpêlên xwe hiştibûn û wekî berqa birûskê pirika binê wargehê li dûv xwe hiştibûn. Tu kes nizane çi qewimiye, her kes bi hezar remandinên cor bicor hewl dide ji cihê şewatê  dûr bikeve.

Dema her kes bê mehwer direvî Zîna Hevlerî ya komîteya semtê jêlil hat û pora xwe vediçirand. Dayîka dilşewitî ji cêh kurveda nav girê agir û Partîzanê Deştlelanî yê jixwe di revê de ne zîrek, zivirî û da dûv Zînê. Her kes di cihê xwe de qerisîbû û bi awrên cemidî li hunerê Zînê û Partîzan temaşe dikirin. Êdî ne dikarin birevim û ne jî li dûv wan herin. Biqasî tu çavên xwe binoqînî û bel bikî, Zînê bi dergûşa zaroka xwe ve derket û Partîzan dîsa li dûvbû! Agir nû bi betanê çadirê yê  ji zarokê re kirî serdergûş ketibû. Ew jî bi rê ve vemirandibûn û hê jî zarok di xew de bû. Ay xwedê..! Her kesî henasey kûr kişandibû û çepkek mezin ji dayika mînak û zilamê şîr helal re kutabûn.

Hêdî hêdî guriya agir nivz dibû. Êdî varêl ne difirîn û dengê guleyan jî kêmtir bibû. Vê carê jî koçber, berevajî ber bi cihê şewita ve dibezîn. Dayîk digirîn û li zarokên xwe digeran. Dayîka kû destên zarokên wê ne bi dawa wê ve be, dengê giriyê xwe bilindtir dikir. Agir vemirîbû ema, qêr û girî, axîn û nalîn zêdetir bibû. Dayîkan bi qêr û girî digotin; “zarokên me çûn!” Piştî demek ne dirêj, mizgîniya xêrê rûyê her kesî kenandibû. Xwîn hatibû dêman û dayîkan çep û rast lamên qemitî yên zarokên xwe maç dikirin. Çend tiştên bi xwe re anîn û di wan mercan de komkirîn, şewitîbûn ema, ne di xema kesî de bû. Piştî kifş bû kû ziyana canî çênebûye, ne şerm bûya dayikên malên wan şewitîn yê rabibûna reqsa Batûyanî.

Di nav deh, pazdeh deqeyan de heştê û du mal şewitîbûn. Bi dehan çekên BKC, keleşkof, bisfing û guleyên wan bibûn xwelî. Ew bûyer çawa qewimî, ew şewat çawa derket bibû dabaşa gotûbêj û lêpirsînek kûr. Rêvebertî, komîte, dadger, dozger, gel û her kes bi nav hev ketibûn û li sebebê derketina wê şewatê  digeran. Her kesî milên xwe hildabûn û  tu kesî tiştek nizanî.

Di encama lêpirsînek seresere de hatibû kifşkirin kû şewatê

ji çadira Mustefayê Cizîrî despêkiriye. Ema çima wê, hê jî raza xwe diparast. Piştî demekî hat gotin kû;

“Mustefa dest ji jin û zarokên xwe berdaye û bi hênceta kar çûye Zaxo. Li wêdê ji dizî ve dubare zewiciye. Kengê Şerîfa hevjîna Mustefa, vê bûyerê dibîhîze; dixwaze xwe û zarokên xwe bişewitîne. Dema agir bi quncikê çadirê têxe, çadira şimakirî ji nişan ve di nav guriyê de dimîne. Şerîfa jî ji biryara xwe dizivire û ji berya her kesî ew direve.”

Lê Şerîfayê ev rastî ti carî îtîraf ne kir û koçberan jî ji vê çîrokê ti carî yêqîn nekiribûn. Jixwe piştî demek kurt Şerîfa, ji wargehê revîbû û derbazî Bakur cem mala bavê xwe bibû.

***

Başûr dikelî û li ber teqînekînêbû. Artêşa Turkan li Bamernê, Dêrelûk û Kanîmasî baregihên nû ava dikirin û wekî dixwest hespê xwe dibezand. MÎT, JÎTEM û mêrkujên wan, biteybet li herêma Behdînan li hev diketin. Rê dibirîn, mirov direvandin û yên dilên wan dixwest dikuştin. Gladyo ya NATO, Başûrê Kurdistanê vegerandibû tenekeya xwe ya gelaş. Heta pir kurdên li Bakur Kurdistanê ji aliyê wan hêzan ve dihatin revandin, kelaşên wan li ser sergûyê Başûr dihatin dîtin. Jixwe koçberên wargehên geliyê Qiyametê û Etrûş, di armanca sereke ya wan hêzan de bûn. PDK, bigiştî ketibû di xizmeta wan de û her xirabiya dixwestin pê didan kirin. Partiya nandozan, ti pîvanên huqûqî, civakî, exlaqî û siyasî nas ne dikirin.

Ji bû di nav kurdan de şerek navxweyî derbixe dewleta Turk, hemî rê û rêbaz bikartanîn. Polîtîkaya dewleta Turk eşkerebû; dixwest şerê Bakur derbazî Başûr bike û PKK’ê li Başûr bi fetisîne. An jî mujûl û lewaz bike. Jixwe di wê dabaşê de hêzên Başûr xwedî ezmûna “Şerê xiyanetê” bûn û ya dixwiya PDK ya mala Berzanî, ji dûh ve kumê xwe ji şerek wisa re hiltavêt.

Êdî kêr gihatibû hestî. PDK û artêşa Turk, xwe ji şer û tevgerek mezin re amade dikirin û amadekartiyên wan jî li ber qedandinêbûn. Ji bû xafil newe girtîn, PKK’ê jî xwe amade dikir û êdî bi awayek eşkere hev tehdît dikirin. Mêhkutokê daholvanê cengê ji hewa ve diheja û çaverêyê fermana fermandarên şer rawestabû. Şer, her bêhn dikarî biqewime û vî şerî yê bi xwe re çi anîbûya û çi biribûya ne diyarbû. Ya diyar û tekeztiya wê gotûbêjê bi xwe re nabe, koçberên di nîvê xeleka agir de mabûna. Tevgerên hêzên nûker û axayên wan yên li dora wargehan, ev rastî vekirî datanîn holê. Heke şerek derkeve -kû êdî her kes bi çavek misoger lê dinêrî- hedefa destpêkê koçberbûn. Koçberên wargehan bêhna xwe girtibûn û çaverêyê dengê lêdana dahola cengê rawestabûn.

Ji bû gelê wargehan bikerixînin, teslîm bigrin û belav bikin, her rê hatibûn ceribandin. Êdî hîviya bikaribin koçberan ji PKK qut bikin ne mabû û bi şêwazek tolvan nêzîk dibûn. Tam di wê dema têkeliya hêstan di lotkê de û derba serê derziyekî dikare biteqîne, li semta Şehît Karkera wargeha Şehît Azad, şewatek mezintir derketibû! Ew şewata ji mala Tahirê Osmanê Ziravikî destpêkirî, ji ya Şehît Eşref bi caran mezintirbû. Dibêjîqey di wargehê de qiyameta sohr rabibû û wargeh vegerabû dojehê. Her varêlek ya qazyaxê bibû saroxek û her galonek yê dohn vegerabû bombeyekî û derdora xwe dişewitand. Di nav demek pir kurt de bi tona çek û cebilxane û sed û heştê mal bibûn xwelî. Ji sedema şewat roj derketibû û gel bi ezmûnbû, ji xeynî çend birîndarên sivik ziyanên mirovî ne çêbibûn.

Şehît Karker, semta mirovên ji Zaxo û gundên derdora wê hatibûn. Di dema artêşa turkan, bi navê operasyona "Pola" derbazî Başûr bûyî, her kesê kû navê xwe dayî rayedarên UNHCR, anîbûn wargehê. Ji wê sedemê rûniştvanên semtê pir texlîtbûn û kesê şewat ji mala wî destpêkirî jî gomandarek tevlîhevbû. Pir malbatên ti têkiliya wan bi PKK û siyesatê re nîne û di dîrokên cuda de ji sedemên cor bicor derbazî Başûr bûyîn, li wê semtê hatibûn cem hev. Pir malabtên Başûrî jî tevlî wî karwanî bibûn û hatibûn wargehê. Bi vegotinek din mêrkuj, qaçaxçî, sîxur û her core kes di wê demê de bi niyetên cuda anîbûn û li wargehê bi cêhkiribûn. Ji ber wê gelê wargehan her tim bi goman li van şewatan nêrî û ji lewaztiya rêvebertiyê ev bûyer di zemanê xwe de ne hatin zelalkirin.

Piştî şewatê bi mihaneyên cor bicor saziya UNHCR, hefteyekî çadir û pêwîstiyên din nedabûn malbatên mala wan şewitîn. Di rastiyê de ji pêwîstiyan pir zêdetir tişt di ambara UNHCR ya wargehan de hebûn ema, digotin; "nînin" û ne didan. Piştî hefteyekî dilxwede UNHCR bi tirimpêlan çadir anîn ema, di duryana ketina wargehê de pêşmergeyan çadir ji tirimpêlan danîn û şewitandin. Pêşmergeyan şewitandin an jî bi wan dan şewitandin, hê jî raza xwe di parêze. Gelê jixwe bêhna wî hatî serê pozan, bi zorê ambara UNHCR vekirin û çadir û her tiştên pêwîst li malbatên malên wan şewitîn hatibûn dabeşkirin. Karmendên xwe nerazî jî kirîn, bi dar û kuçan ji wargehê hatibûn qewitandin.

Têkiliyên jixwe bi benê xav ve girêdayî, li ser wê bûyerê qetabûn û haxta biqetên. PDK ya li pey fitneyekî, bûyera dabaşa gotinê jixwe re kiribû pesartek û êrîşên xwe dijwartir kiribûn. Ambargoya fermî, ji wê rojê û pêve destpê kiribû. Her koçberê ji wargehan derdiket digirtin û yên bi wan ve jî diçûn tavêtin cem girtiyan. Piştî bûyera derkirina karmendên DY, di demek pir kurt de PDK'ê bi dehan hemwelatiyên wargehan girtibûn û bê serûşûn wunda kiribûn.

Hevdîtin bê encam diqedan û dengê lingên şerek biqedap di guhan de vedida. Li ser van rûdanan koçberên her du wargehan ji aliyên xwe ve derketibûn meşê û li gel hemî astengî û gefxwarinên pêşmergeyan li duryana Şehît Eşref gihatibûn hev. Daxwianiyek ya çapemeniyê dabûn û ji bû protestokirina hêlwesta PDK û nêzîkatiyên rayedarên DY bi sed kesan dest bi rojiya bê dem û dor kiribûn (01.08.1995).

Dibêjîqey wê meş û çalekiyê barê koçberan valekiribû, ji wê tofana liber derî dûr xistibûn û azadî anîbû warê wan. Roj bist û çar demjimare serdanvan li derê çadirên çalekvanan li ser pêyabûn û govenda azadiyê fireh dor vedida. Cihê çalekî yê milek bilindbû û dengê stran û durişmeyên çalekvanan di guhê neyaran de dikir zirme zirm. Ji bû pêşiya serdanvaniyan bigrin û çalekiyê bê bandor bikin pêşmergeyên PDK'ê, hewlek ne asayî di mezaxtin. Lê gel şîverêyên çiyan bikartanîn û hewlên pêşmergeyan bê encam diman. Di bîst û yêkemin roja çalekiyê de pêşmergeyan êrîşê çadirên çalekvanan kirin, çalekvan bi serdanvaniyan ve girtin û anîbûn kelha Etrûş. Beyaniya roja din, girtiyên kevin û nû hemî berdabûn û jixwe çalekî jî bidawî bibû.

## Û Şer Destpêkir

Êvara 25'ê heyva Tebaxa 1995'ê bû. Hê artêşa Turk û hêzên PDK dest bi êrîşê ne kirîn ARGK'ê, êrîşa dijber ayan kiribû. Ya jê dihat tirsîn û ji bû pêk newe her kesî dua dikirin qewimîbû. Jixwe gotina; "Şeva tarî ji êvar ve kifşe" tam li cihê xwe rûniştibû. Ev şer ji dûr ve xwiyabû û bi alan û dîlan hatibû. Bi jin û zarokan ve koçberên wargehan, di nîvê bosya agirek dijwar de mabûn. Ya çi bibûya ne kifşbû. Erd şemîtokbû û kêyê li kûdê biketa ne diyarbû. Bi hîvî ya xeberek ya xêrê her êvar hûr û gir gelê wargehan li dora kolikên televîzonê kom dibûn. Piştî nûçe diqedan, jin û zarok belav dibûn û zilam kom bi kom li derûdor kûlîs digerandin. Di wan kûlîsan de ji nûçeyên televîzyonê zêdetir nûçeyên girkê Viran dihatin gotûbêjkirin. Yêk derdiket, wekî pir tiştên cuda dizane û têkiliyên wî yên nayên zanîn hene; dengê xwe nivz dikir û digot; "Hevalan evqas gund û erd girtine." Yê din gotin ji wî digirt û wekî yê tiştek pir girîng bîne ziman, xwe ji qestîka dikenand û lêdikir; "Nêçîrvan Berzanî reviye û xwe spartiye Xalid Şêxo yê Zaxoyî" û wekî din her kesî ya dixwest bibe wekû bûyî tavêta holê. Rewş ji şîrovê re vekirîbû û kê çi digot lêbû. Şer destpêkiribû û reva jê ne gengazbû. Ya din jî karwanê koçberan meyl û aliyê xwe ji serî ve kifş kiribû û cihê gav avêtina bi paş ve ne mabû û jixwe niyetek wan ya wisa jî tinebû.

Ji bû bikaribin bi ziyana herî kêm zarokên xwe ji boseya

agirê şer biparêzin, civîn li ser civînan lidardixistin. Xweparastin dabaşa sereke ya her kesîbû. Ema, çawa? Rayedarên UNHCR, bi birina kirt û pertalên xwe re jî ne gihatibûn û revîbûn. Ya di dest de mayî, bi hêza xwe ya cewher xwe parastinbû. Merem û mexseda her kesî parastina nekar û zarokanbû. Xweparastin, refleksa destpêkê ya her jîndariye. Hêza xweparastina cewher ya Şehît Eşref sirtê girê Eslan û Şehît Azad jî çiyayê Şêxan girtibû.

**Merwanê Ziving Şikakî** vedibêje;

"Ez endamê fermandartiya saziya hêza xweparastinê ya wargeha Şehît Eşref bûm. Piştî destpêkirina şer çend rojan ez û Evdilayê Bacrîdî ji bû qût û pêwîstiyên din yên milîsan bibin, bi tirimpêlê çûn girê Eslan. Ez bi niyeta bimînin û Evdila jî ji bû arîkarî bike û bizivire hatibû. Piştî me barê tirimpêlê danî Evdila jî şermkir vegere û ew jî ma wêdê. Taxima Musa yê Nêrwehî, nêzîkê rê bû û destpêkê em bûn mêhvanê wî. Keyayê gundê Kanika jî kelikek bacan ji wan re anîbû û jixwe sohbeta wan me qut kiribû. Piştî Lewendê Ziravikî di îskanên mezin de çayek ji me re jî rûkir, sohbeta xwe ji cihê mayîn dewamkiribûn. Ji rewşa keya kifş dibû kû ji rêvebertiya PDK'ê ne razîbû û ji hêza bê amadekartî ew sirt girtîn jî ne bawerbû. Zilamê navser, req û dirêj kîsikê tutnê ji ber şûtka xwe derxist, çixareyek stûr pêça û bi çavên xwe yên di nav qermîçokan de wunda bûyîn qasekî li demê zerîn yê Mûsa nêrî û got;

"Em Êraqî bê bavin, bavê me nîne. Kê dayika me mehr bike em jî wî re dibêjin, yabo."

Dema zilamê şaşikek kovikî serê wî yê hûr dinixwimîne rabû ser xwe ji rêzê ve destê me hemiyan şidand û destê Mûsa berneda. Kêmekî vesekinî û gotina xwe ya dawî lêkir;

"Ji kerema xwe heval, haj xwe hebin" got û çû.

Wî yêxtiyarê dirêj û rûyê wî ji qermîçokan wekî boxçika dayika min lêhatî, em lekmê şîroveyan kiribûn. Gelo wî agahiyek girtibû û bi wan gotinên xwe yên jidil dixwest peyamekî bide me? Lê piştî gavekî, me keyayê xwe û gotinên wî yên hêstîdar jibîr kiribûn û sohbeta xwe di coyek din de ajotibû.

Çekdarên piraniya wan ji hemwelatiyên wargeha Şehît Eşref pêk dihatin, ne çaverêyî êrîşekîbûn û girêdayî wê amadekartiyek mucid ya şer jî ne kiribûn. Her ref li binê darekî bicêh bibû û ji bû şer çeperek jî ne çêkiribûn. Fermandarê giştî yê wî sirtî Feyziyê Rojavayî bû û ji zirtan zêdetir tiştek ne dikir. Jixwe arîkarê wî Hesenê Fereşînî, ji erd û ezman bê agahbû. Ew mirov çima li wêdê komkiribûn û niyeta wan ya dawî çibû, wan bixwe jî nizanî. Ne wekî hêzek xweyî dijmin, wekî hin gundiyên ji rêzê li binê darên girê Eslan belav bibûn û ji bû xwe bidin piş, du kevir jî ne danîbûn ser hev.

Rewşa halê hazir ez veciniqandibûm û ji kûr tirsandibûm. Gotinên keya di serê min de deng vedidan û bi wan xeman min Evdila hişt wêdê ez çûm cem Kemalê Pîr. Ez û Kemal ji Gabar ve hevnasbûn. Mirovek bitemenbû û bi serhatiyên xwe bawerî dida derdora xwe. Min rewşa heyî bi zimanek rexnegir ji hevalê Kemal re vegot. Min temaşekir, Kemal jî bê zare û di heman demê de jî neçare. Fermandar Feyzî bû û guhdarî tu kesî ne dikir.

Di heman rojê de taxima Pilingê Mijînî jî hatibû girê Eslan. Ew demekbû baskî gundê xwe ve çûbûn û li ser rûdanên dawî ji bû parastina zarokên xwe divegeran wargeha Şehît Azad. Kelecana bûyerên dawî û ya dîtina zarokan di dêmê wan de dihat xwendin. Êvara heman rojê xatir ji me xwestin û ber bi Şehît Azad ve ketin rê. Di şeva heman rojê de li dola binê fitlûpêçkên Zawîtê ketibûn kemîna pêşmergeyê partiya mala Berzanî. Di kemînê de Piling şehît ketibû û çendek jî birîndar bibûn. Kelaşê Piling mabû cihê bûyerê û yên sax birîndarên xwe gihandibûn wargehê.

Nûçeya şehadeta hevalê Piling zû gihatibû me. Me qurbanê yêkemîn yê wî şerî dabû. Sedem çibû ne dihat zanîn ema, dîsa jî fermandarên me rewş mucid ne digirtin û amadekartiya şer ne dikirin. Piştî Şehadeta Piling sê rojan, bi berbange re supaya Berzan êrîşî me kir (12.09.1995)! Piştî neh şehîdan, me cihê xwe berda û em di ser Çiayê Gara de vekişan.

PDK bi hêzek mezin hatibû. Ne tenê êrîşî me kiribûn, hê ji êvarî ve çar dorên Şehît Eşref girtibûn û di heman demê de êrîşê her çar aliyên wê kiribûn. Meshûd Berzanî yê serokê PDK'ê û Xalid Şilî yê Axayê Muzûriyan, li duryana geliyê Qiyametê û ew êrîş birêve biribûn.

Ji berya şer û di dema şer de jî birêya bêtêlê têkiliyên me bi milîsên Şehît Azad yên li çiyayê Şêxan re hebûn. Ew gav bi gav ji rewşa me agahdarbûn. Me rewşa dawî jî ji wan re ragihandibû. Piştî pêşmerge çembera dora Şehît Eşref dişkînin û pezê bi dest wan dikeve talan dikin, Meshûd Berzanî û waliyê Duhokê Evdilezîz Teyîb bi karwanek tirimpêlan ber bi Duhokê ve derdikevin rê. Ji bû tola me hilînin hêza me ya li çiyayê Şêxan li fitlûpêçkên jor yên çiyayê Zawîtê kemîn datînin. Karwanê dabaşa gotinê dikeve kemîna hêzên me û derbeyên giran dixwe. Tirimpêla Meshûd Berzanî jî derbe dixwe lê, ew bixwe bê birîn rizgar dibe."

***

Xeta xweparastinê ya Şehît Eşref zû şkestibû. Dor li wargehê hatibû tengkirin û guleyên pêşmergeyan li raser banên çadiran dinirijîn hev. Zarok, temendar û nekaran xwe berdabûn parastgehên

binerdîn û yên mayîn li dora malan çeper girtibûn. Pêşemrgeyan ji her çar aliyan ve êrîşê koçberan dikirin û gel bedena xwe kiribû sênc. Koçberan ne dixwestin şer bikişînin nav malan û pêşmergeyan jî ne wêrîn bidin ser wargehê û ji dûr ve li qampê didan. Agir bi pûş û sorpelên li dora wargehê ketibû û çavan çav ne difitirandin. Tu kesî nizanî, kê saxe û kê miriye. Wê rewşê heta reş ketina şevê ajotibû. Pêşmergeyan ji dûr ve li wargehê didan û gel bersiv ne dida. Pêşmergeyan, bi israr dipesartin gel ji nav malan bersiv bide û hênceta wan ya qirkirina jin û zarokan xweş bibe. Koçberan ev dizanî û ji bû hênceta wan xweş nebe sebrek mezin dikişandin.

Bi reş ketinê re gule barandina pêşmergeyan jî qut bibû. Hêdî hêdî mirov ji cihên hemandinê derketibûn û bi awrên neçar li dêmê hev dinêrîn. Çavê her kesî li lêhvên rêvebertiyê ve qerisîbûn û wan jî bi awrên neçar li mihacirên çavmijdar dinêrîn. Ji bû zarok ji parasgtihan dernekevin û nebin armanca guleyên pêşmergeyan, dayikan hewlên mezin didan. Lê, beytişebû. Zarok ji berya her kesî derketibûn û di zikakên wargehê de diqijvijîn. Êdî ruh li xweyê xwe bibû bela û kesî ne dixwest li qewmînên piştî çirkeyek din bifikire.

Piştî demjimarek derbazbû û deng ji çeperên pêşmergeyan nehat, mirov ji parasgehan derketibûn û li kuştî û birîndarên xwe digeran. Di rewşên wisa de, herê kes bikaribe ji xeynî xwe kesên din bifikire. Bê goman ji bilî dayikan. Têkiliya zarok û dayikan ji derveyî vê pênaseyêne. Çavên her kesî li xizm û nasên wan digeran. Ji ber kû ji berya hingê, bi hişyartiya rêvebertiyê her hemwelatê wargehê di çadira xwe de parastgehek binerdîn çêkiribû, zêde telefat ne çebibû. Di çadira heşt metre damde parastgehek hatibû çêkirin. Ankû binê çadirê hemî parastgehbû. Heke  zêde telefat ne çêbûbe ji xêra wan parastgehane. Nixwe nîvê koçberan ji wê êrîşê sax ne difelitî. Ji bilî çend birîndarên sivik, wundahî di qampê de ne dixwiyan.  Lê, ji şivanan du Nêrwehî, di nav êrîşkaran de mabûn û ew jî ne diyarbûn. Jixwe çend kesên ji girê Eslan ber bi wargehê ve vekişayîn û xwe gihandîn wargehê, rewşa qewîmî ji rêvebertiyê re vegotibûn. Ema ji bû malbatên kesên hatîn qetilkirin pê nehesêne, kuştî wekî razekî diveşartin.

Wekî pir hatî dubarekirin dîsa mêr ji dewreyê derketibûn û bar mabû ser milê jinan. Ji ber kû di çanda Kurdan de jin pîroze û ne dihatin kuştin. Kêm jî be û hatibe çewtkirin jî hê şkestekên vî exlaqî bermayiyên xwe diparastin. Jixwe jinan jî destûr ne didan mêr ji nav malan derbikevin ji der ve. Koçberan baş dizanîn kû mêrê wê şevê ji nav malan veqetê, êdî jîndar nazivire nav zarokên xwe. Ji bû li dewsa şivanên ne hatîn herin, birek jin berbi cihê wan ve ji wargehê veqetabûn.

Her kû diçû şev tarîtir dibû. Çimatiya wê ne dihat zanîn ema,

ew şev ji hemî şevên din zilomatir dixwiya. Dibêjîqey şev bê henesa mabû û di singa çiyayê Kanika de qerisîbû. Stêrên dirijan û guleyên xetat yên ji lûleyên çekên pêşmergeyên mala Berzanî difelitîn, li raser banê wargehê tevlîhev dibûn. Dengê giriyê zarokên sêwî mayîn, dengê guleyan dadiqurtand û dengek melûl li bê dengiya şeva tarî bardikirin. Jinên dema li qampêbûn dengê giriyê wan ezman dilerizand, piştî ji nav malan veqetan li gel tarîtiya şevê bê dengiyek şermdar dabelandibûn. Belkî jî li wî welatî azadiya herî tamdar di giriyek bê sînor de veşartîbû. Li ser wê xakê ji zû ve deng hatibûn qedexekirin û girî di gewriya yaran de fetisandibûn.

Piştî nîv demjimarî jinan kelaşê Mehmût û hemgundiyê wî Cangîr anîbûn. Mehmût, zilamek yêxtiyar û Cangîr jî ewqas ciwanbû. Bi çekên biksî û bisfingan li her du şivanan dabûn û laşê wan parçe parçe kiribûn. Pêlav û cilên wan ji xwe re biribûn û du sed û pêncî mêh û bizinên wan jî talan kiribûn. Pez û dewarên wê rojê pêşmergeyan dizîn, ne yê Mehmût û Cangir tinêbû. Di heman rojê de, bi dehan birê pez û dewarên li dora qampê talan kiribûn û ji xwe re biribûn. Lê, şivan û gavanên din xwe sax xilas kiribûn û ji bilî çend birîndaran yên din jîndar gihatibûn nav malan. Di heman şevê de koçberan kuştiyên xwe veşartibûn û ji bû zarokên xwe ji pêşmergeyan biparêzin, li dora malan dîwarek ji mirovan avakiribûn.

Roja din asayî hilatibû. Ji bilî dengên zarokên wargehê, deng ji cîhana koçberan ne dihat. Her kes bê dengbû û şaqistiya roja bûrî jiyan dibûn. Rojê nû tîrojên xwe dijwar kiribûn û dehlvanan bê xwestek û bigavên sist xwe berdidan nav dehlan. Pez û dewarên hê ne hatîn talankirin, di nav çadiran de asê mabûn û bi awrên birçî li xweyên xwe dinêrîn. Xwendevanên ne tebetî bibez diçûn cem dibistanên xwe yên kolik, yên liber siha çinarên di dolê de hatîn avakirin û bi heman bezê dubare dizivirîn nav malan. Komek mamosta li derê wargehê sekinîbûn û bi awrên erzşkên li xwendevanên ne tebitî dinêrîn. Cêhgirê berpirsê giştiyê wargeha Şehît Eşref yê UNHCR Rizgar û berpirsê ofîsê, di demjimara xwe de dîsa hatibûn û nû ji tirimpêlên xwe peya bibûn. Her du zilamên çavên xwe bi berçavkên reş nixwimandîn hê jî li derê navenda xwe bûn û li dewsên fîşekên pêşmergeyan dinêrîn. Ji nişkan ve qirên ketibû çekan û şerê li girê pişta wargeha Hungo destpê kirî, her kes veciniqandibû.

Di hemwextê şer destpêkirî de hêzek mezin ya pêşmergeyan ji aliyê Etrûş ve xwe berda û yêkser berê xwe da nav wargehê. Êdî guhên kesî li ser şerê li pişta wargeha Hongu diqeme ne mabû û bala koçberan qulibibû ser rêza pêşmergeyên bê pakî berê xwe dayîn nav malan. Tevgerek awerte ketibû nav koçberan û li ber dîwarên

konan çeper girtibûn. Qir û qiyameta sohr rabibû û wexte cîhan ji eksena xwe bibeyê. Jiyan bi serê berikek serxweş ve daleqayî mabû, her kesî nefesa xwe girtibû û awir li sihikên tifekan hatibûn korkirin. Teşkên rêvebirên wargehê li hev taliqîn û çep rast dibezîn. Li çareya herî baş digeran û dikirin û ne dikirin peyda ne dibû. Aqilê Ednanê rêvebir gihatibû hewarê. Zelamê qor û mûyên tenik li raser eniya wî libadib, qêrek da jin û zarokên li derdor bi xof diqijvijin û ber bi ofîsa UNHCR ve bezî. Ednan, komek jin û zarok ve dor li ofîsa UNHCR girtibûn. Dest danîbûn ser her du zilamên hê jî li derê ofîsêne. Ednan bi deng asayî ema kêmek bilind got;

"Xwe tevnedin û ne tirsêne. Armaca me ne zerer dayîna we ye, em dixwazin gelê xwe ji van celadan biparêzin."

Cêhgirê rêvebirê ofîsa UNHCR yê Şehît Eşref Rizgarê Sohran û berpirsê ofîsê Ziyad, di nav lepên gel de zir zira wan bû dilerizîn. Rizgarê ûr derfik, ji Ednanê lewaz û ji xwe ciwantir re got;

"Fermandarê vê hêzê waliyê Duhokê, Evdilezîz Tayîbe. Heke hûn destûr bidin, ezê bi bêtêlê bipêre baxivim û ji wan re bêjim, vegerin."

Rizgar, bi walî re bi dijûnan dest bi axaftinêkir û peyvên pir giran ji wan re bikaranîn û got;

"Heke hûn gavek din bi pêş ve bavêjin, yê me hemiya bikujin û wê demê tu jî sax namînî."

Dema pêşmergeyên Evdilezîz Teyîp yên ji aliyê Etrûş ve hatîn, divegeran û bipaşve dikişan, hê jî şerê li girê pişta wargeha Hungo tiştek ji diwartiya xwe wunda ne kiribû. Gel, rayedarên DY wekû tedbîr li cem xwe girtibûn û ne berdabûn.

Roja sohr, wekî qursek zêr li raser girê Hingo daleqayî mabû. Mohrikên xwêhdanê di bin guliya endamên hêza parastina wargehê yên di dorpêça pêşmergeyan de mayîn dihatin xar. Ji ber parî nanê kerdizên Asya Navîn, kurdan kurd dikuştin û di zinarên pişta wargeha Hungo de tavêtin xar. Ya jandartir û kilameta hê mezintir, Kerdiz bixwe jî bi nanê welatên wan birayan jiyan dibûn. Ber bi nîvro ve, ji bilî Ûnisê Şêwêdî û Osmanê Kalikî çekdarên wargehê yên li gir bi paş ve kişabûn û ketibûn nav malan. Piştî şerek giran û kuştina bi qasekî pêşmerge, her du kesên navbûrî jî şehît ketibûn û komek zarok sêwî mabûn.

Di du rojan de neh hemwelatiyên wargeha Şehît Eşref hatibûn qetilkirin. Musa yê Nêrwehî, Lewendê Ziravikî, Kemalê Pîr, Evdilayê Bacrîdî û Yaqûbê Kamilê Ziravikî li girê Eslan; Ûnis Kayicî yê Şiwêdî û Osmanê Kalikî li pişta wargeha Hungo û her du şivanên Nêrwehî.

Qirkirina duyemîn ya geliyê Qiyametê destpêkiribû û bi hemî bê wujdantiya xwe dewam dikir. Gelo, ew qirkirina çendêbû

geliyê Qiyametê şahidîtiya wê dikir? De bila Ezdanê dilovan ziman êxistibûya devê wî geliyê şîrîn de û jana dilê xwe verêhta. Hingê ya hatibûya zanîn; ka di bin şûrên xwînkaran de xwîna çend Rojyarên welatê Rojê herîkîbû. Ev ne şerê Rojyarên Êzdî û Adaniyên reformîst, ne jî şerê pêxas û dawdirêjên amorît û Kurdên jînyarbû; ev şerê Şaristana hov û neviyên Xan Baban bû. Qirkirinê dewam dikir û xwîn diherikî. Wê carê çend Rojyarên di wî geliyê bedew de, di oxira evîna xwe de çûbûna ava û xwîna çend evîndarên bê murat ya tevlî pêlên wî robarokî bibûna, hê ne dihat zanîn.

Dibêjîqey pêşmergeyên PDK'ê, çaverêyê rakirina cenazeyan sekinîbûn. Bi derengiya şevê re, ji her çar aliyan ve wargeh gulebaran dikirin. Guleyên xetat li raser wargeha mihacirên welatê xwe, reqsa bablekan dikirin. Çadir paçibûn û xweyên xwe ji guleyên pêşmergeyan ne diparastin. Wekî heyî diçûn hundir. Ji bilî parastgehên binerdîn ti star tinebû. Zarokên çilikdar, jinên avis yên li ser roj û mehên xwe û kesên yêxtiyar di parastgehên teng û piçûk de li ser pişta hevbûn. Giriyê zarokan tevlî dengê guleyan dibû û erşê ezîm dihejanda. Dema dengê guleyan qut dibû, bipêre jî giriyê zarokan disekinî û bê dengiyek şermdar şeva kambax dorpêç dikir. Pêşmergeyên kengê êrîşê nav wargehê bikin û qirkirina kes naxwaze raman bibe pêkbînin; ne dihat zanîn. Ema koçberan, bi çavek misoger li wê qetlîama encamê wê ji xwe diveşartin dinêrîn. Wê şevê, siba an jî rojek din.

Her kû diçû agirê bi dora wargehê ketî gurtir dibû û têhna wî xwe li çadirên şimakirî dida. Belkî jî pêta agir ji berya êrîşkaran bi gihê çadirên şimakirî û kitekor ji koçberan ne felite.

Têkiliyên her du wargehan ji hev hatibûn qutkirin. Êdî têkiliyên bi ser bêtêla li girê Eslan re çêdibûn jî tinebû. Haya Şehît Azad ji şehîdên girê Eslan hebû lê, li nav wargehê û li derdora nêzîk çi diqewimî nizanîn. Lê, baş dizanin kû hatin, çûyîna karwanên leşkerî yên pêşmergeyan û dûyê ji Şehît Eşref bilind dibû; ne nîşanên xêrêbûn. Ji gava êrîş li ser girê Eslan çêbûyî û pêve Şehît Azad bi kordînasyon, erkdar û avana xwe ve jipiyabû. Pêwîste tiştekî bikin, ema çi? Dûyek mezin ji hindama Şehît Eşref bilind dibû û evê zeravên wan diqetandin. Şîroveyên 'wargeh bi koçberan tê şewitandin' ji hewa ve difirîn. Ji bû bi hewara hevrêyên xwe ve herin civîn li ser cîvanan dihatin lidarxistin ema, di rêbazê de li hev ne dikirin. Endamê kordînasyonê yê ji parastina wargehê berpirs Ararat û endamê kordînasyona giştî Şahîn dixwestin; gel bide ser pêşmergeyan û derbazî Şehît Eşref bibe. Endama kordînasyonê ya ji jinan berpirs Jiyan, bi dijwartî li dijî vê rêbazê derdiket û ne dixwest bê fermana TAK'ê û bi serê xwe rêbazek evqas xeter were bikaranîn. Vê gotûbêja dijwar danek yê rojê xwaribû. Şahîn û Ararat, hemî rê

diceribandin ema nikarîn Jiyanê qayil bikin. Di dawiyê de her du zilaman Jiyan bi tirsonektiyê tewmbar kiribûn, hêza xwe ya hêjmarî dabûn pêş û bi serê xwe biryar girtibûn.

Piştî nîvroya roja piştî êrîşa Şehît Eşref bû. Ararat, Şahîn û kesên din yên di rêvebertiyê de li semt û taxan belav bibûn, civîn lidarxistibûn û dixwaza 'divê gel îşev rabe û berê xwe bide Şehît Eşref' wekû fermana Tevgara Azadiyê ye pesartibûn.

**Evdilaqadir Mustefayê Kinyanişî** vedibêje**;**

"Roja piştî êrîşa girê Eslan danê êvarîbû. Hewayek tîr avana wargeha me nixwimandibû. Hema bibêje ji roja ji berya wê ve tevayê wargehê li ser linganbû û kes ne nivistîbû. Dûyê li ser Şehît Eşref diket zeravê me diqetand. Komîteyan agahdariya civîna lezgîn kiribûn û wekû Semta Şehît Îsmaîl em li kolika televîzyonê kom bibûn. Ji Kordînasyona wargehê Şahîn derket pêş. Zilamê sohr û dirêj, zendên xwe hildabûn û agir ji devê wî dibarî. Bi dêmek tirş û bi dengek aciz got;

"Hevalan bi bêtêlê em agahdarkirine kû PDK'ê qamp bi mirovan ve şewitandiye û divê bi tarîtiya şevê re tevayê Şehît Azad derkeve rê û here Şehît Eşref!"

Wekû rêbaz em li dijî şêwazê çalekiy tê dikarkirin derketin û me got;

"Wekû rêbaz ne raste, em berê yazdeh, dazdeh hezar zarok, avis, nexweş, birîndar û temendar bidin vî kaşî. Ya din jî PDK ne hêzek huquqiye, hêzek çeteye. Nûkerê dewleta Turke, dikare van zarokan hemiyan qir bike û tu kes jî dengê xwe nake. Ev, ji hêlwesta Helefeyan kifşe. Hemî hevalên hevin. Pêşniyara me, biqasî pêwîst zelam çekên xwe bigrin û bi hewara Şehît Eşref ve herin."

Şahîn, di ya xwe de û me jî di ya xwe de israr kiribû. Şahînê jixwe aciz, aciztirbû û dest bigefan kir. Tiliya xwe rep kir û got;

"Heke hûn newin ezê we bi vê tiliyê bibim!"

Me jî got;

"Heke ji te were bike" û civîn belavbû."

**Reqya Muhemed Erdem** vedibêje;

"Hedara gelê Şehît Azad ne dihat. Gotinên; "mala Berzanî Şehît Eşref dişewitînin û divê em tiştekî bikin" li her derî bilind dibûn. Ema çi!? Her kes bifikarbû û di aliyê şêwazê çalekiya were kirin de binakokbû. Tu kesî PDK wekû hêzek serbixwe an jî demokrat ne didît kû ji çalekiyên demokratîk fêhm bike. Pêşmergeyan dora wargeha me jî girtibûn û wekî nêçîrvanên di kozikê de çaverêyê nêçîrekîbûn. Ev ji hemî rewş û tevgerên wan kifşbû. Ji kordînasyona wargehê Şahîn û Ararat ling dabûn ser gel û dixwestin berê jin û zarokan bidin ser pêşmergeyan. Gel ev ferman wekû întîharê didît û milê xwe nedida ber.

Piştî nîvrobû. Dengê “li girkê Vira kom bibin” di Şehîd Azad de vedabû. Jixwe ji berya hingê wekû semta Şehît Karker ji me re civîn hatibû çêkirin û em li dijî şêwazê çalekiyê derketibûn.

Rêvebertiyê digot; “fermana rêkxistinê ye” û ez jî çûm girkê Vira. Dema ez gihatîm wêdê, Jiyan, Şahîn, Ararat, Polat, Ezîma û ji kordînasyon û rêvebertiyê pir kes kom sekinîbûn û gotûbêjek ne asayî dikirin. Gotûbêj, di navbera Şahîn û hevala jiyan de bû û bi turkî taxivîn. Hevala Jiyan li dijî şêwazê çalekiya were kirin derdiket û Şahîn wekû fermana rêkxistinê dipesart.

Di dawiyê de Jiyan pir acizbû, birêket û gel jî da dûv. Me pir hej hevala Jiyan dikir. Jin û zarok li pêş, zilam li dûv wan û em derketin rê. Kengê pêşya gel ji çadiran bûrî, pêşmergeyên çepergirtîn bêkû hişyartiyekî bikin ji her sê aliyan ve em gulebaran kirin. Di şînika destpêkê de Moma keça Mele Tewfîq û keça Mihemedê Se’do yê Hilalî êxistin. Wekî taviya teyrokê pêşmergeyan gule di ser me de dibarandin û wekî pelçimên darên peyîzê mirov ji me diwerandin. Nûjînek Rojavayî ya sto kurt hebû; bezî û ji bû vegere lave ji hevala Jiyan kirin. Ema, Jiyanê guhdar nedikir û li pêşiya girseyê dibezî.

Wekî taviya barana Heyva Gulanê gule dibarandin ser me. Wekî pelên darên Peyîzê mirov têxistin û em dimeşîn. Tam dema me goristan xilaskir û em gihatin kaşikê ber rêya qîr, ji pêş ve guleyek li singa hevala Jiyan ket û lixwe zivirî. Dema zivirî berê wê ket min û ji nişkan ve rengek zer xwe avêt rûyê wê. Kêmek veşwişî û veximiha erdê. Bi vexwimandinê re berçavka wê beyî û li kuçê rexa rê ket. Qet deng jê ne hat. Min û Yadê Xanê, Fedîla Mijînî û Nûjîn xwe avêt ser kelaşê wê û me kir qêr. Refa pêş, ji jin û zarokên dibistana seretayî pêk dihat. Zilam, qederekî li dûv me bûn û bigavên dudil dimeşîn.

Bi ketina Jiyanê re qedemên me şkestibûn. Ew ji bû me hêvî, wêrîn û bawerîbû. Di rêya biqasî pênçsed mitreyan de bi dehan kes hatibûn êxistin ema, ne di xema me de bû. Ji ber kû Jiyan li pêşya me bû. Bi ketina Jiyanê re qêr bi jin û zarokan ketibû. Kesî bawer ne dikir Jiyan miriye. Ji ber kû hejêkirina wê di dilê gelê wargehê de cudabû. Ew ruhê partiyê ya Şehît Azad bû, rêkxistinbû, îradeyek ji pola û milîtanek bê eman ya Serokatiyê bû.

Hevalan Jiyan bi nav xwe re kir û ber bi qampê ve bezîn. Hê jî pêşmergeyan bê navber gule dibarandin. Tam dema her kes bi xofa ketina Hevala Jiyan, bi bez bi paş ve dibezî, dengê “ma hûnê min bihêlin vêdê” guhên min hingavtin. Helîma Şirîşeyî, jinek êxtiyarbû û li cihê Hevala Jiyan êxîstîn ew jî ketibû. Gule bi bin gozekê re li pêyek yê wê dabûn û bi lingê din re avêtibû. Guleyekî her du lingê wê simtibûn. Min Helîma da pişta xwe û anî nexweşxaneya gel.

Bi fermana şaş ya Şahîn, Ararat û kutilk xwerên wan, me pênç birîndar û Hevala Jiyan şehît dabû. Jixwe gelê wargehê, ji

ber hêlwestên wan yên ji der veyî xeta Serokatiyê, axatî, şaşîtî û çewtîtiyên wan dabûn qaqareş. Her kesî dikar dikir kû derengê şevê Şahîn li girikê Terzîxanê û li cihên din yên ji derveyî wargehê bi bêtêlê Erebî û ingilîzî taxive û vê kirina wî bi her kesî re goman çêkiribû. Piştî şehadeta Hevala Jiyan jî hat ser, êdî di çavên koçberan de ferqa wan kesan û pêşmergeyên PDK ne mabû. Xwîna hevala Jiyan bi destê Şahîn û Ararat ve mabû. Ev nêrîna mine, bila kes li qusûrê ne nêre" û êdî hêstiran peyv diqirika Reqya yê de asê hiştibûn. Jina gir û duta çûbû wan rojan û jandil li ser Jiyana xwe dinehwirandin.

Jiyan- Zeyneb Erdem; hevala Jiyana gelê di welatê xwe de mihacir. Jiyana Hevalên wê ew wekû; "Zeyneba Jiyana çiyan wekî rist di mergê xwe de hewandî" pênase kirîn;

Sala 1969'ê li Sêwasê jidayik dibe. 1988'ê ji zankoya Ankara tevlî TAK'ê dibe. Destpêkê derbazî Yewnanîstan dibe û ji wêdê jî diçe qada Rêbertiyê. Piştî perwerdeya bingehîn ji bû rêkxistinkirina gel dubare dizivire Turkiye. Di qada rêkxistinkirina jin û ciwanan de pêşketinên mezin pêktîne. Dibe armanca êrîşên dewleta Turk û dubare dizivire qada Rêbertiyê.

1992 yê derbazî herêma Heftanîn dibe û wekû fermandara taximê tevlî şerê Xiyanetê dibe. Piştî hingê derbazî Bohta dibe û li qada Cûdî û Besta şervantiyê dike. Ji ber têrê nekirina xwe ya fizîkî demekî di çapemeniya Eyaletê de kar dike û bi pişt re bi pesartina xwe tevlî tabûra bitevger ya Eyaletê dibe. Tevlî 5. kongreya PKK'ê û 1. Kongreya Netewî ya Jinan dibe. Piştî kongrê wekû endamê Kordînayona her du wargehan ya ji rêkxistina jinan berpirs tê wargehê. Sêzdehê Êlûna heman salê ji aliyê pêşmergeyên PDK'ê ve tê qetilkirin.

**Derwêş Kara Hilalî** vedibêje;

"Ez berpirsê giştî yê asayîşa Şehît Azad bûm. Ji sêrî û pêve nakokiyên mezin di navbera Şahîn, Ararat û hevala Jiyan de hebûn. Nakokiyên wan îdeolojîk û kûrbûn. Jixwe Merwanê sohr bê însiyatîfbû û tim li Şehît Eşref dima. Nixwe di asta herî jor de Merwan berpirsbû. Biteybet di derbarê Şahîn de gomanên min yên mucid hebûn. Nêzîkatiyên her du yan jî bi ti awayî nediman yên PKK yiyan. Bi caran ez bibûm şahid Şahîn, piştî nîvê şevê ji derveyî wargehê an bi îngilîzî an jî bi erebî bi bêtêlê taxivî û pir tevgerên din. Min ev gomana xwe bi hevala Jiyan re jî parve kiribûn.

Êvara heman rojê Şahîn, Ararat û Evdoyê Mijînî jî bi wan re hatin asayîşê û ji min xwestin ez taximek ya asayîşê bigirim û herim girkê Mijîn. Li gor fermana dayîn min; divê em di ti şertan de çek bikarneyînin. Min ev îtîraz kir û got;

"Heke em herin û dijmin were, emê çek bikarbînin."

Piştî gotûbêjek nexweş berê me dan girê Terzîxanê. Hê em

nû gihatibûn cihê xwe, dengê tilîlî û durişman ji wargehê bilindbû û girseyek ne mezin jin û zarok berê xwe dan rêya qîr. Hê ne gihatîn rê, di nav goristanê de pêşmergeyan girse gulebarankir. Ji girseya ji jin û xwendevanên dibistanên seretayî pêkdihatin neh kes birîndar bibûn û hevala Jiyan şehît ketibû.

Ez jî ji cihê nobetê hatim û bi cinazeyê hevala Jiyan re çûm goristanê. Piştî me cenazeyê wê veşart, ez hatim mal. Min temaşekir her kesê xwe ji bû rê amade dike. Jixwe ji berya hingê ez bi dijwarî li dijî wê biryarê derketibûm û di zena min de biryar hatiye betalkirin. Min, ji rêhspiyên Hilal Bavê xwe, Egîdê Misto, û Mamê Resûl komkirin û em çûn mala Osmanê Mehmût. Parastgehek mezin, qayîm û xweş ya Osmanê Mehmût hebû. Ji ber wê her tim Şahîn û Ararat li mala wî diman. Em çûn û me ji wan re şaşîtiya biryara dayîn vegot. Erza me şkandin û xwestin me bêxin der. Mamê Resûl, gotinên ne xweş ji wan re kirin û bezîn hev.

Derwêş;

"Bi dehan birîndar û nekarên li wargehê hene, nabe em berê van jin û zarokan vê şevê bidin vî kaşî. PDK ya wan qir bike.

Şahîn;

"Ji koçberan hezar û pênçsed kes bifelitin besê mene."

Egîdê Misto;

"Heke tu û Ararat ditirsên, ezê pêncî mêran bidim rex we û bila we bibin Gara teslîmê Partiyê bikin. Berevajî, em jixwe vê biryarê pêknaynin; heke hûn israr bikin di navbera me de tiştên ne başê biqewimin."

Ararat;

"Wê demê her kes di cihê xwe de bisekinin, heya siba emê li rewşê temaşe bikin."

Bi vî awayî biryara Şahîn û Ararat hatibû betalkirin."

Li çiyan şer bi hemî dijwartiya xwe dewam dikir. Qamp jî di nav de berpirsên herêmê tedbîr ne girtibûn û amadekartiyên pêwîst ne kiribûn. Evan bê amadekartiyan wêrîn dida PDK'ê û her kû diçû hartir dibû. Dora her du wargehan girtibû, têkiliyên wan ji hev qutkiribûn û şev û roj Şehît Eşref gulebaran dikir. UNHCR, dest ji wargehan berdabû û ji dûr ve li qirkirina mihacirên di bin parastina xwe de temaşe dikir. Di navbera gêrîlayên li çiyan û wargehan de wekû fizîkî têkilî qut bibûn. Kordînasyona wargehan şaştî li ser şaştiyan dikirin û ev şaşîtî dibûn sedemê kerixandina gel.

Pêşmergeyên mala Berzanî, wargeh bose kiribûn û li dora wargehan xendek kolabûn. Koçberan jî di nav wargehan de xetên xweparastinê avakiribûn û bi sihika tifekê re li hev dinêrîn. PDK, ne wêrî bikeve di nav wargehan de û çend sedemên vê ne wêrîna wan hebûn. Ya yekem û ya herî girîng, PDK ji PKK'ê ditirsa û ne wêrî

qirkirinek giştî bigre çav. Ya duyemîn; ew koçber xweyê statûya siyasîbûn û dibe kû qikirina gel bandorek neyînî li semaxa UNHCR bike. Ya sêyemîn; hêzek rêkxistî ya wargehan hebû û bihêsanî dagirkirina çênebibû ya. Yêk ji wan her sedeman, an jî her sêyan bi hev re teqlên PDK sist dikirin.

Tektîkê PDK û yê aqlê wê yê jor bikartanî; tektîkê "bikerixîne û teslîm bigre" bû. Ji bû di wî tektîkî de biser bike ve hemî rê û rêbaz bikartanîn. Dora koçberan girtibûn û berdêla ketin û derketinê serê mêranbû. UNHCR, qût û PDK'ê jî çûyîn hatin birîbû. Qûtê gel sînordarbû û nikarîn demek dirêj li berxwe bidin. Koçber, li herêma eşîra Muzûriyan bûn û ehlê wê eşîrê di dema şerê Êraq û pêşmergeyan de çeteyên xêdar yên dewleta dagirkerbûn. Bi deh salan di nav artêşa Êraqê de talan û xenîmeta Kurdan kiribûn. Di dabaşa talan û şelandina Kurdan de hem pispor û hem jî jêhatîbûn. Hêza pê dora wargehan hatî bosekirin jî hêza Muzûriyan bû. Bi fermana PDK, çeteyên girêdayî wê eşîrê destpêkê dest bi dizî, talan û xenîmeta koçberan kiribûn. Şivan dikuştin, di sêrîde pêlav û tiştên din yên wan dişelandin û pezê wan talan dikirin. Êdî kuştin, dizî û talankirin, biteybet bibû parçeyek yê jiyana rojene ya koçberên Şehît Eşref.

Xeta xweparastinê ya Şehît Eşref hatibû şkandin, dor li wargehê hatibû girtin û bi hemî lezgîntiya xwe talanê dewam dikir. Ema ji bilî qetilkirina Jiyanê, hê li Şehît Azad êrîşek mucid destpê ne kiribû. Dor li wargehê girtibûn, ketin û derketin birîbûn ema, hê rayedarên UNHCR li wargehêbûn û talanê jî destpê ne kiribû.

Ji sedemên nexweşî û ne karînên xwe yên fizîkî ew demekbû sê gêrîlayên PKK'ê li wargeha Şehît Azad bûn. Ew ciwanên binavê Huseyn, Dijwar û Rifat ji bû pêwîstiyên hêza xweparastinê ya li çiyayê Şêxan bibin ji wargehê vediqetên. Li tenişta gundê Mikêrs ya li Rojavayê wargehê ketibûn kemîna pêşmergeyan û her sê ciwan jî hatibûn qetilkirin.

Dema tê gotin pêşmerge, nayê wateya hêzek leşkerî, rapêçayî û birêkûpêk. Pergela dagirker ya Êraqê û zêhniyeta Partiya Demokrat tevna civakiya Kurdistana Başûr tarûmar kiribû. Li Başûr her kes çekdarbû. Her zilamî, an demek dirêj çetetiya dewleta dagirker kiribû, an jî pêşmergetiya mala Berzanî kiribû. Di navbera her du zêhniyetan de qetiyen ferq tinebû. Komanek eşîrparêzbû û di bin pergala dagirkertî û eşîrtiyê de ji rastiya xwe hatibû valekirin. Her gotina ji nav lêhvên axayan dirija, di hukmê ayata Qur'anê de bû. Jixwe PDK, rêxistinek ya axayanbû. Têkiliyek ya wê birastiya netew, gel û mafan re tinebû. Li gor wan wargeh hedefek lewaz û yaxdarbû û jê ne ditirsan. Dema talan û xenîmet jî dabaşa gotinê be, zilamên eşîrên derdor har û hêc dibûn. Ankû her kes li ser serê

koçberan bibû pêşmerge û her kes bibû rêbir. Yên Huseyn, Dijwar û Rifat qetilkirîn jî gundiyên gundê Mikêrs bûn.

Piştî qetilkirina Zeyneb Erdem pênc rojan, pêşmergeyên PDK'ê êrîşê hêza parastina Şehît Azad jî kiribûn. Hêza xweparastinê ya li çiyayê Şêxan bi cêhbûyî, di demek kurt de şkestibû. Ji hêza parastina wargehê çar kes hatibûn qetilkirin, du kes dîl hatibûn girtin û yên mayîn jî bi paş ve kişabûn. Wekû hemwext dora şivan û pezê koçberan yên li dola quntara heman çiyayî jî girtibûn. Şivanê bi navê Ehmedê Evdo yê Hilalî kuştibûn piranî pezê Hilal û Mijînyan, nêzî pênç hezar pez talan kiribûn.

**Hevjîna Ehmedê Şiwêdî Hacer Kaya** vedibêje;

"Piştî êrîşa Şehît Eşref, me dizanî PDK ya êrîşê wargeha me jî bike. Demjimar dazdehê şevêbû. Karwanek mezin yê pêşmergeyên mala Berzanî bi rêya Laleş re hawaketin û di neqebê de wunda bibûn. Me dizanî ew pêşmergeyên êrîşê zilamên me yên li çiyayê Şêxan bikin. Em ditirsan û dilê me daleqayî mabû. Di navbera hêza êrîşkar û ya me ya xweparastinê de ne hevsengîtiyek mezin hebû. Di serî de dewleta Turk û hemî hêzên hegemon yên cîhanê li pişta wan bûn û ligor hêza me ya xweparastinê hêzek mezin ya wan hebû. Jixwe dema dabaş kuştina Kurdan be, xweşmêr bi ser pêşmergeyên PDK re tinebûn. Dibêjîqey ev hêza biqedap ji kuştina Kurdan re hatiye Cîhanê.

Wê şevê tu kes ji koçberên wargehê ne nivistibû. Her kes jipiyabû û me nefesa xwe girtibû û çavên me li çiyayê beramber Şêxan bû. Bi banga sibhê re şer destpêkir. Şer, zêde ne ajotibû. Me dizanî hêza me şkest. Ji ber kû hem di aliyê hêjmarî de hêza me kêmbû û hem jî çekên wan yên giran tinebûn. Şîn ketibû nav malan û her kesî hêstirên xwe dirijandin hundir. Me şerm dikir, em eşkere bigrîne. Bi reş ketina heman şevê re qismek ya hêza me ya xweparastinê zivirîbû wargehê ema, Ehmet nehat. Roja paştir rêvebertiya wargehê, ji dayika min re gotibû;

"Ehmet birîndar bûye û mayê cihê şer."

Dayika min ev xebera qedapdar zû gihandibû min. Min fêhmkiribû Ehmet ne saxe û şehît ketiye. Ema dîsa jî hêstên min rê ne didan mejiyê min saxbîr raman bibe û digot, 'na, nabe Ehmet me bihêle û here'. Pêşmergeyan dor li qampê girtibûn û her zilamê serê xwe ji nav çadiran dertêxist gulebaran dikirin. Bar mabû di stoyê jinan de. Sêyemîn roja piştî bûyerê ez, xwesû û dayika xwe çûn cihê şer. Em du roja li wî çiyayî geran, ne sax, ne birîndar û ne jî kuştî me kes nedît. Roja sê ya li ber robarê qontara çiyê em li rasta zilamek êzîdî hatin.

Zilam got; "Hûn li çi digerêne?"

Ji tirsa me newêrî em merema xwe bibêjin û me got;

“Pezê me wunda bûye û em li dewsa wî hatine.”

Zilamê navser û di çavên wî de neyartî ne dixweya, ji gotinên me bawer ne kir. Zilamê Êzdî, awrên xwe yên şil pesartin lotkeya çiyê û bi dengek kelegirî got;

“Ne têrsêne. Ez dizanim, hûn li kuştiyên xwe digerêne. Herin kuştiyên we li serê filan giriye.”

Em çûn serê girê zilamê Êzdî nîşankirî. Bêhnek tûj û dijwar bi gir ketibû. Heta hingê min bawer ne kiribû Ehmet hatiye kuştin. Gotibûn; “birîndare” min jî wisa xeyal dikir û dixwest. Bi hatina bêhna dijwar re, qedemên min şkestibûn. Êdî min dizanî agir bi mala min ketiye û stûna mala min şekstiye. Destpêkê em li rasta kelaşê Muhemet Tahirê Hilalî hatin û kêmekî li wêdetir jî Ehmet dirêjkirîbû. Gule ji rayê qulinca xwe xwaribû û devikî ketibû. Pêşmergeyan pêlavên wan biribûn, kûrkên wan şelandibûn û çekên wan rakiribûn. Me Ehmet û Muhemet Tahir di qelşa kevire kî de veşartin, kêmekî sohrpel avêt ser wan û em derbazî girikê teniştê bûn. Li wêdê jî me kelaşê Medenî Mehmûdê Hilalî û Ehmedê silîvî dîtin. Me kelaşê wan jî li wêdê veşartin û em zivirîn wargehê. Êdî ez qet ne çûm wî çiyayê biqedap û kelaşê wan hê jî li wêdêne.”

**Ehmedê Elî yê Hilalî** vedibêje;

“Sibeh zûbû, dengê şer xweş dihat me. Ez û Ehmedê Evdo yê gundiyê me şivanbûn. Me dît birek pêşmerge hatin û li ber rizda jor xwe veşartin. Me pezê xwe da hev û me xwest em qesta wargehê bikin. Li ser vê tevgera me pêşmergeyan, em gulebaran kirin. Ji her çar aliyan em gulebar dikirin û ber bi me ve dibezîn. Ez û Ehmet ji hev qutbibûn û êdî me qet hev nedît. Ez ber bi niwalê ve revîm û derbazî gundê Dêrext bûm. Wekû rasthatî ez ketim di malekî de. Min ji xweyê malê re got;

“Ez dixwazim mêj bikim.”

Ne wextê ti mêjanbû lê, min zen dikir kû di ser mêjê de min nakujin. Çirke bi zêranbûn. Lê, ne tiştek yê me yê em pê bikirin mabû û ne jî celadan bifiroşin. Serê mêran hatibû bi pîvazek rizî û bikir jî peyda ne dibûn.

Hê ez di ser mêje de bûm, pêşmerge jî ketin di hundir de. Ne hiştin ez mêja xwe biqedînim û danîn min. Xweyê malê, lave ji wan kirin û got;

“Yêxtiyare, gunehe, ne kujin.”

Soza ne kuştina min dan xweyê malê, ez li tirimpêlê siwarkirim û birim kelha Etrûş.

Kengê gihatim kelhê, tişta destpêkê min doza wê kirî, sicada mêjêbû. Nizanim çima ema, min xwe pir bê hêz û bê star hîs dikir û min dixwest; bi mêjê valetiya di hundirê xwe de dagirim. Piştî girtina min di heman rojê de Sedîqê Bilehî, Enwerê Kadûnî û Sebriyê Mijînî

jî ji çiyê girtibûn û ew jî anîn cem min."

Ji berya pelçimên darberûyên çiyayê Şêxan bi werîne Pyîzê, ji zû ve dest bi weşandina mihacirên welatê xwe kiribû. Dayiktî ti carî ewqas zor, neçar û dilqayîm ne bibû. Ti carî jana kezebê ewqas bê şerm û sêwî ne mabû. Kurmên ji birînên mêran di weşan, ti carî ewqas bê wate ne mabûn. Û di bin postalên nûkeran de ti carî çiyayên pîroz ewqas ji kûr ne nalîbûn.

**Narinca Qutasê Lewendê Hilalî** vedibêje;

"Piştî Ehmedê Evdo ne zivirî, êdî her kesî dizanî ne saxe. Piştî şer, roja heştêbû. Dayika Ehmet Qutê, hevjîna wî û çend pîrekin din me xwe da hev û em çûn. Jixwe em bêrîvanên wan bûn û me ew çol xweş nas dikir. Heta piştî nîvro em gerihan. Rasthatinek jandare, Qutê kelaşê Ehmedê xwe dîtibû! Bêhna wî kiribû û li ser bêhnê kelaşê kurê xwe dîtibû.

Ji nişkan ve qêra dayîka kezebker em hilciniqandin û li ser qêra wê em bezîn. Ehmet, ketibû di navbera du kuçan de û Qutê ya porkir devê xwe êxistibû bîrîna wî de. Bêhnek gêjker ji kelaşê felişî difûriya, ema Qutê bêhn ne dikir. Dema min Qutê ji ser kelaş kişand, kurmên bi dev û dêmê wê ve mayîn hê jî diqijwijîn. Kelaş, wekî seradê lê kiribûn. Bi sedan gule lê xistibûn. Kelaşê rizî herişîbû. Me bi kûda wî digirt bi destê me ve dima. Qutê ya porkur, kirasê xwe êxist û me kirasê dayikê li kurê wê kir. Kiras qayîmbû. Me her yekî bi quncikek yê kiras re girt û bi dorê hilgirt.

Ji bû kes bi me nehesê û nizanibin cinaze bi me re ye, êdî Qutê jî hêstirên xwe ji dizî ve dibarandin. Hevjîna wî ya dayika du zarokan şebikîbû û tenê li dêmê kurma xwarî dinêrî. Ne diwêrî bigrî û ne jî dikarî kelaşê bavê zarokên xwe hilgire. Lê Qutê, ji me hemiyan bêhtir kelaşê delalê xwe dihilgirt. Dema derek ya kelaş li erdê diket dilê wê têşa û digot;

"Hûn bixwedêkin hajê hebin, bila Ehmedê min ne êşê."

Bi çi kul û halî me kelaşê Ehmet anî binê gundê Şehya. Gundiyên wî gundî, ji berê û pê ve hej me ne dikirin. Hacî Brahîmê axayê gund, her tim dij propexandaya me dikir. Jixwe gundî yên wî gundî pêşvantî ji qetil û talana me re kiribûn. Gundî yên li nav dehlên li binê gund, bi awrên mirin barkirî li me dinêrîn. Zeravê me qetan. Me zen dikir, haxta êrîşê me bikin û kelaş ji me bistînin. Serî werhasil, em bê bela ji hindama gund bûrîn. Êdî em pir westabûn û taqet bi me re ne mabû. Ehmet, zilamek girbû. Laşê wî herişîbû û cihekî xwe bi ya din ve ne digirt. Ya herî zehmet jî bêhnek dilgir, gêjker û ne asayî pê ketibû û kurm ji birînên wî gindirvarî dibûn.

Zilamek navser, simbêl mezin bi teketorê hat û li rasta me rawesta. Zeravên me bizdan! Me ji xwe re got; "êdî xilas! Ev zilam li dûv me ketiye." Zilam, birûyek ken û dostane silavek da me û got;

"Ez Êzîdîme. Xwilamê Seîd Axayê gundê Mikêr'sim. Heke hûn soz bidin, dema pêşmerge li rasta me werin, hûn bêjin; "ajotvan nizanî cenaze bi me re ye û me rica kiriye û em bixwe re anîne" ezê we û kelaşê we bigihînim nêzî wargehê."

Zilamê navser û şaşikek melkebî di ser rûyê qermiçî de daketî, xetên rûyê xwe mucid kirin û lêkir;

"Divê hûn bêbextiyê li min nekin. Bixwidê pêşmerge bibihîzin min arîkarî bi we re kiriye, yê kelaşê min jî deynin rex vî kelaşî."

Me bi razîtiyek mezin soz da û zilamê mirovyar. Em anîn, danîn dolika binê wargehê û zivirî."

**Xela**

Di zimanê Kurdî de, bêjeya "xela" qira ji birçî mayîna ji bûyerek xwezayî jêderbûyî bilêhv dikir. Ev xelaya dikara wê têkirin ne ji bûyerek xwezayî, ji wujdana beşerî jêder bibû. Zarokên koçberan, di nav pencên şaristanên modern û nûkerên wan de diperpitîn. Di himbêza dê û bavên xwe de ji birça zimanê wan hişîn dibû, çavên wan dişemitîn rexê û henaseya xwe ya dawî didan. Janek bê şerm rûyê dê û bavan dinixwinad û bi awrên neçar temaşeyî mirina zarokên xwe dikirin.

Jixwe ji roja şer ya destpêkê ve rayedarên UNHCR'a Dewletên Yêkbûyî xwe ji wargehê kişandibûn û koçberên Şehît Eşref spartibûn wujdana pêşmergeyên PDK'ê. Bi ti awayî têkildarî koçberan ne dibûn û di nav boseya agir de hiştibûn. Ji heyva Tîrmehê ve qût û tiştek din ne ketibû wargehê û her tişta cihê xwarinê jî digirt pêşmergeyan dizîbûn û talan kiribûn. Jixwe pez ne hiştibûn û ji çêleka li ser sing bigre heta bi elok û mirîşkên di lîsikan de; li ber çavên xweyên wan girtibûn û ji xwe re biribûn. Vê jî têra daketina kîna wan ne kiribû. Bê navber şev û roj wargeha ji komek çadir pêk dihat gulebaran dikirin û tu kesî nikarî serê xwe ji parastgehan derxîne. Ne nexweşxane mabû û ne jî derman. Doxtorek dildar yê kurdên Rojavayê Kurdistanê li wargehê bû. Ew zilamê xwebûr, ji hemî doxtorên Êraqê û şaristaniyetê zîrektirbû lê, hebek ya serêşê jî li cem ne mabû.

Hêdî hêdî qût dibirha û çare ya wê jî kesî nizanî. Pêşmerge, hîz û dizên gundên derdor bibûn mêrxas û bi ser koçberan de dixwirîn. Kê li kûdê keysê xwe ji çiyê koçberan tanî, didizî. Di rastiyê de bêjeya "dizî" tam ne di wê wateyê de bû. Ji ber kû dizî xef dihat kirin. Wan camêran eşkere û nîvê rojê her tişt talan dikirin.

Di mijara birçîbûyînê de, dayîk ji her kesî bihestirbûn, jixwe dayikên zaroşîr pir hesastirbûn. Ewan, ji gihanên bedena xwe, ji

awrên zarokên xwe, ji giriyê dergûşa xwe dizanîn; zarokên wan çiqas birçîne. Ji bû zarokên wan ji nêza ne mirin, ji berya her kesî dayik ketibûn tevgerê. Bi tarîtiya şevê re çend dayik digihatin hev û ji bû peydakirina şîvekî berê xwe didan gundek yê derdor. Ew, bi hêstên xwe yên dayîktiyê, bi mêhvan perwertiya xwe ya kurdîtiyê derdiketibûn wê rêvantiya dijwar û bawer dikirin kû dayikên wan gundan yên wan fêhm bikin.

Heke li rasta kemînek ya hîz û dizên Mizûriyan ne hatibûna û bi lêdan û dijûn bi paş ve ne hatana zivrandin – kû piranî caran wisa çêdibû- bi sed sexdeyan û duayan digihatin gundekî. Gundiyan çend tiştên ji rêzê û kêm, bi buhayên deh qet zêdetir difirotin wan. Lê îş, li wêdê ne diqeda. Yên tişt difirotîn di heman demê de ji derveyî gund, di rêya wan de kemîn datanîn. Dema dayik ji gund vediqetan, diketin kemînê û dihatin girtin. Dilxwede yên tişt firotîn gundîbûn û yên kemîn danîn jî pêşmergenbûn û ji hev bê agahbûn. Lê ne wisa bû. Her du jî heman kesbûn û bi hev re bi hevpeymanbûn. Hem diravên dayikan ji wan distandin û hem jî tiştên firotîn wan. Bi pişt re dirav li xwe behr dikirin û jixwe tişt li cihê xwe bûn. Carnan heman tişt bi dehan car difirotin dayikên koçberan. Her tiştên difirotin jî bi buhayê deh qet zêdetir. Ankû 10 x 10 = 100. Wekû mînak; heke kêloyek nîsk bigihata wargehê, ew nîsk li ser kesê koçber ji buhayê xwe yê asayî deh qet zêdetir disekinî. Koçber, ji wê jî razîbûn. Lê piştî demekî PDK'ê temaşekir koçber li berxwedidin û teslîm nabin. Li ser vê rika koçberan, ferman li gundên derdor belavkir û ew jî qutkiribû.


PDK ya piştî demekî bawerkirî kû koçber ji taqet ketine û êdî nikarin li berxwe bidin, dest bi bang û hewldanên teslîmiyetê kiribû. Lê koçber, di berxwedayînê de bi israrbûn. Berde sikitî û bê merîstiyên nûkeran bawerî û îrade ya koçberan bi şikîne, berevajî kîna wan tûjtir û ruhê wan yê berxwedanê mezintir kiribû.

Di rastiyê de yê ambargo danî ser wargeha Şehît Eşref ne PDK, Saziya Dewletên Yêkbûyî –UNCHR- bû. Ji ber kû her du wargeh ji heman kesan pêk dihatin, heman xet û heman felsefe diparastin. Ji aliyê kordînasyonekî ve dihatin rêvebirin û xweyê yêk mejlîsîbûn. Ambargo danîbûn ser Şehît Eşref û her kê yê kû serê xwe ji çadiran derdixist dihat gulebarandin. Jixwe ji destpêka şer ve rayedarên DY kirt û pertalên xwe dabûn hev û terka wargehê kiribûn. Lê heman sazî li Şehît Azad li ser karbû û qûtê meha Tebaxê jî belav kiribû û ya hayva Êlûnê jî anîbû. Qûtê heyva dawî yê Şehît Azad amadebû ema, ji sedema ambargoya li ser Şehît Eşref hemwelatiyan hêlwesta durû ya UNHCR protesto kiribûn û qût ne digirtin. Nixwe ambargoya qût, li ser wan tunebû. Saziya dilxwede mirovyar UNHCR, dewleta Turk û PDK'a mala Berzanî hemrolên heman leyîstokêbûn û di heman

şanoyê de dileyîstin. Yêk derhêner, yêk ser rol û yê din jî figûranbû. Di encam de ji heman armancê re kar dikirin û hevtemamkerên hevbûn.

## Rojaneyên Embargoyê

*“Em li welatê NAN, bê nan hiştin!”*
*Rêber APO*



*"Ev zêdeyî 40 rojaye Tevgera brûsk ya PKK'ê li dijî bazarvanên xwînê dewam dike. Navçeyên wekî Kanîmasî, Bêgova, Bamernê û biqasî 70 gundên mezin û piçûk girtine quntrola xwe. Û şerek pir serkeftî dewam dike. Her tişt serkeftî û di rêya xwe de ye. Ema tişta neyînî rewşa mihacirên siyasî yên ji Bakur hatîn Başûr û li qampa Etrûş bicêh bûyîne.*

*Şer li çiyan û li sînorê Bakur- Başûr germe û Etrûş ji sînor 160 KM dûre. Ev PDK jî bê rêgez, bê zagon û ji eşîretên kevneperest pêktê. NY jî dilxwede saziya Emperyalîzmê ya arîkariya miroviye. PKK jî tevgerek sosyalîste û ji ber kû li dijî dostên wan yên stretejîk şer dike dijbertiyên wan yên îdeolojîk û siyasî hene. Ji ber wê NY jî PDK'ê destek dike.*


*Di rastiyê de ji serî û pê ve jî arîkartiyek gel bi karibe xwe pê jiyan bike ne didan. Serê kesê 7 kx ar, 1 kx dohn û 900 xiram nîsk didan. Bi arîkariya PKK, gel bi diravan pêwîstiyên xwe zar-zor peyda dikirin.*

*Piştî şer destpêkirî PDK'ê bi arîkariya NY ketin û derketina qampan qedexe kiriye, çend cara êrîşê qampê kiriye, bi dehan şêniyên qampan qetil kiriye û ji 3000 zêdetir mêh û bizinên qampê dîzîne.*

*Û heta bi dîroka 6.10. 1995'ê ankû heta bi îro hat. Rewşa îro; ne ar maye û ne jî qet tiştek ya xwarinê. Rewşa her du qampan jî hemane. Ez bêjim; "17 000 koçber bi zar û zêçên xwe ve, bi mirinê re rû birû ye" ya kêmekî were mezin kirin lê, bi vê çûyînê di pir nêzîk de peyva "mirinê" êdî nayê wateya mezinkirinê. Daxwaza bazarvanên xwînê û NY, me jî teslîmê bazarvanên xwînê bikin. Bila kes ne liçaverê be gel vê bipejirîne. Teslîm bûyîn bi dehan car ji mirinê kambaxtire.*

*Slavên şoreşgerî*


*6.10.1995/ Hewar-Etrûş"*



*"21. 10. 1995 – Etrûş*

*Îro dîsa birçî hat destpêkirin. Doh komîteya me ya NY ji bû kifşkirina cêh û ji bû em bikaribin şerê xwe yê siyasî berdewam bikin çûbîn Ş. Azad. Nûçeya anîn; ji bû destek kirina vê qampê 10.000 kesên li Ş. Azad jî di ne girtina qût de bibiryarin. Hêzên nûkerên 100 mitreyan nêzîkî wargehê bûyîn û di her 50 mitreyan de çeperek danîne. Û nêrînên gelê qampa Şehîd Azad; 'çi dibe bila bibe newin vê qampê, li berxwe bidin û xwe neyêxin di çembera nûkran de'.*

*Ez piştî ambargoyê ji Gara zivirîbûm. Qûtê me cîrana me ya malbata şehîdan digirta. Piştî em zivirîn êdî me cihê çadira xwe ya kevin jî guhert. Ji ber wê ji serî û pêve qet qûtê me tinebû. Ji berya niha terbiya PKK'ê hemî qamp anîbû rewşa malbatekî û niha jî wisa dewam dike. Lê, dema mirov van zarokan dide ber çavan, kes nikare li cem ti malbatan xwarinê bixwe."*



— Gittikçe bulunan mevcut bazı erzak-
lar kıtlığı ile tükeniyor
Fakat moral bakımından halk oldukça
iyi durumdadır. işbirlikçi p.d.k. e
ve emperyalizmin göz boyamacı sözde
insani kurumu B.M.M.Y. komiserliğine
teslim olmaktansa açlıktan ölmeyi
ve tarih sahnesine yeni bir sayfa
yazılmayı tercih ederiz. yönündeydi
ve PKK'nın taviz vermez radikal
tavrından kimse ödün vermek istemedi
dün Ş. Azad kampına erzak götürmüşler
halk Ş. Eşref kampına erzak vermeden
biz almayız ölümse beraber ölmeyi
tercih koymuş. Bu kararlı ve tavizsiz
direniş karşısında B.M.'nın geri adım ata-
cağına benziyor. Bu sabah 2 B.M.
arabası geldi B.M. Halk komitesinden
bir kaç kişi alıp Ş. Azad'a götürdü-
ler. Bu akşam 7.30. Med TV'nin haber
bülteninde B.M.M.Y.K. [illegible] denetiminde
[illegible] bulunan 16.000 kişi ölümle
yüz yüze bırakılmış ve kampın [illegible]
TV. [illegible] büyük bir [illegible] ben-
zercesine. 25.10.1997. [illegible]
27

*“Her kû diçe hin qûtê heyî jî bi leza bahozê diqede. Lê, di aliyê moralda rewşa gel pir başe. Meyla gel; “ji dêla em teslîmê PDK’a nûker û çav boyaxvanên Emperyalîzmê, dilxwede saziya mirovî ya Komîsertiya bilind ya Netewên Yêkbûyî bibin, em mirina ji nêza û di dikê dîrokê de rûpelek nû nivîsandinê tercîh dikin” bû. Û tu kes naxwaze ji hêlwesta PKK’ê ya bê tawîz û radîkal tavîz bide.*


*Dûh qût birine Qampa Ş. Azad. Gel gotiye: “Heta hûn qût nedin Ş. Eşref em jî nagrin.” Tercîha xwe di aliyê ‘mirin be, emê bi hev*

*re bimrin' de daniye. Li hember vê berxwedana bibiryar û bê tawîz, di zena min de NY ya bi paş ve gav bavêje.*

*Vê beyaniyê du tirimpêlên NY hatin. Ji komîta NY ya wargehê çend kes girtin û birin Ş. Azad.*

*Şevê din nûçeya sereke ya Med TV ya nûçeyên 7.30, "16.000 koçberên Etrûş, yên di bin çavdêrtiya KBNY -Komîsertiya Bilind ya Netewên Yêkbûyî- de dimînin; bi mirinê re rû birûne" bû. Û di kolika navdar ya televîzyona qampê de wekî semînerek mezin hebe.*

*25. 10. 1995 / Hewar"*




*“Şevê din heta derengê şevê me Med TV temaşekir. Piştî demjimar 9.30’ê li jora qampê dengê çekên giran dihat. Li gorî nûçeyên me îro girtîn, hevalan li girê Eslan, Gundê Bêbadê û li nokteyek din ya nûkeran dane. Hêza hevxebatkaran wekî çîçikên elokan ji hev belav kirine.*

*Îro bazarvanên xwînê bê deng dixwiyêne. Rewşa bê qûtiya qampê jî dewam dike. Her kû diçe bi kêm û kurtî jî be hin tiştên heyîn jî li ber qedandinêne. Lê, li min wisa hat kû ew xofa destpêkê di nav gel de nemaye. Dibêjîqey %50 gel fêrî birçîbûyînê bûye. NY, bi pênç tirimpêlan hatin, li beramberê qampê kêmekî rawestan û bêkû bi kesî re hevdîtinê bikin bi şûn ve zivirîn. Sedemê hatina wan ne hat fêhmkirin. Li gor yên ji nêzîk ve dîtîn, tirimpêlek ya Xaça sohr jî di nav wan de bû.*

*Slavên Şoreşgerî*

*27. 10. 1995 / Etrûş- Hewar”*



Kürt denilince ölüm
Kürdistan denilince akla savaş geliyor
30.10.1995 Etruş Hewar


*“Şevê din di kolika min ya spehî de bi awayek doxe dîsa hemî gelê qampê hatibû seyra dengûbasê Med TV. Nûçeya sereke Heyva Sohra Kurdistanê, nameyek bi naveroka “mihacirên li qampa Etrûş bi mirinê re rû birû hatine hiştin” ji Sekreterê Giştî yê NY Bortîs Galî re şandibû. Dixwiya kû vê nameyê gel qederekî memnûn kiribû. Piste pista; “em ne tenê ne” di nav gel de bilind dibû.*

*Belê, bi zehmetiyên hê mezintir me dest bi rojêkir. Sedem çiye nizanim ema, her kes ji vê rojê pir bi hêvîbû. Herhalde ji ber kû serê heyvêbû û roja duşemêbû. Ji berya deh deqîqeyan dema tirimpêla bazarvanên xwînê ya doçkaya 14.5 li ser û bi rêya Hervîşim ya beramberê me re derbaz dibû qamp gulebarankir.*

*Ji bû hilberandina çaresertiyekî her kes dixebite. Her kû diçe dijwartî di qampê de bejin dide.*

*Dema tê gotin, ‘Kurd’ mirin û dema tê gotin, ‘Kurdistan’ jî şer tê bîra mirov.*

*30.10 1995 / Etrûş- Hewar”*



”îro ji dilê min hat. Rojaneyên xwe yên derbaz bûyî de giş min bi zimanê tirkî, zimanê dagirker nivîsiye. Belê, îşev ket mejiyê min û min got: “gelo çima ez bi zimanê dayika xwe na nivîsim û nafikirim?”

Belê, min wisa dest bi vê rojanê kir û nivîsand. Dabaş dîsa qampa Etrûşe û rojev birçîbûna gelê qampê û abloqaya bazirganên xwînê yên li ser gelê li ser xaka xwe penaber bûyîne. Îro dîsa Dewletên Yêkbûyî hatin qampê. Komîta gel birin  wargeha Şehît Azad. Li wêdê qomîteyên her du wargehan bi hev re civînek çêkirine. Biryara îmzekirina kaxeza Dewletên Yêkbûyî girtine û îmzekirine.


Li gor nûçeyên min girtîn, çi di kaxezê de ye ji gel re hevcedariya diyarkirine ne dîtine. Ji ber vê ez jî nizanim û li gor gotinê; wê siba

*civînek gelemperî ji hêla temsîlvanên Dewletên Yêkbûyî ve di wargehê de were çêkirin. Bipêre doxtor wê kesên nesax tedawî bikin û roja duşemê erzaqa were.*

*Ji xeynî rojanê ez dixwazim di vî rûpelî de bi kurtahî li ser rewşa pdk'ê ya vê qiphetê tîne serê gelê Kurdistanê û biteybet penaberên wargehên Etrûş binivîsim. Ji bo di mejiyê gelê Kurdistan de rureşiya wan, ev qontratiya wan û ev lanet û dijminatiya wan ya li dijî Rizgarî û Azadîxwazên Kurdistanê newe jibîr kirin.*

*Belê du meh bûrîn. Derketin û ketina wargehan, anîna erzaqê, hatina doktor qedexeye. Kê qedexe kiriye hûn dizanin? Partiya Mele Mustefa Berzanî, PDK'ê. Ev tenê na, şazdeh hezar mirov li ber mirinêne. Êrîşê wargehê kirin. Gelê wargehê nehiştin bikevin nav wan. Di wê dê de şeş xort şehîd ketin, bi deh hezaran pez , çêlek, hêstirên kampê dizîn û talankirin. Her roj, her şev wargehê gulebaran dikin. Gel ji bû zarokên xwe ji mirinê biparêze diçin berûyan. Wan pîrekan, wan zarokan digrin, dijûnan dikin wan û her pîsîtiyê didin xwiyandin. Çima p.d.k van tiştan tîne serê vî gelî hûn zanin? Ji bû zulma dewleta dagirkerên tirk ne pejirandine.*


*s. şoreşgerî 02. 11. 1995/ Etrûş- Hewar*



*Îro dîsa heman piyan û heman serşûk. Di rastiyê de Komîteya NY ya gel û karmendên NY roja înê hevdîtin çêkiribûn. Biryar girtûbûn kû îro qût bînin. Rêvebertiya wargehê, bi cîvînekî ev biryar ji gel re ragihandibû. Gel jî bi hêviyên mezin çaverêyî îro mabû. Lê, ji sibehî ve dîsa bazarvanên xwînê bela xwe ji vî gelê bê parastin venakin. Demjimar li derdora 11.00, li girê pişta qampê birek pez birin. Bi wê jî têr nebûn, hê jî dengê B.7 û BKC û qlêşan tên bîhistin. Li cem Şehît Bêrîtan hin kesên ji birçîbûnê debar nekirîn û ji buhayê asayî 4, 5 qet zêdetir dixwestin hin tişt peyda bikin gulebaran dikin.*

*Ji du mehan zêdetire, ji zarokê yêk salî heta bi kalê 90 salî li hember birçîbûyînê, guleyan û zextan liberxwe dide. Nûkerên PDK biberdewam bi desteka T.C û Êraqê xiyanetê dipesêre vê berxwedana bê hemsal û êrîş dike. Xiyanetê dipesêre. Îradeya gel ya xiyanêtê têk bibe.*

*Silavên şoreşgerî/ 06.11.1995 / Etrûş.*



*"Di rojana min ya îro de tiştên pir girîng hene. Ger her roja me ya dawî ji roja derbazbûyî girîngtire û her rojek ya em vê demê, vî zemanê cîhan evqas bi derfetên fireh jiyan dibe. Em vê jiyana giran-buha evqas tengahî, heta bi xelayê li ser xwe dipejirînin, ji bû dîsa dîroka derbasbiyî de li ber çave, em bigihêne netewa xwe û teslîmkariya xiyanetkaran ne pejirînin. Ji bû em bikaribin hesabê gelik salan ji dijmin û hevxebatkarên wî bixwazin pêwîste rojê me, rojaneyên me wisabin. Derfetên me dîsa jî ji yên qehremanê zêndanan bêhtirin. Di van rojan de, di van tengahiyên dîrokî de birastî jî xêret û derfet hebin mirov her roj dikare romanekî an jî pirtûkekî binivîse. Lêbelê ev firseta şoreşa Kurdistanê dayî me, em bi rastî na nirxînin. Ez*

*bitirsim dîrok û ciwanên nû rabin, yên vî hesabî giran bixwazin. Lê ez dibêjim; "derfetên me hindikin. Ji bo wê heke bigihê armanca xwe ev rûpela tênûsa mina piçûk wê ronahiyê ji gelik tiştan re bigre.*

*Belê! Me got, hingî roja paştire gelê wargeha Etrûş ji sedema abloqeya p.d.k'ê û eleqeder nebûyîna Dewletên Yêkbûyî berbi mirinê ve diçe. Îro di hêla dîtina min de bi rastî xem û kulên mezin ji min re çêkirin. Bi teybetî mala dayê. Ez siet 11.00 çûm wêdê. Şeş, heft zarokên wan hene. Ji piçûk û mezinan hemî ketibûn erdê û neçar di bin dûvikên çavên xwe re dinêrîn. Tesîrek pir mezin li ser min çêkir. Bi rastî gelê wargehê hezar malbin, nehsed di vê rewşê de ne. Yanî civakiye ne şexsiye.*


*Ez niha pir nesaxim, cemidîme û hundirê mirov valebe zûtir dicemide. Ji berya nîv sietî ez ji ber Med TV hatim. Ez pir nesax jî bîm lê, bername pir xweşbî. Destê min jê ne qeta.*

*Dabaş, şerê Başûr bî. Pir mêhvan tevlî bibûn. Serokê Netewî Serok Apo, Îbrahîm Ehmed Î. Şerîf Wanlî û gelik kes.*

*Serokê Netewî got: "Ev hêza cehşîtiyê dike, aqlê xwe neyîne serê xwe ev zivistana wan ya dawiye." Evê peyvê ez germkirim.*

*Niha siet 23.00 ye, çadira me pir sare û ez jî pir nesaxim. Îro bixatirê we.*


*07.11.1195 Etrûş."*



*"Pêwîste mirov binivîsîne, her roj binivîsîne. Ji xişandina mar heta bi stêrên ezamanê welatê xwe binivîsîne û drama li wargeha penabrên Etrûş jî binivîsîne. Îro jî birçî û neçar derbaz bî. Ez jî nesaxbîm, zêde di nav gel de nebûm. Lê, dîsa jî bê xem nemam. Êvarî min hevalek dît, tinebûn û meyilvantiya rêvebertiya wargehê û neçartiya di nav zarokên xwe de tanî ziman. Ne prensîbê mine insanek şoreşger bigrî, jiber kû girî zeîfiye. Ne wisa bûya, tu bawer bikî ezê têr girîbîma.*

*Bûyera herî girîng ya di wargehê de jiyan bûyî, pîrekek ji hemla xwe rihet bûye û piştî wê jî nesaxbûye. Du jin ji bû bibin nexweşxanê çûn qereqola Dewletên Yêkbûyî. Erebeyek anîn û birin nesaxanê. Dîsa hevalê qazit talîmata Serokatiyê ya li ser wargehê anîbû. Evê jî ez pir keyfxweş kirim.*

*Silavên şoreşgerî/ 8.11.1995 /Etrûş"*



“Belê îro siet 10.30’ê  NY bi deh, dazdeh tirimpêlan hatin. Ji bû wargeha Şehîd Eşref ankû vê wargehê bibin wargeha Şehîd Azad. Ev nêzîkî 80’ê rojaye me li berxwe dida û me digot; “çûyîna wargeha Ş. Azad ne başe, xwesteka dijminaye.”


Lê, çare ne ma û em mecbûr bîn bipejirînin vê daxwazê.

*Ji ber kû bi rastî jî gel, zarokan û yên di wargehê de dijîn her kesî berxwedanek dîrokî kir. Hin kesên sist, leq jî hebin, lê ji seda notê gel bi berxwedanek mezin ev merheleya partî û demê ji me dixwest bi serkeftinek mezin anîn cêh.*

*Aha niha semta Ş. Bêrîtan bardikin. Heger em bi tifaq bin, ka jiyana me li vir çawabî ya li wir jî wisa be. Rêveberiya wargehê hakîmiyeta wargehê ji dest berdaye. Ev jî kêmasiyek herî bilinde. Mirovê şoreşger tengahiyêde belî dibe. Bes, di vê tengahiyê de evê rêveberiyê navê PKK'ê û rêberiya PKK'ê temsîl ne kir. Yê hesabê vê jî qetiyên were pirsîn. Ev jiyana birûmet û buha encex gelê şoreşger bikaribe jiyan bibe.*

*Ji du hezaran re pênc divê û em ji bû xwe ne spêrin hevxebatkaran, Nanê Berû, Nanê ce.. Bi rastî min nanê ce ne xwar, sedem jî min peyda ne kir. Di sefê gerîla de min pir zehmetî dîtin. Lê, em azadbîn, em digeran. Di nav lepên me de zarok, yêxtiyar tinebûn. Kesî nekarî dora me dorpêç bike. An me yê xwe tine bikra, an jî dorpêça dijmin ya biqeta. Lê, li vêdê ne wisaye. Bi hezaran zarok, yêxtiyar û statûya mihacirî. Ev jî bi serê xwe belayeke.*

*Silavên şoreşgerî*
*11.11.1995/ Etrûş"*



*“Belê îro derdorê siet deha bî, dengê çekên BKC û qilêşa hat. Min pirsî, heçî heyî got:” nizanim.”*


*13.11.95 saat dazdeh bî; qîrînek xwirimî. Min dît cenazeyek nav betaniyêde jêlil tanîn. Gotin: “Ahmedê Hevleriye.” Hinga çek teqîn pêşmergeyên p.d.k’ê ev mirov li milê wargehê şehîd xistine.*

*Niha siet sêzdehe. Ji bû zarokên wan nemrin pîreka wî çûbî berûyan. Hatiye, pê hesaye, “hewar, hewarên” wê perdeya guhê merivan diqetîne. Nirxandin ji kîs we.*

*Belê, çiqas ez dixwazim dramekî binivîsim yêk hê girîngtir derdikeve holê. Ez jî şaş mame.*

*Lê, çi dibe bila bibe biryarkarim. Ev karanîna ji derveyî mirovahiyê ya bazirganên xwînê ezê binivîsim.*

*Me got, doh û pêr tirimpêlên dilxwede Dewletên Yêkbûyî hatin wargeha Şehît Bêrîtan. Tenê 40 mal rakirin û birin wargeha jêr. Îro nehatin. Li gor nûçeyên gihatîn me, ji hêla p.d.k ve tên asteng kirin. Baş nizanim lê, dibêjin; "xayînan dîsa em dorpêç kirine!" Ema baş nizanim.*





*"Xelaya Wargeha Etrûş di roja 80.de ye.*

*Min îro li binê dara mala Hesenê Nerexî, zarokek dît. Zarokê du salî, li ser nîvê rê piştîkî dirêj kirîbî. Zarokek gewr û por zerbî. Çavên wî melûl û mêşa dora devê wî yê vekirî nixwimandibî. Zerîtiyek lewitî spiyika çavên wî yên di nav mijgûlkên kizirî de bi zorê dihatin fitrandin girtibî. Bi çevên xwe yên bi zorê dikare nîv bel bike li min dinêrî. Di awrên wî yên li min dinêrin*

*de, beşişandinek jandar û veşartî dixwiya. Dibêjîqey ez nas dikirim û hîviyek ji min dikir. Li min nêrî û lepta lêhvên wî bala min kişand. Dengek derdixist lê, gotinên wî ne dihatin fêhmkirin. Ji ber kû taqete axaftinê bi pê re nemabî. Ji bû gotinên wî fêhm bikin, li cem rûniştim û min guhê xwe nêzî devê kir. Gotina wî "NANO" bî. Wî ez nas dikirim lê, niha jî nizanim kêye. Jixwe hev nas kirin, an jî ne nas kirin jî ne kifşkere. Zarok ji nêza piştikî ketibû û nan dixwest. Tenê nan! Pariyek nanê zuwa. Lê, ew jî ji min ne dihat. Tenê ya ji min dihat, gotin û daxwaza wî derbazî ser rûpelê deftera xwe ya peritî bikim.*

*13.11.1995/ Hewar"*



*“Belê, wextê min dûh rojane dinivîsî, vize viza berikên hevxebatkaran li nav wargehê diketin. Min gotibî, ez encamê nizanim. Lê, encam îro hat girtin. Li semta Şehît Cûma zarokek birîndar kirine. Îro jî DY hatin. Eslinde yê îro hatibîna mal kişandi bîna. Lê dîsa vir, vir,vir! Her roj ev saziya dilxwede mirovtî, mafê penaberan diparêze û navnetewî Vira dike. Ne hatin. Ber bi êvarî ve hatin, ew birîndar birin nexweşxaneyê û çûn. Digotin, emê siba werin. Lê di wargehê de tu kes ji wan bawer nake.*

*Ez îro yanî dawî sê, çar roje pir birçî dibim. Ev nêzîkî mehekiye xwarin-vexwarin tiştek di mala me de nemaye. Du dana birçî, danekî nîv têr dibûrî. Vêca ew danê nîv têr jî nemaye. Ji xeynî wê jî îro du roje tengahiyek mezin bi min re jiyan dibe.*

*Bedelê şoreşê zore, ya Şoreşa KURDISTANÊ hê zortire.*

*15.11.1995 /Etrûş.”*

**Ey Xwedê Tu Me Nekî Bizin, Deqene PDK Me Ne Dizin**

Roj sayî û sarbû. Bayê Kur firîzî didan û wekî zeleyan li binguhê mirov diket. Ji nîvro re êmek mabû. Pêşmergeyên PDK'ê, ji dehlên li binê wargehê birek pez, kerek, du hêstir û çend elok talan dikiribûn. Zarokan bi kuçan datanîn zilamên talanker û sê, çar jin jî li dûv talanê xwe ketibûn. Mirovên çekdar û piraniya wan zikmeşk, jin û zarokên kom bûyîn gulebaran dikirin ema, xweyên heywanan jî dest ji têkoşîna xwe ne berdidan.

Tengahiya bûyerê wargeh di bin xwe de hiştibû û hêst şidandibûn. Hemwelatiyên li derê çadiran kom bûyîn, hêdî hêdî belav dibûn û hin jî li ser lingan kom bikom sekinîbûn û dikara bê wijdantî û sikîtiya kesîtiya xayîn dikirin. Hemabêje her devî kirinên pêşmergeyan wekû fitne şîrove dikirin û wekû; “dixwazin ji qirkirinê re hêncetekî” çêkin dinirxandin.

Komek ji wan kesan jî li derê çadira Sofî Reşîdê Şaxî kom bibûn. Hin li ser qurmên daran û hin jî li ser kevirên derê çadirê rûniştibûn. Muhemdê dîn jî kêmekî dûrî civata ji kundka rûniştbû û bê navber dikenî. Ji bilî Sofî Reşîdê cemedaniya peritî li dor guhê xwe pêçayî, qermîçokên rûyê wî xeramên girê Mêhrav tînin bîra mirov û di ser hev ve de qumişî  her kes bi kenê Muhemed dikenî. Sofî Reşît, zilamek lewaz, bejin navîn û kêmekî bi ser navsertiyê re, yêktiyar dixwiya. Kêm axaftinbû û hemabêje kesî nedîtibû rûyê wî kenî. Rûyê wî ji asayî pir zêdetir lewazbû û bê hêjmar qermîçok dihewandin. Pêşmergeyan wê rojê hêstira wî jî biribûn û dibêjîqey evê qermîçokek din jî li rûyê wî zêde kiribû. Qermîçokên dêmê wî kûrbûn  û di her qermîçokekî de çîrokek jandar veşartîbû. Jixwe bê dengî û ne kenîna wî ji wan janan jêder dibû. Ewrek spî çavek yê wî nixwimandibû û bi çavekîbû. Hevjîn û hemabêje hemtemena wî Edlê, jinek spehîbû û hê jî zêde tiştek ji bedewtiya rûyê xwe wunda ne kiribû. Hema mirov lêbiketa hêstirên wê dibûn lehî û dihatin xar. Hemabêje her tim şopên hêstiran li ser hinarkên rûyê wê yê gewr diyarbûn.

Merwanê Ziving Şikakî û Feqeyê Gweyînî, dixwestin Muhemdê dîn bidin axaftin û ew jî bi gewdeyê xwe yê gir tenê bi wan dikenî. Di dawî yê de Muhemedê dîn dest bi axaftinê kir û got;

“Birê min, mêr nînin. Heke mêr hebîna qey van toleyan dikarîn me talan bikin!? û  ji cêhê mayî kenê xwe ajot.

Yadê Edlê;

“Erê bixwidê Muhemed, ma rebenê mêrayên çi bikin. Nixwe ma heqê xwidêye, me ew hêstir hebû ew jî dizîn.”

Şahînê Rêvebirê vê sermayê zendên xwe heta bi enîşkê badayîn û Seydayê Xwirsî, ji aliyê wargeha Hungo ve dihatin. yê Aliyek ya delingên pantorê Seyda di ber gorê de bûn, milê xwe bi yê

Şahîn ve şidandibû û bimelaqtî tiştek jê re vedigot. Xwidê dizane, ka dîsa seb û kitma kê dikir. Dema gihatin rasta civatê Seyda rê neda Şahîn û bi dengek bilind û melaq;

"Merheba, hûn çawanin başin?" got û bêkû mûhletê bide bersîvdayînê bi hêlwestek tevzdar lêkir;

"Muhemed birê min, dunya xweşe ne we ye"?

Muhemedê dîn, têr kenî û bi ber kenê re got;

"He, heee, hee, erê birê min. Mane te û hevalê Şahîn ava kiriye, qey dibe ne xweşbe."

Ji dêmê wan yê tirşbûyî kifş bibû kû pênaseya Muhemedê dîn, li xweşa wan ne çûbû û hê bipêre negihatîn bersîva Muhemed bidin, ji nişkan ve Evdilayê dîn dûvikê kupalê xwe yê biherî êxist di nav teşkên Seyda de û got;

"Tirrrrrr!"

Seyda yê melaq, ji tirsa nîv mitreyî hilbeyî û veterisî. Lingên wî li herîsohrka wekî deboqanê şemitîn û xwe kutekî xwe ji ketinê rizgar kir.

Muhemed û Evdilayê dîn, erza Seydayê Xwisirî pîs şkandibûn û nizanî yê xwe çawa ji nav lepên wan rizgar bike. Her du zilamên şûr simblên wan nabirin zû ji Evdila dûr ketibûn û çûbûn. Kifşe kû hinan bêhna Evdila jî teng kiribû û bi gotinên lez û nayên fêhmkirin taxivî û ew jî bi aliyê din ve bûrîbû.

Sohbeta civata li derê mala Yadê Edlê zivirîbû û li ser demê bûrî sekinîbû. Jixwe gotinek heye dibêjin; "dema qereçî birçî dibin dikara xêl û şahiyên demên bûrî dikin." Ya wê civatê jî ew meselebû. Her kesê di wê wargehê de jiyan dibû, çîrokek ya wa ya jandar hebû û bi vegotina çîroka xwe kêmekî rihetir dibûn. Her kes tijîbû û hema mirov li kê biketa dest bi vegotina çîroka êşên xwe dikir. Merwan pirskir û Edlê destpêkir;

"Di nav çar, pênç salan de min du delal, du şitlên rihanê êxistin di bin erdê de. Dema Riza yê minê mezin şehît ket, Riza yê piçûk çeka wî rakir û çû. Li Cûdî bû û car caran min didît. Vê jî ez pir şad dikirim. Ji ber kû hin dayik hebûn bi salan delalên xwe ne didîtin" got û dibêjîqey her du çavên jina gewr bibûn du avzêmên dema Biharê û av ji wan difûrî.

Jina bejin navîn, kelegiriya di qirika xwe de asê mayî daqurtand, bi tîka xavika lewitî hêstirên xwe paqijkirin û vegotina çîroka xwe ajot;

"Axlêveya derengbû. Hê hefteyek bi ser Cejna Newrozê re ne bûrîbû. Ew demekbû min Riza yê xwe ne dîtibû û min pir bîriya wî kiribû. Mergê dayîktiyê ye, wekî gurê hare. Çare jê nabe. Rizayê min, bi birek hevalê boş ve derket û hat gund. Min carek din jî berxikê xwe dîtibû û şadîtiya min geliyê Şax dagirtibû. Hejîr, mehûj,

helîl, hinarên şaxan hema çi bi dest min keti be, min danî ber wî û hevalên wî. Pistoka şapikê ezîzê min kêmekî xwerabî. Cilên wî yên kevin li mal zehfbûn û min kir û nekir kesî ji wan serê xwe ne şuşt û cilên xwe ne guhertin. Ax.. dayîka te nemîne şervanê min. Êvarî, bi rê ketinê re min ew himbêz kir û qet berdana min ne dihat. Janek bê eman mergê min diguvaştin û hîsê carek din nabînim hinavê min dagirkiribûn. Xwe bi zorê ji nav çengên min kişand û çû.”

Edlê vesekînî. Çavên xwe yên ji girî wekî du pêloxan sohrbûyîn paqijkirin, fitlek din jî li xavika xwe da û li hevjînê xwe yê peritî nêrî. Rûyê yê qermiçî di nav riha yêk hefteyî de piçûktir dixwiya, pişta xwe dabû civatê û digiriya Sofî Reşît. Girî, li wî zelamê rû nizar ne hatibû û hêstirên wî wekî xendekan merg dihingavtin. Wekî Edlê jî ji giriyê hevjînê xwe yê kuldar re care ewil bûbe şahid, bi dengek ji xwe bawer got;

“Ne girî Sofî! Ew rûyê me yê spîne. Bila mirov rojekî bi serefrazî jiyan bibe, ne sed salan bi sernivzî” û awrên xwe pesartin pêşmergeyên li nav qaçên beramber diqijvijin û êdî ne digiriya Edlê.

Dayîka merg birîndar, awrên xwe yên bi pêşmergeyên keyfa pezên dizîn dertêxin ve qerisî mayîn zivirandin û bi hêlwestek şerefdar vegotina serpêhatiya xwe domand;

“Çûbîn ser Silopya! Dijmin ketibû di navbera taxima serdarê min û hevalan de û di nav bajar de asê mabûn. Roja paştir heya nîvro şer kiribûn û delalê min di minara mizgevtê de şehît êxistibûn. Hevala şehadeta wî ayankir û me konê sersaxiya Şehîdê xwe veda.

Roj destpêkê ya sersaxiyêbû û roja sohr nu gihatibû cihê danûpeza. Silameta min ya bûka salê bi kurê xwe yê çilikdar ve hatibû sersaxiya birayê xwe. Dîsa Ehmedê min yê zavayê salê û hevjîna xwe ya avis di mal de pêşwaziya serdanvanan dikirin. Ez li ser tenûrêbûm û Sofî jî derketibû ber tavikê. Dengê balefirên turkan hatin. Jixwe em fêrî wî dengî bibûn û her roj çiyayê Cûdî bomba dikirin. Her kû çû dengê wan nêzîktir bibû û qazan berdan ser mala me! Oooyyyy...dilê dayika we bişewite! Qey ev jî ya hatibûya serê me û ez bezîm.


Toz û dûmanê dola Şax dagirtibû. Dar û ber, wekî taviya teyrokê di jor de dihatin xar. Xaniyê me di nav tozê de mabû û ne dixwiya. Piştî kêmekî min dît, xanî bi erdê ve bûye yêk û kuçên binyatê beyîne dola xarê. Min bi destê xwe zarokên xwe ji kavlê xanî anîn der. Û hê jî ez saxim û hê jî jiyan dibim. Kula li ser kulan jî ya van xayînaye.”

Êdî girî rê neda Yadê Edlê baxive. Hêstir bibûn lehî û dihatin xar. Dibêjîqey çavên wê bibûne avzêma robarê Nêrdoş û difûra. Êdî qet deng jê ne dihat û tenê hêstir dibarandin. Sofî jî giriyê xwe ne şemirandibû û hê jî pişta wî li civatêbû. Ji nişkan ve avzêma di çavên

Yadê Edlê de dayî der çika û şopa hêstiran hê jî diyarbûn. Dibêjîqey dilopên hêstiran li ser dêmê gewr dîl mabûn êdî.

Birek zarokên li pey talan ketîn û nû dizivirîn, li ser rê milê hev girtibûn û ji kul û xemên Yadê Edlê bê agah durişma;

"Ey xwedê tu me nekî bizin, deqene PDK me ne dizin" tavêtin û jidil dikenîn. Gotin û kenê wan zarokan, hewa giran ya ketî derê mala Sofî Reşît kêmek jî be siviktir kiribû.




*“Xela hezar û nehsed û not û pêncê li wargeha Etrûş berdewame. DY, îro sê rojin ne hatî. Îro hevala Heznê çûbî berûyan. Kîsek tijî anîbû. Zilam ji ber p.d.k’ê newêrin derkevin ji derveyî qampê. Eslinde zêde qural û qanûnên wan xayînan nînin. Lê hê, yanî heya niha tu jin şehît ne êxistine. Gel dibêje, ‘belkî jinan ne kujin’. Ger jinên girtîn dijûn, ne başî û şelandin anîne serê wan bes, heta niha kuştina wan ne kirine. Ji ber wê jî yên bêhtîrî xwe di wargehê de tevdigerêne jinin.*

*Îşev hevalê min Merwan biryarek stand û çû gundan. Emê zû çûbûna lê, perê me tinebûn. Doh qurûma milîsan, sed dînar dabûn wî û sed jî dabûn Egîd. Her dused birin û ji bû bikaribe sê, çar kl. ar bîne. Min ne dixwest here, li cem mine. Tiştek were serî ez nikarim hesab bidim wijdana xwe. Ji ber kû hevalê qedera mine.*

*Silavên şoreşgerî / 17.11.1995*

*Hewar / Etrûş.”*


Belê îro dîsa D.Y. hatin Berê jî me got
bî xêr hatina wa de. Behsa anîn evbû
hûnê werin seytera milê Hevxebatkarên
bi efendiyê xwe re Nasnamê we birênin
û li ser we bi gerin Kî bi xwazin bigrin
Hingê tevayî teslîmkariyê bi pejirînin
Qomîta Gel. ev behs gihandin Birastî
jî gel Reaqsîyoni pir hişk daxwiyandin
Lê mixabin ev zarok pîrek. yêxtiyar
bune bela jî 20.9.1995. îro 19.11.1995
û virde ev gel Giştî birçiye Qîr qîra
zaroka. Dilê mirov rojê sed caran di şew
tinin Ez û Hevalê xwe îşev bi Qazidê
Hevalare çûbîna W........ Lê mixa-
bin kemîn hebû em zivirîn


Slavên şoreşgerî
Etûrş-Hewar
18.11.1995

*"Belê îro dîsa DY hatin. Berê jî me gotibî, xêr di hatina wan de nîne. Behsa anîn evbû; "hûnê werin seytera milê, hevxebatkarên bi efendiyên xwe re li nasnameyên we binêrin û li ser we bigerên." Kî bixwazin bigrin û hingê bi tevayî teslîmkariyê bipejirînin.*

*Qomîta gel ev behs gihandin. Birastî jî gel reyaqsiyonek pir hişk daxwiyandin. Lê mixabin ev zarok, pîrek, yêxtiyar bûne bela. Ji 20 .09. 1995'ê û îro 19.11.1995 û vir ev gel giştî birçiye. Qîre qîra zarokan, dilê mirov rojê sed caran dişewitîne.*

*Ez û hevalê xweyê îşev bi qazidê hevala re çûbîna w........ Lê, mixabin kemîn hebû û em zivirîn.*

*Slavên şoreşgerî*
*Etûrş / Hewar*
*18.11.1995"*



*“Îro jî DY hatin. Me dûh gotibû, yê siba werin bersîva me bibin. Îro hatin, li gor min fêhmkirî bersîva me, pejirandina mercên wan bî. Min dûh jî gotibû, em mecbûrin mercên wan bipejirînin. Sedem jî eve; zêdetir çûyîna ser gel zerere. DY di bin navê mirovahiyê de li gor siyeseta Tirkan û Emerîka dimeşe.*


*Wekî tê zanîn ev hefteyeke heyhetek ya Emerîka û yêk jî ya Tirka li Selahedînê ne. Ka di derheqê me de ewê çi bêjin, çi biryarê bigrin ev karmendên DY jî yê li wê gorê nêzîk bibin.*

*Em vê sazgehê baş nas dikin. Lêbelê, pêwîste mirov mercên xwe û dijminê xwe baş nas bike, li wê gorê bimeşê û gavê bavêje.*

*Îro ji sibehî ve min tiştek ne xwaribî. Bi libên berûyan me rêve dibir. Hevala Heznê li ser pêşniyara min, şîvê mirtûxa berûyan çêkir. Min jî du, sê kevçik xwarin. Ji hingê ve ez gêjbûme û zehf tîşême.*

*Di bernameya panel de Serok Apo li ser rewşa hilbijartina Tirka taxivî. Belkî ji min re bibe derman.*

*19.11.1995”*



*Îşev me nîsk xwar! Ev sê roj bî zarok, mezin tu kesî tiştek ne xwaribî. Belê îro hevala Heznê êrîşî qerekterê xwe kir û çû gund. Hin tişt û miştên rojane anîn û nîskek çêkir. Di malê de her kesî eyd çêkir. Penaberiye û pere qet tinînin. 200 dînar peyda kiribûn, ew jî dabûn. Keys û fesale, gundî tiştan pir giran didin. Lê dîsa jî heçî cesaret bike, biçe û bîne pir keyfxweş dibe. Kêloya ar 6, 7 dînaraye lê, li vêdê difirûşin 35, 40 dînaran. Bes dîsa jî peydakirin pir zore.*

*Ez ji biçîbûyînê natirsim, ji mirinê jî lê, qîre qîra van zarokan min qehr dike. Derengê şevêye, qîra giriyê zaroka cîrana me na hêle ez razêm. Merwan jî ne hatiye. Nizanim li kûdê maye. Ez û fanos, tênûs, pênûs û bi qîra zarokên birçî bi serê xwe mane.*

*Şeva wargehê zêde bê deng namîne. Ji ber kû nobedar her tim digerin. Lê îşev, bê dengiya şevê bes ev zarok xira dike.*

*20.11.1995 /Etrûş"*

Şeva tarî, sarbû. Baran, wekî lûlka misîn dihat xar. Dilopên barana bê navber dibare, pişta çadira kelekî dihingavt û hemî dengên derdor didewisadin. Ronahiya birûskan xwe li paşiya çadirê dida û ji nişkan ve wunda dibû. Dengê birûskên ezmanan û dengê guleyên ji aliyê gundê Kanika ve dihatin tevlîhev dibûn û dengên dilopên barana li banê çadira peritî diketin dadibelandin. Ji hasreta qazyaxê sopeyên Eledîn zincar girtibûn. Guriya di fanosa piçûk de reqsa Torikî dikir. Zarokê Durê ya Aqîrî bê navber digirî. Paçê çadirê deng ne radigirt û wekî heyî dikişand hundir. Dayîka zarokê birçî demekî dilorand û bi pişt re wê jî di girî de nemerdîtî ne dikir û îske îskên wan tevlîhev dibûn. Derengê şevêbû û Merwan ji êvarî ve wunda bibû. Dibêjîqey erd kelişî û di tê de çûbû xar. Tu kesî ne dîtibû. Ji berya kêmekî li hindama gundê Kanika dengê şînikek gule hat û di cêh de qut bibû. Ne Gabar dikarî binivîse û ne jî binive.

Ew qasekbû dengê çekan sekinîbû lê, dîsa jî nav bi nav guleyek xetat bi ser wargehê re dirija û di nav qaçên berwarê beramber de ditefa. Û Merwan ket di hundir de!

Deziya zuwa lê nemabû. Kefiya Sêrtikî ya rîşî dirêj, di stoyan de ziravtir dixwiya. Dilopên ji bin guliya genimî diherikîn, di ser dêmê gewr û girover de dirijan. Av ji qubûrên jerjûrên êlêk ji taviya dijwar ne parastîn, dibû şirik û di delingên şalê Gabardîn de diherîkî. Lê, qermîçokên şalê wî hê jî tekûztiya xwe diparastin. Xwidê dizane ketibû û barana dijwar jî têra paqijkirina herîsohrka bi qilêşa wî ve ne kiribû. Her du ciwanan li hev dinêrîn û xendetiyek tinazdar ji çavên şil yên Merwan diherîkî ser hevalî wî. Gabar, bi dengek ji darizandinê maliştî ema, di nav pêlên gazindên sivik de melevanî dike got;

"Cilê xwe deyne, tuyê nexweş bikevî."

Dibêjîqey wî dengê himbêzker ciwanê rextê xwe yê av jê diherike bi stûna devê derî ve dadileqand rihetir kiribû.

"Niha sopeyek ya daran hebiya û tijî darberûyên girê Mêhrav bûya, şûr simbêlên min ne dibirîn."

"Simbêl! Deqene tu dikara simbêlan neke."

"Tuyê bibînî, heke ez ji vê xelayê bifelitim; qurmên simbêlin qeytaniyê bikevin ser min."

Wekî Gabar nû şûrê xwe yê rexneyan kişandi be, ema bi dêmek beşaş pirsa mereqa wê dikir ji devê wî rija;

Tu çûbî kûdê, wisa ji nişkan ve bê xeber wunda dibî?"

Wekî ji mereqa hevalê xwe bê hay, bersivek pehnikî

da Merwan;

"Em li gundê Kanika ketin kemîna paşmergeyan! Kuro hemî hevalên hevin; yên tiştan difiroşin, yên kemînê datînin hemî heman kesin. Çend kes tiştan difiroşin, hevalên xwe jî dişînin li ser rê û kemînê tavêjin. Dubare heman tiştan difiroşin hin rebenên din. Ev sala xwidêye wisa dikin."

Dibêjîqey çavên hûr yên Gabar, ji mereqa ew mijûl dikirin ne hatibûn valekirin.

"Guran, kozika berxikan li derê kuna xwe peydakirine, qey wî keysî direvînin" got û ya mereqa wî dikir lêkir;

"Vêca hûn çawa felitîn?"

Dibêjîqey ji zû ve bersiva vê pirsê hazirkiribû Merwan. Beşişî û bi bişişandinê re rêze dinên wî yên hûr di bin şevaqa zerhimî de biriqîn.

"Siviktiya lingên me ji xapên wan jêhatîtir derketin."

Gabar, mereqa xwe derbazkiribû û wekî ne xwaze zêdetir hevalê xwe yê westayî bi vê rojeva lewitî mijûl bike, berê sohbetê guhert.

"Paşmerge? Bi rastî jî wateya navê 'Pêşmerge' çiye?"

"Ya nayê zanîn çiye, ji hevgirtina 'merg' û 'pêş' pêktê."

"Erê, min 'pêş' fêhmkir 'merg' çiye?"

"Tu bi qedrê xwidêkî neke Gabar, 'merg, merge'!"

"Ankû 'merg' bi Turkî tê çi wateyê?"

"Aha dîsa me dest bi Kurdiya Stembolî kir. Qey şerte, her bêjeya Kurdî bi bêjeyak ya Turkî re were beramber kirin?"

"Na ya, pêşmergeyan bêhna te teng kirine, tu dixwazî kîna xwe bi serê min re derxînî."

"Na bixwidê ne wisaye. Ema hûn evên dixwazin zimanê me bêxin turkmençe min aciz dikin."

"Deka te ne got 'merg' çiye?"

"Merg" ji bû xatirê te bi zimanê turkî 'yûrek'e"

û dibêjîqey pirsa Gabar rê ji kewandinên birînên wî re vekiribû. Xetên rûyê wî yên şil mucid bûn û gotinên xwe ajotin Merwan.

“Di aliyê wateyî de ‘pêşmerge’ navek pir xweş û watedare. Ema, van camêran bi kirinên xwe ev navê şîrîn jî lewitandin. Bêjeya ‘pêşmerge’ tenê nayê wateya mirovên çekdar. Pêşiyên me, pir wate li vê bêjeyê barkirine. Ji mirovên fedekar, wêrek, bi namûs, bi wijdan û di heman demê de kesê neheqiyê napejirîne, li hember êrîşên dagirkeran mergê xwe têxe çeper re tê gotin. Ankû di jiyanê de pêşmergeya herî dilsoz dayike. Vêca ev camêrên niha kurtanê nûkertiya turkan hildigrin, ne pêşmerge, di rastiyê de paşmergene.”

“Sipas heval, te xweş got.Te dirav ji kû anîn?”

“Min ji hevalê Rehmî girtin.”

“Tu dizanî wê rojê Hevalê Rehmî ji min re çi got?”

“Çi?”

“Min jêre got; hin dirav bide me, dibekû em ji xwe re hin xwarin peyda bikin.”

“Got; “çima hûn xwarinê dikirin? Hûn jî wekî min bikin.”

“Min got; “qey tu çi dikî?”

“Got; “ez naxwim!”

Di vê navberê de cilê xwe guhertibûn û şûtika zerbelek wekî her tim bitosintî girê dida Merwan. Ji guliya daketî ser eniya fireh hê jî dilop dirijan. Dilopên diherikîn nav simbêlên zirav û tenik di bin ronahiya fanosê de diteyisîn. Şûtika naylona şil, dibêjîqey newqa wî ya zirav ziravtir kiribû. Jixwe edet wisabû; her kû zik vale dima şûtik bêhtir dihat şidandin. Hê jî bigotina Rehmiyê Pîr dikenîn her du ciwan. Lê dibêjîqey, dengê giriyê zaroka cîran kenê wan di paş de tehf dida.

Gabar;

“Şûtikê girê nede, heta sibehî ya zuwa bibe.”

Merwan;

“Bê şûtik sebra min nayê.”

“Bîra te tê, dema em li Gabar bûn te digot; “bê rext sebra min nayê?”

“Çiye vêca, tu dixwazî ez bi rext ve binivim?”

“Na! Dixwazim tu şûtika xwe ya şil girê nedî.”

Du betaniyên hevala Heznê bi niyeta doşekê bi hev ve dirûtîn ber cihê Gabar re danî, balgihê di şûna hiriyê de tijî paç û maçên zarokan danî ber serê dilxwede doşekê û fanosa bi singa çadirê ve reqsa goyikî dike vemirand û xwe dirêj kir Merwan.

Dilopên barênê yên bi ahenga melodiyek fon li pişta çadirê diketin bi dengê birûskan dihatin birîn û dubare destpê dikirin. Heke dengê giriyê zarokên birçî û guleyên nûkeran tevlî wî dengê xweş ne bibûya, ew xewa bi wezbet bûya.

Dibêjîqey haya Gabar ji westandina Merwan tinebû û dixwesta kêmek din jî sohbetê dirêj bike. Ema, ji zûve dema xewa Merwan bûrîbû û jixwe wekî serê xwe datanî nivistîbû. Lê, ya dixwiya hevalê wî yê betal ne dihişt ew jî razê. Gabar, bi dengek nerm û ji wirarên xewê şuştin got;

“ Dibêjin, yê siba werin mala bikişînin.”

“Tu dibêjî, di cîvîna Silhedîn de biryar girtine” got û bi acizî gotinên xwe ajotin;

“Jixwe polîtîkaya van zaliman tê zanîn, yên me jî ji wan re zemînê çidikin. Te mesela dema hatîn qampa Hungo dikişandin bihîstiye?”

“Zêde ne baş. Bi rastî jî ew çi meselebî?”

Merwan ji nav cilan rabû. Çarmêrkî veda, betaniya ji şilatiya laşê wî hêwî bûyî avêt ser navmilên xwe û vegot;

“Di peymana yên me û wan de, diviyabû êdî paşmergeyan ti ziyana me ne kiribûna. Tam dema qampa Hungo bar dikir Bawerê Hevlerî tê û ji Şahîn re dibêje; “pezê min dizîn!”

Şahîn, Mahir û Cindiyê Şirîşeyî dibin yêk û dibêjin; “emê karmendên DY desteser bikin.”

Erê, na! Li tenişta rê civînê çêdikin. Biryar digrin kû vê meseleya girtina rayedarên UNHCR, bêxin dengdanê û ji çaran, sê biryar tê betal kirin. Dîsa mane UNHCR biryar girtibû, di nav qampê de ser hêjmarê bikin û wisa barkirin destpê bike. Dîsa gel hêjmara xwe têxe du qet û ew jî pê dihesêne.”

“Mane yên me lêgerîn ne dipejirandin. Ema bawerim niha ew jî pejirandine?”

“Belê! Jixwe ev saziya bi navê mafê mirov tevdigerê û ti eleqeya wê bi mirovtiyê re nîne, li hêncetan digerê. Maşalleh em jî cihê hêncetên wan xweş dikin.”

"Te pirtûka min ne dîtiye?"

"Kûjan?"

"Gilgamêş."

"Min jixwe ne dîtiye lê, ez jî wî navî jî nefret dikim."

"Çima?"

"Evên niha vê nûkertiyê dikin hemî şopvanên wî zilamîne."

"Qey Gilgamêş Kurde?"


"Gilgamêş Kurde lê, evê he ne kurdin, cihûne!"

"Cihû!"

"Belê, Cihû! Ezê çîroka xiyaneta Gilgamêş, dîl girtina Namtara, kedî kirina Enkîdo û Cîhûtiya yên van paşmergeyan kiş dikin me ji te re vebêjim. Lê, Mele Heyder bang da û ez pir westiyîme. Em kêmekî binivin başe."

Merwan, xwe li betaniya ya tenik pêça û di cêh de bi xew ve çû. Merwan nivist û Gabar li dêmê wî dinêrî. Şewqa berqa birûskan çadira kincik kun dikir û li dêmê Merwan yê ji bê xwarinî lewaz bûyî dida. Xew lê giran bibû û xwidê dizane xewna sopeya daran didît.

Li quncikê jorê mezala mêhvanan yê xaniyê du olî nivistîbû Merwan. Dayîka wî milek darê darberûyên qeyda sopê hatîn birîn anîn û avêtin di sopeya nû vexwimayî de. Ji nişkan ve agir bi daran ket û humên ket sopa bejna mirovekî derbaz dike. Kurê wê yê xweşik, pehînek li nivîna hirî da û ji ser xwe avêt. Dayika li devê derî sekinî û ni eşqek kûr li dêmê lawê xwe dinêre zivirî û meylda binixmîne. Carekî, di aliyê binixwîmîne an na de bê biryar ma û waz li nixwimandina wî anî. Xwe tewand maçek li eniya kurê xwe yê spehî da û ji mezelê derket.



*“Belê, di tevayê penabertiya xwe de me vir û derewên vê saziya emperyalîzman, paşverûyan û dilxwede DY dît, got û nivîsand. Îro siet heftê, nêzîkî 50 erebeyan anîn. Lê, şertên wan hebûn; pêwîste PDK bikaribe di nav tiştên gel de li çekan bigere. Xem nake, me ew jî pejirand. Nêzîkî 150 malan birin. Bi rêve li nav tiştan gerabûn û tiştek nedîtibûn. Jixwe rêvebertiyê tevayê Ç*[38]*... wargehê kom kiribîn û me şevê din hilanîbûn. Ez pir westam. Piştre emê bi peya derbazî wargeha Ş. Azad bikin.*

*Lê, min gotibî; hevala Heznê êrîşî qerekterê xwe kiribî û çûbî gundan. Hin tişt anîbîn. Yadê Qumrî jî çûbî. Îro zêde tengahiya xwarinê tinebî. Derdorê min dîtîn giş keyfxweşbûn.*

*Îşev Hevalê Merwan jî li vêdêye. Belê, ez dereng hatim û ew razaye. Şevê din çûbîn ketibîn k.....*[39] *hevxebatkaran û zivirîbîn.*

*Silavên şoreşgerî*
*21. 11. 199*
*Etrûş / Hewar”*
*****

38 Çek.

39 Kemîn.

Ji dema DY xwe ji Şehît Eşref vekişandî û pê ve, hemabêje her çend rojan carekî du, sê tirimpêlên wan dihatin û li serê fitlûpêçkên beramber wargehê demekî di rawestan û diçûn. Li jorê wan jî wekû ewlekarî pêşmerge disekinîn. Her kû dihatin bala gel dikişandin û dibûn sedemê şîroveyên cor bicor.

Endamê komîteya karê jiderve yê Şehît Eşref **Eliyê Heso yê Ziravikî** vedibêje:

"Piştî êrîşên PDK'ê û me karmendên Dewletên Yêkbûyî desteserkirin û piştî demekî berdan, êdî têkiliyên koçberên Şehît Eşref û UNHCR ji hev qut bibûn. Di vê navberê de carnan her roj, carnan jî çend rojan carekî dihatin û li beramberê wargehê demekî disekinîn û diçûn. Evê hatina wan, di serê me de nîşanên pirsê di afirandin. Me destpêkê ev tevgera wan erênî şîrove kiribû. Em dihizirîn kû em mihacirên siyasî ne, heke qirkirinek mezin di ser wargehê de were dibe kû ji semaxa vê saziyê re bibe qitme û ji bû êrîşek mezin çênebe wekû nobedar têne. Bi pişt re me dît kû li ber çavên wan, me dikujin, heywanên me talan dikin û ew tenê temaşe dikin. Piştî wê em gihatin wê baweriyê, sedemê hatina wan şerê teybete. Armanca wan, ji koçberan revandina malbatanbû. Ew difikirîn kû malbat ji qetilkirinê ditirsên û ne wêrin teslîmê PDK'ê bibin. Heke ew li ber çavên wan bin, yên bawerî bînin û ji wargehê birevin. Jixwe piştî demek dirêj derbazbû û kesî xwe teslîmê wan nekir, bi rêya komîteya Şehît Azad ji me re xeber şandin û doza hevdîtinê kirin. Ewan ji komîteya Şehît Azad re daxwaza hevdîtina me kiribû û komîteyê birêya qazidekî şev ji dizî ve xeber gihand me.

Beyaniya şeva xeber gihatî me dîsa hatin û li cihê xwe yê kevin sekinîn. Dîsa pêşmerge di ewlekariya wan de bûn û bi nîşana destan em vexwendin cem xwe. Ez, Mustefayê Cizîrî, Şahîn û Cindiyê Şîrîşeyî çûn cem wan. Şandeya DY ji rêvebirê giştî yê Qampan Abdurehman Îsa, Ziyadê Soran û ji çend kesên din yê Başûrî pêkdihat. Rêvebir ji me re got;

"Ji aliyê Komîsertiya Bilinda Cenewre ya Mihacirên Netewên Yêkbûyî ve wekû fermî qampa A[40] hatiye girtin. Yan divê hûn werin Qampa B[41] yan jî em neçarin statûya we ya siyasî bêxin."

Me ne pejirand û me xwest wekî heyî arîkarî bi me re bikin. Wan jî daxwaza me qebûl nekirin û çûn.

Bi caran hatin heman cihî û gotûbêja me ajot. Dawî Rêxistina Partiya me, di aliyê pejirandina çûyîna qampa Şehît Azad de nêrîn kifşkir û me jî pejirand. Lê yêk ji şertên me, serhêjmarê di nav qampê de bikin û ji pejirandina me ya çûyîna qampa B û pêve PDK, ti ziyanê

40
Şehit Eşref.
41
Şehît Azad.


ne de me. Ewan jî şertên me pejirandin.

Piştî yazdeh û dazdehê mehê semta Şehît Bêrîtan kişandin, sibeha sêzdehê mehê dîsa hatin, li cihê xwe yê kevin sekinîn û bi îşareta destan em xwestin cem xwe.

Em çûn û me got: "xêre dîsa?"

Gotin; "yêk; dema em di nav qampê de serhêjmarê dikin hûn xwe zêde dinivîsin. Divê ji derveyî qampê malbat, bimalbat serhêjmar were kirin û wisa li tirimpêlan siwar bibin. Du; PDK dixwaze li serê milê li ser gel lêgerînê bike."

Me daxwazên wan red kirin û piştî ew çûn deh deqîqeyan, li tenişta qampê Ehmedê Hevlerî hatibû qetilkirin û çend kulekên mayîn jî hatibûn talankirin."



*“Min her roj rojana xwe şev wextê xewê dinivîsî. Belê îro wargeh bardike û dora barkirinê hatiye me. Lê, ber êvare û bawerke em îşev jî li virin.*

*Malên ji berya niha barkirîn, dar, pejînk û pir tişt li pey xwe hiştine. Malên îro bar dikin ew tiştên mayîn jî li xwe kom dikin û barkirin pir giran tajo.*


*Aslinde hemabêje darê her malbatê ji wan zêdene. Lê, ev gel tê naskirin. Ji aliyê dagirkeran ve tim birçî hatiye hiştin. Çav birçî kiriye. Jixwe Kurd mihacir bibe qet têr naxwe. Ev hêlwesta dimohr limin pir biyanî tê. Dil dixwest ne wisabiya. Te gundê xwe yê keda hezar salî hişt, te bê hed û hesab malê xwe hişt ev çi kulbe?*

*Ji dilê min tê bêjim bese! Lê ev gelê gelemperî hezar sale û bi teybet jî ev sê mehe birçî, dilê te naçe tu bêjî.*

*Silavên şoreşgerî*

*22.11.1995*

*Hewar/ Etrûş"*


Evet dün günlüklerimde belirttiğim gibi
[illegible] [illegible] [illegible] B.M. lerin aracı-
lığıyla Şehit Eşref kampını kapatıp
Ş. Azad kampına geldik. Bilindiği gibi
26. 8. 1995 ten 23. 11. 1995 e kadar
[illegible]. [illegible] ahlaksızca PDK işbir-
likçilerine TC kontrasına ve B.M. lerin
insanlık dışı siyasi yaklaşımlarına karşı
çıplak yüreğimizle 1 günlük çocuktan
100 yaşındaki yaşlıya kadar herkes
direndi ve kazandık.
23. 11. 1995 te yani dün buraya geldik ya-
[illegible] bu gün herkes çadırını kurmakla
meşgul. Buradaki halkta bütün yüreğiy-
le yardıma yemeğe herşeye bütün
varlığıyla yardım ediyor. Dayanışma
Eşitlik sosyalizm ne kadar güzel
[illegible] PDK bakımından daha [illegible]
Burada işbirlikçiler kamp etrafında
her yüz-iki yüz metrede bir karakol
kurmuşlar ama kampa yaklaşamı-
yorlar.
[illegible] [illegible]
24. 11. 1995 Etrûş - [illegible]

*"Belê, wekî min di rojana xwe ya dûh de jî kifş kirî, piştî pêşbaziyek dirêj bi rêya DY me Qampa Şehîd Eşref valekir û em hatin Şehît Azad. Wekî tê zanîn ji 26. 08. 1995 heya 23. 11. 1995 ji zarokê yêk salî heta bi kalê sed salî li hember boseya birçîbûyîna nûkerên PDK'ê, quntrayên Turkan û nêzîkatiyên ji derveyî mirovtiyê û siyasî yên Dewletên Yêkbûyî bi mergê xwe yê tazî me li berxweda û em bi serketin!.*

*23. 11. 1995, yanî dûh em hatin vêdê û bicêhbûn. Îro her kes bi vedana çadira xwe ve mijûle. Gelê li vêdê jî bi tevayê merg û hebûna xwe arîkariya xwarin û her tiştî dike. Piştgirî, wekhevî û sosyalîzm çiqas xweşe.*

*Li wêdê ji aliyê PDK'ê ve em azadtirbûn. Li vêdê nûkeran her sed, du sed mitreyan li dora qampê qereqolek ava kirine. Ema nikarin nêzîkî qampê bibin.*

*24. 11. 1995*

*Etrûş / Hewar."*

**Eyaleta Şehît Jiyan**

Piştî her du wargeh bûn yêk saziya dilxwede mişhetyar Dewletên Yêkbûyî-UNHCR ambargoya xwe sistir kiribû lê, ya PDK bi hemî dijwartiya xwe tajot. Wargeh dorpêç kiribûnn û hijdeh baregih li dora wê danîbûn. Armanca hemî hêzan, rêvanên azadiyê kedî bikin û ji Tevgera Azadiya Kurdistanê -PKK- qut bikin. Lê ya dixwiya û di ezmûnên derbazbûyî de jî kifşbûyî, hewla wan beyhûdebû. Sebebê mal wêranî û xirabûna koçberan PKK bû û ligor dihat dîtin ne gengazbû dest ji hev berdin.

Bi ser barkirina Şehît Eşref re nû sê roj derbaz bibûn. Şahiya hijdehemîn ya salvegera damezrandina PKK'ê hatibû lidarxistin û coşa gel hêjayî dîtinêbû. Ew rêvanên erdhejek mezin jiyan bûyîn, bi dehan kuştî, bi sedan kal, zarokên wan ji nêza mirîn, bi sedan girtiyên bê serûşûn dayîn, ji aliyê desthilatdarên cîhanê û nêkerên xwecih ve dor li wan hatî girtin û di pehnava Etrûş de hatîn asê kirin; tiştek ji coş, kelecan û girêdana xwe ya bi Tevgera xwe re wunda ne kiribûn. Berde sist bibin, an jî hîviya xwe jidest bidin, dibêjîqey kelecana welatek azad ya bi sed salaye bîriya wê kirîn niha jiyan dibûn û ew serkeftin pîroz dikirin. Belkî jî dibin gulebarandina pêşmergeyên çetetiyê ji dewleta Turk re dikin, qêrîna azadiyê li wan biwatetir hatibû. Ligor derfetên xwe bernameyek herî dewlemend ya pîrozbahiyê amade kiribûn. Xwendevan bi meşa leşkerî hatibûn qada pîrozbahiyê û ji kevaniyan bigre heta bi nexweşan, hembêje her endamê wargehê tevlî şahiyê bibû. Ji dazdehê rojê heta bi tarîtya şevê Şahiyê dewam kiribû. Jixwe govenda êvarî hatî gerandin biwezbetbû.

Bi qewlê Merwan, paşmergeyên partiya mala Berzanî yên bi hîvîbûn rêvanan derbeyên giran xwarine, êdî nikarin pişta xwe rast bikin û di demek kurt yê ji hev belav bibin; coşa gel ne ragirtibûn û ji destpêkirina şahiyê heta bi dawîbûna wê wargeh gulebaran kiribûn. Pîrozbahîvanên Cejna Jidayîkbûnê, dengê guleyan jî tevlî coşa xwe kiribûn û durişmên xwe yên azadiyê li ber dengê guleyan bilindtir qêrîbûn. Xwidê dizane, li hember wê coş û berxwedanê DY, PDK û Endamên JÎTEM'ê yên cilên pêşmergeyan li xwe kirîn û bi endîşeyek mezin di dora wargehê re dizivirîn şaqis mabûn.

PDK û hevkarên xwe zêde keyfa dorpêçkirina wargehê jiyan ne bibûn. Ji ber kû ti baregihan, ti dorpêçan berxwedanvantiya gel ne şkandibû û ne kerixandibûn. Gel, li ser rêya derketina qampê û li himberê derbenda PDK'ê, derbenda xwe bicêh kiribû. Dîsa li der dora wargehê xendek kolabûn, çeperên hêşedaran avakiribûn û dest bi seferbertiya xwe ji nû avakirinê kiribû. PDK, li hember wê vîna ji pola har û dîn bibû û hemî sînorên mirovî derbazkiribûn. Di êrîşên xwe yên di ser koçberan de ti carî sînor nas ne kiribûn

ema, êdî li rêyên heta hingê ne ceribandî digera. Tam di wê demê de, du kesên cilên pêşmergeyan li xwe kirîn û gelê wargehê ew wekû endamên MÎT'a Turkan şîrovekirîn hevldan jehrê bavêjin di embara ava wargehê de. Li ser pêhesîna nobederan, kesên jehrkar kîsên xwe yên jehrê li cem ambaravê hiştibûn û revîbûn. Piştî ji aliyê tibî ve ew jehr hat tehlîl kirin, derket holê kû heke ew jehr tevlî ava wargehê hatibûya kirin, dikarî hemî gelê wargehê bikuje. Lê ya xerîb, ew bûyer demjimarekî jî di nav gelê wargehê de ne bibû rojev û qet jî wekî bûyerek girîng ne hatibû dîtin. Jixwe piraniya gelê wargehê jî ne bihîstibû.

Li gel hemî dorpêç, gulebarandin û hewldanên hêzên neyar, li wargehê hêdî hêdî rewşek asayî pêkdihat û dibêjîqey seferbertiyek ne ayankirî ya ji nû ve xwe ava kirinê hatibû destpêkirin. Rêvebertiya wargehê civîn li ser cîvînan lidartêxistin, komîte û rêvebirên semtan bê rawestandin saziyên xwe ava dikirin. Rêvebertiya dibistanan, ji bû avakirina dibistanên nû û kifşkirina mamostayên nû di nav xebat û lêkolînên bê mehwer de bû. Ji bû xwe ji nû ve tekûz bike û endamên jin jî tevlî saziya xwe bikin hêza xweparastinê, wekî pêşewitiyan tevdigera. Jixwe hemabêje asayîşê xwe rêkxistinkirin berbi dawî ve anîbû. Û di dema nûçeyên Med TV de, kolikên televîzyonan hêjayî dîtinêbûn.

Demsala Zivistanêbû. Cihê wargehê avgirbû û wekû coxrafîk Etrûş têr barînbû. Her tim baran dibarî, çadirên koçberan havînînî û qetayîbûn. Têhn, ji sopeyên eledîn yên biqasî fanosek mezinin ne diçûn. Çadirên koçberan di nav golên avê de sûbayî dikirin û di mercên asayî de mirov nikarî danek yê rojê jî di wan şertan de jiyan bibe. Ema ew zehmetî di nav koçberan de ne dibûn pirsgirêk û dikara wan jî ne dihat kirin. Ligor koçberan, pêwîste di ti mercan de navber ne keve perwerdeya dibistanan. Çadirek mezin ya dibistana Şehît Eşref hebû, ema mabû wêdê. Tenê dibistanek çadir ya Şehît Azad hebû û mêze kursiyên wê jî saziyek xwêrxwaz anîbûn. Dibistanek çadir ya semta Şehît Îsmaîl jî hebû lê, mêze û kursiyên wê tinebûn û gel bi bilokên axê cihê rûniştana zarokan çêkirbûn. Çadira mijara gotinê wekî seradê kun kun bibû û her roj bagerê ji ser zarokan difirand û tavêt. Bi leza bayê re ji bû gelê Şehît Eşref jî du dibistanên kursiyên wan bilokên axê hatibûn avakirin û jixwe mêze ne dihatin xeyal kirin.

Bi hatina ser hev ya wargehan re, mejlîsa bîst û pêncê Tebaxa wê salê hatî hilbijartin û qet derfetên civînê peyda nekirî, civîna xwe ya yêkemîn kiribû û navê wargeha Şehît Azad wekû 'Eyaleta Şehîd Jiyan' guhertibû.

Eyaleta Şehîd Jiyan; ji heşt semt û sih û du taxan pêkdihat. Çar dibistanên wê yên seretayî hebûn û piştî wargeh bûyîn yêk,

hazirtiyên dibistanek ya navîn jî hatibû destpêkirin. Yêk ya gel, du nexweşxane, du terzîxane, navnedek ya çand û huner, saziya malbatên şehîdan, asayîş, navenda hêzên xwe parastinê, çapemenî, dadgeh û bi dehan sazî û dezgên din di nav sînorên xwe de dihewandin Eyaleta Şehît Jiyan. Jixwe Mejlîsa Demokratîka Gel, saziya sêhwanbû û hemî sazî û dezgahên Eylatê girêdayî wê kar dikirin.

Zivistana reş, ling dabû ser koçberên Eyaleta Şehît Jiyan û lîkek zelal di firnêkên pozên wan de diherikand. Pêşmergeyan, bi qewlê Merwan "paşmerge"yan, dor li Eyalata nû ji dayîkbûyî teng kiribûn û ne dihiştin çûk jê derbikeve. Ema, malbata Raufê Giteyî ji wê zext û dorpêçê muafbû û di nîvê wargehê de jiyanek asayî jiyan dibû. Ew malbata dabaşa gotinê, ji sê, çar malbatên xizmê hev pêkdihat û bi koçberên Zaxo re tevlî jiyana wargehê bibûn. Sedema ji Zaxo hatina wan û tevlîbûyîna wan ya koçbertiyê ne dihat zanîn, an jî herî kêm me nizanî. Ji berya şer û ambargoyê wekî her malbata wargehê wan jî zêde bala kesî ne kişandibûn. Bi destpêkirina şer û êrîşên pêşmergeyan re, ferqa wan derketibû holê. Hêzên PDK'ê bi ti awayî dest ne didan wan malbatên gundiyên gundê Gite. Pezê wan talan ne dikirin, çûyîn û hatina wan asteng ne dikirin û ew malbat ji derveyî qetlîam, kuştin û talanê girtibûn. Dema zarokên wargehan ji nêza dişikestin, mala wan camêran li ber şîr, goşt û xwarinê diçû. Di çavên gelê eyaletê de, ew malbat wekî baregihek ya PDK'ê dihat dîtin. Ew mirovên hergîz tevlî xebatên rêxistinî ya navxweyî nabin, li ser kewna xwe bûn. Ya dilêş û bi ti awayî ji aliyê gel ve ne dihat watedarkirin, ji kordînasyona wargehê Şahîn û berpirsê hêza xweparastinê Arart, ji mala wan camêran ne derdiketin.

Rêber[42] Apo, demjimar dazdehê şeva 11.12.1995'ê bi awayek yêk alî di navbera PKK'ê û PDK'ê de agirbest îlan kiribû. Piştî agirbestê şerê sed û heştê rojan ajotî rawestabû ema, di aliyê dorpêç û êrîşên li ser Eyaletê de bandorek mucid ne kiribû. Dîsa di pazdehê heman mehê de agirbesta yêk alî li hember artêşa Turk jî hatibû ayankirin û vê agirbestê jî asta êrîşên dewleta Turk ya li hember Kurdan kêm ne kiribû.

Li gel hemî zext û êrîşan, Cîhana Eyaletê dizivirî û bi kêfarat jî be jiyanê berdewam dikir. Li dijî her êrîşa pêşmergeyan gelê Eyletê bertekek dijwar nîşan dida û têkoşînê karwanê koçberan şad û hêzdar dikir. Bi ayankirina agirbesta yêk alî re, kesek bi navê Dawut Baxistanî derketibû holê. Ev kesê keçel û perokek dirêj bikartîne, têr berjengebû û wekû temsîlvanê Başûrê Kurdistanê yê DY dihat pênasekirin. Her kû çû, kesê navbûrî êdî bû parçeyek yê Eyaletê.

42 Pêşvanê giştî, stretejîk, siyasî, rapêç yê têgir. Rêber, bêjeyek coxrafîke, cihê "Rêber" nagire.

Di rastiyê de qedrek yê wî jî di nav gelê Eyaletê de hebû. Tam dema rojên herî dijwar ya şer û dorpêçê de Dawût Baxistanî, kamerayek danîbû ser milê xwe û hatibû nav wargeha Şehît Azad. Bi hêlwesta qazidê aştiyê, soza aştî û rakirina ambargoyê dabû koçberan.

Piştî agirbesta yêk alî şandeyên ji der ve, bi teybet ji Parlementoya Kurdistanê ya ji Derveyî Welat dest bi hatina Başûr û Eyaleta Şehît Jiyan kiribûn. Dawut Baxistanî bi wan şandeyan re dihat û bê wî mirovê mifsid, tu kesî nikarî derbazî nav Eyaletê bibe. Êdî ew sexsê li ser her benikî cembaztiyê dike, bibû pira di navbera eyaletê û jiderve de. Ew mirovê enerjîk, rûken û serbest wekî hemwelatiyek yê eyaletê tevdigera. Rojekî li cem Osman Ocalan û Xelîl Atac bû, roja piştî wê li cem Meshûd Berzanî bû û roja din jî bi şandeyekî re li eyaleta Şehîd Jiyan bû.

Di navbera PKK'ê û PDK'ê de hevdîtinan bê navber demandikir. Şertê yêkemîn ya PKK'ê ewlekariya Eyelatê bû û ji hevdîtinan hê encamek berbiçav ne hatibû girtin. Pêşmergeyan hê jî bê navber çadirên eyaletê dihingavtin,  koçber birîndar dikirin û kesên keysê ji wan didîtin direvandin. Gel jî bi çalekiyên rojiyên birçîbûnê, meş û protestoyan bertek nîşan dikirin.

Heta bihara sala nû wê têkoşîna ne hevseng û bê eman, ajotibû. Dibêjîqey her du alî jî fêrî vê hevrikiyê bibûn û êdî dizîna kerekî, birîndarkirina mirovekî zêde bala koçberan ne dikişand. Rojeva hemwelatiyên eyaletê, rêkxistina navxweyîbû û wekû asayî jiyana xwe ya xweser jiyan dibûn. Du yê meha Sibata 1996'ê, cara duyemîn hilbijartina meclîsa Eyaleta Şehît Jiyan hatibû kirin. Dîsa piştî hilbijartinê du rojan, bi şahiyek bi wezbet saziya malbatên Şehîdan hatibû vekirin. Dîsa dazdehê heman mehê PDK bi daxwiyaniyekî diyarkiribû kû agirbest pejirandiye. Piştî daxwiyaniyê û bi hewldana endamên PKDW[43] kêm jî be êrîşên li ser eyaletê hatibûn sistkirin.

### Yêkîtiya Rewşenbîrên Kurdistanê

Her roj li eyaletê saziyek dihat zêdekirin û hin ji wan saziyan bê navend û çadirbûn. Yêk ji wan saziyên temen pîvok û bê navend û tebele jî saziya Yêkîtiya Rewşenbîrên Kurdistanê bû. Bi pesartina endamê nû yê kordînasyona eyaletê Rêdar,  saziya navbûrî hatibû damezrandin (11.02.1996). Armanca sereke ya avakirina wê saziyê, rêkxistinkirina meyîldarên rewşenbîrtiyê û derxistina kovarek rewşenbîrî ya eyaletê bû. Endamên destpêkê yên saziyê, H. Gabar, Îsmet Yalvaç, Mele Elî yê Spêrtî, Rihan Îke û çend kesên dinbûn.

43
Parlemana Kurdistanê ya jiderveyî welat.

**Rihan Îke** vedibêje;

"Şevek sar ya heyva Sibatê bû. Wekû komîteya rêvebir ya saziya rewşenbîrên Kurdistanê, em di çadira rêvebertiya dibistana Muhemed Kurd de kom bibûn. Civîna me ya destpêkêbû û em pir bi kelecanbûn. Piştî çend civîn û bernameyan dest bi nivîsandina kowara dabaşa gotinê hatibû kirin. Berpirsê giştî yê saziyê û girêdayî vê yê kowarê H. Gabar hatibû hilbijartin. Wekû teknîkî ji bilî pênûs û kaxezê ti amêrên kowar pê were nivîsandin tinebûn. Nêzî mehekî li ber fanosa piçûk ya Helefeyan, kesên erkdar nivîsandinên hatîn nivîsandin redekte dikirin, yên kêm nivîsandîn timam dikirin û kowar dihat amadekirin. Ji kordînasyonê hatîbû kifşkirin kû Hozanê rewşa dawî ya kowarê venêre û erê bike. Hozan, zelamek gir, navser, sist û leqbû. Bi armanca tevlî Artêşa Gel bibe, ji berya hingê demekî ji Rojavayê Kurdistanê derbazî qadên çiyan bibû û ji sedema rewşa wî ya fizîkî ne destdayîbû hevalan zivirandibû eyaletê. Ji bû bizivire nav malbata xwe çaverêyê çûnêbû. Hej nivîsandinê dikir û hin ristên wî yên destnivîs hebûn.

Me di bin çavdêrtiya zelamê sist de amadekirina kowara dabaşa gotinê qedand. Jixwe piranî demên di hazirtiyê de bi me re bû û her tim wesif û pesnên hazirtiyên me dikir. Hevalê dabaşa gotinê pir keyfa xwe ji şêwaz û naveroka kovarê re anî, ket pêşya me û ji bû di weşandinê de arîkariya me bike ez, ew û H. Gabar çûn çapemeniya rêkxistinê. Kengê deriyê çadira çapemeniyê vekir, hê em nû ketibûn di hundir de û hê ne rûniştibûn, Hozan bi zimanek bitevz got;

"Evan çend pelik reş kirine û dibêjin, me kowar nivîsandiye."

Li ser vê hêlwesta Hozan hevalên çapemeniyê kowara me êxistin di bin keviya betaniya xwe de û bawer nakim carek din ji bin derketibe. Hê zêde tu kesî nav û dengê saziya me ne bihîstî, xeyalên me yên Yêkîtiya Rewşenbîran û derxistina kowarê jî li wêdê mabûn."

***

Li pehnava Etrûş, Biharê hêdî hêdî kifşeyên xwe kifş dikirin. Baran bê navber dibarî û hemwelatiyên eyaletê hatina biharê bi çalekiya rojiya birçîbûyînê paşwazî kiribûn. Kelecana rojiya birçîbûyînê û amedekartiyên Newrozê, rojeva eyaletê dagirkiribû. Roj bîst û çar demjimar li cihê çalekiyê govend dizivirî û dengê reqasvanan di bedena kelha Etrûş de vedida. Tevlîvanên girkê Vira zêde bibûn û nûçe li ser nûçeyan belav dikirin. Nîvroya roja duyemîn ya çalekiyêbû. Karwanek yê tirimpêlên cîp yên li ser tenişta wan UN nivîsandî ket di eyaletê de û yêkser berê xwe da cihê çalekiyê. Ew tirimpêlên demek dirêjbû wundabûyîn, herî zêde bala kesên li gikê

Vira kişandibûn. Navber dabûn sohbeta xwe, dev ji guhdar kirina radyoyan berdabûn û zîq li tirimpêlan temaşe dikirin. Bê goman şîroveya wê ya bi pişt re hatibûya kirin.

Ji şandeya hatî zelamek stûr, gir, bilind û rêh bizin bi wergerê xwe re nêzî girseya çalekvananbû û dest bi axaftinê kir. Zilamê xwe wekû temsîlvanê Rojhilata Navîn yê UNHCR Şemsî Barî dayî nas kirin; soza rakirina ambargoyê, zêdekirina arîkariyê, çêkirina xaniyan û parastina gelê eyaletê bi zimanek vekirî dabû. Dîsa soz dabû kû ji bû dabaşa guhertina cihê eyaletê ya kû gel ji bû wê di çalekiyê de ye hewl bide û heke ji destan were, gel bibe cihek aramtir û ewletir. Li ser sozên Şemsî Barî û ji sedema piştî du roj din Cejna Newrozê bû, gel bi coş û şahiyek mezin dawî li çalekiya xwe anîbû.

Li her çar aliyê Eyaleta Şehît Jiyan pêta agirê Newrozê xwe li erşê ezîm dida. Hemwelatiyên eylaletê, diruşmên “Bijî Berxwedan, Bimre Xiyanet” diqêrîn û dengê gel di guhên bosevanan de dikir zirme zirm. Heta berbanga roja cejnê, eyalet jipiyabû. Pêşmergeyên zen dikin ew jî kurdin, bi awayek şermedar guleyên xetat bi ser Eyaletê re diteqandin û jixwe ew kirinên wan yên her demîbûn. Ji bû guleyan di ser eyaletê de birijînin, pêwîstî bi hêncetek tinebû. Di pîrozbahiya tevayê şevê ajotî de, zarokên bi navê Zîlan Kaçar û Perwîn Emer sivik şewitîbûn.

Cejna Newrozê, bi guloka hevgihandina serkeftinan destpêkiribû û lamên pêşkêşvana pîrozbahiyê ji qêran sohr bibûn. Xwendevanên wekî mircanan li dûv hev rêzbûyîn, ji dibistanên xwe cuda cuda vediqetan û di ketin qada cejnê de. Zeriyên bi cil û bergên netewî û xortên xwe bicilên gêrîla xemilandîn, reng tevlî rengîntiya qada Newrozê dikirin. Jixwe hemabêje hemî zilaman û heta hin jinan jî her tim cilên Hevalan li ber xwe dikirin. Hêza xweparastinê û asayîşê, ji bû ewlekariyê dorfireh qada bosekiribûn û gotin di cêh de be, ne dihiştin çûk bifire. Di vê navberê de Xelîl Atac û Dawut Baxistaniyê ji êvar ve li Eyaletê û zêde xebara kesî ji wan tine, derketin dikê cejnê. Piştî axaftinek germ Ebabekir, mizgîniya aştiya di navbera PKK’ê û PDK’ê de wekû fermî ji gel re ragihandibû. Vê nûçeyê coş tevlî coşa hemwelatiyên eyaletê kiribû û pîrozbahiyê heta êvarê derneg ajotibû.

Piştî vê daxwiyaniyê deriyê eyaletê ji serdanvaniyan re hatibû vekirin. Qedexeya derketina hemwelatiyên eyaletê bi hemî dijwartiya xwe tajot ema, derî ji tevlîvanên nû û rojnamevanan re vebibû. Wargeha ew heşt mehe wekî qutiyek girtî, ketin û derketina wê hatî qedexekirin û her roj nûçeyên qirkirinê li ser hatîn belav kirin, bibû xala kişandina rojnamevanan. Eyaletê, her roj rojnamevanên ji her aliyê cîhanê pêşwazî dikir û li her quncikê çadirekî guhên mikrifonên rojnamevanan dixwiyan û hemwelatiyan serpêhatiya

berxwedana xwe vedigotin. Evê bal û eleqeyê hemwelatî şad kiribûn û gotin ji keyfa wan re ne dihat kirin. Berxwedana meşandîn bilind vedabû û li her çar aliyê cîhanê deng dabû. Dîsa malbatên di dîrokên cuda de ji ber zulma dewleta Turk revîn û ji sedema dorpêçkirina PDK'ê rê ya tevlîbûyîna eyaletê peyda ne kirîn, wekî lehiyê diherikîn û ji tomarkirina navê wan komîteya karê jiderve firseta serê xwe jî bixwerîne peyda ne dikir.

Tevgerek awerte li zikakên eyaleta ji bajarokek çadir pêktê ketibû. Her kes di nav hewldanekî de bû. Li aliyekî gelê Eyaletê hewldida birîn û pirsgirêkên erdheja heşt mehan ajotî bipêçe û çareser bike. Li aliyê din, biteybet ji aliyê Çelê malbatên nû tevlî jiyanê dibûn û xebata bicêhkirina wan hebû. Dîsa piştî li hevhatinê, bir bi bir girtiyên di destê PDK'ê de hatibûn berdan û serdana wan liv û tevgerek cuda derxistibû holê.

Sebeb çiye ne dihat zanîn lê, rêvebirê nû yê UNHCR Abdulah Arif, ji bû xanî, rê û binsaziyê; sê çar companye rêkiribûn eyaletê. Ya star, cara yêkêbû rayedarên saziya UNHCR, evqas hej wan koçberan dikirin. Lê, hemwelatiyên di naskirina wan hêz û saziyan de pisporbûyîn, ev nêzîkbûyînên zêde semîmî wekû elametên xêrê ne dinirxandin. Li ser rê û rêbazên xebatê û ji nû ve avakirina wargehê komîteya gel, Abdulah Arif û berpirsên kompanyeyan civîn li ser civînan lidardixistin û proje li navguhê hev diketin.

Di dîtinê de PKK û PDK, li hev hatibûn. Diyalog û hevdîtinên wan ji her demî zêdetir bibûn. Hevdîtinên her du aliyan jî bê navber dewam dikirin û qewlê yêkemîn yê PKK'ê aramî, ewlekarî û serbest hiştina gelê eyaletêbû. Lê PDK, jidil nêzî wî qewlî ne dibû û ji bû belavkirina eyaletê ya ji desta dihat texsîr ne dikir. PDK ya ji ber PKK'ê êdî nikarî rêbazên xwe yên kevin û stûr bikarbîne, dest bi rê û rêbazên nû kiribû.

Hê jî qedexeya ketin û derketina hemwelatiyên eyaletê hemî dijwartiya xwe diparast. Gêradayî vê dorpêç û abloqeya Pêçmergeyan jî dewam dikir. Arîkariya UNHCR dida pir kêmbû û ti der ne dadigirtin. Hê jî serê kesê heft kêlo ar, neh sed xiram dohn, sê sed xiram şekir û sed û pêncî xiram ça didan. Ji bû gel bikaribe debara xwe bike neçar mabû ji kîsê xwe qûtê zarokên xwe bikire. Ema, ji bû dabînkirina qût, bazar û dukan pêwîstbûn û bi vê hêncetê zext li rêvebertiya PDK dihat kirin. PDK jî ji bû hênceta gel ya kirîna tiştan û girêdayî vê derketina ji wargehê rake, di navbera derbenda eyaletê û ya xwe de ji çadiran bazarokek ava kiribû. Çend kesên endamê Parastin[44]ê anîbûn, bi navê dukanan çend çadir bi wan dabûn vedan û gel pêwîstiyên xwe ji wan dikirîn.

44 Saziya îstîxbareta PDK.

Jixwe tişt bi buhayek pir fahîş difirotin koçberan ema, armanca esîl ya wan dukandaran ji dukandartiyê pir wêdetirbû. Armanca wan ya bingehîn ji eyaletê revandina kes û malbatanbû û girêdayî vê belavkirina eyaletêbû. Kesên leq, sist û baweriya wan şkestî bi hênceta kirîna tiştan ji derbenda eyaletê derbaz dibûn û di nav wê bazarê de leyîstokên cuda dileyîstin.

Endamê komîteya karê ji derve **Eliyê Huso yê Ziravikî** vedibêje:

"Piştî sekinandina şer, me di eyaletê de komîteyek ya li hevhatinê avakiribû. Ev komîtya ji rihspiyên hemwelatiyên eyaletê pêkdihat, diçû serdana gundên derdor û bi wan re danûstandin pêktanîn. Wekû cîran me dixwest em pirsgirêkên kevin bi rêya danûstandinan ji holê rakin û têkiliyên xwe xweş bikin. Hefteya ewil ya piştî cejnêbû. Komîteya têkiliyan, vexwendinameya waliyê Duhokê ji me re anî û wî qerasê waliyan doza hevdîtinî li me dikir. Di mercên heyî de pêşmergeyek ji rêzê jî em hevkûfê[45] xwe ne didîtin û bi me re hevdîtin qebûl ne dikir. Çawa çêdibe, waliyê Duhokê ji nişkan ve biryar digre û dixwaze bi me re hevdîtinê bike? Em bêjin, vê vexwendina em ne li çaverê em şaş nekirin û ecêb ne hiştin ne raste, ema me dixwest em pirsgirêkên xwe çareser bikin û em çûn. Komîteya dabaşa gotinê, Ez, Mele Heyderê Amedî, Cindiyê Şirîşeyî û Huseyn Şedal'ê Geverînbûn. Azadê kurê Fazil Buldan jî şufêrê me bû û berpirsek yê PDK'ê jî bi me re hatibû. Em bi hev re çûn walîtiya Duhokê. Xebatkarên walîtiyê gotin; "walî ne amadeye, emê we rêkin otêlê, siba werin." Me jî daxwaza wan pejirand û em birin otêl Parlemen.

Di zena me de, em mêhvanên walîne û mesref jî ji kîs wî ye. Wê şevê endamê PDK'ê yê bimere Îsa got;

"Tu Azad Goyî nas dikî?"

Min got: "Belê."

Ew mirovê Îsa dikarkirî, ji gundê Kalhesin ya Qulaban bû. Ji kevin ve endamê Partiya Azadî bû. Piştî PKK dest bi şerkir, bû ajanê turkan. Êdî ne tenê ajantiya gundî û derdor dikir, bibû endamek yê MÎT yê navnetewî.

Carekî çar kesên dilxwede ji partiya wî dixwazin bi rêbertiya wî derbazî Başûr bibin. Ev kes wan bi rêve dikuje, dişelîne û ji xizm û malbatan wan kesan re dibêje; "PKK'ê kuştin." Dîsa ew û sê kesên ji herêma me ji bû bazarvantiya çekan diçin Êranê. Bi rêve li cihekî bêhna xwe vedikin. Azad Goyî, ji dizî ve diçe qereqola turkan û dibêje; "Eve sê gêliyanên PKK'ê li vêdêne" û wan jî dide kuştin.

Min di sohbeta me ya dirêj de ev kirinên Azad Goyî hemî ji

---

45 Mûxatap.

Îsa re gotin. Îsa got;

"Ji kesî re nebêje ema, ev kes tê derbenda PDK'ê ya wargehê. Bi hemwelatiyên wargehê re hevdîtinan çêdike û ji bû wan bide revandin rêkxistin dike."

Bû sibeh. Otêlê heqê Îsa jî di nav de serê kesê sed dînar ji me standin û em çûn cem waliyê Duhokê, Evdilezîz Tayîp. Tam dema em derdê xwe vedibêjin û pêwîstiya serbestkirina gelê eyaletê gotûbêj dikin, kesek ket hundir û kaxezek danî ser mêzê walî. Piştî walî kaxez xwend, nav çavên wî girbûn û em dan ber awrên dijwar. Walî, qeta kaxezoka di destê xwe de bi hêlwestek hêrsdar hejand û got;

"Hûn ji min qenciyê dixwazin. Aha şevê din PKK'ê li Duhokê Azad Goyî kuştiye" û ket ber pesin, wesif û welatperweriya Azad. Îsa kaba xwe li ranê min da û şaqis li nav çavên min nêrî. Walî, em destvale zivirandin û heqê otêlê jî çûn ji kîsê me.

Bi pişt re me ji jêderên saxlem bihîst, ji bû revandin, fitne û di encam de belavkirina wargehê, bi hevkartiya Parastina PDK'ê û MÎT'a turkan gurubek hatibû erkdarkirin. Navenda wê gurubê Duhok bû. Azadê Goyî û Şivanê kurê Kazo yê Nêrwehî yê par ji wargehê revî jî endamên wê gurubêbûn. Şeva dabaşa gotinê, Azad bela xwe li destgirtiya Şivan dide û di navbera wan de şerê çekdarî derdikeve. Her du hev dikujin û jin jî di navbera wan de tê kuştin. Dibe kû sedemê cuda jî hebin lê, biqasî em fêrbûyîn bûyer wisa qewimîbû.

Wekû kesî şîroveya min ya bûyera kuştina Azad Goyî û Şivan Nêrwehî pir cudatire. Bi dehan sebeb û nîşeneyên min lekmî şîroveyek cudatir dikin hene.

Yêk; waliyê em bi ti awayî hevkûf ne digirtin çima ji nişkan ve em vexwendin Duhokê?

Du; madem em vexwendin û hevdîtin wî bixwe amade kiribû, çima dema em çûyin xwe veşart û hevdîtin hişt roja piştî wê?

Sê; heman bêhna her du kesên navbûrî werin kuştin an jî hatîn kuştin, çima zilamê teybet yê PDK'ê pirsa Azad ji min dikir? Gelo tam di wê gavê de dibekû ev pirskirin rasthatinek dahiyane be?

Çar; kesên dabaşa gotinê, êvara ji ber ya wê hatibûn kuştin û hergîz walî bihistîbû. Çima tam dema em di hevdîtinê de kesek kaxezekî datîne ser mêzeyê wî û dilxwede walî ji bûyerê agahdar dike?

Li gor min qewmînên dilxwede rasthatî jiyan biyûn, têstekbû, hêzên tarî ji zû ve nivîsandibûn û wê şevê derxistin ser dike. Hevdîtina me jî kirin, dikeyek ya wê şanoyê.

**Avana Sosyolojîk ya Eyaleta Şehît Jiyan**

Koçber, di kêştiyek şkestî de bûn û kêştî li nîvê okyanûsê asê mabû. Kêştî, di bin gefa sîpêl û hûtan de ji derb ketibû û li ber xerqbûnêbû. Kêştiya kun kun bûyî li ber pêlan ketibû ema, sekanvan[46] jêhatî û wêrekbû û ne dihişt xerq bibe. Sebir û têkoşîna rêvanan ne dihat fatiskirin ema, divê ev rastî hergîz ne hata paşguhkirin; ya li berxwe dida ne qayimtiya kêştiyê an jî aramtiya rêvananbû, zîrektiya sekanvanbû. Bê goman armanca yêkemîn û lezgîn ya sekanvan û erkdarên kêştiyê, ne edalet, wekhevî û çareserkirina pirsgirêkên rojane yên rêvananbû; hedefa lezgîn ji xerqkirinê rizgarkirina kêştiyêbû. Di mal de hêzên xwecih û jiderve desthilatdarên mezin, rika xwe dabûn eyaletê û dixwestin belav bikin. Di nav wê qergeşeyê de Tevgera Azadiya Kurdistanê PKK'ê, bi hemî hêz û karîna xwe hewl dida wargehê ji pencên wan hûtan biparêze. Li ser zemînek şemîtok têkoşînek ewqas dijwar dihat meşandin, her bêhn hevsengî dikarîn werin guhertin. Şer û têkoşîna ne hevseng yêkser bandor li jiyana hemwelatiyên eyaletê jî dikir.

Ji sedan şêstê avana eyaletê gundiyên gundên eşîreta Goyan pêktanîn. Ankû zîna pişta eyaletê ev qisimbû. Biteybet gundiyên gundên Hilal, Mijîn û Nêreweh hemî koçber bibûn û dema li Bakur bûn hemî ne xebatkarên rêkxistinêbûn. Heta ji aliyê dewleta Turk ve sûncek yê wan jî tinebû. Dema barkirîn jî piraniya wan ne bi niyeta qamp, mihacirtî û vê têkoşîna dijwar ya di navbera PKK'ê û hêzên desthilatdar de hatibûn. Bê goman hemî meyildar û aligirên PKK'ê bûn ema, ji wê dijwartiyê re jî pir ne amadebûn. Qismek mezin gundiyên gundê Ziravik jî li eyaletêbûn û ew jî parçe parçe hatibûn. Li aliyê din hatina Başûr ne tercîhek ya wa ya serbixwebû. Bi zora dewleta Turk derbazî Başûr bibûn. Ewan ji her kesî bêhtir rastiya hêza siyasî ya desthilatdarê Başûr nas dikirin û di bin ti mercan de baweriya xwe bi wê hêzê ne tanîn.

Dîsa eşîreta dabaşa gotinê li ser sînorê Bakur û Başûr bû û têkiliyên wan yên civakî, siyasî, aborî ji Bakur bêhtir bi Başûr re bûn. Ji sedema wekû coxrafîk xaka eşîrê teng û asêbû û xwecihên xwe têr ne dikir, her tim endamên eşîrê neçar mabûn biteybet li Başûr û li herêmên derdor li rêya debara xwe bigerêne. Vê lêgerîna ji der ve bandorên erênî û neyînî bi xwe re anîbûn. Yêk; hêst û têkiliyên wan yên eşîrî pir nerm û qayîmbûn. Du; berxwedanvanbûn. Sê; di malê de rêvebir jinbû. Çar; di aliyê îdeolojîk de zû ne distewan û di her mercî de berjewendên xwe yên malbatî li pêş digrtin. Pênc; pir hej hev ne dikirin û zêde ne hevgirtîbûn lê, şertên jiyanê û pisîkolojiya xweparastinê rê ne dabû hevgirtina wan sist bibe. Kengê tengav

46 Qeptan.

dibûn, têkiliyên wan yên eşîrî derdiketin pêş û vê jî di jiyana civakî ya eyaletê de ne hevsengiyek bixwe re tanî.

**Hilal;** ji eşîra Goyan gundê herî boş yê eyaleta Şehît Jiyan bû. Nêzî sê sed malan koçber bibûn û hemî li wargehêbûn. Qismek yê gund jî mihacir nebibû û li gundê Şêxan bibûn çete. Hilal, di fermiyeta pergala dewleta Turk de Nehiyebû. Berjengê nahiyetiyê ewantajên baş pêşkêşî gundiyan kiribûn. Evê rastiyê tesîrek erênî li ser aliyê civakbûyinê gundiyan jî kiribû. Ligor Mijîn, asta xwendin û zanîna wan lipêştir û di nav xwe de gundek hevgirtîtirbû. Wekû gund, berjewendên xwe bi ser her nirxî re digirtin û meyla wan ya desthilatdartiyê li pêşbû.

Ji berkû di pergala dagirker de xweyê berjenga nahiyêbûn, dibistan zû hatibû gund û evê jî di asta xwendin û nivîsandina gundiyan de bandorek erênî kiribû. Ji bilî dibistanên seretayî dibistanek navîn jî li gund hebûye û hemabêje asta xwendiyên ciwanên gund bi ser nîvî re bû.

Di rêvebertiya malbatê de hergîz[47] jin rêveberbû. Gotina; "malxwê" di rastiya civakî ya Hîial de zêde ne bi watebû. Di malê de kevanî her tiştbû. Evê jî reng û wateyek pir spehî tevlî jiyana wan dikir. Bê şik PKK rêkxistinek ya azdiya jinêbû. Heke 'Pîrek rêveber' ya herêma Goyan rast were nirxandin û pêşxistin dikare pêşketinên pir lezgîn û erênî bi xwe re bîne.

**Mijîn;** piştî Hilal gundê herî boş yê eyaletêbû. Hêjmara gundiyên li wargehê bi ser sed û şêst malî re bû. Hemabêje ji nîvî zêdetir gund hatibû wargehê. Qismê mayî jî li cihên cuda yên Bakur belav bibûn. Ji sedema cihê gundê wan pir asêbû, bi Tevgara Azadiyê re zû hevnasbibûn. Ji ber wê, li herêmê tevlîbûyinên destpêkê û yên herî zêde ya gerîla, ji wî gundî çêbibûn. Ema dibêjîqey vê hevnasî û tevlîbûyinan bandorek pir erênî li ser pêşketina civakî çênekiribû.

Gundê Mijîn, di nav eşîra goyan de wekû misexir[48] bi vegotinek din wekû rayit dihat binavkirin. Rayît, di zimanê Kurdî de tê wateya bê desthilanîn. Bigotinek din, bindest. Evê jî di aliyê xwe rêxistin, rêvebirin û di derketina pêş de bandorek neyînî dikir.

Asta xwendin û nivîsandina gundiyan pir kêmbû. Hemabêje qet tinebû.

Rêvebertiya malbatê di navbera jin û mêr de, bi vegotinek din, di navbera kevanî û malxwê de digevizî. Her du alî jî jiderb ketibûn û ji sedema aboriya gund jî baş ne hatibû rêkxistinkirin û pêşxistin feqîrtiyê ser ji her tiştî standibû.

47
Mûtlaq, tekez, bê guftûgo.

48
Helîm.

Di wargehê de rewşa Mijîn û di gerestêrka cîhanê de rewşa Kurdistanê pir dişiphan hev. Gundê herî kedkar û boş yê wargehê Minjîn bû ema, di aliyê rêvebirin û rêkxistin û tekûzkirina de, gundê herî bê bandorbû.

**Nêrweh;** li gor gundên navên wan li jor hatîn kifşkirin hêjmara wan kêmtirbû. Hêjmara gundiyên derketîn rêya koçbertiyê, bi bin sed malbatî re bû.

……

Di aliyê civakî de pênaseya ji bû Hilaliyan hatîkirin hemabêje ji bû wan jî derbazdare. Tenê di asta xwendevantiyê de wekû neyînî ji Hilaliyan cudabûn. Di asta gun de xwendevanên wan qet tinebûn.

**Bileh;** di aliyê boşahiya jimarî de gunde çaremîn yê eyaletêbû. Di aliyê avanî, çandî û civakî de pir dima gundê Nêrweh. Jixwe wekû gundekî tevdigeran û koçberan gundiyên her du gundan pir caran tevlîhev dikirin. Tona dengê wan, şêwazê peyvên bikartînin û asta wan ya çandî hemanbû.

**Ziravik;** wekû bajariyên eşîra Goyan werin pênasekirin ne şaşe. Hêjmara li qampê ne ji ya Bilehiyan kêmtirbû. Jixwe ji berya mihacirbûyina giştî salekî, dewleta Turk êrîşî gundê wan kiribû, qetlîam pêkanîbû û heştê mal ji gund koçberî Başûr bibûn. Bi avabûna wargeha koçberan re, piraniya Ziravikiyên li Zaxo û derdor bicêhbûyîn tevlî jiyana wargehan bibûn. Tevlîbûyina wan ya Gêrîla pir kêmbû û ji qismek piçûk wêdetir dibêjîqey li hember vê jiyana bê eman li berxwe nadin.

**Şirîş;** di aliyê kozmopoîtîk û xweser de gundê herî balkêş yê eyaletêbû. Qîma xwe bi jiyana koçbertiyê ne tanîn û vê jî qelqîtiyek ne asayî bi xwe re tanî. Ji sedema coxrafya gund asêbû, ji destpêka Têkoşîna Azadî û pêve têkiliyên wan û Gêrilayên Kurdistanê çêbibû û bi têkoşînê re hevnas bibûn. Girêdayî vê di herêmê de ji bû koçbertiya giştî gundê Turkan hedef girtî û bi balefiran bombardiman kirî jî ew bû. Yên pêşvantî ji vê serûwenê re kirîn jî hemabêje Şirîşeyîbûn. Evan xalan bi wan re hêstên delaliyê pêş êxistibûn û ne dihatin jiyana heyî. Ji qismek piçûk yê gund wêdetir xwe cuda didîtin û ev jî di aliyê tevliyîbûna jiyanê de bi serê xwe pirsgirêkekbû.

Balkêştiyek din ya Şirîş; ji destpêka Têkoşîna Azadiyê ve wekû gund bi Gêrîlayan re di nav têkiliyan de bû ema, wekû gêrîla tevlîbûyinan wan hemabêje qet ne çêbibûn.

Girêdayî bombardima dewleta Turk, pêkenokek jan-kenok ya gundiyên gundê Şirîş hebû û di civat û sohbetên koçberan de her tim dihat qisetkirin. Balefirên Turkan li gundê wan dabûn û di her keysî de ev çîrok wekû minet dubare dikirin. Carekî di civîna gel de Simalê Şirîşeyî yê xwe wekû pêşkêşê gundê Şirîş difiroşe; dîsa dirêj dirêj dikara heman rûdavê dike û dixwaze civînê ji wateya

wê derxîne. Hevserokê Eyaletê Sînanê Sohr, pir aciz dibe û dibêje; "Xwezî ew qazan ne li Şirîş, li serê min ketibiya. Belkî em ji bela te rizgar bibûna."

**Pîran;** yêk ji gundên geliyê Goyan yê bi giştî mihacir bûyî û wekû koçerên eşîreta Goyan werin pênasekirin ne şaşe. Hêjmara wan li derdora bîst û pênc mala ye. Dêmanînbûn ema şêwazê jiyana wan koçertîbû. Girêdayî wê mejiya wan yê aborî û bazarvantiyê baş dixebitî. Mirovên îşkerbûn û di halê xwe de bûn. Di rêxistina navxweyî de tevlîbûyînek ya wana kifşker tinebûya jî ji neyîntiyan dûr disekinîn.

Wekî din, ji herêma Goyan gundiyên gundên Delak, Robozkê, Nîreh, Kadûn, Repin û Aloş jî li eyaletê hebûn ema, di aliyê hêjmarî de kêmbûn û zêde ne bi bandorbûn.

Li aliyê din, yên wekû "Şêladizî" (Bêtrot, Sêvê, Kinyaniş) dihatin naskirin, bi hemî aliyên xwe ve Başûrîbûn. Bêhtirî xwe xizm û mirovên wan li Başûr bûn û jixwe heta bi operasyona Pola jî tevlî jiyana koçberan ne bibûn. Wekû rasthatî xwe di nav wê boseya bi agir de dîtibûn û li rêyek ya revê digeran. Ji ber wê wekû mayînde xwe ji koçberan ne dihesibandin, zêde tevlî karên rêxistina navxweyî ne dibûn û ji bû xwe ji wargehê rizgar bikin li pey keysekîbûn. Hêjmara gundiyan van gundên navbûrî nêzî sed û pêncî malanbû.

**Bêgalte**, biyanî û kûviyên eyaletê werin pênasekirin di cihê xwe de ye. Ji xeynî çend malbatên Oremarî, yên avana qampa Hungo pêktanîn gundiyên gundê Bêgalte bûn. Nêzî pêncî malabûn û di nav eyaletê de cîhanek ya waya cuda hebû. Wekû rasthatî liber bayê vê têkoşînê ketibûn û ne di aliyê çandî, ne zanîn û ne jî netewî de têkiliyek ya wana PKK re tinebû. Hemî li gund çetebûn. Ji sedema Hevalan li gundê wan li romiyan dabûn dewletê gundê wan xirakiribû û berê wan dabû Başûr. Piştî hatîn Başûr jî têkiliya xwe bi PKK'ê re ne çêkiribûn. Ji bû koçberên Bêsivê çûyîna geliyê qiyametê bipejirînin, bi biryar û daxwaza PDK'ê avêtibûne geliyê Qiyametê. Ew jî bi agirê Şehît Eşref şewitîbûn. Nixwe ne niyet û ne jî armancak ya waya wisa hebû. Di rastiyê de wekû çand, fikir, şêwazê jiyanê jî ji PKK'ê bêhtir nêzîkê PDK'ê bûn.

**Geverî;** Li eyaletê nêzî 20 malbatên Geverî, bi teybet ji Oremar hebûn. Rewşa van Oramariyên wekû 'Geverî' dihatin binavkirin, hêjayî lêkolînêbû. Di dîtinê de aliyê eyaletê yê bajarî temsîl dikirin. Rewşa wan ya diravî jî wekû erênî ji ya avana eyaletê pêktînin pir baştir dixwiya. Heke asta modernîteya roja me pîvan bihata girtin, ji wê ne zêdetirbin ne kêmtirbûn. Ema ev tenê di dîtinê de bû. Her tişt, her kes rexne dikirin ema, bixwe tiştek ne dikirin û tevlî karên rêxistînî ne dibûn. Her kes bi eşîretvantiyê tewambar dikirin ema, aliyê girtî, hişk û kevinvan yê eşîretvantiya bê qisûr

pêktanîn. Her kes bi paşverûtiyê sûncdar dikirin ema, hê jî keç an jî kurek yê wan nikarî bi kesek ji derveyî eşîrata xwe re bizewice. Dibêjîqey ev Geverî tenê ji bû gazindan hatibûn dunyayê.

Li eyaletê hêjmarek ne zêde ya malbatên Çelî û gundên derdor hebûn. Piraniya wan gundiyên ji gundên cudabûn. Her çend malbatan ji gundekîbûn ema, pir ne zêdebûn. Piraniya wan dema li warên xwebûn, milîs û xebatkarên rêkxistinêbûn û di serîwana koçbertiyê de jî xebata xwe berdewam dikirin. Giraniya wan endamên hêza xweparastinêbûn û di rêvebirina navxweyî de bandorek ya wa ya berbiçav tinebû.

Wekî din hêjmarek ne kêm ya koçerên li derdora hezex, Cizîrê jî koçber bibûn û hatibûn wargehê. Piraniya wan dema li Bakur bûn xebatkarên rêkxistinêbûn û di pêvajoya koçbertiyê de jî xwe ji karên rêxistinî zêde ne vedidan. Jixwe koçerbûn û ji jiyana koçber zêde ne xerîpbûn. Têkiliyên wan yên Başûr jî pir ne başbûn. Ema ji çanda koçertî dihatin û nikarîn di warekî de asê bimînin. Dîsa mirovên pir aborîkbûn. Dibêjîqey ekonomîstên Brîtanî li ber destên wan hatibûn perwerdekirin. Ger kû demek dirêj bi rêkxistinê re tevger kiribûn jî lê, wekû îdeolojîk, felsefîk giradanek ya waya mucîd tinebû.

Ji gundên derdora Şirnex, Silopî û Cizîrê hêjmarek ne kêm gund û malbat li eyaletêbûn. Her çend mal ji gundekî hatibûn û piraniya wan xebatkarên rêkxistinêbûn. Têkiliyên wan yên eşîrî tinebûn û di nav xwe de ne hevgirtîbûn. Jixwe axatiya Şirnex bi navû dengbû û hemabêje her malbat axayek bê eşîrbû. Wekû madî jî piraniya wan feqîrbûn û di aliyê hevsengiya siyasî ya di nav eyaletê de faqtorek bi bandorbûn. Ev qismê koçberan wekû zîna pişta eyaletê were pênasekirin ya ne şaşbe.

**Kundikremo;** hêjmara gundiyên vî gundî yên li eyalet, sih, sih û pênc malbûn û gundikî tevlî vî karwanî bibûn. Wekû şêwazê jiyanê di navbera koçertî û dêmanîtiyê de digevizîn. Belkî yêk ji gundê destpêkê yê ji aliyê dewleta turk ve hatî şewitandin û xirakirin Gundikêremo bû. Tevlîbûyînên wan ya gêrîla jî ne kêmbû. Asta xwendin û nivîsandina gund hema bibêje sifirbû. Di aliyê rêvebirin û pêşvantiyê de kêmek ruh dexesbûn û ne li pêşbûn. Ne pir gazindokîbûn ema, ne pir stewayî jî bûn.

Dîsa nêzîkî deh malekî Avyanî, wekeza Gundikmelayî, Bacrîdî, Girekî, Aqîrî, Biryanî û ji navenda Şirnex hebûn.

Lê, di nav Şirnexiyan de xetek cuda hebû. Ew jî xeta Bilik, Siliv, Gite û Koçerên Spêrtiya bûn. Ji sedema li xeta sifir ya sinorbûn, têkiliyên wan yên bi Başûriyan re kûrbûn. Di aliyê îdeolîjîk de nêzî PKK ne dibûn. Ev jî dibû jêdera sereka ya pirsgirêkan. Li gor navîna eyaletê rewşa wan ya aborî jî ne xirapbû. Zêde tevlî karên

rêkxistinvantiya navxweyî ne dibûn. Gotin di cêh de be, hê biryara xwe ya wekû mayînde tevlîbûyîna vê jiyanê ne dabûn û di navberê de diçin û dihatin. Bayek din di ser wan de were, berê wan li kûye ne diyare.

**Bilik;** hêjmara wan ne ji ya Gundikremoyiyan kêmtirbû. Tevlîbûyînên wan yên gêrîla jî ne kêmbûn û girêdayî vê ya şehîdan wan jî. Ev dihat wê wateyê naskirin û tevlîbûyîna wan ya Têkoşîn Azadiyê kevinbû. Ema, di aliyê tevin û zêhniyeta civakî de hingî bixwazî ji rastiya îdeolojîk ya PKK dûrbûn. Xerîbe ema, gundiyên wî gundê li nav sera çiyayê Cûdî wekû burjûvayên eyalêtê werin pênasekirin ya ne şaş be. Ev aliyek yê wa bû, aliyê din dibêjîqey hemî di medreseyên Nexşîbendiyan de gihatibûn. Di pêvajoya koçbertiyê de yên destpêkê û dawî bertek li hember 'Pêxembertiya Zerdeşt' nîşandayîn Bilîkîbûn. Ji sedema mamostayekî Zerdeşt Pêxember wekû "pêxemberê Kurdan" pênasekiribû Bilikî hemî rabibûn serhildanê û êrîşî dibistanê kiribûn. Girêdayî vê, di navbera PKK'ê û PDK'ê de ditirşan. Yanî di hundirê xwe de nakokiyek yeman jiyan dibûn û ev nakokiyan wan bi kû re derxîne pir ne diyarbû. Ji ya heyî ne razîbûn û ya dixwestin jî ne kifşbû.

Nêzîkê bîst malabatên xwe wekû Gabarî pênase dikirin jî li eyaletêbûn. Di eslê xwe de wekû malbat pênasekirina vî qismî zehmetbû. Ji ber kû piraniya wan bê malbat, bi serê xwe tevlî vî karwanî bibûn. Hinek ji wanan nû malbatên xwe anîbûn û yên din jî hê bê malbatbûn- bigotina goyiyan, 'zigurdbûn'. Ev kesên wekû 'Milîsên Gabarî'' dihatin binavkirin, endamên hêza xweparastina eyaletêbûn û derwêşên sereke yên vê pêvajoyêbûn.

Dema destpêka Nîsana 1994'ê gundên wan hatîn şewitandin û herêma wan hatî valekirin, wekû milîs di nav rêkxistinê de mabûn. Piştî demekî rêxistinê qismek ji wan derbazî Başûr kiribûn û qismek jî di nav Hevalan de mabûn. Hevalan, qismê derbazî Başûr bûyîn wekû ewlekar şandibûn wargehê. Di rastiyê de saziya destpêkê ya xweparastinê ji aliyê wan ve hatibû damezrandin. Bi demê re ev sazî hatibû mezinkirin û heta hingê jî wekû taximek milîs, karên herî giran yê wargehê li pişta wan bû.

Xala şîrîk ya haveynê hevgirtina koçberên eyaleta Şehît Jiyan, girêdana hêstî ya bi PKK'ê re bû. Ji bilî îstîsnayên veşartî, koçberên avana eyaletê pêktanîn alîgirên PKK'ê bûn. Jixwe sedemê vê serîwena dijwar, ev alîgirtiya wan bû. Li gel hemî kêm û kurtiyan, girêdana koçberan ya bi şehîdan û Rêbertiya PKK'ê ve bê guftûgobû. Jixwe piraniya malbatên li wargehê, yan malbatên şehîdanbûn yan jî xizmên wan yên herî nêzîkbûn. Heta ji nîvî zedetirê malbatên li wargehê, ji yêkî zêdetir şehît dabûn. Hêz û jêdera berxwedana wan jî ji wêdê dihat. Ema êrîşên li ser wan dijwarbûn û yên êrîş

dikirin jî xwirtbûn. Bi kal û pîr, jin û zarokan ve li hember van êrîşan liberxwedayîn, stewandinek kesî, siyasî û ji hemiyan girîngtir jî îdeolojîk dixwest.

Avana eyalet pêktanî bê sîtîsna gundîbûn. Dibekû li gor pîvanên şaristaniyetê ne pir xwenda û pêşketîbin ema, di aliyê hêstî, exlaqî de pir paqij û girandana wan safî û bê hesapbû. Di aliyê îdeolojîk, polîtîk, felsefîk û pêşdîtinê de pir ne di astek di pêş de bûn ema, rast hatibûna perwedekirin û ronahîkirin dilsoz û pêşvanên mezinbûn. Jixwe ji bû pêkanîna vê astê û rakirina vê lewaztiyê şev û roj xwe perwerde dikirin.

## Perwerde

Ji bû PKK'ê Perwerde, di qewlê nebe nabe de bû. Her saziyê di bin banê xwe de dewreyên perwerdê vedikirin û li ser rastiya Rêbertiyê, rêkxistinê, Kurdistan û cîhanê bername dihatin hazirkirin. Dîsa bê navber dewreyên perwerdeya gel dihatin vekirin û birêvebirin. Jixwe dibistan û perwerdeya zarokan pîroz dihat bi destgirtin û seferbertiyek bê eman jê re hatibû ayankirin. Ema, pêwîste ev xal jî newe paşguhkirin; di perwerdeya heta hingê hatî dayîn de, di navbera perwerdevan û avana perwerdê dibîne de hevsengiyek baş ne hatibû çêkirin. Mamostayên perwerdevan xwe baş amade ne dikirin, an jî baş têrê ne dikirin û ev jî dibû sedemê di wextek kêm de encamek baş newe bi dest xistin. Her kesê bi navê perwerdevan derdiket pêş, dirêj taxivî ema tiştek jî ne digot. Heta ev şêwaz di dema pêş de dikare encamên berevajî jî bi xwe re bîne. Bê goman di serê vê pênaseyê de dibistan û mamosta dihatin.

Yêk ji perwerdevanê sereke yê eyaleta Şehît Jiyan, Yaşerê Turk bû. Yaşer, mirovek por hişîn û navserbû. Kadroyek kevin yê PKK'ê bû û ji Turkmenê Ruhayê bû. Mirovek biberhev û têr zanîn jî dihat hesibandin. Ev mirovê enerjîk û têr axaftin, tevlî perwerdeya xwerêxistina zarokan, jinan û hemî saziyan dibû. Di rastiyê de gazindên gel jî pir jê tinebûn. Ema xalek balkêş hebû, Yaşar qet Kurdî nizanî û avana Eyaletê qet Turkî nizanî. Ya xerîbtir, niyeta Yaşar ya fêrbûyina Kurdî jî qet ne dixweya. Hevgihandina vê girseya Turkî nizane û perwerdevanê Kurdî nizane ya bi xwe re çi anîbûya ne kifşbû.

## Sazîbûyîn

Sedema fer û bê guftûgo ya ev karwan bi rê êxistî, aligirtiya wan ya PKK'ê bû. Ji ber kû aligirên PKK'ê bûn û di vê alirgirtiya xwe de israr kiribûn gundên wan hatibûn şewitandin, zarokên

wan hatibûn kuştin û bi evqas êrîş re rû birû mabûn. Girêdayî vê, ji bû xwe bi felsefe û rêbazên Rêberê Tevgera Azadiyê rêkxistin dikin û birêve dibin, hêzên desthilatdar çavreşî tavêtin wan. Ji destpêka karwan û pêve rêvebertiya koçberan xwe bi rêbaz, felsefe û şîretên Rêber Abdullah Ocalan birêve dibirin û rêxistin dikirin. Qewlê sereke û bê guftûgo ya Tevgera navbûrî di her qadên jiyanê de xwe rêxistinkirinbû. Bê goman, rêbaza xwe rêkxistinkirinê jî bisazîbûyînbû. Kadroyên PKK'ê yên li wargehê jî di vê rasteke de tevdigeran û di xebitin kû her qismê civakê bisazî bikin. Ji ber vê nêzîkatiyê, saziyên wargehê gelikbûn. Jixwe eyalet ligor herêmek xweser hatibû tekûzkirin. Gelê wargehê destûr ne didan ti hêzên ji derve tevlî karê wan yê navxweyî bibin. Saziyên xwe jî ligor xwe bixwe rêvebirênê rêkxistin kiribûn. Jixwe jêdera bingehîn ya ne li hev kirina gelê eyaletê, rayedarên UNHCR, PDK'ê û hêzên desthilatdar ev bû.

Ji mejlîsa gel bigre heta bi yêkîtiya zarokan, ji civata îslamiya Kurdistanê bigre heta bi komeleya ciwanan, rêvebirtî û komîteyên semtan, çapemenî, nexweşxaneya gel, hêza xweparastinê, asayîş, dibistan û bi dehan saziyên din hatibûn avakirin. Navend, rêvebertî û rêvebirnameya her saziyê hebû. Hevpeymanek komanî ya eyaletê hebû û hemî sazî û dezgehên eyaletê girêdayî wê rênameyê tevdigeran. Qadroyên rêvebirtiya wan saziyan dikin, wekû rasthatî ji nav komana eyaletê hatibûn hilbijartin û wekû dihat hîvîkirin di karên xwe de ne hostabûn. Ji ber vê şagirtîtiya kadroyên rêvebirên saziyan, sazî ne dibûn sazîmankar û di aliyê rêvebirin, sazkirin û pêşxistinê de kêm diman. Ji ber tevayê van bandor û sebeban, saziyên dabaşa gotinê ji hedefên dihatin xwestin pir dûrbûn û kor û kulek dimeşîn. Heta mirov dikare bibêje, carnan dibûn sedemê pêşketinên berevajî.

Sazî, bi kadroyên sazkar dibin sazî û dikarin bi erkê xwe re rabin. Kadroyên sazkar jî dema tê xwestin nayên gihandin. Pêvajoyek dirêj, holek serbest û bi perwerdeya mamostayên pispor derdikevin holê. Bi vegotinek din, avanîbûyînek zêhnî dixwaze. Li gor nirxandinên giştî û daneyên zanîstî gelik faktorên sebeb hene. Ji van sedeman çend jê evbûn: yêk; avana eyaletê gundîbû û ji sazîbûyûnê pir xerîpbû. Ev biyanîbûyîn tenê ne bi gundîtî, an jî bajartiyê ve girêdayîbû. Gelê Kurd, yê bi sedan saleye bindest û hingî ji serdestan hatî bê rêxistin hiştî, di sazkartî û rêvebirintiyê de ji şagirtan jî wêdetir pir ecemîbû. Rastiyek bijan jî be lê mixabin, di serî de di qada xwe rêxistinkirinê de û pir qadên siyasî de hewldanên serdestan biqasekî biser jî ketibûn. Kesên rêvebir xwe û saziya rêvebirê wê mucid ne digirtin. Mînak; di nav kurdan de qedrê zanînê pir tê gotûbêjkirin ema, em nikarin wê zanînê bi Kurdî xeyal

bikin.

Ya duyemîn; êrîş û erdhejên dijminanbûn. Ji roja karwanê koçberan derketî rê û pêve rojane her endamê wargehê dibin gefa mirinê de bû. Ne tenê gef dixwar, di heman demê de dihat kuştin jî. Van êrîşan, fik kirina demê pêş û tevna civakî tarûmar dikir. Mirovê çavê wî li kêloyek arê xelkêbe, nikare xwe azad hîs bike. Hedefa sereke ya qût û xweyî derketina UNHCR, ne têgînek mirovî, kedîkirina kûviyên azadbû.

Ya sêyemîn; wekû zêhnî û hizrî avana civakî ya wargehê biyanî û ecemiyê xwe rêkxistinkirinêbû. Ewan xwe rêkxistinkirin di forma eşîrtî, baviktî û xizmîtiyê de digirtin dest. Ji bû ev valetî û şagirtîtî were derbazkirin, TAK'ê kadroyên xwe rêdikirin wargehê. Ema, ji sedemên çandî, civakî, zimanî û pir sedemên din kadroyên dihatin jî kêm diman û wekî dihat xwestin têrê ne dikirin. Wekû mînak; perwerdevanê gel yê herî navdar Yaşarê Turk bû. Navê wî li sere, turk bû û Kurdî nizanî. Li aliyên din, ji komana avana eyaletê pêktanî ji %84'ê zilaman û ji %90'ê jinan Turkî nizanîn. Ev nakokiyek yemanbû û ji derveyî îstîsna di hemî saziyan de rewşên wisa hebûn.

**Rib Aydîn- Ez Axa**

Piştî di navbera PKK'ê û PDK'ê de agirbest hat ayankirin, ji bû li hevhatinê şandeyên PKK'ê dihatin û piraniya wan serdanek li Eyaletê jî dikirin. Ligor wext û keysê xwe carnan ji tevayê gel, carnan jî bi teybet ji saziyan re civîn lidardixistin. Endamê komîteya navend ya PKK'ê Xelîl Ataç hatibû û dixwest ji mamostayên dibistanan re civînekî lidarbixe. Avana mamostayên di demek kurt de not kes derbaz kirîn, piraniya wan nûbûn, tenê xwendin û nivîsandina turkî dizanîn û wekû mamosta lingên wan ji hewa ve bû.

Ligor daneyên ne fermî û mîsoger, asta xwendin-nivîsandinê di nav zilaman de eyaletê de ji %8, 9 derbaz ne dikir. Di nav jinan de çaryêka vê hêjmarêbû. Hêjmara yên di dibistanên turkan de amadeyî qedandîn tiliyê destekî derbaz ne dikirin. Yên navîn jî qedandîn ne ji vê hêjmarê pir cudatirbû. Yên din, piraniya wan an li gund dibistana seretayî xwendibûn, an jî ji der ve fêrî xwendin- nivîsandinê bibûn. Ji avana mijara gotinê, jin û mêr têkel not mamosta hatibûn hilbijartin. Li aliyê din, kesên wekû mamosta hatîn erkdarkirin jî ne di encama lêkolîn û çavdêrtiyek pisportî de hatibûn kifşkirin. Piraniya wan li ser pêşniyaran hatibûn girtin û li ser kesên dabaşa gotinê lêkolîn û çavdêrtiyek baş jî nehatibû pêşxistin. Hê wêdetir, carnan ji bû rêvebertî ji hin derdorên xwe ji karên rêxistinê dûr digrin mamostayekî peydabikin, mal bimal li

kesek bixwendin-nivîsandin digeran. Ankû pir caran kes ne ligor jêhatina xwe ya kesî, ligor feydeyên rojane yên parastina wargehê dihatin erkdarkirin. Evê jî qelbîtî li qelbîtiya heyî zêdetir dikir.

Asta zanîna mamostayan ligor xwendina wan ya dibistanên turkan dihat pîvandin û zirt ji hewa ve difirîn. Hemabêje şahidnameya kesî tinebû û wey li wî yê asta xweya xwendinê bilindtir bide diyarkirin. An jî bê astîtiya xwe ya heyî veşêre. Mela, yên bixwendin-nivîsandin, yên dibistana seretayî xwendîn û yên din hatibûn komkirin û wekû mamosta, mudûr hatibûn biberjengkirin.

Ebabekîrê wî bixwe jî dibistana mamostatiya turkan xwendî, yê ji wê avanê re civîn çêkiribûya. Xwidê dizane **Xelîl (Mehmet Aslan)**'ê rêvebirê giştî yê dibistanan, di guhê Ebabekir de hin tişt pistpisandibûn.

Şevbû û baranek xwanavî dibarî. Avana mamosteyan li çadira çand û huner ya bi bin girkê Vira re kom bibû. Li gor hêjmara mamosteyan xîbet piçûkbû û di kon de kursî tinebûn. Mamosta, di çadirê de wekû du rêz li pişt hev jipiya rawestabûn. Wekû mamosteyan cara yêkêbû di astek jor de civînek ji wan re dihat lidarxistin û her kesî di serê xwe de ka yê çi bêje amade kiribû. Kelecanek ne asyî avan pêçabû û dibêjîqey leşkerên ecemî yên artêşa Turk li beramber serfermandar sekinîbûn. Û Ebabekir ket di hundir de. Piştî silavek germ, kêmekî di hola nîvê ya wale hatî hiştin de çû û hat zelamê bi bejin û bal. Di bin dûvikên çavên xwe re avana pileya dawî ecemî û bi kelecan bi çav re derbaz kir û bi awazek rexnegir got;

"Hûn rib aydîn (çaryêk rewşenbîr)in" û li ser teybetiyên kesên perwerdevan û ziravtiyên perwerdekirina mirovan kêmekî axivî.

Ji nişkan ve ji Menafê Kurê Seîdê Geverî pirsa; "navê te çiye" kir û li ser pirsgirêkên perwerdê û pedegojiya zarokan çend pirsên din jî lêkirin. Zor, bela Menaf bela Ebabekir jixwe vekir û jixwe bûrand. Zilamê di bin sakoyê belek yê leşkerî de destek cilên gêrîla bejna wî ya dirêj di xemilînin, çavên xwe li kesên pir bi tirs disekinin, xwe pir di ser hev de diqumişînin digerand. Berê xwe da Ehmedê Şirnexî û bi dengek sehwdar got;

"Tu heval?"

Ehmedê bejna wî ne ji ya Ebabekir kêmtir, sohrbû, hişînbû, gotin di dev de xirabû û bidengek bilind got;

"Ez axa!" û nikarî dawiya gotina xwe bîne.

Mamostayên di rêza pêş de, bi derdê îfadeya xwe amadekirinê ve mijûlbûn û keysa bikenin peyda nekiribûn. Lê di rêza paş de hin kes, bi dengek nivz beşişîbûn. Ema kesê herî zêde û bê endîşe bi vê gotinê kenî, bê goman Ebabekir bixwe bû.

Piştî Ehmet bêhnek kûr kişand, hat ser hişê xwe Ebabekir got;

“Tu ji kûyî?”

Ehmet bersîva ‘Şirnex’ da û Ebabekir destpê kir;

“Hûn hevalê Meshûdê kor yê Şirnexî nas dikin. Piştî bîst û pênç salên gêrîlatiyê di rexnedayîna xwe ya dawî de got; “Sedemê tevlîbûyîna min ya gêrîla, ez bikevim di cihê Axayê Sohr de.” We Şirnexiyan çi ji axatiyê fêhm kiriye kû hûn evqas şewityê wêne.”

Û heya ji nîvê şevê du demjimar derbazbûn Ebabekîr, dikara xirabiya axatiyê kir û avan jî jipiya mabû.

“Ez Axa”tiya Ehmet, di nav avana mamosteyan de bibû mijara mereqê

Eslê meselê ev bû; Ehmet, ji gundê Biryana Şirnex bû. Ji sedema malbata wan feqîrbû û mal û milkê wan li gund tinebû bi demê re koçî navenda bajar kiribûn û li wêdê bibû qersonê çayxanê. Derfetên dibistanê bixwîne peyda ne kiribû û zarokatî û ciwantiya wî di karên solbendî û qersontî yê de derbaz bibû. Ji wêdê jî tevlî jiyana koçberan bibû. Ehmedê Şirnexî, bixwendin- nivîsandinbû û li ser pêşniyara xwe bibû mamsota. Di vedana çadiran de û ji bû çêkirina bilokên ax mirovek bidest û pê û xwirtbû û ji bû vê qedrek yê wî jî li cem Xelîl hebû. Di zêhniyeta rêxistinî de her çiqas têgîna axatiyê hatibe mehkumkirin jî lê, di nav civakê de forsek ya wêya veşartî jî hebû. Pir kesên dûr, nêzîk têkîliya wan bi axatiyê re tine jî ev berjeng wekû razek rakêş di hundirê xwe de hiltanîn.

Biteybet di nav avana mamostayan de Ehmet, îdîa dikir kû “ew ji malbatek axa tê û sedemê herî kifşker yê xwe di karên pratîkî de dide pêş, xwe rizgarkirina ji têgîna axatiyê ye.” Ya ji hemiyê balkêştir, kurê gavanê gundê Biryan bixwe jî bawer kiribû kû kurê axê ye. Ehmet, dilxwede xwe ji wê civînê re baş amade kiribû û di xwesta bi kuçekî du çûkan bêxe. Hem li cem rêkxistinê axatiya xwe fermî bike û hem jî bide diyarkirin kû ew gihatiye wê asta kû xwe ji axatiyê rizgar bike. Demek dirêj li ser, ‘ka yê çi bêje’ dihizire û bi peyva axatiyê ve komsantre dibe. Kengê Ebabekir bi dengê xwe yê sehwdar, pirsa “tu heval” dike, ew peyva di bin hişê wî de bi cêhbûyî ji nav lêhvan difelite.


### Eyaleta Şehît Jiyan di Dorpêça MÎT’a Turk de ye

Giyayê li derdora eyaletê hêdî hêdî diqemitî û bi rengek zerîn xwe dinixwimand. Dewsên lehî û şapan bi toza lingên hemwelatiyên wargehê dihatin nixwimandin û tîrojên rojê germahiya xwe didan hîskirin. Çeperên pêşmergeyên eyalet pêçayîn bê wate mabûn û çûyîn û hatina Gara ji her demî bêhtir çêdibû. Pêşmergeyên li

hember hevretiya Kurdên eyaleta Şehît Jiyan û gêrîlayên Azadiya Kurdistanê neçar mayîn û ne karîn di navbera wan de bibin sênc, bi kîn û hêrsek hê mezintir nêzîkê gel dibûn. Her êrîşa pêşmergeyan rê ji serhildanek nû re vedikir û her nêzîkatiya şaş dibû sedema çalekiyek cuda.

Ji bû pê debara zarokên xwe bikin tiştek li dora gel ne hiştibûn. Pêşmergeyên Partiya Demokrat her tiştên wan talan kiribûn. Rayedarên UNHCR jî bi çavên mihacirên asayî li koçberan ne dinêrîn û qûtê didan têra tiştekî ne dikir. Ji bû gel bikaribe debara xwe bike, Tevgera Azadî li Ewropa kampanyayek ya arîkariyê dabû destpêkirin û diravên di vê kampanyayê de hatîn komkirin bi rêya endamê PKDW hatibûn wargehê. Ji bû koçberên eyaletê ji wan diravan sûdek mayînde bigrin komîsyonek avakiribûn û komîsyona hatî hilbijartin li gundên derdor çelek û pez dikirîn. Pêşmergeyan, pez û dewarên dihatin eyaletê asteng dikirin û DY jî bi israr jêdera wan diravan pirs dikirin. Heta birek pez diket eyaletê de, an jî nexweşek diçû doktor bi dehan civîn dihatin lidarxistin û piraniya wan cîvanan jî bê encam diqedan. Civînên rêvebirên eyaletê, berpirsên DY û PDK'ê rekor şkandibûn û dîsa jî biqasî misqala zir pêşketin  ne çêdibû. Berde ew civîn bi xwe re erêntiyekî bînin, di dawiya her civînê de êrîşên bosevanan dijwartir dibûn. Jinek ya eyaletê ji bû çêleka xwe diçû piştiyek pûş, pêşmergeyan pûşê wê di şewitand û têr lêdan dikirin. Bi destûra waliyê Duhokê tirimpêlek ya koçberan ber bi bajar ve ji wargehê derdiket, pêşmergeyan bi rê ve heqaretên mezin li rêvanan dikirin û tirimpêl bi paş ve dizivirandin. Li nav bazara di navbera her du derbendan de ciwanên eyaletê digirtin, li wan didan û carnan jî di revandin. Her roj heqaretek ya pêşmergeyan û li beramber wê jî protestoyek ya gelê eyaletê pêkdihat. Hêza eyalet dorpêçkirî fermanên xwe ne ji walî, qaymiqam û berpirsên din yên PDK'ê digirtin. Fermanên walî û yên din li cem wan çerxiyek jî ne dikirin û ji ber wê jî ti civîn û hevdîtinan encam ne digirt.

Li gel hemî neyîntiyan saziya dilxwede mirovparêz UNHCR, amadekartiyên qampek mayînde dikir. Sê, çar şirketên pêgir amadekartiyên çêkirina xanî û binesaziya eyaletê dikirin. Heta despê kiribûn jî. Dîsa wekû cara yêkemîn bi navê UNHCR, nasname li hemwelatiyên eyaletê dihatin belavkirin. Li aliyê din lehiya televîzyonvan û rojnamevanên ji her çar aliyên cîhanê ber bi eyaletê ve dewam dikir û eyaleta Şehît Jiyan di cîhanê de deng vedida. Van pêşketinan zeravên dewleta Turk û hevkarên wê yên xwecih diqetand. Dewleta Turk, bi bin banê Dewletên Yêkbûyî de wekû fermî û mayînde bi cêhbûyîna eyaletê wekû serkeftina PKK'ê dinirxand û hevxebatkarên xwe yên li Başûr têxistin tevgerê.


UNITED NATION
HIGH COMMISSIONER
FOR REFUGEES

REFUGEE IDENTITY CARD

SEQ. NO: DHK- 2856
NAME: Ahmed Taher Azdamir
NO. OF FAMILY MEMBERS : 2
DOB : 1972 SEX : ☒ M ☐ F
REGISTRATION NO: 2482 RANK IN REGISTRATION: 1
PLACE OF ORIGIN : Shirnakh ☒ HOF ☐ SPOUSE ☐ OTHER
COUNTRY OF ORIGIN ID CARD (IF AVAILABLE):
SIGNATURE:

***Yêk ji mînaka nasnameya cara destpêkê ji aliyê saziya UNHCR ve ji hemwelatiyên eyaletê re hatî amadekirin.***

***Ahmet Tahir Özdemir, di dîroka 10.06 1996'ê de ev nasname li Eyaleta Şehît Jiyan ji saziya UNCHR girtiye.***

PDK ya mala Berzanî jî di şerê dawî de wundahiyên mezin dabûn, hêz wundakiribû û ne dixwest dubare bi PKK'ê re were himber hev. Ema hevsarê wê di destê MÎT'a turk de bû û bi kû ve dixwest bi wê ve dikişand. Bi awayek ne fermî MÎT'a Turkan Başûr dagirkiribû û wekî dixwest hespê xwe dibezand. Biryarên li ser eyaletê dihatin girtin rêvebertiya Başûr derbaz dikirin û PDK, tenê bibû piyonê pêkanîna wan biryaran. Jixwe kengê li Ankara, an jî li Silhedîn; Amerîka, Turk û PDK dicivîn gelê eyaletê xwe ji êrîşek nû re amade dikir. Wan cîvînên sê alî ber didan qedera eyaletê. Bê guftûgo, saziya UNCHR jî biryarên siyasî yên ji wan civînan derdiketin pêktanîn.

Yêkê şeva nehê heyvêbû. Şevek zîz û zelal ya meha Hezîranêbû. Ji hemwelatiyên eyaletê Xalid Muhamed û Adem Ehmedê Şeladizî nobedarên derbenda eyaletêbûn. Pazdeh kesên çekdar bi derbenda PDK'ê ya eyaletê re ketibûn hundir û ji xafil ve dor li nobedarên eyaletê girtibûn. Hêşedarên dergahê eyaletê gerew girtibûn û avêtibûn ser mala Hemîdê Şeladizî. Jin û zarokên Hemît desteser kiribûn û bi rêya hatîn re revandibûn. Li gel hemî serîlêdan û hewldanên komîteya karê jiderve û xizmên kesên hatîn revandin, rayedarên UNHCR xwe ne lepitandibûn. Li ser gef û xwe ne razîkirina TAK'ê, piştî du rojan PDK'ê kesên hatîn revandin serbest berdabûn.

Di hemwextê êrîşên PDK'ê de UNHCR'a mirovyar û mişhetparêz jî dest bi mihane û hêncetên xwe kiribû. Gotinek ya me Kurdan heye, dibêje; "Barê hêncetan girane." Ji her liv û tevgerek ya koçbran, ji her nav lêkirinek û ji her avakirina saziyekî re hêncetek dafirandin. Destpêkê hênceta 'mejlîs û komîteya birêvebir ya qampê ji aliyê PKK'ê ve hatiye destnîşankirin û ji aliyê me ve ne rewaye' avêtibûn holê. Di encama gotûbêj û civînên dûvdirêj de biryara 'komîteyek nû ji aliyê gel ve û di çavdêrtiya DY û PDK'ê de were hilbijartin' hatibû girtin. Piştî girtina vê biryarê rojekî, bûyera revandina mala Hemît qewimîbû.

Di heman wextî de, rêvebirê qampê yê UNHCR Abdorehman Îsa got;

"Dewleta Turk, bi îdîaya di qampê de amadekartiya vekirina radyoyekî tê kirin, dibistan û nexweşxaneyên leşkerî hene û ev qampek leşkerî ye, me tengav dike û em dixwazin li cihên goman ji wan tênkirin lêgerînê pêkbînin."

Rêvebertiya eyaletê ev daxwaza rayedarên UNHCR bê dudil pejirandibû. Dîsa bi hênceta "em çaverêyê rêvebirê DY yê Bexda yê ne" lêgerîn di paş de dabûn. Bîst û çarê Hezîranê Rêvebirê DY yê Bexda Abdulah Arif, yê qampê Ebdorehman Îsa, berpirsê PDK'ê Hesen Şilî, Dawut Baxistanî û gelik rayedarên din yên xwecih li cihên goman jê dikirin gerabûn û gomanên wan pûç û derew derketibûn. Piştî vê bûyera lêgerînê çar rojan, biryara hilbijartinek nû û rakirina bêtêla mezin wekû fermî hatibû ayankirin.

Piştî hemî hêncet û mihaneyên wan vale derketin, balefirên Turkan ketibûn di dewrê de û berê xwe dabûn eyaleta Şehît Jiyan. Hemabêje her roj çar-çar, şeş-şeş, heşt- heşt bi hev re bi ser eyaletê re nivz difirîn û li raser malan dengê xwe berdidan. Dîsa heman jetan pimpomokên agir berdidan cihên têr pûş yên rexê Eyaletê û agir pê têxistin. Ji ber dengên jetên Turkan perda guhan û hinavên zarokan di teqan û rayedarên DY jî tenê temaşe dikirin.

Roja dawî ya heman mehêbû. Ji bû gotûbêjkirina bûyer û rûdanên diqewimin, şandeyek neh kesî li Duhokê bi Serokê PDK'ê Meshûdê Berzanî re hevdîtin pêkanîbûn. Di wê hevdîtinê de Serokê PDK'ê, bi zimanek vekirî soza rakirina dorpêçê, hatin û çûyîna serbest û ewlekariya eyaletê dabû. Piştî hevdîna bi Meshûd Berzanî re du rojan, beyaniya zû heşt balefirên Turkan bi awayek pir nivz bi ser eyaletê re firîbûn û li raser malan dengê xwe berdabûn. Pimpumokên agir avêtibûn û agir berdabûn dora eyaletê.

Dewleta Turk, tenê bi firindina jetan sînordar ne mabû. Jixwe ji Tebaxa sala bûrî ve, bi quntra û nûkerên xwe wargehên koçberan dorpêç kiribû û zûlm û qirkirinek di dîrokê de kêm hatî dîtin meşandibû. Piştî wekû fermî biryara hilbijartina Rêvebertiya

Eyaletê hat girtin, hartir û çavsohrtir bibû.

Bi vê pêvajoyê ve girêdayî xeleka xiyaneta navxweyî êxistibûn tevgerê. Bi berbanga beyaniya çarê heyva Tîrmehê re Osmanê Îsivê Ziravikî, sê kurên wî û sê malbatên din yên xizmê wan li tirimpêlên xwe siwar bibûn, dabûn ser hêşedarên dergehvan û revîbûn cem derbenda pêşmergeyan. Di nîvroya heman rojê de, çar malbatên din yên xizmên kesên nav bûrîn jî ji eyaletê revîbûn û teslîmê pêşmergeyan bibûn.

Di wê salê de û biteybet piştî dorpêça eyaletê kêmekî sist bûyî û çûyîn hatinê destpêkirî, nêzî du sed malabatên ji Bakur koçber bûyîn tevlî eyaltê bibûn. Li gel vê, kite mitên bi desteka PDK'ê û quntrayên turkan revîn jî hebûn. Ema bûyera Osmanê Îsîvê Ziravikî, ji van qewmînan cûdabû. Têkiliyên vê malbatê û dewleta Turk kûr û dûr dixwiyan. Delîlên van têkiliyan jî evbû; şewata par derketî û di encam de sed û heştê û du mal şewitîn, ji mala kurê Osman, Saleh destpêkiribû. Hingê bi teybet karmendên DY israr kiribûn kû "ev şewat bi zanebûn û ji qestî hatiye derxistin". Ji ber vê israr û pesartina wan, di navbera komîteya gel û wan de devjeniyên bêtam jî derketibûn. Heta çadir nedabûn mal şewityan û gel embarên wan bi kutekî valekiribûn. Ev bûyer bibû sedem kû demekî saziya UNHCR xwe ji eyaletê vekişîne.

Di heman roja ev malbat revîn de, ji kamarayên TV yên turkan re digotin;

"Me par ji qestî û bi fermana MÎT'ê qamp şewitand!"

Dîsa ev malbat ji aliyê MÎT'ê ve bi awayek teybet hatibûn pêşwazîkirin û yêkser derbazî Bakur kiribûn. Ev bûyera wekû "xiyaneta Osmanê Îsîv" di dîroka karwanê koçberan de hatibûya qeytkirin.

Pir eşkere û vekirî dihat dîtin kû dewleta Turk, bi dijwartî li dijî hilbijartina Mejlîsa Eyaletê derdiket û ne dixwest wekû fermî mejlîsa koçberan were hilbijartin. Ji ber kû heke hilbijartina dabaşa gotinê hatibûya kirin, di qada UNHCR de rêvebertiya eyaletê fermî dibû û turkan ev qebûl ne dikir. Li ser zexta dewleta Turk, UNHCR û PDK ji biryara xwe zivirîbûn û dixwestin hilbijartin were betalkirin. Di roja xiyaneta Osmanê Îsîv qewimî de, bi hênceta 'artêşa Turkan ya eyaletê bombebaran bike' PDK'ê derbend û kozikên xwe yên dora eyaletê valekiribûn û UNHCR jî karmendên xwe ji qampê revandibûn.

Ew UNHCR û PDK ya ling didan ser koçberan û bi awayek lezgîn hilbijartinek dilxwede azad dipesartin; vê carê jî digotin; "heke hûn hilbijartinê betal nekin, di wargehê de qirkirinek mezina çêbe û berpirsê wê jî PKK ye."

Li gel hemî gef û çavtirsandinên dewleta Turk û şantajên

rayedarên UNHCR û PDK'ê, şeşê heman mehê gelê eyaletê hilbijartina dabaşa gotinê pêkanîbû. Ji bû komîteya pazdeh kesî, pêncî û çar kes berendam derketibûn. Di heşt semtan de sandoq hatibûn danîn û dengdayînê ji heştê sibhê heta pêncê êvarî ajotibû û 4625 deng hatibûn bikaranîn. Di heman şevê de deng hatibûn hijmartin û encama hilbijartinê ji cihên eleqeder re hatibûn şandin.

Bi xêra 'dewlet Turk ya eyaletê bombabaran bike', PDK ya mala Berzanî kozik û derbendên eyalet bosekirîn û rayedarên UNHCR jî navenda xwe berdabûn û revîbûn. Di çeper û navendên wan de cin direqisîn û koçberan hefteyek azad derbaz kiribûn. Di wê holê azad de bûyerek jan-kenok qewimîbû. Bi navê Ehmet, zarokek yê Hesenê Qulabî hebû. Ehmet, zarokek kêmek jixwe zêdebû û di eyaletê de wekû dîn dihat pênasekirin. Piştî PDK û DY ji tirsa bombardima turkan revîn û sê, çar rojan ne zivirîn Ehmet, xîbet û kozikên pêşmergeyan şewitandibûn. Ev bûyer jî bibû pirsgirêkek mezin. PDK, bi îdîaya "we bi zanebûn çadirên pêşmergeyên me şewitandine" rabibû ser lingên paş.

Bi hilbijartina mejlîsa eyaletê re şerê dihat zenkirin kêmekî sistbûye, dubare gur bibû. Rêvebirê DY yê Bexdayê û yê qampê bi şandeyekî ve hatibûn eyaletê.

Gotina Abdulah Arif ya destpêkê;

"Ji aliyê me ve ti rewatiya komîteya we hilbijartî nîne. An hûnê hijdeh çadirên kesên revîn (Osmanê îsiv û kesên pêre revîn) teslîmê me bikin an jî ezê karmendên xwe ji qampê bikişînim."

Li aliyê din, dîsa nûkeran zend û bendên xwe ji dizî, girtin û talanê re hildabûn. Çend ker û hêstirên ji ber talana wan felitîn û li derdora eyaletê diçêrîn, ji aliyên pêşmergeyan ve hatibûn revandin. Jinên ji bû piştiyek pûş derdiketin ji derveyî eyaletê, dihatin hingavtin û kesên bi destûra wan bixwe diçûn Duhokê dihatin girtin. Di heman rojê de çar balefirên Turkan jî kirinên xwe dubare kiribûn.

Gelê eyaletê, bi mîsala "ji banger mezintir di ser çûkê de nayê" bi awayek asayî jiyana xwe didomand. Xwe hê bêhtir rêxistin dikir û sazî û dezgahên xwe mezintir dikirin. Cejn û sersalên xwe bi gêwil û coşek mezintir pîroz dikirin û bîranîna pakrewanên Rojiya mirinê jî bi vê coşê hatibûn derbazkirin.

Li gel hevdîtin û diyaloqan, meş û çalekiyên protestoyî jî bê navber tajotin. Hijdehê heyva Tîrmehê bi daxwaza rakirina derbend û çeperên eyalet dorpêçkirîn, serbest derketin, dawî anîna revandina hemwelatiyan û firîna balefirên turkan; demjimar dehê beyanî heta şeşê êvarî bi hezar kesan li pêşya navenda DY çalekiya rûniştinê hatibû pêkanîn. Dîsa ji bû daxwazên dabaşa gotinê ji DY û PDK'ê re daxwazname hatibûn pêşkêşkirin.

**Civata Îslamiya Kurdistan (CÎK)**

Di eyaletê de navendek ya CÎK'ê ya hatî diyarkirin tinebû. Jixwe daxwazeka wan ya wisa jî ne çêbibû. Berpirsê CÎK'ê Mele Evdorehmanê Xendekî bû. Wekû xwezayî piranî meleyên li eyaletê endamên wê civatêbûn. Mele Evdorehman, kesek yêxtiyarbû û li derdora Cizîra Bohta bi welatpêrazî û zandartiya xwe bi nav û dengbû. Di nav koçberên eyaletê de jî qedrek yê wî yê diyar hebû. Bê malbat, ji ber dewleta Turk revîbû û ji destpêka wî karwanî ve li wargehêbû. Melayek demokrat û di aliyê ilm û zanînê de rewşenbîrek dagirtîbû.

Bi şandeyek ya hemwelatiyên wargehê re par çûbû Qada Rêbertiyê. Wekî tevayê endamên şandeyê, Serok APO ew jî bi qedrek mezin pêşwazî kiribû. Di dema embargoyê de û di rewşa heyî de jî têkiliyên wî bi Îxasa îslamiya Duhokê re başbûn û birêya wan têkiliyan pir caran îslamiyan ji qampê re arîkarî anîbûn. Dîsa wekû rêhspî û ilimdarekî, di navbera koçberan û PDK'ê de navbeynkartî dikir û di wî aliyî de jî rolek ya wî ya baş hebû.

Ev kirin û hewldanên Melê, di nav melayên civatê de bibû sedemê gazindên zikêşiyê. Çend melayên zikêş serê bazkê dijber kişandibûn û li dijî Mela Evdorehman qampanyaya reşkirinê dabûn detpêkirin. Mele Evdorehman, bi ajantiya PDK'ê hatibû tewambarkirin û rapor li ser raporan ji Rêxistinê re şandibûn. Berpirsên eyaletê Şahîn û Ararat jî destek dabûn qampanya ya dabaşa gotinê û benê Mele Evdorehman kişandibûn. Di dawiya dawî de berpirsên TAK'ê yên Gara, Xelîl Atac û Ariyê Başûrî û di heman demê de wekû rêxistin eyalet girêdayî wan bû, hatibûn qayîlkirin û fermana girtina Mele Evdorehman hatibû dayîn. Ji aliyê berpirsê hêza xweparastinê Araratê ji Başûrê piçûk ve ferman hatibû cêh û Mele Evdorehman û Mele Nûredînê Şirnexî hatibûn bin çav kirin û rêkiribûn qada Gara (26.07.1996).

Mele Evdorehmanê Xendekî û Mele Nûredînê Şirnexî, bi tewambartiyek rûreş hatibûn sûncdarkirin û ketibûn ber lêpirsînê. Rastiya sûnçdartiyên hatîn pêşxistin pir kêmbû û di nav koçberan de ne hatibû bawerkirin. Jixwe di encama lêpirsîna li Gara hatîkirin de jî bê gunehiya wan hatibû îspatkirin. Piştî Rêber Apo bi vê bûyerê dihesê, rexneyên giran li berpirsên qadê dike û pêşniyara, "Mele Evdorehman û hevalê xwe herin Hewlêr û derdorê îslamî birêkxistin bikin" dike.

Mele Evdorehman mirovek pir yêxtiyar, dil nazik û sefîbû. İlimdartî û welatparêziya wî qedrek di nav civakê de çêkiribû û ev tewambartî û girtin di ser milê xwe de nebiribû û ji Hewlêr revîbû û çûbû Zaxo. Bi vî awayî serîwena Mele Evdorehman ya koçbertiya wargehan jî qedabû û deftera wî hatibû girtin. Hemwextê girtina

Mele Evdorehman, di wargehê de Cıvata Îslamiya Kurdistan jî qedabû.

***

Hêzên hegemon, dagirker, nûker saziya mişhetyar UNHCR jî dabûn rex xwe û bê eman êrîşî koçberên alîgirê PKK'ê dikirin. Aligirtiya Mafperestan bibû tewanek mezin û ne dihat bexşandin. Komikek mirovên mihacir di pehnava Etrûş de hatibûn asêkirin û çep û rast li wan didan. Têkiliyên koçber û UNHCR, têkoşînek bê eman û bi hev re bûyînek têr nakokbû. Kuştin, girtin, talankirin, revandin, civîn, diyalok, nasname dayîn, xanî û binesazî avakirin tevlî hev bibûn û diçû. Carnan zirav dibû û te digotqey haxta biqete û piştî rojekî jî dibêjêqey ev gel heta bi rizgariyê li vêdê mayîndebû. Pênaseya 'têkilheviya her tiştî' ne mezinkirinekbû ema, sekna gelê eyaletê safî û zelal dixwiya.

Ji bû gel bikaribe debara xwe bike wekû arîkarî TAK'ê kêmek dirav ji eyaletê re birêkiribûn. Komîteya birêvebir ya eyaletê jî ji gel komîsyonek hilbijartibû û ji gundên derdor pez û çêlek krîbûn. Heywanên mijara gotinê li malbatên pir mûhtac hatibûn belavkirin. Malbatên pez li wan hatîn belavkirin, bi dorê şivantî dikirin. Wê rojê (29. 07. 1996) dora şivantiyê ya Ehmedê Fehîma ya Hilalî (Ehmet Kara) bû. Du, sê kêlomitreyan Ehmet, li Rojavayê eyaletê ji aliyê kesên nayên zanîn ve hatibû qetilkirin. Ber bi êvarê heman rojê ve kelaşê Ehmet anîbûn eyaletê û roja paştir bi girseyek mezin şîna wî hatibû lidarxistin. Li ser vê bûyerê gelê eyaletê komîteya PDK'ê protesto kiribû û rêvebertiyê eyaletê têkiliyên xwe bi PDK'ê re qut kiribûn.

Tîrojên rojê pehnava Etrûş dikelandin. Dibin tozê de çadirên gewr, bi rengek şêlo hatibûn nixwimandin. Şazdeh hezar mihacirên di wî quncikî de hatîn asê kirin, di nav çadiran de wekî mûriyên hêlîn xirabûyî diqijvijîn. Zarokên xas û daw qetayî, li ser rêya têr toz berdidan hev û li ser girê xîza ji bû çêkirina xaniyan anîn xwe serqulîfatî dikirin. Dayikan koçxane danîbûn ser tebaxên ji bêhna qazyaxê dil diqeliqandin û amadekartiyên şîvê dikirin. Evdilayê dîn, li cem çadira dibistana Mehmet Kurt sekinîbû, berê xwe bi ezmanan ve kiribû û peyvên nayên fêhmkirin bi lez didan ser hev. Zarokên gotinên zilamê dîn mereq dikirin, çember fireh avêtibûn û guhê xwe kiribûn sêl. Komek zarok li derê kulika televîzyona Şehit Cûma kom bibûn û Elî Qopê Aloşî, ji wan re pêşketinên dawî dixwendin.

Elî Qop;

"Îro hêzek boş û mezin ya Partiya bizin diz, êrîşek mezin anîn ser kerek yê eyaletê. Di encama şer û cengek mezin de du

pêşmerge li rîxa kerê boz şemitîn, çar pêşmerge hatin kuştin û herî kêm du car ewqas jî birîndabûn û kerê qehreman bi silematî vegera baregiha xwe. Silav û rêz.”

Elî Qopê şhet û aqil kêm, her roj ji zarokan re bidevûka Goyîkî pêşketinên siyasî û eskerî yên dawî dixwendin û ji zarokan çepkek mezin digirt. Ne tenê zarok, carna bi sedan kes li Elî Qop kom dibûn û bi ken û zewqek mezin guhdarî nûçeyên wî dikirin.

Elî Qop, kurê Seyniyê Tahirê Aloşî bû. Bi qasî dihat zanîn, çar kur û sê keçên Seynî çêbibûn. Keç hemî saxlembûn û kur hemî seqetbûn. Ji kuran Emer, ji yên din baştibû û rihet li ser xwe digera. Yûnis û Ico li erdêbûn û Elî jî şehtbû ema dikarî rabe ser xwe. Ev ciwanên Felek li wan hatî xezebê, li gundek li nav sera çiyan jidayîk bibûn û derfetên çûna nexweşxaneyekî jî peyda nekiribûn. Laşên wan pêşneketibûn, Ico û Yûnis nikarîn peyvan çêkin û Elî jî hem bi zorê birêve diçû û hem jî peyvên wî qut û seqetbûn. Dê û bavê wan jî nexweşbûn û keça malê ya bi navê Feyziya li hemiya dinêrî. Feyziya, jinek gewr, gir û spehîbû. Hemî xwezgîniyên xwe redkiribûn û xwe fedayî birayên xwe yên seqet kiribû.

***

Her kû roj ber bi Rojava ve dişemitî, tîrojên wê bê bandor dibûn û mereqdarên girkê Viran jî hêdî hêdî hildikişan meskenê xwe. Bi çavên xwe yên mereqdar û di nav dêmên têr qermîçok de wekî cirnikan li wan hatîn, tirimpêlên pirkêt û xîzê dikişînin dihijmartin. Bazara di navbera her du derbendan de û ji çadirên bê merîs pêkdihat, sûka pertala ya erebên Sêrtê tanîn bîra mirov. UNHCR, qûtê mehê anîbû û kîsên ar li ser bêrzanê di nivî semta Şehîd Karker de avêtibûn ser hev. Komîteyê semtê Mehmûdê Kadûnî, navê semtvanan ji rêzê ve dixwend û her kiyê dora wî dihat li gor hêjmara helefa qûtê xwe dikişand, datanî ser milê xwe û ber bi çadira xwe ve diteyîzî. Qerebalixa derdor û tîrojên tavê serê Mehmûdê keçel gêjkiribû û dibêjîqey ew zilamê gir û bilind bi zorê jipiya disekinî. Alî Dursun, Ararat, Evdoyê Mijînî, Ebûzêtê Dêrhînî, Merwanê Dudêrî, Îdrîsê Şirîşeyî û bi çend milîsên din ve valetiya di navbera semta Şehît Salîhe û Şehît Cûma derbazkirin û ketin di kolika hêza xweparastinê de.

Li wî warî, li wê eyaletê her tişt awertebû û piştî deqeyek din çiya biqewimiya, kêyê hatibûya kuştin ne diyarbû. Tiştek ne kifşbû û jiyan ber bi ne kifşbûyînê ve bi hemî awertetiya xwe diherikî. Jîndarên biqasî toxmê mirov zû fêrî merc û holên awarte bibin kêmbûn û dibêjîqey mirovên wî karwanê asê jî zû fêrî wan mercan bibûn. Ji bû mirovên komanên di mercên asayî de jiyan dibin,

jiyandina wê jiyanê qet û qet jî ne mûmkûnbû. Lê were û bibîne, ew komika mirovan di du salan de wisa fêrî wan mercan bibû kû her tişt li wan asayî dihat.

Ligor erdhejên derbazbûyîn eyalet, di rewşa xwe ya herî bihîvî de bû. Ji bilî UNCHR çar kompanye di dewrê de bûn û bi hewarî xanî û binesaziya eyaletê ava dikirin. Ji rêzê ve nasnameyên bi mohra UNHCR hatî kutan li hemwelatiyan belav dikirin û di cîhana gewrik de êdî nasnameyek ya wan jî çêbibû. Qût û pêwîstiyên din birêkûpêk dihatin û ji bû çareserkirina bitevayî rakirina boseya li ser eyaletê jî hevdîtin li ser hevdîtinan dihatin lidarxistin. Heta wekû cara destpêkê, şîr li zarokên dibistanan belav dikirin, çadir derman dikirin û birêkûpêk beytaran lawirên eyaletê qontrol dikirin. Li aliyê din, şande li ser şandeyan ji derveyî welat mêhvan dihatin eyaletê. Ji Cenewreya navenda mihacirên cîhanç bigre heta bi PKDW'ê û ji her çar aliyên cîhanê televîzyonvan û rojnamevan dirijan eyaleta Şehit Jiyan.

Dema eleqe û pêşketinên mijara gotinê dihatin hesibandin, hîviya mayîndebûna Etrûş bi mirov re pêş diket. Ema, li aliyê din jî qetilkirin, revandin û boseya quntrayan jî tiştek ji dijwartî û leza xwe wunda ne kiribû. Bûyer, serpêhatî û pêşketinên dawî du salên bûrî, bi karwanê koçberan baş dabû fêrkirin kû nakokî kûrbûn û ava wî gelî û wê sîstemê di coyekî de ne diherikî. Ya sîstema heyî dipesêre koçberan nikarî bi pejirîne û ya koçberan jî dixwest, bi hêsanî sîstemê ne dipejirand. Nakokî û têkoşînek yemanbû û ya çi bi xwe re anîbûya ne diyarbû.

**Bayê Nû**

Li gor salnameya Newrozê di roja pazdehê Tebaxê de bayê nû werdigere. Dar ji nû ve tirh didin û xweza dubare xwe nû dike. Hewa hûnik dibe û bandora germahiya havînê kêmtir dibe. Avên qelp dicemidin yên esîl germ dibin. Di rastiyê de salnama Newrozê sêdeh rojan li pey salnama Mîladî ye. Ema bi demê re û bi bandora Cejna Vejînê, di têgîna gelê Kurd de her du bûne yêk û ji bû gelê Kurd pazdehê Tebaxê rojek bixêr û bêre. Li gel hemî zor û zehmetiyan ti caran cejn, sersal û bîranînên netewî ne dihatin paşguhkirin û di mercên herî ne xweş de cejn û bîranînên netewî bi coştir dihatin pîrzokirin.

Dîsa kelecana Cejna Vejînê eyaleta Şehît Jiyan pêçabû. Di serî de saziya Çand û Huner, tevayê eyaletê di nav seferbertiya amadekartiya pîrozkirina cejnê de bû. Li derê navenda Çand û Huner, dike hatibû amadekirin û bi deqeyekî rêzgirtina şehîdên azadiyê re cejnê destpêkiribû. Pêşkêşvana bejna xwe ya narîn bi

kirasê Kurdî xemilandî, Hevseroka Eyaletê Leyla Wanî (Filîz Arslan) vexwend ser dike. Jina esmer û ciwan, li ser wate û girîngiya rojê, pêşketinên siyasî û xebatên li eyaletê axaftinek kurt kir, dike teslîmê koma Medya ya muzûkê kir û daket xar. Piştî koma Medya, dîlana xwendevanan amadekirî û herî dawî jî koma Penaber derket. Piştî çend stranên şoreşgertî, dîlanê destpê kiribû.

Di cejnên wargehê de ya herî xweş û bi kelecan dîlana gelbû. Dibêjîqey bi dehan pispor û mamostayên dîlanê wargehî li ser coreyên dîlanê perwerde kirine û eyalet dikeyek mezin yê Rêberaha dîlanêbû. Bi dehan gêrên govendê dorvedabûn û bê goman govenda gêra wê mezin Goyîkîbû. Wekî dîlana kulekan direqisîn; carekî xwe hiltavêjin, li ser lingê rastê dikulînin û gevekî bi pêş ve diçin. Colemêrgiyan milên xwe bi bin hev re kiribûn, cixara xwe dipêçan, sohbet germkiribûn û bi hemdê xwe çepikî bi rê ve diçûn. Heke mirov bêmafiyê neke; dîlana herî ezîz, rind û navdar ya Batûyanîbû. Bi teybet dema jin û zeriyan wan milê hev digirtin û dawa kirasên kurdî bi heman ahengê çep û rast dihejan, temaşevanên xwe mest û serxweş dikirin. Gelê Kurd, di xwezaya xwe de gelek çandî û huneriye. Ev ji girêdan û hejêkirina wî ya jiyanê jêder dibe. Ema bawer bikin, reqsa Batûyan lotkeya wê hunerêbû. Heke di nav coreyên reqsên kurdan de rêznavek bihata çêkirin, bê şik Batûyanî yêkemînbûn.

**Xwezan**

Şevên eyaletê her tim tarîbûn. Trûskên ji fanosokên Helefa dirijan di kulekên piçûk yên çadiran re daleqayî diman. Lê, heman tişt ji bê dengiye re ne dihat gotin. Dengê şevê bilindbû û yê xîbetên paçik bilindtirbû. Dengê giriyê zarokan, yê lingên hêşedaran û yên hevjînên bi hev re devjeniyê dikin ti carî kêm ne dibû. Jixwe dengê guleyên pêşmergeyên eyalet bosekirîn, hemî deng di bin xwe de dihiştin.

Wekû eşkere derketin û ketina wargehê hê jî qedexebû. Lê, gelê wargehê rojekî jî ev qedexe nas ne kiribû û şev ji dizî ve di nav çeperên pêşmergeyan re ref bi ref derdiketin û bi heman awayî jî dizivirîn. Dîsa kesên ji Hewlêr bi tirimpêlan dihatin, li ser rêya qîr ya bi pişta eyaletê re derbaz dibe peya dibûn û ew jî ji dizî ve derbazî nav malan dibûn.

Derengê şevêbû. Bajor bi hemî nazdartiya xwe diherikî. Keziyên hûnik rûyên hemwelatiyên Şehît Jiyan diferikandin û derbaz dibûn. Mihacirên ji germa derî û kulekên çadiran vekirî hiştîn, di bin rohaniya fanosan de bê minet nivistîbûn. Reşên sê kesan bi nav çadirên semta Şehît Cûma re daketin jêr û bi gavên sivik pêş diketin.

Bi hev re sohbet dikirin ema bi dengek nivz taxivîn. Hamabêje bejin û bala du kesan wekî hevbû û yê din kêmekî ji wan dirêjtir dixwiya. Yê dirêj çend gavan li pêş dimeşî û yêkser berê xwe dabûn çadira Merwanê Gabarî. Destê xwe li stûna hêsin ya deriyê çadirê dan û bêkû çaverêyê bersîvê rawestin derbazî hundir bibûn.

Hozan Serhat û Serbestê Xaranî ji Hewlêr dihatin û wekû rêber jî Merwan çûbû pêşiya wan. Di nav çeperên pêşmergeyan re zikxirkî ketibûn di wargehê de û hê jî pûş û pelaş bi singa wan ve bû. Gabarê malîvan, ji dengê mêhvanên şevê kutekî çavên xwe bel kiribûn, pala xwe dabû çelteyê leşkerî yê di şûna balgeh de bikartanî û dibêjîqey hê jî di xewnek şîrîn de bû. Serbest, li rex Gabar rûnişt;

"De rabe çayekî, xwarinekî amade bike. Qey em ne welatparêzin, hey min riknê te qulibandî" got û kenî.

Bi kenandinê re, bi hindama dinanên wî yên ketî re şkefta devê wî xwiya û ji nişkan ve devê xwe da hev. Pêrar di çalekiya li ser baregiha romiyên Turk ya gundê Zivinga Hacî Eliyan de gule di bisfinga li ser milê wî de teqabû û dinanên wî yên pêş hemî firandibûn. Ew ciwanê eşqî ken, êdî ji ber dinanên xwe zêde ne dikenî û hewlidida bilez dinanên xwe bide çêkirin. Jixwe armanca wî ya çûyîna Hewlêr jî ew bû. Jiber bûyera dagir kirina Hewlêr, neçar mabû zû bizivire.

Hozan Serhat, bi awrên xwe Gabarê çav lixwe nîşan kir û got;

"Rehabîlîte bûye" û bigotina xwe re ji kena zik û pişt bibû. Piştî kenê wî şemirî dest bi wateya vegotina wê bêjeyê kir;

"Dema ez ji Ewropa zivirîm, Hevalê Ebas got;

"Hûn li Ewropa rehabîlîte bûne û ji bû qirêja Ewropa ji we here divê hûn xwe bi heft avên welat bişûne. Lê, ya dixwiyê divê Gabar xwe bi heşt ava bişû."

Gabarê niyeta wî ya rabûnê na xweyê, çavên xwe gemişandin û got;

"Rewşa Hewlêr çawabû? Min îşev di Radyo BBC de guhdarkir; Emerîka bîst û heft sarox li Bexda dane."

Xwezan Serhat;

"Dîsa PDK'ê ya li xwe dihat kir. Pêr pêşmergeyên PDK'ê bi artêşa Êraqê re ketin di bajar de. Pêşmergeyên YNK yên revîn, jixwe revîn; yên şerkirîn di bin paletên tangên artêşa Êraqê de hetin gêrekirin. Niha li ser kelha Hewlêr ala Êraqê liba dibe."

Serbest;

"PDK, ji bû berjewendên xwe yên hizbî ti rêgezan nas nake. Dikare bi her awayî bi hemî dijmin û dagirkeran re bitifiqe û di heman wextî de jî bêbextiyê bike."

Merwan;

"Gotûbêjek ya min û hevalê Gabar li geliyê Qiyametê nîvçe mayî hebû. Heke xewa we newe, ez dixwazim bi arîkariya we wê gotûbêja nîvçe mayî timam bikim."

Xwezan Serhat;

"Niha xewa me nayê. Lê, bila ne biqasî dûvê rûviyê axayê Şirnex be!" û hemî bi hev re kenîn.

Merwan;

"Di dîroka Kurdan de, yê bi awayek bê qisûr xiyanet û dîroka xiyanetê şîrovekirî Rêbertiye. Dibêje; "xiyaneta Kurdan, ji destpêka dîroka şaristaniyetê û bi xwilamkirina rastiya jinê destpêkiriye û xiyanet li Kurdistanê wekî banevank[49]ê ye."

Xwezan Serhat;

"Heke hûn ji min bipirsin; Destana Gilgamêş, vegotina serhatiya vê xiyanetê ye."

Merwan;

"Belê. Jixwe ya ez jî dixwazim gotûbêj bikim eve. Dema mirov bi zêhniyetek Apocîtî destanê dixwîne, rastiya hatî hûnandin xweştir dibîne. Ew sêtî ya lehngtiya destanê dike; Namtara, Girgamêş û Enkîdo. Jixwe kurdbûyîna her du yên din mîsogere lê, ligor min Kurdîtiya Girgamêş jî gotûbêjê bixwe re nabe. Hem wateya navê wî û hem jî serpêhatiya jiyana wî vê vekirî datîne holê. Ya ji hemiyê girîngtir jî hemahengiya kirinên vê sêtiyê ye.

Xwezan Serhat;

"Jixwe di destanê de vekirî tê gotin; Namtara, ji Welatê Arata dîl hatiye girtin. Ankû hemşehriya min, ji Serhadê ye. Di hin jêderan de navê wê wekû Tehiptilla jî derbaz dibe."

Merwan;

"Belê. Lê dema qirika Kurdî tê berçav girtin, Namtara bêhtir nêzîkê rastiyê dixwiyê.

Îhtîmalek mezin, çîrokek wisa ya Girgamêş jî heye. Ew jî xenîmeta şere û zarokê dê û bavek Kurdên hatîn qetilkirîne. Heke bala we kişandibe, kevin û nûtiyê di nav hev de bi Namtara didin jiyankirin. Hem serxatûna perastgiha Înana ye û hem jî navgîna kedîkirina dijmina ye. Rolek wisa du çeqil pê didin leyîstin. Dîsa rastî ne wekî di destanê de tê vegotine; ya Girgamêş amade dike û ji Kîşê dibe Uruqê jî dîsa Namtara ye.

Ankû bi jina hatî dîlgirtin mêr kedîkirin û bi mêrên ji cewherê wan hatîn valekirin jî Kurdistan fetandin."

Xwezan Serhat;

"Biremandina te, Kurdistan fetandine."

Merwan;

---

49 Bûkelemon.

"Na. Heke fetandibûna, Rêberên wekî Serok APO û xwezanên wekî we ne derdiketin. Ema, dikarîn jandartiyek bê eman jî bi me bidin jiyankirin."

Dengê stûr yê Mele Mustefa yê Mijinî û yê ziravê Mele Eliyê Silivî tevlîhev bibûn û banga sibhê didan. Di navbera dengê wan de bê ahengiyek ewqas sik hebû û dibêjîqey her yêk dixwaze dengê xwe li ser yê din bêxe. Serbest û Gabar bergeşa taştê danîbûn.

Serbest;

"Gotûbêj xweş û bi feydebû. Dev û hişê we saxbe. Ema, birastî jî heta bi Qesirka Gêlî dirêjbû."

Gabar;

"Kuro, nixwe bêje qutiw (qutbî)."

Hemî bi hev re kenîn û dema Xwezan Serhat gewdeyê xwe yê kêmek tijî û girover ber bi bergeşa xwarinê ve di xirikand Merwan got;

"Gotûbêja me li vêdê bidawî nebû ye. Emê şevek din dibekû li warek din, banevanktiya xayîntiya Kurd û cenga di navbera stiyên Stêr û xwidayên hemdem de gotûbêj bikin."

Serbest;

"Te got: qampek din? Bixwidê zanyar, em hew dikarin bar bikin. Tu dibînî, Enkî û Enkîdo yên hemdem ji me re qesran ava dikin û nasnamyan têxin di berîkên me de. Yên rêyên me qîrûzivt bikin. Li gor nûçeyên girkê Viran; yên ji seyê Sîso re jî şampo bînin."

Merwan;

"Ev cenga di navbera Stêr û Mardoqan de ye. Rayên wê di kuratiya dîrokê de veşartîne. Nakokiyek yeman û şerek bê emane. Wisa bi çêkirina kuxikekî, an jî bi hevdîtina bi ezbeniyekî re çareser nabe."

Hemabêje roj gihatibû cihê danûpeza. Tîrojên li berojê çiyayê Şêxan didan, wekî kana duran xalxalok têxistin singa çiyê û di şûn de vedidan. Wekî qetên elmasan trûsk ji pelçimên darberûyan diçûn û zeraqa rengan tanî holê. Tenûrokên ji rojê dirijan bandora xwe wunda kiribûn û bayê sivik diherikî bêhna Peyîzê bi xwe re tanî. Kelha Etrûş, kozikên hêşedarên sûrha Babîl tanîn bîra mirov. Karwanê tirimpêlên cîp yên bitîpên mezin UN li ser tenişta wan nivîsandî, tozek xeniqandvan di ser civata girkê Viran de barand û li derê navenda UNHCR li hev zivirî.

Ala UNHCR ya bi dibistana seretayî ya Mehmet Karasungur ve liba dibû serkerat dikir û rîşiyên ji derdor felitîn paçê hişîn mezintir kiribû. Kelecana erkdarên cêh nîşa tirimpêlên pirkêt barkirî dikirin, ji hejandina destên wan diyar dibû. Dengê li hevketina pirkêt û tampêra tewixî, dinanên wan di sîqandin û bi şûn ve direvîn. Bi hewarî xaniyên koçberên eyaleta Şehît Jiyan dihatin çêkirin. Li aliyê

din, ji her çar aliyên cîhanê kûjan rojnamevanî kamara xwe digirt berê xwe dida wê eyaletê. Mîsoger ji bû zêhniyeta desthilatdar evder ne asîtan û ferwarbû. Ema eyaleta Şehît Jiyan, navdar dibû û ev jî ne nîşanên xêrêbûn.

Çêkirina xaniyan ji dergahê eyaletê destpêkiribû. Dora ewil ya Bilehî, Şirîşeyî, Nêrwehî û Ziravikiya bû. Êdî ji xîbetên piçûk, peritî û hertim ji şewatê re amade rizgar dibûn. Vê jî keyf tevlî şadîtiya wan dikir û hewla hewşa xaniyên xwe fireh bigrin didan. Ji ber kû êdî kengê dilê wan bixwaze nikarin cihê mala xwe biguherin. Ji nişkan ve qêr li milê jor yê rojhilatê semta Şehît Cûma ketibû! Jixwe hîs û refleksên gelê eyaletê pir hişyarbûn û dema bûyerek ji rêzê jî diqewimî her kes bi wî alî ve dibezî. Dîsa wisa kiribûn û ji semta Şehît Êrîvan jî mirov berbi cihê herkes qestê dike ve dibezîn. Di rastiyê de kesî nizanî çi diqewime lê, dengê zarokekî jî têra lezandina wan dikir.

Karzanê Şîrîşeyî û Hedwanê Bilehî, ji ber tengahî û firehiya hewşê şerê hev dikirin. Destpêkê şer, ji jin û zarokan destpêkiribû û bipiştre zilam jî tevlî bibûn. Zendê wan badayî, sike di destên zendbadayî de çend ciwanên Bilehiyan ji dûr ve temaşeyî devjeniyê dikirin û çaverêyê keysekîbûn tevlî şer bibin. Jixwe ji bû şerê gundîtî Şîrîşeyî li serê govendêbûn. Komîte, rêvebir, cîran, dost û nasan berevantî dikirin û ji bû şer mezintir nebe xwêhdanek tîr dirijandin.

Kef bi lixabên Hedwan ketibûn û ji bû gewdeyê xwe yê gir ji lepên beravanan rizgarbike hemî hêza xwe bikartînî. Tiliya xweya stûr, dirêj û wekî rotikekî bi ser serê berevanan re li Karzan dihejejand û dijûnên mêr pê tên kuştin dikirin. Li milê din, rewşa komika mirovên Karzan girtîn ewqas ne zorbû. Lê, ya dihat bîrê wî jî texsîr ne dikir.

Hedwan;

“Kuro, min serê xwe ji dewleta Turk re ne tewandiye. Min serê xwe ji bavê xwe re ne tewandiye. Qey ezê serê xwe ji seyên wekî te re bitewînim Kero?  Qey bîra te nayê romiyên turkan ji mala te dernediketin. Tu îro ji min re bûyî welatparêz ne?

Na, heval na! Min berdin yan ezê li vê qampêbim yan jî Kero” digot û tipikên kefa ji devê wî dibeyîn wekî taviya baranê di ser dêmê berevana de dibarî.

Karzan;

“Kuro Hedo, bizanibe tu kurê kêyî. Qey ez te nasnakim. Heval, siyaneta min ji we re heye ema, min berdin. Ez dikarim kurê xwe ji bû we serjê bikim lê, ez nikarim neheqiyê qebûl bikim” û pê devzendka xwe ya qetayî xwîna bi devê xwe ve paqij dikir.

Kupalê wî di dest de, hile hil li ser dila ketî, hevserokê eyaletê Sînanê Sohr ji nişkan ve derket holê;

“Karzan, Hedwan heval ma hûn şerm nakin? Armanc û merema we çiye û ev rewşa hûn ketînê çiye” got û bi gotinên xwe re jî ket di navbera her du komikên berevan de.

Bihatina Sînan re xof û kelecana navbeyvanan daketibû û xwe ji şerkeran kêmekî dabûn aliyekî. Her du şerker di holê de bê star mabûn û awrên wan li erdê dinêrîn. Rewşa wan kambaxbû û xwîna ji serê keçel yê Hedwan diherikî ji erzena wî dilop, dilop dadiketin erdê. Serê şûtika şerkeran li erdê kom bibû, bedena şapikên wan vekirîbûn û ji xwêhdanê pirça singa wan ya belek şilûpil bibû. Ciwanên ji dûr ve labûteyên sikeyên xwe nîşa hev dikirin jî ji hev belav bibûn û her kes ji aliyê xwe ve ji çavan nependî bibû. Bi vexwendina rêvebir û bi arîkariya berevanan her du şerker jî di nav de civatek mezin li serê wê milkê girêdabûn. Piştî kêmek nazdartî û xwe girankirinê, destên hev yên dilerizin girtin û rûyê hev yê bixwîn maç kirin û herkes zivirî kolika xwe.

***

Destpêka meha du ya peyîzêbû. Pisîkên peyîzê ji hewa ve li hev diketin. Hewa hûnik, xwe baştir dida hîskirin. Êdî bêkû xwêhdan ji serê pozan biherike koçberan li ber siha çadirên xwe civat digerandin. Wekî ji berya mehekî, wecha tebaxan xwêhdan di serûguhê kevaniyan de ne tanî xar. Dabaş, dabaşa xaniyanbû. Avahiyên ji du mezel û eywanokek piçûk pêk dihatin rojeva eyaletê dagirkiribû û yên dora wan dûr, kûr kûr dihizirîn. Dihezidin yên xaniyên wan qedayîn û tenê ji bû dîtina xaniyan diçûn serdana wan. Malbatên ji çadiran rizgarbûyîn û derbazî xaniyan bûyîn, ji malbatên hê di çadiran de ne pesnê û wesfê xweşiya xaniyan didan û ji metihdayînê têr ne dibûn. Piştî derbazî xanî bûyî du rojan, Fatê ya Kalikî çû serdana cîrana xwe Asya Zorvayî û got;

“Xwêkê birastî jî nizanim hûn çawa di van çadirên bê merîs û piçûk de jiyan dibin?”

Piştî dirêj dirêj pesnê xweşiya xaniyê xwe kir, kitana dirêj li devê xwe pêça û devê xwe bir ber guhê malîvana xwe.

“Xwêkê tu jî pê agahdarî ev demeke kurikê me û keçika Hesenê we haj hev hene. Ji ber kû di nav meselê de dilketin derbaz dibe, Hesen xwe giran dike. Me camêrên ji we neçêtir avêtin ser berika wî û ne ji dil jî be pejirand. Îşev emê herin next vebirê û em bitirsin barê me giran bike. Di vê rebentiya mihacirtiyê de, ma emê ewqas dirav ji kû bînin. Vêca em dizanin, qedrê birayê Evdo li cem Hesen zehfe. Evdilayê me got: “Heke ew jî were emê pir minetê jê hilînin.”

Fatê, dengê xwe nivztir û devê xwe nêzîktir kir;

"Tu dizanî, heval ji next acizin. Bavê keçkê gotiye; "Heke heval bibihîzin min next standiye, ez keça xwe nadim we. Ji ber wê, devê birayê Evdo girtiye û biteybet em ji ber wê dixwazin were."

Malîvana ji pesnê xanî yê mêhvana xwe aciz û kêmekî dilmayî bûyî, bi dengek tevzdar got;

"Ma çima nebe. Ez di şûna Hesenê totak de bûma minê keça xwe belaş dabûya we. Ma bi dest kî dikeve ji van çadirên peritî rizgar bibe û bikeve di qesran de!"

Ji bû next vebirinê, bi tarîtiya şevê re xwezgîniyan devê çadira Hesen kutabûn. Ji bû heval pê ne hesêne xwezgînî boş ne hatibûn û jixwe ev daxwaza bavê keçkê jî bû. Mamê Keçikê yê mezin Evdo yê Haciyê Evdo yê Mijînî, di paşiya çadirê de çarmêrkî û bavê kurik li tenişta wî bi awayek perçiqî û şermokî rûniştibû. Pişta Hesen li stûna lûle ya devê çadirêbû û dêmê wî ji her demî tirştirbû. Dengê mîratên çadiran bilind vedida û ji bû cîran ne bihîzin herkes nivz taxivî. Mîrana dayika keçikê, bi dildarî erkê hêşedartiyê girtibû û bi dora çadirê re çar dizivirî.

Ji ber kû dînarên esîl yên Êraqê û lîreyên Turk bê îstîkrarbûn, nextê bi doloran hatibûya vebirîn. Bazarê ji sê hezar dolar destpêkiribû. Buhayê hatî vebirîn diyarkiribû kû bazara çêtîn derbaz bibe. Xatirê mam û birazî, xalo, xaletê, mihacirtî, feqîrtî, totakî, rebentî û Evdo yê Haciyê Evdo ketibû di navberê de û bi şertê heval ne bihîzin, li ser 1150 dolarî li hev hatibûn.

## Civîna Ankara

Roja dawî ya Cohtmehê bû. Li pehnava Etrûş zivistanê qenc destpêkiribû û barana Peyîzê bê navber dibarî. Çadirên kevin û peritî yê çawa wê zivistanê xwedeyên xwe bisitrînin, tu kesî nizanî. Yên sitargeha wan çadir bi kul û xembûn û gotin ji keyfa xweyî xaniyan re ne dihatkirin. Nûnerên Amerîka, Îngilîz, Turk, PDK û YNK li Ankara civiyabûn û mijara sereke, eniya hevpar ya li dijî PKK'ê û aşîtiya di navbera YNK'ê û PDK'ê de bû. Şertê destpêkê yên dewletên beşdarvan 'ji bû her du partiyên Kurd bikaribin li hev werin û aştiya wan mayînde bimîne; divê li dijî PKK'ê eniyek hevpar vekin û şer bikin'.

Vedan û bandora vê civînê, ji berya hemwelatiyên eyaletê gihatibû erkdarên PDK'ê yên li dora wargehê. Di cêh de hêlwesta xwe ya neyartî vegerandibûn dijminatiyê. Civîna Ingîlîzan serkêşiya wî kirî, ya bi xwe pir tiştên nû anîbûna û ji bertekên destpê yên PDK'ê diyar dibû kû ev hevîrê hê pir avê hilîne.

Roja yêkemîn ya piştî civîna Ankara bû. Berpirsê PDK'ê yê derbenda eyaletê Şukrî, endamê PKDW Zubeyîr Aydar û endamên

şandeya li hevhatinê ya PKK'ê Mahir û Robar du demjimaran li derê eyaletê rawestandibûn û gef li wan xwaribûn. Dîsa roja wê di şopîne de heman kesî doza rakirina derbenda gel ya eyaletê kiribû û gefên kuştinê li endamên asayîşa eyalêtê xwaribûn. Roja din, du tirimpêlên pez yên ji gelê eyaletê re hatîn, dîsa ji aliyê Şukrî ve hatibûn vegerandin. Di heman hefteyê de rêvebirê UNHCR wekû lezgîn daxwaza vegotina jêdera diravên pê pez tê kirîn kiribû û di heman civînê de PDK'ê pesartina xwe ya rakirina derbenda gel ajotibû. Li aliyê din PDK'ê, hatin û çûyîna mêhvanan ji derveyî zagonan ayan kiribû. Heman piştî wê qaymiqamê Etrûş, daxwaza civînek lezgîn li komîteya eyaletê kiribû.

Zilamê şaşik sohr û zikmeşk, destên xwe bi hev ferikandin û bi hêlwestek tevzbarkirî got;

"Dewleta Turk dixwaze bi komîteya koçberan re hevdîtinê çêke."

Rewşa te digotqey ber bi erêntiyê ve diçû, wekî bi kêrê were birîn qut bibû û bi leza fîşekê vajî dibezî. Rayedarên UNHCR û PDK'ê, hêlwesta xwe ya jixwe kambax dijwartir kiribûn. Yazdehê meha Mijdarê, rayedarên UNHCR tevlî civîna wan bixwe daxwaz kirî ne bibûn û civîn hatibû betalkirin. Piştî civana hatî betalkirin du rojan, şivanên eyaletê ji aliyên kesên çekdar ve hatibûn şelandin û îzakirin. Şazdehê heman mehê di serî de Azadê Geverî û du ciwanên din li derbenda PDK'ê hatibûn hingavtin.

Van êrîşan sebra gel û rêvebertiya eyaletê fûrandibû. Ji komîteya rêvebir Sînanê Sohr, Elî Dursun û çend kesên din çûbûn derbendê û asayîşa PDK'ê tehdît kiribûn. Eyaletê, ne tenê PDK tehdît kiribû; di heman demê de têkiliyên xwe yên bi UNHCR re jî cemidandibûn û wekû resmî ev biryara xwe ji wan re jî ragihandibû. Şûr ji kalanan hatibûn kişandin û devê şûrên dibiriqîn ji hewa ve direqisîn. Dîsa Rêbertî gihatibû hewarê û ragihandina 'qutkirina têkiliyan' rexne kiribû. Heman roja piştî wê komîteya rêvebir ya eyaletê civînek awerte lidarxistibû, fermana Rêbertiyê 'ya rawestandina têkiliyan rexne dike' hatibû xwendin û têkiliyan dubare destpêkiribû.

Têkoşîna di navbera hêzên desthilatdar û gelê eyaletê de, ya dibêjîqey kêmekî vesekinîbû dubare bilez ketibû. Hemî alî derbazî pozîsyona êrîşê bibûn û eyalet jî derbazî rewşa awerta ya xwe parastinê. Her kes bi leza fîşekê tevdigera û ava serê eyaletê ji zû ve hatibû kuç kirin. Bûyera herî balkêş û ya her tişt vekirî datanî holê, guhertina rêvebirê UNHCR yê qampêbû. Rêvebirê UNHCR Muhamed Arifê nû hatî bi lezgînî guhertibûn û di şûna wî de kesek turkê Azarî yê binavê Niyazî erkdar kiribûn. Roja Niyazî hatî qampê eşkere gotibû;

"Ez ji bû belavkirina vê qampê hatime erkdarkirin."

Dîsa Niyazî yê xwe wekû turkek neteweperest dide naskirin û turkîtiya xwe bi ser hertiştî re digirt lêkiribû;

"Ji UNHCR re belavokek ya dewleta Turk hatiye û em dixwazin vê belavoka dabaşa gotinê li qampê belav bikin."

Dawiya heyva dawî ya demsala Peyîzê bû. Roja hijdehemîn ya salvegera damezrandina PKK'ê bû. Gelê eyaleta Şehît Jiyan, bi kelecanek kînbarkirî rijabû dikeyê li binya girkê Viran. Pîrozbahiya dazdehê rojê destpêkirî bi bernameyek dewlemend barkiribû. Ji rêvebirên eyaletê Elî Dursun, ji endamên PKDW Nîzametîn Toxoç û Dr. Sîrac Bilgin axaftina siyasî kiribûn. Bi êvara dereng re pîrozbahî qedabû û fesla govendê destpêkiribû.

Li ser vegotina rêvebirê turk ya belavoka dewleta Turk, meclîsa eyaletê ji bû kifşkirina mercên xwe yên vegerê di heman şevê de raporek amade kiribû. Lê, Niyazî bileztirbû. Roja piştî pîrozkirina hijdehemîn salvegera damezrandina PKK'ê, rêveberê Saziya parastina koçberên eyaletê yê Dewletên Yêkbûyî û dilxwede berpirsê giştî yê ewlekariya qampa Etrûş, bi refek çekdar ve bi şêwazê karwan ketibûn di eyaletê de. Ji dergahê eylatê destpêkiribûn û belavokên dewleta Turk yên 'koçberan vedixwîne Turkiye' çep û rast reşandibûn.

Tîr ji kevan derketibû û koçber rabibûn serhildanê. Di navbera semta Şehît Salîhe û girkê Viran de, gel pêşî li karwanê Niyazî birîbû. Karwanê ji tirimpêlên DY pêktên, dibin barana keviran de mabû. Gel rêya revê girtibû û kesên di tirimpêlan de bi linçbûyînê re rû birû mabûn. Heta rêvebertiya eyalête bipêre gihatibû, tirimpêl bibûn qafik û wekî şirikê xwîn di serê Niyazî yê mezin de hatibû xarê. Bi vê serhildanê re hêzên PDK'ê yên eyalet bosekirîn ketibûn tevgerê lê, zû ji biryara xwe vegerabûn û li ser dûvê xwe rûniştibûn. Êrîş kirina eyaletê û qirkirinek vekirî hêrs, hêst û hêlwesta wan derbaz dikir. Ji ber kû PKK li çiyayên jorbû û hewldanek ya qirkirinê dihat wateya destpêkirina şerek nû. PDK ya hê bi YNK'ê re aştî mîsoger ne kirî, dubare şerê bi PKK'ê re ne digirt çav.

**Dibistana Navîn**

Pehnava Etrûş, bibû meydana têkilî û nakokiyên yeman. Dibêjîqey cîhan bibû du alî, aliyek di eyaleta Şehît Jiyan de hatibû bosekirin û aliyê din hicûm dikir. Her alî ber bi armanca xwe ve dibezî û li hevkirina wan ji ne gengaztiyê jî wêdetir ne mûmkûn dixwiya. Aliyê desthilatdar hewldida saziya herî piçûk ya eyaletê jî belav bike û koçberan bê ser û ber bihêle. Li hember vê hewldanê, koçberan jî bi israr û biryar saziyên xwe mezintir û xwirtir dikirin û

her roj saziyek nû li xwe zêde dikirin.

Xelîl Ruhayî, zilamek bejin navîn, navser û ji sikan jî ne dihat hesibandin. Pora hemiza nîv binîv spî bûyî, nîvê eniya wî dinixwîmand û her tim cilên Hevalan werdigirtin. Gêrîlayek kevin û zane yê Partiya Karkerên Kurdistan bû. 1989'ê li Cizîra Bohta hatibû girtin û piştî sê salan hatibû berdan. Di pergala dewleta Turk de jî mamostatî xwendibû û ji wê sedemê bi destpêka wargeha Şehît Azad re ji bû xebatên dibistanê bipêş bêxe hatibû wargehê. Wî û Delala biberçavka qet kurdî nizanî, bi hev re rêvebertiya dibistanan dikirin.

Nîvro nû wexirîbû û zivistanê jî baş destpêkiribû. Xelîl, qumçeyên sakoyê xwe heta bidawî dadabûn û sto yê wî di nav pistoka sakû de wunda bibû. Ew û Delal ji dibistana Dr. Nûrî Dêrsimî derketin û yêkser berê xwe dan dibistana navîn ya Şehîd Jiyan. Dawa kirasê Delalê li ba dibû û kutekî bileza Xelîl re digihat. Di deriyê hewşa ji dergînkekî pêktê û rûyê wî bi betaniya helefan hatî nixwimandin  re ketin di hewşê de. Dengên mamostayan ya ji dersdayînê bêhtir dimîne xîtabek bişewat, tevlîhev dibû û bi ser çadirên reş diket. Yêkî xwendevanek ne tebitî didarezand, yê din dikara pîvanên welatparêziyê dikirin û dengê xwendevanên rabûyîn ber depên reş. Ji bû balê belav nekin Xelîl û Delal, bi ser xîza ji bû hewş nebe herî reşandîn re hêdîka birê ve diçûn û li derê rêvebertiya ji paç û maçan hatî çêkirin rawestan.

Dibistana navîn, ji çar çadirên reş yên şemala wan ji hev cuda û ji kolikekî pêk dihat. Ji bû refên ji çadiran pêktên kursî û mêze hatibûn peydakirin ema, ya wekû kolik dihat pênasekirin ev şans bi dest ne êxistibû. Jixwe ya balkêştî li wê dibistana balkêş bardikir jî ew refa "2A" bû. Ji darên spîndar qerqodeyek hatibû çêkirin, ev qerqode bi betaniyên helefa hatibû nixwimandin û ji bû dilop neke, qetek naylon bi sere hatibû kişandin. Ji bû xwendevan li ser rûnên, ji rêzê ve û bi şêwazê derînceyan sing di refê de hatibûn kutan.  Singên pêş kurt û bi rêzê ve her kû ber bi paş ve diçû sing bilindtir hatibûn bicêhkirin. Spîndarên stûratiya wan du zendan derbaz nakin, di nîvê re hatibûn şeqitandin û bi bizmaran li ser serên wan singan hatibûn bicêhkirin. Xwendevanên kelaşgir li ser kursiyên paş dirûniştin û li gor giratiya bejnê rêz berbi pêş ve dihat. Li aliyê Rojava yê kolikê beşek piçûk bi betaniyan hatibû veqetandin û evder jî rêvebertiya dibistana Şehît Jiyan bû.

Di eslê xwe de ew berhem, ew hêsar ya Xelîl bû û her kû dihat wê dibistanê, ji temaşekirina berhema xwe ya bê hemsal têr ne dibû. Ji nebûnê hebûn afirandin, binyata felsefeya PKK'ê bû. Wekû PKK yekî Xelîl jî ji bû pêwîstiyên pêkanîna vê felsefê bê kêmasî bi cêh bîne şev û roja xwe tevlîhev dikir.

Dibistana navîn ya Şehît Jiyan, ji sê refên du û ji du refên yêk pêk dihat. Dema du ya sala perwerdeya 1996/97 hatibû vekirin û wekû sazî nû tevlî eyaletê bibû. Li gor asta zanîna wan, xwendevan ji her çar dibistanên seretayî hatibûn hilbijartin û wekû dibistana navîn nû dest bi jiyanê kiribû. Xwendevanên ast û temenê wan mezin, yêkser derbazî refên du bibûn û yên din jî ji refa yêk destpêkiribûn. Sed û pêncî xwendevanên hatîn hilbijartin, li ser pênc refan hatibûn belavkirin. Saziya herî nû ya Eyaleta Şehît Jiyana, dibistana navîn ya Şehît Jiyan bû.

## UNHCR'a Dewletên Yêkbûyî Xwe ji Eyaletê Vekişand

Roja nîvê meha dawî ya salê bû. Barana ew sê rojbû qet ne rawestayî wekû coyên aşan di nav xîbetan de diherikî. Badeva dijwar sing û şelîtên çadiran sist kiribûn û şilatiyê tepe repa serpûşkên wan dimêht. Şapa dijwar cihên çal vegeran dibûn bêrmkên piçûk û çadirên eyaleta Şehît Jiyan di nav wan golikan de melevanî dikirin. Kevaniyên di bin barana tavî de nan li tenorê didan, av ji guliya wan diherikî û wekî lûlka misîn di serê pozê wan de dihat xar. Dengê kuşêna peşkên li pêloxên di tenorê de diketin, warên kevin tanîn bîra kevaniyan. Ji bû pêşiya ava dayî bin çadirê bibire, zilamek rû tirş coya dora xêbetê kûr dikir. Lingê koçberê navser, li şerîta çadirê aliqî û devikî bi ser çadirê re dirêjbû. Bi birha zilamê tenik, serê şelîtekî ji cihê xwe felitî û ew aliyê çadirê daket xarê.

Tirimpêlên buha yên UN li ser tenişta wan nivîsîn û entenên dirêj bi pêşiya wan ve dihejên, bê navber diçûn navenda DY û li ser piyên xwe dizivirîn û dubare ber bi Duhokê ve wunda dibûn. Mirovên texlîtdar yên di tirimpêlan de, qet jî bi çavek dostane li gelê eyaletê ne dinêrîn. Jixwe piştî hatina rêvebirê Azarî û belavkirina belavokên turkan yên bi naveroka "werin teslîm bibin, emê we efo bikin" û bi nerazîbûna koçberan re awirên wan tûjtir bibûn. Hevdîtinên rêvebrên eyaletê yên bi rayedarên DY û PDK'ê re, hewldanên Dawut Baxistanî- yên xizmetê ji kê re dike ne diyar- meş û serhildanên mihaciran encamek dihat xwestin bi xwe re ne anîbû.

Ji endamên komîteya jiderve Hesenê Diyarbekrî û Fadilê Ehmedê Hedrîşî ji eyaletê revîbûn û xwe sipartibûn navenda DY ya bajarê Duhokê. Wan kesan di derbarê eyaletê de îtîrafên xirap kiribûn û cihê hêncetên neyaran xweştir kiribûn. Îtîrafên Hesen, Fadil, Osmanê Îsîf û derdora wî hêncetên DY xweştir kiribûn û PDK jî gurxweştir kiribû. Bi teybet Hesen, xirap bikartanîn û xirap dileyîstandin.

Di heman roja rayedên UNHCR kirt û pertalên xwe ji eyaletê dikişandin, Niyazî yê por xemor bangkiribû komîteya wargehê û

li qaymiqamtiyê civînek li ser lingan çêkiribû. Zilamê stûr û çav biçiçik, bi hêlweste kîndar vegotina; “statûya  we ya siyasî ketiye û ji aliyê UNHCR ve qamp Etrûş hatiye girtin” vegotibû (15.12.1996).

Roja piştî vegotina Niyazî, gelê eyaletê li qada Newrozê civînek giştî lidarxistibû. Hemabêje hûr û gir tevayê rûniştvanên eyaletê li wêdêbûn. Hevserokê eyaletê Sînanê Sohr, bi devoka xwe ya Torikî, axaftinek dirêj kiribû. Hedefên dagirkeran, girêdan û berjewendên nûkeran û li beramberî vê berxwedana were kirin dirêj dirêj vegotibû. Piştî wê jî govenda motîvasyonê destpêkiribû. Jixwe bê reqis berxwedan û çalekiyên Kurdan ne dihatin ramandin. Li cihê berxwedan û têkoşîn hebe, li wêdê hergîz reqs û dîlan lidarbû.

Bi qewlê Niyazî yê zirtonek, statûya siyasî ya du salan ajotî ketibû. Rayedarên UNHCR, navenda xwe valekiribûn, ala xwe daxistibûn û çûbûn. Navenda bi awayek tosin hatî xemilandin bibû cihê çalekî û civînên koçberan. Di vê navberê de koçber jî vale ne sekinîbûn û ji bû bikaribin rêvantiya xwe bidomînin civîn li ser civînan û şêwir li ser şêwirê lidardixistin. Piştî bi cêh hiştina UNHCR du rojan, di navenda DY ya hatî valekirin de bi sed û bîst kesan rojiya birçîbûyînê hatibû destpêkirin. Navenda DY ji bû kedîkirina kûviyan avakirî, vegerabû cihê protesto û berxwedana li dijî wan. Êdî awir û bal vegerabûn ser çalekiyan. Bihêjmarek kifş çalekiyek dorveger hatibû lidarxistin ema, roj bîst û çar demjimare tevayê şêniya eyaletê li derê navendêbû. Ser û binê gêra govenda çalekvanan ne dixwiya. Biryara rayedarên UNHCR, gêwilê gel û hêza wan ya têkoşînê bilindtir kiribû. Biryarên DY, PDK’ê,  dewletaTurk û an jî hêzek din ji bû wî gelî tiştek îfade ne dikir. Biryara kifşker û girîng ya TAK’ê bû. Baweriya wan bi rêkxistina wan bê dawîbû û heta rêkxistin hebe endîşeyek ya wana jiyanê çêne dibû.

Piştî paye bilindên UNHCR ji Cenewre vegotina; “statûya mihacirtiya siyasî ya qampa Etrûş qedaye û mihacirên bixwazin yên destpêkê derbazî qampa Sêmêlê bibin û ji wêdê jî derbazî Turkiye bibin” kirin, wekî teyrên kelaşan rojnamevanên Turkan berê xwe dabûn eyaletê. Destpêkê Ridwan Akar’ê bernama “roja 32”, Namik Durukan’ê BBC û bi pişt re jî NTV, SHOW, ATV, Ajansa Anadolu û wekî din bi dehan televîzyonvan û rojnamevan di nav eyaletê de li navguhê hev diketin. Ji bû dîmenê kêliya destpêkê ya teslîm bûyîna eyaletê bibe nesîbê wan bi hev re pêşbaziyek nedîdîtî dikirin.

### Rêvantiya Gara

Roja dawiya hefteya destpêkê ya sala nûbû. Dorpêça gêrîlayên Kurd ya Kêryê Reş dewam dikir û romiyên romê ji Zaxo derbazî Başûr bibûn. Li eyaletê jî rojiya birçîbûyînê ya protesto

kirina polîtîkayên UNHCR bi hemî heybeta xwe tajot. Ariyê Ji endamê komîteya birêvebir yê qada Gara, bi hewara eyaletê ve hatibû û civîn li ser civînan lidartêxistin. Ji bû pir corekirina protestoyan rêbazek nû dihat ramandin û rêbaza dabaşa gotinê li ber zayînêbû.

Şeva heftê heyva Çile bû. Tarîtiya şevê wekî konek reş daketibû ser eyaleta Şehît Jiyan. Ji bilî dengê xişandina lingan û guleyên pêşmergeyên eyalet dorpêçkirîn tiştekî bêdengiya şevê xira ne dikir. Dîlana çalekvanan jî ji zû ve betal bibû û fanos jî hatibûn vemirandin. Bir, bibir reşên mirovên çelteyên leşkerî li ser pişta wan bilind dibûn, hewşa navenda UNHCER dagirtibûn. Tarîtiya şeva Çile jî kelecana li ser dêmên rêvanên Gara ne diveşart. Ji bû pêşmergeyên PDK'ê, bi wan nehesên, bi dengên nivz taxivîn û heta ji wan dihat qet ne taxivîn.

Desteyek kaxez ya ji rêznava çalekvanan pêkt dihat di dest de Cemîlê Amedî, bi gavên dilicime ji tarîtiya şevê xwe vekişand û ji rêvanan xwest, xwe rêz bikin. Fazil Buldan, kurên wî Niyazî, Murad, Huseyn û neviyên wî li pey, ketin di hewşê de. Yên nû dihatin jî rêz digirtin û di demek pir kurt de hezar û pêncsed kes di meydana li pêşya navenda kevin ya UNHCR de kom bibûn. Cemîl, ji rêzê ve dest bixwendina navan kir û her kêyê kû navê wî dihat xwendin, li milê çepê rêzek nû çêdikir û bi fermana Sînanê Sohr berbi Rojhilat ve bi rê diket. Sînan, li ser rêya rêvanan sekinîbû û di bin dûvikên çavên xwe re rêz û temtêla çûyiyan çavnêr dikir. Dibêjîqey, peyvên "aha ji we re bersîv" bê hemd ji nav lêvên wî difelitîn.

Di heman şevê de Namiq Durukan, bûyera qewimî ji radyo navdar BBC re ragihandibû. Nûçevan, wekû 'hezar û hefsed kes ji qampa mihaciran ya Etrûş tevlî PKK'ê bûn' bi kelecanek mezin radigihand. Vê nûçeyê navenda UNHCR ji bin ve hejandibû. Kum ketibû û keçeltiya wan tazî mabû. Dema biryara 'êxistina statûya siyasî' ya eyaletê dayîn îhtimalek pir mezin bertekek di vê astê de ne hesibandibûn.  Dost û dijmin li hember wê îradeya qayîm, berxwedan û têkoşîna koçberên eyaleta Etrûş şaqis mabûn. Kes ne çaverêyê berxwedanek evqas dijwarbû. Dihat zenkirin kû heke DY wekû fermî vegotina ketina statûya mihaciran bike, qedemên gelê bişikêne û yê hêza xwe ya berxwedanê wunda bike. Piştî wê jî yên xwe bisipêrin destên rayedarên UNHCR û bi pişt re jî turkan. Ema wisa çêne bibû û gel hemî rêyên berxwedanê bikartanîn. Piştî derketina Gara du rojan, UNHCR'a dilxwede mirovyar bi paş ve gav avêtibû. Rayedarên UNHCR bi rêya navenda xwe ya Cenewre re vegotina; "statûya siyasî ya mihacirên qampa Etrûş dewam dike lê, bişertê kû cihê qampa dabaşa gotinê were guhertin" kiribûn. Li ser vê vegotinê di êvara heman rojê de çalekiya birçîbûyînê ya bîst û pênc roja ajotî hatibû qedandin(12.01.1997).

Vê vegotina şermokî ya navenda UNHCR, keyfa PDK'ê jî di qirika wê de hiştibû. Bi daxwiyaniya yêkem ya "statûya siyasî ya qampa Etrûş ketiye" re, bi hêlwestek serkeftin bidest êxistîn pêşmergeyên eyalet dorpêçkirîn çeperên xwe berdabûn û çûbûn malên xwe. Bi daxwiyaniya duyem ya UNHCR re, PDK'ê bilez û bez fermana "dubare eyaletê dorpêç bikin dabû pêşmergeyên xwe yên Mizûrî. Û pêşmergeyên dabaşa gotinê jî bi hêlwestek ji ya mezinên xwe şermoktir dîsa eyalet bose kiribûn.

Hewa sarbû. Berfa giran wekî konek spî çiyayê Gara nixwimandibû. Li dolên kûr yên li quntaran jî belekî ne mabû. Şembelûlkên cemedê bi simbêlên Dudêriyan ve daleqayî mabûn. Ji Sêdarê bigre heta bi deşta Kafya, çalekvanên Eyaleta Etrûş di şkeft û mangeyên Hevalan de bi cêh bibûn. Li ser dahatûya şexsî kes zêde raman ne dibû. Jixwe tiştek ya bihata ramandin jî ne mabû. Ji bilî qismek sist û leq, hemabêje her kes di berxwedanê de mîsogerbû. Çalekvan, di hizrandina "rêya serkeftinê bi berxwedanê re derbaz dibe" hemfikirbûn. Ema, qismek piçûk yê wate ne didan wê têkoşîna dijwar jî hebûn. Ew jî kerixîbûn û ji bilî teslîmbûyîna PDK'ê rêyek din li wan mantiqdar ne dihat. Ema ji bilî hemfikrên xwe, ramana xwe bi kesî re parvenedikirin.

Gundikremoyiyan, bi awayek bê xem û xwezayî sûviriyên beroj û nizaran ji hev vediqetandin. Ji êxistina qulêla daran, destên wan hemî meritîbûn.

Di berbanga her beyanî de, dengê zîz û xembarkirî yê Evdê Dêrşewî li ser manga Gabariyan diket. Dengê zelamê bi ser navsertiyê re yêxtiyar, ji mejî dihat û zîz û zelalbû. Mergên guhdarvanên xwe diguvaştin û dûr dibirin. Dibirin şevên zivistanê yên gundên welatê Bohta. Jixwe dema destê xwe têxist dibin guhê xwe de û 'Seydiko seydevano' digot, her kes mest dikir. Lê, teybetiyek ne xweş ya wî dengbêjê deng xweş hebû; tenê dikarî bi berbanga sibehan re xweş û jidil bistirîne. Ji wê sedemê, gelik caran xewar û xew giran ji guhdarkirina wî dengê zîz û wan stranên xweş bê behr diman.

Berfa salê ya destpêkê li eyaletê nû ketibû. Zarokên daw qetayî, rû qemitîn bi zewqek bê xem gulokên berfê li nav guhê hev didan. Ji serma berfê dinanên xwendevanên dibistana navîn li hev diketin û şeqe şeqa dinan wan deng bi refa 2/A êxistibû. Betaniyên helefa di binê çadirên peritî de melavaniyê dikirin. Qazyax tinebû û hebuya jî sopeyên Eledîn bê têhn mabûn. Ema qerqeşe, tevlîhevî û têkoşîna di nav eyaletê de têra germ kirina xwecihê xwe dikir û zêde jî bû. UNHCR'a ji berya sê rojan wekû fermî poşmantiya xwe ayankirî dîsa poşman bibû. Ew fêrsa saziya Dewletên Yêkbûyî, li hember wê komika mirovên ne tebitî neçar mabû û her roj biryarek berevajî ya din kifş dikir.

Roja nîvê meha Çile, rayedarên UNHCR'a DY bi belavokek din ketibû di eyaletê de. Di belavoka mijara gotinê de dihat gotin; "UNHCR biryar daye kû di navbera pazdeh rojan de qampa Etrûş vale bike. Ya destpêkê koçberan bibe qampa Musûrîkê (Sêmêl) û piştî amadekartiyên pêwîst hatin qedandin, yê wan derbazî Tûrkiye bike."

Evê daxwiyaniyê mirênek tehl bi ser gel êxist. Silêmanê Aloşî tif kir erdê û di ber xwe de got;

"Kuro ev rebanan jî gêj bûne. Her roj biryarek ji ya din cudatir didin. Diyare di navbera şivik û duholê de asê mane" û êrîşê kesê rêh bizin yê belavok di destan de kir.

Bi pêre jî guhdarvanan dor li karmendên bê biryar girtibûn. Belavokên wan qetandin û heta bi dergahê eyaletê qewitandin. Di heman rojê de radyoya BBC jî di heman naverokê de nûçe belav dikirin.

Silêmanê Aloşî; mirovek bi ser navser re yêxtiyarbû. Qam qut, girover  û wekî gokekibû. Perixî, perçiqî û di nav hev de bû. Kesek bêhn teng, cir ne xweş û dema pir aciz dibû, ewil tif dikir erdê û bi pişt re kela xwe vedireşand. Kefiya bi awayê Behdînankî girêdida, her tim li ser serê wî yê sto kurtbû. Ji gundê Aloşa girêdayî Qulaban bû. Wî gundê mijara gotinê, di sifira sînorê Başûr û Bakur de cêh digirt. Heta ligor dihat gotin, niha jî li ser nexşeya siyasî girêdayî Başûre an jî Bakure ne diyarbû. Ema, di demên dawî de dewleta Turk qeyda gundiyan çêkiribû û ji wêdê û pêve wekû Bakurî hatibûn hesibandin.

Silmanê Aloşî, demek dirêj pêmergetiya mala Berzanî kiribû û ligor dihat gotin, navbera wî û Mele Mustefa pir xweşbû. Piştî wekû mihacir derbazî Başûr bûyî PDK,  rêkirbû pey û xwestibû ji karwanê xwe veqetê û li Zaxo bicêh bibe. Bê goman, teklîfa maaş, xanî û kar jî jê re kiribûn. Silêman, teklîfa PDK'ê ret kiribû û zivirîbû wargeha Şeraniş.

Li ser xebera dawî ya UNHCR, xêr nexwazan bêhnek kûr kişandibûn û destê xwe bi hev ve ferikandibûn. Nîv meh wext hatibû kifşkirin û piştî du hefteyên din li cihê şêran rûviyên bikin gêre-vêre. Mexsed û murada PDK'ê hatibû cêh. Êdî pêwîstî bi bose û çeperên derdora eyaletê ne mabû. Jixwe ligor wan, di nav hefteyekî de kes li eyaletê ne dima û pêwîstiya xwe westandinê tinebû. Pêşmergeyên eşîreta Muzûriyan, di bîst û yêkê heman mehê de çeperên xwe yên li dora eyaletê valekiribûn û vegerabûn malên xwe. Û di heman rojê de çend rojnamevan, televîzyonvan û ajansvanên Turkan hebin, rijabûn di eyaletê de.

**Hevdîtina bi Meshûd Berzanî re**

Ji endamê şandeya hevdîtinê **Eliyê Heso yê Ziravikî** vedibêje:

"Roja piştî nîvê meha yêkemîn ya salêbû. Şandeyek rêhspiyan ya ji 40 kesan pêk dihat, li ser vexwendina Meshûd Berzanî em çûn bajarê Duhokê. Serokê PDK'ê Meshûd Berzanî, em bi rûyek ken û gotinên xweş pêşwazî kirin û me dest bihevdîtinêkir. Destpêkê xwest daxwazên me guhdar bike.

Me got; "Em dixwazin bi hev re, li cihek hûn jî pêkan dibînin bicêh bibin."

Ewî ev daxwaza me redkir û xwest koçberê eyaletê li Başûr belav bibin. Hê nû gotûbêja me destpêkiribû, ji nişkan ve endama şandeya me Fatma Bilehî got; "em dixwazin hûn rê bidin, em derbazî herêma Soran bibin."

Vê pêşniyara haya me jî jê tinebû, Meshûd Berzanî pir aciz kiribû. Eniya wî hatibû qermiçandin û rûyê wî tirş bibû. Bi awayek aciz got;

"Xwişka min, hûn bixwazin ezê rê bidim we lê, willeh Celal Telebaniyê we bi firoşe bipênc filisan" û ev hevok du, sê caran dubarekir.

Me pêşniyara çar wargehên cuda kir û ew jî red kiribû. Ewî bi israr xwest, çend mal bi hev re li cihên ew dixwazin belav bikin. Hê gotûbêja me dewam dikir û me li ber hev dida, Îsîvê Gundik Melayî got;

"Em dixwazin herin, van nêrînên we bi gelê wargehê re jî bişêwirin û bipiştre we agahdar bikin."

Dibêjîqey Meshûd Berzanî, çaverêyî wê gotinê rawestabû. Got; "başe" û civîn qedand. Îsîvê Gundikî, bi zanebûn an jî ne bizanebûn, bibû sedem civîna me bê encam biqedê.

Piştî vê hevdîtinê çend rojan ez û Huseynê Mahmût ji bû hevdîtinê çûbûn Etrûş. Dema em gihatin derê qaymiqamtiyê, me dît hewş tijî tirimpêlên teybetin. Hêşedar em nas dikirin û kengê dît em hatin bikelecan bezî pêşya me û got;

"Di hundirê tirimpêla xwe de birûnên heta min hûn agahdar kirîn."

Li ser gotina nobedar Husêyn, zivirî tirimpê lê, hingî hêşedar israrkir ez ji derva mam. Piştî kêmekî şandeya di hundir de derket. Bedlek cilê reş lê, qerwatek di stoya de û Hesenê Diyarbekrî di nav wan de bû. Dema çav da min, berê xwe zivirand û bi bez derbazî hundirê tirimpêlê bû.

Piştî ew ji hewşa qaymiqam derketin em derbazî cem wî bûn. Me pirsa şandeyê û Hesen kir. Qaymiqam, bi hêlwestek şaş

mayî got;

"Qey we Hesen dît?"

Me jî bersiva "erê" da û qaymiqam Evdorehmanê dest û lingên wî tevlîhev bûnyîn û got;

"Bixwidê haya min ji wan nîne. Ew ne mêhvanên min yên Musa (cêhgirê waliyê Duhokê) bûn."

Li wêdê me ji qaymiqam fêhmkir kû şandeya Hesen bi wan re MÎT'a Turk bû û ji bû kifşkirina cihên leşkerî hatibûn Etrûş (23.01.1997).

Hesen û Fadil, di xira kirina Eyaletê de rolek pir mezin leyîstin. Jixwe yê eyalet xira kiribûna, ema îtîrafên Osmanê Îsîf û derdora wî û yên Fadil û Hesen, hênceta wan xweştir kiribû û destê wan xwirtir kiribû."

## Ji bû Dewletên Yêkbûyî –UNHCR-
## Qampa Etrûş Hatibû Girtin

Meş, protesto, bûyer, pêşketin û daxwiyaniyên rayedarên UNHCR li navguhê hev diketin. Zemîn şemîtokbû û her tişt bi leza fîşekê dihat guhertin. Di nav ewqas daxwiyaniyên binakok yên UNHCR de, statûya siyasî ya mihacirên wargeha Etrûş ketibû an na, ne kifşbû. Ema ya kifş û mîsoger, divê eyalet bihata valekirin û li cihek cuda bicêh bibûya. Jixwe du roj ji mûhleta dayîn re mabû. Di çarçoveya valekirina eyaletê de, Cenewre daxwiyaniyek nû dabû û pêşmergeyên cara duyem rêya mala xwe girtîn dubare zivirîbûn çeperên bosekirinê.

TAK û komîteya eyaletê di dewrê de bûn û ji bû gel veguhêzin cihek nû hemî hêza xwe bikartanîn. DY, arîkariya dilxwede mirovî li ser eyaletê birîbû û ligor derfetên xwe bi diravên TAK'ê qût dihat kirîn. Lê, vê carê jî peşmergeyên dora eyaletê dubare bosekirîn, qûtê dihat asteng dikirin.

Zivistan sarbû û eyalet dikelî. Gemiya koçberan hatibû qefê û hingî sekanvan sekanê xwe ba dida birê ne diket û bê navber av digirt. DY, bi israr dixwest cihê koçberan were guhertin û PDK cêh ne dida. Bê bawer, leq û poşman bûyiyên eyaletê, xwe ji hundir dipesartin û bê navber pirsgirêk dertêxistin. Roja çarem ya Sibatoka dîn bû. Nû nîvro wexirîbû û Bakurek dijwar rûyê koçberên eyaleta Şehît Jiyan zele dida. Rustem, Bawer, Seîd Beg, Ehmet û Emerê Hevlerî çekên xwe rakiribûn û bi kaşê binê Etrêş re bi bez hawa diketin. Hemî eyalet li derdora girikê Vira kom bibû û li reva wan kesan temaşe dikirin. Li ser rêya diçû Hewlêr, pêşmerge hatibûn pêşya wan, çekên wan girtibûn û biribûn Kelhê.

Wekî tu avek cemidî bi koçberan de bikî. Cara yêkemînbû ewqas mêr, nîvê rojê, mal û zarokên xwe dihiştin û biçekên xwe ve teslîmê PDK'ê dibûn. Di heman demê de ev destpêkek jî bû. Evê bûyerê sist, leq û poşman rakiribûn ser lingên paş û bê goman hêlwesta berxwedanvan jî tûjtir kiribû. Reva zelamên Hevlerî, biteybet Şêladizî, Şirîşeyî, qismek Mijînî, xeta Bilik, Siliv, Spêrt û Bêgalteyî rakiribûn ser lingên paş. Xwe dihilpesartin û her roj ji hêncetekî pirsgirêkek nû derdixistin. Dixwestin, an rêkxistin cihek bi keyfa wan peyda bike, an jî ji eyaletê veqetên.

**Gabarê Gabarî** vedibêje:

"Ez mamostayê dibistana navîn ya Şehît Jiyan bûm. Çar dibistanê me yê seretayî hebûn û li wan dibistanan heta asta refa sê xwendevanan dixwendin. Her du refên yêk û du mamostayê refê ders didan û refên sêyan jî branşbûn. Min hem li dibistana navîn ders dida û hem jî wekû branş li dibistanên seretayî dersa 'Kesîtî û Şehadet' dida.

Dema ezmûnên dema du ya sala perwerdêya 1996/ 97 bû. Ez ji ezmûna refa 3/A ya dibistana Mehmet Karasungur nû derketibûm. Rojek sar û badarbû. Mamostayê dibistanê Hewarê Şirnexî xwest, em derkevin ser banê dibistanê û hewayek paqij bigirin. Ez jî jixwe mirîkarbûm û em derketin ser banê herî. Bayek hişk dihat û wekî zixwiran li dêmê mirov diket. Dema dibistan nû hatî çêkirin, dilxwede binavê parastin û fermiyetê xebatkarên UNHECR stûnek li ber xaniyê dibistanê daçikandibûn û alek ya xwe daleqandibûn. Ala dabaşa gotinê peritîbû û rîşiyên jê daleqayin bostekî dirêj bibûn. Piştî UNHCR, eyalet terikandîn al li cihê xwe mabû. Li ber ala peritî û ji alê zêdetir wekî paçek qetayî lêhatî, me çixareyên xwe pêxistin. Bayê dijwar, rîşiyên ji alê felitîn li rûyê Hewar didan. Hewar hewlda wan rîşiyan bi çeqmeqa xwe bişewitîne. Ema, bayek pir dijwar dihat û Hewar di şewitandina rîşiyên alê de biser ne diket.

Xeyîca Ziravikî, jinek bitemenbû û dema ji xwendevan re şîr dihat, ewê dikeland û çadira wê cîranê dibistanêbû. Bi kûdê re dibîne nizanim, tenê min dît Xeyîc ji çadira xwe derket û bidengek bilind bangkir me;

"Li bextê we me kurê min, ne şewitînin" got û bi qêra jina yêxtiyar re Nêrwehî hemî derketin ji derve. Me jî hingî bi sond û selewat digot; "em na şewitînin yadê" ema laveyên me feyde ne dikirin û Yadê Xeyîc hê bêhtir dengê xwe bilindtir dikir.

Saziya UNHCR, ji zû ve dest ji eyaletê berdabû û PKK'ê qûtê eyaletê tanî. Refek ya heman dibistanê wekû embar bikartanî û ew ref hê jî tijî arbû. Min ji Hewar got; "di rewşa heyî de UNHCR'a me PKK ye" û bi serê çixarê min navê PKK li ser wî paçî nivîsand. Li ser vê bûyerê Nêrwehî û biteybet Şirîşeyî çûbûn cem rêvebertiyê û gef

li me xwaribûn.

Piştî ez zivirîm dibistana navîn demek pir kurt, endamek yê asayîşê hat û ez vexwendim asayîşê. Jixwe asayîş cîranê dibistana me bû û em bihev re çûn derê çadira asayişê. Hevalekî bi zimanek nazik çadira girtiyan nîşa min kir û ez çûm hundir. Hewar, ji beriya min anîbûn û ew jî di çadira girtiyan de bû. Hê jî kaxezên ezmûna xwendevanên Mehmet Karasungur di bin çengê min de bûn. Asayîşê ji me re vegotinek nekir û em bê qedir jî ne hiştin. Şeva heman rojê hevserokê eyaletê Sînanê Sohr hat û sedemê girtina me vegot;

"Ji bû we ala Helefa şewitandiye, ciwanên Şirîşeyiyan xwestin li we bidin. Ji bû hûn lêdanê nexwin û hêrsa wan jî dakeve me hûn anîn vêdê" piştî çend şîret û rexneyan Sînan em dan berdan.

Roja piştî bûyera şewata alê li kolika televîzyona semta Şehît Karker civîna rêhspî û erkdarên eyaletê hebû. Ez jî wekû erkdar bi navê dibistana xwe tevlî bibûm. Dema ketim di hundir de her kesî li min dinêrî. Jixwe Simalê Şirîşeyî awrên dijwar ji min vedidan. Civînê destpêkir û dîwan Ariyê Başûrî, hevserokên eyaletê Sînan û Leyla Wanî bûn. Hê nû civînê destpêkiribû, Simalê Şirîşeyî bê destûr rabû ser xwe;

"Hoval, ew mömhostayên doh bayreqa 18 dewletan şewitandîn ez dixwazim aha niha li vêdê werin îdam kirin" bi devoka xwe ya goyikî got û ne rûnişt. Her kesî li min temaşe dikir û min jî li girşê nîvê kolikê. Simalê yêxtiyar û şaşik melkebî serê wî daqurtandî, girşê nîvê kulikê nîşan dida û daxwaza xwe ya darvekirinê dipesart. Hê ew jipiya yêk din rabû, yêk din û sê, çar kes bi hev re jipiyabûn û hemiyan heman daxwaz dikirin. Çavek yê min li kesên darvekirina min dixwazin û yê din jî li darê nîvê kolikê ve daleqayî mabû. Teşkên min dilerizin û min xwe bi sêdarê ve hilawistî xeyal dikir.

Yên din hemî rûniştin ema, Simalê xwe wekû maqûlê Şirîş dibîne û ji mihacirtiya xwe poşmabûyî ne rûnişt. Ji berya hingê ew demek dirêjbû Simal û derdora xwe bi hezidandinek mezin dikara zêrên di stoyê hevjînên çeteyan de dikirin û dixwestin vegerin û bibin çete. Di rojên dawî de êdî, ev xweziya xwe bi zimanek eşkere vedigotin. Sînan, ev rewşa wî bihîstibû û jê acizbû. Sînanê Sohr, bi dengek nerm ema keziyên aciziyên jê difûrin got;

" Hevalê Simal, rûnê cihê xwe!"

Simalê ji hêrsa kef bi lixabên wî yên bê dinan ketîn, ne rûnişt û bi gotinên hê siktir gazindên xwe ajotin. Sînan eniya xwe qermiçand, awrên xwe tûjkirin û dengê xwe hilda;

"Rûnê!.. Qey me ji ber te girkê Vira berda ne bese."

Girkê Vira, cihê seb û dijpropexanda Simal bû. Dema ev nav derbazbû teqlên zilamê pîr sist bibûn. Gotinên li ser wî girikî ji rêvebertiyê re kirîn giranbûn û ne dixwest di nav wê civatê de

Sînan, gotinên wî li rûya bide û hetka wî here. Simal rûnişt û bi xêra hevserokê eyaletê Sînanê Sohr, ez ji sêdara Simalê Şîrîşeyî felitîbûm.”

### Eyaleta Şehît Jiyan Belav Dibe

Çaryêka sêyemîn ya meha Sibatê bû. Rê hemî li ber koçberên eyaleta Şehît Jiyan hatibûn sênckirin û yê bi kû ve herin ne dihat zanin. Karwanê koçberan, li duryanek asê hatibû qerasekirin. Dibêjîqey rojan lingê xwe qerastibûn erdê û derbaz ne dibûn. Qazyaxa heyî jî hêd hêdî diqeda û berfa bê navber dibarî dibêjîqey ji xirabûnê re çepik lêdidan. Bê bawer û poşmanên eyaletê rabibûn ser lingên paş û hin ji wan jî hêdî hêdî direvîn. Rêxistin û Rêvebertiya eyaletê, bilezgînî li çareyekî digeran û çareya lê digeran jî peyda ne dibû. Hevdîtinên bi Êraqê û YNK’a Celal Telebanî re encam nedidan û qadên çiyan jî ne bijartekek saxlembû.

Hê eyalet bi tevayî ji hev ne ketî, rêvebertî neçarbû bilez here biryarekî û gel hatibû sê beşkirin. Beşa ji hezar û dused kesan pêktê û naxwaze li Başûr bimîne, ya ber bi sînorê Êraqê ve rêvantiya xwe bajota. Herî kêm biqasî wan jî yê li eyaletê bimana û bi pişt re derbazî Ranya, herêma Zelê bibûna. Yên mayîn jî wekî dixwestin, yên li Başûr belav bibûna. Êdî wekû fermî eyalet belav dibû. Ema, belavbûnek bi rêkûpêk û birêxistinbû. Qismê here û yê bimîne ji hev hatibûn cudakirin, bi wan re hatibûn axaftin û hatibûn qayilkirin. Pêwîstbû belavbûnek bê rêkûpêk û bê ser û ber jiyan ne bibûya.

Her kes di astekî de welatparêzbû û salên mihacirtiyê de êşên bê eman bi hev re jiyan bibûn. Eyalet wekî malbetekî lê hatibû û wekû dildar zêde kesî ne dixwest ji hev qut bibin. Di wargehan de tevnek muhteşem ya civakî avakiribûn û du salên azad bi hev re derbaz kiribûn. Ema êrîşên dagirker û nûkeran dijwarbûn û her kesî di heman astê de îrada berxwedanê bi xwe re ava ne kiribû. MÎT’a Turkan, pêşmergeyên PDK’ê, hin rêveberên UNHCR, rojnamevan û her kes wekî teyrên kelaşan li dora eyaletê dizivirîn û malbatên bê îrade direvandin. Ji eyaletê revandina kesekî, malbatekî ewqas nirx qezinckiribû, carnan diravên mezin di holê de dileyîstin. Li cihê belavbûyînek bê rêkûpêk û hêstên têkçûyî bi xwe re bafirîne, Rêxistinê belavbûyînek serbilind hilbijartibû.

Demê veqetînê hatibû û xwe pesartibû. Dilketiyên hev, dezgirtiyên hev yên ji hev bi veqetana û dibe kû carek din qet hev ne dîtibûna. Ew fêrsa cîhanê li karwanê koçberên welatê xwe hatibû hev û kêyê li kû bi keta, an jî li kû bisekinîbûya ne diyarbû. Zeman, ber bi ne kifşbûyînê ve bi lezgînî diherikî û kûjan duryana derketa pêşya kê, ne dihat pêşdîtîn. Di nav wê qergaşey giran de dê û bavên keç û kurên têkiliyên wan yên hêstî bi hev re heyîn rûniştibûn û

li hev kiribûn. Ramana “em dikarin ji hev qut bibin, ema heqê me li evîndaran nîne” heq qezinc kiribû û ligor daneyên fermî di nav pazdeh rojên dawî de, sed û pazdeh coht li eyaletê zewicîbûn.

Ji bilî heft malbatên Kinyanişî, Sêvî û Bêtrotî; Şêladizî hemî. Ji xeynî pênç, şeş malbatên Şirîşeyî hemî. Nêzîkê çaryêka Mijîniyan. Bêgalteyî qompîle. Koçerên eşîra Kiça bitevayî. Sipêrtî, bi malbata Mele Resûlê Basayî ve hemî. Ji bilî yêk, du malên Bilikî qompîle. Silivî qompîle. Jixwe Raufê Giteyî û çend malbatên li derdora wî ti car nebibûn ehlê eyaletê. Gund û malbatên navên wan li jor hatîn kifşkirin hemî, di navbera hefteyekî de ji eyaletê veqetabûn. Bi qasî dused û pêncî malbatên milîsên gundên derdora Şirnex, Cûdi, Gabar û ji hêjmara tiliyên destekî ne zêdetir Çelî; ji bû Zelê û an jî heke Zelê nebe Gara hatibûn veqetandin. Hilalî, Mijînî (yên mayîn) û Geverî di mayînê de israr dikirin û dixwestin, PKK ji wan re cihek bi ewle peyda bike. Jixwe çelteyê hezar û dused kesên rêvanên sînorê Êraqê dagirtîbûn û wê şevê, şevek din rêwîbûn.

Ji meha Newrozê re şevek mabû. Şev tarî û sarbû. Bayê Kur di şeva sahî de wekî zixwirên berbestan demên rêvanên di qada gokê ya li derê dibistana Mehmet Karasungur de kom bûyîn, gez dida û li qontara çiyayê Şêxan diket. Hemwelatiyên eyaletê yên dimînin û yên diçin, qumpîle qulibibûn derê dibistana Mehmet Karasungur. Dema xatiran hatibû û her kesî hev himbêz dikir. Dayika keçên xwe, xwendevan hemrefên xwe, cîranan cîranên xwe û yên vediqetên bi stoyê hev ve bibûn gewlaz. Di bin tevna tarîtiya şevê de bav û kuran jî bi awrên kulbar li hev digeran. Hêstirên dilketiyên ne gihatîn hev û wêrîna ayankirina evîna xwe peyda nekirîn, wekî taviya Sibatoka dîn diherikîn.

Ji milîsên Gabar Merwan, Serbest û Feqe xwe di çek û rextan de pêçabûn, delingên şarwalên xwe êxistibûn di ber gurên rîs de, kefiyên Sêrtkî li stoyên xwe girêdabûn û ketibûn pêş. Tevna tarîtiya şevê, wekî şelîtekî rêza karwanê ber bi Êraqê ve ketîn rê dadiqurtand. Sînanê Sohr, bi dengê xwe yê tinazî tevlî tehdît têkel derdikeve, keç ji stoyê dayikan vedikirin û birêtêxistin.

“Derenge Heval, leza xwe bikin zû...” digot û bi gotina wî re mayî û rêvanan himbêza hev berdidan û dibezin.

Di nav rêvanên ber bi Laleş ve birêketîn de jinên mezin û zarok tinebûn. Ew pêşvanên karwanê mezinbûn. Heke wekî hatî hesibandin rêvantiya wan bi encam bibûya, jin û zarok jî yê çûbûna û bigihatana hevjîn û zarokên xwe yên pelweste. Na, heke vajî derbiketa, yên çûyîn jî yê dubare vegerana Etrûş û li rêyek nû bigerana. Tiştek kifş û hatî keşifkirîn tinebû û her tişt êsarê rasthatinekîbû.

Reşê heyvêbû. Bi tehfdayîna bayê Kur, girên ewran bi lezgînî

ber bi Başûr ve dişemitîn. Stêra şivanan sê, çar werîsan bilind bibû û dibêjîqey li dêmê rêvanên berbi nekifşbûyînekî ve dişemitin dibeşişî û rê nîşa wan dikir. Merwan li pêş û bira mirovên berbi rexa rêya diçe Duhokê ve diherikî. Serbest, gavên xwe siviktirkirin û gihat tenişta Merwan. Bi dengek nivz û tevlî tinaz got;

"Niha em qesta Sedamê mirovxwer dikin Kurdo?"

Merwan, bi hêlwestek mucid û jixwe bawer bersiv da;

"Her kêyê kû ji xizmetkirina hegomonên Rojavayî diwestên wan mirovxwer ayan dikin."

"Ankû tu dibêjî, ji xwilamtiya wan westaye?"

"Erê. Ew jî dixwaze êdî wekî ser xwilamekî tevbigerê. Ema ev hêlwesta wî zêde li xweşa Panteona Xwedayên Rojavayî naçe û qedaba xwe li wî barandine."

Vê sohbetê ew zûtir gihandibûn ser pira li duryana Duhok û Laleş. Destê xwe ji pêşmergeyê bi kuxikê duryanê re stoyê xwe dirêjkirî ji derve hildan û berê xwe dan rêya Laleş. Bi fitlûpêçkên rêya qîr re hewaketin.

Piştî nîvê şevê gihatin duryana Asîtana Laleş. Ziyaretgaha Êzdîxanê, bi qasî avêtina du kuçan bi ser wan re bû. Lê, wextê wan yê spehîtahiya Laleş ramanbibin tinebû û ber bi Nînûva ve rêya xwe ajotibûn. Her kû diçû neqeba kûr tengtir dibû û dibêjîqey çêlên çiyayên ber bi ezmanan ve hewadiketin, yên li hev biketana. Di navbera Bakurê çiyayê Şêxan û Başûrê Rojhilatê çiyayê Laleş de, kutekî cihê rêya tirimpêlan mabû. Li cihê herî zêde neqeb teng dibû, çiyayê Şêxan ber bi Rojhilat ve dizivirî û neqeb jî diqeda.

Bi keşafa beyaniyê re dawiya bira mirovan ya ji hefsed kesan pêk dihat neqeb li dûv xwe hiştibû. Şevê konê xwe ji ser deşta Pîroz rakirbû û dolik, girik û peserên piştî neqebê derketibûn holê. Dengê dîkên gundên Mûseka û Xwedêda yên dola neqebê diket di navbera wan de jî qut bibûn. Pêşkarwaniyên rêya qîr dişopandin li duryana gundê Xwedêda rawestabûn. Sirtikê ji çiyayê Laleş dirêj dibû jî li wê duryanê xilas dibû. Çep û rastê rê zeviyên çandîbûn û genimê zer nû zîl dabû. Xaniyên gundê Xwedêda yê cixareyekî li destê rastêye, di nîvê deştikek piçûk de wekî govên pezê gundên Bohta dixwiyan. Wekî lûleyên bablîsokan dûyê gewr li ser xaniyan diket û piştî kêmekî di valetiya ezmanan de wunda dibû. Karwanê ber bi ne kifşbûyînê ve diherike, li ser wê rêyê govenda ARGK'ê girêdabû. Merwan serê govendê dikişand, Serbest milê wî dihejand û boseya govendê bi strana "Elo dîno" germ bibû. Jixwe dîlan her tiştê wan rêvananbû; xwarin, bêhn vekirin, gêwil û hêza wan ya berxwdanêbû.

Sînanê Sohr, li heman duryanê koma rêvanên çekdar ji karwanê giştî nependî kiribû û karwan ber bi derbenda Sedam ve rêya xwe dewam kiribû. Piştî çixareyekî li ber deriyê tixûbê Parelêla

sêh û şeş rawestabûn.

**Mamosta Hewarê Şirnexî** vedibêje:

“Bi hilatina tîrojên rojê re em li ber derbenda tixûbê Êraqê sekinîn. Beyaniyek sar û bi zemîtebû. Em nêzî hefsed kesabûn. Keç û xort, jin û zilam çeltên leşkerî li pişta me û em liber lûleya sohr û spî ya bi ser rê re hatî dirêjkirin rawestabûn. Em li pêş lûleya biqasî zendekî û li ser qetek tenaka girover ya bi nîvê wê ve hatî lehîmkirin bi zimanê Erebî “qîf” dinivîse kom bibûn. Kuxikên banê wan bi qetek teneke nixwimandîn û wekû çeper bikartanîn valebûn. Li aliyê hundirê çepê rê girikek piçûk hebû û li ser nîvê girêk darek mezin ya berû bilind dibû. Dara pir qurm û bi nêzî erdê re du ta ji qurmê wê hatîn birîn xemlek cuda li wê deşta rût bar dikir.

Li ser bang kirina me, sê leşkerên bê pergal ji mila banî xwe berdan, hatin û li ber lûla hêsin rawestan. Leşkerên çavlixew şaş mabûn û bi awrên şaqis li me dinêrîn. Wekû tercûman, jinek bi navê Rojbîn bi me re hatibû. Rojbîn, ji Rojavayê Kurdistanê bû û ji sedema pirsgirêkên tenduristî hatibû eyaletê. Rojbîn, zimanê Erebî xweş dizanî û bi çend gotina sedemê hatina me vegot û rapora serîlêdanê ya rêvebertiyê bi zimanê Erebî amadekirî êxist di destê leşkerekî de. Şirt (leşker)ê kum sohr, qundireyek pehnî şkestî di lingan de û heta dixwazî ji hevketî, bi zimanê erebî got;

“Kêmekî li vêdê rawestin, ezê niha ji we re bersivekî bînim” û bi lez bi şûn xwe ve zivirî.

Dema şirteyên Êraqî pêlavên xwe yên qetayî li ser rêya qîr li dûv xwe dixirikandin û berbi Eyn-sefnê (Şêxan) ve diçûn, min qurmên dara delal dihêjmartin. Neh tayên cuda ji heman qurmî radibûn. Bi erdê re du hatibûn bîrin û heft mabûn. Pirsa; “gelo çima di vê herêmê de tenê ev dar hatiye parastin” di mejiyê min de bê bersîv mabû.

Piştî nîv demjimarî birek şirte, tirimpêlên zirxî yên bi çek û doçka hatin û li aliyê din yê darê rawestan. Çar şirteyên zik daketî, çav şimşirî, lêhv reş ji koma leşkeran veqetan û berbi me ve hatin. Ew û Rojbîna werger kêmekî bi hev re axivîn û şirteyan pirsa Şêxê êla me dikirin. Rojbînê, wekû Şêx (Mezin) Brahîmê Erûhî nîşa kiribû. Şirteyên fermandar, Şêx Brahîm jî dan rex xwe, ketin pêşya me û dubare em zivirandin duryana em lê reqisîn.

Fermandarê zikmezin, demanceyek bi kemaxê ve daleqayî û pir nîşan li ser milan got;

“Li vêdê rawestin. Bipêşvetir newin. Memno-e (qedexeye). Emê rapora we ya serîlêdanê, ji Seyît Reîs Sedam El Huseyn re birêkin. Dema bersîv ji wî hat emê we agahdar bikin” vegeran û çûn.

Fermandarê şirte cihê me yê cêhbûnê nîşana kiribû. Ne pir saxlem jî be, êdî bostek axa em çadirên xwe lê vedin hebû. Di heman

demê de ez û çend xort zivirîn eyaletê. Bi tirimpêlên eyaletê û yên me ji gundên derdor kirêkirîn, me jin û zarok  kişandin wargeha Nînûva. Heta êvarî me wargeha Nînûva avakir û bi avabûyîna rojê re em vîlaybol dileyîstin.”

### Wargeha Nînûva

Wargeha Nînûva; di navbera quntarên Başûrê çiyayê Şêxan û bajarê Şêxan de cêh digirt. Li Rojhilat, gundê Faris axayê Zêdikî Mûseka û dolek dirêj heta bi çiyayê Xêra yê Gara dirêj dibû. Li Rojava jî gundê Xwedêda (Memo) yê pismamê Faris û deşta Ba Edlê radiwesta. Niwala besta ava Laleş, ev coxrafya bikendal û dolik ji hev vediqetand û perçeyek erdê xweş yê Kurdistanê bû. Koçberan, çadirên xwe li ber her du rexên rêya ji duryana binê Etrûş ji rêya Duhok û Hewlêr vediqetê û diçe bajarê Şêxan vedabûn û wargeha mijara gotinê avakiribûn.

Wargeha navê “Nînûva (Mûsil)” lê hatî kirin, şeş kêlûmitran diket Bakurê Rojhilatê bajarê Şêxan û herî kêm ji bajarê Nînûva sed û pêncî kêlûmitran dûrbû. Di navbera cihê wargehê û bajarê Nînûva de, bi dehan bajar û bajarok hebûn. Ji ber kû armanca koçberan bajarê Nînûva bû û li ser rêya bajarê dabaşa gotinê war danîbûn; navê “Nînûva” li wargeha xwe ya nû kiribûn. Jêdera navê wargehê ev bû. Ankû berê koçberan li Nînûva bû û ev warek zoravabû. Hedefa esîl xwe gihandina bajarê Nînûva bû.

Piştî bicêhbûyînê rojekî, rêvebirê teybet yê DY kû piştî hatina Niyazî yê Azarî ji holê wunda bûyî Muhamed Arîf, bi karwanek yê tirimpêlan ve ji aliyê Etrûş ve derket û hat wargeha Nînûva. Komîteya rêvebir ya wargehê, hatina wî ya ji aliyê PDK’ê ve red kiribû û xwestibû ji aliyê Êraqê ve were. Şandeya UNHCR zivirîbû, biqasî sed kêlûmitreyan tewlek dabûn xwe û ji aliyê bajarê Şêxan ve dubare hatibûn. Bi awayek stoxwer û şermedar soza pêkanîna pêwîstiyên koçberan dabûn û ji wargehê veqetabûn.

***

Di navbera rêvebertî û pêşkêşên gel yên eyaletê de, bê navber gotûbêj û civînên warên nû dewam dikirin. Qismê rêvanên Zelê, dilniyabûn û di xaniyên barkiriyan de bicêh bibûn. Geverî, Çelî, Hilalî, qismek mezin Mijinî, Bilehî, Nêrwehî, qismek Ziravikî, Aloşî, Nîrehî, Repinî û hin malbatên din yên ne dixwestin belav bibin û bi israr dixwazin Rêvebertî ji derveyî Başûr ji wan re cihek bi ewle dabîn bike, ewqasî ne dilniyabûn. Baweriya Rêvebertiya eyaletê li Yêkîtiya Niştimanperwerên Kurdistanê ne dihat û ne dixwest zêde hîviya gel

bi wêdê ve girê bide. Jixwe ji bû rêvanên Zelê jî alternatîfek nû dihat fikrandin û bi çavek mîsoger li poşmantiya Mam Celal dihat nêrîn. Ji bû kes û malbatên ji bû Zelê hatîn veqetandin jî wekû alternatîf, Gara dihat ramandin. Ji ber pirsgirêkên ewlekariyê Rêxistinê, ne dixwest zêde barê vê altarnatîfê were girankirin. Van têkilî, nakokî û lêgerînan xewa Sînanê Sohr diherimand û kûr kûr dida ramandin.

Dawî li meha jê dihat tirsîn hatîbû û meha pîroz destpêkiribû. Di çanda Kurdan de, Sibat mehek têr xeter û bêbextbû. Vê mantiqê jêdera xwe ji mercên çiyan, çanda lawirvantî û çandiniyê digirt  Ji ber vê sedemê Kurdan, Sibat wekû “Sibatoka dîn” pênase kiribû. Her bêhnek ya wê ji ya din cudatirbû û kengê lehî, kengê şapeya rabe ne kifşbû. Dibekû bi rojhilatinê re dunya sahîbe ema, piştî wê kêmekî lehî û badev rabe û gîsk bi şivan ve di niwalekî de bê can bimînin.

Adar, meha destpêkê ya demsala Biharê bû û têr xêr û pîroztîbû. Dawî li zivistana reş hatibû û xetertî derbaz bibû. Êdî tirs ne mabû. Gavan û şivan, rêncber û zewêrîvan, kehrvan û berxvanan êdî bê fikar dikarîn ji hewîngehên xwe dûr biketana. Li gor salnama Newrozê, bîst û yêkê Adarê sersalbû û pîroztiya ‘roja nû’ ji vêdê dihat. Jixwe di himbêza Laleş de derbazkirina salê, pîroztiyek cudatir li hêstên wê komika mirovê ne tebetî bar dikir.

Kulîlkên behîv û bilalûkên çiyayê Laleş, li dêmên mêhvanên xwe yên nû dibeşişîn. Darberûyan buşkov dabûn û wexte biteqên. Zeviyên deştika Ba Edlê hêdî hêdî xwe birengek kesk dinixwimandin. Bayê ji neqeba Laleş difelitî, wekî nîv meh berê rûyê koçberên welatê xwe zele ne didan. Erd qemitîbû û sermaya ji heriya hundirê çadiran vedida bandora xwe wunda kiribû. Heriya bi pêlavên periti ve kêmtir bibû û delingên şalan ji ber saka goreyên rîs rizgar bibûn. Her kû diçû têkiliyên îstîxbareta Êraqê û rêvebertiya wargeha Nînûva germtir dibûn û hîviya rakirina bê altarnatîfiyê dilivand.

Ji zemanê Berpenîr û pêve mirovên vê xakê bêhnek rihet ne kaişandibûn. Her kû zikên neviyên Enkî û Mardoqan mezintir dibûn, jiyan li mirovan heramtir dikirin. Di van her du salên mihacirtiyê de van mirovên qedîm, ligel hemî tinetî, zehmetî, êrîş û qirkirinan kêmek jî be dubare hêstên zemanê Berpenîr tam kiriribûn ema, di boseya gur û heftaran de avakirina jiyanek bi exlaq, rêxistî, polîtîk û azad ji parçekirina atomê milyon qet zehmetirbû. Xew û kew, bi hev re bi dest ne diketin. Di dorpêça axayan de serbestî, hisyet û aramî di coyekî ne diherikî. Yan tuyê bi berdêla qir û qiyametê jiyanek bişeref hilbijêrî û bi dînemergîtî li berxwe bidî yan jî serê xwe bêxî ciherê xêrbendiyê de û mejiyê xwe ji alîgirtiya PKK’ê re dadî.

Gel, ji roja destpêkê ve bijarteka herî zehmet ema birûmet hilbijartibû û di wê oxirê de berdêlên bê eman jî dabûn. Ema belavbûna eyaleta Şehît Jiyan ya di encamê êrîş û tofanên giran de

pêk hatî, hîviyên qismek kesên ne çaverêyê wê tofanê bîrîndar kiribû. Li rasta bêbextiya herî bê exlaq ya xwişk û birayên xwe hatibûn. Bi awayek pir vekirî şahidîtî ji durûtî û hîleyên herî mezin yên saziya dilxwede mirovyar UNHCR'a Dewletên Yêkbûyî re kiribûn. Jixwe ji êrîş û binasên dewleta Turk qet bê behr ne mabûn. Qismê, di bin wî barê giran de ji taqet ketî û kerixî, hêstirên xwe rijandibûn hinavan, dest rakiribûn û li Başûr belav bibûn. Yên di navberê de digevizîn, ne dixwestin xwe bispêrin PDK'ê û serkeftina ya heyî jî li wan pir dûr û mijdar dihat, niha li ber dergahê Sedam bûn. Û yên li cêh mayîn jî emanetê Xwedê bûn.

Ebo Nafi'i, –gelê qampê wekû "Ebo Minafiq" binav dikirzilamek gewr, gir, bilind û sêh û pênc, çil salîbû. Yêk ji rêveberê îstîxbareta Êraqê beşa Bakur bû. Kesek têr axaftin, şidayî û guhê wî dilepitîn. Ji turkekî xweştir turkî taxivî û pirsgirêkên wî û komîteya wargehê ya danûstandinê jî tinebû. Hemabêje rojane li wargehêbû û her roj nêçeyek bi ya din re binakok tanî. Ji rewşa wî ya rûhî kifş dibû kû wî bixwe jî ji gotinên xwe bawer ne dikirin. Komîteya wargehê ya bi pêşvantiya Şêx Birahîm jî bi gotinên wî dibeşişin û ber bi pêş ve serê xwe dihejandin.

Ligor salnama Mîladî nîvê heyva Adarê bû. Roja du werîsan bilind bûyî, dêmên qemitîn yên zarokên wargeha Nînûva nû germ kiribû. Ebo Minafiq, li tenişta Başûr ya wargehê ji tirimpêla xwe ya nîvcîb û şemala kîsoyan dide hatibû xwar. Bi kelecanek ji ya rojên din cudatir, bi gavên sivik ber bi çadirên lewitî ve hat û got;

"Mujde, mujde (mizgînî, mizgînî)! Seyît Reîs hûn pejirandine û ferman daye; yan li Hemam Elî yan jî liber ava Zê ya navçeya Giwêr, ji we re qampek nû were amadekirin."

Dîsa komîte bi goman nêzîk bibûn. Ema rewşa ruhî û psîkolojîk ya vî mirovê guhên wî dilepitin ji ya rojên bûrî mucidtir dixwiya. Piştî roja paştir rêvebirên DY jî heman vegotin piştrast kirin, êdî dilxwede deriyê xêrê vebibû.

Firset hatibû û mûhlet li nik herambû. Sedam hewandina koçberan pejirandibû û bêhnek kûr bi rêvebertiya eyaletê dabû kişandin. Dibekû yê herî zêde bi vê nûçeyê şad bûyî, Sînanê Sohr be. Bi leza berqa burûskê, amadekartiyên çûyîna wargeha Nînûva ya koçberên li eyaletê mayîn destpêkiribû. Ji bilî hezar û pênçsed kesên rêvanên Zelê, herkes rêvanê wargeha Nînûva bû. Bi wê biryarê poşmantiya belavkirina yên qutbûyîn jî xwe dabû hîskirin. Yên çûyîn heqkirîn hebûn ema, ne hemî. Di mejiyê Sînanê Sohr de, 'xweziya belavkirin ligor asta pejirandin û ne pejirandina mihacirtiyê hatibûya birêkûpêk kirin' ji dizî ve xwe dipesart.

Piştî mujdeya Ebo Minafiq sê rojan, ji derveyî rêvanên Zelê mihacirên eyaletê qulibîbûn ser rê. Sênca duryana Êraqê rabibû û

rê vebibû. Ne jidil jî be UNHCR jî keyfa xwe ji vê rêvantiyê re anîbû û kêmek tirimpêl jî şandibûn eyaletê. Çekdar, şev bipiyan, jin û zarok bi tirimpêlên DY kirêkirîn û xweyî lawir jî jixwe bi berbanga beyanî yê re derketibûn rê. Di nav du demjimaran de derdora rêya qîr ya ji Laleş diçe Şêxan qampek fêris hatibû avakirin.

Roj nû ji cihê nîvro bûrîbû. Hemwelatiyên wargeha nû, ji cêhbûnê nikarîn serê xwe bixwrînin. Malîvanên kevin ji yên nû bikelecantir û ji wan bêhtir dixebitîn. Heyhedanek ne asayî wargeha Nînûva dagirkirbû û av û nan jî di nav de tiştek ne dihat bîra kesî. Zarokên di dergûşan de jî xwe ker kiribûn û wan jî hîskiribûn kû ne dema giriye. Ji nişkan ve Enwerê Kurê Emerê Batûyî, bi qîr û girî neqeba Laleş xilaskir û ket di nav wargehê de. Bi peyvên di qirikê de asê mayîn û ne dihatin fêhmkirin digot;

“Cebar mir!”

Li pêş, dê û bavê Cebar û her kesî tevr, bêrik û çarkûçên xwe avêtibûn û ber bi neqebê ve bezîn. Li dawiya neqebê, li ber stûnek ya birqê li rasta kelaşê bê can yê Cebarê zarok hatibûn. Kelaş zarokê du dilop xwîn di kunikên pozan de zuwa bûyîn rakirin û anîn wargehê. Gora Cebar, bibû tirba yêkemîn ya goristana wargeha Nînûva.

Cebar Sanrî; kurê dazdeh salî yê Beşîrê Hacî Şrîfê ji Gundkê Melê bû. Xwendevanê refa sê ya dibistana seretayî ya Mehmet Karasungur bû. Piştî talan û embargoya PDK’ê, PKK kêmek dirav şandibûn eyaletê û rêvebertiyê jî pez û çêlek dabîn kiribûn. Ev lawir, li malbatên zarokên wan pir, hûr û neçar hatibûn belavkirin. Ji ber kû di barkirinê de DY tirimpêlên barhilgir ne anîbûn, gel neçar mabû pez û dewarên xwe bi peyatî derxîne rê. Cebar jî çêleka xwe anîbû. Ji berya hingê şivanokên gundên derdor têl ji tekelek teqayî derxistibûn, kevir bi her du serê têlê ve girêdabûn û avêtibûn ser têla birqê. Têla tekel ya bi birha keviran daleqayî jêr, nêzîkê erdê bibû. Cebarê haja wî ji birqê û hêza wê nîne, destê xwe tavêje têla tekel û li wêdê can dide.

***

Hefteya destpêkê ya nû hatiyên Nînûva bû. Koçberên Nînûva, bi çavên misoger li derbazbûyîna Êraqê dinêrîn û roj dihêjmartin. Jixwe Ebo Minafiq û rayedarên UNHCR jî mizgîniya warek bi ewle piştrast kiribûn û barkirin bê gomanbû. Ji berkû demkurt li warê xwe yê nû dinêrîn, pêwîstiya avakirina saziyên rêxistînî jî zêde ne dîtibûn. Ya rast, tinê mesele ne derbazertiya warê nûbû; bûyerên qewimîn, belavbûyîna eyaletê, derbazbûyîna axa Êraqê mejiyê qismek rêvan şêlokiribû û gotina “halê wan li wan bûye bela” tam di cihê xwe de bû. Ema rêvebertiya wargehê wekî wî qismê gel ne

dihizirî û di her mercan de saziyên rêxistinî şertek jiyanî dinirxand.

Tam di wê demê de Yaşerê turkê mejiyê wî jî mijdar û wekû berpirsê wargeha Nînûva hatî erkdarkirin; sê, çar ciwan li rex, çadira semtê ya li kererebeya Muhemedê dîn barkirî li pêşyê û ketibû di nav semta Hîlaliyan de. Di rastika nîvê semtê de çadir ji kererebeyê danîbûn û dest bi avakirina kolika semtê kiribûn. Zilamek pora wî ji ne şuştin qij bûyî, destek cilê Bohtanî li ber, pehniya meqaba di lingan de şkandî û sikeyek Goyîkî di destan de hat û li raser Yaşerê pişt tewandî dixebite sekinî. Hîlalî yê navser, bi dengek aciz û bi dêmek tirş got;

"Hevalê Yaşer, hûn li vêdê çi dikin?"

Yaşer, bi zimanê turkî û wekî her tim bi gotinên dide ser hev bersiv da;

"Em kolika semtê ava dikin, ka ji kerema xwe tu jî arî me bike."

Bi pê re çend ciwanên din jî ji çadirên derdor derketin û li wan kombûn. Zilamê navser, bi hatina ciwanên hemgundên xwe gurxweştir bibû. Bi milê Yaşer re girt, sikeyê kupalê xwe hilda jor û bi dengek gefker got;

"Ez ji te re dibêjim, vê çadirê li vêdê ne vede! Çadira xwe rakin û ji nav me derkevin!"

Yaşerê şaqis mayî û êdî devê wî wekî aşê avê tîpan dixwe, bi zimanê turkî got;

"Tu çi dibêjî, were ser hişê xwe!"

Zilamê ji bû lêdana Yaşer hatî erkdarkirin got;

"Çi cirdî birdiya turkiya teye? Qey emê ji turkan û turkî xilas nebin" û lekmek li Yaşer da.

Yaşer jî xwe neqayîlkir û kupalê ji hewa ve daket ser serê wî. Ciwanên Hîlaliyan jî xwe vekişandin ciwanên bi Yaşer re hatîn û şer destpêkir.

Hevjîna mezin ya Resûlê Hîlalî Xanê ya, bi qelebalixa şer ji çadira xwe derketî; kir hewar, bezî û xwe êxist di navbera Yaşer û zilamên êrîşkar de. Jina bi ser navsertiyê re yêxtiyar, dikir qêr, zilamên êrîşkar didan ber tehfan û zilamên Hîlaliyan şermedar dikirin. Çend jinên din jî gihatibûn hewara Xanê û belaya zilamên Hîlaliyan ji Yaşer û hevalên wî vekiribûn. Rêvebirê kelaşê wî dibin derbên sikeyên Hîlaliyan de herişî, kelaşê çadira semtê hiştibû wê erdê û ji semta Hîlaliyan derketibû.

Nû çend roj bi ser bûyera Yaşer re derbaz bibûn. Xebera ne bixêr zû gihatbû eyaletê û Sînanê Sohr sohrtir kiribû. Ji eyaletê komek endamên xweparastinê li tirimpêlan siwarkiribûn û berê xwe dabûn Nînûva. Piştî nîv demjimarî zilamên çekdar li derdora kelaşê çadira Yaşer belav bibûn û kupalek di dest de Sînan li raser

çadirê sekinîbû.

Wan koçberan, ti carî Sînanê Sohr biqasî wê gavê aciz nedîtibûn. Agir ji devan dibarî, birhên wî yên hemiz çavên gemimî nixwimandibûn û bi dengek tehdîtkar ji ciwanekî re got;

“Bangbike Resûl, bila were vêdê!”

Mam Resûlê qamqut, perixî û wekû pêşkêşê Hîlaliyan dihat hesibandin, hat û li pêşberî Sînanê ji teqandinek mezin re amade sekinî. Yêxtiyarê şaşikek Behdînî serê wiyê piçûk daqurtandî, dibêjîqey bi birha şaşikê stoyê wî yê kurt di navmilan de çûye xar, di bin dûvikên çavên xwe re li çekdarên derdor yên ji şerek xwîndar re amade temaşekir û got;

“Kerem bike Hevalê Sînan?”

Sînan, biqasek dirêj bê deng li nav çavên Resûl nêrî. Keserek kûr kişand û bi dengek gefker got;

“Ji çend serseriyên xwe re bêje, bila aha niha vê çadirê vedin, rayêxin û ji xebatê re amade bikin!”

Yêxtiyarê serhatiyên salên dirêj di nav qermîçokên rûyê xwe yê dapên spî ji zû ve nixwimadîn, vê carê bi awayek eşkere serê xwe rakir, li çekdarên ji her rewşa wan kifşe ji şerekî re amedene nêrî û bersiva Sînan da;

“Li ser serê xwe Hevalê Sînan! Yêk, du kesên xwe nenas exmeqtî kirine û ji ber wan ve ez lêbûrîna xwe dixwazim” bi pê re jî bangkir çend ciwanên malên derdor û di demek pirt kurt de wekî Sînan gotî çadir amade kiribûn. Sînanê Sohr jî bêkû gotinek din ji devan derbikeve, hevalên xwe komkirin û wekî hatî zivirîbû eyaletê.

### Laleş

Hefteya destpêkê ya meha bûkbû. Roja nû du bejna bilind bûyî, tîrojên xwe berdabûn ser çadirên wekî melkeban milê xwe dayîn hev. Çadirên kevin û rengê xwe wundakirîn, dibin tîrojan de bêxêrtir dixwiyan. Koçberên cil kevin, por qij û riha wan ne kêmî hefteyekî, li dora rêya qîr çûkvedabûn û bi awrên mereqdar li karwanên tirimpêlên ji kebarê ve dawî ya wan ne hatî, temaşe dikirin. Zerî û esmerên pora wan wekî hervişim li berbayê dikeve, bejna xwe bicilên renga reng xemilandîn û tacên ji kulîlkên gangilok û xecxecokan li ser pirça xwe bicêh kirîn; bibin dûvikên çavên xwe re bi awayek şermokî li mihaciran dinêrîn. Merwan, Birahîmê Erûhî û Serbestê Xaranî nû ji civîna hêza xweparastinê derketibûn û hê jî giraniya pirsgirêkên ne hatîn çareserkirin di dêmên wan de dihatin xwendin. Şêx Brahîm li pêş û hindama tûyên bi navbera girikê Fazil Buldan û Şefîqê Bilehî re derketin ser rê.

Birahîmê navser westabû û ji bandora bê haliyê pora wî ya

hişîn qijtir bibû. Bi çavên xweyên kuskusî li karwanê tirimpêlan nêrî û got;

"Çi qewimiye îro? Xêle, dawete, seyrane Êzîdiyan wisa xwe xemilandine; yên bi kû ve herin?"

Merwan, bi keyf û kelecanek lekimvan;

"Çarşema serê Nîsanê ye. Cejna jiyanê ye. Ji bû cejn û şahiyê Êzdî diçin Laleş" got û çavkir Serbest.

Serbest qet Laleş ne ditibû û pir dixwest bibîne. Dixwest pêşniyara çûyînê bike lê, nizanî berteka Hevalê Birahîm ya çibe. Piştî qirika xwe paqijkir, gotin bir û anî û pêşniyara dixwest bike ji deva felitîbû. Birahîm xwest, bê wî herin. Serbest û Merwan israr kirin. Ji bû pêşmerge wan nas nekin û ne vegerînin, pîkabek paşiya wê vale rawestandin. Li ser daxwaza Birahîm û dilpêşewîtina jina navser ya ligel ajotvan rûniştî, li tirimpêlê siwarbûn û piştî deh deqîqeyan liber dergahê Pîroz peya bibûn. Her sê zelamên koçberên welatê xwe gorên rîs heşandin pêlavên mekab de, bi pehniya pêlavên xwe re girtin û li ber kembera aqidî ya pira Selatê rawestan. Deriyê mezin-bilind, aqidî û wêneyek ya rojek bîst û sê tîr di serdera wê de kolayî, efsûndarbû. Baxçeyê zeytûnan yê li dawiya paş yê pirê dixwiyê, xemlek muhteşem li pira Selatê bar dikir. Sê, çar keçên ciwanên delingên xwe hildayîn, bi ser pira nêzî deh mitre dirêj re dibezin wî alî û dubare bibez dizivirîn aliyê din.

Wê rojê di geliyê Laleş de ax bihata hilavêtin ji mirovan li erdê ne diket. Keçên bi cilên renga reng xwe xemilandîn, Bavêşêx, Şêx, Pîr, Qewal, Feqîr, Bavêçawîş, Guhçak Kevanî û Micêwrên jin û mêr li navguhê hev diketin. Darên tû yên gelî dagirtîn, tirh dabûn û berhemên hê pirçik, maka xwe bi rengek gewrîn nixwimandibûn. Birahîm, kêmek dirav avêtin ser desmala Micêwrê cemedaniyek sohr bi şêwazê Bohtanî girêdayî û biskên rêh û simbêlên wî yên wekî qitranê tevlîhev bûyîn. Micêwrê xweş zilam, bigotina;

"Destê Melekê Tawus li ser serê we be" minetdartiya xwe anî ziman û wekû rashatî her sê serdanvanên ûrkel hewaketin Meydana Melekan.

Meydana Melekan; di navbera deriyê Mîr û deriyê Muradan de cêh digirt. Mirov dikare ji sê deriyan ve bikeve di meydanê de. Deriyê Mîr, ji sûka Marîfetê derdiket meydana Melekan. Deriyê ji aliyê zikaka Stiya Ês ve tê, deriyê Celsê ye. Deriyê Muradan jî ji aliyê Rojhilat diket şkefta Zemzem û bi tirba Şêx Adî re derbazî hemen meydanê dibe. Deriyê Mîr, li Rojavayê meydanê ye û li çep û rastê derî dirîncên du pêpilik hene. Dirînca rastê dadikeve meydana Melekan û ya çepê jî dadikeve zikaka Stiya Ês. Li pêşya deriyê Celsê pênç mitreyan, birka Kelok heye. Di vê birkê de şêx û kesên li Laleş jiyan bûyîn, mirîn û ruhê cesedên wan koçkirîn dihatin şuştin. Jiber

kû di felsefa Ezdatiyê de, mirin ne dawiya jiyanê; dawiya zayînêye û kesa ruhê wê koçkirî di bedena jîndarek din de jiyan dibe. Li aliyê çepê yê birka Kelok, civata Melek Ferxedîn heye. Di cejin, sersal û bîranînan de Bavê Şêx di wê dîwanê de dirûnê. Li milê rastê yê birkê, xizîna Nan cêh digre. Devê vî hewtê mitreyek û nîv dirêj, fireh û nêzî heftê û pênc santî mitroyan kûr, bi sanduqek hêsin hatiye girtin. Di dema şuştina cesedên temsîlî de ev sanduq dihat rakirin. Li Rojhilatê xizîna Nan, komgeha Pîr Seîdê Bedewî heye û her sê darên pîroz yên di nîvê meydanê de xemlek cuda li meydana pîroz dikirin. Li rastê deriyê Murada (Muraza) nîşangeha Şah Siwar cêh digre. Ligor gotinên gotinbêjan, di vê Nîşangehê de heft tawusên pîroz dihatin parastin.

Dema ew her sê biyaniyên bicilên xerîb bi meydanê re derbaz dibûn, Qewalên Guhçak yên ji rêzê ve rûniştîn û li bilûl, erbanê û Zemberê didan jenantiya xwe şemirandibûn û bi awrên şaqis li wan temaşe dikirin. Guhdarvanên jipiya û bi ser milê hev re li hunermendan temaşe û guhdar dikirin jî awrên xwe vegerandibûn ser wan û kêmekî navber dabûn keyf û sema yê. Piştî mereqa di awrên wan de derbazbû, dubare ji cihê lê mayîn şahiya xwe domadibûn. Li çepê rêya pêşberî deriyê Muradan, Kevaniyek navser, gurza keziyên wê yên hunadîn di ser singan de têne xar û xweyê dêmek bê qisûr bi jinek Micêwir re taxivî. Jina xwirî spî pêçayî, bi awrên hizirdar li wan mêhvanên xerîb dinêrî. Her sê serdanvaniyên rakêş, ji Kevaniya awir bedew bûrîn û di navbera dazdeh mezelên aqîdî û quba heşt perî ya sûka Marîfetê re derbazbûn. Sûka Marîfetê ya di navbera deriyê Mîr û Koçka Zoro de cêh digre, di bin çeqilên darên berû de wunda bibû. Bi deriyê Mîr yê li Rojhilatê meydanê re ketin di hewşa avahiya gora Şêx Adî de û li pêşberî deriyê Murada rawestan.

Dibekû di aliyê mîmarî de li vê dola efsûndar cihê herî spehî û bedew ev derîbe. Li ser milê rastê yê deriyê serder xemilandî, wêneyek yê marek reş hatbû kolan û bi qubek bîst û çar per hatibû remizandin. Merwan, di navbera milkê derî û wêneyê kolayî yê mar de destê xwe bi ser milê Serbest re avêt û got;

“Makîneyeka me ya wêneya hebiya, meyê li vêdê wêneyek bikişanda. Dema Kurdistan rizgar bibûya, minê ew wêne mezin bikira û bi serdera odeya xwe ve bidaleqanda.”

Serbest xwest jidil bikene û dinanên wî yên ketî hatibûn bîrê û lêhvên xwe bi ser hev ve şidandibûn. Milê xwe ji bin çengê Merwan kişand û got;

“Devêca li Kurdê xwedê binêre! Em di heyra peydakirina fîşekekî de ne, ew makîneya wêneyan raman dibe.”

Di vê navberê de awrên Êzdiyên hewş dagirtîn, li asîtana

herkes maç dike hatibûn qulfkirin. Hemiyan bi dêmên tirş û awrên dijwar li wan kesên xeşûm dinêrîn. Ji nişkanve Mêcêwra ji bilî kitana li serî hemî cilên wê reş, bi kerb bezî û bi hêrs Birahîm hişyarkir. Birahîmê ji xwe fihêtokî, bi vê berteka ne çaverê di ser hev de qumişîbû. Bi şaşîtî pêl asîtanê kiribû û di baweriya Êzdiyan de ev bêrêzî û gunehbû.

Her sê zelamên xeşûmê qewl û edetên Laleş, di bin bandora berteka Micêwra dijwar de ketibûn di Sindurok (gor)a Şêx Adî de. Di hundirê Sinduroka bi Periyan hatî xemilandin de dîwana Şêx Adî û çiraya Marîfetê hebû. Herkesê bawermend gor maç dikir, sê caran dorê re dizivirîn û ji bû murada wan hasil bibe, girêk li periyên gor xemilandîn didan. Li rexa Rojava yê gorê mezelek din hebû û di wê mezela tarî de, bi dehan Lînên (kûzê) dohnê zeytûnê bê rêkûpêk bi erdê re dirêjkirîbûn. Li çepê dîwanê deriyek nivz û girtî hebû û ev derî derdiket dîwana "Beriyê Şibaka" Şêx Adî.

Birahîmê jixwe temendar û dibin barê giran ya koçberan de ji temenê xwe mezintir dixwiyê, westabû û ji ber wî gera xwe ya sêhrvan rawestandibûn û derketibûn hewşê. Birahîm, dixwest derkevin çiyayê Erefat û bêhna xwe vekin. Merwan û Serbest jî dixwestin, li her derê dola pîroz bigerên û keysê bidest êxistîn baş binirxînin. Li hember awrên ji kelecanê dibiriqin Şêx Brahîm têkçûyîn pejirandibû û li dûv her du hevalên xwe yên ciwan dixirikî. Bi cem Periya Heft Siwar re derbzbûn û bi deriyê piçûk yê li rexa Dîwana Berê Şibakê re ketin hundir. Hundirê zilomat bi findan hatibû ronahîkirin. Ronahiya ji guriya findan vedida qelsbû û Birahîm, di dîtinê de zehmetî dikişand. Merwan bi destê hevalê xwe yê yêxtiyar re girt û di pêpilkên hilûs de daktin xar. Piştî heft pêpilkan, di çepê şkefta tarî de ava Zemzem derket holê. Li heman cihî Kepenê Şêx Adî jî dihat parastin. Di hundirê şkefta mezin de du qetê coya aşekî av diherikî û av di heman şekftê de wunda jî dibû. Her bawermendê amade, dest û rûyê xwe bi wê avê dişuşt, çend kulm li derdor direşandin û kêmekî vedixwar. Daxwaza muradê dikir û dihat bawerkirin kû heke hêstên kesên muradxwaz paqijbin, murada wî hasil dibe.

Têkoşerên Asîtana Pîroz, ji şkefta Zemzem zû derketin. Bi rêya xwe re zivirîn Sûka Marîfetê û ji bû derkevin Çiyayê Erefatê, bi zikaka Dînan re hawaketin. Li rastê zikaka Dînan, stûna Muradan û şkefta Memedê Reben cêh digirt. Serbest, li pêş zêdekir û ket di şkefta stûna Muradan de. Ji bû destên xwe bi stûna kevir û stûr re bigihîne hev pir hewlda ema, biser neket. Jixwe Merwan û Birahîmê bejna wan ji ya Serbest kurtir, zêde pêwîstiya hewldanê jî ne dîtibûn.

Bayek hunik û nerm diherikî û bêhna gul û hendekokan bi xwe ra tanî. Ji serê çiyayê Erefat geliyê Laleş, efsûndartir dixwiya.

Qubên melkebî yên perên wan tîrojên rojê temsîl dikin, dîtinek sêhrvan li spehîtahiya gelî bar dikirin. Geliyê Qewalan, yê di navbera çiyayê Erefat û çiyayê Mişrûgiya de cêh digre, ji darên berû tijî bibû. Di niwala Waweylê de deriyê şkefta Cinan, ji dûr ve piçûktir dixwiya. Çiyayê Hizretê, yê ji Rojava ve Laleş dipêçe sûrha Nînûva tanî bîran. Dîwana Şêx Adî, li serê Çiyayê Mişetê yê ji Başûr ve gelî dipêçê cêh digirt.

Ligor baweriya bawermendên Êzdî, Tawusê Melek û Şêx Adî li serê çiyayê Erefatê li rasta hev hatine û hev nas kirine. Ji wê sedemê ev gir pîrozbû û di agirdana li serê çiyê de her şev agir dihat dadan. Yêk mezin ya din kêmekî piçûktir li serê gir, du darên berû hebûn. Ev darên Muradan, dibin terîşên rengîn de wunda bibûn. Ya mezin ya jinanbû û ya piçûktir jî ya mêranbû.

Komek jin û mêr têkel, bi awayek tekûz nîşanên xwe bi darikên muradan ve kirin û bi hev re hawaketin rastika jor ya agirdana kevirên wê ji ber teniyê reş bûyîn. Agirdan maç kirin, torekî bi dora wê re zivirîn û bi rêya hatîn re daketin jêr. Serbestê di derbarê Ezdatiyê de zêde ne xweyî lêkolîn, bi awrên mereq barkirî li Merwan zivirî û got;

"Qey ev cejna keyf û seyranêye, ti pêkanînên wê yên din nînin?"

Merwan, di bin lêhvên xweyên tenik de beşişî û bi beşişandinê re rêza dinanên wî yên wekî mircanan xwiyan. Çavên xwe yên reşbelek pesartin tîrojên rojê û ji her rewşa wî kifşbû vê pirsê ew şad kiribû.

"Jixwe ev cejna jiyanê ye. Tê bawerkirin kû îro Zerdeşt jidayik bûye. Ezda; îro Melekê Tawus, Adem û Hewa û Şahit bîn Car afirandiye. Ligor salnama Newroz, her sal çarşema yêkemîn ya Nîsanê ev cejin tê pîrozkirin. Ankû roja avakirina cîhanê ye."

Serbest, bi serxwe ve hat qutiya xwe ya elbikî derxist;

"Kurdo, bibexşîne! Heke hevalê Birahîm lezê neke, ezê îro pir pirsan ji te bikim" got û wekî erêkirina wî bixwaze li hevalê xwe yê por xemor nêrî.

Birahîm, bi serê xwe daxwaza Serbest erêkir ema, ji her rewşa wî kifşebû wekû ruhî pir mujûlbû.

Serbestê erêkirina hevalê xwe yê yêxtiyar jî girtî, bi dengek dilniyatir pirsên xwe ajotin;

"Melekê Tawus kêye?

"Ligor bawriya Ezdatiyê, Xwidayê Ezda destpêkê Melekê Tawus dafirîne û bi pişt re jî şeş melekên din. Melekê Tawus wekû cêhgirê xwe û ser melek ayan dike.

Ev her heft melek têne cem hev;

Di roja yêkemîn (Şemî) de "axê dafrînin.

Di ya duyemîn de “ba”yê,
Di ya sêyemîn de “avê”
û di ya çaremî de, ankû Çarşemê jî “ar (agir)” dafrînin.

Di heman rojê de, ankû îro ev melek gokek agir rêdikin cîhana me û jiyana li ser rûyê erdê bihebûn dikin. Ev herçar elamet (element); ankû “Ax, Av, Ba, Ar” wekû di zanyartiya Zerdeştiyê de, di Ezdatiyê de jî pîrozin.

Dîsa di vê felsefê de “Roj, Heyv (Meh), Stêr” jî pîrozin û pîroztiya hêjmara ‘heft’ ji vêdê jêder dibe. Ola Ezdatî yêk xwidayiye û di exlaqê vê olê de “ax” û “av” nayên firotin û her kêyê kû vê bike ji bin ve xirabe.”

Serbestê heyrantî û şakistiya wî ya li hember wê dola efsûndar di dêmê wî de dihat xwendin, pirs didan dûv hev û dibêjîqey dixwest di yêk carî de her tiştî fêr bibe. Di dabaşa Laleş de Merwan, ji bû wî şansekbû û ne dixwest vî şansî bi revîne.

“Di vegotinên we de tiştek din bala min kişand. Em hemî hemfikrin kû Zimanê Kurdî yêk ji zimanên herî kevne û bêjeyên wekû pîroz jî derdikevin pêş – Av, Ax, Ar, Ba, Roj, Heyv, Stêr- bêjeyên vî zimanî yên destpêkêne. Ev bêje hemî yêk kiteyîne gelo, qey bêjeyên kurdî yên safî û mak hemî yêk kiteyîne?”

“Nizanim. Mirov dikare vê rêznavê pir dirêjtir bike wekî; ga, ker, şîr, pez, mêh, berx, kehr, mast, dew, gur, se û wekî din. Gelê Kurd, gelek lawirvan û çandinvane û ev bêjeyên wan yên destpêkêne. Bi dîtina min, peyvên pêkhatî yên niha em pê taxivin; ji peyvên yêk kiteyî yên hevgirtî pêktêne.”

“Wekû resen wateya bêjeya “Çarşem” çiye?”

“Ligor zimanzanên me, “çar” Kurdî û “şem” ji şemsa (roj) Erebî tê. Ema di çîroka afirandina çar pîroztiyan de jî derdikeve holê kû paşgira “şem” ne ji cihek din hatiye girtin. Di Kurdî de bêjeyên wekî “şeml, şem, şemal, şewq, şox, şeng” remza ronahî û spehîtahiyêne û tûrhên heman qurmepeyvêne. Dîsa hêjmara “heft, heftî” jî di vê çarçovê de ye.”

“Êzîdî çiye?”

“Dibekû bilêhv kirina bêjeyê ya rast, ‘Ezda’ be. Ankû Xwidayê “Ez da”yîm. Di zimanê Kurdî de û biteybet di felsefeya Zerdeştî de bêjekirinên girêdayî vî rayî hene. Wekû mînak; “ez-da, xwe-da, me-da, xwe-za.”

“Gelo, Sermelekê vê birê jî ‘Xweza’ye?”

“Hemî nîşan û heyîn diyar dikin kû wekî xweza, “ez-da”yê vê birêye.”

Serbest beşişî û dengê wî kêmek bitinaz derdiket êdî;

“Musa yê reben çil salan meşî, encex dikarî axên pîroz ji dûr ve bibîne. Em di sê salan de gihatin nîvê axa pîroz!”

Serbest, awrên xwe yên mereqdar pesartin keçên li ser kehniya Spî henekan dikin û mizek kûr da çixara xwe ya nû pêçayî. Dibêjîqey eşqa dîtina Laleş hê jî ne berdabû û bi wê eşqê çavên xwe zivirirandin ser hevalê xwe yê xweşik. Bi awrên kelecan ji wan dipijiqe qasêkî li dêmê gewr û simbêlên zirav xemla wê timam dike nêrî û bikelecan pirskir;

"Şêx Adî kêye?"

Li ser vê pirsî xendeyek tevzker û jandar rûyê Merwan pêçabû. Kêmekî rawesta. Dibêjîqey di bersiv dayînê de dudil mabû û an jî ji tişta bêje ne qayîlbû. Keserek kûr hatê û got;

"Şêx Adî Bîn Musafirê Baalbekî; 1075'ê Mîladî li gundê Bêtil Far- di roja me de wekû Xirbet Kanafar tê zanîn- yê Lûbnanê jidayîk bûye. Di ciwantiya xwe de li cem yêk ji sofiyê herî girîng yê Mistîzmê Mele Xezalî ders dîtiye. Piştî bi damezrênerê Terîqeta Nakşîbendî Evdilqadir Gêlanî re hevnas dibe, bi birazyê wî Şêx Hesen ve rêdikin Laleş. Ligor hin jêderên ne az, eslê xwe Ji Hekarya ye û malbata wî ji ber qirkirina artêşa Îslamê reviye û çûye Lûbnanê. Ankû di jêderên dabaşa gotinê de, wekû Şêx Adî el Hekarî jî derbaz dibe.

Piştî tê Şengalê, dixwaze ji Mîtraîzm û ji Zerdeştîzmê sertezekî çêke. Bawermendên resen û xwecih vê hewldana wî wekû reformê dinirxînin û bi dijwartî li dij derdievin. Di vê berxwedanê de şer û qirkirinên mezin rû didin. Ligor tê gotin; şerê herî mezin û yê dawî li derdora geliyê Qiyametê pêk hatiye. Li wêdê Rojyar (xwecih) û Adanî (aligirên Şêx Adî) yan şerek mezin kirine. Adaniyên dibin fermandartiya Biraziyê Şêx Adî, Şêx Hesen de, biser ketine û Rojyarî di qirkirinek mezin re derbaz kirine. Di encama vê têkçûyînê de, Rojyariyan qewlên Adaniyan pejirandine û teslîm bûne.

Jixwe heke baş were lêkolînkirin, ji berya hatina Şêx Adî û û bi bin ketina Rojyaran; di nav Êzdiyan de saziya "şêx"îtî û "ben"îtiyê tinebû. Wekû pêşvanên ola Ezdayiyan saziya fer "Pîr"îtîbû. Bêjeya "Pîr" kevne û hê ji serdema Neolîtîkê tê. Di Elewiyan de hê jî ev sazî zindiye. Bêjeya "Pîrek" jî tûrehdayîna vê têgehêye. "Pîr-ek" ankû "fer- pîr, yêk pîr, hergîz pîr." Bi pêşketina Şaristaniyetê re Stî (Xwidawend)tî wekû qehbîtî ayankirin û ev bêje jî wekû jiniktî derxistin pêş. Ankû ji bû valekirina naveroka van saziyan, reşkirinek mezin pêşxistin û mixabin biqasekî ser jî ketin. Bi hatina Şêx Adî re, di ola Ezdatiyê de saziya "Pîr"îtî dadikeve pileyên dawî. Ankû di dereca yêkemîn de Mîr cêh digre. Pêşmîr, Bavê Şêx, Şêx, Pêşmam, Şêxê Wezîr û piştî wê Bavpîr û Pîr têne."

Awrên Merwan, di valetiya niwala Waweylê de daleqayî mabûn û keserek tevlî kîn kişand. Dengê wî hatibû guhertin û dibêjîqey bêbextiyek bê binî vedigot. Xendeya li ser rûyê wî yê sîs, cihê xwe ji jandertiyek tehl re berdabû. Axînek ji dil kişand û

gotinên xwe ajotin;

"Ya 'Ezdanan û pîroztiyan ava dike çande. Di kurdan de çand, tevayetiya jiyanê ye. Fir'ewnên hemdem pîroztiyên me lewitandin. Musa, ji bû xwe bigihîne Axa pîroz dimeşiya. Em, jibû Axa pîroz paqij bikin vê cenga bê eman dimeşin. Ferq eve."

Dibêjîqey awrên Merwan, bi ser girê Pîroz re bi çiyayê Şêxan ve qerisîbûn. Çavên wî yên gir û belek çûbîn ava û di nav mijgûlkan de bizorê dixwiyan. Ewî li valetiya navbera her du çiyan û Serbest jî li dêmê wî yê girover dinêrî. Ji her halê wî kifşbû ya ew pir êşandî hatibû û bîra wî dagirkiribû. Ji nişkan ve veciniqî û awrên xwe pesartin yên Serbest. Awrên wî hatibîn guhertin û bi îfadeyek kîndar hatibûn nixwimandin.

"Heta di aliyê siyasî de rastiya mala Berzanî û ya olî de ya Şêx Adî ji Gelê Kurdistanê re newe rayêxistin, ev jiyana her jandar be" got û gotûbêja li ser çiyayê Erefat dada.

Birahîm, li demjimara xwe nêrî û xwest rabin. Merwan bibeşaş li dêmê wî nêrî, kefya xweya rîşîdirêj li stoyê xwe pêça û got;

"Hevalê Birahîm, ez bitirsim îro koça ruhî bi we re jî çêbûbe. Ji sibehî ve qalikê we li vêdê ye ema, ruhê we ne diyare. Tiştek ya em nizanin û we aciz dike heye?"

Birahîmê Erûhî;

"Tansu Çiler, îro bi serdanek suprîz çûye Bexdayê. Ez bitirsim sebebê vê serdanê em bin û her tişt di aliyê neyînî de were guhertin."

Serbest;

"Kê got?"

"Radyoya BBC."

Komek zeriyên cilên reng bireng bejna wan di xemilînin, ketin di deriyê aqidî yê kehniya Spî de. Wêneyê kolayî ya roja bi serê stûna dazdeh per û banê kehniya Spî diniximîne, li ber tîrojên tavê dibiriqî. Quba wekî kovikekî bilind dibû, ji ya Şêx Adî pir piçûktirbû. Ji ber lêketina destên keçan, leylanokan li ser rûyê ava birkê gêr vedidan. Leylanok li dîwarên rexan diketin û wunda dibûn.

Her sê şoreşgerên bi barê welatek bindest barkirî, bi gavên bilez ji çiyayê Erefat daketin xar. Jixwe hertim bilezbûn û fêrî hêdî çûyinê ne bibûn. Di zikaka Dînan ya teng de ji komek zeriyên pora wan wekî hervîşmê li ser navmilên wan dilerize, boyaxa dêmê wan di bin tîrojan de dibiriqe û ji cilên wan kifşe ji welatên xerîbiyê hatine, bûrîn û bi rêya xwe re zivirîbûn wargeha Nînûva.

***

Biharê bi hemî bedewtiya xwe qada tampon ya parelêla

sêh û şeş xemilandibû. Qada di Ezdatiyê de 'Pîroz' û mêhvanên nû wekû "Nînûva" bi nav dikin, keyfa biharê jiyan dibû. Kulîlkên sînem, nîsan, beybûn û terezinan milê xwe dabûn hev û dîlana bûka biharê digerandin. Perîstank û xalxalokan bêhna gul û hendekokan li axa pîroz direşandin û jîndarên wê mest û serxweş dikirin. Zeman ber bi bêdawîtiyê ve diherikî û tiştek ne kifşbû. Ew zemanê raz veşartî, serîwanvanên wargeha Nînûva bixwe re dixirandin û ya wan bavêje kûdê, ew jî ne dihat zanîn. Yên çend duryan din derbaz bikirana, kêyê li kûjan duryanê bê taqet biketa û çend kesê bi eşqa Cejna Jiyanê heta dawî Semaya welatek azad bigerandana, ew jî ne kifşbû. Dema sergovendiya semayê dihejandin, çend kesên din yê bi tîrên Ehrîmanan çûbûna ava qet û qet jî ne kifşbû.

Serxatûna Sitargeha Înana ya Şaristaniyetê, bi serdanek bê vexwendin li deriyê Bexdayê dabû û gefên Nemrûdên hemdem ji Sedam Husêyn re ragihandibûn. Seyît Reîsê xwe mêrxasê Ereban ayankirî, li dijî mîrên Kapîtalîzmê serî rakirî, li hember gefên jina zer û girover sto xwehrkiribû û sozên dayîn zû jibîrkiribûn. Mam Celalê li ser dengeyan li pariyek nan digerê, cara yêkemîn rûyê xwe yê rast nîşa rêvanên rêya azadiyê kiribû. Li cihê "soza mêrê berê" badev diherikî û wirarên wê ne dihatin fitirandin. Rojavayiyan, soz kiribûn siyaset, siyaset kiribûn polîtîka û polîtîka jî vegerandibûn derewên rûsar.

### Dawiya Eyaleta Şehît Jiyan

Bi serdana suprîza wezîra karê jiderve ya dewleta Turk Tansu Çiler re "mujde" ya Ebo Minafiq jî ketibû di avê de. Ne tenê derbazbûyîna Êraqê, xeyalên çûyîna Zelê jî qedan dibûn. Yêk cêh û bijartek mabû, ew jî wargeha Nînûva bû. Heke ew jî ji bijartekan bihata hesibandin. Warê nû di qada Tampon ya Parelêla sêh û şeş bû û pêwîstebû ne dibin desthilatdariya ti hêzan debe. Ema, ne wisabû. Wargeh, di nav gundên eşîreta Zêdikiyan de bû û ew jî şûrkêşên PDK'ê bûn. Karwanç koçberan, ji Rojhilatê çiyayê Şêxan qulibîbû Rojava ema, desthilatdar ne hatibûn guhertin û coxrafya wargehê ji dorpêça Mît'a Turkan û PDK'ê ne derketibû. Dîsa kengê bixwazin dikarin wargehê bose bikin, embargo deynin, koçberan bikujin û talan bikin. Jixwe ji roja destpêkê û pêve, hem Êraqê û hem jî PDK'ê embargoya wargehê ayan kiribûn. Ji aliyê Şêxan û Mûsil ve leşkerên Êraqê girtibûn û ji aliyê Etrûş, Duhokê ve jî pêşmergeyên PDK'ê.

Rojên dawiya hefteya duyemîn ya Meha Nîsanê bû. Koçberên ji bû çûyîna Zelê li eyaletê mayîn jî bi derfetên xwe hatibûn wargeha Nînûva. Li Rojhilatê wargehê, di navbera niwala ji neqeba Laleş tê û bi binê Nînûva re derbaz dibe û quntara çiyayê Şêxan de wekû

semta pênc bicêh bibûn(12, 04, 1997).

Di nav warên herî zêde warnişînên xwe bêşîne de, diyare ya warê axa pîroz bûya. Pesartekên sedemê vê îdîayê bi dehanbûn. Yêk; êrîşên di sê salên dawî de û biteybet di aliyê madî de koçber ji taqet êxistibûn. Di aliyê rewanî de jî belav bûyîna eyaletê bandorek neyînî kiribû. Ji hifdeh hezar kesên şêniya eyaletê pêktanîn, tenê 7605 kes gihatibûn wargeha Nînûva. Du; wargeh di herêma tampon de bû û di aliyê ewlekariyê de ti parastian wê tinebû. Koçber, ji ber Turk û PDK'ê revîbûn û dîsa li qadek dibin desthilatdartiya wan de mabûn. Kengê, çawa bixwestana dikarîn bose bikin, embargo deynin û talan bikin. Sê; wargehê di boseyek xwezayî de danîbû. PDK'ê, destûra aliyê Duhokê ne dida û Êraq ya Mûsil. Çar; rayedarên UNHCR, carnan dihatin û diçûn ema, ji embargoya par ve ji bilî hin qûtê ne birêkûpêk ti arîkarî ne dikirin. Qûtê wekû mehane didan, têra hefteyekî ne dikir. Ew jî heft kêlo ar, kêmek birinc û ya din bi keyfa xwe bûn. Carnan ji kêloyekî kêmtir nîsk, şekir û ji sed xiraman kêmtir ça didan. Dema keyfa wan ne li cêhbûya ew jî ne didan. Demsal biharbû û koçberan ji avzêmên derdor ava xwe peyda dikirin. Piştî demek din ew avzêmên biçikana û pirsgirêka av û paqijiyê ya serî hildabûya. Pênc; ya herî girîng rewşa navxweyîbû. Ji bilî neqla destpêkê û dawî hatîn, hemwlatiyên din kû zêdahiya wargehê ew pêktînin, ne qayîlbûn. Di bin êrîş, embargo û qirkirinan de kerixîbûn û ne eşkere jî be ji bûyerên diqewimin behra PKK'ê jî tevlî dikirin. Şeş; li warên din, wargeh li xakên serbixwe dihatin avakirin û gel ewlekariya xwe digirt. Dergahek yê wargehê hebû û nobader li ber dergahbûn. Bê qontrol û destûr, tu kesî nikarî biketa di nav malan de. Wargeha Nînûva, bi dirêjahî li ber rêya mak ya ji Şêxan diçû Duhokê bicêh bibû. Roj bîst û çar demjimare, tirimpêl bi nîvê wargerê re derbaz dibûn û ne dergahek û ne jî venêrînek hebû. Kê bixwesta dikarî bi her alî re bê pirs û lêpirsin biketa di nav wargehê de. Vê jî zeravên şêniyên wargeha Nînûva diqetandin.

Ji nîvî zêdetir ehlê wargehê ji rêvebertiyê cihek ewle û birêkûpêk dixwestin û ne tenê dixwestin; dipesartin jî. Bi ser hatinan wan re mehek derbaz bibû ema, hê jî Hilaliyan destûr ne didan ti nîşanên rêkxistinê di nav wan de werin avakirin. Lê, şev çiqas tarîbe jibîrkirina spehîtahiya stêran ewqas gunehe. PKK'ê, di bin felsefeya ruhê BERXWEDAN JIYANE de, di demên herî teng de gavên herî mezin avêtine. Rêberê mezin, zanyar û ramyarê sedsala bîst û yêkê gotiye;

***"Hîvî ji serkeftinê binirxtire."***

Jixwe ya hêz dida, li hember hemî bose, embargo û

qirkirinan ruhê berxwedanê mezin dikir, bi coş, kelecan û gêwil dikir ev HÎVÎ bû. Heke ne hêviya vegera welatek azadbûya, heke ne xeyalên rengîn yên xwe gihandina axên pîrozbûya, kûjan qudretê dikarî çirkeyekî jî wî gelî di nav wê janê de zetim bike!

***

Bi hatina refa dawî re tevgerek erenî ketibû di nav koçberan de. Kêm-zêde gel bicêh bibû û êdî dora sazî û ji nû ve xwe rêkxistinkirinêbû. Dibistan hatibûn avakirin û sala perwerdê ya nîvî mayî ji zû ve destpêkiribû. Ji niha ve asayîş, navenda hêza xweparastinê, kolkên semtan, kolikên televîzyonan, navenda malabatên şehîdan hatibûn avakirin û tekûzkirin. Hêza xweparastinê û asayîş, ji parastina wargehê berbirsbûn û ji her demî bêhtir di tevgerê de bûn. Li hember êrîşên jiderve û biteybet şev, wargeh ji aliyê wargehiyan ve dihat bosekirin. Ji Rojhilat ve rê hatibû keşifkirin û dibin rêbertiya Emerê Batûyî de, rêya di navbera Gara û Nînûva de wekî rêka kakêşokan dixebitî. Ne wekî eyaletê jî be, hêdî hêdî sazî û dezgahên pêwîst dihatin rêkxistinkirin û jiyan ber bi ne kifşbûyînê ve diherikî.

Xwezayê xwe bi kirasek rengîn pêçabû û ji bû guhertinê dibêjîqey hewar dikir. Dema çûyîna çiyan hatibû û xwer ketibû milîsên Gabar. Jixwe çend salên mihacirtiyê wisa derbaz kiribûn. Zivistanê, dihatin wargehê û bi axlêvê re xwe tavêtin çiyayên bilind. Ji ber qewmîn û barkirna salê dereng mabûn û pitya wan ne dihat. Ji bû çêkirina dinanên xwe, Serbest ji refê diqeta û rêvanê Hewlêrê bû. Berê Merwan li Gara bû û yên mayîn rêvanên çiyayê Gabar bûn.

### PDK û Mala Berzanî

Tarîtî nû ketibû û reşê heyvêbû. Di nav stêrên bê hêjmar yên bi ezmanê zelal ve daleqayîn de, stêra Şivanan ji her demî bêhtir dibiriqî. Komika sêwiyan nû hilatibû û wirarên bist û pêwiran ne diyarbûn. Bayê hunik bi bêhnek xweş barkirîbû û hemî bêhnên ne xwezayî liber xwe dibirin. Di çadira Zigurdên Gabar de komcivînek ne fermî lidarbû. Bi gotinek din, dema xatiranbû. Biçav pêketina destpêkê re kifş dibe kû destê jinekî li wê çadirê ne ketibû. Rext û têzat, li quncikê çepê yê devê derî şkêrikî li ser hevbûn. Çend betaniyên helefa, yên wekû nivîn bikartanîn li quncika jor bê rêkûpêk pêçayîbûn. Betaniyên binê çadirê dinixwimandin qermiçîbûn û şemitîbûn aliyê nivz. Dû li ser guriya fanosa şûşe lewitî diket û bi stûna paşiya çadirê ve dileqa. Liber şevaqa zerhimî ya di şûşeya şêlo de reqsa Torikî dikir, rûyên mirovan zor dihatin fitrandin. Ji çadana

ji tenîdohna dûyê tebaxê şemala wê hatî guhertin, Feqeyê Gweyînî ça dadigirt. Serbestê bi du hevjînan û hevjînên wî nû hatîn wargehê, hê fêrî jiyana malbatî ne bibû û piraniya wextê xwe di wê çadirê de derbaz dikir. Wekî her tim dîsa bi girêdana rextekî ve mujûlbû Serbest. Wekî elokan poza wî yê mezin daleqayî Sohro, li quncika jor rûniştîbû û heta gotin ne hata ser ne taxivî. Pişta Merwanê çarmêrkî rûniştî, li stûna paşiya çadirêbû û her kû xwe dilivand fanos jî bipêre diheja. Tîr li dûyê çixarê ne diçû û hemabêje bêdengiyek xwezayî di dihundir de desthilatdarbû. Kes naxwaze dikara dabaşa şevê din bike û hê dabaşek nû jî venebibû.

Şevê din taxim wan li neqeba Laleş hêşedarbû. Ji nîvê şevê kêmek derbaz bibû. Her kes di çepera xwe de bû û guhê wan dengek piçûk jî ne direvand. Feqeyê di henekan de hosta, hêdîka xwe kişand çepera Evdiqadirê Reşêneyî û got;

"Mala te, di vî temenî de tu şerm nakî fîşekên hevalan didizî?"

Evdilqadirê jixwe di kevçikek av de dixeniqe, ji cihê xwe hilbeyî û ji dîn û îmanê xwe derdiket. Bi dengek aciz û kef bilixaban ketî pirsa; "kê ji te re got, fîşekên çi" kir.

Feqe, bi rûyek mucid û wirarên henekan li ser nînin bersiv da;

"Egît got; 'dema cebalxaneya hevalan birî Gara bi rêve çend jerjûr fîşek dizîne û ji xwe re firotine'!

Nefes li zelamê navser qutbû, kaşeya qilêşa xwe kişand û bi dijûn û helaket êrîş bir ser çepera Egîdê Gabarî. Egîdê şaqis mayî û zen dike kû hevtemenê wî dîn bûye, tenê peyva "dijûna neke" ji deva derdiket. Feqeyê dilxwe de bûyî berevan, bi bedena Evdilqadir re girt û got;

"Ma yêk derew, du derew! Ma ne Tahir jî heman tişt digot."

Hê gotin nû ji devê Feqe derketibû Evdilqadir, dest ji Egît berda û bi dijûnên dê û jinê re êrîş kir çepera Tahir. Werhasil heta sibehî Feqe yê henekvan, Evdilqadirê aqil sivik, bi wî kaşê asê ve bezand. Evdilqadirê ji qehra har bûyî, sibehî zû çû derê çadira rêvebertiyê û ji Kenanê Kobanî yê berpirsê hêza cewher re ta bi derziyê ve kir. Bêkû taxima hêşedar toxtek xew bike, Kenan ew vedixwendin civînê. Heta melayê nîvro destê xwe êxistî di bin kerika guhê xwe de civînê ajotibû û enirî bikutekî hetibûn haştkirin. Ji ber buhayê giran yê wê henekê, kesî ne dixwest dubare dabaşa wê jî were holê.

Ji nişkan ve çixareyek stûr di êxira çepê de, Egîd ketibû di hundir de. Bi hatina Egîd re pîrkên bi civatê ketibû û ji bilî Sohro her kes ji kena zikûpişt bibû.

Sohro;

“Jikerema xwe, em vê henekê dirêjtir nekin.”

Civat bi hejandina seran tevlî vê hişyatiya Sohro bibû û deng şemirîbûn.

Xwendin û nivîsandina Serbest kêmbû û derfetên bi serê xwe lêkolînan jî bike ne zêdebûn. Evê jî bi wî re hîsek yê kêm mayînê çêdikir û her kû keys diket, mijarek mereqa wî dikişand vedikir. Wê şevê jî keysek narev ketibû. Rextê di destê xwe de danî aliyekî, bi ser xwe ve hat û got;

“Em îşev PDK’ê gotûbêj bikin.”

Soro;

“Emê çiya wan guftûgo bikin? Jixwe em her roj nûkertî, kuştin, dizî û talana wan zindî jiyan dibin.”

Feqe;

“Aha devêca li vî yê poz dolmik binêrin. Divê em jêdera sebebê wan tehfî kirina van xirabiyan dikin guftûgo bikin.”

Serbest;

“Netewperstî û kevneperestiya wan tê fêhmkirin ema ligor min, kirinên wan van pîvanan jî derbaz dikin.”

Merwan:

“Ew ne netewperest û ne jî kevneperestin, nexweşiya wan kûre û wekî firîzê vedigre.”

Serbest:

“Aha ez dixwazim jêdera vê fêr bibim. Ev çiye?”

Merwan;

“Ji bû naskirina PDK’ê, divê destpêkê mala Berzanî werin naskirin. Ev malbat di destpêka s.s 18.de derdikeve holê. Ji berya hingê dewsek ya wan na xweye û derbazbûyê wan hê jî tarîtiya xwe diparêze. Kesê bi navê Tajdîn û wekû bapîrê wan tê pejirandin, piştî perwerdeya xwe li cem Evdorehmanê Nehrî di qedîne li gundê Bêrzan tê bi cêhkirin. Ev malbata mala xwe li ser pişta kerek kurmî anî, di demek kurt de li herêmê dibe hêzek mezin. Ewqas bihêz dibin kû êdî guhdarî seydayê xwe jî nakin û bi Mîrîtiyên derdor re destbi şer dikin. Ya balkêştir, xwe wekû şêx pênasekiribûn û bi navê dîn û îmanê bibûn pêgirtiya eşîra xwecih. Li aliyê din, li coxrafya herî stretejîk ya Kurdistanê bicêh bibûn û di demek pir kurt de bi eşîrên herî mezin û bihêz yên herêmê; Zêbarî û Biradostiyan re şer ayan kiribûn. Ji her du aliyan jî qirkirin û janên mezin hatibûn jiyandin. Balkêştiya din, ev malbat di dema destpêka polîtîkaya navendkirina Împeretortiya Osmaniyan de ji nişkan ve derdiketibû holê û di cêh de bibû hêz. Osmaniyan, bi polîtîkaya dabaşa gotinê dixwestin otorîteya Mîrîtiyên Kurdan ji holê rakin û di şûna wan de saziyên şêxîtî û axatiyê bipêş bêxin.

“Ankû tu dibêjî, ji aliyê Osmaniyan ve hatine bicêhkirin û

destekkirin?"

"Hêjayî lêkolînê ye. Li gor min mesele Osmaniyan jî derbaz dike."

"Wêdetira wê çiye?"

"Dibekû ji Kurdan re perûyek ya Ingîlîzan be!"

"Delîlên wê yên dîrokî çinin?"

"Yêk; Ev malbatek ne xwecihe. Ji derve hatiye û wekû şêxên Terîqeta Naxşîbendî xwe pênase kirine. Du; kariye li coxrafya herî xweş ya dibin desthilatdartiya eşîrên di dema xwe de herî bihêz û mezin de bicêh bibe. Li aliyê din sofî û bawermendên ji qewm û netewên pir cuda li dora xwe bicivînin û bibin hêzek mezin. Sê; ji destpêkê ve kengê vê malbatê keysê xwe dîtiye di şerê Kurdan de qet texsîr (ev gotinek ddi wateya xwe pozitife, li şona wê texsîr nakin baştir dibe. Yani gotinek din) nekiriye. Çar; piştî vê malbatê ber lingên xwe dîtiye, çend Rêberên şoreşger yên xwestîn ji bû azadiya Kurdan tiştekî bikin bi destê vê malbatê çûne. Pênç; PDK, ne rêkxistina qismekî an jî çînekiye; rêkxistana berjewendên malbatek xenedane. Ev nîşan û delîl didin diyarkirin kû ev malbatek qewitî ye."

"Ankû ne kurdin?"

"Kurdîtî, ji netewiyetê wêdetir çandeke, exlaqeke. Di xwezaya çanda kurdan de mînakek din ya wan nîne. Her kû ez dîrok, têkilî û kirinên wan lêkolîn dikim, rê derdikeve Serguma Cihûyên Zavayê we Nabokadnizar. Teybetiya herî balkêş ya Cihûyan; banevanktî û veşertina secera xweye. Piştî xwarziyê we Kuro, Babîl dagir dike û wan azad dike, piranî na zivirin. Dîsa heke bala we kişandibe, paytexta Babîla Bakur, gundê Babilê yê li cem Hezex bû."

Soro;

"Ankû li gor vê teza te dibekû ez jî ne kurdbim?"

Feqe;

"Jixwe ji destpêkê ve ez ji kurdbûyina te bigomanim."

Hemî bi hev re kenin û dengê banga beyaniyê ya Seydayê Amedî sohbeta wan qedandibû. Dibêjîqey dengê Seydayê bejin kurt û perixî, ji niwalek kûr û dûr dihat. Lê dîsa jî bibanga wî re, reşê zilamên li dora çadira mizgevta semta sê kombûyîn li navguhê hev diketin.

***

Dawiya hefteya destpêkê ya Meha Gulanê bû. Qamp, di nav tarîtiyê de xeniqîbû û ji bilî dengên seyên Mûseka û baregeha Nehdaran ya leşkerên Êraqê tiştekî bêdengiya şevê xira ne dikir. Trûskên qels yên carnan bi derê çadiran re dixwiyan, di cêh de ji

çavan nependî dibûn. Komika sêwiyan, li raser Nînûva dibeşişî û dibêjîqey ji ber Bist û Pêwiran direvîn. Stêra Şivanan, ber bi Başûr ve diherikî û tiştek ji spehîtahiy xwe ya êvarî wunda ne kiribû. Koçberên li Rojhilatê neqeba Laleş xewnên têkel didîtin û semta pênc di tevgerek awerte de bû. Milîsên Gabar, bê Merwan û Serbest rêvanên Buhişta Piçûkbûn û demê xatiran hatibû.

Ji nîvê şevê kêmek derbaz bibû. Hemî li derê kolika rêvebertiyê ya di qontara çiyê de kom bibûn. Her kesî hev himbêz dikir û girî ji Merwan û Serbst kêmbû. Merwan ji çûyîna Gara û Serbest jî ji pêşniyara çêkirina dinanên xwe ji zû ve poşman bibûn. Ew heşûya rizî ya bêmerîs û di bisfinga wî de teqayî ev encam bi xwe re anîbû. Zilamê tenik û bejna wî biser nîvî re kêmek dirêj, ti carî wekî wê bêhnê ji teqîna wê heşûye evqas aciz ne bibû. Heke Merwan û Serbest ne hazirbûna yên herî kevin, pêşvantî û cihê wan dagirtana Feqeyê Gweyînî, Qehremanê Şehrikî û Soro yê Xaranî bûn. Jixwe wisa jî kiribûn. Qehreman da pêş, Soro li dûv û Feqe paşvan. Milîsên din ketin di navberê de û ber bi neqeba Laleş ve derketin rê. Tarîtiya tevna şevê şelîta rêza taximê dabelandibû û ji çavan nependî kiribû. Biqasî li pey çûyiyan nêrîn, hêstek êşdartir nîne. Janek merg guvêş û dilqelqînbû.

Her sal Merwan Fermandar û Serbest pêşvan ew taxim dibirin Gabar. Ema wê salê xwezayê çi ferman dikir, di qederê de çi hebû ne dihat zanîn ema, 'xweziyek' di mergan de daleqeyî mayî li dûv xwe hiştibû û cihê daxa wê ji niha ve dişewitî. Ji bû dinanên xwe çêke Serbest, roja paştir bi tirimpêlê çû Hewlêr û şeva heman rojê jî bi lingan Merwan çûbû Gara.

### 16'ê Gulanê

Berbanga roja çardehemîn ya Meha Gulanê bû. Şevaqa rojê nû tevna asoyê keşafkiribû. Deşta Dubanê xwe bi rengek xwirî kesk xemilandibû. Serê Xantûr û Cûdî yê xwe nû ji tarîtiya şevê rizgarkirîn li peravê ezmanan diket. Deşta Silopî mijdar dixwiya. Zaxoka Behdînan, di qontara çiyayê Bêxêr de ketibû xewa mirinê û deng jê ne dihat. Gundên li çar dorên çiyayê Spî, çîçikên xwe dibin perên makên xwe de mitkirîn tanîn bîran. Dengê Helîkuptêrên leşkerên artêşa turk dikişandin Kûra Gavanan, geliyê Xabûr tijî kiribû û sehwek bê şerm li Xabûra xemdar bar dikir. Tangên li kenarê Xabûra ji serê çiyayê Spî wekî marek reş dixwiyê, guhera garana berazan ratêxist pêşçavan. Û artêşa romiyan li ser vexwendina mala Berzanî bihêjmarek mezin dubare derbazî Başûr bibû. Rêya rêvanên Buhişta Piçûk zetim kiribûn û çûkan bi çûkaniya xwe nikarîn bifirin. Li pêş pêşmergeyê mala Berzanî, li pey wan romî û top û tangên Romê

êrîşî çiyayê Spî dikirin û şer ji zû ve germ bibû.

**Kurikê Gabarî**

Tam roja nîvê heyva Gulanê bû. Tevgerek awerte ketibû di nav biryargaha gêrîlayên Kurd ya Sêdarê de. Bêlûk û hêzên gêrîla yên amadekartiyên xwe diqedandin di şîverêyên cuda re belav dibûn û ji çavan wunda dibûn. Serokê PDK'ê sond û soza "li hember PKK'ê arî Turkan şer neke" bi caran dabû. Ema, soz wekî darikê sibhûêvaran lê hatibû û bawerî pê nemabû. Pêwîstbû amadekartî baş bihatana kirin û barê giran hatibûya belavkirin.

Merwan, ji wargeha Nînûva nû hatibû û rêya Gara û Nînûva jî baş nasdikir. Yê destpêkê hatî bîra Rêvebertiya biryargahê ew bû. Malbata Nebî Öner yê Gozareşî, Ehmedê ji Başûrê Piçûk yê lingê wî bi ranê stûr re qutbûyî, du hevalên din yên bi lingekî û birîndar, Muhemdê Mendîz yê milîs û ew demekbû li Gara, sipartibûn pêşvantiya Merwan. Bi roj zerikê re xatirên xwe xwestibûn û berê xwe dabûn wargeha Nînûva.

Bi banga beyanî ya meleyê gundê Şehyan re gihatibûn Quntara çiyayê Şêxan. Ji derb ketibûn û hal di wan de nemabû. Pênç zarokên hûr, dê û bavek yêxtiyar û sê hevalên seqet. Bi teybet Ehmedê bi çûkanan rêve diçû felişîbû. Jixwe şerek hatî ayankirin jî di navbera PKK'ê û PDK'ê de tinebû. Gote gotên "PDK'ê arî Turkan nake" ji zû ve li nav avana PKK'ê belav bibû. Wekû rêberê refê Merwan, xwestibû kêmek din jî bi meşin û xwe bigihînin nêzîkê wargehê. Ema, dilnehiştibû zêde israr bike. Li beramber Şehyan, li qama Rojavayê robar bêhna xwe vekiribûn. Tenê Merwan û Muhemedê Mendîz çekdarbûn û hevalên din bê çek hatibûn. Jixwe rewşa wan ya çek hilgirtinê jî tinebû.

Bira rêwiyên ji westa bê taqet ketîn xwe dirêj kiribûn û zarok ji zû ve bi xew ve çûbûn. Ehmedê demek dirêj di nav gêrîla de fermandartî kirî û piştî lingê xwe yê çepê ji ranê stûr wundakirî ji derveyî şer mayî rûniştîbû û Merwan jipiyabû. Hêlwesta dilniya ya gerîlayê kevin, avek cemidî di fikarên rêber de dikirin. Ema dîsa jî tebeta wî ne dihat û bi segurê re hawaket serê dara berû ya li tenişta noqtê. Bi hawaketinê re veciniqî Merwan! Hewaketin û daketina wî bibû yêk. Ya jê ditirsa hatibû sêrî.

Merwan bideng û hêlwestek dilniya ema, birûyek têr endîşe got;

"Pêşmergeyan dora me girtine" û emniyeta qilêşa xwe vekir.

Awrên Ehmed, bi zarokên ji hemî xayîntî, bêbextî û desthilatdatiyan bê hay ve qerisîbûn. Pênç zarokên temenê wan di navbera yêk û dazdeh salî de, li rex hev razayîbûn. Bavek û dêyek

reben. Sê zilamên seqet û du çekdar. Li aliyê din bi hemî derfetên dewleta Turk bi hezaran Pêşmerge.

Ehmet;

"Di navbera me û PDK'ê de aştî heye. Ti sebeb nîne em şerê hev bikin. Diyare şaş fêhm kirinek çêbûye û dixwazin biznibin em kîne" got û wekî ew jî ji gotinên xwe bawer neke keserek kûr di hinavê xwe de fetisand.

Merwan, Muhemed ji xew rakir û ji bû çeper bigrin birêket û bihêlwestek zelal û safî got;

"Ev xayînin! Dema keysa xwe bibînin aştî û biratiyê nas nakin!"

Bi gotina Merwan re hêza pêşmergeyan ji her çar aliyan ve rizde gulebaran kir.

Bi dengek bilind û lavekar Ehmet qêrî;

"Merwan, Raweste! Di nav vê malbatê de şerkirin ne exlaqiye. Em ne di heyra canê xwe dene. Lê, heqe me li van zarokan nîne!"

Hêstirên dayika reben û ji westa û tirsa rebentir dixwiyê û zarokên xwe di bin çengên xwe de komkirin, wekî taviya heyva Gulanê dibarîn. Dayîka navser û biskên pora xemor di bin kitana lewitî re rijayîn ser dêmê şaqis, bi qirikek tijî girî û bi dengek lavekar got;

"Ez li bextê weme kezeb, bila dilê we bi van tifalan bişewite. Şer nekin!"

Mam Nebî yê dibêjîqey poz û lêhvên wî di dêman ve daleqayî mane, pişta xwe dabû rizdeya kuç û ax jê dibare û wekî avzêmên bihare hêstir ji çavên poşman bûyîn diherikîn.

Her kû diçû pêşmergeyan dor li wan tengtir dikir û bersîv ne dayîna bosekiriyan hêza êrîşkar gurxweştir dikir. Guleyên bisfingan li singa rizdeya xeram diketin û kursiyên kuçan ji hewa ve dinirijîn hev.

Ehmet;

"Yadê Amîne, derkeve ser vî kuçî û bang bike wan. Bêje; "em malbat û zarokin û kesê şerê we bike nîne!"

Dayîka kuldar, ji doh ve lavekarbû. Tiştên Ehmet gotîn kirin û pêşmergeyan jî gulebarandina xwe rawestandin. Xwilamên axayan, wekî revda garana berazan li dora wan kombibûn.

Pêşmergeyek zikmeşk û rêzek zirav ya muyên li ber pozê wî yê bêmerîs got;

"Çekên xwe deynin, destê xwe li ser patika xwe girê bidin û teslîm bibin."

Merwan, ji komê veqeta, ber bi pêşmerge ve çû û bi dengek jixwe bawer û bê hîvî got;

"Em birayê hevin. Jin, zarok û seqet bi me re ne. Em koçberên wargeha Nînûva ne. Ka derdê we çiye bêjin, emê herin?"

Bi gotinan re pêşmergeyekî ji paş ve qontaxeyek li patika Merwan da û sohrgula Baxê Buhiştê bi erdê re dirêj kiribû.

Giriyê Yadê Amîne û laveyên Mam Nebî feyde ne kiribûn. Ji bû qedrê Îsa yê Gozareşî, malbat şandibûn kelha Etrûş û yên din bi cihek ne diyar ve biribûn.

**Amîne Muhemed Öner** vedibêje;

"Sala 1995'ê, ji ber zulma Turkan em revîn û hatin wargeha Etrûş. Piştî wê salekî li ser daxwaza Hevalan, em malikî çûn Gara û li wêdê bûn şivan. Gulana 1997'ê, dema Romî derbazî Başûr bûn Hevalan xwest, em dubare bizivirin wargehê. Wê demê qamp derbazî Nînûva bibû. Sê hevalên lingek yê wan tine, ez, Nebî û pênc zarokên hûr û Mihemedê Mendîz yê Mijînî. Rêberê me jî ciwanek xweşikê Gabarî bû. Navê wî çibû, nayê bîra min. Em jêre bibêjin "Kurikê Gabarî."

Bi roj avabûyînê re em ji Sêdara Gara birêketin. Heval bê lingbûn, zarokên min pir û hûrbûn û bi rêve em perîşan bibûn. Jixwe hevalê Navê wî Ehmet, lingek yê wî bi ranê stûr re tinebû û me nikarî em bimeşin. Ciwanê rêbertiya me dikir, carna zaroka min ya berşîr hildigirt û carnan barê hevalan. Dayîka wî nemîne kezep, wekî bazehekîbû.

Bi berê sibhê re me wargeha Etrûş derbazkir û em gihatin qontara Rojhilat ya çiyayê Şêxan. Me li wêdê bêhna xwe vekir. Ji kazibê re kêmek mabû. Kurikê Gabarî, xwest em heta cîhan ronahî bibe bimeşin û bigihêne cihek ewle. Lê, taqate me ya meşê ne mabû û me hemiya xwest em wê rojê li wêdê bimînin.

Em li pêşberî gundê Şehyan li qama din ya avêbûn. Heke me xwe êşandibûya, me dikarî em dûr jî bikevin. Ema, sedemek yê em ji PDK'ê birevin tinebû. Ya em tengsistkirîn û hiştîn wêdê jî ew remanbû. Lê, rêberê me ne di wê nêrînê de bû û ji bû em kêmek din bimeşin û dûr bikevin pir israr kiribû. Piştî me hemiyan nêrîna xwe ji bû mayîna da, êdî tiştek ya ew jî bike ne mabû. Ema pir bi endîşebû. Qet li cihê xwe ne dirawesta. Ew her tim jipiyabû.

Tarîtiya şevê keşaf bibû û êdî segurbû. Cihê me lêdanî kêmekî çalbû û derdor ne dixwiya. Ji bilî kurikê Gabarî, herkesî xwe dirêj kirîbû. Zarok ji zû ve nivistîbûn û yên mezin jî xilmaş bibûn. Rêberê me jipiyabû û ez û hevalê Ehmet jî hişyarbûn.

Darberûyek mezin li tenişta me bilind dibû. Ji bû keşfa derdor bike ciwanê rêber hawaket serê darê. Ji nişkan ve xwe ji darê avêt û got;

"PDK'ê dora me girtiye!"

Bi gotina wî re, ji her çar aliyan ve em gulebaran kirin. Em

li ber rizdeyekîbûn û guleyên wan ji me ne digirtin. Kurkê Gabarî û Muhemedê Mendîz tenê çekdarbûn. Em yê din hemî bê çekbûn. Kurikê Rêber emniyeta çeka xwe vekir, bombayên xwe derxistin û li pişt rizdeya tenişta me çeper girt.

Bi ranê stûr re lingek yê Ehmet tinebû û pê çûkana birê ve diçû. Ehmet, lave ji kurkê Gabarî kirin û xwest şer neke.

Pênç zarokên hûr, dê û bavek yêxtiyar, sê kesên seqet û du çekdar. Pêşmergeyan bi hêzek mezin dora me girtibû û heke bersîv hatibûya dayîn tu kes ji me ne difelitî. Çavek yê Ehmet li zarokên min û yê din bi dêmê kîndar yê kurikê Gabarî ve daleqayî mabû.

Ehmet; gêrîlayek kevin û ji berya lingê wî qut bibe fermadarek yê gêrlabû. Ji ber wê wekû xwezayî rêz û siyanetek ya herkesî ji gotina wî re hebû. Ehmet, ji kurikê Gabariyê di şer de israr dike re got;

“Heval, heke em şer bikin, ev zarok hemî yê werin qetilkirin. Jixwe di rewşa heyî de, di navbera me û PDK’ê de şerek hatî ayankirîn nîne. Herhalde şaş fêhm kirinek heye. Di hevdîtina dawî de jî Meshûd Berzanî, bi gora Berzanî sond xwariye kû bi Turkan re şerê me neke. Bila werin, em bi hev re baxivin. Ankû tiştek xeter nîne.”

Kurkê Gabarî yê bi me re ne hemfikir li Ehmet zivirî û bi dengek hêrsdar got;

“PDK, bi bêbextiyê firşik bûye. Em şer bikin û nekin em çûn!”

Ehmet;

“Dibekû em herin, qet nebe ev zarokên bifelitin. Exlaqen ne pêkane em di nav van zarokan de şer bikin.”

Gotinên Hevalê Ehmet avek sar li mergê min yên di şewitin de kiribû. Ji bû şer nekin ez digîrîma û min lave dikirin. Hevalê Ehmet, ji min re got;

“Derkeve ser vî kuçî û bang bike pêşmergeyan.”

Bi gotina wî re ez derketim ser kuçê rexê û bi dengek bilind min bangkir;

“Şer nekin. Em xwe bixwene. Ez û zarokên xwene!”

Li ser bangkirina min, paşmergeyan gule baradin rawestand û li dora me hatin hev. Kesek şaşik sohr û meşka wî dimna ya kimetekî, ji koma paşmergeyan veqeta û ber bime ve hat;

“Çekên xwe deynin, destê xwe li ser patka xwe girêbidin û bi ber min ve werin.”

Li ser gotinên vî meşkoyê kimêt, Kurikê Gabarî ji nav me derket û ber bi wî ve çû û got;

“Em birayê hevin. Di navbera me de aştî û li hev hatin heye. Em koçberin û emê herin wargeha Nînûva. Ziyanek me ya ji bû we nîne. Rêya me berdin em herin.”

Bi van gotinan re paşmerge ji aliyê din ve ketin di nav me de û ew meşkoyê kimêt jî gihatbû cem Kurik. Zilamê zikmeşke çû destê Kurikê Gabarî, xwe kenand û got;

"Qusûrê bibexşînin, me nizanî hûnin" û hê destê wan di nav hev de bû, paşmergeyekî din quntaxeyek danî patka wî şenge lawî.

Ax kezep, de bila çavên min birijana û min ew rihanzer, ew şengemêr di nav lepê wan bêbextan de ne dîtibûya. Çavên dayika te birijin. Kurik veşewişî û hê ne ketî sê, çar kesan bi hev re xwe avêtinê. Xwîna ji patika wî divizikî di her du aliyên stoyê wî kerengzerî de diherikî û di bedena wî de dirija. Dema xwe avêtînê yêkî tiştek li serê wî dabû û xwîna ji birîna serê wî diherikî çavên wî nixwamandibûn.

Di nav paşmergeyan de kesek gundiyê me û navê wî Îsa hebû. Dema em li Gara bûn her tim dihat dilxwede serdana me. Ewî ji Nebî re got;

"Qey bi caran min ne got, dest ji PKK'ê berde Nebî?"

Nebî;

Îsa, teyê ev xayîntî nekira. Min baweriya xwe bi te anî û te bêbextî li min kir."

Îsa yê Gozareşî;

"Bê dengbe! Ezê te û zarokên te berdim. Lê, evên he dijminê mene û çi pêwîstbe emê wê bikin.

Nebî, di hevdîtina xwe ya roja dawî de, dikara çûyîna Nînûva jî Îsa re kiribû. Îsa jî ew xeber gihandibû PDK'ê û di rêya ji Gara diçû wargeha Nînûva de kemîn danîbûn.

Her pênc zilam ji me veqetandin û çûn! zarokên me li tirimpêlekî siwarkirin û em birin kelha Etrûş. Ajotvanê tirimpêla me kaxezek da fermandarê kelhê. Piştî fermandarê pêşmergeyan kaxez xwend beşişî û got;

"Ooo.. Ser çavên min. Îsa emîl (Casûs)ê meye, qedrê wî li ser serê meye. Madem hûn nasên wî ne, hûn mêhvanên me yên ezîzin" û em birin cihê mêhvanan.

Piştî çend demjimaran pêşmergeyekî di guhê Nebî de ji dizî ve got;
"Ew kesên bi we re, di nav zeviyên li tenişta wargeha Etrûş de hatin remî (gulebarandin) kirin."

Di heman rojê de pêşmergeyan em birin Duhokê û teslîmê romiyên turkan kirin. Min turkî nizanî û leşkerên Turkan sê rojan Nebî bi lêpirsînê re derbazkirin. Piştî tiştek ji me girê nedan, em li heman tirimpêla em ji Etrûş anîn siwarkirin, anîn derbenda Laleş û berdan."

## HEWLÊR

Ew du rojbû tevger û hêlwesta pêşmergeyên Hewlêr hatîbû guhertin û di nivî bazarê de îşkenc û îza li hemwelatiyên bajar dikirin. Her kû diçû gote, gotên “PDK ya êrîşê Karkeran bike” li Başûr deng vedida. Dawud Baxistanî, şandeya li hevhatin û aştiyê ya PKK’ê ya “soza” şer ne kirinê ji Meshûd Berzanî girtî, şeva ji berya wê bi hewarî ji bajar revan dibû. Di asta herî jor de PDK’ê sond û soza “bi romiyên Turkan re şerê birakujiyê nake” dabû. Ema, kirin û gotinên PDK’ê hev ne digirtin û hêst şidayîbûn. Jixwe gotina “piştî soz dayînê ji mala Berzanî bitirse” di nav Kurdan de navdarbû.

Ji bertya artêşa Turk derbazî Başûr bibe du rojan Serbestê Xaranî û Îsmaîl Kiyas, bitirimpêlê û birêz û siyanet hatibûn Hewlêr. Her du jî ji bû dinanên xwe çêkin hatibûn û li cem nexweş û birîndarên Tevgera Azadiyê diman. Nexweşxane, ji xaniyek asayî pêk dihat û li pişta pira Eyn Kawa li ser cada şêstî cêh digirt. Hemî kesên PKK yî yên pirsgirêkên wan yê tenduristî heyîn di wî xanî de diman û tedawiyê xwe li nexweşxaneyên cuda didîtin. Serbest û Îsmaîl jî ji bû dinanên xwe hatibûn û hê tedawiya wan destpê ne kiribû. Bi dehan hevalên birîndar, bê ling, bê çav û nexweşiyên wan yên giran û sivik jî heyîn, di wî xaniyê de diman. Ji bû xwe ji diz, hîz û kesên serserî biparêzin, du çekên wan jî hebûn. Ji bilî hevalên nexweş û birîndar, pir sazî û dezgahên aydê PKK’ê li Hewlêr kar dikirin. Navenda Rojnameya Welat, rojnameya Roja Welat, navenda Yêkîtiya Netewa Demokratîk ya Kurdistan (YNDK)’ê, navenda Heyva Sohra Kurdistanê û bi dehan dezgah û mal hebûn. Ev sazî û dezgahên mijara gotinê jî yasayî û legalbûn.

PKK’ê, ji zû ve li bajarê Hewlêr binyat avêtibû. Ji Hewlêriyan qismek girîng azadî di fikrê PKK’ê de didîtin û hêdî hêdî aligirên wî hizrî zêdetir dibûn. Jixwe piştî PDK’ê bi arîkariya Êraqê Hewlêr dagirkirî, meyildarên PKK’ê bicaran zêdetir bibûn. Girseya pîrozbahiya Newroza wê salê, ji ya kombûna hemî partiyên Başûr bêhtirbû. Hewlêra navenda Başûr dihat pejirandin, biketa di bin bandora PKK’ê de wate Başûr ji dest çûbû. Vê pêşketinê biteybet dewleta Turk, PDK û hêzên hegemon ditirsandin û xewa wan diherimand.

Ji banga melê re demjimarek mabû. Birq tinebû û konê şevê bajarê Kelhê daqurtan dibû. Ronahiya qels ya ji kite mitên tirimpêlên peritî vedida û ji nişkan ve wunda dibû. Reşê Hewlêra di bin tarîtiya şevê de xerq bûyî, ji bajerekî zêdetir kavlên warek xirabe ratêxist pêşçavan. Hê dewsên qirkirina par ya PDK û artêşa Êraqê di ser Hewlêriyan de anî zindîbû û vê qirkirnê bajarek şkestî li dûv xwe hiştibû. Ji navenda welatek nû azadbûyî zêdetir dişipha

qampek ya dîlan. Pêşmergeyên PDK'ê yên bi zora artêşa Sedam Hewlêr dagirkirîn, ti zagon nas ne dikirin û biçavên dijminan li şêniyên bajar dinêrîn.

Ji nişkan ve kite-mitên seyareyên di cada şêstî de diherikîn jî wunda bibûn û pîkabên bêmerîs yên pêşmergeyan cade dagirtibûn. Ji bû tirimpêlên ser cadê xwe bidin aliyekî destên xwe ji ser qurnê ne radikirin û çep û rast dijûn dikirin hemwelatiyan. Şêniyên jixwe wekû dîlan li xwe dinêrîn, bê mehwer direvîn û di zikakên navber de wunda dibûn.

Û qirêna fîşekan li ser bajar ketibû. Şev ji dizî ve dora hemî sazî û dezgahên girêdayî Karkeran girtibûn ema, destpêkê li navenda YNDK'ê dabûn. Pê lipey pê saziyên din jî bê hişyartî gulebaran dikirin. Ji hemî rewşa wan kifşbû kû niyeta wan ya dîl girtinê jî tinebû û bi çekên giran û sivik gule dibarandin ser mal û saziyên PKK'ê. Sûbay û tîmên teybet yên Turkan, supaya Cemal Mutkî, asayîş û polîsan dor li navend, sazî û dezgahên PKK'ê girtibûn û bi hemî çekên di destên xwe de dihingavtin. Nexweş, seqet, rojnamevan, xebatkarên partiya YNDK'ê û xebatkarên Heyva Sohr bi çekên ferdî û kêm hewl didan xwe biparêzin. Ema, berxwedana wan têra seknandina êrîşan ne kiribû. Destpêkê xaniyê nexweş û birîndaran ketibû! Jixwe du keleşkof û li ser her çekê çar jerjûrên ne tijî hebûn. Guleyên wan qedabûn û pêşmerge bi tîmên Turkan ve ketibûn di hundir de. Yên di şer de hatîn kuştin ji xwe miribûn, birîndarên giran, yên nikarin rabin serxwe di berbanka xaniyê du qet de tavêtin xar. Kelaşên li rêya qîr diketin diteqan, ûr û rûviyên wan belav dibûn û mejiyê wan bi rêya qîriûzivt ve dima .

Hewlêr digiriya, Hewlêr xwîn divereşa. Xwîna ji çardeh kelaşên li binê pira Eyn Kawa şkêrikî avêtîn ser hev diherikî, golikên meyandî çêkiribûn. Kelaşên parçe bûyîn hê germbûn û dibekû zindî jî di nav wan de hebin.

Pêşmergeyên dilxwede Kurdistana azad û serbixwe, bi dagirkerên herî xedar yên heman Kurdistanê re têkoşer û birîndarên heman Kurdistnê qir dikirin! Hem jî di nîvê Paytexta Kurdistana azad de. Warê qedîm Kurdistana nakokiyan, ji van kirinan ne biyanîbû. Hê ji zemanê Berpenîr, ji dema Enkîdo Xanbaba qetilkirî ve ev toqa naletê dihilgirt. Ji wê rojê û şûn ve ne vemirîbî şerê qedapdar û pîrozan. Şerê xayîn û berxwedanvanan û şerê şkandina toqa naletê.

Ber bi nîvro ya hema rojê pêşmergeyên Berzanî bi hêzên teybet yê turkan ve hemî sazî û dezgahên PKK êxistibûn. Herkes kuştibûn û tu kes nehiştibûn! Pêşmergeyên Cemal Mutkî, bi kelaşên zarokên herî spehî yên Kurdistanê dileyîstin û dengê kenê wan bê şerm bilind dibû. Kelaşê jinek gêrîla ya di şerê li dijî Turkan de giran birîndarbûyî û ji bû dermankirinê hatî Hewlêr, bi dawiya pîkabekî

ve girêdabûn û di nava bazara Şêxela de dixirandin. Parçeyên goşt ji kelaşê jina nîvrût diweşan û di nîvê bazara bajar de şopek xwîndar li dûv xwe dihişt. Li hember kirinên sik û bê fihêt yên pêşmergeyan, romiyên dewleta HOV û kerdiz jî şaqistiya xwe ne diveşartin.

Hewlêr, di dîroka xwe de ji pir bêbextî, xayîntî û qirkirinan re şahidîtî kiribû. Li Hewlêr, li vî bajarî B.M 330'ê Yewnaniyên kirêgirtî bêbextî li fermandarê xwe kiribûn û bi destê Daryos dabûn kuştin. Hê bîst û şeşê Tebaxa sala bûrî, li ser kelha vî bajarî; bi desteka Pêşmergeyên PDK'ê, tangên Sedam li ser kelaşên pêşmergeyên YNK'ê gêre kiribûn. Ema, ti bêbextî, ti xayîntî, ti qirkirin ne di hemsalê vê de sik û hovbû. Ti caran dîroka toxmê mirov ji xayîntiyek evqas bê şerm, ji bêbextiyek evqas durû û ji qirkirinek evqas jandar re şahidîtî ne kiribû. Dayikên çend jandilan, dengbêjên çend şeran, ristvanên çend ristan, nivîskarên çend destanan û yarên çend şînan li ser vê qirkirinê bêjin, nayê zanîn. Gelo, di dîroka Kurdan de şazdehê Gulanê ya wekû "Roja Qedapkirina Bêbextiyê" were ayan kirin, ew jî nayê zanîn. Ema ya hergîz û rastiya wê guftûgoyê bi xwe re nabe, PDK'a mala Berzanî û artêşa romê qirkirinek hemsalek din ya wê di dîroka mirovtiyê de nehatî dîtin li vêdê, li Hewlêr pêkanîbûn.

Wujdan kor bibûn, merg bibûn sentetîk û pêşmergeyên PDK'ê har û çavsohr bibûn. Êrîşên wan yên li ser Kurdên azadîxwaz dubare kirina nêçîra Naziyên Aleman ya li hember Cihûnyan di bîran de zindî dikirin. Turk, bi deh hezaran romî û pênçsed tangan derbazî Başûr bibûn û soza tinekirina PKKê dabûn nûkerên dîrokê. PDK'ê jî ji vê sozê jidil bawer kiribû. Ji bû wan çekdar, bê çek, gêrîla, gel ferq ne dikir. Kê li kûdê digirtin bê pirs û îfade dikuştin. Di rojekî de bi dehan kes hatibûn qetilkirin. PKK'ê, wekû fermî hê hêjmara qurbaniyên Qirkirina Hewlêr diyar ne kiriye ema, li gor daneyên ne fermî dikara ji heştî kesa zêdetir dihat kirin. Hin jêderan jî hêjmara qurbaniyên vê qirkirnê bi ser sed kesan re didan diyarkirin. Wekû fermî hêjmara şoreşgerên di rojekî de hatîn kuştin hê ne diyarbû ema, ya mîsoger û bê guftûgo li Hewlêr xwîn dibarî.

Ey ristvan; ji min re dikara boşatiya saxmiriyên welatê min neke.

Malikên ristên xwe bi nandozên çavbirçî ne lewitîne.

Bêje, teşbîhê perîstankan çend evîndar di agirê evîna xwe de şewitîn?

Çend dilber di oxira dildara xwe de bîn xwelî?

Çend roj di oxira welatê mayî de çûn ava?

Û bêje heval, dil dildarê dilketiyane Dilo!

**Evîna Evdilayê Dîn**

Dor li zarokên herî xweşik yên welatê Rojê hatibû tengkirin. Partiya mala Berzanî hevsarê xwe qetandibû û qirkirin li ser qetlîaman pêktanî. Her gav xebera qirkirinekî dihat û Başûrê welat kiribûn gola xwînê. Pêşmergeyên mala Berzanî, li pêşiya leşkerên Turkan derketibûn nêçîra şoreşgerên welat û ti sînorên beşerî nas ne dikirin. Rêvanên Gabar li çiyayê Spî asê mabûn û zivirîbûn wargeha Nînûva. Fermandar û rêberê xwe wundakiribûn û xweziyên bihara bûrî di dilde fetisîbûn. Bi hatina artêşa Turk re pxêşmergeyên dor li koçberan girtîn çavsohrtir bibûn. Tevgerek awerte ketibû di nav eşîra Zêdikan û har û hêç bibûn.

Ji nîvro re nîv demjimar mabû. Tîrojên roja wekî qursek zêr li raser rawestayî, li çadirên melkebî didan û paçên çadirên lewitî zeraqên rojê dimêhtin. Gul û hendekokên diyarê pîroz tiştek ji bedewtiya xwe wunda ne kiribûn û bayek hunik û nerm, bandora germahiya tîrojan kêm dikir. Komek mirovên ji têkeliya jin û mêran pêktê, ji semta du derketibûn û bi binê asayîşê re daketin derê çadira mezin ya di devê dolê de. Koma mirovan ya ji erkdarên wargehê pêk pêktê, ji rêzê ve çûbûn hundir. Ji rêvebirên wargehê Cûma yê kêmekî ji lingê xwe yê rastê dilicime, li dûv hemiyan ketibû di mal de. Komek din mirovên ji civînvanan kêmtir, cesedê zarokekî li ser destê kesê li pêş, di kaşê girikê Fazil Buldan de hatin xar. Jinek ciwan ya bi desteka du jinên din bi zorê dimeşe û bi dengek nivz digirî, li pey cenazeyê zarokê dixirikî. Dema cinaze bi bin rê êxistin, Hacî Eliyê Xwirsî yê binyata saziya Malbatên Şehîdan bi kuçên az û spehî datîne, keranokê xwe danî ser rêza dîwar û ew jî tevlî karwanê bikulbû. Ew demekbû zarokên du, sê salî hinavêşî dibûn, divereşan û dimran. Ji bû pêşîgirtina vê nexweşiyê li ser daxwaza komîteya tenduristiyê ya wargehê, hukumeta Êraqê li derbenda Nehdarê çadirek vedabû û carnan doktorek leşkerî li wêdê dirûnişt. Lê, ew jî beytişebû.

Mala Cibraîlê Geverî, bilokên heriyê dibirin û ji bû heriya bilokan bi kerê Qedîfe ji avzêma xarê av dikişandin. Hunerê van Geveriyan yê çêkirina bilokên heriyê kevinbû û hostayê wî karîbûn. Ji rêza bilokan, ji destsiviktiya wan û şeklê çêkirina bilokan ev hostatiya wan bi hêsanî derdiket holê.

Xwendevan derketibûn navbera nîvro û wekî kulmek nohk li dîwarekî bikeve, her yêk bi aliyekî ve dibezî. Mamosta Îsmetê dibêjîqey deh kes bi aliyê rastê ve bi zincîran dikişînin û Mele Şîrînê wê navrojê li ezmanan stêran digerê, ji dibistanê derketin û berê xwe dan semta yêk. Mele Mihyedînê Bilehî, li duryana semta yêk bazara hişînatî û fikî danîbû û di ser bikiran de qêr û helekata wî bû.

“Wileh ezîm, bileh kerîm ev bacan yanii domatês olarak li eloya Mîsil (Mûsil) bi 250 dînarê tebe-e hatine kirîn” digot û toxt di ser bikiran de bernedida. Li aliyê din, kurên wî ji dizî ve libên rizî tavêtin ser sanduqan. Xizmên tek-tûkên koçberên hatîn bosekirin li bajarê Mûsil hebûn û wan kesan bi rêya xizmên xwe dikarîn herin bajar. Mele Mihyedîn jî kesek ji wan şansdaranbû û fikî tanî wargehê. Dukandarên wargehê jî neçarbûn ji wî bikirin û gazind ji buhayê tiştên wî dikirin. Mela yê têr gotin jî keys û fesal derbazî destê xwe kiribû û di ser dukandaran de dixwirî.

Feqeyê Gweyînî yê ji koma civînvanan veqetayî, bi kaşikê binê semta pênc ve li rasta Evdilayê dîn hat. Evdilayê kûrikên êlekê wî ji paçûmaçan wekî cemikên têrê dixwiyên û bi kefika kupalê xwe re girtî, pêşî li Feqe girt. Evdila û Feqe dostên hev yên qedîmbûn. Dema li Eyaletêbûn, Evdila her roj diçû çadira milîsên Gabar û têkiliyên wan xweşbûn. Jixwe dema mirov henekên xwe pê neke û wî mucid bigre, dostek hêjabû Evdila. Na, heke hîs bike tu tevzê xwe lê dikî, ti sînoran nahêle.

Evdila yê Dîn;

“ Xitûpitû.. Xitûpitû.. Ez xwilam tu çawayî. Mane em ji ziryeta yêkin. Hûn mal xala minin. Di kevin de dayika min jî ji aliyê Şingalê hatibû.

Feqe;

“ Were em herin çadira me çayekî vexwin Evdila.”

“Ez xwilam, min li qama din kolika we nas dikir lê, piştî em ber hirve bûyîn ez nas nakim.”

Feqe û Evdila hawaketin ser cada ji gundê Mûseka dihat. Mele Eliyê Spêrtî, di dema belavbûyîna Eyaletê de pêşvantî ji spêrtiyan re kiribû û li cem Faris axayê Zêdkanî, li gundê Mûsekan bicêh bibûn. Rêya diçe Mûseka, di nîvê semta pênç ya wargeha Nînûva re derbaz dibû. Mele Elî, li rex Faris Axa rûniştî tirimpila wan ya spehî gihat rasta Evdila û Feqe. Berçavkek reş çavên Mele Elî dixwimandin û pişta xwe bi kursiyê tirimpêla cîb ve şidandibû. Serê xwe ne hildida û belkî jî ji bû çavên wî û gelê wargehê li hev nekevin, berçavka reş bikartanî. Dibêjîqey bi ser berçavka xwe re ji dizî ve li derdor dinêrî û dubare berê xwe diguhert. Evdila, Mele Elî naskir û bi dengê; “wurrrrrr...” derxist û kupalê xwe da pêşya tirimpêlê. Feqe, milê Evdila kişand û tirimpêl derbazbû.

Bi hêlwestek şaqis, Evdila li Feqe zivirî û got;

“Ez sond dixwim bi wî xwedayê tiştek yê xwe kifş nekirî, ew Mele Eliyokê Spêrtîbû. Mak mîraaat...”

Feqe;

“ Erê Evdila erê, dev jê berde” got û bi hev re gihatin rasta Mala Emerê Batûyî. Hêstira boz bi singê çadirê ve girêdayîbû û

Emer, ji bû stûnên kolika xwe bi bista hêsin di tehtê de kun vedikirin. Qewetek li Emerê di nav xwêhdnê de şilbûyî dan û ketin di kolika zigurdên Gabarî de.

Ya gelê wargehê wekû "kolik" binav dikir, di rastiyê de çadirbû. Ji sedema dema destpêkê dest bi mihacirtiyê kirîn çadir tinebûn û di kolikan de jiyan bibûn, êdî hemî stargeh wekû "kolik" bi nav dikirin. Binê çadirê, bi çend betaniyên helefa nixwimandibûn. Li quncikê çepê, çend betaniyên di nav de dinivin li ser hevbûn. Rextên malîvanan, şkêrikî li quncikekî avêtbûn ser hev û qilêşên wan jî li rex rextan, biber hev re dirêj kirîbûn. Du wêneyên bi rûyê kaxezek stûr ve aliqandîn li gel alek ya ARGK'ê bi paşya çadirê ve hilawistîbûn. Evdila dîn, li ber wêneyê Merwan û Serbest sekinî û bi awayek baldar li wan nêrî. Tiliya xwe bi kelecan û hejêkirinek mezin danî ser dêmê wêneyê Merwan û got;

"Kanî ev? Kanî evê gangilok û tazenok!?"

Bi pirsa Evdila re destên Feqe yên hewldide tebaxa qazyaxê pê bêxe û firavînê amade bike lerizîbûn û îşkek jandar di qirika wî de rûniştibû. Awrên wî bêhemd şemitîbûn ser wêneyê cohtikên bazan û çavên wî yên tijî av bi xemla Merwan ve daleqayî mabûn. Wêneyê par zivistanê di nav berfa çiyayê Gara de kişandî, di nav cilên gêrîla de biwezbetir disekinî. Biskên guliya genimî û kêmekî dirêjbûyîn, di ser eniya pehn de rijabûn xar. Simbêlên reşên zirav xemla dêmê wî timam dikirin. Çavên gir û belek li dûr dinêrîn. Jixwe di wêneyan de her tim li dûr dinêrî Merwan. Evîna wî li dûr mabû û dibekû awrên wî li evîna dûr mayî digeran. Di bin bedena şapikê heya bi şûtikê vekirî de fanûreyek reşbelek wergirtîbû. Guhên kefiya Sêrtikî ya rişî dirêj û yêk ta avêtî ser navmilê xwe, li bin tîkên êlek diketin. Li ser şûtika zerbelek, du bombayên Rûsî dadileqan. Dibêjîqey qermîçokên şarwalê di bin şûtikê de dadiket, bi destê êtûvanek kohne hatibûn tekûzkirin. Sakên goreya rîs heta bi kortikên kaba xwe kişandibûn û goreyek nalyon bi ser goreya rîs re wergirtibû. Lûleya qilêşa bi milê rastê ve li pêş dinêrî. Di zikakek ya berfê de dimeşî û dema gava xwe ya rastê avêtî pêş wênevan pêl denklanşorê kiribû. Feqe, kelegiriya di qirika xwe de daqurtand, bi zendika xwe ava di çavên xwe de kombûyî paqijkir û bi dengek şêlo got;

"Ew şehît ket Evdila!"

Bersiva Feqe, zilamê dîn hiciniqandibû. Ema ji her halê wî kifşbû ji vê mizgîniya biqedap bawer ne kiribû. Hêwîtiyek tehl çavên wî yên bi xende nixwimadin û bi dengek ti carî Feqe jê re şahidîtî ne kirî got;

"Heneka neke Xalo!"

Feqe awrêk kûr avêt çavên Evdila yên westayî û bi keserek kûr re got;

"Xwezî henek bûya Evdila!"

Du hêstirên gir ji çavên jixwe tijî av yên zilamê dîn rijan, di ser gurmikên sîs de daketin û di nav riha belek de wundabûn. Dibêjîqey çavên wî bi wêne ve qerisîbûn û nikarî jê veke. Tiliya xwe bi hêlwestek siyanetkar danî ser dêmê Serbest û wekî bêje, 'ji bû vî jî heman mizgîniya biqedap ne de min' bi dengek tirsbarkirî pirskir;

"Ev, kul vî hat?"

"Di qirkirina Hewlêr de, di nexweşxaneyê de ew jî şehît ket!"

Êdî Evdila bideng digiriya û malîvan jî hew kela di qirika xwe de fetisandî zevt kiribû. Piştî zilamê dîn yê Feqe ti carî ji giriyê wî re şahidîtî ne kirî kela xwe verêht, bi dengek jandil got;

"Oyyy... Ez nemînim ji ciwanan re! Her du jî mala Berzanî kuştin ne" û bêkû li çaverêyê bersivê rawesta axaftina xwe ajot;

"Ez sond dixwim bi wî xwedayê xwe kifş nekirî, ew melekin. Belê, belê, min di xeybê de dîtiye ew melekin."

Dema Evdila di xeybê de dikara ne kifşiya xwedê dikir, Feqeyê di henekan de hostayek pispor xwest atmosfera giran kêmekî belav bike û pirskir;

"Evdila, ew keça tu lê evîndar bûyî çi jê hat?"

Pirsa Feqe, zelamê dîn ji bin ve hejand û ji nûçeya şehadeta Merwan û Serbest zêdetir veciniqand. Wekî derba xencerekî ji serê dilê xwe xwaribe, awrên wî di bêdawîtiyek bê binî de asê mabûn. Keserek kûr kişand û ew Evdilayê dîn çûbû û yêkê jidil evîndar hatibû şûna wî. Çavên xwe noqandin û çû wê cîhana aqlê wî firandî û hê jî xeyalên wî dixemilîne. Dubare veciniqî û dibêjîqey ji cîhana xwe ya xemilandî vegerabû. Çîroka jiyana xwe zêde ji kesî re ne digot û Feqe jî qet bawer nekiribû yê bêje. Bi awazek êş û kulbarkirî destpê bi vegotina çîroka aqlê wî firandî kir;

"Dohmamek ya min hebû. Navê wê Medîna bû. Medîne, keça herî spehî, rind û çak ya gundê Şiwêd bû. Na, na! Ne tenê Şiwêd, di geliyê Goyan de kesek ji wê spehîtir tinebû. Bejna wê zirav, dirêj û dêm gulîbû. Çavên wê gir, reş û belekbûn. Dema dikenî te digotqey kabikek şekirê nebatê ye. Keziyên wê wekî fitlên marên reş dadiketin ser kemaxan. Û em li hev evîndar bibûn. Bavê min wefat kiribû û mamê min qet hej me ne dikir. Em ji wî pir ditirsan. Dayîkek ya mina reben hebû û mamê min her roj li me dida. Dema min ya leşkertiya romê hatibû û min keleşkubara xwe hişt û ez çûm eskeriyê.

Dema ez ji eskeriyê zivirîm, dayika min miribî û Medîne jî bi zorê dabûn zelemek Jîrkî. Lê, hê ne biribûn û bidezgirtîbû. Navê wî zelamê Jîrkî Rimezan bû. Kesek xwehr, hewl û bêmerîsbû. Medîne bi kutekî dabûnê û em her du jî bê çarebûn. Xwest, ez wê birevînim û bibim cihek dûr. Lê, min tider nas ne dikirin û wêrîna min têra revandina wê ne dikir. Her roj li cem min digiriya û hêstirên wê wekî

ava royê Mijîn diherikîn. Em bê çare, bê kes û reben mabûn. Min pir caran hewlda birevînim ema, wêrîna min têrê ne kiribû.”

Evîndarê awrên wî bi dawa çadira lewitî ve qerisîn û dengek cuda jê derdikeve, bi awayek kîndar destê xwe li singa xwe da û gotinên xwe ajotin;

“Vî mergê qedapdar destûr ne da Berfîna xwe birevînim” got û êdî peyvên xwe dan ser hev;

“Rojek ya peyîzê bû û roj nû gihatibû cihê nîvro. Çend kes bi hêstir û mehînekî ve hatin mala mamê min. Ew xwezgîniyên Medînê bûn û dema war guhertinê hatibû. Min wê şevê biryara dawî dabû kû Medînê birevînim. Ema em dereng mabûn û poşmantya dawî beytişebû. Terezina min êxistibûn odeyekî de û derî li ser dadabûn. Nobedarên çekdar dor li xanî girtibûn û ne dihiştin tu kes nêzîk bibe. Heya çûka sibhê xwend, ez bi dora malê re zivirîm, ema Medîne nehatibû. Bi segurê re ez ji gund derketim û min berê xwe da Ziravikê. Min qesta hevalê xwe Evdo kiribû. Ewî gotibû; “heke pêwîstbe ez dikarim bi te re arîkarî bikim.”

Hê roj du bejna bilind ne bibû. Ez û Evdo çûn ser girê li bermaber Şiwêd. Evdo dûrbûn anîbû û me bi dûrbûnê li xêlîvanên Medînê temaşe dikir. Medîne li mehînek reşa çal siwarkiribûn û çarikek reş avêtbûn ser sera. Dengê tilîliyên xêlîvanan di geliyê Goyan de vedidan û wekî berqa birûskê li mejiyê min diketin. Û êdî min xwe nedît!”

Dibêjîqey Evdilayê çîroka êş, eşq û dînîtiya xwe vedigot û yê piştî wê ne hemanbû. Çavên wî yên di dêmê gewr û zelal de kûr kûrbûyîn, tijî av bibûn û ji nişkan ve veciniqîbû. Piştî gihat xala êdî tiştek nayê bîrê, ruhê wî dubare zivirîbû cîhana xwe û dîsa destbi gotinên xwe yên êdî qet nayên fêhmkirin kiribû. Jixwe her tim wisa dikir. Dema aciz dibû, an jî diqehirî li ser hev taxivî û tiştek jê ne dihat fêhmkirin. Nû rûniştibû ser bergeşa xwarinê û pariyê destpêkê hê di desta de bû. Ew jî danî ser bergeşê û devê xwe nedayê. Ji bû xwarinê bixwe Feqe pir israr kiribe jî ewî xwe ji bergeşê da aliyekî û xwest zû ji wêdê here.

Êdî Evdilayê dîn xwe wundakiribû. Dengê wî tevlî girî derdiket û tiştek jê ne dihat fêhmkirin. Di devê deriyê çadirê de singa wî û ya Hesênê Bîşenga Avyanî li hev aliqîbû. Xortê xesifî û nû gihatî, wekî her tim dîsa xwest henekên xwe lê bike. Ema, nizanî zelamê dîn vegera ye bombayek ya atomê. Êrîş kir û Hesenê nû gihatî da ber kupalan.

“Ezê ziryeta hewe biqelînim! Mak mîrat. Hey min dê û maka hewe... Hey te dê û maka Hilaliyan…” got û tu kesî ne wêrî xwe nêzîkê wî bike. Sedem çiye ne dihat zanîn ema, dema Evdila pir aciz dibû dijûn dikirin Hilaliyan. Feqe, bela wî ji Hesenê di bin derbên kupal

de dilerize vekir û zelamê dîn rêya semta beramber girt. Bi hêrs û kîn taxivî, dest û kupalê xwe li xwedê dihejandin û çû.

***

Şer bi hemî dijwartiya xwe tajot. Bi qirkirina Hewlêrê re ta qetabû û PDK'ê ti sînor ne hiştibûn. Turkan bi hêzek ji ya her demî mezintir Başûr dagirkiribû û wêrînek bê tixûb dabû nûkerên xwe. Hem Turkan û hem jî PDK'ê, bixwe dabûn bawerkirin kû ew sala dawî ya PKK'ê ye. Her kesê kû silava wan li PKK'ê heyî, di heman astê de dijiminên wanbûn. Qamp jibû PDK'ê hedefek lewazbû û her kû dixwest êrîş dikir. Keys ji kê tanîn dikuştin û hesabê roja piştî wê ne dikirin.

Warê wargeh lê bicêhbûyî ji bû parastinê pir bi dezewantajbû. Rêyek bi nîvê malan re derbaz dibû û li ser lêhva her du aliyên rê seranser çadir hatibûn vedan. Rêya dabaşa gotinê ji duryana Laleş, ji rêya Duhok diçû Hewlêr vediqeta û xeta Şêxan, û Mûsil bû. Dîsa rêya gundên derdorbûn û gundên dikara wan tên kirin, hemî pêşmergeyên PDK'ê bûn. Jixwe hêzek tekûz ya PDK'ê tinebû. Axayên eşîretan fermandar û hemî zilamên eşîrê jî pêşmergeyên wan bûn. Ev dihat wê wateyê, her roj pêşmerge bi nav wargehê re diçûn û dihatin. Li eyaleta Etrûş, an jî li warên din ne wisa bû; sînor û dergahek yê wargehan hebû û bê destûra koçberan tu kesî nikarî ji wî sînorî derbaz bibe.

Wargeha Nînûva, ji ber bê startiya cihê cêhbûyînê, her tim ji êrîşên ji derve re vekirîbû. Ne tenê ji êrîşan re, ji tevlîheviyên navxweyî re jî vekirî mabû. Sê aliyên wargehê Pêşmergebûn û kê digirtin bê pirs û bersiv dikuştin. Aliyê Başûr jî leşkerên Êraqê girtibûn û bi ti awayî destûr ne didan koçber ji wan derbaz bibin. Xwarin û qûtê UNHCR dida diyarbû û ji bû gel pêwîstiyên xwe dabîn bike neçarbû serî li navbeynkaran bide. Navbeynkarên dikarkirîn jî bê îstîsna hemî pêşmergebûn. Dema çeka xwe datanîn gundiyên ji rêzêbûn û kengê çek radikirin dibûn pêşmerge. Kesên wekû navbeynkar ji bû dabînkirina pêwîstiyan bi koçberan re têkildar dibûn, gelik xwisarên cuda jî bi xwe re tanîn. Hem tiştên tanîn bi buhayek ne asayî difirotin, hem jî casûsên PDK'ê bûn û hemî zanînên wargehê gav bigav digihandin PDK'ê. Dîsa kesên leq û lewaz têxistin û bê exlaqiya xwe li nav koçberan jî belav dikirin. Ya herî bixeter, gomana navxweyî bi xwe re tanî. Her koçberê têkiliyek bêhnî jî bi van kesan re datanî, ji aliyê gelê wargehê ve wekû kesek gomandar lê dihat temaşekirin.

Rêvebertî ya ji rêvebirina wargehê berpirs jî netêr û neçar mabû. Rêvebertiya dabaşa gotinê, bi derfetên xwe nikarî pêwîstiyên

gel dabîn bike û ji bû karwan bikaribe jiyana xwe berdewam bike, neçarbû pêwîstiyên xwe bi awayekî peyda bike. Ji ber van sedeman, di nav warên karwan de wargeha herî zehmet, bê rêkûpêk, tevlîhev û koçber ditirsandin bê goman warê Nînûva bû.

Piştî qirkirina Hewlêr şeş rojan, kesek bi navê Cerbetullah û xwe wekû berpirsê saziya UNHCR ya wargehê pênasekirî, bi karwanek tirimpêlan ve hat wargehê. Cerbetullahê çavşimşirî, xwestibû ji koçberan re civînekî çêke. Di heman gavê de daxwaza wî hatibû bicêh anîn û komikek piçûk ya koçberan li pêşberî zelamê reş û hişîn kom bibû. Zelamê bi qasî hespek yê topê, bi bin xwe re li komika mirovên peritî nêrî û got;

"Ev herêm tampone. Ne pêkane hûn li vêdê bimînin û ji bû parastina jiyana we em jî nikarin li vêdê tiştekî bikin. Em dixwazin hûn dubare vegerin qampa Etrûş."

Gel bi hêlwestek dijwar li dijî daxwaz Cerbetullah derket û got;

"Heke zikê we ne hîlebe, an me bibin Îranê, an jî Sûrî."

***

Her kû diçû roja sohr tîrojên xwe dijwartir direşandin ser diyarên pîroz. Bi hatina demsala Havînê re avzêmên li derdora Nînûva jî yêk bi yêk çikabûn û vê jî xetertiya têhn mayîn û nexweşiyan bi xwe re tanî. Pêşmergeyên PDK'ê bişubheta toleyên li derdora bedena Amedê, wekî aş aşokan bi dora wargehê re dizivirîn û her kû keys diket ne direvandin. Şivan dikuştin, pez talan dikirin û bê navber çadirên koçberan gulebaran dikirin. Li pey fitneyekîbûn. Dixwestin, gel ji nav wargehê bersîva wan bide û ew jî pesartî vê bersîvê koçberan qir bikin. Aqlê wan yê jor ev ferman dabû û wan jî jidil pêktanî.

Wargeh, li ber derê dergahê baregeha leşkerî ya dewleta Êraqê bû. Koçber, dilxwede bi nizbeta wan hatibûn wêdê. Ema rewşa wan ji ya koçeran kambaxtirbû û ketibûn heyra têrkirina zikên xwe. Berde xweyîkirin û parastina koçberan bikin, çaverêbûn koçber bi wan re arîkartiyekî bikin. Endamê îstîxbareta Bakurê Êraqê Ebo Minafiq, her roj li wargehêbû ema biqasî misqala zir jî feyda wî ne çêdibû. Qenciya kirîn, çadirek li derbenda Nehdaran vedabûn û carnan doktor dihat wêdê. Ew jî ciwanek nû gihabû û koçber ji doktortiya wî jî bigomanbûn. Dermanên wî doktorê qease ji êşbiran pêkdihatin û kûjan nexweş çûbûya cem, bi qutiyek dermanê serêşê ve vedigera. Ji bû nexweşên lezgîn, giran çûbîna nexweşxaneyên Şêxan an jî Mûsil, bi dehan prosedorên bûroqratîk dixwestin. Ankû heta kesê nexweş digihat Şêxan, an dimra an jî bixwe sax dibû.

Rewşa UNHCR jî jan-kenokekbû. Di çûyîn hatinê de zêde qisûr ne dikirin. Li wargehê navendan wan hebû û ala wan ya navdar jî li raser banê wargehê liba dibû. Binav jî be nexweşxaneyek aydê wan jî li wargehê hebû. Lê tiştek ne dikirin. Qût ne didan, hemabêje çadir hemî qetayîbûn, çadir ne didan û av peyda ne dikirin. Nexweşiyên cor bicor û vegir di nav koçberan de belav dibûn û hemabêje her roj zarokek dimra. Ema rayedarên wê saziya dilxwede fêris, eniya xwe jî ne diqermiçandin û doktorek yê nexweşxaneya wan jî tinebû. Li aliyê din, li ber çavên wan her roj PDK'ê koçber dikuştin, terşê wan talan dikir û koçber direvandin, ema qet ne li xema wan bû. Ya hê balkêştir, xebatkarên wê saziya fêris hemî Başûrîbûn û di heman demê de payebilindên PDK'ê bûn. Tenê yêk xebat jidil dikirin; ew jî tevlîhevkirina navxweyî ya wargehêbû. Karê herî pîroz yê wan xebatkaran, ji nav wargehê revandina koçberan û rêkxistinkirina sist û leqanbû. Bianêvê berdestka doktor, jinek dihat nexweşxaneya UNHCR ya wargehê. Jixwe doktor tinebû û ewê li nexweşên wargehê dinêrî. Ligor dihat gotin û rastiya vê îdîayê ji bû koçberan goman bi xwe re ne dibir, karê wê tevlîhevkirina nav malbatan û revandina jin û keçên koçberanbû. Jixwe pirêzeya wê jî hêdî hêdî derdiket holê.

***

Roja nîvê meha destpêkê ya demsala Havînê bû. Tîrojên roja nû hilatî, asîtana Şêx Adî bin Musafir ji her demî dijwartir dihingavt. Çadirên ji taqet ketîn, êdî nikarîn xweyiyên xwe ji têhna germahiya rojê bi parêzin. Newqa çêlek û hêstirên bi pesarên dola di nîvê wargehê ve giradiyîn û ji tirsa talana pêşmergeyan xweyên wan ne wêrin ji nav malan derêxin; biheve mabûn. Xwendevanên sala wan ya perwerdê kêmekî hatî dirêjkirin, ji bû navbera havînê roj dihijmartin. Yêxtiyarên girkê Viran wundakirîn, bimitalebûn û li derê mizgevta Mele Heyder bi dûvikên kupalên xwe erd dixepartin.

Hacî Silo û Mehmûdê Hilalî û kurê Hacî Silo Ezîzê dazdeh salî jî dabûn rex xwe, ker û hêstir dabûn pêşya xwe û ji bû sênc kirina baxçeyê çêkirîn sibehî zû çûbûn stirya. Bi ber tixûbê Sedam re xwe berdabûn aliyê Rojhilat. Xalidê Mûsa û Husynê Emerê Hilalî jî hemabêje her roj bi wê rêyê re diçûn nav koçerên Ereb yên li ber robarê Etrûş. Jajî, penîr û sipilik ji koçerên ereb dikirîn û li wargehê difirotin. Ji ber wê, ew rê wekû rêyek ewlê dihat pejirandin. Xalid û Husyen, ji berya Mehmût wan qederekî derketibûn û êdî wirarên wan jî ne dixweyan.

Hacî Silo kêmek li pêş, Mehmût û Ezîz li dûv ker û hêstirêbûn û ji biwara gundê Mûseka nû derbaz bibûn. Ji nişkan ve xwe di boseya pêşmergeyan de peyda kiribûn. Ji sê aliyan ve wekî taviya

teyrokê gule dibarîn ser wan. Ketibûn kemînê û her kes ji aliyê xwe ve direvî. Ji miqabilê bira pêşmergeyên li pêş bê bela nependî bibûn ema, tam ketibûn himber refa li aliyê Mûseka. Mehmût ji kurtika kaba xwe guleyek xaribû û Hacî Silo jî ji pişt û destê xwe birîndar bibû û li cihên cuda ketibûn. Dewarên wan jî hatibûn kuştin û zarokê ji tirsa hişînbûyî, li tenişta kelaşê Mehmût xwe avêtbû erdê.

**Ezîzê Hacî Silo yê Hilalî** vedibêje;

"Wekû wargeh em di dorpêçek dijwar de mabûn û me nikarî em nanê zikê xwe jî peyda bikin. Li devê dola binya mala Mamê Mehmût, ji bû sewzeyên demsala Havînê me bi hev re erdek piçûk fetandibû. Ji bû em bikaribin erdê xwe ji mirîşk û heywanên ji talana PDK'ê felitîn bi parêzin, sênckirin lazimbû û ji bû sêncê jî stirî. Ema ji tirsa pêşmergeyan me ne wêrî em ji nav malan derbikevin. Xalidê Mûsa û Husynê Emerê gundiyên me, ew çend robûn diçûn nav koçerên Ereb yên li ber robarê Etrûş, penîr û lorik dikirîn û tanîn li wargehê difirotin. Me pirsa saxlemiya rê ji wan kir û wan gotin; "li aliyê sînorê leşkerên Êraqê tiştek nîne."

Sibeh zûbû. Kerek yê me û hêstirek ya mamê Mehmût hebû. Me dewarên xwe kurtankirin û em ketin pey Xalid û Emer. Ewan li hindama gundê Mûseka lingê xwe sivikirin û qederekî li pêş dimeşan. Bavê min li pêşya me diçû û ez û Mamê Mehmût jî li dûv dewaran dimeşîn. Em li xala sifir ya sînorê Êraqê bûn û me bawer ne dikir pêşmerge werin wan deran. Me hewdît ji pêş û ji çep û rast ve wekî taviya barênê gule barîn ser me. Destpêkê li bavê min dan û dan erdê. Dewarên me jî kuştin û dawî mamê Mehmût ket. Min di navbera mamê Mehmût û kelaşê hêstirê de xwe avêt erdê.

Pêştî kêmekî wekî garana berazan pêşmerge hatin. Ez saxbûm û wekî dîkeyek ya şano her tişt zindî li pêş çavên min diqewimî. Bavê min çend mitreyan li pêşya min di nav xwîna xwe de digevizî û mamê Mehmût jî li ber tenişta min bû. Ji tirsa zimanê min şkestibû û deng ji kesî ne derdiket. Pêşmerge hatin û çûn ser pişta bavê min. Xwe bi her du lingan li ser pişta wî hiltavêtin û ûr û rûviyên wî li erdê belav bibûn. Bi pişt re hatin cem me. Îza û îşkenceyek ne asayî li kelaşê Mehmût jî kirin. Pêştî yêqînkirin her du jî mirine, li min zivirîn.

Mamek yê min ji kevin ve li Bexda yê bû û zarokatiya min li cem wan derbaz bibû. Jixwe ez nû hatibûm wargehê û min ji Kurdî pir baştir Erebî dizanî. Min ji wan re got;

"Ez ne Kurdim, Erebim û ne ji wargehême. Ev ker û hêstir yên minin û van mirovan kirê girtine û ez jî bi dewarên xwe re hatime."

Li ser vê îfadeya min, di nav wan de du bendî çêbû. Aliyekî got;

“Derewan dike û em wî jî bikujin.”

Aliyê din got;

“Na, madem ne Kurde em nakujin.”

Aliyê erênî serdest hatibû û ez xirandim û bi kulm û pehînan ber bi robarê Etrûş ve ajotim. Piştî meşa demjimarekî em gihatin nav koçerên li ber robarê Etrûş. Min Xalid û Emer li wêdê dîtin. Destên wan bi pişt ve girêdayîbûn û xwîn di nav çavên wan de dihat xar. Ema, min newêrî ez bi wan re baxivim û piştî demjimarekî bi soza ‘ez rêya xwe bi wargehê neyêxim û yêkser herim mala xwe’ berdam.

Rê dûrbû û bi ser bûyerê re du demjimar derbaz bibûn. Piştî ji pêşmergeyan dûrketim, bi hizrandina ‘belkî bavê min û mamê min ne miribin, hewarê bigihînim wargehê û rizgar bibin’ ez bezîm. Wekî berqa birûskê hatim. Rêya em demjimarekî çûyîn, min di nîv demjimarî de qutkiribû. Destpêkê hatim ser kelaşê bavê xwe û bi rastî jî hê saxbû. Piştî min dît hê jî nefesa bavê min dijene, cîhan hemî bibû ya min. Jixwe birîna mamê Mehmût ji ya bavê min pir siviktirbû û ew jî jiyan dibû. Ez bi bayê bezê hatim û min hewar gihand wargehê.”

Zarok, bi qîr û hewar gihatibû tenişta wargehê. Bi dengê zarok re koçber qulibîbûn cihê bûyerê û kelaş anîbûn ser rêya tirimpêlan ya diçû Şêxan. Birîndar, li tirimpêlek ya wargehê kiribûn û biribûn derbenda leşkerên Êraqê ya Nehdaran. Vê carê jî destûra derbazbûyînê tinebû. Pêwîstbû Ebo Minafiq bihata û bi destûra wî birîndar derbazî nexweşxaneya Şêxan bibûna. Mala kesê mijara gotinê jî li Mûsil bû û di holê de ne dixwiya. Bijîjka wargehê Medya Alemanî, mûdahaleyê destpêkê kiribû, xwîn rawestandibû ema, birînên birîndaran giranbûn, zêde xwîn wundakiribûn û derfetên wê derbaz dikirin.

Heta çarê êvarî birîndar li ser wê rêyê li hêviya destûra Ebo Minafiq mabûn. Mehmûdê birîna wî siviktir, ema zêde xwîn wudakirî; zêdetir li berxwenedabû, komek zarokên hûr li dûv xwe hiştibûn û jiyana xwe ji dest dabû. Piştî li ber çavên leşkerên Êraqê Mehmût jiyana xwe ji dest dide, destûra derbazbûyîna birîndarê din didin û radikin nexweşxaneya Şêxan. Hacî Silo, wekû nîvmirov ji wê birîndariyê felitîbû û Xalid û Huseyn jî bê ser û şûn çûbûn.

### Rewşa Rêxistinî ya Wargeha Nînûva

Lebeta herî jor ya wargehê, mejlîsa gelb. Ligor hêjmara giştî ya koçberan hêjmara endamên meclîsê jî dihat guhertin. Hêjmara li eyaletê pêncî û yêk, li Nînûva daketibû sêh û yêkê. Endamên mejlîsê bi hilbijartinê dihatin kifşkirin û salê carekî hilbijartin dihat nûkirin.

Berçav girtina koteya jinan ya ji sedan çil mecbûrtîbû. Mejlîsa dihat hilbijartin, di nav xwe de kordînasyonek pênc kesî hildibijart. Wekû kontejan du Kadroyên TAK'ê jî di nav wê kordînasyonê de cêh digirtin. Di heman demê de her sazî û dezgaha di wargehê de cêh digirt, endamek yê xwe ji mejlisê re hildibijart û kesê mijara gotinê saziya xwe di mejlîsê de temsîl dikir. Endamê dabaşa gotinê wekû temsîlvanê wê saziyê neçarbû tevlî hemî civîn û biryarên meclîsê bibe.

Wargeha Nînûva, ji pênc semtan pêkdihat. Her semt wekû sê taxan hatibûn rêkxistinkirin. Neqla destpêkê ya ji eyaletê hatî semta yêkemîn, neqla duyemîn; semta du, sê û çar û neqla dawî jî hatî, avana semta pêncemîn pêktanî. Mejlîsek pazdeh kesî ya her semtê hebû û mejlîsa mijara gotinê di nav xwe de rêvebertiya semtê hildibijart. Hemî karên rojane yên semtan ji aliyê wê mejlîsê ve dihatin rêvebirin û karên karîna mejlîsa semtê derbaz dikirin, dibirin mejlîsa giştî.

Ji sedema di nav derbazertiya mihacirtiyê de bi çavek hê derbazertir li warê Nînûva dihat nêrîn, tenê saziyên sereke hatibûn avakirin. Dibistana navîn ya Şehît Jiyan, dibistanên seretayî yên Dr. Nûrî Dêrsimî û Mehmet Karasungur çalekbûn. Navenda rêbertiya semt û taxan li her semtê kolikek hatibû avakirin. Navenda malbatên Şehîdan, asayîş û saziya karê jiderve xweyî navendbûn. Navendek kifşkirî ya mejlîsê, şaredariyê, hêzaxweparstinê û çand û huner tinebû. Saziyên bê navend, xebatên xwe di kolikên televîzyonên semtan de birêve dibirin.

## Rewşa Siyasî

Ji destpêkê û pêve karwanê koçberên axa welatê xwe aligirên PKK'ê bûn. Ev tagiriya xwe jî ti caran ne veşartibûn. Jixwe sedemê koçbertî, berxwedan, êş û elema wan jî ev alîgirtinbû. Ji destpêkê ve hêza rêkxistina navxweyî ya birêvebirinê û sazûmankirinê; gêrîlayên PKK'ê bûn. Her tim bi navê rêvebirtiyê çend kadroyên ji aliyê Tevgera Azadî ve dihatin erkdarkirin û wargeh birêve dibirin hebûn. Kesên saziya mijara gotinê pêktanîn dihatin guhertin ema, ti carî cihê wan vale ne dima. Di pileya herî jor de wargeh, ji aliyê wê saziyê ve dihat birêvebirin. Berpirsê her tiştên koçberan ew Hevalbûn. Polîtîkaya demê, ya rojane, yê kengê û çawa barbikin, çawa xwe biparêzin û li kûdê bicêh bibin; wê saziyê biryar dida.

Ji bû wekû xwirî gelê wargehê bikaribe xwe bixwe birêve bibe TAK'ê, ji destpêkê û pêve xebat û hewladan bipêş têxistin. Ema, rewşa heyî rê ne dida serkeftina van hewldanan. Ew kesê jiyana zarokên wî ne di ewlekariyê de, nikare bixwe debara malbata xwe

bike û her tim çavên wî li destek din dinêre, nikare wekû kesîtiyek azad xwe ava bike û birêve bibe. Ji bû koçber ne kevin dibin psîkolojiya kesîtiya mihacir de û xwe ne spêrin wê kesîtiya rizî, TAK'ê bi rêya rêvebirtiya wargehê hewlek bê hemta dimezaxt. Ema êrîşên hêz û dewletên derdor ewqas tevayetiyek hevgirtî pêktanî, dibin wan êrîşan de, di qampek ya mihaciran de avakirina kesîtiyek azad, di nav Okyanûsa Mezin de ji avakirina giravekî zehmetirbû.

Bê goman berxwedanvantiya gelê wargehê şayanê her tiştîbû. Ema, li hember êrîş û leyîstokên heyîn û rewşa real ya koçberan; tenê berxwedana wan têra parastin û bi hev re mayînê ne dikir. Ankû yên koçber li hember êrîşên hundir û ji derve diparastin, ew bi hev re digirtin, pêvantiya sazî û dezgehên wan dikirin û tekûztiya navxweyî pêktanîn gêrîlayên PKK'ê bûn. Heke PKK, yêk bêhnî jî kadroyên xwe ji nav koçberan bikişandana, bi navê wê serpêhatiyê tiştek ne dima. Jixwe sedemê sereke ya êrîş û aciziyên saziya Dewletên Yêkbûyî jî di nav de, hêzên derdor ev bû. Armanca wan ya bingehîn, şkandin û rakirina wê sêncêbû. Piştî di wan şertan de karwanê koçberan bê sênc ma, ya were sera kifşe. Jixwe ya karwanç koçberan ewqas jidil û bêpîvan bi fermanên TAK'ê ve girê dida û dibin her merîce de li dûv daxwazên wê dixirikand ev rastîbû.

**Rewşa Civakî**

Li gor daneyên fermî hêjmara koçberên gihatîn Nînûva 7605 kesbûn. Ev, ne li gor hêjmara helefa, ya rastîbû. Ji ber kû di nav koçberan de hêjmara helefa û ya rast ji hev cudabû. Ji sedema qûtê DY dida kêmbû û têrê ne dikir, hin malbatan hêjmara xwe zêde nîşan didan û rêvebertiyê jî çavên xwe li vê hîleya piçûk dinoqand. Ev dibû sebeb kû her tim hêjmara helefa ji ya rastî kêmekî zêdetirbe.

Ji seda pêncî hêjmara şêniya wargehê gundiyên Hilal û Mijîn pêktanîn. Ji xeynî çend malan Hilalî, hemî derbazî wargeha Nînûva bibûn. Mijînya jî çaryêka hêjmara xwe wundakiribû û sê çarêkê din hatibûn. Hemabêje Nêrwehî hemî û qismek piçûk ya Ziravikiyan jî hatibûn. Gundiyên gundê Pîran hemî mabûn û kombûna tevayê gundên din yên ji geliyê Goyan, sed mal derbaz ne dikirin. Bi hesabek bi çav re ji seda şêstê şêniyên Nînûva herêma Goyan pêktanî.

Piraniya koçberên ji herêma Hekariya tevlî eyaletê bûyîn, qut bibûn. Ji sed û pêncî malên Bêtrût, Sêvê û Kinyaniş hatîn, heft malbatan xwe gihandibû Nînûva. Hêjmara malbatên Oremar, Çelê Navend, Deştan, Bilîcan, Gozareş û kitên ji gundên wan derdoran jî sed malbat derbaz ne dikirin. Qasê şêniya herêma Hekarya ya li Nînûva ji sedê dehê koçberan ne dikir.

Herêma Şirnex: qesta vê pênasekirinê gundên li derdora navendêbûn. Gundên dikara wan tê kirin evbûn, Avyan, Biryan, Girek, Bacrît, Gundikêremo, Gundikêmelê, Nerex, Heştan û kitên ji gundên din. Qismek yê gundiyên van gundan hatibûn wargehê û ji bilî çend malbatên Gundikmelayî, ti malbat ji eyaletê ne veqetabûn. Ji hin gundan çend mal koçber bibûn û gundê herî boş yê ji herêma dabaşa gotinê koçberbûyî Gundikêremo bû û hêjmara wan ji bîst û pênc mal derbaz ne dikirin.

Cizîr, Silopî û Hezex: koçberên ji vê herêmê hatîn piraniya wan ji gundê Bilika, Siliv, Şax, Hevler, koçerên Spêrtî û Kiçî bûn. Ji bilî çend malên Deştadara, Hevler  û gundên deşta Silopî hemabêje kes ne gihatibû Nînûva û hemî belavî Başûr bibûn. Çend malbatên xwe wekû Cizîrî didan naskirin jî eslê xwe ne Cizîrî bûn; bi demê re koçî bajar kiribûn û ji sedema ji wêdê tevlî koçbertiyê bibûn wekû Cizîrî dihatin bi navkirin.

Gabar: Gabar, navê çiyayekiye. Ev çiya di sêkûza Şirnex, Cizîr, Dih û Sêrtê de cêh digre û sînorê Rojavayê wê Dîcle dipêçe. Di rastiyê de malbatên wekû Gabarî dihatin naskirin, ji bajarên cuda tevlî karwanê koçbertiyê bibûn. Hêjmara malbatên ji wê herêmê hatîn kêmbûn ema, çalekbûn. Çalektiya wan jî ji vêdê dihat; piraniya zilamên van malabatan dema li gundên xwe bûn milîsên aktîfbûn. Piştî artêşa dewleta Turk gundên wan dişewitîne, malbatên wan direvin û ew di nav refên ARGK'ê de dimînin. Bi demê re her kêyê kû firset peyda kirî malbata xwe bi dizî ve derbaz kiribû û wekû malbat tevlî jiyana koçbertiyê bibûn. Gelik ji wan jî hê jî bê malbatbûn û hêjmara wan bîst malbat derbaz ne dikirin. Bi giştî qasê hêjmara koçberên herêma Şirnex û derdor, wekû ji seda sêh dihat texmînkirin.

### Rewşa Aborî

Ji destpêka koçbertiyê ve keysê koçber ji bû debara zarokên xwe karekî bikin peyda ne kiribûn. Bi teybet koçberên ji herêma Goyan hatîn, ji ber kû gundên wan nêzîkî sînorbûn û dewletê jî dixwest derbazî Başûr bibin piraniya pez û malê xwe anîbûn û rewşa wan ya aborî ne zêde xirapbû. Qismek koçberên ji herêma Cizîr, Silopî û Şirnex jî hatîn, bi diravên bi xwe re anîn debara xwe dikirin û dema firset diket ji aliyê xizmên xwe yên Bakur ve dihatin destek kirin. Rewşa aborîk ya Çeliyan jî zêde xirap ne dixwiya. Jixwe dewlemendên wargehê Geverî bûn.

Bi êrîş û embargoya PDK'ê re, hemî pez û dewarên koçberan hatibûn dizîn û talankirin. Êdî tiştek li dor kesî ne mabû û di aliyê aborî de her kes hatibû rêzekî. Bi rawestandina şer re û rabûna

embargoyê re, bi diravên TAK'ê wekû arîkarî dayîn, ji koçberan re qederek pez û çêlek hatibûn kirîn. Ew malê hatî kirîn bi awayek wekhev li malbatên mûhtac hatibû behrkirin. Pez û dewarên pêşmergeyên gundên derdor wekî rûviyên tomikan dora wan re dizivirîn, ji hingê mabûn. Ankû bi vegotinek din, êdî koçberên Nînûva bi çend kêlo ar û ji kêloyekî kêmtir nîskên UNHCR re rû birûbûn.

***

Çileyê Havînêbû. Vegera cîhana me ya li dora pergala Rojê dewam dikir û cîhan nû ji cihê dûroj (apheliyon)ê derbaz bibû. Destek toz û qirêj li ser pişta çadirên melkebî û ji kevintî reng guhertîn bilind bibû. Havîna germ, pirsgirêkên cuda bi xwe re anîbûn. Nexweşiyên cor bicor û vegir di nav wargeha Nînûva de pêşdiketin. Biteybet zarokên nû jidayîk dibûn û heta bi temenê sê salî, bi nexweşiya hinav êşiyê diketin û piraniya wan dimran. Ligor daneyên ne fermî, heta bi wê rojê ji nexweşiya dabaşa gotinê sêh û çar zarokan jiyana xwe ji dest dabûn. Piştî qetilkirina Mehmût Bilen û bê ser û şûn birina Xalid û Huseyn hefteyekî, Berpirsê UNHCR yê Rojhilata Navîn Şemsî Barî û yê Bexdayê Ehmet Cebretullah bi karwanek tirimpêl ve hatibûn wargehê. Wê şandeya rûsar bixwere doktor û derman jî anîbûn. Bi Komîteya karê jiderve ya wargehê re hevdîtin kiribûn û bi hêlwestek ne jidil jî be soza arîkariyê dabûn.

Şerê artêşa romê, nûkerên xwecih û PKK'ê bi hemî dijwartiya xwe dewam dikir. Her kû diçû şer girantir û berfirehtir dibû. Hêviyên PDK'ê yên di demek kurte têkbirina PKK li ber pêlên ava Zapê ketibûn û saroxdan ji wan ne mabûn. Hêza PDK'ê, li hember berxwedana TAK'ê dişewişî û haxta bihilweşa. Her kû dihiltelipî xwe hê bêhtir bi tîka sakoyên leşkerên romê ve dişidand û di mejiyên xwe de xêrbendetiya turkan mezintir dikir. Ruhê xêrbendetiyê ew, bê perwatir û di rêbaza şer de bê pîvantir dikir.

Piştî avên avzêmên li derdora wargeha Nînûva çikayîn DY, bi tangêran av ji aliyê Etrûş ve tanî. Her çend rojan çend tangêr tanîn û gel êdara xwe pê dikir. Tangêra nehê Tîrmehê hatî, bi xwe re jehr anîbû. Her kêyê kû ji wê avê vedixwar, piştî kêmekî gêj dibû û divereşa. PDK'ê jehr tevlî ava di tangêrê de kiribû û koçber jehr dabûn. Di danek yê rojê de, nêzîkî sed kesan jehrî ketibûn û serkerat dikirin. Bi şîrê hekîmên kurdî û bi hewldana Dr. Medya Alemanî, koçber ji wê belayê jî bê wundayî rizgar bibûn.

Di rastika li pişta Asayîşa di navbera dibistana Şehît Jiyan û mizgevta Mele Heyder de, dike ji êvarî ve hatibû amadekirin. Li paş dike du stûnên spîndar hatibûn daçikandin û panqertek mezin bi navbera her du stûnan ve hatibû daleqandin. Li seranserê aliyê jor

yê panqert bibanda kesk, sohr û zer nivîsandina, ‘***Şehîdên Rojiya Birçîbûnê Bê Mirinin’*** hatibû nîvîsandin. Bi bin nîvîsandinê re wêneyek mezin yê Rêbertiyê û li her du aliyê wî wêneyên Muhemed Xêrî Durmuş, Kemal Pîr, Akîf Yilmaz û Elî Çîçek hatibûn hilawistin. Dike rûtbû û gulatên ji ber lingên pêşkêşvana porqij dibeyîn, ji dûr ve jî dihatin dîtin. Cîhaz, miksêr, mikrîfon tinebûn û her kes bi awaza xwe ya xwezayî taxivî.

Hemabêje tevayê rûniştvanên wargehê, rijabûn cihê bîranînê. Welatparêzên bîranîn bi hêstên şîn û şahî têkel pîroz dikirin, ji bîranînê zêdetir wekî pîrozbahiyê nêzîk dibûn. Cemîlê Amedî yê berpirsê Asayîşê, wekî pê şewityan li çar dora dike dizivirî. Tirsa “heke li gir û pesarên derdor sûyîqastek pêk were” mergên Komserê asayîşê diguvaşt û ne dihişt li cihekî raweste. Ema, kesî haj kêferata Cemîl tinebû û awrên girseyê bi lêhvên pêşkêşvana ecemî ve kilît bibûn. Ligor derfetên di dest de ciwanan bejin û bala xwe xemilandibûn û beşişandinên hîvîdar li hev direşandin. Kelecana pêşkêşvana bejna wê bi bin navîn re, destek cilên gêrîla qama wê ya qut daqurtandî û por xelek, ji dûr ve jî diyarbû. Piştî çend bêjeyên bikelecan û hevokên bê rêkûpêk got;

“Ji bû vegotina wate û girîngiya rojê ez ji rêvebertiya wargehê Hevalê Cûma vedixwînim ser dike.”

Cûma yê kulek, di bin çepik û dirûşma, “Şehîdên Berxwedana Rojiyê Bêmirin” de çû ser dike. Rêvebirê çel û enî rût, ji xwe bawer û bê minet taxivî. Dikara serkeftinên mezin û rojên azad dikir. Evê jî hêstên gel radikirin pêdarê û avek hunik li hînavên wan direşand.

Piştî rêveberê ji lingek yê xwe dilicime û ev jî bejna wî xwehr dike, axaftina xwe ya dirêj qedand, koma Penaber hatibû vexwendin. Endamên koma Penaber hemî ji wargehêbûn ema, keça zer ya bi komê re derketî ser dike, bala her kesî kişandibû. Ew keça ligor navîna qama jinên wargehê kêmekî dirêj, keziyên stûr yên ji pora qesebî berdayîn dadiketin ser êlekê wê û bi dêmek cemidî li tembûrek mezin dida; awrên hemî temaşevanan li ser xwe kom kiribûn.

**Koçertî**

Di çanda Komana Kurd de cihek girîng yê koçertiyê hebû. Raza vê rastiyê di destpêka dîrokê de veşartîbû. Dibekû Kurd, wekî komanên din koçertiyên dirêj jiyan ne bûbin ema, di nav welat de koçertî şêwazek jêneger û binyata jiyanê pêktanî. Nakokiyek yemanbû. Di dîrokê de cara destpêkê kurdan gund ava kiribûn. Ji bû vê afirandvantiya wan, demek dirêj di nav gelên cîran de wekû “Gundvan” hatibûn pênasekirin. Dêmantî, dihat wateya qutbûyîn û

dûr ketina ji koçertiyê. Ema na. Ev pîvana giştî ji bû kurdan derbaz ne dibû. Di quncika dilê her kurdî de evînek ya zozanan diraza. Komanek ezbûyîna xwe bi çi peyda kiribe, bi hêsanî nikare dest ji wê berde. Kurdan jî xwebûyîna xwe bi rêvantiya di navbera zozan û zivingan de, bi forma eşîrî peyda kiribû. Ji ber wê bû, kurdan ne dikarî dest ji eşîrtiyê berdin û ne jî ji evîna koçertiyê. Ev şêwaza zêhnî, ji kûrahiya dîrokê dihat. Rê kutana di navbera zozanên hunik û germiyanan de hêstek bê hemsal û evînek bê vegotinbû . Gelo ev eşq, ji bîrîkirinê an jî ji mereqa nû dîtinê dihat, ne dihat zanîn ema, mîsoger girêdanek ya wê bihêstên azad re hebû. Ev evîne ewqas stran û jandil li dûv xwe hiştîn û an jî mêhra li dûv çûyiyane? Jixwe qey bîrîkirin, ne li dûv çûyiyan bi awrên hêstbarkirî temaşekirine!

Bêjeya "dêman" ji evîn û qedirdayîna zozanan jêderbûye. Bi demê re kurdên li deştan bicêhbûyîn û dest ji çûyîna zozanan berdayîn, wekû "dêmanî" hatine binavkirin. Wekû koçer û dêmanî ji hev hatine cudakirin. Bêjeya "dêm" tê wateya bê av, zuwa.

Koçerên wargeha Nînûva, xwe wekû 'koçber' bi nav dikirin. Di aliyê wateyî de cudatiyek di navbera van her du bêjeyan de heye an na, nayê zanim ema, ya hergîz ewe kû wekû koçer jiyan bûyîn tamek cuda dida jiyanê. Vê tamê, her tim koçber di çaverêyê koçek nû de dihiştin. Jixwe herhalde rakêştiya koçertiyê jî di vê hîviya çaverêtiyê de veşartîbû. Rêvantiya hîviyê. Serîwanên di vê rêvantiyê de dihatin jiyandin û mereqa xwe gihandina jiyana di pişt çiyayên bilin de.

Yên di dîroka mirovtiyê de destpêkê gund ava kirîn kurdbûn. Ji ber wê, demek dirêj ji aliyên gelên cîran ve wekû "gundvan" hatibûn binavkirin. Bi qasî dihat zanîn biteybet İyoniyan serê vê bêjekirinê kişandibû. Yên nikarîn dawî li koçertiya xwe bînin dîsa kurdbûn. Dibekû ev wekî nakokiyekî were dîtin ema, ne wisaye. Di komana Kurde de koçertî ne ji neçartî, an jî ji bû debara jiyanê hatiye ajotin; ji hejêkirina jiyanê jêder dibe. Ev hejêkirin, di qerekterê çanda Komana Kurde de veşartiye. Ankû xwezayiye.

Bandora koçbertiya zemanê berê li ser koçberên wargeha Nînûva jî hebû. Wekî çandek hatî jibîrkirin û dubare jîndarkirinbû. Bi aweyek sistkirî jî be ev çand di nav Goyan de dihat parastin. Havîna xwe li ber keviyên kêla Memê, warkê Sîpo derbaz dikirin û zivistanê vedigeran gund. Navê "banehî" li vê koçertiya du ali dikirin. Dibekû li mirovtiya şaristan ya modern xerîb were ema, barkirin û koçkirin li xweşa van koçberan jî dihat. Dema li warekî kuh dibûn, bîriya warek nû dikirin. Dixwestin bar bikin û li warek din deynin. Ankû ne barkirin, mayîndebûn li zora wan diçû. Ji vê sedemê her tim bi çavek derbazer li warê xwe yê nû dinêrîn. Bê goman ferqên mezin di navbera koçerên deşt û zozanên Kurdistanê de û dozdarên

azadiyê de hebûn. Wargehên azad yên li zozanên welat, qet ne diman qampên mihaciran. Konên çardeh stûn jî ne dişiphan wan çadirên melkebî. Ema di kûratiya mergan de dewsên koçertiyê xwe diparastin û vê jî jiyana koçberan sehltir dikir.

Bi hemî dijwartiya xwe jiyanê li wargeha Nînûva dewam dikir. Artêşa Romê, qismek mezin leşkerên xwe bi paş ve kişandibû û evê bandorek erenî li tevgerên PDK'ê jî kiribû. Êrîşên wan kêmtir bibûn û ew demekbû ti talanên wargehê jî ne biribûn. Saziya UNHCR ya dilxwede navê sênc û sêhwana mihaciran li xwe kirî jî dibêjîqey bi aqilê PDK'ê xapabû û ketibû di valetiyêkî de. Dev ji israra xwe ya dubare vegera Etrûş berdabû û bi kolandina bîrekî pirsgirêka ava wargehê jî çareser kiribû. Kêm jî be, van pêşketinan bandorek erênî li nav wargehê belav kiribû.

Ji heyva Gulavêj re rojek mabû. Nîvê çileyê demsala Havînê bû. Deşta Laleş di şewitî ema, biteybet şevên Nînûva hunikbûn. Bayek nerm û hûnik neqeba Laleş dadigirt û wekî baweşînkê dibarî ser çadirên wargehê. Şevên wargehê dirêjbûn. Êvara zû dinivîn û beyaniyan jî ji berya hilatina rojê hişyar dibûn. Şertên jiyana wargehê ev şêwaz dipesart. Amêra ronahîkirina malan fanosbû. Hundirê çadiran wekî êtûnêbû û hemabêje her kes ji derve dinivist. Ji xeynî hêşedar û erkdaran, piştî guhdarkirina nûçeyên êvarî yên Med TV ti karê kesî ne dima. Her kes di kolika li pêşya çadira xwe avakirî de, an jî li derê wê sohbetek kurt dikirin û dinivistin. Li nik êrîşên pêşmergeyên mala Berzanî, bi destpêkirina havînê re belayek din li koçberan mûselet bibû. Wargeh di bin êrîşa mar, mişk û dûpiştkan de mabû û ji êrîşên pêşmergeyan bêhtir gelê wargehê tirsandibû.

Muhemed Xelîl, ji navenda Çelê ya Colemêrgê koçber bibû. Piştî rabûna embargoya eylaetê wekû malbat tevlî karwanê koçberan bibûn. Ji sê zarokên wan yên tevlî ARGK'ê bûyîn kurek şehît ketibû. Malbatek boşbû û ew jî rêwiyên Zelê bûn. Piştî Mam Celal li hember gefên Turkan sto xwehrkirî, wekû bira dawî ew jî hatibûn Nînûva û li semta pênc bicêh bibûn.

Keça malê Selîmaya yazdeh salî, êvara dereng ji dara hatibû. Piştiyê daran zarok westandibû û li derê kolikê, li ser cihê dayîka xwe nivistibû. Piştî dayika wê Rehîme, ji ber nûçeyên televîzyonê dizivire, ew jî xwe bi berê keça xwe re dirêj dike û dinive.

Selîma, wextek yê şevê ji xew divecinîqe, bi destê xwe re digre û têxe qêr. Tiştekî bipêve dabaû û tarîtiya şevê heywana jehrdar veşartibû. Dayîk û malî li ber ronahiya fanosa helefa li her derî gerabûn ema, tiştek ne dîtibûn. Xwişka wê Gulê, derziyek dij-jehir lê dabû û dubare serê xwe danîbûn. Hê demjimarek bi ser re derbaz nebûyî, bi dengek hê dijwartir Selîma qêrîbû. Laşê zarokê hişîn bibû û gilîz ji deva diherikî. Birayê zarokê yê mezin Polat,

Selîma da pişta xwe û bibez digihand kolika Doktor Medya ya li dawiya wargehê.

Selîma, êdî ji ziman ketibû, çavên wê venedibûn û laşê wê yê hişînbûyî serûm ne dipejirand. Bi lez li tirimpêla erka embulansê dibîne siwarkirin, Dr. Medya serê wê danî ser ranê xwe û berê xwe dan derbenda Nehdaran ya Seyît Reîs. Leşkerek bê merîs, ser û guhê wî di nav qirêjê de wunda bûyîn, delingek ya pantorê wî qetayî û kitên pêlava ne ji hev; demjimara xwe nîşakir û got;

"Memno'e! Heta benayiyê demjimar heşt!"

Di bin barana hêstirên çavan de dayîka kuldar lave kirin, bavê reben rabû îsyanê, Dr. Medya êrîşkir ema, beytişebû. Her kû diçû di dergah de hêjmara leşkeran zêde dibû û mirovên bi nexweşê re hatîn, bi gulebarandinê tehdît dikirin.

Hê nû şev nîvî bibû. Ji heştê re heşt demjimar mabûn û keçik li ber serkeratêbû. Şirteyên artêşa Sedam gotibûn 'nirç' û hîvî û laveyên koçberan bê feydebûn. Dubare zarok vegerandin çadira Dr. Medya Alemanî. Her kû diçû laşê Selîmayê hişîntir dibû, çavên wê hêdî hêdî di şemitin rexê û dermanên heyîn feydê ne dikirin. Dubare keçik rakirin û xwe avêtin bextê heman dergahî. Hêşedar hatibû guhertin ema, "memno'û" hê li cihê xwe bû. Di wê şeva tarî de tevayê wargeha Nînûva qulibîbû ber dergahê dewleta Êraqê û bi awrên neçar li serkereta Selîma ya zarok temaşe dikirin.

Dûpiştik, bi rayê sinir yê zenda zarokê ve dabû û heke di wextê xwe de mûdahele çêne be, mirin nêzîke. Her kesî ev dizanî û tiştek ji kesî ne dihat. Ji bû jîndarekî tişta herî jandar, ji awrên neçar fûrandina hêstaye! Zaroka dermanê jiyana wê kêlûmitreyekî wêdetir, li ber çavên her kesî can dida û tiştek ji kesî ne dihat. Selîma zarok, di heman şevê de sê caran birin deriyê Seyîd Reîs û dest vale zivirandin. Hê demjimara rabûna qedexeyê nehatî Selîma yê can dabû. Li ser goristanê Dr. Medya Alemanî serê xwe danîbû ser milê dayîka birîndar û digiriya. Muhemed Xelîlê gir û bilind, bibû kulmek û bi çavên kûrbûyîn li gora keça xwe dinêrî. Xabûr û Muradê Çelî, xwestin wî rakin û bibin mal. Zelamê yêxtiyar, bi destên xwe û bi awayek kubar zilam dan aliyekî û got;

"Min di vê oxirê de pir can dan, pir ciwan binax kirin. Êşa min ne ji mirina Ferîştaha mine, ji şêwazê kuştina wêye!" Şaşka xwe rastkir, destên xwe li pişt xwe girêdan û bi kaşê semta pênc re hawaket. Ji wê rojê û pê ve êdî tu kesiyê rûyê Muhemed Xelîl, biken nedîtibûya.

Kuştina Selima zarok, hêdî hêdî dihat ji bîrkirin. Ji sedema di mercên koçbertiyê de xeleka bûyeran hev dişopandin û her kes çaverêyê bûyerek mezintirbû, bûyerên bûrîn çiqas jandar jî bin zêde rojev dagir ne dikir. Hefteya destpêkê ya heyva Gulavêjê

bû. Deravê Cejna Vejînê bû û amedekartiyên wê rojeva yêkem ya gelê wargehêbû. Tevgera jinê li devê dola beramber semta pênc, Rêbereha keleporan (kevnê bûrî-Kultur) vekiribû. Di çadirek mezin de destxetên jinan rayêxistibûn. Di Rêbereha dabaşa gotinê de, tiştên zêde bala çavan dikişandin parzonên bigulîvandik yên Goyikî û goreyên rîsên binexşbûn. Quncikek ya çadira Rêberehê ji destxetên xwendevanên keç re jî hatibû veqetandin û Rêberehê heta bi roja cejnê ajotibû.

Pîrozbahiya cejnê, beyaniya rojê destpêkiribû. Ligor mercên heyîn, amadekartiyek baş hatibû kirin. Sibehî zû her semt û sazî li derê kolika xwe kom bibûn û di demjimara hatî kifşkirin de bi awayek birêkûpêk berê xwe dabûn cihê pîrozbahiyê. Bi hatina her semt û saziyê re, pêşkêşvana jin bi dengek bilind xêr hatina girseya dabaşa gotinê dikir û derbazî rist xwendinê dibû. Keçên ciwan, bejna xwe bi kiras kurtekên kurdî xemilandibûn û temtêla wan dîmenek rengdar tevlî qada pîrozbahiyê kiribû.

Wekî her tim, bi rêzgirtina şehîdan re pîrozbahiyê destpêkiribû. Ji bû vegotina wate û girîngiya rojê ji rêvebertiyê Cûma hatibû vexwendin. Piştî rêveber dirêj dirêj polîtîkayên dost û dijminan û erk û berpirsiyartiya gelê wargehê şîrovekir, bernameyê destpêkir. Ji bilî şanoya binavê “Ey xwidê tu me neke bizin, deqene PDK me ne dizin” ya saziya parastina cewher amade kirî, tiştekî zêde bala gel ne kişandibû. Jixwe di hemî pîrozbahî û şahiyan de hedefa yêkemîn ya girseya kombûyî reqisbû. Girseya kombûyî bi bê aramtiyek mezin çaverêyî dawiya bernamê û destpêkirina dîlanêbû. Jixwe heke dabaş serkeftin be, govend jênegerbû. Ji bû mirovên di tenghiyê de jiyan dibin, keyf û şahî dermanê mejî ye. Felsefe û îdeolîjiya kes çi dibe bila bibe, toxmê mirov ne di wê hêzdartiyê de ye demek pir dirêj barê hêstên şidayî hilgire. Demkî û derbazer jî be dîlan, mirov ji barê giran vale dike û motîvasyonek berdewam çêdike. Komîteya amadekar ya di vê zanebûnê de, bername kurt birîbû û bi gotina “dawet serbeste” ya pêşkêvanan spehî re mirên ketibû temeşevanan. Kesî qîma xwe bi dengê vemirî ya tembûra Medya Efrînî ne anîbû û dest bi stranên dawetê kiribûn.

Ya star! Deh rêz govend li dor hev dizivirîn. Ji bablekan bigre heta bi şêxanî, ji govenda ARGK bigre heta bi ya Şirnexî her kes direqisî. Û pîrozbahiyê heta bi derengê şevê dewam kiribû.

***

Saziya UNHCR, ji berya wê demek kurt serhêjmara giştî ya koçberan kiribû. Wekî her carî dîsa gel hêjmara xwe du qet nivîsandibû. Diyare karmendên wê saziya mirovî, vê carê pir

fikirîbûn û rêbazek mifsidî peydakiribûn. Ji bû gel û rêvebertiya wargehê bînin himber hev, formên hin malbatan pir kêm û yê hinan jî pir zêde kiribûn. Lê ji xeynî hin kesên leq, baweriya wan şkestî û ji bû revê li hêncetekî digerên, kes neketibû xefka wan camêran.

Pêncê meha Êlûnê bû. Pêşmergeyên ew demekbû ne xwiyabûn, bi hilatina rojê re wargeh dorpêçkiribûn û ji her çar aliyan ve gulebaran dikirin. Kêr gihatbû hestî! Jinên zaroşîr û zarok daketibûn stargehan, zilam û pîrekan çek rakiribûn û li dora wargehê çeper girtibûn. Bi hewldan û şîretên rêvebertiyê bersîva pêşmergeyên mala Berzanî ne hatibû dayîn û şer derneketibû. Hemwextê êrîşên pêşmergeyan, çar balefirên cengê yên Turkan bi ser çiyayê Laleş re dabûn der. Li warê Nînûva, cara yêkembû balefirên Turkan dihatin dîtin. Bi awayek pir nivz dadan ser wargehê û dengên selawatên sofiyên Mijîniyan dengê bişewt yên balefiran didewisandin. Awrên dê û weledan bi wê amêra mirin barkirî ve daleqayî mabûn û bi qêrên bê deng xatirên dawî ji hev dixwestin. Dibêjîqey her kes bêhna dawî ya jiyana xwe jiyan dibû û dengê piste pista dua û sexdan li ser semta Hîlaliyan ketibû. Ema na! Dîsa balefiran li ser wargehê çend dor dabûn xwe, çend bombayên deng li derdora malan dabûn û bi rêya hatîn re zivirîbûn.

Di heman dema balefir li raser banê wargehê dizivirîn û mejî û çav bi wan ve mijûlbûn; pêşmergeyan jî dadabû nêçîra xwe û bi murada xwe dîsa şabibûn. Li rexa Başûr û li ber pozê leşkerên Êraqê şeşsed pez talankiribûn û şîvanan canê xwe kutekî ji devê lûleya tifeka wan rizgarkiribû. Balefir, ji bû nêçîran pêşmergeyan hêsan bikin, li hewara wan hatibûn. Roja piştî wê pêşmergeyan hê bêhtir xwe nêzîkê malan kiribûn û dused mitreyan li tenişta malan qederek pez û çêlekên mayîn jî dizîbûn. Wekî heywanên ziyanker, tam li ber devê wan ketibû û pitiya wan ne dihat.

Ji destpêka vê rêvantiyê û pêve tektîka ne dihat guhertin ev bû; bi erêkirina karmendên UNHCR, PDK û Turkan hewldidan şer bikişînin nav wargehê û bi wî awayî dawiya wê serîwenê bînin. Li aliyê din, ji bû ev leyîstok bi ser nekeve û jandartiyek mezintir jiyan nebe TAK'ê, hewldanek bê hemsal dimezaxt. Dibekû têkoşîna herî dijwar ya di vê rêvantiyê de hatî meşandin ev be û bê şik heta hingê aliyê serkeftî PKK'ê bû.

Mirov bi hêsanî dikarî ji tevgerên pêşmergeyan fêhm bike kû kengê artêşa turka ya derbazî Başûr bibe. Kengê pêşmergeyan êrîşên xwe bêperwa dikirin, hingê artêşa Turkan rêvanê wlatê wan bû. Di rastiyê de ji Şerê Xiyanetê û pêve, ti carî artêşa Turkan bi tevayî xwe ji Başûr ne vekişandibû. Ema, carnan hêza xwe zêde dikir û carnan jî ji bû hêzên nûker tengav bibin û qedrê mezintiya xweyên xwe bizanibin xwe vedikişand.

Dawî çend rojbûn hemî êrîş û tevgerên pêşmergeyan delîlbûn, dubare artêşa Turkan li ser rêya Başûre. Delîl û texmînên koçberan rast derketibûn û heştê Êlûnê li ser daxwaza PDK'ê artêşa turkan bi hêzek mezin, bi ser Zaxo re derbazî herêma Başûr bibû. Bi derbazbûyîna turkan re, bê goman êrîşên pêşmergeyan yên li ser koçberan jî zêdetir bibûn. Jixwe êrîşkarên wargehê û hêza li dijî PKK'ê şer dikir hemanbû. Endamên MÎT'a Turk, cilên pêşmergeyan li ber xwe dikirin û li Başûr tewl didan xwe. Pir caran pêwîstî bixwe veşartinê jî ne didîtin û bi cilên xwe yên sifîl jî çalekî pêktanîn.

Ji berya wê demekî PDK'ê, êrîşên xwe yên li ser koçberan kêmtir kiribûn û pêşmerge zêde li derdora wargehê ne dixwiyan. Ew nêzî hefteyekîbû dîsa wargeh ji dûr ve bosekiribûn û her kû keys peyda dikirin ji aliyekî ve êrîş dikirin. Bê goman ne tenê êrîşê kesan, çekdaran an jî gel dikirin; wekû tevayetiyekî êrîşê her tişta wargehê dikirin. Armanca wan ya fer, di nav wargehê de şer derxistin û pêkanîna qirkirinek mezinbû. Girêdayî vê belavkirina wargehêbû. Rêbaza din, pêşxistina xof û tirsêbû û bi vî awayî dîsa encam, belavkirinbû. Hedefa sêyemîn jî derdiket heman deriyî; wekû aborî koçberan ji derb bêxin û bi wî awayî bigihêne armanca xwe. Ema dikirin û ne dikirin bi ti awayî bi ser ne diketin. Êrîş û dimohrtiya wan, ji bêçaretiya wan jêder dibû. Bi wê qerasa hêzê ve, bi çekên herî pêşketî yên NATO ve, hîle û leyîstokên UNHCR ve, bi hemî hunerên xiyaneta nûkerên xwe yên kohne ve heyîrî mabûn û tirsa bibin ketinê zeravên wan diqetandin. PKK, li hember wê hêza qerase bi çend mirovên xwe yên kulek û bi wê komika mirovên xwendin û nivîsandina wan jî tine, ber bi serkeftinê ve çargav dibezî. Ya hêza berber dîn û har dikir ev bû.

Di heman roja artêşa turkan derbazbûyî de dîsa êrîş kiribûn û li tenişta malan birek pez biribûn. Hêzên pez û dewarên koçberan talan dikirin, bi mantiqa xenîmetê hatibûn erkdarkirin. Her rê rewabû û armanc, ji holê rakirina wargehêbû. Wekû madî malê dihat desteserkirin jî yê hêza dizkerbû.

Bi ser talana dawî re nû rojek derbaz bibû. Rêvebirê UNHCR yê Bexdayê Ahmet Goba, bi şandeyekî ve derket û hat wargehê. Zilamê sivûrî li ser riha wî ya bizinî direqisin, ji gel re civînek çêkir û got;

"Min ji we re kêmek pêwîstiyên zivistanî anîne û vê zivistanê hûn li vêdêne."

Hê civîna Ahmet Goba yê çav şimşirî nû destpêkiribû; pêşmergeyan li Başûrê malan û li ber çavên leşkerên Êraqê keriyek pezê Nêrwehiyan bi şivan ve revandin. Keys ketibû û mûhlet li nik herambû. Koçberan çavên xwe noqandin û ji payebilindê wê qeraseya Dewletên Yêkbûyî re devê xwe vekirin. Zilamê qure, bi

awayek heyîrî mayî serê xwe hejand û bi tirimpêlan bi pey pezê hatî talankirin ket. Hêza talanker li ser daxwaza Ahmet Goba, Birahîmê Ehmedê Nêrwehî yê şivan berdan ema, dused û şêst bizin birin û çûn.

Hêza berpirsê DY, têra vegerandina talanê koçberan ne kiribû û an jî ne xwestibû vegerîne, ne dihat zanîn. Ya tekez û li cem koçberên wargehê şik bi xwe re ne dibir, ji bû vegerandina pez hewlek zêde ne mezaxtibû û bi awayek eşkere talankirina malê mihaciran erêkiribû. Vê durûtiya li pêş çavan, koçber rakiribûn serhildanê û qulibandibûn duryana gundê Xwedêda. Bi berevantiya rêvebertiya wargehê rayedarên UNHCR, ji xezeba koçberan felitibûn. Rêvebirê forsa wî ketî û bi xêra rêvebertiya wargehê ji destê gel felitî, li tirimpêla xwe ya buha û spehî siwar bibû û berbi Şêxan ve wunda bibû.

Ligor agahiyên nû hatîn, MİT'a Turka endamên xwe yên kevin û binketî kişandibûn û birek nû şandibû dora wargehê. Yên nû hatîn, bi soza "di demek pir kurt de berxwedana karwanê koçberên welatê xwe bişkînin û wan teslîm bigrin" dagirtîbûn û wekî teyrên kelaşan her gav ji aliyekî ve dadidan. Koçberan jî çek hildabûn û bi hêstên şidayî dixwirîn. Ema, destûra bersivdayînê tinebû û bi awrên neçar li qatil, diz û talankerên xwe dinêrîn. Roja Amet Goba hati wargehê, ji hemî çaxên zeman dirêjtir bibû û koçber û talanker wekî leyîstoka birkê di ber hev de dibezîn. Talankeran, ji her çar aliyan ve bê mehwer êrîş dikirin û deng bi kûjan aliyê wargehê diket, koçber diqulibîn wî milî. Hêza bosevan, pêşî li tangêrên ava koçberan jî girtibûn û zarok ji têhna dişkestin. Êvara derneg ya heman rojê du jê zarok, sê kes bi birek pez ve revandin û bixwe re birin.

Ew demek dirêjbû berpirsek paye bilind yê DY ne hatibû wargehê. Jixwe têkiliyek mucid jî bi wargehê re ne datanîn. Li aliyê din di pêvajoya mihacirtiya van koçberan de erkdarên UNHCR, zêde israra bixwe civînan ji gel re çêkin ne kiribûn û jixwe edetek wisa jî qet pêş ne ketibû. Her çi hikmetbe wê rojê, wî camêrî bi israr xwestibû ew bixwe civînê çêke û bi gel re baxive. Gelo di wê rojê de hatina berpirsê herî bilind yê UNHCR'a Êraqê rasthatinekbû, an jî parçeyek ya fika êrîşkirina wargehêbû? Dîsa hevoka wî ya "vê zivistanê hûn li vêdêne" nîşanên pirsên di rastiyê de bersiva wan kifş di serê gel de dizûrîn hev.

Piştî wezîra karê jiderve ya Turkan Tansû Çiler, çûyî Bexdayê û Seyît Reîs Sedam el Huseyn ji soza dayî poşman bûyî, gel dizanî yê demek din jî li wî warî bimîne. Ema, kêm jî be dîsa gote gotên "piştî demek kurt Sedamê soz xwe bicêh bînê " di nav karwan de dihatinkirin. Gelo wî camêrê berpirsê wê saziya fêris, xwestibû şkestekên hîviya mayî jî berhewa bike? Gelê wargeha Nînûva, di

nêrîna duyem de hemfikrbû. Ema, di nêrînek din de jî ehd dabû; ew jî heta azadiyê berxwedanbû!

Roja piştî civîna rêveberê DY bû. Wê rojê dora şivantiyê ya Pîranê Ezebê Hilalî bû. Pîranê zavayê heşt mehan, sibehî zû pezê taxê komkir û berê pezê xwe da aliyê derbenda leşkerên Sedam. Di navbera malan, gundê Memo û derbenda leşkerê Sedam de pezê xwe diçêrand. Heta hingê pêşmerge zêde nêzîkê dergahê leşkerên Sedam ne bibûn. Bi baweriya 'pêşmerge ne wêrin heta bi ber dergehê leşkerên Êraqê werin' pezê xwe ji leşkerên Êraqê dûr ne têxist.  Hê roj nû gihatibû nîvê ezmanê Nînûva. Birek pêşmergeyên mala Berzanî xwe ji gundê Memo berdan û liber pozê leşkerên Seyîd Reîs dor li Pîran Kara girtin. Pêşmergeyên PDK'ê û MÎT'a turkan bihêza çek û boşatiya xwe Pîranê ciwan zevt kiribûn. Pîştî lêdan û îşkenceyek girin gotin;

"Heke dijûnên em dixwazin tu bikî Apo (Abdullah OCALAN), emê pêz bibin ema te berdin."

Ciwanê devikî dayîn erdê û wekî lûlika misîn xwîn ji birînên serê wî diherike, bertekek dijwar nîşa wan dikir û dijûnên hatîn bîrê hemî di ser mezinên wan de barandin. Çekdarên PDK'ê li ber çavên leşkerên Sedam, lûleyên çekên xwe êxistn stoyê Pîran de, stoyê wî firandin û sed û pêncî bizinên wî birin û di ser gundê Memo de revîn.

Piştî van qewmînan du rojan, PDK û dewleta Turk bi hêzek mezin û çekên giran dor li wargehê girtin û êdî di cihên xwe de sabît sekinîn.

Derbegotina "se guştên seyan naxwin" dibêjîqey ji tifiqa li dijî karwanê koçberên welatê xwe re hatibû gotin. Di serî de Pêşmergeyên mala Berzanî, artêşa dewleta Turk, artêşa dewleta Êraqê, UNHCR û hêzên hegomon yên li pişt perdê hemiyan bi hev re êrîş dikirin wê komika mirovên mihacir. Ya Star! Mezin û piçûk hegemon, dagirker û nûker bibûn yêk û dor li şeş hezar mihacirên wargeha Nînûva girtibûn. Dabelandin û haxta wan dabelînin. Wargeh ketibû di nîvê bergeşa guran de û ji çar aliyan ve gurên dev bixwîn êrîş dikirin. Heta  PKK, yêk dûr têxist ji aliyek din ve dehan hicûm dikir.

### Stûna Qiyametê

Li ferwarê Şêx Adî el Hekarî pisîkên peyîzê li hev diketin. Bandora germahiya havînê kêm bibû û bayê Kur bi xwe re keziyên cemidî tanîn. Bayê Peyîzê, li çadirên wekî pezê mêşin ketî guher dida û qetên nû ji wan vedikirin. Çadirên kevin, rizî û qetayî ji zûve li ber serkerata mirinêbûn. Li hember bayek sivik jî nikarin li berxwe bidin û yên bi singan ve terîş terîş bibûna.

Bîst û yêkê meha destpêkê ya Peyîzê bû. Çadira sersaxiyê ya Pîran nû rakiribûn. Tu axê hilbavêjî li ser rêya qîr ji zarok û zilaman li erdê nakeve. Melayê mizgevta semta pênc Mele Tevfîqê hejhejokî, ji bû banga êvarî destmêja xwe nû dikir. Emerê Batûyî, refa rêvanên Gara hazir dikir û çaverêyî ketina tarîtiya şevêbû. Bermayiyên girkê Viran, li serê girkê Mijînyan kom bibûn û ji aş û beraş sohbet dikirin. Ji nişkan ve dêwek heft serî roja pîroz bi ronahiya wê ve dabeland û stûnek badayî erd û ezmana kiribû yêk. Stûna serê wê di valetiya ezmanan de wunda bûyî, her kû nêzîk dibû binê wê firehtir vedida. Bablîsoka axa pîroz dabelandî, bi leza berqa birûskê di ser semta yêk de dibezî. Stûna wekî beraş dizivirî, konek sohrê tarî li pêşya xwe rêkiribû û wî konî wargeha Nînûva nixwimandibû. Stûna bablîsokê ya erd û ezman gihandî hev, li duryana gundê Memo ket di nav çadiran de! Sofî Miho yê Mijînî, bi hêlwesta qazidê qiyametê bezî ser girikê Mijînyan û heta awaza wî derket;

*“Heware.. Hewareee..! Herkes şehde bidin, qiyamet rabû”* got û hê gotin ji devê Sofiyê hatina qiyametê radigihîne xilas ne bibû, ew dêwê heft serî gihatê! Destpêkê şaşik ji sera firand û di cêh de sofiyê radigihandvanê qiyametê dabeland.

Ya Star! Ev ne pêlên derya tofanêbûn û ne jî agirê semawet, ev dêwek heft serîbû. Agirek sohrê tarî ji devê wî difûrî û pêta agirê ji deva dirija, bi werîsan pêşya xwe dişewitand. Zimanê bi werîsan dirêj, her tişta diket pêşyê dadibeland. Mirovên xwe bi stûnên çadiran ve şidandîn, di valetiya ezmana de li navguhê hev didan. Firax, betanî û qetên çadirên semta yêk bi ser semta pênc re difirandin. Wî dêwê gewrê şêlo, di yêk carî de tevayê semta yêk û nîvê semta du amlişt û daqurtand. Dengên teqe reqa singên çadirên di valetiya ezmana de sûbayî dikirin, wekî berqa bûriskan li ser wargehê diketin. Mirovên xwe devikî avêtîn erdê û bi lepûşkên xwe ax dikulan, di çala Hilaliyan de şkêrîkî avêtibûn ser pişta hev. Dengê şehde û selewatên sofiyan tevlî dengê giriyê zarokan dibûn û di heman gavê de jî qut dibirhan. Rûniştvanên semta sê, paldana bablîsoka dijwar jî dabûn pişt xwe û wekî fîşekê ber bi dolê ve direvîn. Yên li pêş direvîn û bi tehvdana bayê bablîsokê devikî diketin û yên li dûv wan dihatin xwe bi ser kelaşên wan re diqevastin û derbaz dibûn. Şêniyên semta pênc jî baskî şkefta quntara çiyayê Şêxan ve tifkiribûn binê lingên xwe.

Ew fêrisa stûna wekî aşê avê her tişt dadibeland û têxist ar, di dola wargehê de asê mabû. Teqlên bablîsokê êdî sist bibûn û fêrîstiya xwe wundakiribû. Dibêjîqey ji serê xwe derbeyek ya mirinê xwaribû û bi kaşikê semta pênc ve dişewişî. Hêdî hêdî xwirimî û di dawî de hilweşa erdê. Ema toz û xwibara rakirî, bi demjimaran ne hiştibû pirêzeya li pey xwe hiştî derkeve holê. Sofiyên ji tirsa mirinê deng li wan birhayî, ji zû ve hatibûn ser hişê xwe. Dengê şehde,

estexfar û star, stara wan; nîşanên derbazbûyîna qiyameta gewrbû.

Piştî xwezayê bi bayek dijwar nixwimandina ser malan belavkir, dîmenê piştî tofanê derketibû holê. Her cihê devê wî dêwî jê girtî, maliştibû. Li cihê dused çadiran wirar ji malan ne mabûn. Stûnên li berxwedayîn bi şerîtên çadiran ve hê jî li cihê xwebûn ema tenê û bêkû çadir bi wan ve girêdayîbin. Xwîna ji rûyê mirovan diherikî tevlî toza bi dêman ve mayî bibû û vegerabû teqna heriya Geveriyan. Ew qerasa çadira mizgevtê li ser çadira dibistana Dr. Nûrî Dêrsimî devikî dirêj kirîbû û çadira dibistanê dibin de xwirimîbû. Sofiyên Hilal û Mîjînyan, di hola nîvî de bê şaşik û êlek mabûn. Rûyên mirovan bi rengek têkel hatibû nixwimandin û tu kesî hev nas ne dikir. Dayikên bê kitan mayîn û pêxas, di nav mirovên şaqis mayîn de li zarokên xwe digeran.

Heta reş ket erdê, hê jî betanî wekî pereşûtan bi ezmanê Nînûva ve li hev dizivirîn. Qetên çadirên hawaketîn ezmanê Nînûva, wekî teyrên dubirak tewl didan û dibêjîqey haxta dadin nêçîra xwe. Serpûşk û koçxane li cihên cuda sekinîbûn. Sofî û melayên şeqawetên mezin jiyan bûyîn, zêde wate nedabûn wê tofanê. Sofiyên Mijîniya, ew tofan wekû xezaba xwedê ya li hember ciwanên ne mêjker nirxandibûn û yên kêmekî din erênî difikirîn, wekû aciziya xweda ya li hember lewitandina cîhanê şîrovekiribûn. Yên navbera wan û sofîtiyê pir ne xweş-baş, tofana balîsokê wekû xwedayê feqîrkuj nirxandibûn û gavek din jî ji xwedayê qedernivîs dûrketibûn. Kûjan ji wan nêrînan rastbû an jî hemî şaşbûn, ne dihat zanîn. Lê ya rast û di holê de, bablîsokê jî ya xwe kiribî û tofanek kilamet di ser koçberên wargeha Nînûva de anîbû.

Tofan derbaz bibû ema, êşên wê mabûn. Di encam de dused malbat bê mal û bi dehan malbatên din jî ziyanên mucid dîtibûn. Navbera koçberan û saziya xweşmirov ya DY ne zêde xweşbû û ne çadir û ne jî tiştek din didan wan malbatan. Lê ya xweş, koçber bi şêwazek nîv komînal jiyan dibûn û bê berdêl her tiştên xwe bi hev re behrdikirin. Ji tiştên ji nav koçberan hatîn berhevkirin, di rojekî de malên nû ji qiyametzadeyan re hatibûn avakirin û ji tiştên wan yên kevin bêhtir navmalî hatibû komkirin.

***

Cenga zarokên şaristaniyetê, nûker û ARGK'ê bi hemî dijwartiya xwe tajot. Artêşê Romê kuç û darên Başûr bombebaran dikirin û gelî û niwalên Kurdistanê dişewitandin. Nûker û dagirker tevlîhe bibûn û ji bû qirkirina Kurdan bi hevre di nav pêşbaziyê de bûn. Pêşmergeyên PDK'a mala Berzanî, bi durişma "Allah, Allah" ala Turkan dihejandin û li ser pişta tangên neviyên Helako (Hûlago)

êrîşî xwişk û birayên xwe dikirin. Gelo çima hemî dagirker û nûkerên Rojhilata Navîn, dema êrîş dikirin, mirov qir û talan dikirin bi navê "Allah" navlixwe didan? An jî dema benî zulm û zordariyê dikin çima, dixwazin 'Allah' bêxin şîrîkê gunhên xwe? Gelo, 'Allah'ê Turk û PDK dikar dikin û qedera beniyan li ser eniya wan nivîsandî û 'Xweda' yê Kurdan yê şev û rojê ne hemanbû? Heke hemanbe, çima Kurd di şer û cengan de, bi 'Xwada' yê xwe navlixwe nadin? Û heke ne hemnbe cudatiya wan çibû?

Her kû hêzên dagirker û nûkerên xwecih li hember ARGK'ê lewaz diketin Roma Reş, hêzên nû derbazî Başûr dikirin. Piştî stûna qiyameta sofî Miho sê rojan, dîsa artêşa Romê pêncî hezar romî bi dused tangan ve derbazî Başûr kiribûn. Dewleta Turkan bi xêra PDK'ê, şer ji Bakur derbazî Başûr kiribû. Başûr bibû qetek ji axa Tûrkiye û pêşmerge jî leşkerên wê yên kirê girtî. Ji bû romê ferq di navbera Gara û Engîzek de ne mabû êdî. Koçberên Nînûva yên ji ber zulm û zordariya romê revîn û dilxwede derbazî welatek din bûyîn, xwe di boseya ji agir ya hêzên kirê girtî de peyda kiribûn.

Demsala komkirina bereketa salê, jidil hatina xwe dida hîskirin. Barkirina Havînê, dilniyatiyek kifş bi koçberên Nînûva re afirandibû. Xwezayê konê şevê nû di cîhanê de kiribû û stêra Êvarî ya sê, çar werîsan bilindbûyî, bi hemî spehîtahiya xwe li rûyê serîwanvanên azadiyê dikenî. Şewq û şemala ji wê gula têr reng diçû, mirov heyran dihişt. Silêmanê Nêrwehiyê televîzyon semtê bi ber singa xwe ve hişk şidandî, di nav mirovên di nîvê meydana semta pênc de kombûyîn re derbazbû û li ser cihê wê ediland. Bi dêmek bixende yêk, du qêr dan zarokên na tebitî û televîzyon pêxist. Awrên hemî temaşevanan bi wê cama werimî ve daleqayî mabûn. Di demên dawî de PKK çalekiyên serkeftî dikirin û vê jî avêk hûnik li hinavên birîndar direşand. Zîna Hevlerî, li aliyê pêş ya temaşevanên kolika televîzyonê çarmêrkî rûniştîbû û ji qutiya xwe ya piçûk çixarê dipêça. Sohro yê wê şevê rêvanê Gara, xwe di rext û têzatên de paçabû, keleşkofa rikêp li milabû û li quncikê jor rawestabû. Bê aramtiya zilamê biskên guliya wî ya hulûs dirijin nav çavan, ji qelqa wî kifşbû. Emerê Batûyî ji wê ve hat, di guhê Sohro de tiştek got û bi hev re di nav tarîtiya reşê heyvê de wunda bibûn.

Mijara her du, sê kesên li derdora kolika televîzyonê sohbet dikirin, nexweşiya tîfobû. Ew demekbû nexweşiya dabaşa gotinê zarokên wargehê dişikandin û derbaz dibû. Di nav du mehên dawî de bi dehan zarok miribûn. Vê belaya vegir, ne ji çekdarên PDK'ê kêmtir fikar êxistibû di dilê koçberan de.

Hemabêje giraniya nûçeyên MED TV, li ser cenga di navbera ARGK'ê û Turk û PDK'ê de bû. Nûçeya cuda û balkêş, nameya Serokê PDK'ê Meshûd Berzanî bû. Kesê nav bûrî, di nameya xwe ya ji Rêbertiyê

re birêkirî de doza lihev hatinê dikir. Ji piste pista temaşevanan kifş dibû kû evê nûçeyê hêstek têkel bi wan re afirandibû. Hem pir şad bibûn û hem jî baweriya wan bi xweyê nameyê ne dihat. Ramana hemfikir, hebûna xapekîbû. Piştî wê rojekî Rêbertî wekû zindî tevlî bernameya televîzyonê bibû û gotibû; "***Heke xiyanet qedabe ez amademe.***" Heman piştî van daxwiyaniyan, artêşa Romê jî xwe gav bigav bi paş ve kişandibû. Evan pêşketinan keyfxweşiyek gomandar bi şêniyên zoravayiyên diyarê pîroz re afirandibû.

Tam dema koçberên Nînûva çaverêyî qedandina şerbûn, PDK'ê êrîşê çeperên YNK'ê kiribû û agirbest qedandibû. Eniya cengê tevayê Başûr dorpêçkiribû û YNK, PSDK û Zehmetkêş jî tevlî eniya ARGK'ê bibûn. Balefirên cengê yên çeperên eniya dijber dihingavtin, ezmanê Beşûr dişarandin. Pêşmergeyên boseya dora wargehê kêmekî sistkirîn, dubare derbazî rewşa êrîşê bibûn û bê navber koçber gulebaran dikirin. Ax û toza ji derbên guleyan ji teniştên xîbetên reben radibû, di navguhê jin û zarokên di parastgehan de dibarî. Pîrek û mêrên çeperên dora wargehê girtîn, ji dizî rêvebertiyê ve pite pita "êdî bese" dikirin. Ji dil dixwestin, bersîva wan talankeran bidin û bi awayekî ji wî îzayî rizgar bibin. Ema her kesî baş dizanî, şer bihêstan ne dihat qezinckirin.

Karwanê koçberên Nînûva li ber duryana Laleş asê mabû. Dora wan hatibû bosekirin û ji bû kedîkirinê, xêr nexwazan hezar û yêk rêbaz bikartanîn. Karmendên DY, di bin navê arîkariya mirovtî de kesên bi awayekî ji ya heyî ne razî direvandin û disipartin PDK'ê. Dewleta Turkan ji derveyî mît û tîmên xweyên binavê pêşmergeyan dişandin ser wargehê; her kû pêwîst didît balefirên cengê bikartanîn û derdora koçberan bombebaran dikir. Dewleta Êraqê ya di dîtinê de dijminê wan hêzaye, dema dabaşa gotinê ev komika mirovan be ew jî derbazî xeta dijber dibû. Dewleta Seyît Reîs ya li ber serkeratê, bi awayek pir ticarî nêzîkê aligirên PKK dibû. Ji bû koçberan wekû amêrek ya ticarî bikarbîne bi herkesî re di nav danûstandinek biqirêj de bû. Heke ji destan hatibûya, heta hingê bi dehan car koçber firotibûn. Ema, di pîvanên ew dixwazin de bikir peyda ne dibûn. Ew li keysekî digera bi firotina koçberan di çavên hegemonan de ji xwe re semaxekî çêke. Ema nîşanên heyîn eşkere diyar dikirin kû ew xewn û xeyalên wan di dûh de mabûn.

Mele Heyderê Amedî, Haci Ehmedê Silopî û Ehmedê Arîfê Mijînî di mizgevta semta du de rûniştîbûn. Hacî Ehmedê mereqdar û kêmekî jî fihêtokî piştî du rike'et sinet nêzîkê her du yên din bû û got;

"Niha me çi ziyana kê kiriye, çima her kes êrîşê me dike?"

Mele Heyder li Ehmed nêrî û xwest ew bersiv bide. Ehmedê Mijinî yê ji teklîfa Mele Heyder hem kêmek şermoke bûyî û hem jî

piçek hej xwe kirî, birhên xwe yên spî û dirêj hildan, şaşka belek bi her du destên xwe rastkir û bersiv da;

“Me ziyana kesî ne kiriye. Tu li vê cîhanê bigerêyî mirovên ji me siyenetkartir û bê ziyantir peyda nakî.”

“Wê demê pirsgirêk çiye? Çima ev camêrên Helefeyan evqas ji sazîbûyîna me, jixwe rêxistinkirina me û polîtîkbûyîna me acizin?”

“Pirsgirêk zêhniyeta desthilatdar û kesîtiya azade. Şerê mezin şerê vê qadêye. Em dixwazin bi şêwazek azad û wekî xwe jiyan bibin. Ew dixwazin em bi awayek bê rêxistin, bê serûber û wekî ew dixwazin jiyan bibin.”

Mele heyder gotin ji Ehmedê Arif girt û dewam kir. Dibêjîqey dengê wî ji kûrahiya dîrokê dihat.

“Ev der ferwarê cenga di navbera Xwedayan û Stiyên Stêr de ye Hacî ehmet. Li ser her bosta vê xakê ev dews hene. Saziya UNHCR temsîlvanê pergala Emperyalîste. Zen neke, xêra xwe vî arî didin me. Ev ar jehre! Ew dixwazin dibin navê mirovtî de me ji me bistînin, warê me bêxin qehbexane û me jî bêxin micêwrê ber derê wê.”

“Wê demê çima dest ji me bernadin, em diçin kûdê li dûv me dibezin?”

“Têkoşînê dikin. Ji bû me ji me bistînin û kedî bikin li berxwedidin. Tê bîra te, wê rojê rêveberê Bexdayê yê DY digot; “di cîhanê de bîst û çar milyon koçber hene û pirsgirêkên hemiya hingê yê we nînin.”

Seydayê mizgevta fer Mele heyder, keserek kûr kişand, çavên xweyên werimî kuskusandin û gotinên xwe ajotin;

Tu dizanî ziyanên me kirîn çinin? Exlaqîbûyîna meye, xwe rêkxistinkirina meye, îdeolojî û şêwazê ramandina meye.”

Ankû tu dibêjî “BERXWEDAN JIYANE?”

“Belê. Heke wekû toxmê mirov em dixwazin wekî xwe, bi awayek bişeref jiyan bibin, rêyek ya duyemîn nîne. Yên bizanebîn li berxwedidin, ser dikevin. Yên birêz, biexlaq û li hember nirxên xwe yên netewî bihesin ser dikevin Hacî Ehmet.”

Qêra ji nişkan ve li ser wargehê ketî sohbeta di mizgevtê de birîbû. Tevayê semta pênc di ser gundê Mûseka de dibezî. Di heman demê de guleyek ya hewanê li navbera semta du û sê ket û parçeyên wê bi ser çadira mizgevtê re firîn. Qirên ketibû çekan û deng bi dol û niwalên çiyayê Şêxan êxistibû. Gundiyên gundê Mûseka û koçberên semta pênc ketibûn ber singa hev. Mûsekiyên şivanê wargehê gerew girtîn, şivan berdabûn û di ser koma gundiyên xwe de direvîn. Faris axayê eşîra Zêdikan, bi dengek dilerize bang dikir û digot;

“Xêre, xêre! Du cêhilên me bê aqiltî kirine. Ema, hûn jî zelamên me berdin.”

Piştî kêmekî mesele hatibû fêhmkirin. Hesoyê Xato yê Nêrwehî û kesek ji wî gundî bi hev re bazarvantî kiribûn. Zelamê Mûsekî hezar dînarê Siwîsrî yê Heso fatis kiribû. Dema ew zelam û du hevalên xwe di nav wargehê re derbaz dibûn, Heso û xizmên xwe zelamê dabaşa gotinê di gerewa diravên xwe de girtibûn û yên din jî serbest berdabûn. Her du kesên hatîn berdan hewar gihandibûn gund û hewl dabûn şivanên wargehê di gerewa zelamê xwe yê gerew de bigrin. Li wêdê Farisê ji tirsa ji serûbin dilerizî, hezar dînarê Heso dayê û Heso jî gerewê xwe berda û her kes zivirî mala xwe.

***

Ji nîvê meha Mijdarê re neh roj mabûn. Roj li cihê nîvrobû û bayek sar rûyê hemwelatiyên Nînûva dida ber zelan. Xêlê Gulê ya keça Muhemed Xelîlê Çelî û kurê Fazil Buldan Azadê Geverî bû. Li serê girêkê Fazil Buldan gêra govendê fireh digera û dê li weledê xwe ne dibû xweyî. Şerbeta keça Hesenê Nerexî, ser govendî dihejand û ya Star, te digotqey hestî di laşê keça bejin zirav de tinebûn. Ji ser û bin bejna xwe dilerizand û devê xort û lawan wekî çapikekî vekirî hiştibû. Gêra govenda Hevalan gir pêçabû. Li quncikekî jî govenda sist, leq û çepikî ya herêma Hekariya li darbû. Û qirêna fîşekan lingên xêlîvanan bi erdê ve qerisandibûn. Pêncsed mitreyan li Rojavyê cihê dawetê pêşmergeyan êrîşê pezê Ferhanê Pîranî kiribûn. Şivanê yêxtiyar di nav xwînê de diperpitî û talankeran pez berbi çiyayê Laleş ve direvand.

Xêlîvan di cihê xwe de cemidîbûn. Bêhna gelê wargehê hatibû serê pozê wan û kirinên dizekan sînorê sebra wan ji zû ve derbazkiribû. Jin û zarokên xêlîvan ber bicihê Ferhan ketî ve dibezîn, zilaman çek rakiribûn û bi hêstên kîndar xwe ji êrîşê re amade dikirin. Tam di wê gava Nînûvayî kîn, hêrs û xezaba xwe bajone lûleyan û di ser wan hîzan de birijînin Birahîmê Erûhî, Kenanê Kobanî û Medya Alemanî bi wêdê re derketin û pêşya çekdarên dinanên xwe ji dizan re tûj dikirin girtibûn. Talankeran, wekû rasthatî gule dibarandin ser girseya bi Ferhan ve çûyî û bilez ber bi qontara çiyayê Laleş ve bizin tajotin. Biteybet ciwanên Pîraniyan û gelik çekdar li cem embara ave kom bibûn û di pêşî girtina wan de rêvebertiyê zehmetiyên mezin dikişandin. Birahîm qêrek da û her kes di cihê xwe de rawesta. Ji hêrsan laşê Birahîm dilerizî û çevên wî yên hûr sohr bibûn.

“Ya hûn dikin, ji qirkirina vî gelî, van jin û zarokan re zemîn amade kirine. Heke daxwaz û karîna we ya tolhildanê hebe, cihê şer ne evdere.”

Van gotinan teqlên çekdaran sistkiribûn û her kesî berê xwe

dabû cihê Ferhan lê mayî. Ferhanê şêst û pênc salî, piştikî dabûn erdê. Ji nêzîk ve jerjûrek fîşek li dutayiya wî dabîn û hemabêje laşê wî kiribûn du qet. Ûr û rûviyên wî rijabûn erdê û hê kupalê wî di zendê de û çeltê wî jî bi mila ve bû.

Keça Ferhan **Zahîde Altûrk** vedibêje:

"Gundê me li qontara jor ya zozanên Kêla Memê bû. 1991'ê romiyên Turka bi çeteyên Sêgirkê ve hatin, gundê me şewitandin û pezê me talankirin. Ji bavê min xwestin cihê hevalan nîşa wan bike. Bavê min got;

"Ez nizanim."

Îşkenceyek bê hemta li bavê min kirin û di dawiyê de jî xencerek li ranê wî dan. Ranê stûr seranser çirandibûn. Bi wî awayî li helîkupterê siwarkirin û birin. Bêkû birîna wî derman bikin hefteyekî sax li Sêgirkê îşkence kirin û piştî hingê berdan. Hê bi ser berdana bavê min re çend roj derbaz ne bibûn, dîsa hatin û dubare bavê min girtin. Dîsa li helîkupterê siwarkirin û birin gundê çeteyan, Hosyan. Hê helîkuptêr ji hewa ve bavê min jê avêtibûn û her derê wî şkandibûn. Di ser wî halî de avêtibûn îşkencexaneyê û piştî hefteyekî bi birînên wî ve anîn û avêtin derê malê.

Karê me lawirvantîbî û me ji şivantiyê zêdetir tiştek nizanî. Jixwe pezê me jî talan kiribûn û em di holê de bê çare mabûn. Em revîn û çûn gundê Deştadara ya Hezex. Piştî salekî em ji wêdê hatin û çûn gundê Şêxan. Dema em li Şêxan bûn hevala avêt ser qereqolê. Di çalekiyê de hevalek navê wî Çirav li wêdê birîndar bibû û di binoliya Xelîlê Mehmûdê Hilalî de xwe veşartibû. Hin gundiyan gilhê Çirav kirin û dan girtin. Romiya li derê mala me Çiravê ji Başûrê Piçûk tazî kirin û avêtin dûv panzêrê. Xwîna wî li ser cadê dibû şop. Li serê pirê romiyekî jerjûrek sax di serê wî de teqand û mejiyê wî li ser cadê belav bibû. Tu kes ji tirsa nêzîk wan dera ne dibû. Bavê min çû, mejiyê li erdê belavbûyî komkir, cilên wî anîn û hat. Bi pişt re em revîn çûn Fereşînê û ji wêdê jî hatin Başûr."

Di heman roja Ferhan hatî qetilkirin de dewleta Êraqê çavdêrên çekan yên DY dersînor kiribûn û di navbera Konseya Ewlekarî ya DY û dewleta Êraqê de rewşa şer derketibû holê.

Li diyarên pîroz zivistana sar ji zû ve rûye xwe yê cemidî nîşa mihaciran kiribû. Çadirên peritîn xweyê xwe ne dihemandin û qîmetek yê kolika jî ne mabû. Barana bê navber dibarî, qada wargehê vegerandibû derya ya heriyê. Avên di kortên nav malan de kombûyîn, vegerabûn bêrmên mezin. Her kû diçû cil û pêlav diqetan û zexîre jî hêdî hêdî diqeda. Koçber ji her çar alî ve ve bosekirîbûn û diravên heyîn jî birhabûn. Yên çawa Zivistana reş bi qulibandana û xwe bi gihandana Bihara pîroz, tu kesî nizanî. Her du xwendevanên malekî, bi pêlavek qetayî diçûn dibistanê û ew jî di nav heriyê de

asê dima. Kite-mitên kes û malbatên di berxwedanê de lewaz ketîn, bi desteka rayedarên UNHCR ji wargehê direvîn. Jixwe ji destpêkê û pêve PDK, Turk û xebatkarên UNHCR ji dizî ve di nav koçberan de xebatek ya revandinê rêxistin dikirin û hêdî hêdî encam jî digirtin.

Li ser axa pîroz berxwedanek yeman dihat meşandin. Cîhan li aliyekî û komikek mirovên mihacir li aliyê din. Êrîşkar xwirt û fêrîs bûn ema, rastiyek ya newe paşguh kirine hebû. Ew jî çanda berxwedanvantiya Kurdn bû. Dema aliyê polîtîk ya felsefa Rêber Apo jî li vê berxwedanê dihat barkirin vedigere polayê siqakirî. Rewşa jiyanî ya koçberan, sînorên xeyalên kesên di mercên asayî de jiyan dibûn derbaz dikir. Ji bilî qismek kesên leq û xav gêwilê koçberan di lotkê de bû. Di xizmet û girêdana xwe ya rêkxistinê de qetiyen qusûrê ne dkirin. Bi pêşvantiya kadroyên PKK'ê, her tişt bi zanebûn dikirin û polîtîk tevdigeran. Ligor mezintiya bûyerên diqewimîn, leyîstokên dihatin leyîstin û rewşa real ya wargehê jiyan asayî diherikî. Dibistanan di dema xwe de destbi sala xwe ya perwerdê kiribû, hêza xweparastinê ji her demî bêhtir birêxistinbû, asayîş şev û roj li ser piyanbû û komîteyên semtan bê qisûr xebatên xwe dewam dikirin. Tîmên tolhildanê derketibûn meydanê û heyfa şehîdên xwe radikirin. Çûyîn û hatina çiyan dewam dikir û hemabêje her şev birek çekdar ji wargehê derdiketin. Jixwe xeta fer ya di navbera wargehê û cîhana ji der ve de vekirî qadên çiyabûn. Ew jî şev û ji dizî ve pêkdihat. Bi rêya kesên diçûn Gara, TAK'ê arîkariya diravî dişand û ew dirav birêkûpêk li malbatên pir bê çare dihatin belavkirin. Qismî û sînordar jî be, bi ser Êraqê re çûyîn hatina hin kesên xizmê wan li Misûl pêkdihat û wan jî bazarvantî dikir. Ankû di ti şertan de sazîbûyîn, perwerde û rêkxistina navxweyî ne dihat sistkirin.

Ewrek reşêtarî  û ker banê Nînûva nixwimandibû. Ji ewrê tarî baranek xwinavî dirija ser kolik û çadirên koçberan. Hewayek sar, ema nerm serwerbû. Hewaya cejnê ji zû ve mergên koçberan pêçabû. Semt, semt û sazî, sazî bi durişmên "***Bijî Serok APO! Bi can bixwîn em bi te re ey Serok!"*** koçber**,** ber bi qada pîrozbahiyê ve diherikîn. Dengê durişmeyên mirovên di welatê xwe de mihacir, bi geliyê Laleş diket û dûr vedida. Jixwe ji bilî çend wêne û guhertinên piçûk hemabêje dekora dikeyê kevin hemanbû. Di bin nivîsandina ***"19.salvegera jidayikbûnê pîroz be"*** de; wêneyê Rêbertiyê li milê rastê û li aliyê din Hekî Karer, Zîlan û Mezlom Doxan disekinîn.

Pîrozbahiya qada wê vegerayî teqna heriyê, ji her demî jîndartir û bi coştir dixwiya. Birahîmê Erûhî, axaftinek tevlî hêstî hîvî barkirî kiribû û çepkek mezin girtibû. Şanoya mijara wê her tim kirinên PDK'ê vedibêje, hatibû pêşkêşkirin. Stranbêjan stran gotibûn, xwendevanan rist xwendibûn û ew bêhna motîvekirinê

hatibû. Bi dehan rêzên govendê li paş hev dizivirîn. Reqesvanan desmala sergovendiyê ji destê hev direvandin û dengê stranên bi awayek kuro dihat gotin xwe li gundê Mûseleka dida. Heriya di bin lingên reqasvanan de hatî stirhan têra bilokên nîvê wargehê dikir. Pîrozbahiya Cejna Jidayîkbûnê, heta reş ketinê ajotibû.

***

Roja destpêkê ya meha Kanûnê bû. Dunya sahî û sarbû. Bi rêya Ebo Minafiq, muxaberata Êraqê Şêxe destpêkê yê wargehê ji bû hevdîtinê vexwendibûn bajarê Şêxan.

Endamê Komîteya karê jiderve **Eliyê Heso yê Ziravikî** vedibêje:

“Ez û hevalê Birahîm sibehî zû bi tirimpêla komîteyê çûn derbenda Nehdaran. Endamê muxaberetê yê li Nehdarê çaverêyî me, xwest Birahîm tenê here hevdîtinê. Jixwe ew demekbû hevdîtin wisa çêdibûn; ne dihiştin ji yêkî zêdetir endamên komîteya me tevlî hevdîtinê bibin. Piştî ez dizivirim ji Birahîm re dibêjin; “pêwîste tu bê çek werî.” Birahîm, ji wêdê dizivire, demanca xwe datîne cem Cemîlê ekonomiyê û diçe.

Birahîm, heta êvarî ne zivirî. Di rewşên asayî de herî dereng demjimarekî ne dima. Dereng mayîna wî fikar çêkiribûn. Ez û hevalek yê komîteyê çûn derbendê û me pirsa Birahîm kir. Kesê berpirs destpêkê gotin di devê xwe de gewiland û ne xwest bêje. Vê hêlwesta zilamê Ereb endîşeyên me mezintir kiribûn û me israr kir. Piştî me ling da ser, zilamê Êraqî got;

“Piştî hevdîtinê dema Şêx Birahîm dixwaze li tirimpêla xwe ya li rex avahiya muxaberatê siwar bibe, sê kes wî birîndar dikin û bi tirimpêlê ve direvînin. Li gel hemî lêpirsîn, lêgerîn û lêkolînan tiştek din ji rewşa Şêx Birahîmê nehat fêhmkirin.”

Zilamê pidû hişîn, li nav çavên me dinêrî û vir dikirin. Muxabereta Êraqê, berpirsê komîteya me firotibû. Bikir jî PDK û dewleta Turke bû. An jî her du bi hev re bûn ne dihat zanîn. Ema ya mîsoger, wekû fermî û alanî muxabereta dewleta Seyîd Reîs yêk ji berpirsê koçberan firotibû. Ya balkêş û her tişt vekirî ratêxist berçavan, di heman dema Birahîm hatî revandin de helîkupterek ya Turkan bi awayek pir nivz bi ser wargehê re difirî û baskî Ba edrê ve çûbû. Bi îhtîmalek pir mezin û ji îhtîmalê jî wêvetir ya hergîz, mûxaberata Êraqê Birahîmê Erûhî teslîmî wê helîkupterê kiribû.”

Birahîmê Erûhî; eslê xwe ji gundek yê Dihê bû. Ji ber zulma dewleta turk wekû malbat koçî bajarê Antalya kiribûn. 1993 wekû endamê Parlementoya Kurdistanê yê wê herêmê hatibû hilbijartin. Piştî rewş hat guhertin û mejlîsa dihat payîn bipratîk nebû Brahîm,

derbazî wargeha koçberan bibû û jiyana xwe wekû koçber dewam dikir. Wekû endamê rêvebertiya wargehê hatibû hilbijartin û di asta yêkemîn de berpirsê bira destpêkê ya hatî Nînûva bû. Piştî hingê derbazî komîteya karê jiderve bibû û dema hatî revandin berpirsê komîteya dabaşa gotinêbû.

***

Berfa destpêkê ya salê hûr dibarî. Berfa yêk şevî pehnava Ba Edlê kiribî hêk. Xêrgeha Asîtana Laleş xwirîmîbû û wirarên wê jî ne mabûn. Rewşa dewleta Ûrûqa hemdem, ji ya mihcirên di duryana wê asîtanê de asê mayîn kambaxtir dixwiya. Girgamêşê hemdem li ber serkeratêbû û diperpitî. Hîviya xwe ya dawî ya bê hîvîtiyê bikartanî. Di dawiya dawî de hêza dewleta fêris ya Seyîd Reîs, bi bêbextî têra firotina Birahîmê Erûhî kiribû. Di rastiyê de  çandek exlaqî ya eşîrên Ereban hebû û bi awayek evqas sehl bêbextî li xwegirtiyê xwe ne dikirin. Ema li welatê Êraqê xelabû û li cihê xela lê heyî li exlaq gerîn exmeqîbû.

Di hemwextê revandina Birahîmê yêxtiyar de, neviyên Mardok û Sargonan çavdêrên çekan yên Rojavayiyan dersînor kiribûn. Ji bû zarokên çanda oryantal êrîşî bermayiyên dewleta Ûrûq bikin, şûrên xwe ji kalanan kişandibûn û xwe bi tîr û kevanan pêçabûn. Seyît Reîs, bi şewtandina Xelîcê Ereban xwedayên şaristaniyetê tehdît dikirin û ewan jî ew bi xweyîbûna çekên nûklerî tewambar dikirin. Daholvanê cengê sîkutokê xwe hildabû jor û çaverêyê fermana xwedayê mezinbû. Ji bû Turk û PDK bi awayek herî baş ji mîrateya welatê Ûrûq sûd bigrin û di şer de rola xwe baş bileyîzin; dihatin provakirin û hêdî hêdî rola wan jî dihat kifşkirin. Artêşa Turkan,  xwe li Başûr baş bicêhkiribû û di şerek mûhtemel de dixwest xeyalên xwe yên desteserkirina Kerûk û Mûsil pêkbîne. Ji bû dirustbûyîna wan xeyalên şertê destpêkê, ji holê rakirina PKK'ê bû. Ev, jî ji bû wan firsetek narevbû û bi hemî hêza xwe êrîş dikirin. PDK ya ji van fik û rûdanan wêrîn digirt, çavsohrtir bibû û heyfa dagirkirina Kurdistanê ji mihacirên qampa Nînûva hiltanî. Maka wargehê PKK bû û jixwe ya di demek kurt de hatibûya tinekirin. Piştî serî çû, gewde jixwe yê wan bû. Ji bû qetê mezin yê wî gewdeyê bê serî mayî bidest bêxin, axayên eşîrên derdor di nav pêşbaziyek har de bûn.  Weyli wî yê perçeyek mezintir liber xwe bêxe.

Nînûva ya di nîvê van hesaban de li ser girê cemedê sekinî, ya kengê û bi kû ve bişemite ne diyarbû. Wekî kêştiya di nav pêlên deryayê de li ber noqbûyînê. Sekanvan wêrekbû û rêvan jî ne xirapbûn. Ema, her kû diçû bejna pêlan bilindtir dibû û hût û sîpêlan ji her çar aliyan ve êrîş dikirin. Ji bû dabelandina kêştiyê hemî

hunerên xwe bikartanîn. Bi qewlê jina koçer, “xwedê mezinbû ema, kelek piçûkbû.” Kêştiya karwanê koçberan ya ji devên van pêlên har û hûtên fêris rizgar bibûya û an jî xerq bibe ne dihat zanîn. Ema ya encam kifş dike, bi hostatiyek mezin û di demek rast de helmet kirinbû.

Ew demekbû hemî televîzyon, radyo û nûçevanan serkeftina PKK’ê vedigotin û dinivîsandin. PDK ya mala Berzanî şkestibû û neçar mabû xeta Çûman, Qesrê û seranserê sînorê Rojhilatê Kurdistanê berde û Hacî Umran û Sîdeka jî li ber ketinêbûn. Evê têkçûyînê hesabên wa yên li ser koçberan jî xira kiribûn û êdî ewqas dimohr êrîş ne dikirin. Van pêşketinan şadîtiya koçberên Nînûva du qet kiribû û hîviya ‘di vê cîhana gewrik de êdî qetek xaka me jî heye’ jidil derketibû holê. Hîviya qetek welatê azad, di dêmên koçberan de bihêsanî dihat xwendin. Êdî mineta Sedam, YNK û NY li kaşê hee.. Ji bû vegera qadên rizgarkirî kêliyên zeman dihijmartin! Pir malbatan ji bû çûyînê xwe amade jî kiribûn.  Heta hinan zefera mezin ewqas nêzîk didîtin, destên xwe dirêj bikirana yê bigirtana. Lê, yên kêmekî ji rastiya pergala desthilatdar haydartir û baştir dikarin analîz bikin ewqas ne dilniyabûn.

Şadîtiya ‘di vê cîhanê de êdî perçeyek xaka aydê me jî heye’ zêde ne ajotibû. Piştî revandina Birahîmê Erûhî çar rojan, bi deh hezaran artêşa Romê bi tang û balefir û li gel deh hezaran pêşmergeyên PDK’ê ve ketibûn di Xakurkê de. Hêza dagirker bi arîkariya teknîka NATO û mercên zivistanê, gêrîlayên ARGK’e ji gund û bajarên bidestxistîn derxistibûn. Şer di herema Xakurkê de tîr bibû û bi hemî şewata xwe dewam dikir. Di wan şeran de pêşmergeyên gundên derdora wargehê jî dihatin kuştin û ev jî dibû sedem êrîşên li ser koçberan dimohtir bibin.

Bi gelê PDK’ê di nav kulabên xwe de fetisandî re, wirarên felsefeyek rast, kesîtiyek azad an jî îdeolojiyek kurdîtî ne mabû. Ew bi salanbû li ser hêstên xwîndartiyê hatibûn mercdarkirin. Ya PDK tîmar dikir û li ser lingan dihişt ev hêstbû. Wekû mînak; xwîndartiya herî mezin ya cîhanê dibekû ya di navbera Soran û Behdînan de be. Ew bi salanbû şerê hev dikirin û bi deh hezaran ciwan ji hev kuştibûn. Ema tu kesî pirsa “em vî şerî çima dikin” ne kiribû. Jiber kû şer vegerandibûn hêstên kor yên xwîndartiyê û rayedarên PDK’ê jî ev lewaztiya eşîretî û xwîndartiya kor bi hostatiyek mezin bikartanîn.

Pelçimên darên çiyayê Şêxan weşabûn û rût û tazî mabûn. Bapeşka li navguhê darên keçel diket, dengê şilxa mêşên hingivî bi ser dol û niwalên çiyê têxist. Bagera ji neqeba Laleş difelitî, çadirên kelekî dihingavtin û singên wan ji binî ve dileqandin. Ligor gotinên gotinbêjan; bagera vê neqebê tirimpêlên mezin qulibandine û

pekandine pesarê beramber. Bagera dimohr, serpûşkên xîbetên yêxtiyar û bê hal ketîn tavêtin dola dawî. Koçberên li dûv çadirên xwe yên ji hewa ve wekî perwaneyan dizivirin diketin, di nav derya heriyê de asê diman.

Mele Mihyedînê ji serma dilerize, cemedaniyek reşbelek li dor guhê xwe pêçabû û buhayê bacana du qet kiribû. Sond û selawat didan dûv hev û biminetek mezin digot; "wîleh we, bileh we û semawileh ez vê xizmetê ji bû xelkê qampê dikim." Li gel buhabûn û tinetiya koçberan jî her dukandarê kû sanduqek bacan bidest ketî şad û razîbû. Dukandarên kêmek fîkî û sanduqek bacanê rizî bi dest êxistîn biber dukanokên xwe ve diteyîzîn. Ji berya dukandar ji huzûra Melayê yeman veqetin, muşterî li devê dukanê kom bibûn û biteybet bacan, ji destê hev direvandin.

Roj, wekî qursek zêr li cihê danûpeza rawestabû. Bi ser operasyona dawî ya dewleta Turk re nû du roja derbaz bibûn. Çêlên ewrên bi tevger, wekî aş aşokan bi dora xwe re dizivirîn û bayê xezebê di ser koçberên Nînûva de dirijand. Karwanek mezin ya ji cîbên landegros pêkdihat û li ser tenişta wan bi rengê hişînê ezmanî bi tîpên mezin "UN" nivîsandî, bi neqeba Laleş re ketibû di nav malan de. Karwanê ji tirimpêlên teybet û buha pêk dihat, li derê navenda UNHCR ya li pişta saziya malbatê Şehîda rawestabû. Cêhgirê Komîsertiya bilind ya koçberan Cemalê zikmeşk, berpirsê heman saziyê yê Bexdayê Ahmet Cebretullahê rêh bizin, berpirsê qampê Piyerê çav kunî kunî, berpirse dilxwede ewlekariya qampê Turûncî û rayedarên walîtiya Duhokê ji tirimpêlan daketibûn xar. Van mirovên hêst sentetîk, rûsar û bi awrên kîndar li koçberên Nînûva temaşe dikirin, komîteya wargehê vexwendibûn huzûra xwe. Ahmet Cebretullah, bi dengek tevzker û û minetdar got;

"Dewlta Turk û PDK ji mayîna we ya li vêdê ne rihetin û pêwîste hûn ji xwe re cihek din peyda bikin."

Jixwe koçberan ew mirov û saziya wan zêde mucid ne digirtin û guhdar jî ne dikirin. Ji destpêka wê rêvantiyê û pê ve ev wisabû. Ewê saziya dilxwede mirovyar, ti carî mirovtiyek bê berdêl nîşa koçberan ne kiribû. Dixwestin li beramberê çend kêlo arê kufnikî, koçberan ji wan bistînin û kesîtiya ew dixwazin li wan bar bikin. Camêran ji destpêkê ve digotin;

" Yan hûnê bê rêkxistin, bê îrade, bê armanc, bê îdeolojî girêdayî vê; bê exlaq û wekî mebin an jî ava me di coyekî de na herike."

Tişta herî zêde ew gurên kevilên mihan li xwe kirîn jê aciz, xwe rêxxistinkirina mihaciranbû. Ji ber kû komana birêkxistî komanek azad û kubare, bi urf û edetê xwe jiyan dibe. Li hember destên ne xêrxwaz yên jiderve bihesin sto xwehr nakin û hêstên

wan yên xwebûnê xwirtin. Komana xweyê van teybetiyan, destûr nade werin kedîkirin, bê kesîtî, bê îdeolojî bimînin û xelk wan ligor keyfa xwe bikar bînin. Ya ew rûsar aciz dikirin ev bû.

Dazdeh roj ji meha Kanûnê derbaz bibûn û bi ser hatina şandeya DY re pênc roj bûrîbûn. Jixwe piştî operasyona artêşa Romê ya dawî, dîsa pêşmergeyên PDK'ê har û hêc bibûn. Her roj bi awayekî êrîş dikirin û çêlekên bi singên çadiran ve girêdayî jî direvandin. Çend kerî pezên mayî jî hêdî hêdî talan dikirin. Qismek piçûk koçberên ji serkeftina wê rêvantiyê bê hîvî ketîn, li rêyek ya revê digeran û kit mitên wan jî bi desteka rayedarên DY direvîn. Ji bû gel dest ji xwe ne berde û xwe ne sipêre wan gurên dev bixwîn, koçberan civîn li ser civînan li dartêxistin. Ema gotin di cêh de be, li hember wê hêza heft serî bi dilek tazî li berxwedayîn, ne karê her mak egîdîbû. Cengek bê eman ya îdeolojîkbû û yên di îdeolojiya azad de ne serwext di wê têkoşînê dijwar de xwe ne radigirtin.

Reşê şevê nû ketibû. Bagera ji neqeba Laleş difelitî her tişt dimalişt û li navguhê çadiran dida. Şev sahîbû û hê di êvar de erd û ezman biheve mabûn. Dora hêşedartiya neqeba Laleş, ya taxima Mijîniya bû. Fermandarê taximê Şêx Hacî yê Mijînî, li pêşya hevalên xwe hatibû û bi hizrandina 'hê dijminan çeprên me ne girtîn' dixwest zû xwe bigihîne cihê nobetê.

**Şêx Hacî Şêxê Mijînî** vedibêje.

"Min ji hevalên xwe re got;

"Heta hûn xwe amade bikin, emê dereng bimînin. Ezê herim, hûn jî zû xwe hazir bikin û werin."

Li devê dolê hêşedarên semtê hebûn. Ji min re gotin;

" Milîs li çepera bi ser cihê we re nobetê digrin."

Çepera hêşedarên semtê nîşankirîn, bi ser ya me re li serê girbû. Piştî min parola ji hêşedarên semtê girt, ez hizirîm 'destpêkê herim cem milîsan û bi pişt re dakevim cêhê xwe'. Min xwe tewand û sirt û sirt berê xwe da çepera dihat ramandin milîs lêne. Hê ez ne gihatîm çepera dabaşa gotinê, ji çepera me ez gulebaran kirim. Di şînika destpêkê de min ji kemaxa xwe fîşekek xwar û ketim. Di heman demê de li her du aliyên neqebê jî cihê min û wargeh gulebaran dikirin. Hevalên li dûv min hatîn, semtên nêzîk û hevalên li derdor bi hewara min ve hatin. Li ser hatina hewarê, pêşmergeyan cihê xwe berdan û revîn.

Di encamê rasthatinekî de şans li rûyê me kenîbû. Heke hêşedarên semtê ne gotibûna; "milîsan çepera jor girtine" û min qesta çepera dabaşa gotinê ne kiribûya, ezê yêkser çûbûma çepera pêşmergeyan girtî û wê demê meyê pir wundahî dabûna.

Wê şevê ez birim nexweşxaneya gel. Dr. Medya Alemanî, tedawiya min ya destpêkê kir û wundakirina xwînê rawestand.

Jixwe şev leşkerên Sedam destûr ne didan kes derbazî Êsifnê bibe. Roja din heştê beyaniyê hevalan ez birim Şêxan û emeliyat kirim.”

***

Her kû diçû rewş kambaxtir dibû. Êrîşên MÎT’a Turkan û pêşmergeyên PDK’ê gelê wargehê kerixandibû. Seb û gazindên li ser hin kes û malbatên têkiliyên wan bi PDK’ê re heyîn, ji zû ve di guhê rêvebertiyê de vedida. Hin bûyerên diqewimîn, ev gazind û rexne mafdar dertêxistin. Ji kemînên dihatin avêtin, ji êrîşên di xalên hesas yên koçberan de dihatin pêkanîn dixwiya kû bi awayek bêhnî haya pêşmergeyan ji nav wargehê çêdibe. Gomanên ‘PDK’ê di nav koçberan de tevnek ya sîxoran avakiriye û di bêhê de agahî digre’ mejiyê avana wargehê tevlîhev dikir. jixwe ew demekbû dikara têkildartiya hin malbat dihatkirin û hin endamên malbatên mijara gotinê, di lêpirsînê asayîşê de têkiliyên xwe îtîraf jî kiribûn. Ema, rêvebertiyê zelaltiya îtîrafan ji gel vedişart û hewldida piştî tekezkirina encam îtîrafan eşkere bike.

Nadir, kurê Silêmanê Jîrkî bû û yêk endamê asayîşa wargehêbû. Ew demekbû li asayîşê girtî û têkiliyên xwe yên bi PDK’ê re îtîraf kiribûn. Bûyera Şêxê Hacî jî di encama arîkariya wî de pêkhatibû. PDK’ê, kesê mijara gotinê êxistibû û bibû casûsê wan. Di derbarê hemî fik, xef û tevgerên gelê wargehê de zanîn digihandin pêşmergeyan û di encama zanîn wî de ziyanên mezin gihatibûn koçberan. Muhemed, mamê Nadir yê mezin û di heman demê de pêşkêşvanê wan bû. Li gel hemî delîl û nîşanan Muhemed, têkiliyên malbata xwe û PDK’ê red dikirin û wekû bêbextî şîrove dikir. Piştî peletforma gel, dadgeha gel biryara ji wargehê qewitandinê wan malbatan dabû.

Bi ser bûyera Şêxê Mijînî re sê roj derbaz bibûn. Nîvro nû wexirîbû. Li kolika televîzyona semta sê, platforma malbata Muhemed û Silêmanê Jîrkî li darbû. Hemî erkdarên wargehê vexwendiyên platformêbûn. Ji rêvebertiyê Cûma, ji asayîşê Zîna Hevlerî û ji semtan Nahîda porspî wekû dîwana peletformê hatibûn hilbijartin û dadgeha gel destpêkir. Meqamê îdîayê ji rêvebertiya asayîşê Cemîlê Amadî îdîaname xwend. Her tişta hatîkirin di îdîanameyê de eşkere û vekirî hatibû kifşkirin. Cûma yê di rewşa heyî de dadger, ji tewambaran pirsa; “hûn tiştên îdîanameyê de hatîn diyarkirin dipejirînin” kir. Nadir, bi “belê”yek ne jidil îdîayên mekamê îdîayê pejirand. Ema Muhemed, bi dêmek tirş, bertekek tevzker nîşa dîwanêkir û îdîayên hatînkirin wekû derew û bêbextiyek mezin binavkir.

Dîwana dadgehê di biryardayînê de zehmetiyek mezin

dikişand. Ne dixwest kesî bi kutekî bêxin der û şertên demdirêj yên girtîgehê jî li wargehê tinebûn. Gelik kesên bi awayekî têkiliyên wan li ser gundiyên derdor re bi PDK'ê re çêbûyîn û zanînên navxweyî ji wan re radigihînin hebûn û ji bû peyamek dijwar bidin wan kesan ew keysek narevbû. Têkiliyên malbatên gomandar, bi delîl hatibûn îspatkirin û rêvebertiyê hewldida biryarek encamgir ji dadgehê derbikeve. Jixwe dadgeha gelbû û biryar ji gel re hatibû hiştin.

Li hember îtîrafên hatînkirin û îdîanameya hatî xwendin avana dadgehê pir aciz bibû. Ligor hatî îdîakirin, bi dehan mirovên wargehê di encama zanîn dayîna wan kesan de ketibûn kemînê û şehît û birîndar çêbibûn. Dîsa di encama rê nîşandayîna wan de, bi keriyan pez û dewar hatibûn talankirin.

Silêmanê Aloşî mirovek temendar, bejin kurt û her tim şaşikek peritî li serîbû. Dema aciz dibû, di ber xwe de taxî û wekî taviya heyva Gulanê kef ji deva dibarî. Kêmekî vizbû û dema bêhna wî teng dibû yêkcar tiştek ji gotinên wî ne dihat fêhmkirin. Pêşniyara destpêkê ji Silêman hatibû;

"Heval, çi hatibe serê me ji destê van xayîn û bêbextan hatiye. Pêşniyara min; ev avan xwe di devê vê çadirê de bêxe rêz û ji rêzê ve tif bike rûyê van xayînan û bi pişt re jî ji wargehê werin avêtin."

Pêşniyara Silêman, bi yêk dengî hatibû pejirandin. Wekî Silêman pêşniyar kirî avana dadgehê di devê derî de nebibû rêz ema, avan hemî rabibû jipiya û dema tewambar di nav wan re derbaz dibûn di serî de Silêman û çend kesan tif kirin rûyê wan. Piştî dadgehê, malbata Muhemed û silêmanê jîrkî, ji wargehê hatibûn avêtin.

Di asta hatî îdîakirin de hebûna têkiliyên wan malbatan ya bi PDK'ê re, ti carî xwe ji gomanan rizgar ne kiribû. Ema ya bê goman û ti şik bi xwe re ne dibirin, têkiliyên Nadir di astekî de bi dijminan re çêbibûn û di derbarê navxweyî de hin zanîn dabûn PDK'ê. Lê, cezayê 'tif kirinê' ti carî xwe ji rexneyan paqij nekiribû û di astekî de avana wargehê ne rihet kiribû.

Bi ser qewitandina malbatên Jîrkî re nû çend roj bûrîbûn. Endamê komîteya navenda PKK'ê Riza Altun, bi rêya rêberên çiyan re li hewara koçberan hatibû. Riza, PKK bû û PKK ji bû wî gelî di şeva tarî de trûska ferbû. Bi hatina Riza re, sist şidabûn û tirsonek bi wêrîn bibûn. Dibêjîqey ew zilamê esmer, zirav û dirêj bibû sûrhek pola û li dora qampê hatibû pêçan. Êdî her kesî bi hêviyek cuda li jiyanê dinêrî û bidilek rihet di nav zarokên xwe de serê xwe datanî û dinivî. Gelo Rizayê bikaribûya ji duryanên hatîn sênckirin yêkî veke û van rêvanan bigihîne cihek aram; ne dihat zanîn. Ema, ya misoger eve kû hatina wî mirovê hêlwest hişk û jixwe bawer, bêhnek kûr bi avana koçberan dabû kişandin.

Ew mirovê bi berxwedana xwe ya di zîndana Amedê de navdarbûyî û bi têkoşîna xwe ya li dijî dijminan bûyî efsaneyek jîndar, bi hêlwesta xwe ya natirs hîvî û bawerî bi xwe re anîbû. Jixwe di heman dîrokê de konferansek li Silêmaniyê çêbibû û konferansa PKK û YNK jî di nav de hifdeh partiyên Kurdan tevlî bûyîn, du rojan ajotibû. Di encam de komîteyek netewî hatibû hilbijartin û vê komîteya mijara gotinê ya tevayê pirsgirêkên heyîn çavdêr kiribûna û ji çareseriya wan berpirs bû. Ev pêşketinên gelê wargehê ji MED TV fêr dibe, hîviya vebûna duryanekî jî bi xwe re dafirand.

Bi hatina Riza re, erêntî û neyîntiya bi hev re serê xwe hildabûn. DY, ya ew demekbû embargoyek ne ayankirî danî ser wargehê û qût jî di nav de tiştek ne tanî, hêdî hêdî dest bi anîna qût û kêm jî be pêwîstiyên zivistanî kiribû. Ema ew saziya sîsika şerê teybet, her gava wê ya wekû erênî dixwiya hergîz bipêre hesabek nexêr jî dikir. Ji du hezar malan re çarsed çadir û pênçsed betanî anîbûn. Li aliyê din dohn tanî, ar ne tanî, an jî arê tanî têra nîvê şêniya wargehê ne dikir. Koçberan, ev nêzîkatiyên wan wekû “tevlîhevî” binav dikirin û kesên di derbarê vê saziya dilxwede mihaciryar de erênî jî difikirîn, behrek ji vê rastiyê derxistibû. Tu kesî nikarî bawer bike kû, ew fêrsa DY nikare têra heft hezar mirov ar, an jî ji bû starê çadir bîne.

Li aliyê din, pêşmergeyên PDK’ê û quntrayên Turkan asta êrîşên xwe derxistibûn lotkê. Hemabêje roja êrîşek ne anîbûna ser wargehê tinebû. Wan pêxasên têr berjengên neyînî, her roj tiştek ya koçberan didizîn. An jî êrîşê aliyek ya wargehê dikirin. Êdî ewqas çavsohr bibûn, ker û dewarên di nav wargehê de ji singên çadirên xweyê wan vedikirin û ji xwe re dibirin. Bi hêzek mezin sirt û girên li derdor girtibûn û her kû bêhna wan teng dibû wargeh gulebaran dikirin.

Nakokiyek yemanbû. Hîviyekî ya din tîmar dikir û şaşîtiyekî gelik rastî bi xwe re dibirin. Awatên bi mergan ve daleqayî mayîn yên li kû biketan, ne dihat zanîn. Carna xewnên xemilî yên girava evînê û carnan jî guriya agirê dojeha cîhana wujdana xwe wundakirî serî hildida. Xewn û xeyalên koçberên rêvanên ber bi ne kifşbûyînê ve diherikin, ketibûn çincîrka di bêdawiyetiyê de û ji kendalekî ber bi kendalê din ve ditirşa. Hemî duryan hatibûn sênckirin û bayê sihergehê ya kengê mizgîniya xêrê bîne, ne diyarbû. Deşta xêrgeha Ahûra Mazda dikelî û haxta pêlên ava taristanê bi ser re bavêta. Kê yê li ber pêlên ava ne ji ya Tofana Nûh kêmtir biketa û kê yê xwe gihandibûya qeraxên welatek azad, qet ne dihat zanîn. Teşbîhê kêştiya Nûh, wargeha bikaribe xwe bigihîne çiyayek xwe ragir an an, ew jî ne kifşbû. Ya mîsoger û ti şikan bi xwe re nabe, komikek mihacirên welatê xwe di teqna deşta welatê Şêx de asê mabûn û ji

aliyê pêxasên desthilatdartiyê ve dihatin qirkirin.

Têkoşîna li ser wê xaka şemîtok, bi hemî wezbeta xwe tajot. Ev ne têkoşîna Mûsa û Firavnê Misrî û ne jî ya Xelîl Îbrahîm û Nemrûdê Ruhayî bû. Ev, cenga du alîteya Bavê Kal bû. Têkoşîna tarîtî û ronahiyêbû. Şerê qenc û xirabanbû. Şerê zikmeşkên çavbirçî û lêgerînvanên azadiyêbû. Ev şer, şerê Awir Mezin û Ehrîmanan bû. Hê çend evîndarên di vê rêyê de biketana, çend xewnên nîvçe bimana û çend stêrên din yên ji ezmanê welatê min birijana qet û hîç ne dihat zanîn. Ema, şev çiqas tarîbe, dêw çiqas pir serîbe û zalim çiqas qemçik stûrbe; hergîz serkeftin ya rêvanên heqîqetê ye!

Roja cejna Noela Xirîstiyanan bû. Alema xirîstiyan bi cejna xwe sermest û serxweşbû. Galtê pê li darbû û deng li ezmanan ketibû. Ji nişkan ve deng li wargehê ketibû û herkes ber bi derbenda Sedam ve dibezî. Jixwe êş hevbehrbû û her şêniya rûniştvana wargehê, li hember dengek pir piçûk jî bihesbû. Dengek bilind, hewarek piçûk jî wargeh radikir ser piyan. Ax bihata hilavêtin, li ser rêya diçû Nehdaran li erdê ne diket. Herkesî dilezand û tu kesî nizanî çi qewimiye. Jixwe yên dizanîn jî li pêş çûbûn.

Pêşvanên hewarê li hember dîmenê çavên wan qeytkirîn hilciniqîbûn. Kurê Mehmûdê Zêwkî, Xalidê deh salî di nav xwînê û janê de digevizî. Qetên lingek yê wî li derdor belav bibûn. Parçeyên pêlava lastîka reş û yên lingê wî tevlîhev bibûn û bixwînê hatibûn nixwimandin. Xwînê, xwe ji dêmê zarokê di nav êşek dilqelqîn de li erdê vedigevize kişandibû. Zarok, ne digirî û bi awrên şaqis li valetiya bê dawî dênêrî. Ya di hişan de hatî neqişandin û qet newe ji bîrkirin, hêlwesta bavê Xalid, Mehmûdê Çav şeqitîbû. Zilamê çavek yê wî şeqitî û vajîbûyî, zarokê lingê wî bi gozekê re qutbûyî û rayên xwînê jê dirêjbûyîn da ber zeleyan û got; “çi karê te li vêdê heye?”

Xalid û çend hemsalên xwe hatibûn pejîngên tifikê. Ji bû nan pehtin, xwarin çêkirin û av germ kirinê dar pêwîstbûn. Ji tirsa pêşmergeyan ne diwêrîn li aliyê çiyê herin û berê xwe dabûn aliyê leşkerên Sedam. Ew qad jî ji kevin ve hatibû mayînkirin û haya zarokên ji mayînan tinebû. Xalid li pêş û zarokan dabû nav zeviya mayînan. Xalidê zarok, dabû ser mayîna pênç şîşik û mayînê lingê wî yê rastê bi gozekê re firandibû. Aliyê erênî rojbû û çaverêyê demjimara destûra dewleta Êraqê ne mabûn. Dr. Medya Alemanî, zarok da ber singa xwe û bibez gihand tirimpêlê.

Ji sersala salnameya Filehan re du roj mabûn. Çêlên ewrên li ezmnan bi tehfdayîna bayê Kur bi leza fîşekê berbi Başûr ve dirijan. Roja tîrojên wê rengek efsûnî li ewran barkirîn, ber bi Rojava ve hêdî hêdî perên xwe dikutan. Haxta dema xatiranbû û xendeyên dawî tavêtin dêmên koçberên Nînûva. Bayek sar li dêmên zarokên nû ji dibistanê derketîn diket û çilm û gilîza wan tevlîhev

dikir. Xwendevanên lêhvên wan dibin çadira sar ya dibistanê de hişînbûyîn, bê rêkûpêk ber bi malên xwe ve dibezîn. Bizinên hê destê pêşmergeyan ji wan ne girtîn, li derê çadirên xweyiyên xwe newqa wan bi hev ve mabû û ji birça û serma dilerizîn. Bergehê wargehê tengbû û biteybet êvaran wargehî diqulibîn ser rêya qîr û piyase dikirin. Dîsa roj êvarbû û rêya tirimpêlan ji koçberan tijîbû. Cihê koçberan hevdidît û razên xwe vale dikirin ev rêbû. Her kêyê kû serê xwe ji çadira bêmerîs dertêxist, xwe li ser wê rêyê peyda dikir. Ji bilî demjimarên xewê her tim rê ji koçbran pînc dayîbû.

Esayîşa wargehê ji sibeha rojê ve di tevgerê de bû. Xebera "pêşmergeyên di bin menfesa li tenişta wargehê de kemînê bavêjin û suyîqastê li hin kesên diyar bikin" girtibûn. Ji bû pêşiya qewmîna dabaşa gotinê bigrin, ji her demî bêhtir bihes tevdigeran. Di bin rê ya li milê jor yê semta du, xêlê Meshûdê Nêrwehî li darbû û gêra govend fireh dizivirî. Karwanê tirimpêlên pêşmergeyan ya ji berya demekî bi aliyê Ba Edlê ve derbazbûyî, fikarên asayîşê zêdetir kiribûn. Ji bû koçber zêde li ser cadê kom nebin û di rewşa gulebarandinek ya PDK'ê de zêde telefat çênebe, asayîşê gel hişyar dikir û ji rê dertêxistin. Malbata xêlîvan jî ji rewşê hatibû agahdarkirin û wan jî xêlê xwe sist kiribû.

Karwanê ji berya du demjimaran derbaz bûyî, dubare zivirî. Li hindama gêra govendê tirimpêlên xwe sistkirin ema, ne sekinîn. Rûyên çekdarên di tirimpêlan de girtîbûn û bi tiliyên xwe kesin nîşa hev dikirin. Camên tirimpêlan vekirîbûn û lûleyên çekan li mirovên li ser cadê dinêrîn. Dijminatî bê minetîbû û her tişt dikare di her rewşê de biqewime. Ema tu kesî bawer ne dikir ew karwanê gel gulebaran bike. Jixwe tu kesî ne dixwest îhtîmalek wisa jî raman bibe. Ji ber kû herî kêm rojê bi sedan tirimpêl di wê rêyê re dibûrîn û heke bixwestana dikarîn ji her tirimpêlê wargehiyan gulebaran bikin. Lê heta hingê tiştek wisa ne qewimîbû û îhtimala wê jî ne hatibû ramandin.

Dawiya karwanê tirimpêlan li cem bîra avê ji Welat û Osmanê Hîlalî bûrî. Her du kesên navbûrî, xizmên hevbûn û endamên asayîşêbûn. Wê rojê dewriyevanên cadêbûn û heta wê demjimarê çar zivirîbûn. Piştî dawiya tirimpêlan di neqebê de wundabû deh deqeyan, tirimpêlek ji karwan veqeta û bi rêya xwe re zivirî.

Dayika **Welat Kara Mehbûb** vedibêje;

"Mala me li pişta asayîşê û nêzîkê devê neqebêbû. Kêmek roj mabû û dora avê ya taxa mebû. Jinên taxê hemî li ser kehniya devê cadê kom bibûn. Welatê min û Osmanê Sadiq, wê rojê dewriya li ser cadêbûn. Boşîtiya li ser rê belav dikirin û ji bû mirov zêde komî ser hev nebin ew hişyar dikirin. Karwanê tirimpêlên pêşmergeyan ya ew demekbû bi baskî gundê Şkeftê ve çûyîn, zivirîbûn. Piştî karwan

di neqebê de wundabû kêmekî, tirimpêlek Landegros ji karwan veqeta û dubare bi rêya xwe re zivirî nav malan.

Camên tirimpêla vegerayî vekirîbûn û mirovên di tê de rû girtîbûn. Bi goman û balkêş li mirovên li ser rê dinêrîn. Xofek ya ji wê tirimpêlê dihat mergên min dihingavtin. Min ji jinên li derdora xwe re got; "çima vê zivistanê derî û camên vê tirimpêlê vekirînê û mirovên di têde rû girtîne?" Ajotvan, tirimpêl bilez tajot. Welat û Osman, li hindama nexweşxaneyê, li ser rê sekinîbûn. Keça min Sebîha got; "ezê herim kehniya ser cadê bîdonê xwe dagirim" û berê xwe da rê. Tirimpêla dabaşa gotinê hê ne gihatî duryana gundê Memo, dubare zivirî û gihat hindama me. Li hindama me tirimpêl sistkirin û ji nişkan ve deriyê sandiqa tirimpêlê vebû. Bi çeka BKC yê mirovên li ser rê gulebaran kirin. Bi dengê guleyan re pêşmergeyên her du girên aliyên neqebê girtîn jî gule di ser malan de barandin.

Her tişt di bênekî de qewimîbû û herkes ji aliyekî ve direvî. Xwendevanên dibistana navîn di dersê de bûn û pêşmergeyên neqeb girtîn, yêkser dibistan hedef girtibûn. Zarok ji dibistanê derketin û herkes bi aliyekî ve revî. Kurê min Welatê hijdeh salî, keça min Sebîha deh salî, Osmanê Sadiqê bîst û pênç salî, Mihemedê Derwêşê pêncî salî, Nermê ya sêh salî û Heyata Nêrwehî dabûn erdê. Karwênê dihat îdîakirin Meshûdê Berzanî jî di nav de ye, endamên asayîşê Welat û Osman naskiribûn û yêkser hedef girtin. Welat, li tenişta menfesa li pişta mizgevtê gêrbû binê rê. Bi dehan gule li singa wî ketibîn û di cêh de can da. Osman jî li tenişta rê ket û ewî jî di cêh de jiyana xwe ji dest dabû. Yên mayîn jî hemî birîndar bibûn.

Me hemî bi hev re rakirin nexweşxaneya Êsifnê. Ema Welat û Osman li cihê bûyerê şehît ketibûn. Singa Welatê min wekî seradê kun, kun kiribûn. Dayika te nemîne kezeb! Hê ciwanê min hijdeh salîbû. Wan cehşên Turkan ne hiştin bi murada xwe şabibe. Xweda wan jî bi muradê şa neke îşileh. Heta qirê qiyametê kula ciwanê min ji dilê dayîka wî dernakeve" û girêka di qirika Mehbûb Kara de asê mayî, bişubheta du avzêmên biharê bi çavan re teqabû û dirija xar. Jina çavên wê yên belek di bin jana Welatê ciwan de westayî, rûyê xwe zivirand û êdî bideng digiriya.

### Fika Qirkirinê

Sala nû mizgîniyek ne bixêr bi xwe re ne anîbû. Roja destpêkê ya salê li Dublîna Îrlanda, di pişt deriyên radok kirî de fikên bêbext dihatin çêkirin. Serkêşiya wan fikan Amerîka û dewleta Ingilîz dikir. Dewleta Turk, PDK û YNK jî tetikkêşê wê fikêbûn. Armanc, tinekirina PKK'ê û girêdayî vê belavkirina karwanê koçberanbû. Piştî xetên bingehîn yên fika dabaşa gotinê li Dublînê hatin kifşkirin,

civîn derbazî Ankara bibû û rêbazên pêkanînê li wêdê dihatin gotûbêjkirin.

Roja sêzdehemîn ya sala nûbû. Çileyê zivistana reş bi hemî hunerê xwe li ser dikebû. Xwezayê wargeha Nînûva bi çarikek spî nixwimandibû. Serê şembelûlkên bi şerîtên konan ve daleqayîn li erdê girên cemedê avakiribûn. Çarika spî xwe ji zû ve li ranê stûr yê zarokên dibistanê dabû. Zarokên ji serma lêhvên wan hişîn bûyîn û şeqe şeqa li hevketina dinanên wan ji dûr ve dihat bihîstin, gokên berfê dileyîstin. Dûyê agirên tifikan hêstir di çavên kevaniyan de tanîn xar. Pêlavên qetayîn goreyên rîs yên hêşedaran ne diparastin û di pêlavên peritî de şil û pil bibûn. Guriya bêmerîs ya di sopeyên Eledîn de dilerizî, têhna xwe wunda kiribû û dora xwe germ ne dikir. Çadirên kevin bê taqet mabûn û di nav berfê de wunda bibûn. Di bin berfa giran de silûma pişta wan tewabû û haxta bişikesta. Çêlek û bizinên bişans û destê pêşmergeyan ji wan ne girtîn, li derê çadiran ji serma û birça dilerecifîn û newqa wan bi hev ve mabû. Teyrik û tiyarên deşta pîroz vekişabûn lîsên xwe û êdî dengê wan ji dûr ve jî ne dihat.

Berf bereketbû û ketina bereketê her tim mirovên kedkar şad û bexteyar kiribûn. Şert çiqas zorbin û serma çiqas serdestbe dîsa jî barîna berfê mergên kedkaran geş û xweş dikir. Mercên xwezayî çiqas ligor rastiya xwe ya resen pêk hatibûya ew komika mirovên xwezayî ewqas şad dibûn. Kurdistan welatê demsalabû. Her demsal ligor rastî û spehîtahiya xwe pêk dihat, jiyan dibû û rindîtiya xwe dewrî demsala li dûv xwe dikir. Zivistanek berfîn biharek rengîn, têr gul û giya bi xwe re tanî. Havînek germ, peyîzek têr bereket dafirand. Girêdayî vê rastiyê, di bin çadiran de bin jî dar û sopeyên wan tinebin jî Komana Kurd jiberfê aciz ne dibû.

Neviyên Helako, ji bû kerixandin û di encam de teslîm girtina wê komika lêgerînvanên heqîqetê her firset bikartanîn. Danûpeza roja piştî barîna berfêbû. Dîsa çar balefirên cengê yên dewleta Romê, berê xwe dabûn warê koçberan. Balefir ji Bakur ve hatibûn û li raser wargehê nivz bibûn. Ji ber dijwartiya dengên wan heloyên mirinbarkirî, çadir ji cêh firîbûn û şembelûlkên bi şerîtan ve hûr û heraf bibûn. Newq li berfa şiloke vekiribûn û badev ji cihên pûtikî radikiribûn. Wekî teyrên dubirak, bi ser malan re digihatin sînorê Seyît Reîs û ber bi bejna sînor ve difirîn. Çawa per û bazkên kew ji ber baz dişikestin û dibin lat û kuçan de ji xwe re li cihek yê revê digera; artêşa Seyîd Reîs jî wisa ji ber balefirên turkan direvî. Seyît Reîs, hingî dixwaze bila zirtên şewitandina cîhanê bike; bi vê artêşa tirsonek, ji qirkirina Kurdên belengaz zêdetir nikare tiştekî bike.

Bi dersînorkirina çavdêrên çekan re awrên cîhana şaristan zivirîbûn ser bermayiyên Ûruqa Girgamêş. Ew desthilatdarên

çavên wan ji zêr û petrola Rojhilata Navîn zêdetir tiştekî nabîne, berê lûleyên çekên xwe dabûn Êraqê û haxta qiyameta sohr bihata xarê. Sedam El Huseyn, zirtên bê hîvî li dûv hev rêz dikirin û cîhana Şaristan gurxweştir dikir.

Kerdizên Asya Navîn yên her tim li ser nakokiyên desthilatdaran nan peydakirîn, dîsa di kemînê de bûn. Ew toxmê bi liqata pirêzeyên desthilatdarên şaristaniyetê tîmar dibû, dîsa xewnên xemilî didîtin. Bi xeyalên hestiyên bergeşa xwedayên şaristaniyetê bikujin, heştê Sibatoka dîn dubare derbazî Başûr bibûn. Di bin navê "şerê PKK'ê" de şêst hezar romî û bi hezaran top û tang derbaz kiribûn. PDK'a mala Berzanî jî bidil û can tevlî wî şerî bibû û li hember TAK'ê tevgerek mezin dabûn destpêkirin.

Biryara serdarên şaristaniyetê mîsogerbû û wê carê hîviya serkefinê bê gotûbêjbû. Ji bû belavkirina pergala Êraqê, tinekirina PKK'ê wekû mercek narev hatibû kifşkirin. Girêdayî vê fikê, keysa belavkirina wargeha Nînûva jî ketibû û ne ya revandinêbû. Bi erêkirina Amerîka û Îngilîz, rê û rêbazên pêkanîna vê fikê li Ankara hatibûn zelalkirin. Tabloyek piçûk ya vê şanoyê; artêşa Romê û Pêşmergeyên PDK'ê, yên bi tang, top û leşkeran êrîşî wargehê kiribûna û dagir bikirana. koçberên ji ber şûrên wan jî bifelitin, yê yêkser derbazî Turkiye hatibûnakirin.

Bi ser derbazbûyîna dawî ya artêşa romê re nû rojek derbaz bibû. Ew demek dirêjbû roja sohr cara yêkê sibehî zû dêmê xwe yê bibeşaş nîşa koçberan dikir. Zemîteyek tîr, dola di nav malan re derbaz dibû tijî kiribû. Sira ji nav zemîtê difelitî, wekî şivterkên hinaran li rûyê mihacirên Nînûva diket. Li cihên bê berf mayîn, xwûsîtî destekî stûr bibû. Dêmên bêrmikên di nav wargehê de, bi cemedek stûr hatibûn nixwimandin. Di rewşek asayî de tu kes ne wêrî serê xwe ji nav cilên xewê derxîne. Ema koçberên ji serma nikarin binivin, ji zû ve li ser linganbûn. Rêveber û komîteyan çadir dikutan û koçber vedixwendin civînek giştî.

Jixwe di pêvajoya rêvantiyê de darezînek giştî bi karwanê koçberan re pêşketibû. Ji berya wekû fermî were ragihandin hîs û refleksên wan ya heyî jiber kiribû. Ji xeynî hin tiştên pir teybet û fermanên rêkxistina jor, hemabêje ya rêvebertiya herî jor pêdihesa, gel jî dizanî. Jiyanek komîn pêkhatibû û herkes bi her tiştê hev zû dihesa. Xetertiyek herî piçûk bihêsanî dihat hîskirin û ji nişkan ve guhê her kesî beldikir. Herkes li hember her îhtîmalê bihesbû û jixwe heke ya mijara gotinê xetertiyek ya jidervebe, herkes dibû laşek û heman tiştî hîs dikir.

Di nav nîv demjimarî de ji nîvî zêdetir koçber li meydana pîrozbahiyê kom bibûn. Mirovan bi awrên pirsker li hev dinêrîn. Mergên koçberên li ser xaka xwe, bi pirsên bê bersîv ve daleqayî

mabûn. Baweriya birêkxistinê hîviyên nû dafirandin û wan hîviyan taqetek veşartî bixwere tanî. Jixwe rêkxistinê Hevalê Riza bi hewara wan ve şandibû û bi hatina hevalê navbûrî re hîviyek ferikandvan mergên qerisî nerm û germ kiribûn. Ramana "haxta Heval duryanekî vekin û me ji vê boseya mirinê rizgar bikin" ji zû ve rengê biharê li dilan barkiribû.

Di nav wan têkilî û nakokiyên hêstan de ji rêveberên wargehê Cûma derketibû ser dike. Ji awrên rêveberê lêhvên wî ji serma bi rengek hişîn hatîn guhertin, trûskek ya hîviyê diherikî. Dil û mergên guhdarvanan, bi lêhvên dilerizîn ve daleqayî mabûn. Rêveberê warê li ser xeta di navbera mirin û mayînê de asê mayî û di navbera qelsemêrtî û xweşmêrtiyê de ji mûyê ziravtir, piştî beşişandinek ji qestîka dest bi axaftinê kir;

"Hevalno, hewa sare û naxwazim we zêde bidim rawestandin. Jixwe tiştek zêde were dirêjkirin jî nîne. Em her tiştî bi hev re temaşe dikin û jiyan dibin. Dewleta Turk doh bi leşker û teknîkek boş dubare derbazî Başûr bûye. Rewşa PDK'ê li ber çavaye. Em hemî ji fik û biryarên Dublîn û Ankara haydarin. Vê carê rewş cûdaye; desthilatdarên Rojavayî dixwazin tekûztiyek nû bidin Rojhilta Navîn û vê jî ji Êraqê bidin destpêkirin. Ji bû di vê stretejiya xwe de serbikevin pêwîste PKK'ê û sazî û dezgahên girêdayî wê ji holê werin rakirin. Dewleta Turk jî bi xeyalên desteser kirina Kerkûk û Mûsil bi xwestekek mezin tevlî vê fikê bûye. Turk dixwazin, bi kevirekî du çûkan bêxin; hem ji hêza ji dewletên Rojavayî digirin pişta PKK'ê bişikîne û hem jî xeyalên xweyên xweyîbûyîna Kerkûk û Mûsil jîndar bike."

Her kû diçû dengê rêveber hêstdartir û jixwe bawertir bilind dibû. Ema guhdarvan, bi bê aramtiyek mezin çaverêyê wê gotina dawîbûn. Tiştên dihatin gotin hemabêje herkesî dizanîn lê, hê dor nehatibû wê gotina efsûndara çar kûşe.

"Fermana Rêbertiyê hergîz û mîsogere; ji zanînên ji jêderên az hatî girtin, PDK û Turk amadekartiyên êrîşa ser wargehê dikin. Yên li berxwe bidin yê qetil bikin û yên mayîn jî derbazî Bakur bikin. Divê di demek kurt de em xwe ji vê dorpêça mirinê rizgar bikin û van zarokan bigihînin warek bi ewle. Rewşa Êraqê diyare, di halê xwe de diperpite. Sozên ji Celal Telebanî hatîn girtin hene ema, rêvebertiya YNK'ê bê semaxe û bawerî bi sozên wan nayên. Jixwe YNK jî perçeyek yê şêwir û biryarên hatîn girtine.

Ya girîng ne raman û hêlwesta hêzên dagirker û nûkerên wa ye, ya kifşker û me bigihîne serkeftinê hêz û biryardariya me ya cewhere. Yêkîtî û rêkxistinbûyîna me ye. Divê em, ji her demî bêhtir ji her tiştî re amadebin. Kengê ferman hat, divê kes xwe bi tiştekî ve mijûl neke. Ji malbatê kesek bi zarokan re bimîne û yên

din xwe ji şer re amade bikin. Ez naxwazim hîviyek bê binyat bi we re bidim afirandin ema, sozên hatîn dayîn hene. Heke di gava dawî de bêbextiyek çênebe emê derbazî Herêma Soran bibin."

Baweriya wê komika mirovên rikdar, bi rêkxistinê wan bê dawîbû. Di ti şertan de PKK'ê, du gotin ji wan re ne gotibûn. Ji bû pêkanîna her soza dayî, bi hewldanek bê eman dixebitî û ti carî hevalên xwe di nîvê rê de ne hiştibû. Ji bû PKK'ê qewl SOZ bû û soz jiyan bixwebû. Jêdera 'her peyva ji devê endamek yê PKK'ê derdiket wekû qewlek xwidayî dihat pejirandin' ev bû. Gotinên dawî yê Rêvebirê kulek, wê sibha sar avek germ reşandibû mergên wan mirovên ji rêzê derketîn. Ramana; "hergîz PKK ya rêyekî peyda bike û van zarokan ji qirkirina artêşa romê rizgar bike" bi her kesî re serwerbû. Evê ramanê karwanê koçberan ji tirsonektî, ne wêrektî û bê biryartiyê diparast û hêzek bê dawî li wan bardikir. Jixwe heke ne wisabûya kê dikarî bêhnekî jî di wê boseyê dojehî de li berxwebide.

Bi durişmên; "***Berxwedan jiyane! Bijî Serok APO!***" gel ji hev belav bibû. Êdî wekû fermî koçberan dest bi amadekartiyên barkirinek nû kiribûn. Tu kes nizanî ew herîkîna berbi ne kifşbûyînê ve, ya li kû bi sekine. An jî yên bi kû ve herin. Fikra herî zêde ber bi aqil û ya rêveber jî xwestî bêje, derbazbûyîna herêma Soran bû. Ema bi kû re û çawa? Ya herî girîng jî rewşa YNK'ê bû. Ew hizba gotinên wê yên sibeh û êvaran ne dibûn yêk û rêgeza xwe li ser nakokiyên hizb û dewletên derdor avakirî, ya çiqasî li ber barê wan mirovan rabibûya, qet ne diyarbû. Felsefa Serokê YNK'ê Mam Celal, ji ya her kesî cudatirbû. Ji dost û hevalên xwe re gotibû;

"PKK agire! Mirov pir nêzîk bibe yê bi şewite û pir dûr bikeve yê bi cemide. Pêwîste ne em xwe pir nêzîk bikin û ne jî xwe pir dûr bêxin."

Bi belavbûyîna civînê re amadekartiyên koçek nû destpêkiribûn jî. Rêya tirimpêlan bi nav wargehê re derbaz dibû û ji bû bikaribin hin pêwîstiyên xwe ligel xwe bibin pêwîstî bi amêrek barhilgir hebû. Ema çi û çawa? Meydan ji îcatkaran re vebibû û qedir û qîmeta gotinên wan hawa ketibû ezmanan. Fikekî ya din pûç dikir û proje li ser projeyan dadiketin meydanê. Di wê bêhna tengav de dîsa pîrên serhatî gihatibûn hewarê. Yên kêmek dirav li dor wan mayîn û birêya navbeynkaran jixwe re çar bûrberîn peydakirîn, kesên bişansbûn. Jixwe heke bûrberînên peydakirîn kêmekî mezinbin, êdî ew xweyî cercerebû. Yên ew şans bi dest ne êxistîn embarên sopeyên Eledîn û varêlên qazyaxê gihatibûn hewara wan. Her malbatê bi hewarî ji xwe re tirimpêlokek amade dikir. Tekerên hin amêrên hatîn amadekirin, ji çar bûrberînên piçûk pêk dihatin û ew di qada xwe de mîrbûn. Yên hinan ji çar embarên sopeyan û yên hinan jî ji du varêlên qazyaxê pêk dihatin. Rêbaz ev

bû; serê du darên bi qasî zendekî stûr û mitreyek û nîv dirêj zirav dikirin û bi nizbeta tekeran burberîn bi serê daran ve asê dikirin. Bi çend darên din ew her du dar bi hev asê dikirin û destek dikirin. Rêbaza embarên sopeyan jî hemanbû. Ema ya varêlan cudatirbû. Bi dirêjkanî her du aliyê du varêlan kun dikirin û du girş bi wan kunan re derbaz dikirin. Bi nizbetan tekeran varêl, di nîvê girşan de bi cêh dikirin û her du girş bi darên stûr bi hev ve asê dikirin. Di rewşa heyî de, yên tekerên tirimpêlên wan varêl, xweyî tirêlebûn.

Cihê wargehê vegerabû deryaya heriyê lê, yên malên wan nêzîkê rêya qîr bişans dihatin hesibandin. Malbatên malên wan li semta pênc, an jî li devê dolê û ji cadê dûr, kûr kûr difikirîn. Ji bû candarekî ya herî girîng, di her şertî de bikaribe jiyana xwe biparêze û xwe li ser lingan bigre. Yên mirin li ser patika xwe hîs nekirîn, ji bû zarokên xwe ji mirinê rizgar bikin mergên xwe yên tazî nekirîn mertal û bi dilek tazî di boseya lûleyên xayîn û dijminan de ne mayîn; vî hêstî fêhm nakin. Di nîvê çileyê zivistanê de, di bin berf û badevê de, bi zarokên çilikdar, bi pîr û kalên temendar ve û di bin lûleyên ji çar aliyan ve gefê qirkirinê dixwin de berxwedan! Ew berxwedana hîviyek mijdar li bîbûkên wan rêvanan barkirî, bi ti peyvan ne dihat vegotin. Radoka raza awrên mergên hîvî û mirinê bi hev re vedireşînin, ji xeynî yên jiyan dibin tu kes nikare veke. Hêstên têkel li awran hatibûn barkirin. Awir bi bê dawîtiyê ve daleqeyî mabûn. Enerjiya ruh têxist tevgerê, ber bi ne kifşbûyînek bê dawî ve diherikî. Mejî taqeta bersîvdayîna pirsan ji dest dabû û bersiva pirsên ji dil dihatin di valetiya ezman de reqsa rûviyan dikirin.

Her tişt rawestabû. Suweyda, di kêferata helmeta xwe ya dawî de bû. Dibêjîqey cîhan ji eksena xwe beyîbû û haxta biqulibe. Enerjiya gerdûnê, lepta cemseran, gera cîhanê bi tekerokên bûrberînan ve daleqayî mabûn. Zeman vezîlabû û ji rastiya xwe pir dirêjtir bibû. Her bêhna wî zemanê hatî vezîlandin, ya bixwe re kûjan kul û kûjan janan bîne ne diyarbû. Qiyamet, bi devê lûleyên romiyên romê û pêşmergeyên PDK'ê ve hatibû daleqandin. Rabû û ya rabibûya. Tiliyên lewitî li ser tetikanbûn û awrên kîndar giriyê zarokên çilikdar difetisandin. Ji bû zarokên xwe ji guriya bê wujdan rizgar bikin, dilên dê û bavan di nav heriya berfa ferwarê Stiyan de digevizî. Ew Stiyên, di dawiya zemanê Berpenîr de kilamên xwe yên qedîm ji dest dayîn û qedaba xwedayan pîroztiyên wan lewitandîn.

Şerê qedap û pîrozan aha li vêdê, li ser qetê vê erdnîgariya spehî destpêkiribû. Evîndarên rojê, zarokên warên bilind û Rojyarên Zaxrosan; li vêdê ji desthilanîn hatibûn êxistin. Di bin şûrên teres û pêxasan de li vêdê nefesa xwe ya dawî dabûn. Û cara dawî li vêdê Stî giribûn.

Ji bû kenên zarokan di dorpêça hovan de ne fetisin, koçerên

warê Stiyan di nav kêferatek bê eman de bûn. Bûrberîn, bi zêran ne dihatin kirîn. Embarên sopeyên Eledîn ti carî ewqas biqedir nebibûn. Tu kes ne fikirîbû, varêlên qazyaxê yên rojekî bi erkên tekeran werin erkdarkirin û bibin hîviya jiyana warek nû. Jiyan, bi zehmetiyên xwe xweşbû. Afirandvantiya toxmê mirov, ji zehmetiya jiyanê jêder bibû. Zehmetiyan mejî, mejî ruh tehf dida û mûcîzeyên nû li jiyanê zêde dikirin. Zanyaran kilam qedîm gotibûn; "ya mirov kirî mirov û ji alema lawiran cuda kirî pêwîstiyên jiyanîne."

Şevek din jî qulibîbû. Tîrojên roja Zaxrosan yên ji nav çêlên ewrên reş dadileqan ser Nînûva, bê tesîr mabûn. Bi milyonan zeraqên di valetiya ezmanan de dilerizîn, xeberek ya xêrê ne anîbûn. Tenê tevgerên tirimpêlên nenas û bê merîs, yên dibekû her gav mirin ji wan birijê zêde bibûn. Ligor mercên jiyanê jîndar, xweyê hêzek mezin ya veguhertinêne. Di serê van jîndaran de toxmê mirov dihat. Heke hîviya xwe gihandina warek azad û aram hebe, toxmê mirov qabilê her tiştiye. Hîvî gêwil û gêwilbûyîn li hember her zehmetiyan biser diket. Ji mirovên din, cudatiya koçerên Nînûva ev bû. Ji bû wê komika mirovan PKK, baweriyek ji polabû. Trûskek piçûk ya ji PKK'ê dihat, di mergên qerisî yên wan mirovan de dibû êtûn û vedigera pêtek kilamet. Jixwe ya dagirker, nûker û bavên wan yê aqilmend fêhm nekirîn ev ziravtîbû.

Roja piştî Cûmayê rêvebir fermana Rêbertiyê vegotî, şandeyek ji rayedarên UNHCR'a Dewletên Yêkbûyî hat wargehê. Rêvebirê çav kunî-kunî yê ji Rojhilata dûr, bi hêlwestek tehdîtkar got;

"Yan hûnê derbazî Turkiye bibin, yan jî em neçarin dest ji we berdin" û bêkû mafê bersîvdayîna hevkûfan guhdar bike civîn qedandibû.

Ew saziya dilxwede fêris bibû piçek û di çavên koçberan de wunda bibû. Hatin û gotinên wan, ji bû wê komika mirovan ji mirin, talan û dorpêçkirinê wêdetir tiştek îfade ne dikir. Ji hîviyê wêdetir, xof û tirs bi xwe re tanî. Di pir şevên reş û tarî de hev ezmûn kiribûn û heskoya xwe li binê sîtîla hev gerandibûn. Ew fêrisa saziya dilxwede ji hewandin û parastina mişhetan berpirs, ji bû sênca mişhetên Nînûva rake û wan teslîmê devên gurên dev bixwîn bike; hewlek ne asayî dimezaxt.

Xerîbe ema, hemî desthilatdar avkêşên heman aşîbûn. Nav û berjengên bi xwe ve dadileqandin qet tiştek ne diguhert. Hemiyan ji avana zêhniyetekî re xizmet dikir. Di çavên wan de kesîtiyek azad dijminbû û ji bû xwilamkirinê hemî derfetên şaristaniyeta hov bikartanîn. Di nîvê xaka pîroz ya bav û kalan de, te dikin mihacir, bê war û bê hêlîn dihêlin. Xaka te, di nav xwe de parve dikin û her hêz para xwe bi têlên ristî û leşkerên dest û dev bixwîn dipêçin. Yan

tuyê evîndartiya celadê xwe bipejirînî, an jî yên wekî gokê te ji hev re bavêjin.

**Şeva Belek**

*Şeva belek bixemlîne ey stêrên li ezmanan.*
*Kulîlka dil te avdaye bi sond û soz û peymanan.*
*Singa ezman min ramûsand bi qêrînên êş û janan.*
*Li hîviya te rûniştîme li ser rêka bêrîvanan.*
*Min ji tirsa evîna te dil pêçaye bi birînan.*
*Da ji kesî re venekim paştexta hêstrên narînan.*

Salnameya Filhan dazdehê Sibatê dinivîsand. Ewrek kerespî ezmanê hişîn nixwimandibû. Haxta dawa ewrê bê deng û bê tevger li erdê biketa. Xwîn ji lixabên neviyên dêlegura boz û rûviyên tomakan diherikî û dengê lingên qirkirinek mezin hêdî hêdî xwe nêzîk dikir. Dibêjîqey gundiyên gundên eşîra Zêdikan; Mûseka, Xwidêda û Şkeftê xwe ji liqata mihaciran re keysxweş û amade dikirin. Di berwarê qontara Laleşa pîroz de tevgerek awerte hebû û hemabêje her malbatê tirimpêloka nû îcadkirîn barkiribûn û ji bû seferê li benda lêdana zengilê rêvebertiyê rawestabûn.

Roj ji cihê nîvro qederekî bûrîbû. Fermana barkirinê, yêkser ji devê Riza derketibû. Yêkîtiya Niştimanperwerên Kurdistanê, derbazbûyîna koçberan ya Ranya pejirandibû. Dewleta Êraqê jî destûra di nav xaka xwe re derbazbûyînê dabû. Hevalên li herêma Soran, ji bû amadekartiyên koçberan hemî derfetên xwe seferber kiribûn. Tirimpêlên ji aliyê PKK'ê ve hatîn kirêkirin, li bajarê Şêxan çaverêyê hatina mihaciran rawestabûn. Ji sebeba "em nikarin ewlekariya wan bigrin" dewleta Êraqê ne xwestîbû ji aliyê wan ve karwanê tirimpêlan derbazî nav wargehê bibin. Ji wê sedemê tirimpêl li tenişta bajarê Şêxan rawestabûn û heta bi wêdê koçberên bi pêya çûbûna.

Asteng ne mabûn û her tişt amadebû êdî. Mam Celal hatina koçberan pejirandibû û Sedam Huseyn di nav axa Êraqê re derbazbûyîna wan. Êdî tenê di navbera koçberan û siwarbûyîna tirimpêlan de meşa heft kêlûmitran mabû.

Ligor fermana rêvebertiyê, ji piştiyê xwe zêdetir kes tiştekî bixwe re nabe. Her kesê bi destên zarokên xwe bigirin û bi reşketinê re Nînûva bicêh bihêlin. Jixwe rêkxistinê hemî amadekartî kiribûn û pêwîst ne dikir kes tiştekî bixwe re bibe. Ema, ew nifşê mirovan yê fêrî nanê hazir, xewnên xemilî nebûyî ne dixwest bê pertal derbikeve rê. Wê serpêhatiya ji jandartiyê jî wêdetir ew stewandibûn. Bêbextiya dunyayê wekû bêhnî jiyan bibûn û baweriya wan bi sozên weledên

şaristaniyeta Enkiyan ne mabûn. Ji xwe ew hewl û xwêhdana dirijandin, ew îcadên nû dafirandin, berteka li hember bêbextiyê li rastê hatîbû. Sibeha li bendê bixwe dafirandin, amade dikirin û li wê gorê tedbîrên xwe jî digirtin. Dest ji tiştên xwe ne berdidan û destê wan ji pertalên wan ne diqetan. Her endamê malbatê ji karîna xwe pir zêdetir piştiyek amadekiribû û dîsa hemabêje her malbatê amêrek tiştên xwe li ser bixirîne jî hazirkiribû.

Hêjmara tirimpêlên koçberan tiliyên destekî derbaz ne dikirin û ew jî yên Geveriyabûn. Hêjmara dewarên stûr jî wekeza. Kêmek çêlekên rêkxistinê li eyaletê ji koçberan re kirîn û jiber talana pêşmergeyan felîtin, mabûn. Dîsa qasek bêxêr pez mabû. Ankû hin malbatên çend bizinên wan ji talana pêşmergeyan felitîn jî hebûn.

Ewrê kerespiyê haxta dawa wî li erdê bikeve zîq sekinîbû. Dibêjîqey ji qirkirina hatî fik kirin haydarbû û şakis mabû. Hêstên wî berkel bibûn û haxta bifûra. Ligor dîtina serpêhatiyiyan, ewrê berfêbû. Êdî, deng ji kunbaya neqeba Laleş ne dihat û ji çûkên mihacir jî. Çûkên beytik, yên di ti şertan de rêvanên welatek azad tenê ne hiştîn jî wunda bibûn û wirarên wan ne dixwiyan. Sebeb çiye ne dihat zanîn ema, ew çend rojbû rêveberê DY li pey hev dihat wargehê û heta derengê rojê ne diçû. Jixwe her tim wisa dikirin. Xetertî amade dikirin û kengê mirinê êrîş dikir, ji holê wunda dibûn. Û kengê koçberan xwe ji boseya qirkirinê rizgar dikir û bi derfetên xwe digihatin warek nû, dubare derdiketin holê.

Fermana barkirinê hatibû û rêvan, çaverêyê çûyina wî zelamê çav şeqitîbûn. Ji wî ditirsan û ne dixwestin bi rêvantiya wan bihese. Hê demjimarek roj mabû û kengê berpirsê UNHCR ji wargehê veqata, koçberan jî  dest bi barkirinê kirin! Koçberên mala wan ji derbenda Nehdaran dûr, piştiyek tavêtin semta yêk û dubare dizivirîn piştiyek din. Ji bû xêr nexwaz bi barkirina wan nehesin û di gava dawî de êrîşek çênebe; rêvebertiyê li semta yêk pêşya gel girtibû û destûr ne didan ji nav malan derbikevin. Ji bû çaverêyê tarîtiy şevê bimînin, erkdaran hewlek mezin dimezaxt. Ema gel, bi bê aramtiyek mezin hewldida gavek ji berya ya din wî warî terk bike.

Piştî berpirsê UNHCR yê wargeha Nînûva Piyerê Teylandî, ji wargehê veqetayî bîst deqîqeya dubare zivirî, hat û li derê çadira komîteya karê jiderve rawesta. Piyer, bi gomanbû û dibêjîqey çavên wî yên kunî kunî li tiştekî digeran. Ema, bi vegera wî re saroxdan ji barkirinê ne mabû. Ev refleksek jiberxwebû û jixwe agahdarkirin jî xwezayîbû. Pêwîst ne dikir kes tiştekî ji kesek din re bibêje. Koçberên piştî li pişta wan û di tevgerê de, li cihê xwe rawestabûn û bibayêbezê ji holê wunda bibûn. Herkesê derketî rê bi awayekî xwe veşartibû û nîşan ji barkirinê ne hiştibûn. Haydarbûna rayedarên DY, di heman demê de dihat wateya haydarbûna PDK û Roma reş.

Rêveberê dabaşa gotinê tirimpêla xwe li derê çadira komîteya karê jiderve raswestand û ji endamê komîteyê Eliyê Ziravikî pirsî;

"Li derbenda PDK'ê ya Laleş ji min re gotin; qampa îşev bar bike' raste?"

Eliyê ser û kelaşê wî di nav hev de û kêmekî duta, piştî li derdora xwe baş venêrî, bi destê xwe wargeh nîşakir û got;

"Tu nîşanek ya barkirinê dibînî?"

Zilamê navser û çavên piçûk di nav goştê rûyê wî yê pişimî de wundabûyîn, bi awrên binakok li wargehê nêrî. Her tişt li cihê xwe dirawesta û tiştek ne lepitibû. Ne şerîtên çadirekî vebibûn û ne jî cihê tiştekî hatibû guhertin. Ema îstîxbareta girtî saxlembû. Li Elî zivirî û bidengek heyîrî got;

"Hêvîdarim dema sibehî hatim we li vêdê bibînim" û bi nakokiyên xwe ve birêket û çû.

Dema rêvebirê saziya kedîker bi rê diket, Elî di ber xwe de got;

"Hêvîdarim êdî em hev qet nebînin!"

Piyer çûbû û mirovên bipiştî, zarokên di bin barê xwe de tewayîn, bizinên kurtankirî, çêlekên di bin girê bar de zîtkan tavêjin û kesên çekdar wekî bêrzanê milan di nav çadiran de zîl dabûn. Mirovên wekî lehiyê ber bi derbenda Nehdaran ve diherikîn, di derketina wargehê de pêşiya wan hatibû girtin û peng dabûn. Ji bû çemberek din jî ya mirinê bi çirînin çirke dihijmartin û şadbûn rêwiyên welatek azad. Şadbûn û şadîtî ji rûyên wan yên ji heriyê belek bûyî diherikî.

Zerik rojbû û ji rêşketinê re gavek mabû. Ebo Minafiq, bi tirimpêla xwe ya dimîne kîsoyekî, derket û hat! Li himdama duryana gundê Xwidêda rawesta û xwest Cûma yê rêvebir re hevdîtinê pêkbîne. Xeber gihat Cûma yê li girikê Mijînyan, ji bû neqayîlan qayîl bike hewlek mezin dimezêxe. Cûma, bilez hat û li cem zelamê Êraqî sekînî. Rûyê zelamê muxaberat tirşbû û bi hêlwestek xemgîn got;

"Îşev bar nekin!"

Bi gotina muxaberet re tirkin ketibû dilê Cûma û bi dengek aciz pirskir;

"Çima, sedem çiye?"

Muxaberetê dewleta di nav pencên xwedayên şaristaniyetê de diperpite, bi dengek kurt û cewher bersiv da;

"Ez dibêjim, îşev bar nekin" û li ser pêyê xwe zivirî û çû.

Piştî Ebo Minafiq çûyî kêmekî Riza gihat cihê hevdîtinê. Cûma, ji Riza re dikara gotinên zilamê Êraqî kirin. Bi bihîstina wan gotinan re Riza reng avêtibû. Kêmekî ramanbû û dizanî ev gotin ne nîşanên xêrêne. Dema Riza li tirimpêla xwe siwar dibû, li Cûma

zivirî û got;

“Zûû… Pêlê bikin û werin” û ew jî li pey Ebo Minafiq ji çavan wunda bibû.

Wexte reş bikeve erdê. Rûniştvanên semta pênc wekî karwanê mûrîreşkan dadiketin dolê û bi nav deryaya heriyê re giran giran ber bi semta yêk ve diherikîn. Piştiyê jinên zarokên xwe biber singa xwe ve şidandîn, ji yên herkesî mezintirbûn. Her jîndara li ser pêya ketî barkirîbû. Zarok, jin, zilam, temendar û her kes. Di çanda kurdan de çêlek ne dewara barbû. Ema, wê şevê rewş hatibû guhertin û her mirov, her lawir ya barkirinêbû. Pez jî hatibûn barkirin û çêlek di bin barê lê ne dihat de vediterisîn. Kehrikên virnî û nû ji dayikbûyîn, di tûrikan de li ser pişta makên xwe hatibûn asêkirin û bi çavên şaqis li wê lehiya jîndaran dinêrîn. Herkû kehrikên şaqis diqêrîn, makên wan jî wekî aş aşokê bi dora xwe re dizivirîn. Çêlekên fêrî bar hilgirtinê nebûyîn, xwe tavêtin erdê û dibin derbên darên xweyiyên xwe de dinalîn.

Rêvebertiya wargehê di nav xwe de kar parkiribû. Cûma, li tenişta semta yêk pêşya koçberan girtibû û Sebriyê Ker jî birek milîsên Gabar dabûn dora xwe û malbatên ne dixwestin barbikin, bi zorê ji malên wan dertêxistin. Malbatên kerixîn û ji taqet ketîn, tiliyên destekî derbaz ne dikirin. Ema, rêvebertiyê ne dixwest kesî bihêlin û hewldida hemiya bi hev re derbaz bikin.

Ji xeynî hêza xweparastinê ya ewlekariya dora wargehê girtî, lehiya rêvanan li ser rêya Şêxan peng dabû. Mirovên tima û destên wan ji kirt û pertalên wan yên mayîn ne diqetan, dizivirîn û piştiyek din jî tanîn. Herkû rawestandinê dirêj dikir, girên pertalan jî bilindtir dibûn.

Şevê konê xweyê reş nû girtibû ser deşta Şêxan. Reşê heyvêbû û taristanê her der dabelandibû. Sira ji nav zemîteya ketî dolan difelitî wekî zixwirên berbestan li dêmê rêvanan diket. Ewrê kerespiyê bê tevger, daketibû jêr û haxta singa wî rûerd balîsta. Wekî taviya teyrokê mirov ji her çar aliyên malan ve berbi duryana gundê Memo ve diherikîn. Piştîkiribûn û di destê wan de fanosokên piçûk dihejan. Giriyê zarokên çilikdar û bar bara kehrikên li ser pişta makên xwe tevlîhev dibûn.

Şeva heşrêbû! Yên malên wan nêzîkê rêya qîr çek di stûyan de, hevsarê tirimpêla xwe dikişandin û gotin ji quretiya wan re ne dihat kirin. Ema yên kêmekî dûrî rê û jixwe semta pênç, di rewşek yeman de bû. Amêrên bi nizbeta tekeran bikaranîn, îşveya xwe wundakiribûn û heriyê xwe li singa tirimpêlokan dida. Malbat hemî barkirîbûn û hêza tehfdayina wê haleta ecêb jî bi kesî re ne mabû. Komên mirovên heyîrî, li derdora wan tiştên têr bela kom bibûn û yê çawa bigihandana ser rêya qîr ne dizanîn. Pir malbatan dest ji

tirimpêlokên xwe berdabûn û girê kelaşên wan di bin tarîtiya şevê de jî dixwiyan. Hin kesên tima û destên wan ji tiştan ne diqetan, hê jî bi hemî karîna xwe ew kilameta navê 'erebok' lê kirîn dixirandin.

Çêleka Egîdê Gabarî, li ser cadeya ax ya ji semta pênç diçû rêya qîr xwe avetibû erdê û tara bibû binê rê. Hil hila li ser heywanê ketî û dijûnên Egîd tevlîhev dibûn. Niyeta rabûnê ya heywana her çar lingên xwe dirêjkirîn û stoyê xwe bi erdê ve kirî yêk ne dixwiya. Xweyî, werîsê bar bi çêlekê ve girê dide vekiribû ema, dikir û ne dikir heywan ji cihê xwe ne dilepitî. Şaşik ji serê Egît beyibû û çermê tazî yê zêde ji derbên tîrojên rojê re ne bûyî şahid, di bin zeraqên fanosên bi rê re derbaz dibûn de diteyisî. Êdî Egît, bar jibîrkiribû û tenê dixwesta çêleka xwe ya birik rizgar bike. Ema qet niyeta rabûnê ya çêleka reşbelek tinebû û çavên wê yên gir bê wate li valetiya ezmanan dinêrî. Ji nişkan ve fikrê kuştina çêlekê hat û di serê keçel yê Egît de rûnişt. Di dilê xwe de got; "madem nikare rabe, bila ji PDK'ê re jî nemîne." Emniyeta çeka xwe vekir û berê lûlê da ceynika lawira bi awrên bê çare li devê lûleya tifeka xweyê xwe yê cir nexweş dinêre. Bi rastkirina lûleya çekê re, heywanê lixwe da û hewlda xwe ji pertal û werîsê ew anî wê rewşê rizgar bike! Egîdê Gabarî, bi keyfek bê tarîf çek avêt û ji bû heywan rabe bipêre ragirt. Û çêleka belek êdî li ser her çar lingê xwe rawestabû. Êdî pertalên di nav heriyê de reng guhertîn li bîra xweyî ne hatibûn û çêlaka belekreş ber bi koma fanosan ve ajot.

Piştiyê li pişta ji yê her kesî mezintir Bedrê ya Şirnexî, bi qêr û girî ket di nav koma hevrêyên xwe de û got;

"Ez li bextê xwedême! Xwesûya min mir û ma dibin çadirê de!"

Hewar û giriya Bedrê zêde bala kesî ne kişandibû. Têkoşîna herîkina berbi ne kifşbûyînê ve û şerê jipiya mayînê merg û mejiyê rêvanan dagirkiribû. Ema rêkxistin hebû û her tişt aydê wanbû. Rê dîtin, rizgarkirin, xwarin peydakirin, bergirtiya li hember dijminan û ew berpirsên peydakirina hemî çareyanbûn. Wekû xwezayî termê xwesûya Bedrê jî mabû bi hêviya wan ve. Evê pêbawerbûyînê, termê xwesûya jina gir û piştiyê li pişta wê girtir dike zû ji bîra biribû û ew jî bi fanoska xwe ve tevlî karwanê cinan bibû.

Heft hezar kes, heft hezar fanos û bi sedan çêlek û bizin; ketibûn ser rêya Nehdaran. Bi hezaran erebokên tekerên wan ji bûrberînkan, embarên sobeyên Eledîn û ji varêlên qazyaxê pêkdihatin li navguhê hev diketin. Dema tirêleyên li ser du varêlan û ji barê tirimpêlek asayî zêdetir pertal li ser hatîn edilandin ji destên xweyê xwe difelitîn; zarok, mirov, pez û erebokên din têxistin qafo û dibeyandin rexan.

Rêya qîr di nav zeviyên cohtkirî re derbaz dibû û berfa bûyî

lîlav zevî vegeranbûn derya teqnê. Tu kesî ne dikarî ji rê veqetê û derbazî rexê bibe. Hin kesên bê hemd ji rê derdiketin, di nav heriyê de diteqinîn û asê diman. Dengên ji tekerên erebokên dest çêkirî bilind dibû, dengê giriyê zarokan û jandilên dayikan didewisandin. Dengê sehwdar dibû wekû xwimênek kilamet û di singa çiyayê Şêxan de vedida. Zeraqên bi hezaran fanosên piçûk ji hewa ve dilerizin û şeva tarî belek dikirin. Ronahiyên piçûk yên wekî çavên ejderhan diteyisîn, gelaksiyek biheybet ratêxist pêş çavan.

Ya star! Qumên û rimênek bi rê ketibû û tu kesî hev ne didît. Zarokan dawên dayikên xwe yên ji betanê çadiran girtibûn û hişk şidandibûn. Yên destên wan difelitîn, carek din dayika xwe ne didîtin. Gîskên ji keriyên xwe wunda bûyîn, ji ber tirêlên teker varêl bê mehwer çep û rast direvîn. Tirimpêlên hevsarê wan ji destên hevsarkêşan difelitîn, karwan têxist du qet û li rexan diqulibîn. Ekremê Ziravikî, dayika xwe ya temandar li ser qetek teneke dixirand. Dengê ji teneka bi erdê ve dixirikî bilind dibû, pidûyên bê dinan disîqandin.

Ji fermandartiya hêza xweparastinê Tahirê Osman û Feqeyê Gweyînî, bi mangeyek milîs ve li serê girkê Şefîqê Bilehî di jor de li hemrêyên xweyên ber bi Nehdaran ve diherikin dinêrîn. Şeva tarî wekî perdeyek reş ketibû di navbera çavên wan û wê koma fêris ya mirovan de. Ema, bi hezaran zeraqên piçûk tarîtiya şevê kundikirin û wekî leylanokan li çavên wan diketin. Humên û rimêna ji koma şevê dabelandî radibû, ezmanê heftan dişarand.

Ji qontara girikê Şefîqê Bilehî bigre heta bi derbenda Nehdaran nêzî sê kêlûmitreyan, rêya qîr bi mirov, heywan û erebokên dest çêkirî hatibû pînçdan. Dengê qelebalixa mirovan, xirêna tenekeyan, barêna mêh û berxan, bizin û kehran, orêna çêlekan, tekelokên bûrberîn û jixwe dengê li esfaltê ketina varêlên qazyaxê. Û bi sedan dengên din li hev diketin û qiyameta Sofî Miho bibû rastî di wê şeva belek de. Bi hezaran rohaniyên di fanosokên piçûk de dilerizîn, galaksiyek duyemîn avakiribûn. Xetek tijî ronahiyên qels di tarîtiya şevê de gihatibûn hev û bajarê cinan yên di çîrokan de kiribûn rastiya wê şevê. Leylanokên ji zeraqan vedidan, dîmenek bê hemsal derxistibûn holê. Tahirê li ser kuçê derê çadira Mehmûdê Kadûnî ya xir û xalî û dibêjîqey reşa xweyê girêdaye rûniştî got;

"Ez xwe di navbera du galaksiyan de hîs dikim."

Feqe, wekî heyfa ne qeydkirina wê şeva belek jiyan bibe keserek kûr kişand û tevlî sohbetêbû;

"Ev dîmenê biwezbet qetiyen nayê dubarekirin."

Tahir jî hemhizirbû û gotinên xwe yên heyf barkirî ajotin;

"Tu hêz nikare vî dîmenî dubare bike. Xwezî makîneyek ya dîmena an jî kemereyek ya me hebûya. Ama nîne û ev dîmenê bê

hemta yê piştî kêmek din bimre!"

Sofî Miho yê Mijînî, pezê xwe wundakiribû û bi paş û pêş ve bê mehwer dibezî. Çavên wî li bizinan digeran û haj xwe tinebû. Tirimpêla barê qamyonekî kirt û pertal li ser pişta wê bilind bûyîn, serî ji Evdilayê Teyî stand û Sofiyê bejin kurt da ber xwe û dibêjîqey dabeland. Sofiyê bi rehwaltiyek awerte xwe ji xezaba wê haleta dest çêkirî rizgarkirî, di nav bêrmika li tenişta rê de devikî ket. Şaşika beleka Goyikî girêdayî û hêjî saxlem û pertalên tirimpêla qulibî di heman avê de bi hev re bibûn kelek.  Çavên Sofî, pezê li rexa rê zîq li xweyê xwe dinêre ne didît. Jiber kû çavên wî li pezê reş digeran û ji zû ve jibîrkiribû betaniyan rengê bizinên wî yên reş gewr guhertine.

Erebokên teker ji bin wan firîn, dinîvê cadê de çêlên pertalan pêkanîbûn. Rêya ji du kêlûmitreyan  kêmtir vegerabû bajarek yê cinan.

Dema mîla demjimara ele firingî bîst û yêk şevê nîşan dida, pêşiya koçberan gihatibû ber dergahê dewleta Seyîd Reîs. Rêvebertiyê ji hişyariya Ebo Minafiq fêhmkiribû kû vajîtiyek heye. Ema, ji gel vedişartin û ne dixwstin kes pê bihese. Çi qewimiye, kê ji soza xwe vegeraye, pirsgirêk ji kû derketiye rêvebertî jî di nav de tu kesî nizanî. Ema ya hergîz, sozên hatîn dayin berhewa bibûn û soza sebiqî ya Seyît Reîs ber avêtibû.

Reng li Cûma nemabû. Ji mizgîniya ne bixêr ya Ebo Minafiq ve dibêjîqey dilê wî daleqayî mabû û haxta biketa. Lêhvên wî zuwa bibûn û dêmê qemitî lewaztir dixwiya. Zilamê kulek û dibêjîqey di bin barê giran yê karwanê koçberan de tewaye, fikek çêdikir û deh xira dikirin. Karwan derxistibû rê ema, yê bi kû re derketan û li kû bisekinîna nizanî. Leşkerên li pişt wê lûleya hêsin, yên ev mêhvanên têr bela çawa pêşwazî bikirana ew jî nizanî. Gelo, yên dîsa ji ber şirikê bi revînan û biçûna ber mezrîbê? Carnan jî wekî mêşan ji xwe bifirîne Cûma, bi destên xwe ew remanên gurnebaş ji xwe dûr têxistin û jixwe re digot;

"Na, na! Rojhilatî mêhvanperwerin û berdêla wê çi dibe bila bibe yên bi qedir û qîmet derî li mêhvanên xwe vekin."

Li nêzîkê derbendê Cûma, xwe ji wan hizrên di nav wan de xerqbûyî felîtand û kulî kulî bezî. Xwe avêt  pêşya karwan û got;

"Hevalno ji kerema xwe rawestin û guhdar bikin."

Dengê wî yê ketî lewaz derdiket û di bin dengên varêlên diqulibin de noq dibû. Ciwanên li pêş, xwe li pêşiya  karwan kirin tanî û koma karwan di ser hev de bibû qafo. Rêveberê kulek, qirka xwe paqijkir û bi dengek gurxweş gotinên xwe ajotin;

"Hevalno, li vêdê pênc deqîqeyan rawestin. Emê leşkerên derbendê agahdar bikin û wisa derbaz bibin" got û ber bi lûleya bêmerîs ve meşî.

Ema wî bixwe jî wisa hêsanî ji derbazbûyînê bawer ne dikir. Wekû tercûman Nahîda Porspî û çend ciwnan jî dabûn dû rêvebir. Komek leşker û fermandarên Êraqê li aliyê hundir yê lûleya belek sekinîbûn. Piştî silav û kilamekî bi wergera Nahîdê dest bi gotûbêjê kirin.

Fermandarê Sedam;

"Raste, xeber dabûn me; hûnê çûbûna Eynsifnê û li wêdê bi tirimpêlan derbazî aliyê bajarê Silêmaniyê bibûna. Heta êvarî jî biryar ev bû. Ema di fermana vê êvarê gihatî me de dibêje; "qetiyen ne hêlên derbazî nav xaka dewleta Êraqê bibin." Bibexşînin, tiştek ya em bikin nîne. Ferman ji Seyît Reîs hatiye û hûn serî li tevgerek berevajî bidin, em neçarin çekan bikarbînin. Ya baş, hûn dîsa vegerin wargeha xwe."

Cûma;

"Piştî em birêketîn, pêşmerge bi tîmên Turkan ve ketine di wargehê de û êdî em nikarin vegerin."

Van gotinên Cûma, fermandarê rûyê wî yê reş di bin zeraqên fanosan de diteyîse heyîrî hiştibû û bê biryar kiribû. Serê xwe tewand, kêmekî ramanbû û bi erebî ji hevalên xwe re tiştin gotin. Bipiştre li Cûma zivirî û got;

"Ka herin, dubare venêrin. Ez bawer nakim di demek evqas kurt de kes ketibe di wargehê de."

Cûma, pêşniyara fermandarê Êraqê bi serê xwe erêkir û ji hev veqetan. Ji bû rêvan bi vajîtiyên heyîn nehesên, rêvebertiyê hewlek bê eman dimezaxt. Ji bû şandeya hevdîtinê newe nav gel û kes pirsan ji wan nekin, derbazî nav heriya li rexê rê bûn û bi bêtêlê Sebriyê Ker vexwend cem xwe Cûma. Di nav bîst deqeyan de Sebrî gihatibû cem Cûma.

## Romayê Bişewitîne

Cûma, Sebrî xef kir û got;

"Zû xwe bigihîne hêza xweparastinê. Dema min di cîhazê de got: "Romayê bişewitîne" ji semta pênc ve agir berdin wargehê û bipêve werin. Divê yêk çadir nemîne."

Sebrî fermana Cûma bi serê xwe erêkir û bibez dubare berê xwe da nav malan.

Êdî qismê pêş yê karwan jî hîskiribû tersîtiyek heye û wekî hatî gotin, derbazkirina wê duryanê ne hêsanîbû. Refleksên hişyar rabibûn pêdarê û karwanê gel, bi bêbextiya hatî kirin zû hesabû. Dengên "rêvebertiyê vir li me kir û em xapandin" ya qismek kesên ne bidilê xwe barkirîn, bilind bibû. Ema dem û cêh ne ya gotûbêj û şîroveyên serî vekirîbûn û dengên kesên nerazî ji aliyê derdor ve zû

hatibûn tepisandin.

Piştî çûyîna Sebriyê Ker kêmekî, pêşya karwan hat berdan û fermana "bidin ser deriyê Êraqê" ji rêveber Cûma bixwe derket!

Di heman demê de bi bêtêlê fermana "Romayê bişewitînin" jî dabû Sebriyê Ker. Destpêkê li semta pênc û li tevayê wargehê guriya agir xwe li peravên ezmanan dida. Varêlên tijî qazyax ji germahiya agirê çadirên şimakirî diwerimîn, hawadiketin ezmanan û ji hewa ve diteqan. Çirûskên qazyaxa bi birha teqînê ji hewa ve belav dibûn, wekî cewrikên sa dinirijîn hev. Galonên dohn vegerabûn bombeyan destan û pêşbazî bi dengê varêlan re dikirin. Dûmana ji wargehê radibû tevlî ewrê ker bibû û dibêjîqey ewrê nivz, nivztir kiribû. Dû yê tîr, erd û ewrên ezmanan daqurtandibû. Erd û ezman bibûn yêk û qêre vêra 'qiyametê' bi gundiyên gundên Zêdikan êxistibû. Gundiyên gundê Xwidêda berbi Ba Edlê ve û yên Musekan jî ber bi çiyayê Xêra ve direvîn. Şerê xelîcê kû wekû 'şerê cîhanê yê sêyemîn' dihat pênasekirin, ji wargeha Nînûva destpêkiribû.

Cûma bi xef ji bira hêza xweparastinê ya pêşîkêş û hevalên din yên hatîn amadekirin re got;

"Heke em bi zora xwe gel derbazî nav xaka Êraqê nekin, hemî çalekiya me ya vale derkeve û ev gelê were qirkirin!"

Ciwanên li pêş û kesên din yên xwe ji şer re amadekirîn, deriyê dewleta Sedam el Huseyn şkandin û leşkerên Êraqê dan ber tehfan.

Deriyê derbendê, di heman demê de derdiket nîvê tûxaya parastina sînor ya dewleta Êraqê. Li her du aliyên derî çeperên pêş yên tûxayê hebûn. Ankû her koçberê derî derbaz dikir, diket di nîvê tûxayek leşkerî de.

Leşkerên Êraqê yên fêrî çalekiyên sivîl nebûyîn û ti carî ji meş û serhildanên gel re şahidîtî ne kirîn, şaqis mabûn. Gotina; 'irce-e' bê navber ji wan bilind dibû û bi hev re êrîşê serhildanvanan dikirin. Birek gêrîlayên keçên ciwan li wargehê mabûn û hê derfetên derbazî çiyan bibin peyda ne kiribûn. Ewan keçan xwe li pêşiya koçberan kirin mertal û hemî derbeyên ji leşkerên Sedam dihatin bixwe girtibûn. Di çanda Rojhilatiyan de nabe zilam destê xwe ji jinan re rake û leşkerên Sedam, ne bi temamî jî be ev çand diparastîn. Di nav tevna tarîtiya tîr ya şeva belek de, pêşvanên koçberan û leşkerên Êraqê ketibûn di nav hev de. Kê keysê xwe li kê didît, li yê din dida û tavêt erdê. Hev tehf didan û bi paş ve tajotin. Yên diketin di bin lingên şerkeran de diperçiqîn. Dengên kulm û pehînan, mekanîzmeyên çekan, irce'e ya erebî û zirtên kurdî li nav hev ketibûn û bê dengiya şevê tar û mar dikirin.

Ji nîvê şevê re kêmek mabû. Li wargeha Nînûva dengên varêlên qazyaxê û hemî coreyên çekan hemî dengên din

didewisandin û neqeba Laleş dişarnd. Dibêjîqey ew sê rojbû ewrê kerespiyê bi dûyê varêlên qazyaxê û çadirên şimakirî reng guhertî di kemînê de bû û wî jî hunerê xwe rayêxistibû. Gulatên dimohr yên ji ewran dirijan, tevlî dûyê ji erdê hewa diket dibû û xwe birengek reş dipêçan. Berfa li navguhê serîwanvanên Nînûva diket, ji zûve spîtahiya xwe wundakiribû. Qêr û hewara gundiyên ji gundên derdor direvîn, hemî dengên wê şeva biheybet di bin xwe de difetisandin. Laleşa malîvantî ji heftê û du fermanan kirî, li hember hunerê şeva belek şaqis mabû. Heke qiyameta dihat dikarkirin rastbe, Majên Zerdeşt şaş şîrove kiribûn. An jî heybeta berxwedana şeva belek, sînorên xeyêlan wan kiribûn serad.

Her kû diçû hêza leşkerên ji mêhvantiyê fêhmnakin zêdetir dibû. Cihê rê bilindbû û her du aliyên wê kendalbûn. Koçberên ji ber derbên leşkeran dibeyîn, di kendalên rexê de gindirvarî dibûn û diketin nav golikên avê de. Kelecana şer herkes pêçabû û wirarê tirsa mirinê ne mabû. Şer bibû galte û koçberan henekên xwe bi mirinê dikirin. Gotin di cêh debe, êdî keyfa leşkeran jî ji wê şevê re hatibû û ji kîndartiyê zêdetir rêz didan berxwedana biwezbet. Dengê qirêna çekên leşkeran guh ker dikirin ema, berê lûleyên wan li ezmananbûn.

Ji hinga Asîtana pîroz bûyî Şêx Adî ve, şahidîtî ji şevek wisa re ne kiribû. Xweza jî di nav de dibêjîqey her heyîna zindî bi dengê tilîliyan bibû perçeyek yê wê wezbetê. Alan û dîlanbû û xweza jî bi barîna berfê ji zû ve tevlî cenga bê eman bibû. Ji bû kişandina sergovendiyê her tişt, her kes di nav pêşbirkek bê hemta de bû. Di navbera dergah û Nehdaran de tenê sed gaz hebûn û ne dihat birîn. Rêya kurt vezîlabû û ya derdiketibûya dojeha Eyn el safilin an jî bihuşta Heft Tebeq, ne dihat zanîn. Ema ya kifş û eşkere, tekez û mîsoger ev bû; du hêzên bibiryar singa xwe dabûn hev û ji bû serkeftinê têkoşînek bê hemsal dimezaxtin. Leşkeran, ji bû pêkanîna fermana Ebo Minafiq liberxwe didan û koçberan jî ji bû canê zarokên xwe ji qirkirinê rizgar bikin. Leşkeran, ji bû tixûbê deleta matork[50]tiya wê dikin êrîşdikirin û koçberan jî ji bû sînorê wê dewletê ji canê zarokên xwe re bêxin çeper xwêhdan dirijandin.

Didutî û du alîteyek kilamet di ber hev de dibezî li binê Dara pîroz. Dibêjîqey di şeva belek de Nehdaran bibû Kevirê reş û ji bû tewafkirinê bawermendan didan ser pişta hev. Nehdaran bibû qesta muradxwazan û xêrbendeyên çekdar jî bibûn dirî û ketibûn di navbera aşiq û maşûqan de. Şer germ bibû û dê li welêdê xwe ne dibû xweyî. Gelo, haja Dara kubar û wekî pêkerekî li rexê çepê li ser textê xwe yê Stîtiyê rawesteyî, ji vê evînê hebû? Gelo Ezdayê dilovan

50 Bekçî.

ziman dabûya Nehdaran, ya bi zehrê xwe yê şîrîn maf dabûya kûjan aliyî?

Ji nîvê şevê demjimarek derbaz bibû. Pêta ji çadirên wargeha Nînûva bilind dibû, gulatên berfa şevê ji hewa ve dadibelandin. Dengên ferên varêlan hê jî di singa Laleş de vedidan. Ji bû leşker zena şerek du alî bikin, koçberan berê lûleyên çekên xwe zivirandibûn ser gundên derdor û guleyên xetat wekî bizotkan dirijan ser malan. Keysa rakirina heyfa şîrîn ketibû destê mêrxasên Nînûva ema, exlaq û terbiya PKK'ê dest ne dida keysa bi destketî bikarbînin. Nixwe dil dixwest, hîz û dizên eşîra Zêdikan biperçiqîne û tola Ferhanê pîr û Welatên simbêl nehatîn ji wan hilîne. Ema bila qetek nan bixwarana û yêk jî ji exlaq û zêhniyeta PKK'ê re bikirana xêr.

Ji beyaniya rojê re du demjimar mabûn. Berfê erd ji zû ve nixwimandibû û spîtahiya berfê cîhan ronahî kiribû. Dêmên leşkeran, li ber şevaqa berfê hêdî hêdî dihatin fitrandin. Êdî, pêşiya karwan gihatibû binê dara pîroz. Li milê rastê yê darê menfesek mezin hebû û her du aliyên wê kendalbûn. Şer, bi hemî dijwartiya xwe li ser pişta menfesê tajot. Pênc gaz din koçber bi pêşve çûbûna, êdî neqeba teng diqeda û keysê li derdor belav bibin peyda dikirin. Tenê pênç gav û dengên 'kêmek din xêret' ji nav pêşvanên karwan bilind dibûn. Bira keçên ciwan dibin menfesê re derbaz bibûn û diruşma; 'biruh bidem neftîke ya Sedam' davêtin û ji kenan zik û pişt dibûn. Ema diruşma bi methên Seyît Reîs barkirî, feyde ne kiribû û hêz li ser hêzê bi hewara leşkeran ve dihat. Hêza nû hatî wekî ya kevin ne bi merhemetbû û yêkser lûleyên çekên xwe li gel rast kiribûn. Gefên qirkirinê dikirin û wekî taviya teyrokê gule direşandin.

Ya hatî armanckirin bidest ketibû êdî. Karwan, bîst gazan ji darê birûbû û li her du aliyên rê belav bibû. Leşkeran çeperên xwe yên devê dêrî berdabûn û erdek baş ketibû di destê koçberan de. Êdî leşkerên Êraqê dinanên xwe tûj kiribûn û ji hemî rewşa wan kifş dibû kû yên serî li qirkirinekî dabûna. Karwanê birêxistin û di her rewşê de gotinên pêşvanên xwe wekû ferman dipejirandin, baş dizanîn yên çiqasî bipêşve herin û li kû rawsetin. Mîlên siheta elefiringî nû gihatibû çarê beyaniyê. Bi fermana Cûma yê rêvebir, pêşvanên karwan li cihê xwe rawestan û di heman demê de şer jî sekinîbû. Ema berf bidimohrî dibarî û niyeta wê ya agirbestê ne dixwiya.

Bi rawestina şer re, ciwanên di bin derbên şirteyan de kêrstobûyîn û jerjûr û bombeyên wan bi bin êlekan re daleqayîn, govenda serkeftinê girêdabûn. Starana;

"Dor gelyoka nefele lê leylayê ho leylayê.
Nefele çardeh pele lê daykê gorî heyranê.

Mexelê pezê kele lê leylayê hoy leylayê" bilind bibû û gêra govendê şemitîbû ji derveyî rê.

Ji bû bi bihênceta govendê karwan bi pêş ve neçe, leşkeran bi keviran sînor kifş kiribûn. Ema her kû gêra govendê dihat kêlikên tixûp, reqasvanan kevir bi lingên xwe tehf didan û kêmek din jî sînorên xwe firehtir dikirin.

Leşkerên Êraqê, li beramber berxwedan û gêwilê wan serîwanvanan şaqis mabûn. Berf du bosta bilind bibû û sirek bişewat li dêmê zarokên dawa dayikên xwe ji xwe re kirîn star dida. Di berbanga wê beyaniya seqemdar de heft hezar mirov li ser wê rêyê jipiyabûn û pêşvanên wan direqisîn. Her leşkerê devê xwe nêzîkê guhê hevalê dikir, peyva wan ya destpê; "hade mecnûn, mecnûn (ev dînin, dîn)" bû.

Fikrek hatibû zigurdên Gabar. Reqsek ya waya herêmî ya bi navê Bêlûte hebû û ji sedema di wargehê de hindikbûn ticarî firseta wê dîlanê bireqsin peyda ne kiribûn. Wê sibeha biwezbet keys ketibû û mûhlet li nik herambû. Bêlûte, reqsek du alîbû. Du refan li beramberê hev sef digirtin, sê gavan di ber hev de dihatin û bileza fîşekê di paş de diçûn. Refên xwe rastkirin û bi strana 'feqê me çûne feqetiyê' ji kevirên Êraqiyan wekî sînor danîn destpêkirin. Feqeyê Gweyînî sergovendiya refa pişta wan li sînor û Qehremanê Şehrikî jî sergovendiya refa beramber dikişand. Ji nişkan ve dengê strana;

"Feqê me çûne feqetiyê lê bejnê, bejnê lê bejnûbal,
Me li wan kiriye qewîtiyê lê çav û birhên reş qelyan,
Ji me re bînin reşpûşiyê lê bejnê, bejnê lê bejnûbal" bilind bibû.

Bêlûte, ji bû sînor firehkirinê reqsek mûkemelbû. Her kû refa Feqe bi paş ve diçû, reqasvanan pehniyên xwe li kêlikên sînor didan û bi paş ve tavêtin. Carnan refa beramber jî ji qestîka pîvanên govendê xira dikirin, ji refan din dibûrîn û xwe li navguhê kuçên sînor didan. Leşkerên erkdarên parastina sînor, dibezin û xwe didan ber kêlikan. Bêlûtevanên bileza berqa birûskê bi şûn ve diçûn, parastvan di ser keviran de diqulibandin. Şirteyan ji derve ve û reqasvanan ji hundir ve kêlik tehf didan. Gotinên, 'irce'e' yên erkdarên parastvantiya wan wateya xwe wundakirîn, xwe bi ber keviran re dirêjkiribûn.

Keşafa li sihergehê vedayî, mizgîniya roja nû bixwe re anîbû. Aso, zelal bibû û xwedê dizane stêra sibhê ji zû ve hilatibû. Berfa du bost û nîvan stûr bûyî û êdî na bare, cîhan ji wextê xwe rohnîtir kiribû. Wê sibeha tîr, dengên melayên gundên eşrîa Zêdikan di guhên sofiyan de ne vedidan û meleyan şîrîncan ji zû ve tifkiribûn binê lingên xwe. Leşkerên reben yên dewleta li ber serkeratê, ji serma dilerizin û lîka wan li bin lêhva xarê diket. Çûkên Beytik ji zû

ve çeqilên dara pîroz terikandibûn û berê xwe dabûn kunên germ yên serdorên gundên xalî. Govenda mecnûnan bi hemî wezbeta xwe digera, rayên qirika stranbêjan stûr bibûn û lamên wan sohrtir dixwiyan. Kefiyek Sêrtikî li serê xweyê keçel pêçayî Cûma yê Kulek, bi hêlwesta generalek serkeftin bidest êxistî li ser nîvê rê rawestabû. Çavên wî yên di dêmê lewaz de wekî cirnikan dixwiyan, nîşana westandinek bijanbû.

Piştî şevê bi giştî konê xwe barkir, ew dîmenê kilamet li nîvê holê rût û tazî mabû. Kelaşên tirimpêlên dest çêkirî, qafoyên demsala Biharê yên li ber kenarê Dîcle di bîran de zindî dikirin. Li cihên meytên tirimpêlokan û pertalên li wan hatîn barkirin girên bê merîs bilind bibûn. Pertalên di nav heriyê de digevizîn, şkara beresteyên bankê Dêra ratêxist pêş çavan. Heft hezar mirov li ber bejna rêya qîr dirêj bibûn û jipiyabûn. Ji heriyê belek bibûn û dibêjîqey palevanên birîna dehlên birincbûn. Heft hezar mirov, heft hezar jin, zarok, temendar, birîndar, bipez û dewarên xwe ve li ser nîvê cadê jipiya, di nav berfê de rawestabûn. Wekî kurka nû ji lîs derketî, zarokan xwe dibin dawa kirasên dayikên xwe de komkiribûn û bi awrên mereqdar ji derve dinêrîn. Pêlavên qetayî lingên xas ji berfê ne diparastin û hêlma ji nav lêhvên wan yên ji serma hişînbûyîn derdiket, haceta fer ya germ kirinêbû. Makên lingên wan diqerimîn, yêk hildidan û yê din datanîn. Rewşa erebokên tekerên wan ji varêlên qazyaxê, bûrberînkan û binên sopeyên eledîn pêktêne kambax dixiyan. Li berxwe ne dabûn û serûbinê wan cêh guhertibûn. Termê jina yêxtiyar li ser nîvê rê dirêjkirîbû û dibêjîqey jina kefiya wê bi nav betaniyê re dahaleyî di xewek şîrîn de bû. Ji kêfareta zeman, termê jina yêxtiyar bala ti kesî ne dikişand. Wekî tiştek ji rêzêbû û tu kesî lê jî ne dinêrî. Qismek kêm yê karwan derbazî nav xaka Seyîd Reis bibû û hê jî dawiya sist û leqan li tenişta wargeha Nînûva mabû. Rûniştvanê semta pênc li pêşbûn û piraniya wan sînor derbazkirînbûn. Semta yêk û du ya jixwe pir nêzî sînor, pir tişt bi xwe re anîbûn û yên herî li paş mayîn jî ew bûn.

Awrên hêstên têkel ji wan dirijan, bi lêhvên ziwabûyî yên Cûmayê rêvebir ve qerisîbûn. Diviyabû tiştekî bikin, ema çi? Di rewşa heyî de artêşa Êraqê li pêşiya rêvanên azadiyê bibû pêjan û ne dihiştin yêk gavî bi pêş ve bavêjin. Li aliyê din, pêşmergeyên mala Berzanî û pêxasên turk. Heke dewleta Sedam were rehmê û di nav wê lîlava deştê de bimînin, yê çawa jiyan bibin? Yên di bin çi de bisitrin, xwe bi çi germ bikin û çi bixwin? Di nîvê tuxayek leşkerî de yê çawa bicêh bibin? Hezar û yêk pirsên bê bersîv ji awrên koçberan berbi Cûma ve diherikîn. Rêvebertî jî di nav de, fikrek yê tu kesî tinebû. Ligor hatî gotin; PKK'ê dewleta Êraqê û YNK'a Celal Telebanî li hev kiribûn. Ema, saroxdan ji wê fikê ne mabûn û hewîngeha fer

binê dara Pîroz di dest de mabû.

Ji sedemek ne dihat zanîn, dewleta Sedam çerx dabû û xwe ji hevhatina fika derbazbûyîna koçberan vekişandibû. Moxabereta Seyîd Reîs çima di demjimara dawî de poşman bibû, tu kesî nizanî. Haya girseya karwan ji veqetînên peymana hatî kirin tinebû û ewan zen dikir rêvebertiyê bizanebûn ew xapandine. Lê, ji bilî hin kesên kerixî û leq, tu kesî hizra xwe ne tanî ziman û mafê xweyê rexnekirinê veşartî dihişt.

Bihilatina rojê re ewrê berfê xwe vekişand û dunya çik sahîbû. Dibêjîqey tîrojên rojê di cêh de çêlên ewrên li ezmanan daqurtandin û yêk car ji holê hilanîn. Ji serma sahîtiya piştî barîna berfê dijwartir tiştek nîne. Şeqe şeqa li hevketina dinanên zarokan dengê qorûya çûkên çiyayê Reş tanîn bîra mirov. Ji bilî reqasvanên bikelecan û ji tirsa sermayê newêrin reqsê berdin, herkes dilerizî. Ema, mejî ji zû ve laş ligor mercên jiyanê amade kiribû. Heke can di xetertiyê de be û ber li hîviyêbin, mercên zehmet di veqetandekan de dimînin û hîviya rizgarbûyînê tevzînekên şadîtiyê li ruh bar dike.

Ya di wê beyaniya şeva belek de, di mergên rêvanên ber bi ne kifşbûyînê de serwer, hîviya jiyanêbû. Ji xeynî qismek mirovên ji wê serîwenê re ne amade û wekû rasthatî xwe di nav karwan de peydakirîn, gêwil bilindbûn. Hêstên serkeftina li hember artêşa Êraqê bi dest êxistin, qabilê hemî zehmetiyanbû. Bi hêza ji wan hizran digirtin, ji bû starekî ji zarokên xwe re peyda bikin dê û bav li derdor belav bibûn. Mizgîniya xêrê ya karwan çaverê, ji zû ve cihê xwe ji hewldana bicêhbûyînê re hiştibû. Ji bilî warê mayî tu kesî, ti der nas ne dikirin. Hizra dibekû pêşmerge ketibin di nav malan de mejî di biryardayînê de tengvan kiribin jî ji bilî tiştên li pey xwe hiştîn û îhtîmale guriya agir ji wan negirtîn tiştek din ne dihat bîra wan. Biteybet zilaman, gel bi hewarî berê xwe dabû wargeha Nînûva.

Sibeh zûbû û hê liqatvênên Zêdikan xwe ji şaqistiya şevê rizgar ne kiribûn. Bi sedan koçberên zivirîn Nînûva, di nav kavlên ji devê pêta agir felitîn de diqijvijîn. Bi teybet çadir û qût, çi li ber kê diket tavêt ser pişta tirimpêlokên îcada wan û ber bi Nehdaran ve dibezîn. Ewle ne dibûn zêde bi nav wargeha xalî ve bipêş bikevin û di nav semta yêk de li hev diketin. Pêşmerge û gundiyên ji tirsa qiyameta şevê revîn zivirîbûn, ema li pêtiyên dûr çavdêrtî dikirin û wan jî ne wêrîn xwe berdin nav malan. Lê, kêmek mabû wekî teyrên kelaşan dadin ser liqata bermayiyên koçberan.

Birek boş ya pêşmergeyan gihatibûn semta pênç. Zerzûla hê jî ji tirsa şeva bûrî dilê wan hiltavêje, koçberên li derdora semta yêk gulebaran dikirin. Wekî seyên tirsonek û şev û roj ewt, ewta wan, nûkerên welatê bindest jî şev û roj derdor gulebaran dikirin. Koçberên bi dimohrî bermayiyên xwe didan hev, ji tirsa guleyên

pêşmergeyan ji nav malên şewitîn diteyîzîn û di ser Nehdarê de direvîn. Yên cesaret kirîn û wê sibha sar pêdiviyek ji Nînûva rizgarkirîn, gotin ji keyfa wan re ne dihat gotin. Jixwe heke çadirek peritî û pêta agir jê negirtî bi dest êxistibin, xwe nêzîkê welatek azad hîs dikirin. Û yên dudil mayîn, giran tevgerayîn poşmatiyek sik didêmê wan de dihat xwendin.

Roj du werîsa bilind bibû. Berfa axlêvê zû bibû lîlav û zeviyên çandî yên derdor vegerandibûn derya teqnê. Li derdora Dara pîroz xwelî hatibûya hilavêtin li erdê ne diket û her malbat di kêferata avakirina starekî de bû. Yên derfet peydakirîn û çadir bixwe re anîn, çadirên xwe vedabûn û ji zû ve bicêh bibûn. Lê, xweyî çadir pir kêmbûn û malbatan berkendalek dikolan û bi qetek naylon zarokên xwe dihemandin. Tiliya wan li ser tetikan leşkeran, xwe li dora koçberan kiribûn hevşî û ne dihiştin kes xwe bilepitîne. Ji xeynî vegera warê mayî ne dihiştin tu kes ji rêya qîr veqete. Tenê dubare vegera Nînûva serbestbû û li eêdê jî êdî pêşmergeyên PDK'ê dikirin gêre-vêre.

Gera govenda bidawî lêhatina şer re destpêkirî bi tevlîbûyinên nû firehtir dibû. Dilopên xwêhdana li ser eniya govendvanan bibandora xwîsitiyê wekî xwinavê dibiriqîn. Dêmên mirovan ji bandora xwêndanê spehîtir û lewaztir dixwiyan. Zîna Hevlerî ya nû sergovendî berdayî û li rex gêra govendê bi zenda xwe xwêhdana eniya xwe paqij dike, ji qotiya piçûk çixarê dipêça. Çavên wê yên gir, ji bê xewî hûr û qermîçokên li dora wan jî kûrtir bibûn. Sibeh zûbû û cîhan pir sarbû. Jixwe hêza bê dawî ya reqasvanan ji sermayê jêder dibû. Kesên diwestan û reqis berdidan, dicemidîn û dubare vedigeran cihê xwe. Dîlan germbû û dîlananvan wê sibha cemidî hemî hûnerên xwe ratêxistin.

Hewarê Şirnexî û Gabarê Gabarî di nivê gêra govendê de bûn û ji westa leq bibûn. Hewar, devê xwe êxist di ber guhê Gabar de û ji dizî ve got;

"Ezê bi xwe bimîzim, em çibikin?"

Dibêjîqey Hewar, bi vê gotinê tiliya xwe danîbû ser kula Gabar. Cihek bistar tinebû û ji bû pêwîstiya xwe, divê daketana dola jêr ya qet ne dîtîn. Wekî ji dizî ve dîlan berdan û dol û dol berjêr daketin xar. Tam dema bigihêne cihek nependî, singa wan li ya du şirteyên di devê dolê de sekinîn aliqîbû. Leşkerên sefîl û rewşa wan ji ya mihaciran ne baştir, çekên xwe ji milê xwe vekirin, lûleyên wan dan singa Gabar û Hewar û bi hev re gotin; "irce'e". Hemî rêvanan ji şevê din ve ew peyv ji berkiribûn û dizanîn wateya wê "bi paş ve herin." Ema, her du ya jî gefên şirteyên pidû hişîn, lêhv gilol mucid ne girtibûn û hê bêhtir nêzîkê wan bibûn. Gabar, bi destê xwe dutatiya xwe nîşakir û got;

"Mîz, mîz, emê herin bimîzin."

Şirteyan merema wan zû fêhmkiribûn û yêkî tiliya xwe ya beranekê û nîşanê bi hev ve bir û anî û got;

"Mîtên û xemsîn (du sed û pêncî)."

Wan jî merema şirteyan fêhmkir û Gabar xwe acizkir. Tiliya xwe li wan hejand, fermandarê li ser cadê nîşan kir got;

Zabit, zabit (fermandar) ezê gilhê we li cem fermandar bikim."

Leşkerekî nemerdî nekir, bi milê Gabar re girt, Hewar jî dan ber tehfan û berê wan dan cem zabitê xwe pê navdidan. Di navbera dol û cadê de zeviyek pehn, mezin û nû cohtkirî hebû. Heriya zeviyê xwe li navtengê dida û xwe li nîvê zeviyê dan. Bi kutekî û heft belayan teqna zeviyê qetandin û xwe gihandin cem zabit. Zabitê çav şimşirî, lêhv gilol û zik meşk, destê wî li piş û li ser nîvê cadê sekinîbû. Leşkerek ji pêşyê bezî, lingê xwe li erdê da û bi erebî rewşa heyî jêre vegot. Zabit qet sekna xwe xira nekir û li gilehvanan zivirî û got;

"Xems miye (pênc sed)."

Gilehvan şaqis mabûn. Tiştek ya bikirana ne mabû. Ne zimanê wan û ne jî diravên wan yê wan mirovên xelayê jiyan dibin qayil bikin hebû. Ketin di dûv hev de û bi mîz û heriya bi lingê xwe ve hatin û ji cihê mayî dîlana xwe dewam kirin.

Tîrojên roja nû hilatî li lîlava berfa Nehdaran didan û wekî dur û elmasan diteyisandin. Hêlma ji axa axlêvê radibû dolikên derdor dadigirtin. Dibêjîqey tîrojên bê bandor bi lîlava re hevsengiyek ya seqemê çêkiribûn. Sira ji nav berfa bi hewarî dihelê derdiket, rûyê rêvanan dida ber şeqaman. Hîviya çûyîna herêma Sohran ji zû ve di nav heriya zeviyên Nehdaran de wunda bibû û kêferata bicêhbûyîne mejî tevizandibûn. Tu kesî çavên xwe li cihek xweştir ne digerand û li kû sekinîbe cihê xwe li wêdê xweş dikir. Êdî, biryarên rêvebertiyê û dewleta Êraqê jî bala koçberan ne dikişandin.

Ew qederekbû dengê çekan ji nav warê mayî bilind dibû û vî dengî bala koçberan kişandibû. Tirsa dibekû yêkîneyek ya karwan û pêşmerge li hev rast hatibin, dilê wan hilpekandibû. Ema piştî hat mîsogerkirin, ti yêkîneyên wan li wan dera ne mane, dilniya bibûn û dubare vegerabûn karê xweyê bicêhbûyînê. Her kû diçû dengê çekan nêzîktir dihat û dengên çekên giran jî tevlî çekên din bibû. Dengê BKC, RPG û heta dengê hewanan jî bi hêsanî dihat hilbijartin. Serhatiyên salan nîşan dikirin kû li nav wargeha Nînûva şerek dijwar û biberamber diqewime. Her çiqas baweriya 'kesê me li wan deran nîne' di nav koçberan de serwer jî be, dengê çekan ne rihetiyek afirandibû. Ciwanan tevir û bêrikên xwe avêtibûn, govendvanan govend berdabûn, xwe bi çek û rextan pêçabûn û çeperên sirtên beramber girtibûn.

Tam dema herkes li ser şerê di nav wargeha Nînûva de diqewimî raman dibû, teqînek mezin li Rojhilatê beramber yê dara Nehdarê bilindbû û bi teqînê re orêna çêlekekî û dûyek reş hawaket ezmanan. Sima çêleka qulibî serpişta xwe hûr hûr bibû û wekî lûlika misîn xwîn jê divizikî. Koçberan, dest ji karê xwe berdabûn û ber bi cihê çêlek lê ketî ve dibezîn. Çêleka belek çima birîndar bibû û çi lê teqab, fikrek ya tu kesî tinebû. Tam dema şîroveyekî ya din betal dikir leşkerekî li çepera jor kirqêr, cihê çêlek lê ketî nîşankir û got; "elxam, elxam!" Bi gotina 'elxam' re herkes veciniqîbû û di cihê xwe de cemidîbû. Çêleka di nav êş û janê de diperpitî dilê herkesî şewitandibû. Tu kesî newêrî ji ber mayînan xwe bide ser çêleka birîndar û destpêkê xweyê wê, herkesî bi awrên neçar lê temaşe dikir. Mûbarekê Geverî yê temendar, dirêj û lewaz û wekî leglega di nav ordekan de sekinî, bi ser koma mirovan re li çêleka reben nêrî û bi devoka Geverî di ber xwe de got;

"Ezîzê mamê xwe, me warê xwe di nav elxaman de daniye û haya kesî jê nîne."

Peyva 'elxam', ya Mamê Mûbarek ji berya bêhnekî ji leşkerê Sedam dewr girtî, bibû sedemê beşişandina rûyan. Karwanê koçberan, bi xêra çêleka belek fêr bibû; aliyê Rojavayê warê wan zeviya mayîna ye. Ji şevê din ve bi dehan mirov bê pakî dabûn nav zeviya mayînan. Wargeha xwe ya nû di nav zeviya mayînan de danîbûn û leşkerên Seyîd Reîs jî qet dikar nekiribûn.

Dengê mayînê kêmekî bala gel ji şerê di nav Nînûva de diqewime dûr êxistibe jî şer her kû diçû nêzîkê warê nû dibû û fikarên koçberan jî zêdetir dikirin. Êdî kesên şer dikin bi çav dihatin dîtin û aliyê di şer de şkestî berbi Gundê Xwidêda ve direvî. Dengê vîzêna guleyan bi ser çeqilên Nehdaran re difirîn.

Roja çend werîsa bilindbûyî tîrojên xwe yên rengîn berdidan ser çeqilên Nehdaran. Berfa ji bandora germahiya axlêvê bi hewarî dihela, rûyê erdê belek kiribû. Sira ji nav berfa yêk şevî radibû, dibêjîqey di navbera tîrojên rojê û koçberên Nehdarê de bibû tanî û ne dihişt laşên ji serma dilerizin germ bike. Ema tu kesî haj sermaya hişk tinebû û li çar aliyê Nehdaran kêferata peydakirina starekî dewam dikir. Leşkerên bê merîs û çilm û gilîz tevlîhev dibe, tiliya wan li ser tetikan û dor koçberan girtibûn. Zarok û ciwanên hewldidin boseya leşkeran biqetînin û ji bû firek qazyax peyda bikin herin Şêxan, dibêjîqey bi leşkeran re leyîstoka Birkê dileyîstin. Koçberên dereng ramanbûyîn, an jî newêrîn herin Nînûva û starekî ji zarokên xwe re bînin, bi despêkirina şer re bi her du destan lixwe didan. Yên zû ramanbûyîn û çadirek ji liqatvanan rizagrkirîn bi vedana hewîngeha xwe şa dibûn.

Rayên stoyên çîrokbêjên govendê stûrtir bibûn û lamên

wan sohrtir dixwiyan. Kelaşê jina mirî hê jî li binê darêbû û yê li kû hatibûya veşartin, fikrek ya kesî tinebû. Koçberan dixwest bi hênceta veşartina kelaşê jina yêxtiyar, kêmekî sînorê xwe fireh bikin û term di nav goristana bajarê Şêxan de bisipêrin. Leşkerên Seyîd Reîs, bi dijwartî li dijî vê daxwazê derdiketin û destûr ne didan tu kes ji sînorê hatî kifşkirin derbaz bike.

Ji sêyan yêkê koçberan deriyê dewleta Sedam derbaz kiribûn û yên din hê jî di qada tampon de mabûn. Pêşmergeyên eşîra Zêdikan, yên li ser liqata koçberan şer dikirin nû gihatbûn tenişta koçberên di qada tampon de. Hêza xweparastina koçberan  û pêşmergeyên PDK'ê hatibûn himber hev û awrên tûj ji hev vedidan. Lib liber, tilî li ser tetikabûn û li benda fermana mejî rawestabûn. Pêşmergeyan bi dengên bilind koçber wekû 'cehşên Sedam' bi nav dikirin û ji bû koçber dengê wan bibihîsin ji qestî dengê xwe bilindtir dikirin.

Yadê Pîjana Şiwêdî, ya aqlê wê di navbera 'timam' û 'dewam'a rêvantiyê de digevize, hosta gotin û ji qestî xwe li paş hiştî, bi tehnên paşmergeyan firî ser cadê û bidengek bilind got;

"De vêca were û safî bike! Gotinek ya me Göhyiyan heye, dibêje; Spih ji qepalan, gotin ji mirdalan!" û ber bi Mûsekiyên ji ber liqata Nînûva berdidin pismamên xwe û hev dikujin ve çend gavan çû û dewamkir;

"Rizîlên liqatvan! Hûn ji ber liqata me hev dikujin, ji ber qetek nanê turkan me dikujin û hê jî taxivin. Qey heya bi we re nemaye? Qey avka rûyê we qeta ye?"

Cengvanên ji ber liqata mihacirên qampa Nînûva  hev dikuştin, zêde bi jina yêxtiyar re hevkûf ne bibûn û aliyê dilxwede serketî aliyê din ber bi gundê wan ve tajot. Zilamên gundiyên gundê Xwidada, bi pişta qampa nû re berbi sînorê Êraqê ve direvîn û jin û zarok jî berbi Ba Edlê ve. Pêşmergeyên nû ketîn di nav gundê wêranbûyî de agir berdidin malan û di demek kurt de guriya agir bi dehan mitreyan bilind bibû. Sê ciwanên ti çare di destê wan de ne mayî berbi koçberan ve direvîn. Çekdarên ciwan diqewitandin, rasthatî gule dibarandin û guleyên wan çeqilên bilind yên Nehdaran wekî birekê dibirîn. Hêza xweparastinê pêşî li çekdarên berdidin ciwanan girtibûn û êrîşkar rawestandibûn. Piştî ciwan ketin di nav mihaciran de, yên berdidan wan zivirîn û di duryana gundê Xwidêda de ji çavan wunda bibûn.

Her sê ciwanên ji mirinê rizgarbûyîn ji tirsa hê jî dilerizîn. Xwînê xwe ji dêmên wan kişandibû û rengê miriyan avêtbû rûyê wan. Kitek pêlava yêkî ketibû û xwîn û herî bi hev re ji lingê xas diherikî. Yadê Fatê ya Kalikî, bi dengek dilpêşewitî û kelegirî got;

"Kurê min xêre, wan pêşmergeyan çima dixwstin we bikujin? Ev çi şere, çi diqewime?"

Xortê kêmekî qelew, zincîrek zêra stûr li ser singa wî ya tazî dibiriqe, wekî riha bizinan biskek mû bi erzena wî ya bêmerîs ve daleqayî û ji tirsa reng avêtî got;

“Ew pêşmergeyên mamê min Faris axabûn.”

“Mamê te? Qey tu kêyî?”

“Ez kurê Memo me.”

Dema navê bavê xwe got, kela wî xwe ne girt û girî.

“Bav, bira û pismamek yê min, di wî şerî de hatin kuştin” got û hê jî ji tirsa mamê xwe dilerizî kurê Memo axayê êdî mirî.

“Çima, qey çima we şerê hevkir?”

Bi pirsa jina yêxtiyar re, xwîna nû êrîşkirî dêmê sik dubare xwe vekişandibû. Ciwanê ji ber liqata wan mirovan ji malbata xwe du kuştî dayîn, serê xwe tewand û awrên wî şkestin. Bi dengek kelegirî û çilm û gilîz tevlîhevbûyî gotinên xwe ajotin;

“Ji ber tiştên we. Bavê min Memo û mamê min Faris, li ser parkirina bermayiyên we li hev nekirin û ew şerê we dibihîsta sebebê wê ne parvekirina liqata we bû. Di şer de, ji aliyê me bav û birayê min û ji aliyê din jî pismamek yê Faris Axa hat kuştin. Gundê me jî xirakirin û herkes bi aliyekî ve revî. Hûn dibînin, malên me jî şewitandin.”

Koçberên kombûyîn, bi awrên dilpêşewitî û şaqis mayîn li gotinê ciwanan guhdar dikirin. Neheqî û zordariya vî ciwanî, bavê xwe û gundiyên wan ew salekbû li wan mihaciran dikirin ji zû ve ji bîra wan çûbû û niha li ser halê wan digirîna. Hemî êrîşên li ser wargeha Nînûva pêkhatîn, li gundê Memo û bi arîkariya wan hatibûn fik kirin. Ev ciwanên niha xwe avêtî ber stara wan, bi dehan birên pezên wan talankiribûn, birçî hiştibûn û xwedê dizane destê wî di xwîna pir kuştiyên wan de jî hebûn. Jixwe belkî guleya destpêkê ya li Pîranê zavayê salê ketî, ji xedareya wî kesê melez derketibû. Ema biqasî misqala zir kîn di çavên koçberan de ne dixwiya û ji bû wan ji mirinê rizgar bikin û pariyê nanê dawî yên zarokên xwe bi wan re parvebikin di nav pêşbirkekî de bûn.

Gelo ya koçberan raberî wan ciwanên ji mirovtiyê behra xwe ne girtîn dikirin, dilnivztî û mirovperwertîbû an jî fêrkirina rebentî û bê hêrsîtiyêbû? Gelo qey heyfstandin ne hêstek mirovîbû, kîn û hejêkirin ne ji heman serkehniyê dizan? Gelo qey di çanda Kurdan de, li mirovê ketî dayîn tinebû? Di pirtûka wan de keysvantî ne hatibû nivîsandin? Bersiva pirsên dikarkirî mijara lêkolînek kûr û firehbû. Ema ya hergîz, wan kesên xwe avêtîn ber bextê wan û çilm û gilîza wan têkel diherikî; ji berya wê rojekî qibhet û kilametên di dîroka toxmê mirov de kêm hatîn dîtin anîbûn serê wan bextdaran. Jinên derdor, çaya bi çi kul û halî li ser sopeyên eledîn kelandîn ji ciwanên gundê Memo re îkram kirin. Xwarin ne xwarin ema, her

yêkî çayek vexwar û birin cem rêvebertiya wargehê. Rêvebertiyê daxwaza wan guhdarkir û wan xwestin derbazî Bajarê Şêxan bibin û çûn.

Tam dema şerê malaxaya eşîra Zêdikan nû şemirî karwanê tirimpêlên UN li ser tenişta wan nivîsandî, ji aliyê wargeha Nînûva ve hat û li koma gel aliqî. Koçberan rê girtibûn û tirimpêlên UNHCR, di navbera pêşmergeyan û koçberan de sekinîn. Piyerê ji Rojhilata dûr, ji tirimpêla xwe peyabû û pirsa komîteya karê jidervekir. Ji bû tif bikin rûyê mirovê rûsar û hêst nalyon, di bin pêşvantiya Teybeta Hîlalî de birek pîrek bi ber ve bezîn. Endamê komîteyê Huseynê Hilalî, Piyerê çav şeqitî ji nav lepê pîrekan rizgarkir û berbi Nînûva ve tehfda. Piyerê şaqis mayî û ji tirsa dilerizî ji Huseyn re got;

“Ev çiye? Çima we barkir?”

Endamê Komîteya ji derve Huseynê Mahmût;

“Bi kesên ji nav PDK’ê têne em bi wan re hevkûf nabin. Ji bû em bikaribin bi hev re gotûbêj bikin, pêwîste tu ji aliyê Şêxan ve werî. Here û hê van jinan tu  têr lêdan nekirî, zû wunda bibe.”

Piyerê çavên wî yê werimî kûrtir bûyîn, bilez ji wergervanê xwe re got;

“Hay hay! Ji wan re bêje; bila ji vêdê neçin, ezê herim û bi Mûsil re werim” û li tirimpêla xweya buha siwarbû û çû.

Roja sohr, nû ji cihê danûpeza bûrîbû. Wekî qursek zêr, li raser Nehdaran rawestabû. Komek mirov li pesarê Rojhilatê Nehdaran tirba zaroka Mehmûdê Osman dikulan. Dayika zarok, bi her du destan li ranê xwe dida û bi dengek melûl digiriya. Bavê qamqut û wekî pencekî lê hatî şebikîbû û reş li kelaşê di nav betaniyê de dinêrî. Ser û guhên mirovên tirp dikulan di nav herîsohrkê de mabûn û dilopên xwêhdanê di serê pozê wan de diherikîn.

Hiznî yê Şaxî, bi hukmê bertîlê boseya leşkerên Sedam derbazkiribû û xwe gihandibû bajarê Şêxan. Zilamê por qij, bejin xwehr, bîdonek bîst lître qazyax anîbû û li tenişta darê koçber li dorê bibûn hevşî. Kovikek zer êxistibû devê bîdonek pênc lître de û bîdonê pênc lître difirot bi heftî û pênc dînarên Siwîsrî (esîl). Li aliyekî hemrêyên Hizniyê keysvan îsyan dikirin û li aliyê din pîrekan tif dikir nav çavan. Li aliyê din jî diravên xweyên dawî ji wî ezvanî re dihêjmartin. Di rewşên asayî de, mirov dikarî bi wan diravan du varêl qazyaxa dused û bîst lîtreyî bikiriya. Ema zilamê avika rûyê wî qetayî, rewşa ne jirêzê vegerandibû rantê.

### Ji Qirkirinê re Du Demjimar Mabûn

Tirimpêlek leşkerî ji aliyê Şêxan ve hat û li cem fermandarê li tenişta Nehdaran sekinî. Zilamek têr apolet, ser keçel, pidû hişîn,

lêhv gilol û zik têrik ji tirimpêlê peyabû. Bi hatina mirovê ji her rewşa wî kifşbû fermandarek mezine, leşkerên derdor xwe komî ser hev kiribûn û devê lûleyên çekên xwe hê bêhtir qerastibûn singa koçberan. Fermandarê ji berê ve li wêdê, silavek da yê nû hatî û bi erebî tiştin jêre gotin. Fermandarê ji destpêkê ve li wêdê, bi kelecan bezî û ji ciwanek yê koçberan re got;

"Mesûl, mesûl. Serîîî..!"

Li ser qêra fermandarê ereb Cûma yê rêvebir, wergervan Nahîda porspî û çend kesên din hatin û li cem fermandarê nû hatî rawestan. Jixwe di rewşên wisa de her lept û tevgerê bala herkesî dikişand û herkes çaverêyî nûçeyek ya xêrêbû. Bi van hêstan koçberên derdor jî nêzîk bibûn û li ser rê gulatek mirov pêkhatibû.

Fermandarê têr apolet û çav şimşirî, bi awrên tevzvan bejna xwehr ya Cûma bi çav re derbazkir û bi awazek tehdîtkar demjimara xwe nîşakir, tiliya xwe ya reş û têr kulîmek repkir û got;

"Ji te re du demjimar mûhlet. Yan tuyê van mirovan ji nav axa dewleta Êraqê derxînî û dubare bizivirînî cihê wan yê kevin, yan jî ezê kitê sax nehêlim!"

Hê gotinên fermandar ji Cûma re ne wergerandîn Nahîda porspî, reng avêt û dêmê wê ji pora wê spîtir bibû. Jixwe ji tona deng û tevgerên fermandarê Seyîd Reîs kifş dibûn kû gotinên wî neyên xêrêbûn. Lê dîsa jî Nahîdê, gotin bi gotin ji Cûma re wergerand û wî jî reng avêt. Dest û lingên Cûma tevlîhev bibûn, devê wî êdî nedigera û yê çi çi bigota ne dizanî. Tenê got;

"Ev ne mûmkûne. Pêşmerge ketine di wargehê de û ji şevê din ve dişewitînin. Ezê çawa bikaribin vî gelî dubare vegerînim?"

Zilamê til meşk, dengê xwe bilindtirkir, tiliya xwe êxist di çavên Cûma de û zirtên xwe ajotin;

"Ez nizanim, êdî hilbijartina xwe tu bike. Tenê du demjimarên te hene" û bi awayek qure li tirimpêla xwe ya kîsokî siwarbû û berê xwe da Şêxan.

Dema fermandar li tirimpêla xwe siwar dibû çavên Cûma bê hemd li demjimara wî aliqîbû. Mîlên demjimarê 09:51 nîşan dikir. Ev dihat wê wateyê heta 11:51'ê wextê wan heye. Cûma, li komika mirovên derdor nêrî û bi awrên xwe pirsa "em çi bikin" dikira. Ema, dinanên herksî bi serhev ve resisîbûn, kefşîlê êxirên devê wan dagirtibûn û awrên wan di valetiyê de xeniqîbûn. Cîhan ketibû di çincîrkekî de û ji aliyek yê dola Nehdaran dibeyî aliyê din. Haxta cîhana gewrik ji çincîrkê bifelitiya û ji eksena xwe biketa. Ji Sedamê Enfal pêkanî û Helebçe kîmyabarankirî, hertişt dihat hîvîkirin. Jixwe ava cîhana şaristan û wê komika mirovan qet di coyekî de ne herikîbû. Heke ji aliyê kesek wekî Sedam hefsarê xwe qetandî ve bihatana qirkirin, dibekû aferînek baş bigirta û bi efo yê hatibûya

xelatkirin jî.

Nûçeya ne bi xêr, bileza têza tifekê li seranserê Nehdaran belav bibû. Koçberên di nav derya heriyê de û bi zikên birçî hewl didan zarokên xwe ji kulabên mirinê rizgar bikin, bi vê nûçeyê ji taqet ketibûn. Zirtên zilamê lêhv hişîn, zeravê sist û leqan bizdan dibûn û tirsek şermdar li dilê wan barkiribû. Huseynê Xalid, Ehmedê Huseynê Naso, Huseynê Emerê Cango, Evdilayê Lewend, Cemîl û Mustefa yê Lewend yên Ziravikî û çend malên Mijînî yên şevê din ji tirsa mirovên xwe barkirîn, bi malbatên xwe ve dest ji tiştên anîn jî berdabûn û berbi pêşmergeyên PDK'ê yên ti xirabî nemayî ne anîn serê wan ve direvîn. Rewşa koma mirovên bê mehwer baz didan, miriyên ji bin hedan derketîn tanîn bîran.

Dawa wê bibervekirî, zendê xwe hildayîn jinek bi vedana naylona xwe ve mujûl, bêrika di destên xwe de avêt erdê û bezî pêşya malbatên direvin. Her du destê xwe vekirin û li pêşya mirovên awir şkestî sekinî. Zilam û malbatên din bi çep û rastê pîrekê re derbazbûn ema,  serê wî nivz û rengek kerixî dêmê wî pêçayî Huseynê Xalidê Ziravikî, bisiyanet sekinî. Jina bejin navîn û navser, bidengek têr û keziyên lavan jê difelitin got;

"Eybe, yazoxe! Hûnê me bihêlin û bikûve birevin Huseynê Xalid? Guhdarî gefên van leşkerokan nekin! Ji bavê wan zêde ye destê xwe dirêjî me bikin. Heke ewqas lehengin, bila herin qona xwe ji leşkerên Amerîka biparêzin. Qey em bê xweyîne."

Zilamê şaşika xwe Başûrî girêdayî, êlekek navmil qetayî di ser şalwalek pînekirî de liba dibe, meqabek pehnî şkandî dilingan de û pêlava reben tijî herî bûyî bi awrên reben û tirs ji wan dibare li jina rêgir dinêrî. Xwînê xwe ji dêmê wî yê dapên spî nû beyînê kişandibû û dilerizî. Di hinavê wî de tirsa mirinê û serma tevlîhev bibû û şeqe şeqa dinanên wî rê ne dida baxive. Zenda zaroka xwe ya pênç, şeş salî, ne dixwest ji hevalên xwe veqetê û bi hemî awaza xwe digiriya û hewldida xwe ji destê bavê xwe rizgar bike hişk şidandibû. Zilamê tirsa mirinê merg û mejiyê wî dagirkirî, bêkû yêk gotinê bibêje, zaroka di destê xwe de da ber zeleyan û berbi pêşmergeyan ve bi gavên lez bezî. Zaroka lingên xwe qerastîn erdê û di neçûyînê de bibiryar, devikî ket. Zilam ne sekinî û ne jî destê zarokê berda. Zaroka por qesep, di nav berf û heriyê de xirand û ji çavan wundabûn. Mihacirên li ser axa welatê xwe bostek erdê hewandinê peyda ne dikirin, bi awrên neçar li pey çûyiyan dinêrîn û ji 'nirçe nirçê' zêdetir ti deng ji kesî dernediket.

Hê koma reviyan ne gihatî pêşmergeyan Evdilayê Lewend, bi paş ve  lezand û zivirî cem tiştên li dûv xwe hiştîn. Bi awayek lez tûrikê bireng yê Goyî wekû "parzon" bi nav dikin, tevlîhevkir û paçek girêdayî yê biqasî kulmekî ji nav tiştan derxist. Bi heman bezê

dubare ber bi pêşmergeyan ve zivîrî. Jina yêxtiyar ya bi hemî karîna xwe hewldide pêşya reva wan bigre, destê xwe êxistibûn kêleka xwede û bi awrên tevzdar li Evdila dinêrî. Jiberya Evdila bigihê hindamê wê, pîrekê çavên xwe girtin û devê xwe vekir;

"Ka dema kêloyek arê rizî, lîtreyek qazyax dibû dabaşa gotinê ji we mêrxastir û welatparêztir tinebûn. Mêro! Çima dema kêmek tengahî di ser we de hat, qona we erd negirt û hûn direvin? Heke biqasî misqala zir namûs û şeref bi we re hebûya, weyê xwe avêtibûya ber lingên paşmergeyên mala Berzanî!?"

Dema zilamê tirsonek, bi ber jina dilşewitî re dibûrî û keviyê paçê xwedê dizane zêr û dirav di nav de ne ji kûrika êlekê navmil qetayî diheja;

"Dêya min û xwişka min! Niha tu çi bela xwe ji me venakî? Em kerixîn, em felişîn, êdî em nikarin qey bi zorê ye? Bavo, li ber destê te, xwedê û pêxember ez soz didim, sond dixwim; ew Kurdistana hûn li dûv ketîn me navê, navê, navê!.. Qey bikutekiye xwişka min?" got û gihat malbatên nû gihatîn cem pêşmergeyan.

Zilamên li pêşya pêşmergeyên bi hatina wan pir şad dixwiyên rêz girtîn, yêk û yêko xwe tewandin û çûn destê wan. Heke destê wan jî maç kiribûna dikeyê Şêx Mihyedînê Basretî û sofiyên Harûna yê hatibûya jîndarkirin û dubarekirin. Jina çavên wê, ew dikeyê qedapdar zom dikir, bikîn tifkir erdê û zivirî ser karê xwe.

Di navbera qelsemirovtî û xweşmirovtiyê de mû hebû. Pir caran ev xeta zirav diqeta û ji bû tirsonekan bê wate dima. Hevalên xwe di deravên teng de dihiştin û ji bû pariyek nan, an jî temenek dirêjtir xwe tavêtin delingên celadan. Di çanda kurdan de, kirinvanên vê kirinê bi dijwartî hatine mehkumkirin û ev kesîtî wekû bêbext, xayîn û bê namûs hatiye pênasekirin. Di edetên kurdan de, soz ne dihat vegerandin û tif ne dihat alîstin. Yên ji soza xwe vedigeran, di nav komanê de ne dihatin hewandin. Lê, gotina; "***Namûs taca zêrîne, di serê herkesî de nîne"*** herî zêde di deravên teng, di wê bêhna xeta di navbera qelsemirovtî û xweşmirovtiyê de zirav dibû, xweyê xwe peyda dikir. Di firehiyê de ji wan ziman dirêjtir, zirtkertir, gernastir tinebûn. Ema di bêhna mû zirav dibû de û dihat ber qetandinê; tirsek bê şerm hinavê wan dagir dikir û wirarên sozên dayîn li dor wan ne diman. Ezvantî û kesvantiya wan radibû pêdarê û nîşanên nirxên mirovtiyê bi wan re ne dixwiyan.

Xwe ji mirinê re razandin û stoyê xwe ji kêrê re dirêjkirin, berevajî xwezaya jîndaranbû. Jixwe heke mijara gotinê qirkirina zarokên dê û bavekî be, ramandina wê jî dil diqeliqandin. Merc çi dibin bila bibin, heta saniya dawî û bêhna kutahî, xeyalkirina li warek azad jiyanek serefraz rastiyek ruhî ya her zindiyîbû. Girêdayî vê rastiyê gefên fermandarê zik meşk, bandorek mezin

li rêvanên berbi ne kifşbûyînekî ve diherikin ne kiribû û kêferata bicêhbûyînê bê navber dewam dikir. Keysvantiya Hiznî yê Şaxî, ji gefên Fermandarê Seyîd Reîs û ji reva bêbextan pir bêhtir bandorek ruhî li koçerên warê rojyaran kiribû.

Zeman, bileza berqa birûskê diherikî. Herikîna demê, deqe û demjimar bilez dihêran û wexte her du demjimarên hatîn kifşkirin biqedêne. Rêvebertî jî di nav de, tu rêvanan ne dixwest li ser rastiya fermana fermandar raman bibe û bawer bike. Hizra; "ji şevê din ve hevalê Riza ber bi Êraqê ve çûye û hergîz yê çareyekî peyda bike, Hevalan, em ti carî, dibin ti mercan de bê çare û tinê nehiştine û vê carê jî nahêlin" ji zarokê heft salî heta bi kalê sed salî re serwerbû, herkes di vê rastekê de raman dibû. Baweriya bi wê rastiyê ji polayê jî qayimtirbû.

Dema mirina tam tehl konê xwe li ser warê nû yê rêvanên rêya azadiyê vedida û koçber di navbera mayîn û nemanê de çirke dihijmartin, li nêzîkê cihê mayîn li çêlekê teqayî dengek mezintir û dijwartir bilind bibû. karwanê guhbel û refleksên wan pêdar, berbi cihê teqînê ve rijabûn. Ji demjimar çarê sibhê ve, cara yêkêbû reqasvanan jî dest ji reqsê berdidan û berbi cihê teqînê ve dilezandin. Mayîna duyem li bûka yêk mehî ya Brahîmê Nêrwehî teqabû. Jina tenik û ciwan, di nav xwînê de digevizî. Xwînê xwe ji dêmê wêyê gewr kişandibû û rengê mirinê rûyê wê pêçabû. Qetên şimika lingê mayîn lêteqayî, pekîbûn dûr. Lingê hûrbûyî ji birha mayînê reş bibû û ji gozekê heta gîçikê şewitîbû. Dibêjîqey jina ciwan hêza girî û qêrînê wundakiribû û kaze kazek melûl jê dihat.

Jana li ser dêmê jina ciwan û qeyrana ji zeviya mayînan jêderbûyî, zirtên fermandarê Sedam ji hişan şuştibû û di bîran de wundakiribû. Ya mejî mijûl dikirin ramana; "gelo leşkerên destûr bidin, em birîndara xwe bibin nexweşxaneyê" bû. Pîrekan, jina ciwan bi nav xwe re kirin û li binê Nehdaran, bi rex kelaşê yêxtiyara mirî re dirêjkirin. Rêvebertî bi gel ve, bezîn cem fermandarê leşkeran û daxwaza birina nexweşxanyê ya jina birîndar kirin. Wî erebê lêhv şopik got: "nirç" û ji nirçê ne nehat xar. Ne lave, ne zirt û ne jî hêviyan tesîr dikir. Zilamê delingek ya wî li jêr û yêk li jor digot; "Memno'e" û xilas.

Bayek cemidî li navguhê Nehdaran dida û hinav diqerisandin. Dûyê li ser gundê Memo Axayê ji ber liqata hatî kuştin û kelaşê wî hê jî li erdêye diket, deşta pîroz mijdar kiribû. Govendvanên êdî ne direqisîn li cihê govendê komikî sekinîbûn û ji aş û beraş taxivîn. Koçberên li derdora dara pîroz belavbûyîn, ji zû ve qampek piçûk avakiribûn. Tîrojên roja haxta bigihata cihê nîvro, li pişta naylonên nû hatîn vedan diket û qevda zeraqan direşand. Kefiyek Sêrtikî li dorguhan, sakoyek mezin di ser kirasek Bohtanî de lê, gureyek rîsa

sak dirêj û sist dilingan de û pêlavek lastîka reş di ser de Medya Aleman, li rex jina birîndar rûniştîbû. Serê keça xweya bûka yêk mehî danîbû ser ranê xwe, serê xwe pesartibû singa Medya û dayika jina birîndar hûr hûr digirî. Ji her rewşa jina aleman diyarbû, hêstirên xwe bi zorê zevt dikirin.

## DURYANA MIRINÊ

Demjimara qirkirinê hat û ya were. Hêstên têkel ketibûn di çincîrkekî de û di navbera mirin û mayînê de ditirşan. Belkî piştî kêmek din, li derdora dara pîroz, wirar ji rêvanan nemabûna û çîroka jiyana wan li deverek dûr hatibûya nivîsandin. Hîviyên berbi warek azad ve li binê dara Stiyan bivemirîna. Rêvebertiyê nefesa xwe girtibû û bi mejiyek qerisî mizgîniyek ya xêrê xeyal dikir. Her kû mîla demjimarê dijenî û nûçeyek berevajî ji Riza ne dihat, hîviyên dawî jî taqeta xwe wunda dikirin û di nav teqna Nehdaran de diperpitîn.

Berfa axlêvê zû helabû û zeviyên çandî vegerandibûn derya teqnê. Roja kêmek mayî bigihê cihê nîvro, li golikên ji ber ava berfê pêkhatîn dida û diteyîsand. Ligel kû ezman sahîbû û roj wekî gokek ya agir li raser daleqayî jî bû, bayek cemidî diherikî. Sira ji nav belekên berfê radibû, wekî şeqaman li dêmê xwecihên zorava diket. Zoravayiyên li çardorên Nehdaran belavbûyîn, mûrî reşkên hêlîn xirabûyî tanîn bîran. Herkes ditevgerê de bû û tiştek dikir. Dibêjîqey haya karwan ji tirsa mejiyê rêvebertiyê diguvêşe tinebû û di nav kêferata jiyanê de tirsa mirinê ji zû ve kuştibû. Pêşbirka bezê ya di navbera leşkerên Êraqê û zarokên li derdor belavbûyîn de û ji kebarê ve destpêkirî vegerabû leyîstoka Birkê. Zarok û ciwanan dixwestin boseya leşkeran biqetînin û leşkeran bi israr hewldidin wan didorpêçê de bigrin. Ema ligor dixwiya kêferata leşkeran beytişebû û zarokên pêşvan ji zû ve xwe gihandibûn Şêxan û hin ji wan bi galonê qazyaxê ve zivirî jî bûn.

Govenda piştî teqîna mayîna duyem betalbûyî, dubare destpêkiribû û gêra wê ji herdemî mezintir vedabû. Ji bilî kite mitên gêrîla, zêdehiya reqasvanan zelambûn û yên li derdor komikî sekinîn û lihember hatina nûçeyekî guhbel jî toxmê nêrbû. Jinan zend û bendên xwe badabûn û bi avakirina warê xwe yê nû ve mijûlbûn. Çend kevaniyan hacetên xwe digihandin hev û tiştek jê dafrandin. Yên firax bi wan re firaxên xwe, yên kêmek zad bi wan re zadê xwe û yên kêmek qazyax di binê sobeya eledîn de anîn jî sopeya xwe digihandin hev û bigêwil û şadîtiyek serasayî re xwarinek amade

dikirin. Bi heman awayî stara xwe jî bi hev re par vedikirin. Çend malbatan çadirek vedidan û di tê de bicêh dibûn. Mulkiyeta teybet ji zû ve wateya xwe wundakiribû û jiyana komîn bi hemî şepaltiya xwe meydan dagirtibû.

Dibêjîqey yên piştî çaryêkek din şûrê Sedam li ser serê wan bihejê, ne ew komika mirovanbû. Ji bû parastina zarokên xwe lebat û kêferatek bê mehwer dimezaxtin. Dibêjîqey, heta dawiya bê dawî yên li wî warî bimana. Ji bilî rêvebertiyê, wextê tu kesî tinebû li ser gefên qirkirinê yên Seyîd Reîs raman jî bibe. Dibêjîqey gef an jî zirtek wisa ne hatibû kirin. Gelo, rêvanan ew gef ne bihîstibûn an jî ji qestî xwe nebihîstî dikirin, ne dihat zanîn. Jixwe her du jî dihatin heman wateyê û bijarteka duyem ji ya yêkem pir biwatetirbû. Yan tuyê li wê duryanê xwe bavêjî himbêza celadên xwe û yan jî biserefrazî tif bikî rûyê mirinê. Karwan, ji zû ve bijarteka duyem hilbijartibû. Ev heypeymanek ruhîbû, zêhnîbû û pêwîst ne dikir kes ji kesî re şîrove bike, an jî vebêje. Di wê serîwanê de mirin û qirkirinê wateya xwe wundakiribû û mirin bibû perçeyek jêneger ya bêhnek jiyana azad. Ji bilî çend kesên xwilamtiyê di mejiyê wan de baregih avakirî, tu kesî ji tirsa mirinê xwe ne tavêt himbêza koletiyê.

Di rastiya heyî de bawerî, ji nan û avê jî wêdetir xweyê rolek pir cudabû. Toxmê mirov bê nan, bê av xweyê wê teybetiyê ye kû maweyekî bikaribe jiyan bibe. Ema di rewşa heyî de bê îman jiyandin, liberxwe dayîn û serkeftin ne pêkanbû. Tenê îmana dihat dikarkirin têrê ne dikir; divê îmana kes ji pola jî qewîtir û qayîmtirbûya. Ew jî hema wisa jiberxwe û di gavekî de pêk ne dihat. Divê xwedî binyatek çandî û rabirdoyek esîlbe. Aha wî gelî, wan rêvanan ew çand û bawerî di rastiya Gêrîlayên Azadiyê de keşifkiribûn, ji wan bawerkiribûn û derketibûn wê serîwenê. Di rabûrdoya mihacirtiya çar salan de, ev bawerî û îman xwirtir û mezintir kiribûn.

Di bin ti mercan de PKK'ê, pişta xwe ne dabû wan û ew tenê nehiştibûn. Du gotin ji wan re ne gotibûn û bêbextî li wan ne kiribû. Ji bû zarokên wan ji kulabên mirinê rizgar bikin, bedena xwe kiribûn mertal û ji bû birçî nemînin, bi nav xefkên xayîn û bêbextan re bi piştiyan ji wan re xwarin kişandibûn. Ji bû belav nebin û ji gur û çeqelan re nebin tomik, ji wan re rêvebirtî, xizmet û rêkxistinvantî kiribûn. Ya ji hemiya girîngtir jî di bin her mercî de ji wan re hevaltiyek bê bedel, safî û paqij kiribûn. Hevaltiyek ji derewan dûr, bê berjewendên şexsî, malbatî û ji wan re pêşvantiyek biwêrîn kiribûn.

Dema di nav wê komika koçberan de bêjeya; "ew Hevale" dihat gotin, taniyên biyanîtiyê ji holê radibûn, pîvanên xizmîtiyê çargav direvîn, niyetên zayendî ji wêdê bar dikirin û merg vedigeran xwezayîtiya xwe. Bawerî û îmana hêza berxwedana wan

mirovan, taqeta îsyana li dijî wê sîstema fêris û wêrîna li beramber wan zehmetiyan; ji vêdê dihat. Jêdera wan ya eşqa jiyanê, quweta henek pêkirina bi mirinê evbû. Raza berxwedana şeva Belek, di wê bawerpêkirinê de veşartîbû.

Hê Riza ne zivirîbû û karwanê koçberên welatê xwe, bi dilniyatiyek mezin bawer dikirin kû Riza dikare wan biparêze. Dikare di navbera mirin û zarokên wan de bibe taq, bibe dîwar, bibe mertal û wan ji pencên qirkirinê rizgar bike. Dikare wan bigihîne welatek azad. Bi qudreta PKK'ê bawerbûn. Û ti hêz û zehmetiyan, nikarîn wê baweriyê bilewitînin.

***Dawiya pirtûka yêkemîn…***

# *WÊNE*



***1. Destpêka vê rêvantiyê. Mihacir, ji geliyê Goya derbazî Başurê Kurdistanê dibin.***

***Nîsan 1994.***



1: ***Dîmenek ji dibistana Wargeha Bihêrê -1994***



2: ***Wargeha Bêsîvê. Peyîza 1994.***



***Bêrîvan ji bêriyê têne, Wargeha Etrûş Tîrmeh- 1995***



3:***Gelê wargeha Geliyê Qiyametê ji bû protestokirina zextên PDK'ê ber bi wargeha Etrûş ve dimeşe.***

***Hevîn 1995***



4.*Civîna gel. Geliyê qiyametê-1995*



5.*Dîmenek ji wargeha Hingo (Şehîd Bêrîtan) 1995*



*6. Şîna şehîdan. Gelê Wargeha Geliyê qiyametê, şîna şivanên ji aliyê pêşmergeyên PDK'ê ve hatîn şehîd êxistin lidar têxe.*

*Peyîz 1995-Geliyê Qiyametê.*



7:***Dîmenek ji şewata Wargeha Etrûş. Havîn 1995***



8:***Dîmenek ji xwendevanên dibistana seretayî***

***Etrûş 1996***




٩:*Qada pîrozbahiya Cejna Newrozê. Etrûş - 1996*



*Hewar Gabar, dibistana Seretayiya Şehîd Muhemed Karasungur.*
*Wargeha Etrûş- 1996.*



10. ***Civîna gel. 1996 Etrûş***



11. ***Xwendevan ber bi qada 12. Salvegera Cejna Vejînê ve diçin.***

***Not: ev wêne jî yêk ji wêneyên ji bû qepaxa pêş tê pêşniyarkirine.***



12. *Avaker û berpirsê destpêkê yê dibistanên Wargeha Geliyê Qiyametê û Etrûş Şehîd Xelîl (Muhemed Aslan) û berpirsê Tevgera jinên Geliyê Qiyamtê û Etrûş Şehîd Jiyan (Zeynep Erdem)*

*Şehîd Jiyan, di dîroka 13'ê Êlûna 1995'ê de ji aliyê Pêşmergeyên PDK'ê ve li wargeha Etrûş hat şehit kirin.*



13: ***Dîmenek ji kulika telîvîzyona Semta Şehîd Cûma***

***Wargeha Etrûş 1996***



14. ***Şehîd Merwan (Ehmet Ozdemîr), yêk ji endamê fermandartiya hêzên xweparastina Wargehan.***

***Di 16'ê Gulana 1997' de li Çiyayê Şêxan û ew û sê hevalên xwe dikevin di destê Pêşmergeyên KDP'ê û tên bê serûşûn kirin.***

***Not; Em wekû qepaxa paş vî wêneyî difikirin.***




15. *Dîmenek ji dibistana Seretayî ya Wargeha Nînûva- Havîn -1997*



16. *Roja destpêkê (13'ê Sibata 1998'ê ) ya Wargeha Nehdarê.*